Şoreş Reşî



# DÎROKA KURDÊN KOÇBER

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-II-

**Dîroka Kurdên Koçber**

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-II-

**Exil och flykting Kurdernas Historia**

(Mellersta Anatolien, Khorasan, Syrien, Rysland)

**Şoreş Reşî**

**Navnîşan / Adress**

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê / Kurdiska Institutet i Stockholm
Mogårdsvägen 13
143 43 Vårby Gård

**Telefon**

0046 8 38 81 12

**Çapa Yekem / Första Upplagan**

Tebax 2008 / Augusti 2008

**Rûpelsazî**

Xalidê Ezîz

**Wêneyên bergê**

Kesayetiyên Kurd

**E-mail**

kurdiskainstitutet@yahoo.se
soresresi@hotmail.com

**Çapxane / Tryckeri**

Berfîn Verlag
Köln

**ISBN**

91-976138-3-5
978-91-976138-3-5

©
Înstîtuya Kurdî li Stockholmê & Şoreş Reşî

# DÎROKA KURDÊN KOÇBER

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-II-

ŞOREŞ REŞÎ

# NAVEROK


| | |
|---|---|
| Di dema Osmaniyan da Kurd û Kurdistan | 11 |
| Di sala 1540 an de êlên Kurd ên li Besnî | 21 |
| Êlên li Semsûrê | 23 |
| Êlên li Gergerê-Kolikê | 25 |
| Derbend | 35 |
| Beranî (Qerekoyûnlû) | 38 |
| Êlên Beraniyan | 44 |
| Pezgewr (Aq Qoyûnî-Bayindiriyê) | 48 |
| Di serdema Osmaniyan de Ferman û Komkujî | 58 |
| Bi cîh kirin | 64 |
| Sersor-Alavî-Qizilbaşî (Sûrhûser) | 68 |
| Safewî-Şiî | 74 |
| Êlên mezin ên ku Dewleta Safewî avakirine | 78 |
| Êl (Eşîret) | 81 |
| Parçên êlên ji hev veqetîne | 83 |
| Êlên li Kîxî yê | 88 |
| Êlên li Semsûrê | 91 |
| Kurdên Xorasan û Gîlanê | 95 |
| Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê | 100 |
| Êrîşa dîlekî Kurd a ser Şah Ebbas | 105 |
| Şerê Nadir Şahê Efşar bi Kurdên Reşî û Qereçor re | 106 |
| Şerê Romiyan û Kurdên Xorasanê | 108 |
| Nîştecîhbûna Kurdên Çemîşgezek/Zaferan li Xorasan | 109 |
| Zeferan (-Lo)/Çemîşgezek | 112 |
| Welatê Eşkaniyan Qoçan (Xebûşan) | 141 |
| Şadiyên Xorasanê | 142 |
| Kurdên Şadî girîngtirîn parêzerên tixubên Îranê ne | 146 |
| Gîlan (Reşt) | 150 |
| Bi giştî êlên Kurdên li Xorasanê | 155 |
| Nav lê danîna êlên Kurd | 156 |
| Celalî | 157 |
| Tirkmenên Helebê | 164 |
| Boz Ûlûs | 166 |
| Yenî Îl | 171 |
| Kacar (Bayat, Yîva, Şêxbizin-Lek) | 174 |
| Bûyerên demên dereng û girîng ên li Anatoliya Navîn | 176 |
| Reşî | 186 |
| Şêxbizin (Ler-Lek-Lor) | 219 |
| Canbeg (Bexdilî) | 241 |

Mikaîlî (Sîpkan) 253
Sewêdî 257
Avşar (Qereman-Sine Milî-Terikî-Celikî) 268
Mirdês-Têrikî 272
Modanli 280
Badilî-Bexdilî 281
Celikan (Avşar, Bayat, Cerîd, Reyhanli) 284
Çemîşgezek 292
Desthilatdarê Kilîsê (Mendola) 296
Şêxan 297
Oxçî 298
Berazî 300
Dimilî/ke-Kurdasî (Erkeciga-Hilkecik) 303
Mûskan 308
Zerikî 308
Milan 319
Jêder û Çavkanî 327

## PÊŞGOTIN

Xwendevanên hêja!

Di nivîsandina vê pirtûkê de min ji dû kaniyan sûd wergirt: Yek, rehmetîyê bavê min Osê Erîf bû; tim digot: "Em ji Xorasanê û ji Xerpetê hatin." Ew gotin bûn destpêka lêgerînên min. Ya duyemîn jî têkoşîna azadîxwaz bû. Vê şoreşê, pêşeng û lehengên wê di alî raman de bandoreke mezin li ser min kirin ku di hundirê min de vejînek mezin derket holê. Ew lehengana nebîyana ev pirtûka jî dernediket, ew şiyarbûn, bîr û bawerîyên mezin jî dernediketin û mumkun e îro em têketena xizmeta dîroka fermî... Ji bo wê spasiya wan herdû aliyan dikim û bejna xwe li ber wan ditewînim.

Ji bo wê jî ev berhemeka cûda ye, di beşa xwe de şoreşeke û bi perspektîvekî nû hatiyê nivîsîn! Hêvîdarim rê li ber niqaşên nû û dîrokê ji nû ve nivisandinê veke!

Yên ku vê nikaribin tahemûl bikin û xalîçê bin lingan hatî kişandî jî bi awayekî nû êrîşan bikin... Bila bizanin ku roj bi heriyê nayê sîwax kirin û êdî Kurd xwedî rabûrdû û pêşêroja xwe ne...

Min gelek hewl da ku agahiyan hîn berbiçavtir bikim, lê di vê rewşê de ji destê min weqes hat. Bê guman kemasî hene, lê di vî warî de gava yekemîn û ji bo xebatên pêş bingeheke. Hêvîdarim ku xort û keç û dîrokzanên Kurd wê hîn pêşdatir û nûjêntir bikin. Yekê jî ev karê zanko, înstîtû û komên pisporanan e. Ji bo kesekî derfetên xwe bi sînor re karekî giran e.

Ji bo ku Kurd bê dewlet in, heta niha li ser dîroka wan lêkolînên zanistiyê hatine kirin kêm in. Miletên serdest jî vê yekê firsend dihesibînin û li ser kelepûra me ya dîrokî rûdinên û dibêjin ya me ye... Hatina wan a Kurdistanê hîn hezar sal nebiyê, lê xwedî li dîroka deh hezar sal û Sûmer, Hatî, Oxûz û Turkman derdikeve û dike malê xwe...

Her ku ev lêkolîn kûr bû û min parçêbûn û trajêdiya Kurdan dît, kêfa min herimî. Kurd di pevajoyekî dîrokî gelek bi zahmet û dirêj re derbas bûne. Her ku mirov dikeve nav, fêr dibe, yan giriyên mirov tê yan jî mirov bi hêrs dikeve: ku çawa heta roja îro ew wiha girtî û berovajo hatiye zanîn û nivîsîn. Birastî mirov gelek şaşmayî dimîne ku ew xelka mecbûr bûyê serokên xwe yên serhildan kirî teslîmî nijatperestên misilman bike û pê canê xwe rizgar bike!... Gelek caran bira li hember bira derxistine û rûhiyeta wî gelî xirav kirine...

Gelo mirov dikare fêhm bike ku parçeyekî êlê li Xorasana Îranê, parçeyekî li Lazqîyê û parçeyek jî li Navênda Anatolê? Çawa dibe ku perçeyek ji êlê xwedî ola Zerdeştî, yek Elewî-Sersor, yek Şîa û yek jî Sunnî ye? Ew ji tirajediyê jî zêdetir e; şîne şîn! Şîna Kurda ye. Navê pirtûkê bibûya Şîna Kurdan belkî hîn rastir jî bibûya.

Ji vê parçebûnê re hêza min têrê nekir. Min nikarî herim her cîh û parçeyekî. Gelek sedemên wê hene: Maddî, dem, tirs, berpirsiyartiya bav bûnê û hwd… Min karî tenê du caran herim Xorasanê. Careka din jî pêwîst bû lê min nikarî. Carekê çûm Gîlanê. Bi taybetî ji bo çûna minê Xorasan gelek kesan got: "Mere! Dewletê te bikuje!" lê min got bizanim, ku ewê min bavêne paşiya wesayitan û heta vir bi erdê re kaşkine, êvaran di nav maran de rakevime û dê min bikujine jî ezê herim. Di serê min de tenê va lêkolîna temam kirin hebû û min çend caran ji xanima xwe re got: Eger ez wê temam nekim bimirim, çavên min ê vekirî herin! Bi rastî jî ez di gorê de rihet ne radizam û çavên min ê li paş bimana. Li Bakûrê Kurdistanê gor îmkanan li herêmên Kolik, Meletî û Semsûrê hinek lêkolîn di cîh de kirin. Li beşekî mezin ên gundên Anatoliya Navîn geriyam û ji kalan sûd wergirtim. Bi zor û zahmetiyan pirtûk dame tercûme kirin.

Di dîroka Kurd û Kurdistane ya dirêj de tenê ew pêkelokêke û heta pirtûkên ji vê baştir, berfirehtir û kûrtir derkevin ew ya gaveka li pêş e. Pêştebûna wê di îdeayên nû de ye: Heta îro digotin ku nivîsa kevirên Elegeşê ya Tirkan e! Heta ji destên min hat min li ber çavan raxist ku ew qala Kurdan dike…Dibêjin: Oxuz kalên Tirkan in… Lê min hewl da ku îspat bikim ew Kurdên li dervayî Welat in…Ji bo Saka, Îskît, Peçenek, Alan û yên din heta roja îro ew bi miletên din re girêdidan… Lê ew kalên Kurdên îro li dervayî Welat in…Her wekî din digotin: Xorasan warê Tirkan e; cara yekemîn Tirkan Anatol servegirtin; Germîyan, Qereman, Beranî û Pezgewr Tirk in û hwd gelek îdea yên bi vî rengî hene. Ev pirtûka di dest we de dîrokên li ser derawan hatî nivîsandin dihejîne û hewl dide ku vê yekê îspat bike. Di nivîsandinê de bi serketim an na ez nizanim. Eger bi ser neketibe kêmasiya min e. Lewra li ber min zahmetiya ziman jî hebû.

Li dij her astengîyên derketin pêş min va pirtûka bi zimanê xwe kurdî nivîsand. Ev bi serê xwe serhildana hezar salan a li dijî dagirkeran e… Belê ew em kuştin, koçber kirin, xwestin asîmîle bikin, lê biser neketin; ev jî bersiveka hezar salan e û parçeyek ji berxwedana Kurdên Koçber e… Min xwest pirtûkxana Kurd pirtûkeka nû qezenc bike; xortên Kurd dîroka xwe bizanin û serê wan bilind bibe. Berî her tiştî Kurd bigihêjin zanyariyeka giştî û hevûdû baştir fêhm bikin; paşê jî min xwest bibim bersiva dagirkeran û penûsên dîrok berovejo kirine…

Miletê cîranê me Rûsan edeteka xwe heye: Keç û xortên xwe dema dizewicînin, çîrokên xwe yên klasîk diyarî dikin ku ew jî ji zarokên xwe re bixwînin. Ez jî vê pirtûkê ji Kurdên Koçber pêşniyaz dikim ku diyarî keç û xortên xwe bikin û ma ew jî ji zarokên xwe re bixwînin...

Her mijara di vê pirtûke de dikare bibe têza doktoran a zanîngehan. Hêvîdarim xwandavanên Kurd vî karî bikin. Piştî vê, Zanko û Înstîtûyên Kurd çend komîsyonan avabikin û herin Afganîstan, Hindistan, Xorasan, Gîlan, Qefqasya, rojavayê Kurdistan, Anatoliya Navîn, rojavayê başûrê Kurdistan û Lazqîyê û nîştecîhên Kurd di cîh de lêkolîn bikin. Di warê dîrok, ziman, kinc, ol û jiyana civakî de bikolin û rûnin dîsa vê pirtûkê binivîsînin.

Ev pirtûk ji du cîldan pêk tê. Di cîlda yekem de, piranî dîroka Kurdan ya giştî heye û di nava wê de jî dîroka Kurdên Koçber ên kevn heye. Yanî kaniya herdûyan jî digihîje hev û min xwest ew kaniyana destnîşan bikim. Di vê beşê ango cîlda duyem de jî: Di serdema Osmaniyan de rewşa Kurdan destpê dike. Komkujiyên Osmaniyan, Dewleta Safewî-Şîî, Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê, Gîlan, Celalî, Reşî, Şêxbizin, Canbeg, Mikaîlî, Sewêdî, Celikî, Zerikî û dîroka êlên din heye.

Di xwendina pirtûkê de li dawiya hevokan hejmara hatiye nivîsîn jêder û rûpela wê dide xûyakirin. Weke mînak (126- 40) dide nîşandayîn ku jêdera bi hejmara 126 an û rûpelê wê ya 40 an e.

Di amedekarîya vê pirtûkê de li Xorasanê gelek alîkariya Apê Hecî Barûyî bû; dîsa Mam Hesen Nozhatzade di alî tercûma farisî de alîkarîya min kir. Di alî redekte kirin û dîzayine de jî hevalê hêja birêz Xalidê Ezîz fedakariyên mezin kirin û spasiya herşêyan jî dikim.

Şoreş Reşî
Stockholm
15. Tebax. 2008

# DI DEMA OSMANIYAN DE KURD Û KURDISTAN

Heta vir gelek caran min nivîsî ku Kurdên li navenda Xorasanê ji ber Tirk, Moxol û Tîmûr gelek caran cîh guhartin û gelek ji komên Kurd hatin li Anadolê mirîtî avakiribûn. F. Sumer li ser damezirandina Osmaniyan wiha dibêje: Osman Beg û lawê wî Soxût-Bûrsa heyna, ji Enqerê hatibû Soxûtê û ew jî begekî Tirkmen bû.(131-182) Tirkmenbûna wî ji bo me girînge û wekî min nivîsî di Tirkmen de mebesta wî Kurdên li dervayê welat in. Yekê jî ew ji Enqerê çûne. Wê demê Enqere bi piranî di destê Kurdan de yê. Yanê piştî vekişîna Bîzans êdî Kurd xwediyê vî bajarî ne, di beşên derbasbûyî de min nivîsîbû. Hema hema ji sedî sed ez bawerim ku ew Kurd bû. Jixwe gelek dîroknûs jî li ser Tirkbûyîna wan, di şikê de ne. Bi berdewamî hema nûser dibêje: Ew ji ber Moxolan ji dora Merv/Mehanê hatin Enqerê û ji wir jî ji ber Moxolan çûn Soxûtê.(131-182) Bi ditina min ne ji ber Moxolan, ji ber Tirkan hatin Enqerê. Ji ber Moxolan jî çûn Bûrsa-Soxûtê û îhtîmaleka pir mezine ku ew ji koma Germiyanî ne.

Di gelek jêderan de tê gotin ku koka Osman Begê ku dewleta Osmanî avakiriye, ne diyar e. Dîrokzanê Osmanî bi piranî wî girêdayî Oxûzan û êla K/Qayî dikin. Oxûz jî bi piranî êlên Kurdên ku ji Xorasan, Derya Kesk, Mancik û Seyhanê hatine. Elî Kemal Meram jî diyaloga navbera Osman Beg û xanima wî ya bi navê Bala wiha radigihîne, Osman:

-Erê ez misilman im, lê tu dizanî ez ji kîjan miletî me?

-.........!

-Ez û êla min ji koka Persan tên!

-Pers? Ew kîjan milet in?

-Jê re Ecem jî tê gotin.

Mirov dikare vê wek Kurd bixwîne; lewra di lîteratûra Tirkan de heta dema dawî Kurd tunebûn. Lê Yûnanî bûyîna wî balkêşe. Gelo ew ji Kurdên xwe avêtibûn paş Bîzansiyan bû an jî ewên ku dînê xwe guhartine? Ew bê guman zêde lêkolînê dixwaze. Dîsa di heman pirtûkê de Osman Bey ji kurê xwe Orhan re wesiyet dike û dibêje:

-Bi Bîzans ve navbera xwe xera meke, ew bi hêz in. Çavê xwe ji ser Tirkan hilnede, navbera wan tim xera bike, ew dijminên me yên herî mezin in.(88-30) Orhan hat ser text şûnde hereketê xwe û zimanê xwe jî hat guhartin.(88-36) Ew jî niqteyeka gelek girînge ku ew çawa bû, ku wî zimanê xwe guhart? Tiştê bandor li ser wî kire yan jî zor da wî çibû, ku ew bi temamî hate guhartin?

Me gotibû, ku dema Kurd ji navenda Xorasanê hatin Anadolê gelek mîrîtî ava kirin; agahiyên li ser wan piraniyê di arşîvên Tirkan de ne û gor dilê xwe jî dîrok nivîsîne. Hinek ji wan xelekên balkêş radigînin: Dema li Anatoliyê mîrîtiyên cûr be cûr derketin holê, di nava wan de yek hebû ku bala ti kesî nedikişand û li ser wê ti agahiyên zêde jî tunin li destpêkê. Gor jêderên Bizansan Osman Bey girêdayî begê li Qastamonûyê bûye.(82) Ew jî ji Şadiyan

veqetîbûn û hatibûn dora Qastamanûyê. Heta me got îhtîmaleke mezine ku ew Kurdên Lêr-Şêxbizin bin jî. Navê wan ê din jî Şivankar e ku tê wata şivanê karan. Ne dûr e ku kesê dewleta Osmanî ava kirin Kurdekî ji koma Lek-Lor-Şêxbizina ye! Tê gotin ku Osman Beg girêdayî eşîreta Qayî ye. Lê êl bi navê wî tê xwendin; ne bi navê bavê Osman Ertugrul yan jî bavê wî Gunduz.(82) Di vir de jî xuya dike ku ew ne Tirke...Osman Beg di navbera Eskîşehîr, Bûrsa û Îznîkê de bû, li destpêkê ew bi Bizansan re nekete tekoşîneka dijwar û bi wan re bi rindî debar kir. Xwe bi hêz kir, paşê jî bi navê dîn û cîhadê derkete holê û bi vê riyê desteka Tirkmenan jî wergirt. Di sala 1302 an de hêzeka Bîzansan têk bir û bû serokê manewî yê dora xwe û yê Tirkmenan.(82) Diyare, ku wî piştgiriya misilmanan jî wergirtiye û mumkune ku ol bû sedem wî xwe guhart û netewa xwe veşart. Yanî, wekî Selheddîn Eyûbî ola misilmantî derxiste pêş netewa xwe.

Halaçoglû jî dibêje: Dewleta Osmanî di dema avabûnê de, êlên koçber, li cîhên ku nû dagirkiribûn bi cîh dikirin ku wan deran bike axa Tirkan.(156-3) Dema dewleta Osmanî ava bû, mîrîtiyên din jî li Anadolê ava bûbûn. Ji ber wê ew dîtin heta niqteyekê ne di cîh de ye. Lewra ew Osmaniyan dike navenda dîrokê; di ber hatina Anadolê gotinên bi vî rengî hebûn, rêvebirên Selçûqî soz dan Kurdan ku cîhên dagirkiribûn ewê ji wan re bimînin, lê soza xwe zû jibîr kirin. Osmanî bi hêz bûn bi şûnde yek û yek mîrîtiyên Kurdan ji holê rakirin. Hîn Osmaniyan xwe bi rêxistin nekiribûn ku êlên Kurdan tevahiya rojavayê Anadolê dagir kiribûn. Raste, ew êlana gor gelên niştecîh hîna şervan bûn, hîn bi disîplîn û di nava tevgereke de bûn ku ew taybetmendiyên wan ji bo cîhên nû pozîtîf bûn. Lê ne ku Osmaniyan dagir dikir û teslîmî wan dikir bû.

Berê wan salan Şahabeddîn el-Omerî (...?..-1348) di pirtûka xwe ya bi navê **"Masalîk el-Abşar"** de lîsteya beşekî ji Kurdan dide. Gor wî li Îraq, el-Diyar el-Arab, Sûriye û li Yemenê Kurd dijîn. Welatê çiyayî ku Kurd lê dijîne (el-cibal) ji Hemedan destpê dike heta Kîlîkya yê. Omerî, ji Cizîrê heta Hemedanê van êlan dijmêre:

**Geranî:** Li Qirşehîrê êl û gundekî Hecibayî bi navî heye.
**Gilalî:** Beşek jê çûn Sûriyê (bi dîtina min ew nav piştre veguhurî Celaliyan)
**Zangalî (Zengîne?):** Dibe ku Zengene bin
**Kûsa û Mabir:** Ji Şehrîzor koçî Sûriyê û Misir kirin. Dibê ku Kosa bin jî.
**Sabûlî (Sûtûnî?):** Li Şehrîzor û Ûşnû dijîn.
**Hasnanî (Xoşnavî?):** Karkar û Darbendî-Qerebolî dijîn.
**Karhîn (=Kirkûk?):** Daqûq ê dijîn. Êleka nêzîkî Hewlêrê.
**Mazancan û Humaydî:** Hewlêr.
**Sohrî (Soran):** Tell Haftûn.
**Zarzarî (kurên zerîn):** Cîranên Sohriyan bûn û li Melazgir (=Rubar-î Barazgird) û Rûstak (başûrê Şemzînan) rûdiniştin. Îhtîmaleke ku Zarzarî, Kurdên Zerikî bin.
**Colemêrg**

**Markawan**
**Navça Gever:** Nêzîkî Colemêrg
**Navça Zibarî:** Li kelêka Akr-Amadiye û nêzîkî Colemêrg
**Hekarî:** Amadiye
**Besîtkî:** Hekarî
**Bohtî:** Colemêrg û Mûsil
**Dasinî:** Çûn welatên bi heyî û 1000 li Mûsil, 500 ji li Akrê man.
**Dinbilî:** Li çiyayê bilind dijîn. Ew Kurd bi piranî niştecîh in. Ew nivîskar qala Kurdên koçber yan jî yên li rojava nake. Di piraniya jêderan de şopa wan nîne. Sedema vê jî cîh guhartina wan ya herdemî bû. Ji bo wê jî em vê kelkê dikarin tenê ji jêderên Tirkan sûd werbigirin; lê di jêderên wan de jî li ser avabûna Osmaniyan zelalî nîne. Yek jî mirov eşkere dibîne ku ew nivîskarana tiştekî ku ne yên wan bûne xwestine bikin malê xwe. Bi gotineka din; wan dîroka nîjadê xwe li ser nijada Kurd avakirine.

Cengîz Orhonlû dibêje: Di destpêka avabûna Osmaniyan de, êl, ji bo Tirkbûna welatên nû hatibûn dagirkirin rolêke sereke dilîstin û ji bo vê jî bi kar dihatin. Ji bo wê belgeya yekemîn di sala 1357 an de hatiye tanzîm kirin. Di dema Mûratê I an de, di sala 1385 an de hinek êl ji Sarûhanê derbasî Serez hatin kirin. Di dema Beyazîd de jî (1401), ji deşta Menemen hinek êl (Goçerewlîler) derbasî Rûmelî-Fîlîbe kirin.(90-102/3) Wê demê Osmanî xwe bi hêz dikin û bi taybet jî Beyazît, ku zavê Kurdan bû, gelek zirar da Kurdan. Ew Kurdên ku çûbûn Balkanan vegerîn an na, kes nizane. Bawer dikim ew li wir heliyan. Eger mirov li Tirkên Bûlxar û yên din binêre li rûyên wan şopa Kurdan heye, lê dibêjin em Tirk in. Kî dizane ew ne Kurd in?

Ji avabûna dewleta Osmanî bi şûnde, ew hêdî hêdî xwe bi rêxistin kirin û bi piştgiriya ol yan jî di bin ala cîhadê de êrîşî Bîzans, Sirb û mîrîtiyên Kurdên li rojavayê Anadolê kirin. Car carna jî ji bo ku êrîşê Kurdan bikin bi Makedonî, Sirb û yên din re hevkarî kirin. Carna jî bi riya zewacê û bi peran kirinê xaka Kurdan tevlî dewleta xwe kirin. Me ji bo wê agahî di beşên derbasbûyî de dan. Piştî tevgera Tîmûr jî êdî li hember Osmaniyan; hezên Kurd, Ecem û Ereb man. Kurdên ji Anadolê û ji ber zilma Osmaniyan reviyabûn jî dîsa vegeriyan Arran, Gîlan, Îran, Xorasan û cîhên din. Di avabûna Sefawiyan de jî rola Kurdan berbi çav e; berî vê, Kurdan bi rêxistinên mîna **Beranî û Pezgewran** jî hewl dan, lê mayinde nebûn. Emê li pêş qala wan jî bikin.

Di serdema Osmaniyan de, şerên di navbera Safewî û Osmaniyan de careka din hestiyê pişta Kurdan şikand. Lewra: şer li ser welatê wan bû û Kurd ji alî olî ve bûbûn dû beş, careka din li hember hev şer kirin û qira hev anîn. Kurdan, li hember misilmantî û êrîşên Osmaniyan xwe wek muxalefet li dora Şêx Îsmaîlê Safewî bi rêxistin kirin. Birêz M. Wekîlev di pirtûka xwe ya bi zimanê Rûsî nivîsî de îddea dike, ku ew navê Safewî ji êla Kurdên bi navê Sêvika hatiye. Mîrekî Dulqadiran yê bi vî navî jî hebû û yek ji wan komana bû ku di damezirandina Sefawiyan de cîh girtibû. Heta Şah Îsmaîl ji alî

pîreka Dulqadirî ve hatibû parastin û veşartin. Îsmaîl, hêza xwe li destpêkê li bakûrê Kurdistanê kom serhev kir. Piştre êrîşî Gurcîstanê kir û ew dewleta kire bin desthilatdariya xwe. Paşê li dijî Pezgewran şer kir (1500). Şah Îsmaîl paşê şîîti kirê ola fermî ya Îran û Kurdistanê. Piraniya Kurdên niştecîh sûnnî bûn, mîrîtiya Senendej û Kirmanşahê ji Kurdan stend. Wî baweriya xwe bi Tirkmenan-Kurdên koçber û bi Şia tanî û li dijî Kurdên sûnnî bê wijdan bû. Ji bo vê jî bû sedema rûxandina nêzîkî 50 mîrîtiyên Kurdistanê ku bûn dîlên Tirkan. Şah Îsmaîl di azanê de guhartin kir û şûna Muhammed **"eşhedû enne Eliyen Welîûllah"** da xwendinê. Ji alî din ve jî, li dijî Osmaniyan şerekî dijwar ê mezhebî dest pêkir. Ji bo vê jî, bi veşartî gelek kes şandin Anatoliyê û bakûrê Kurdistanê ku propaganda wî bikin û ji xwe re alîgiran peyda bike.(58) Di encama vê propagandayê de bû, ku gelek êlên li bakûrê Kurdistanê yên mîna Reşiyan û yên din, hêstên xwe yên olî dîsa bilind bûn. Ji bo vê jî li gelek deveran "cem" dikirin û ji bo Şah xêrê belav dikirine ku li ser wan gelek fermanên Osmaniyan hene. Seyidê Dêrsîmê, di navbera sedsala XIII û XVI an de mîna derwêşên Tirkmenên li Antoliya Navîn û rojava digeriyan û gelek ji wana jî ji Xorasan hatibûn.(60)

Şah Îsmaîl, bi alîkariya Kurd û Elewiyên li Anadolê: di sala 1500 an de Ezerbeycan; di sala 1507 an de jî Amed heyna.(58) Bi taybetî jî yek şand Anatolê ku navê xwe Nûr Elî Baba bû û ew li nav mîrîtiya **Çemîşgezeka** Şêx Hesen de bi cîh bû. Çemîşgezekê, di dîroka Kurdan de hertim cîhekî girîng girtiye û ji mîrîtiyên mezin yek bûye. Vê demê sencax-mîrîtiyên bi navê Mîremîran yên Kurdan yê mezin; Cizîr, Betlîs, Soran, Heskîf, Îmadiye û yek jî Çemişgezek e. Herêma Dêrsîm hetanî Tercanê di destê Begliga Şêx Hesen de bû. Şerefxan dibêje: Dema Kurdistan dihate gotin, mîrîtiya Çemişgezek dihat bîra gel. Ji ber sedema hêzkirina ji ola Şah, deriyê mîrîtiyê hemû ji Nûr Elî re vekirin. Lê dema begê Çemişgezekê çû cem Şah ew girtin û şandin başûrê Kurdistanê. Paşê gel serhildan kir û H. Ristem xwestin. Ristem hate bakûr û keleha Kemahê li hember Yawûz parast; Yawûz ji malbata wî 40 kes kuştin. Şûna wî kurê xwe Huseyn derbas bû û êl gîhandin hevdû û li dijî Sefawiyan şer kir. Mîrîtiya Pîr Huseyn paşê bi eyelata Amedê re hate giredan.

Berî ku şerê di navbera Osmaniyan û Sefawiyan yê li Çaldiranê di sala 1514 an de pêk hatî; Selîm, Kurdên Elewî yên ku tespît kiribûn di şûr re derbas kirin. Tê gotin ku di wan komkujiyan de 40 hezar Kurdên sersor hatibûn kuştin. **Bajarên mîna Mêrdîn, Riha, Heskîf, Rakka ji destê Îraniyan hatin girtin û Kurdên Şîa yên alîgirên Îranê dihatin kuştin.**(59) Evên ku ji ber reviyabûn jî li çiya belav bûn. Ji wana êla Dêrsîm Hiran û Îzol ji Pertekê çûn Melazgirê. Êla Sadic (Şadî) jî li Mazgirt, Palû, Kixiyê bi cîh bû; êla Koçgirî li Zara; Kumsoran li Kizilkilîse (Nazimiyê), beşek jî bi êla Homecik ve li deşta Tercan û hinek jî li Sêwas, Dîvrîxiyê bi cîh bûn. Êla Balaban jî li Pulumur û Çemê Balaban bi cîh bûn.(59) Osmaniyan di şerê Sefawiyan de, ji bo ku Kurdan bikişînin aliyê xwe **Timar** dan wana. Bi wî şiklî Kurdan baca ku ji gel kom dikirin beşek jê ji xwe

re hiltanîn. Ji heft timarên Kurdan dido jê girêdayî êla Berazî û Asiyan bûn.[58]

Bi hatina Nûr Elî Baba re Osmaniyan ew şopandin û ji şerê Çaldiranê şunde, îhtîmalek mezine ku sala 1515 an be, lewra heta sala 1514 an ew mîrîtî serbixwe û azad e. Di nava herdu aliyan de şer derket û Nûr Elî di şer de mir. Di vê navberê de Hecî Ristem jî mir û Pîr Huseyn bi davetekê hat li ser texte Çemişkegekê rûnişt. Bi mirina Hecî Ristem re Keleha Kemahê derbasî Osmaniyan bû û garnîzonek li wir ava kirin. Begê (Alaeddevle) Dulqadiran ku nikaribû li Xarpûtê bimîne vekişiya Elbîstanê. Alaeddevle xezîna xwe û malbata xwe şand serê çiya û bi xwe jî bi Osmaniyan re kete şer. Çar kur û birayên wî dîl ketin destê Osmaniyan. Serê wan jê kirin û ji siltanê Memlûkan re şandin. Bi vî awayî Yawûz dixwest beg û mîrîtiyên Kurd, bi taybetî jî yên bi Şah re di îttîfaqê de û yên ku di mezhebê Şîa de ne ji holê rake. Li alî Ezingan û Sêwasê jî Xalit Begê Kurd hebû û gotina wî li herêmê derbas dibû, ew jî wekî yên din ji holê rakir. Wê demê hevkariya êlên niha li Anadolê û Kurdên Dimilî û Elewî heye. Sedemên vê gelek in: Di serî de sedemen olî-mezhebî, netewî û azadî xwestin û xwedîbûna heman pêvajoya dîrokî hebûn. Ji ber ku Keleha Kemahê di destê Reşiyan de bû û mîrîtiya Çemişkegekê jî di destê piraniya Kurdên dimilî de bû. Bi serokê Dêrsîmiyan re **Kalmam-î Sir** dihate gotin; îhtîmalek ku ev serokê olî be. **Mîrîtiya Şêx Hesen** ku ji Yawûz derbe xwar bi şunde **ji Meletiyê** (Kalmam- Sir ê) **dev berda û li herêma Lertika Ovacikê bi cîh bû û bû du beş.** Êlên di wan beşan de jî wiha xuya dikin:

| **<u>Seyid</u>** | **<u>Şêx Hesen</u>** |
|---|---|
| Herêma Ovacik-Ezingan | Herêma Hozat-Çemişkegek |
| 1. Koç (Beran) | 1. Qerebalî |
| 2. Kalo | 2. Ebbasan (Seyît Riza ji vê ye) |
| 3. Reşo (Reşî) | 3. Kirganlar |
| ----- | 4. Feratanlar (Kurmanc) |

Li Xorasanê jî êleka bi navê Seyidan heye û beşek ji wan hîna jî koçber in û li dora çiyayên Hezarmecîd de dijîn û Kurmanc in. Mirovên kej û çav şîn in.

Bûyina Beraniyan balkêşe, ku bi tirkî dibêjin Qerekoyûnî. Reşî jî li her cîhî hene. Dema mirov li vê tabloyê dinêre vekirî xuyadike; ku yên di bin sîwana Beraniyan de kom bûne Kurdên Sersor in.

Erdal Gezik jî dibêje: Konfederasyona Şêx Hesen dibe du beş:

| **<u>Seydanî</u>** | **<u>Şêx Hesenî</u>** |
|---|---|
| Gewû | Qerebalû |
| Dem-Asur | Ebbasû |
| Qozû (Koçan) | Kirganû |
| a. Qozû | Ferhadan |
| b. Şemkû | Zenganû |
| c. Nenkû | Laçinû |
| d. Reşkû Findanû.[60] | |



**Seyîdiyên koçber yên li Xorasanê**

Ji vê tabloyê jî tiştê ku em derdexin ev e; ku êla Zenganû ya ku navê xwe derbas dibe îhtîmaleka pir mezine ku kalên Şêxbizinên li Haymanê û cîhên din bin. Laçînû jî balkêşe; lewra li Xorasanê Laînî hene û dibe ku kalên wan bin. **Êlên Dêrsîm jî gelek in, hinek ji wan ev in: Bilikan, Bûtkan, Canbegan, Rûtan, Şadan, Şakaka, Şêx Bazan...... evên li dervayê Dêrsîmê jî Atma û Balyan in.**[60] Di dema Yawûz de, êlên mîna Çarikli, Lolan, Şadî, Arslan Ûşaxi û Balaban li Dêrsîmê bi cîh bûn.[116-127]

Ew êlên hatin hejmartin hema hema bi temamî îro li Anatoliya Navîn û Xorasanê dijîn. Em dikarin bi hêsanî bibêjin; ku beşek ji wan êlana di dema Yawûz de li Dêrsîmê bûne. Lewra hinek ji wan xwedî gelek serhejmar in û dibe ku li herêmên din ên çiyayî jî hebin. Yeşîlgoz dibêje: Di demê berê de hatibûn vira. Zivistanan diçûn Xarpût, Meletî, Arapgîr û bi taybetî jî herêma Qereyazi, Nazarûşaxi. Mîrîtiya wan du beş bûn: Dêrsîma Rojava û ya Rojhilat. Şêx Hesen keça xwe (Kincê Sor) dide Dêrsîmiyên rojhilat û vê herêmê ji zavê xwe re dihêle. Mirov dikare bêje îttîfaq û ev xisimatiyê jî bi hêz kirine. Di sala 1541 an de Kanûnî Silêman ji bo Çemişkegek kanûneka taybetî derxist û navê vê jî **"Çemişkegek Sencaxi Kanûn-namesî"** bû ku ji 300 pezî miyek yan jî 30 akçe bac dihate stendin.[39] Li Xorasanê konfederasyona Çemîşgezekê heye;


hîna jî bi wî navî tê xwendin. Êl û fedarsyonên di nava wan de, bi tabloya jor ve hema hema yek e. Xuyaye ku ew jihev veneqetîne û bihev re jî çûne Xorasanê. Di beşa Xorasanê de emê qala wan bikin. Ji vê şunde beşekî Koçanî li Sariza girêdayî Qeyserî, beşek jî Qoçgiriya Sêwasê bi cîh bûn û beşek jî li Hozat û Çemîşgezekê nîv koçber man.[39] Ew navê Koçan ji Beraniyan tê; ew jî dide îspatkirin, ku ew Kurdana hîna jî di baweriya Elewî-Sersoriyê de ne ku Qerekoyûniyan pê bawer dikir.

Me gotibû ku wê demê li Kurdistanê gelek mîrîtiyên Kurdan hebûn; lê ew di navbera çakûç û kelpetanê de bê çare mabûn. Eger wê demê yekîtiyek xurt a serbixwe avabikirina, îro rewşeka din li holê dibû lê mixabin! Yekîtiya pêk hatî jî, li ser berjewendiyên Osmaniyan bû, ku Îdrisî Bedlîsî vê yekê bi alîkariya Yawûz pêk tîne. Bedlîsî, 25 begên (Hikumet) Kurd bi xwe re girêdan û girêdayî Amedê jî 10 Hikumet hebûn, vana: ... Heskîf, Mehmûdî ye ( Li rojhilatê Wanê bû ji 120 êlan pêk dihat).[59] ..... **Merdas, Sûweydî,** ......bûn.[39]

Wek tê zanîn, êlên di nava Hikumetên li jorê me nivîsî niha li Anatoliya Navîn û cîhên din belav bûne. Hîna jî Mirdêsî û Sewêdî li navenda Anadolê ne. Federasyona mîna Reşiyan jî dem bi dem di nava Heskîf û Mehmûdiyan de mane. Dema Osmaniyan êrîşî Îran kirin, roj hate girtin û ew yeka di nava Osmaniyan de bû sedema kêfxweşiyê. Sedema vê jî ev bû, ku digotin: **Kurdên di baweriya Zerdeştî de ne, dê vê yekê morala wan xirav bike**.[39] Ew bûyera jî dide xuyakirin, ku êlên li dervayê Welat (Sersor) heta vê demê li ser ola xwe ya kevn in. Ew yeka ji fermanên piştî vê demê jî tê îspatkirin. Di vî şerî de bi alikariya Kurdan, Osmaniyan Şah têk birin.

Şerê Osmanî û Sefawiyan yê di sala 1514 an de li Çaldiranê pêk hatî şûnde, mîr û begên Kurdan xwestin xwe bi Osmaniyan re girêbidin. Şah Îsmaîl jî li hember vê tedbîr stendin. Birayê Ûstaclû, Xanê ku di şerê Çaldiranê de mir Qere Xan şand cem desthilatdarê Riha Dûrmiş Beg û wana tevûhev Amed dîsa dorpêç kirin, ku ji destê Osmaniyan derxin. Di heman demê de ji hêzên Sefawiyên li Merdîn, Heskîf û Erxaniyê re jî ferman şand ku piştgiriya Qere Xan bikin û tevhev 5000 hezar leşkeran salekê Amed dorpêç kirin, lê encamek bi dest nexistin. Bi hatina Biyikli Mehmet Paşa yê Amedê re Safewî reviyan Merdînê.[61] Dema Osmaniyan bi Sefawiyan ve li Mêrdînê şer kirin, artêşa Osmanî ji alî Biyikli Mehmed Paşa (ew jî Kurd e) û Îdrisî Bedlîsî ve dihate birêvebirin û li milê çepê artêşê jî, desthilatdarê Çemişgezek Pîr Huseyn Bey, desthilatdarê Arapgir û gelek begên Dulqadiriyan hebûn. Aliyê Sefawiyan jî alî Qere Xan (tê gotin ku ew jî Kurd e) ve dihate birêvebirin, lê Qere Xan têk çû. Bi vî awayî Kurd bi destên Kurdan dihatin kuştin û gelên din jî Împaratoriya xwe li ser xwîna wan avadikirin.

Berî şerê Çaldiranê mîrên Kurdan tevgera Sefawiyan tim rapor dikirin û ji Osmaniyan re dişandin. Ji wan raporana di yekê de Xanê Bedlîsê Şerefxan ji Biyikli Mehmet re name dişine û li ser Şah van agahiyan dide: Di yeka ji sala 1513-14 an de wiha dibêje: Şah li Meraga ye. Birayê Ûstaclû Şah Mule li



Nameya Îdrîsê Bedlîsî(138-504)

Xorasan û Amedê Ûstaclû Memet Beg ji Esterabadê bi 5000 esker hate cem Şah û niha jî sîleh û malzeme kom dike.[150-28]


Piştî gelek amadekariyan, di şer de Safewî têk çûn. Rola sereke jî waliyê Amedê yê bi navê **Ûstaclû Muhammed Xanê Safewî** dilîst, lê ew di şer de mir.[138-492] Li ser nijada wî N. Sevgen dibêje: Emîr Şeref ji alî Şah ve hate girtin bi şûnde, Bedlîs teslîmî **Ûstaclû Şereflî Kurt Beg** kirin.[150-210] Ûstaclû jî Kurd e; vê yekê em di nameyên Biyikli Paşa û Yawûz de derdixin ku giredaneka balkêş jî derdikeve holê!

Piştî şerê Sefawiyan û Osmaniyan (1516) Biyikli Mehmet Paşa ji Yawûz re mektubeka wiha dişîne:

*"Saadetlî hudavendîgarim... Ji Amedê em bi begên Kurdan ve wek yek dil û yek laş û yek reng em çûn ser Mêrdînê û Sersoran. Serokên Sersoran ku (Ûstaclû)-QEREHAN-I LA'ÎN dijminê îslamê ye...Artêşa me di mile çepê de ji Husrev Paşa û milê çepê jî begê Kemah Qereçîn-oglû û navdarên ekrad bûn... Li hember topên me Qerehanê Laîn bi desthilatdarê Esfehan Çûka Siltan, begên Kaşan, Siltaniyê, Çûkûr'şa'd û Kazwîn vê êrîşê kir û heta piştî nîvro şer berdewam kir. Paşê serê Qerehanî Laîn jêkirin û yen din jî revîn...Jina* ***Şah-i La'în*** *û xismên wî jî me dîl girtin...*[138-502] Di vir de niqta herî girîng em dizanin, ku Ûstaclû ji Kurdên Laînî ne...Laîn navê herêmêka li Xorasan e; li wir bi heman navî êleka mezin jî dijî ku ji wê re Laînî tê gotin û wek Reşiya, Celikî û Têrikiya ne. Gelek henekan dikin û mirovên xweşik in. Rengê sor hîna jî li cem wan wek kevneşopiyeke tê hêzkirin. Îttifaqa Qerehanan ku tê hejmartin jî hemû begên Kurdan e.

Îdrisê Bedlîsî jî ji Yawûz re vê mektûbê dişîne:

"Min agahiyên şer gîhandin her qûncikekî Ezerbeycan û Îraqê...ihtîlaf jî hebûn lê min çareserkirin...Ez bi xwe di nava Kurdan de bûm, ji berkû ew hertim di nava gumanan de ne...Di milê min ê raste de emîrên Kurdên mîna: Siltan Xelîlê Eyûbî, Mehmet Begê Sasonê, Qasim Begê Egilê, **Mehmet Begê Zirkî**...li çepê min Şeref Begê Bedlîsî, Dawid Begê Hîzanê, Ahmet Begê Atakê... Di şer de milê çepê li hember êrîşa Sersoran kete tengasiyê û têk çû. Lê ji Xwedê Qerehan mir û kurên emîrê Bîrecîkê Welî Xan: Hekimê Heratê Sarû û çendiken din jî çûn dojehê...Bi ser vê de bihevre berbi Beriyê reviyan... Kurdên di milê me yê çepê de, bi lehengiyeke mezin şerkirin ku mirov nikare bîne ziman û eger ew nebiyana em têk diçûn...Di vî şerî de jiber îhmal û kusûra eskerên Dulqadir artêşa misilmanan gelek wendayî dan...Min êlên Kurdên ku li rêya Şah Îsmaîl û Sersorên kafir in re lihevkir ku ew rê nedin Sersoran...Di nava artêşa me de yekîtî û hevkarî nîne, lê di nava Sersoran de îttifaq û baweriya bi serokê xwe yê manevî gelek bi hêz e..."[138-507] Ji vê namê jî em dizanin ku eger Kurd nebiyana Osmaniyan di şer de têk diçûn. Dudiliya Dulqadiriyan jî balkêşe, mumkune ku bi zorê tevlî şer bûn û dilê wan jî bi Sersoran bû. Niqta din ê girîng jî ewe, ku hêzên Sersoran gelek bi îttifaq û bawerî bûne.



**Kurdê Laîn**

Piştî şerê Çaldiranê Yawûz zilma xwe zêde kir, dest bi nêçîra Kurdan kir û ew jî wek her carê çûn nava çiyayên xwe. Piştî zilma Selîm ya li ser Kurdan, Qanûnî li cîhê wî rûnişt û wî jî gelek tiştên nû ji bo Kurdan anîn. Wek parçekirina êlan, bac stendin, esker girtin û koçer bi cîh kirin di vê demê de destpê dike. Di weşanên "Zaman" de tê gotin: ku di vê demê de Osmanî li rojava zîndî bûn û li rojhilat jî li hember Şiî yan wek parêzvanên sunnîtiyê derketin holê. Di 1527 an de seferên rojhilat di şertên zehmet de derbas dibûn, lê dîsa jî, ji bo ewlekariya rojhilatê Anadolê û tewgerê ji bo Anatoliya Navîn li hember xetera Sefawiyan disekinîn. **Dema Qanûnî êlên mezin hatin parçekirin, cîhê zivistan û zozanan hat diyar kirin**, li defteran hatin qeydkirin û ji wan bac hate stendin ku ev yek gelek nerihetî da êlan.[82] Ji bo ku bacê bistinîn, gelek defterên nifûsê (tahrîr) wê demê amade kirin. Bi alîkariya wan defteran, li ser êlên Kurd îro em xwedî zêde agahî ne.

Qanûnî carna li hember Kurdan bi wijdan tevdigere, lê ew siyaseta dihate meşandin ku Kurd tevlî Sefawiyan nebin. Di bingeh de, li hember Kurdan ti

cûdatî di navbera rêvebiriya Osmaniyan de tunebû. Ew yeka ji alî fermanê hatî dayîn ve eşkere xuya dike: di sala 1551 an de, Qanûnî ji begebeganê Amedê re fermaneke dişine û di wê fermanê de wiha dibêje: **"Tu ji min re nameyan dişinî û agahiyan didî; ku ji yekî êla Begdilî re xelîfetiya êlê hatiye dayîn. Ew mektûba bi mohr ji alî begê Helebê ve ji min re hatiye şandin de: serokê êlên mîna Kiliç, Mehmet û Elî ji min re şandin. Wan kesana nêzîkî Amedê dibin û talanê dikin. Ewên ku di qirêjiya Sersoritiyê de geriyayî pêwîste tu navêjî zîndanê û ji holê rakî! Heman fermanê ji Erzirûmê re, ji emîrê Zirkî û Şîrvanê re jî birêbikî da baldar bin"**.(150-45) Di vê fermanê de jî xuyaye ku li hember Sersorî tu tolerans li cem Osmaniyan tune.

Gor deftera Osmaniyan muhaseba bajarê Qonya û Qeremanê di sala 1530 an de hatî nivîsîn me gelek navên êlên Kurd tespît kirin: Bereketlû-Eskîl û Canbeylî, Dulqadir-Tûrgût, Germiyan-Tûrgût, Canbeylî, Kose-Baybûrt, Şadî, Okçû-Kenarî Irmak.(111-62) Ji vê ew encama dertê ku Berkatiyê li Eskîl û Cihanbeyliyê; Şadî bi Oxçûyan ve jî li dora çemê Kizilirmak bûne. Lê Dulqadir û Germiyan jî kîjan in mirov tam tespît nake; dibe ku Canbeg û Têrikî bin.

## Di sala 1540 an de êlên Kurd ên li Besnî

Heta sala 1540 an êlên li wir hemû girêdayî Kurd/ekrad Îzzeddîn Beg in. Di sala 1563 an de piraniya wan bi êlên li Mereşê re hatine girêdan.

**1. Êla Bezikî:** Girêdayî Kurd Îzzeddîn Beg e. (Paşê ewê bibin Oxçû). Ji êlên Îranê tên hesibandin. Di jêderên de wek êl derbas dibin, bi dîtina min ew ji êlan pirtir wek federasyona êlan xuya dikin. Berên xwe:

| Êl | 1519 | 1524 | 1536 |
|---|---|---|---|
| a. Gozî | 21-6 | 22-1 | 38-1 |
| b. Hewêdî | 40-14 | 45-8 | ------ |
| c. Sewêdî | 49-21 | 50 - | 124-11 |
| ç. Çakallû | 89-18 | 97-9 | 98 |
| d. Silêman (girêdayî Omerî) | 22-4 | 17-1 | 33-3 |
| e. Zeyneddîn (g. Çakallû yê Dul) | ------- | ------ | 19-5 |

Ji wana Hewêdiya beşekî xwe li Xorasanê ye, gotin beşek jî li Hindîstanê û piraniya wan Êzdî ne. Yên Xorasanê niha bûne Şia. Sewêdiyan jî beşekî xwe li Qonya û Aksarayê ne. Bi vî awayî em dizanin ku êla Sewêdî û yên din ên wê demê girêdayî Oxçiyane. Ew girêdana dikare tenê cografîk û li ser kaxizê jî bibe. Yanê, nayê wê watê ku ew ji komekê têne. Navê Oxçî jî Tirkan piştre lê danîne. Navê xwe yê derdora salên 1500 an Kurdên Îzzeddîn Beg in; yan jî Îzzeddînî ne. Çakallû jî li Xorasanê û li Mereşê hene. Lê pêwîste mirov ew hemûyan di cîh de bibîne, ku bi rastî jî yek federasyon in an piştre tevlî hev bûne. Di cîh de

mirov dikare taybetmendiya wan bibîne û bîne berhev û bigihêje encamekê. Gor defterên Osmaniyan, di bin navê Hewêdiyan de jî Oxçî têne nîşan dan, ew jî diyar dike, ku ew piştre gihîştine hev yan jî tenê li ser kaxiz e.

| Êl | 1519 | 1524 | 1536 |
|---|---|---|---|
| **2.Ekrad-i Hewêdî:** | | | |
| a. Abdullah Kethûda | ---- | ---- | 15— |
| b. Qere Huseyn | ---- | ---- | 14-1 |
| c. Mehmet Kethûda | ---- | ---- | 27-2 |
| ç. Okçû Îzzeddîn | ---- | ---- | 16-1 |
| d. Omerî (girêdayî Bezikî ye) | ---- | ---- | 72-5 |

Yên jêrê bi Dulqadiriyan ve girêdayî ne:

**3. Çaxirganlû:** (Kirlar, Silêmanî,Yayci) --- ---- 81-15

**4. Eymûrlû:** (Dexşîr, Qaraca Arablû, Bexdatlû, Cacalû, Încîlî, Mekelû)(288-84)

**5. Cerîd:** (Bayir Cedîd, Soylemezlû, Sari Silêman, Kûş Qerelû, Tevekkulû).(167-82) Li Gîlanê hîn bi navê Tevekulû gund hene.

**6. Axce Koyûnlû:** ( Îbrahîm Kethûda, Yaxcilar) ---- 14-57

**7. Araban:** (Qere Yaxmûrlû) --- --- 13-1

**8. Çemeklû** --- --- 3 ---

**9. Gundeşlû** (Dedeşlû-Çakali, Salman, Exîlanlû)--- 300-59

**10. Tacîrlû:** (Zikir, Oxçûlû, Tacîrlî) ---- ---- 97-79

**11. Kuşne** (Delî Mehmet, Beşîlû, Qere Mûsali, Aldoş --- 200-89

Di deftereka din ê nifûsê dê girêdayî yorikên Qersî- Mereş, **koma Qeremanî** heye. Ew jî li dora Besniyê zivistan derbas dikirin û berên xwe ev in:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1. Qere Hemzelî | --- | --- | 8-8 |
| 2. Tûr Hecîlû | --- | --- | 3-4 |
| 3. Azalû | --- | --- | 3-5 |
| 4. Veladani Kopellû | --- | --- | 12-12 |
| 5. Kizil Yûsûflû | --- | --- | 8-3 |

Ji bo ku Kurdan biçûk nîşan bidin û heqeratan bi wan bikin, carna navê Kupelî (bi guhar) wek kopek (sê) û kopuk (kef) dinivîsînin. Kupelî jî navekî tirkî ye û di wata kesên bi guhar de ye. Lê em dizanin ku ew Qeremanî ne. Ya ji bo me girîng ew e. Aliyê din ê girîng jî, hinek ji vê komê li Semsûrê mane. Yanê ew ji Qeremanan reviyane, berê hatine Kurdistanê (Semsûr) piştre jî bi piranî çûne Xorasanê. Ji bo vê gelek îspat hene. Lê komên ji êlên Kurd bi giştî li Besniyê di sala 1519 an de 4864; sala 1524 an 8110; sala 1536 an 9461 û sala 1563 an jî 17.749 kes xuya dikine.(109-112) Ew baqiyê Qeremaniyan e.

## Êlên li Semsûrê:

**1. Reşî:** Wek "Ekradê Tirkmen" tên bi nav kirin û ji Helebê heta Qastamonû terin. Ew jî îspateke din e, ku Tirkmenên tên qal kirin Kurd in û di vê de ti şik û guman nîne.

| | | | |
|---|---|---|---|
| a. | Rûmiyan: | 32-3 | 22 - |
| b. | Mansûr | 26-13 | 39 - |
| c. | Îzdeganû | ------ | 18 – |

Her sê êl jî niha li Xorasanê hene. Îzdeganû min ziyaret kirin û dema min ew dît zanibûm ku ew Reşî ne. Dema min guhdariya wan kir û li wan temaşe kir, bawer bikin ku xwîna min dixwest ji damarên min derkeve. Ji alî fizîk, ziman, ehlaq û kevneşopiyan ve wek sêveka bi dû aliyan bikî bûn... Rûmiyan di demên kevn de ji Anadolê çibûn Îranê û dewleta Safewî damezirandin. Ew agahî jî îddea mamosteyê hêja Wekîlev piştrast dike.

**2. Dulqadir:** Li Mereş û Elbîstanê diçin zozan û zivistanê derbas dikin.

| | 1530 | 1540 |
|---|---|---|
| a. Tomak Hecîlû | 31-3 | ------ |
| b. Kuşne | 76-2 | |
| c. Pîr Omer | 14-2 | |
| ç. Emûrlû | 3 – | |
| d. Beydîlî (zozanê Sêwasê) | 95 – (1540-63 an nayê dîtin). | |
| e. Qecer | 12 – | |
| ê. Zerk | 7-1 | |


f. Tukuz (Qere Kosecelî) : ji Dulqadiran e û sê xane ne.

Li vir jî baş xuya dike, ku Zerikî tevlî Dulqadiran in. Emûrlû jî li Gîlanê-Reştê ne ku ew xwe wek Reşî dibînin û navê xwe jî wek Amarlû/Emerlû tên zanîn. Beydîlî jî li Xorasanê hene, gundên xwe li dora bajarê Bojnûrdê ne. Xuyadike ku ew êlêna piştî 1519 an edî nema ne. Ew jî bi avabûna dewleta Safewî ve û bi êrîşên Osmaniyan re girêdayî ye.

| | 1530 | 1563 | |
|---|---|---|---|
| **3. Kizillû:** Dulqadirî ne | | | |
| a. Elî Beyî | ------ | 2 | 6 |
| b. Îmkan | ------ | 9 | ------ |
| **4. Bezikî (1530):** | | | |
| a. Koprullû | ------ | 9 | ------ |
| b. Qere Orûçan | ------ | 7 | ------ |
| c. Tûrgay Adîllî | ------ | 24 | ------ |
| **5. Tacîrlî:** | | | |
| a. Gannar | ------ | 9-6 | ------ |
| b. Firûzlû | ------ | 19-6 | ------ |

| | | 1540 | |
|---|---|---|---|
| **6. Ekradî Kawî:** Yoruk in. | | | |
| a. Boylan | ------ | 126-19 | ------ |

| | | | |
|---|---|---|---|
| b. Belîvan | ------ | 126-19 | ------ |
| c. Xelikan | ------ | 57-19 | ------ |
| ç. Boylan Dîger | ------ | 104-16 | ------ |
| d. Zengilan û Salmayanî | ------ | 78-27 | ------ |



**Emar-lû yê li Gîlanê**

Wek tê zanîn Kawî niha li Kolikê dijîn. Şair Huseyîn Yetkîn ji vê êlê yê û gelek şerme ku mirov wan wek Yoruk nîşan bide. Ev ji mirovahiyê, dîrokê û ahlaqê re heqaret e. Xelikan jî beşekî li Qonya ye beşek jî li Xorasanê ne, lê dibe ku bi Kawiyan ve ji bavekî veqetî bin. Zengilanî li Xorasanê hene û di nava şaxa Keyvanlûyan de xuya dikin. Mumkune ku ew nava wek Kawî hatibe guhartin jî.

**7. Dongeleli**

| | | | |
|---|---|---|---|
| a. Avsanî | ------ | ------ | 20-25 |

Bi giştî di sala 1519 an de 6077 kes, di sala 1524 an de 5790 kes, di 1536 an de kes xûya nake, 1540 an de 20384 û di sala 1563 an de 23150 kes in.(109-115)

## Êlên li Gergerê-Kolikê:

**1. Reşî:** Di 1519-1536 an de 10 cemaat girêdayî Reşiyan in:

| | 1519 | 1524 | 1536 |
|---|---|---|---|
| a. Hecî Omer- Qeytan: | 66-22 | 100 | 103-61 |
| b. Xizir Sevran | 21-8 | 26 | 72-12 |
| c. Kellelî | 95-47 | 134 | ------ |
| ç. Çelîkan | 43-13 | 74 | 226-5 |
| d. Mûlûkan | 83-24 | 117 | 89-16 |
| e. Mendûbalî | 28-11 | 35 | 50-16 |
| ê. Zerûkan | 67-16 | 84 | 189-31 |
| f. Boxraci (Boxrasa) | 49-2 | 68 | 115-16 |
| g. Mansûrxan | ------ | ------ | 115-27 |
| h. Karlû | ------ | ------ | 113-21 |



**Reşiya li Kolikê**

Di van salana de xuyadike ku deh êlên girêdayî federasyona Reşiya ne. Lê hinek ji wan navana em nizanin kîjan êl in. Wek mînak: Kellelû, Mendûbalî, Boxraci, Karlû û Mansûran ji bo ku navên kurdî guhartine, em nizanin kîjan êl in. Hecî Omeran îro em li navenda Anadolê wek Omerî bi nav dikin.



**Omeriyên li Qonyayê**

Navê xwe yê din jî **Qeytanî** bûne, ku li Xorasanê nêzîkî (Keyvanlû) wî navî êl hene ku bi van êlana girêdayîne: Mistikan, Vêran, Milan, Dêrûsan, Bêrîvan, Zengilan (li bakûrê Kurdistanê wek Kawî xuya dikin), Lal, Cafkan, Xelan, Zîrekan. Sevran îhtîmaleke mezine ku Sêvikan bin. Celikan, Molikan, Zerikan hemû li Anatoliya Navîn û Xorasanê hene.

**2. Bezikî:** Di 1519 an de tê xuyakirin, pir mezine 13 berê xwe hene.

| | | | |
|---|---|---|---|
| a. Salarî | 99-29 | 155-1 | 156-1 |
| b. Nakibanî | --- | --- | 51-25 |

Êlên girêdayî: Hecî Xelîlî, Rûmiyan, Sînanî, Demranî, Cedûkan **(di 1536 an de di qeydan de nîne)**, Hesen Bellî ne. Cûtikan li Navenda Anadolê xwedî çend gundan in.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **3. Boylanî:** | 36-14 | 54 | 245-51 |
| **4. Bolasanî:** | 55-1 | 74 | 87-18 |
| **5. Reşî:** | 27-11 | 49 | 45 |
| **6. Kawî (Zengilan):** | 43-5 | 55 | (47-3) |
| **7. Leyvanî:** | 7-1 | 8 | ---- |
| **8. Gozî:** | 26-11 | 35 | 72-9 |
| **9. Çopî (çobû):** | 12-4 | 15 | --- |
| **10. Halidî:** | 15-3 | 15-3 | 14-2 |
| **11. Millî:** | --- | 5 | --- |
| **12. Azebanî:** | --- | --- | 14-2 |

**13. Kuşne-Tûxî:** Di sala 1532 an de, li Gergerê ew 20 xane û 3 bêkar bûn. Wekî li vir jî tê dîtin tevlîheviyeka mezin heye. Reşî li ser du navên cûda hatine qeyd kirin û yek di nava yekî de ye.

Di sala 1752 an de li Atlantiyê Atçeken bi cîh bûn.(109-118) Atçeken navê ku Tirkan li Canbegan daniye. Wekî berê jî me gotibû, ew qeydana di dema Qanûnî de ji bo ku bacê û eskeran ji Kurdan bistînin hatine kirin. Wekî di tabloya jêr de jî tê xuyakirin gelek esker jî ji nava Kurdan digirtine. Avyarov dibêje: Di leşkeriya Osmaniyan de leşkerên Kurd bê şik cîhekî girîng digirtin; di sala 1587 an de Kurdan weqas leşkeran dane Osmaniyan:

| | |
|---|---|
| Wîlayeta Dulqadirî | 5.100 kes |
| Wîlayata Erzirûm | 2.500 kes |
| Wîlayeta Riha | 1.600 kes |
| Wîlayeta Amed | 9.043 kes |
| Wîlayeta Çildir | 1.800 kes |
| Wîlayeta Qers | 1.350 kes |
| Bi giştî | 29.193 kes in.(28) |

Li vir dixwazim bala xwendevanan bikişînim, ew hejmarên bi piranî ye Kurdên ku rojavayê Anadolê terk kirî û yên neçûne Îranê ne. Kesên manî bûn eskerên Osmaniyan.

Di navbera herdû Împaratoriyan de gelek caran li ser miletê Kurd û welatê wan şer, komkujî, malwêranî û koçberî pêkdihatin. Ew şerên bê dawî, ji dagirkeran rê jî dibû barekî ku nedikaribûn hilbigirin. Osmaniyan ji bo wan şeran gelek zilm li gel dikir; ji wan bi zorê leşker, bac û xwarin distend, lewre di kîsê dewletê de pere nemabûn. Ji bo van tengasiyan carna di navbera hevdû de peymanên lihevhatine çêdikirin. Lê wan pir dirêj jî dom nedikirin. Lewra êlên Kurd ên mezin li ser xaka welatê xwe dijiyan carna derbasî herêmên xwe

yên kevn dibûn ku balansa mêzînê dihate guhartin...Ji bo ku vê rewşê bidin rawestandin, herdû dewlet dixwestin ku sînor jî hebin. Yek ji wan peymanên girîng jî di sala **1590** an de pêk hat. Şah Ebbas bi Osmaniyan ve di heman salê de li Stenbolê peymanek imze kir. Li gor vê: Ezerbeycan, Gurcîstan, Ermenistan, Şehrî Zor, Herêma Lolo û Hemedan derbasi Osmaniyan bû. **Şah Kurmanc û Dimiliyên li rojava ajotin Xorasan.**(39) Ji bo wê jî, êdî koçên mezin, jihev veqetandinên kûr di nava êlên Kurd de pêk dihat. Ji alî din ve jî nerazîbûnên gel yên di nava dewlêtê de jî dibûn sedema serhildanên mezin.

Mehmedê III an, di sala 1595 an de, dema xwest here ser Awûstûrya û wê pirsgirêkê çareser bike, fermana edaletê belav kir û di wir de rêvebirên li Anadolê bi zilimkarî sûcdar dikir. Bi ser vê de, li Kolikê Abdalek bi meriyên xwe ve dest bi raperînê kirin. Paşê ew hate perçiqandin. Ji ber siyaseta Osmaniyan ku bi darê zorê êl li Anadolê bi cîh dikir; li gelek cîhan û li Semsûrê jî gelek serhildan çêbûn.(120-9) Ji ber zilm û xelk şêlandina karmêndên dewleta Osmanî, êdî tehemûla gel nemabû. Ji bo wê komên ku firsend didîn direviyan alî Sefawiyan, yan jî alî Memlûkan. Ji ber zor û zahmetiya jiyanê ne tenê yên Şîa, yên sûnnî jî direviyan.

Sîstema eskeriya Sefawiya tenê ne li ser Şîan bû, ji Anadolê tenê ne Şîa, sunnî jî diçûn Îranê. Dema li Amasya peyman çêkirin, Osmaniyan xalek kirinê ku yên xwe avêtî paş dewleta Safewî divê şûnde bên şandin. Osmaniyan dixwest pêşî li ber koçberiya ji Sêwas, Dulqadir û Helebê bigirin.(112-71) Ew jî nîşan dide ku gelê Kurd wê deme ji Osmaniyan ne memnûn e; ne sunnî, ne jî şîî. Ji bo wê jî gelakan dixwestin herin Îranê. Her çiqas Osmanî û Sefawiyan peyman çêkiribe û xwestin ji êlên dixwazin herin Îranê re bibin asteng jî, nikarin. Atmaca li Yozgat (1526), sala din dîsa li Bozok, Dulqadir Zûnnûn Beg; êla Hîsar Beg, Çîçek, Axca Koyûnî û Mesûdî li dora xwe komkir û serî hilda. Paşe dîsa di heman salê de Kalender Çelebî; ji Mereş (Qaraca û Bişan-Dokûz) û gelek êlên din 20-30 hezar kes komkir û serî hilda.(112-77) Bi vî awayî gelek serhildan çêbûn; lê yên herî fireh û bi bandor serhildanên **Celaliyan** bû.

Di dawiya serdema Yawûz de li Tûrhalê, şêxekî ji Bozokê yê bi navê **Celal** derdikeve holê. Di şikeftê de jiyaneka bi Xwede re bi serê xwe dimîne. Ew kesa ji der dorên xwe eleqeyeka gelek mezin dibîne. Kesên cahil û nezan ji wî gelek hêviyan dipên. Bi ser vê de gel li dora wî roj bi roj zêde dibe. Rojeke Celal xwe **"Mêhdî"** îlan dike. 20 hezar kesên siwarî û piyade lê dicivin û ji alî alîgirên xwe ve wek **"Şah-Welî"** tê binavkirin. Di demeka kin de gelek gund û bajarok heynan. Dewleta Osmanî Ferhat Paşa û Elî Beg Şahsûwaroglû yê Dulqadir bi vê serhildanê re wezîfedar kirin. Ferhat ji Stenbol, Şah Siwar jî ji Elbîstanê êrîşî ser Celaliyan kir. Celal ji bo ku herê Îranê vekişî Sêwasê. Lê Şah Siwar ew li Şarkî-Qerehîsar girt. Di sala 1519 an de hate kuştin û serê wî ji Yawûz re hate şandin. **Lê ji vê demê bi şûnde ji her serhildanekê re gotin Celalî.**(133-88) Yanê serhildanên Celalî ne yeke û ne jî diyare ku ji alî kîjan êlan ve pêk hatine. Carna ew şaş bi kar tê. Navê Celalî li ser hinek êlan ma ye, bi taybet

jî yên îro li Kazakîstanê û Qefqasan, lê di bingeh de Celalî piraniya Kurdên li dervayê welat in û hema hema hemû êl di navê de hene. Ew bûyerana ji alî nûserên cûda ve bi awayên cûda tên şirove kirin, ya herî rast ji alî Îzadî ve tê kirin:

Di sala 1519 an de li Tokatê yekî bi îddeaya nûnerê ruhê gerdûnî û bi navê Celal derket. Celal bi Nasirê di sedsala IX an de derketî ve ji Pontûsê derketin. Ew herdûyan jî Zerdeştî wek bingeha olî û îdeolojiya civakî bingeh digirtin ku ew balkêşe. Celal navê Şah Îsmaîlê têk çûyî heyna û îddea kir ku şerefa kraltiyê derbasî wî bûye.(154-116) Mirov dikare bibêje piştî damezirandina Sefawiyan Kurdên li Anadol û Kurdistanê her tim di nava têkoşîn û şerê bi Osmaniyan re de bûn. Ew serhildana carna sar dibûn, lê heta salên 1700 an domkirin. Di vê demê de gelek ferman û komkujî li ser Kurdan pêk hatin, emê di bêşên din qala wan bikin.

Di pêvajoya şerê Awûstûrya de, hemû hêza Osmaniyan li eniya rojava bûn. Ewlekariya Anadolê jî komên sekban/levent jî pir bê sînorbûn û paşê ew ziviri serhildanê. Ewliya Çelebî di Seyahatnama xwe de qala paytextê Osmaniyan Bûrsa dike û wiha berdewam dike: Di dema Mehmetê III an de Celaliyên bi navê Qere Yazici, Kalender Oglû, Delî Hesen û Cennet Oglû êrîşî Bûrsa kirin. Xelkê wir bihîst û li sê dorê bajêr qele çêkirin.(96-cilt II-6) Di sala 1601 an de Sokûllûzade Hesen, Celalî têk birin û Qereyazici sala din mir; birayî wî Hesen cîhe wî girt. Ew tevgera li rojavayê Tirkiye nayê dîtin, tenê li Anadolê gundî, koçber û sekbanan serî hildan û li Anadolê belav bû.(147-14) Ev yek ji serhildanên destpêkê yên gelê Kurd e. Wekî tê zanîn di vê salê de beşek ji Kurdên Reşî jî, bi zorê li Gîlanê-Îranê bi cîh dikin.

Êlên Kurdên ku çûbûn Rûsyayê jî di navbera salên 1603-1613 an de koçber bûn. Di serhildana Celalî de bi Abdûlhelîmê Riha (Qereyazici) re piştgirî kirin û ji bo vê hatin ajotin. Hikumeta başûrê Kurdistanê ew qebûl nekirin ji bo vê ew çûn Erzirûm, Eleşkîr, Gole, Ahiska, Erîvan, Tiflîs, Gêncê, Nahciwan, Mako, Kazwîn û Tebrîzê. Ew cîhên mîna: Meletî, Semsûr, Riha, Mereş, Dîlok, Xarpût û Amedê vala bûbûn jî Kurdên koçber hatin û bi cîh bûn.(28) Ew êlên çûbûn piranî yên girêdayî Reşiya ne. Sosyologê Îngîlîzî yê bi navê R. Tapper, li Ezerbeycanê û Îranê lêkolîn kirin û di encamê de dibêje, êleka bi navê Seneklû ya Kurd heye, lê ew bi temamî bûne Tirk.(49) Mixabin gelek êlên Kurd bi taybetî jî li Ezerbeycanê bûne Tirk; yek ji wana jî pismamên Reşiyan ku ji wê re **Qereçorî** tê gotin in. Kurdên ji ber zilma Osmaniyan dirêviyan bi piranî xwe davêtin paş Sefawiyan. Ji wan 20 hezar Celalî yên ku xwe avêtibûn bextê Îranê, Şah Ebbas xwest ku 8 hezaran li nav êşîreta Bradost bi cîh bike. Lê Xanê Çeng Zêrîn a bi nav û deng ev yeka qebûl nekir û şer dest (1608) pêkir.(59) Bi vê yekê wî dixwest Xanê Çeng Zêrîn lewaz bike; ew fermandarê Kurd ê leheng bi hêz dibû û Şah jî ji vê yekê ditirsî, bi vî awayî ew jî planeke ku Kurdan bi hev bide kuştinê bû. Çeng Zêrîn jî dikarîbû wan qebûl bike û hîn bi hêztir bibûya, lê xuyaye ku wê demê Kurd pir teng difikirin.

Tiştekî balkêşe ku Kurdan piştî dewleta Şadî pir kêm yekîtiyên mezin çêkirine; di serdema Pezgewr û Beraniyan de yekîtiyê nêzîkî wî rengî hene, lê ew bi piranî li dijî hev di tevgerê de bûne. Ji alîkî ve di nava hev de ji alîkî din ve jî, bi dijminên li dor û ber re tekoşîn gelek zahmete. Piraniya Kurdan wek êl yan jî federasyonên êlan serbixwe jiyane. Pezgewr, Bayindir û Begên Dulqadirên ku fêrî bi serê xwe jiyinê bûbûn jî, nediketin bin fermana Osmaniyan. Ji bo ku mîrîtiyên xwe jî winda kiribûn li Osmaniyan bi hêrs bûn û ti caran jî xwe ji serhildanan paş ve nedan. Di serhildana Celaliyan de bandor û rola wan hebû. Di serhildanên sedsala XVII an de jî rola Pezgewran hebû.(114-270) Bi sedsalan Tirkan bi hêzên Kurd re şer kiriye ku wan têxe bin xizmeta xwe, yan jî di nava xwe de bihelînê. Lê pir hindik bi ser ketiye.

Carna Kurd di nava dewletê bi xwe de jî dibûn sedema pirsgirêkan. Di dema raperîna Celaliyan-Kurdan de, li ser postê-wezîrtiya Kurdên wek Tirkmen bi nav dibin jî alozî derketin. Ew jî dîsa îspateke ku çawa Tirkan, Kurdên wek Tirkmen bi navdikirine. Li ser axatiya Tirkmenan (1601) di navbera Hesen Axa û Ak Alî Axa-Dewlet de nakokî derket. Hesen li hember Stenbolê, ji Bolû wan deran esker komkir û hate ber deriyê Stenbolê. Ji ber vê yekê Ak Alî jî tirsiya û dev ji axatiyê berda. Axatiya Tirkmenan li holê ma. Ji sîpahiyan Axa henefî Çelebî û Daşnik Emîrze ji bere ve jî kesên xizmetkarbûn û ji bo **Boz Ûlûs, Qere Ûlûs, Atkeşan û axatiya Uskudar Tirkmen bûn berendam**. Bi riya darêzorê "bibin xwediyê naneke" û deynê xwe yên dewlete ji çend kîsan vê derbas kiribûn, lê ew jî ji roje avêtin rojê û ji tirsan ew jî reviyan Uskudarê. Ji wir jî çûn Helebê.(96/III/72) Ew di nava dewletê de şerekî dide xuyakirin. Ew Ûlûs û Tirkmenên qal dibin jî kalê Kurdên li Anadolê ne. **Berdewamiya Boz Ûlûs îro: Terikî, Mirdêsî û Zerikî ne. Qere Ûlûs jî Reşî ne; Tirkmenê Atçeken Canbeg û Uskudar jî Kurdên Sewêdî ne**.

Nûser Orhonlû li ser beş kirin û binav kirina Osmaniyan yên êlên Kurd dibêje: Di dewleta Osmanî de koçerên Kurd di bin sîwana **"Îl"** yan jî **"Ûlûs"** de dihatin komkirin. Bi vi awayî dihatin dor kirin: Boy (êl-eşîret), oymak (cemaat-qebîle), Oba (mahalle-tax). Serokatiya êlan mîran dikir. Dema serokê Êlê bê hilbijartin, bi giştî serok û mezinen êlê biryar didan û dewlete jî ew dipejirand û dibûn Mîrê êlê. Tenê êla Reşiyan cûda bû. Arîstokrasiya êlê û rûspiyên wê biryar didan û kî bixwastana dihate pejirandin.(90-14) Bi ditina min, boy di nava Kurdan de wek zend e, oymak jî êl in û oba jî malbatên girêdayî êla ne. Kopraman jî dibêje: Ji mîrên zendan re digotin "boybeyî"(149-127);di nava Kurdan de ew Begêbegan e yan jî **Mîrêmîran** e. Ji cîgirê wî re jî digotin "kethûda", ew herdûyan têkiliyên dewletê bi yên êlê ve sererast dikirin. Gor defterên tahrîr yên sedsala XV û XVII an, koçber wiha belav dibûn: **Qere Ûlûs**: li başûrê Gola Wanê, **Boz Ûlûs**: li Amedê, **Dulqadir û Yenî Îl**: di navbera Mereş û Sêwasê, **Bozok**: li keviya Kizilirmak, **Uç Oklû û Remezanî**: li Torosan dijîn. Li cografyeka gelek fireh belav dibûn. Wek mînak: Boz Ûlûs, komeka ji 40 hezarî pêk dihatin û xwedî du milyon sewalên serçûk (mî û bizin) bûn. Ew

zivistana diçûn başûrê Mêrdînê û ji bo zozanan jî diçûn Erzirûm û Amedê.[149-127] Ji nava vê zendê, em Têrika, Zerika, Mirdêsî dizanin; dibe ku Canbeg jî di nava vê zendê de binav kiribin. Ji sedsala XVII an bi şûnde, dewlete dest bi cîhkirina wan kir. Di dawiya wê de ew parçe kirin û mecbûr man ku hîn li cografyeka fireh bi cîh bibin. Boz Ûlûs mînakeka baş e: Ji sedsala XVII an heta nava sedsala XIX an ew li Qereman, Akşehîr, Kutahya, Sarûhan, Aydin, Kûşadasi, Rodos û Îstankoyê bi cîhkirin. Xelkê van êlan piranî bi maldariyê debara xwe dikirin. Lê carna ji dewlete re tîr, kevan çêdikirin û bi wî awayî baca xwe didan.[149-127] Ji wir jî em derdixin, ku di nava wan de Oxçû û Şadî jî hene. Ji bo ku tîr çêdikirine, dewletê ew navê Oxçû lê daniye; di bingeh de Şadî ne û hîn jî ew li Erexlî ya Qonya hene.



**Şadiyên Erexliyê**

Dewletê bi hezaran konên Kurdan li cîhên cûr bi cûr niştecih kirin, lê piraniya wan di cîhên xwe de neman û gelek caran wan barkir û piştre jî rastî komkujiya dewletê hatin. Ewliya Çelebî dibêje: Çorûm cîhê rêbiran e û 4300 konên xwe hene. Ew hejmaraka gelek mezine û ji ber êrîşên dewletê û serhildanên Kurdan ew tevlîhevî gelek salan dom kir û li her derê belav bû.

Li Erzirûmê Abaza Paşa Celalî bû, şevekê kelehê zept kir û yeniçerî hemû di şûr re derbaskirin. Abaza 10 salan serbixwe ma, leşkerên ji alî Osmaniyan ve hatibûn şandin dest vala vegeriyan. Paşê Husrev Paşa kelehê

ji dest Abaza xelas kir. Erzirûm bajarekî rind e, lê sar e; pisîk dema ji xaniyekî bazdide xaniyê din, li hewa dicemide û heta Newrozê bi awayî dimine.[95-86] Niqta girîng ev e, ku dema qala Newrozê dike, wek îdeaka ji alî herkesî ve tê pejirandin û nikare ji nedî ve bêyî ye. Yanê heta wan salana jî bandora çand, kevneşopî û ola Kurdan diyar e. Yek jî ne tenê li Kurdistanê, li rojava jî Kurd bi dewletê re di nava tekoşîneka mezin de bûn.

Li ser vê E. Çelebî serpêhatiyeka xwe ya balkêş radigihîne: Ji Eskîşehîrê çûm Akşehîrê. Li gundekî çiyayî bûm mêvan. Sibê min mêzekir, ku li ser hespekî yekî bi dest û pê girî tê. Min agahî stend ku ew di cenga Uskudarê de (şerê Celalî û Osmaniyan ê li Stenbolê) serleşkere yekîna Çomarê bûye. Sîmelên xwe gihîştibûn guhên wî û mirovekî bi xof bû. Min bi zorê da rûniştin û me bi hev re xwarin xwar. Min ji wî re got **"bira"** û ji ser wê, hat li cem min rûnişt û got; te bawerî bi min anî min jî bi te, te ji min re got bira. Ez ji êla **Îzolî** ya Kurd im. Li Stenbolê em têk çûn û çiya bi çiya ez hatim vir.[96/III/20] Ji vê agahiyê em fêr dibin, ku êla Îzol jî di nava serhildanê de bûye. Piştî serhildanên Celalî Kurdên îro li dervayê welat êdî, yan çûn Îranê yan jî bi temamî ketin bin desthilatdariya Tirkan. Heta dema Mûradê IV an, Osmaniyan bi riya otonomî bi Kurdan re îttîfaq dikirin. Lê di dema wî de em dibînin, ku ew tê guhartin û îcar ji holê rakirina mîrîtiyên Kurd ji xwe re dikin armanc.

Di dema padîşahê Osmanî Mûradê IV an (1623-1640) de jî Kurdan gelek êş û elem dîtin; wî paşayî dixwest mîrîtiyên Kurdan ji holê rake û hemûyan bi dewleta navendî re girêbide. Mûrad, dema çû raperîna Sûbaşi Bekirê Bexda (1626) li ser riya xwe serhildanên li bajarê Payas, Îskenderûn, Heleb, Dîlok, Bîrecîk, Riha û Amedê bi xwîne têk birin. Wek xuya dike li vê herêmê bi piranî Kurdên îro li Anatoliya Navîn û bi taybetî jî Reşî, Têrikî, Celikî, Oxçû, Sewêdî dijîn. Li bakûr jî Sadrazam Xelîl Paşa êrîşî Îranê kir. Xelkê li herêma Ezingan, Dêrsîmê erzakên wan temîn dikirin û di vî alî de gelek zahmetî kişandin. Du caran çû ser Bexda; yek di sala 1635 an de, ya din jî di sala 1638 an de bû. Êlên Kurdên li Badînan, Mûsil, Hewlêr, Kerkûk, Şehrî Zor jî beşdarî wan şêran bûn. Mumkune ku eşîra Şêxbizinî jî wê deme ji cîhe xwe hatibe derxistin. Bi vê kome re girêdayî kon/federasyona Caf bû du alî; yek li Îran, yek jî li aliyê Osmaniyan ma. Beşekî Şêxbizin li alî Osmaniyan e. Yeşîlgoz dibêje, di salên 1621 an de Osmaniyan êdî sistema bicîh kirina êlan dan destpêkirin.[39] Ew îddeayeka di cîhê xwe de ye, lewra ji vê demê bi şûnde, tê dîtin ku polîtika dewletê hatiye guhartin. Ji vir û pêve jî, ew yeka heta salên 1800 an berdewam bike.

Dewleta Osmanî dixwest bi her awayî ji Kurdên koçber îstîfade bike: Mîna ku di naqliyê de bikar bîne; ker, hêştir û qantirên wan ji wan bistîne; di raperîna navxweyî de wek înzîbat jî bi kar dianîn. Di sala 1686 an de ji bo sefera duyemîn a Awûstûrya, ji êlan re emir hatin şandin û hat tespît kirin ku divê ew ji artêşê ra çiqas nefer bişînin. Yawûz Selîm ji Danişmendiyan 400, Kilîs Ekradî (Şêxan, Okçû-Îzzeddîn, Amîkî bi cîh bûbûn. Lê malên wan di sala

1705 an de ji dest hatin girtin û hatine firotin) 500, ji hakime Çolê 400 xwestin, lê ew gotin nikarin weqas kes bişînin û îtîraz kirin.(90-27)

Li dawiya sedsala XVII an Osmaniyan êdî dest bi polîtîkayeka nû kirin; ew ji êlên Kurdan ji sînorên dewletê dûr û yên nikaribûn kontrol bikin bi cîh kirin bû. Yek ji wan herêman jî deştên Sûriyê bûn. Gelek sedemen vê hebûn: Di serî de dixwestin ji êlên nayên bin kontrolê rizgar bibin û careka din pêlekî mîna serhildanên Celalî ve rûbirû nemînin. Yên din, li hemberî êrîşên êlên Ereb sînoran bipareze, ji gel bac, esker bigre gelek sedemên din jî mirov dikare bihejmêre. Ji bo vê armancê, paşên Osmanî gelek ferman li ser Kurdan derxistin û emê wan di beşên pêş de binivîsin. A. Refîk dibêje: "...Wan salana (1706) piraniya êlên li Anadolê di nava serhildanê de bûn û dewlete jî hertim hewl dida ku wana li Rakkayê bi cîh bike. Ji êla Mamali Elçî Oglû, êrîşî Akça Koyûnliyê girêdayî Walîde Siltan kirin. Êla Cirid a li Îfrazi Dulqadir rastê êrîşa Yûsûf Paşa hatin û reviyan çiyan. Ji bo ku êlên din jî xirav nekin, dewletê xwest ku wana bişîne Rakkayê. Di heman demê de Kacili yê li Hamayê bi cîh bûbûn jî reviyan Anadolê.(161-142) Wek tê zanîn Reşî di sala 1697 an de vegeriyabûn navenda Anadolê. Tê fêhm kirin ku piştî hatina wan jî, dewletê hewl daye ku êlên din bişîne. Piştî wan jî, êlên mîna Canbeg û yên din vegeriyabûn.

Bi kurtî mirov dikare bibêje, ku ji destpêka Osmaniyan heta serdema komara Tirk, wê dewletê zilim li Kurdan kiriye. Carna ji bo berjewendiyên xwe, rûyê xwe yê nerm bi Kurdan nîşan dane, lê ti caran ji pêşeroja Kurdan û mafê wan re hurmet nîşan nedane. Gelek caran li ser gelê Kurd komkujî pêkanîne. Di dema dawî de jî Mehmûde II an artêşê dişînê ser Emîrê Soran Mîr Muhammed. Reşîd Paşa di riya Samsûn, Sêwas û Meletî re; yê din jî, di riya Trabzon û Wanê re çû. Di sala 1834 an de artêşa Tirk li Kurdistanê komkujiyek mezin çêkirin. Li Sêrtê, li dijî îttîfaqa Ermenî û Kurdên Êzdî jî şer kirin; mixabin hêzên hevkar têk çûn û hemû reviyan sînorên Rûsya. Di vî şerî de 10 hezar Kurd mirin. Ji mirina Reşîd Paşa şunde, şûna wî Hafiz Paşa derbas bû, di vê demê de bi hezaran gelê Kurd kuştin û şêlandin. Hafiz Paşa, di zivistana sala 1839 an de li Meletî derbas kir. Bi biharê re êrîşî Akçadaxê kir, ji çar rojan şunda keleha Kurnak dagir kir, mêr kuştin, zarok şandin Stenbolê û jin jî şandin Meletiyê.(26) Bi zorê bi cîhkirina Kurdan ya li Anadolê heta sala 1850 an dom kir. Piştî van salan hinek koçberî bê dîtin jî, kêm e û ne demdirêje. Piraniya wan di nava herêmêkê de nîvkoçer jiyane, lê ti caran koçberiyên dûre pêk nehatine. Piştî van salana em dibînin ku dewleta Osmanî, welat dike 35 eyalet.

Li gora salnama Osmaniyan a sala 1856 an dewlet dibe 35 eyalet, emê wîlayetên ku mê eleqedar dikin binivîsînin:

**16. Eyaletî Hûdevendigar**

Lîvayî Kutahya: Eşiretî **Şûhûdlû**, Siraçlû û Harzem (Bi Germiyan re koçber kiribûn)

Lîvayî Qerehisar-i Sahîp: Êla Bozûlûs û Mûslûca
Lîvayî Balikesîr: Êla Heremeyn-i Şerîfiyn (Kildonlû)

**17. Eyaletî Qereman:**
Lîvayî Teke
Lîvayî Îçel
Lîvayî Qonya: Kûreyş Divle û Ozû
Lîvayî Nîxde: Êla Mûhacîrinî Acem, Cerit ( Pazarcik), Koçeklî, Şereflû

**18. Eyaletî Adana:**
Lîvayî Mereş: Pazarcik, Hacilyan, Elbîstan, Peşî, Borkan, Soxutî, Nadilî, Çakanî (Tîreka Sadica ye û li Dêrsîmê hene), **Celikan, Sinemîllî, Kiliçî, Atma,** Ç. Cerîdî, K. Cerîdî, Bûlanikan,

**19. Eyaletî Bozok (Yozgat):**
Lîvayî Bozok: Êla Mamalû (Bi dîtina min Mamitî ye) Vê eşîretê cara yekemîn serhildana Celalî da destpêkirin.
Lîvayî Enqere: Êla **Taban û Boz Ûlûs, Cîhanbeg, Şêx Han, Atma** (Li Arapgir û Pazarcikê jî hene), Moratî, Ziveî, Cemyatî.
Lîvayî Çanqiri: **Milan** ( Mêrdîn û Wêranşehr), Nallî, Înalî, Balî.

**20. Eyaletî Sêwas:**
Lîvayî Amasya û Çorûm: Ekrad-i Çorûm, Qere Hisari Tîmûrçî, Mea Katasaray Taht-e Tarik
Lîvayî Sêwas: Kilimgad, **Millî, Kawî** mea **Barikî**, Saxci Mea Badilî,
Lîvayî Gumuşhane: Korto-i Zûr û Bala û nahiyeyê Kuzevid.
Êla Reşiya yê ku li dora Amasya, Tokat, Çanqiri, Enqere bi cîh kiribûn havînan diçûn Erzirûmê; padîşah emir da fermandarên xwe, lê Reşiyan digot em 150 sal in diçin wir û tên û bi Kurdên ku ji Mêrdîn û Şehrî Zor ve hatine re şer kirin.[39] Ji bo belavbûna êlên din jî Moltkê dibêje: Di sala 1838 an de em ji deşta Pazarcikê derbas bûn, li vê deştê sê êlên Tirkmenên bi navê: Atma, Kiliç û Sinemilî bi cîh bûbûn. Her sê qebîle(!) di 2000 konan de rûniştibûn. Reşît Paşa hişên Kurdên bi qudret anîbûn serê wan bi şûnde, wan Tirkmenan jî ji hikumetê hêz dikirin û ji salê 400 kîse akçe baca xwe didan. Ji wana hinek bi ziraetê re mûjil bûn. Kiliçliyan ji 600 siwarî zêdetir hêz derxistin; ew qebîlên din peya şer dikirin. Hespên xwe bê qusûr bûn.[166-157] Ji wê demê bi şûnde dewletê pirsgirêka herî zor bi giranî çareser kiribû û êlên koçber bi cîh kiribûn. Ji bo ku ew êlên hatibûn bi cîh kirin careka din ji cîhên xwe ranebin, sîstema **"Derbend"** avakir. Dewletê ji tecrûbên berê ders girtibû û berê çend caran êl bi cîh kiribûn, lê ew nesekinîn û çûn cîhên ku bi xwe dixwestin. Ji bo vê, dewletê ji nava wan û ji nijada wan sîstema korîcîtiyê bi pêş xist û navê derbend lê danî. Wekî tê zanîn 'der' di kurdî de tê wata dêrî û 'bend' jî girtin e.

## DERBEND

Dewleta Osmanî ji bo ku Kurdên bi darê zorê dabû koçber kirin, li cîhên şandî bimînin, vê demê sîstema korîcîtiyê yanê "Teşkîlata Derbent" ava kir. Li cîhên stratejîk qereqol ava kirin û nava wan jî, gelek caran bi leşkerên Kurdên girêdayî hikumetê tijî kir, ku Kurdên vedigerin welatê xwe re bibin asteng. Ji vana çend wiha ne: Di navbera Riha û Bîrecîkê de Çarmelik, di navbera Ayas û Berendî de **Kurt-kulaxi**, li navbera Misis û Antakya **Baxras**, li Kirşehîrê **Kesîk Kopru**, li Sêwasê **Alaca-Han** û **Hesen Çelebî** ye.[39] Xale bavê min Hecî yê Mamî Tozê (1903-1989) digot: **Êla me dixwest dîsa vegere Kurdistanê, lê derbenda Kesîk Kopruyê girtine û yên me nikaribûne, bi vî awayî em parçe bûne.**




**Heciyê Mamî Tozê**

Cîhên derbenda, bi awakî dora xwe bikaribe kontrol bike dihate avakirin. Bi piranî li cîhên bê kes, li ser rêyên ticarî û eskeriyê digihijin hev û li gelî û li çiya avadikirin. Berpirsiyartiya derbendîciyan ya herî girîng, bi gotina nivîskar: tekoşîna li hember rêbiran û xaka jê berpirsiyar, ji êrîşên wan parastin bû.[155-11] Wek jenderma ewlekariyê temîn bike, çêkirin û parastina riyan û cîhên bêkes zîndekirin bû.[155-65]

Dîsa Orhonlû dibêje: Kesîk Koprî ya li ser Kizilirmak û nêzîkî Kirşehîr xerab bû û bûbû cîhê rêbiran. Gundiyên Mezra Yaylacik û gundê Yilanca yê girêdayê Hecî Bektaş ji bo Kesîk Kopriyê hatibû tayîn kirin. Ji bo rêvebiriya wan jî axayekî pirê hate tayîn kirin, di sala 1156/**1744** an de bû.(155-42) Mirov dikare ji wir jî derxe holê, ku kalên me cara dawî beriya wê tarîxê hatine. Li eyeleta Qeremanê jî êla Beydîlî li Hortî Han (îro bi navê Gundê Hortû ye û li ser riya Erexlî-Qonya ye) wek derbendwan hatibûn tayîn kirin.(155-52) Di derbendê Sofîlarê nêzîkî Haymanayê de 30 derbendwan hebûn û di sala 1764 an de ji wan re axayek hate tayîn kirin.(155-77) Di sala 1753 an de ji Gundê Atlandi yê di navça Tûrgût de, Abdurahman Axa yê ji Bozûlûs ji bo serokatiya wan tayin kirin. Sedema wê ew bû; ku Êlên mîna Hemze Hecî, Nemrûdî, Danişmend, Qere Xelîl, kesên girêdayî Îzzeddîn li Esb-keşan/Tûrgûtlû wek derbendwan hatibûn bi cîh kirin.(155-79) Di sala 1693 an de, derbenda Çar-Melîkan di navbera Riha-Bîrecîk, Kurt-Kulaxi ya di navbera Ayas û Berendî, Kesîk Kopru dîsa hatin tamîrkirin û teqwiye kirin. Wek derbendwan jî kesên koçber lê hatin bi cîh kirin. Di sala 1697 an de, ji Sarili, Koselî Avşarên girêdayî Danişmendan 71 kes li Mîsîsê bi cîhkirin.(155-106) Di sala 1705 an de ji Dulqadir, 25 êl (Mihmadî, H. Hecî, Tatîş, Mûsa Fakî, Cûy, Anamas, Çîxdem, Afşar, Qereman, Sokman, Dîrek, Demîrc, Çakal, Çixrik, Tacîr, Şaab, Kaçar, Aydin, H. Abdurrahman, Terzî Cerîd, Komur Cerîd, Qereman Hecî) Kurt Kulaxi ya girêdayî Adana-Berendiyê wek derbendwan bi cîh kirin.(155-106) Di sala 1720 an de navbera Akşehîr û Ilginê 200-300 malbat hatin bi cîh kirin.(155-111) Li herêma Tûnca ya girêdayî Haymanayê jî, di sala 1731 an de, gel Padkarê girêdayî Bozûlûs, Şêx Ahmedî û yên din li wir pere komkirin û xan û mizgeftek avakirin. Wek derbendwan jî ji Bozûlûs, Şêx Ahmedî, Huseyn Hecî, Sakî yê girêdayî Oxûlbeylî-Bozûlûs hatin bi cîh kirin. Kuşne ya girêdayî Bozûlûs a li Qereman dijî bo şerta baca xwe bidin di sala 1731 an de hatin bi cîhkirin.(155-112) Ew herêma wek Tûnca derbas dibû îro wek Toyçayir e û li dor berê wê hemû êlên Kurd lê dijîn. Ji wê em dizanin ku di sala 1731 an de ew bi cîh bûne.

Heman nivîskar dibêje: Derbend ji bo ku komên şakî neyên belavkirin wek kilîdê bikar dihatin. Ji bo wê jî, derbend dibûn cîhê tekoşîna şakî û dewletê.(155-66) Şakiyên tên gotin Kurd in û ji bo ku wan kontrol bikin nehêlin ku ew herin cîhên din jî, ew derbend sîstemeka esasî bûn. Di sala 1706 an de, êlên berê li Rakka ye hatibûn bicîh kirin ji bo ku neçin zozanan ew cîhên stratejîk hatibûn girtin: Pira Mereş, Derbendê Hudî, Saraycik, Akyol, Mîsîs û Tarsûs; riyên diçin Andirin, Payas û Edenê; Derbenda Zeytîn, Katranli û Kopru; Pira Altin, geliyê Arslanli, Panbûcak, Mekilû, Kanlibel, Pira zêrîn, Peşenlî, Uçdere hatibûn girtin. Jî bo ku derbasî Anadolê nebin derbenda Akyol jî hatibû girtin.(155-66) Lê dîsa jî Kurdan xwe avêtibûn Torosan û bi dewletê re şer kiribûn. Heman nivîskar dibêje ew sîstema ji dema Mûratê II an vir ve heye: Di nava Osmaniyan de derbenda wek saziyên dewletê, em ji dema Mûratê II an (1421-1451) û Mehmet ê II an (1451-1481) vir ve dibînin.(155-18)

Gor tedbîrên dewletê jî bi cîh kirina êlên Kurd di nava gelê Tirk de dibû sedema fikar û tirsan. Ji bo ku êlên Kurdan gelek şervan bûn, Tirk jê ditirsîn. Yan ji wan dûr diçûn an jî carna şer derdiketin. Carna jî, ji bo ku şer dom neke miletên din di navbera herdûyan de bi cîh dikirin. Di navbera Sînop û Reyhanliyê jî Çerkez hatin bi cîh kirin, ku xwestin lihev nekirina di navbera Kurd û Tirkan de bi dawî bibe.[62] Çerkez yan jî gelên din ji bo Tirkan wek tampon bi kar dihatine. Hema sîstemê mirov dikare li Xorasanê di navbera gundên Kurdan de jî bibîne. Pars û Tirk di navbera gundên Kurdan de bi cîh kirine.




Di dema Osmaniyan de cîhên Derbendan(155-93)

# BERANÎ
## (Qerekoyûnlû)

Di dîroka Tirkan de navê wan Qerekoyûnî ne, yanê ewên xwedî **'miyên reş'** û gor nûserên Tirk ew bê niqaş Tirk in. Bi piraniya nûser û lêkolînerên biyanî jî ew yeka dane pejirandin. Gelo em çavên xwe bigirin û vê yekê yekser qebûl bikin? Bê guman na, min ew ji hemû nûseran hêvî dikir lê gelek ji wana mixabin îddea û gotinên Tirkan hema qebûl dikin û pediviyê bi lêkolînên kûr nabînin. Dema mirov hinek kûr lêdikolê, bi wêneyekî din re rû bi rû dimîne:

F. Sumer dibêje: Ji vê xanedanê re **"Beranlû"** tê gotin; lê nayê zanîn ku ew nava ji ku tê. Mînorskî dibêje Beranî ji Yiwa tên.(131-168) Sumer di pirtûkeka din de jî dibêje: Xanedana Qerekoyûnlû yê bi navê Beranî derdikeve pêş me. Ji îfada nivîskarên **"Vakîa Îranî"** û Tirk tê fêhm kirin ku ew navê xanedanê bûye. Lê em wate, kok û armanca vê peyvê nizanin. Di tirkî de ew peyva nîne. Lê eme dizanîn ku Beraniyan girîngiyeka taybet didane pez.(110-17) Wata vê em dizanin û başe ku navê komê yê kevn Beranî ye; di kurdî de beran tê wata pezê nêr. Koka wê peyvê xas kurdî ye û raste ku di tirkî de jî peyveka wiha nîne. Gotina din ê ku girîngiyê didin pez jî raste; lewra Kurdên koçber û pez du tiştên ku jihev nayêne veqetandin in. Lewra ew pêza nebiya wana nedikarî jiyana xwe bidana berdewam kirin; ji bo wê jî pez qûteke konê jiyana wan e.

Di beşa Ereb de min nivîsîbû ku birêz C. Celîl ji **"Dîroka Faûtûs, Dîroka Qalaxlî "** radigihîne, ku di serdema Sasanî û Grekan de êla Cunûkanê li bajarê Darê de bûne. Yûnanî Cunûkan li: Riha, Heleb, Amîd, Nisêbîn, Nînova, Sîncar, Cizîr, Finîk, Beytuşebabê nîşan didin. Van Cunûkana yên îro li dora Enqere, Nevşehîr, Kaxizman, Bako, Selmas, Xorasan, Xuremebad, Hemedanê û Helebê dijîn. Di vê deme de, ola wan ji mezhebeka Zerdeştî ya bi navê **Tiraîlî** bûye. Agatxangelosê Romî vê demê ji bo ola Xiristiyanî belav bike hatiye wan deran (332-BÎ) û Kurdên bi navê **Mamok**yan-Mamokane kirine Xiristiyan. Ereb ji welatê wan ra dibejin **"Dar El Beran"**, Osmaniyan jî gotiye "Beran Yurdu" (Mûş, Xelat, Erdîş, Malazgirt, Xinis e).(26) Şopa vê êl an jî komê çar pênc hezar sal direj dibe û mirov şopa wan li warê Bextiyariyan de jî dibîne.

Di nava Mirdêsiyan de jî şopa Beraniyan heye. Bi vê re girêdayî birêz Hoko dibêje: Mirdêsî di serê sala 900 an de gava êla mezin a bi navê **Mehmûdî**, ji dora Mûsil û Şehrîzor hatine durxistin... Ji Hekkariyê dema hatine rojava, ji xwe re Pîran, Xarpût û zozanên wir kirin war. Êl û berên Mehmûdiya ev in: **Aşmîşarat, Bala Beranî, Bergîlî, Delîkan, Babikî, Siwedanî, Birkanî, Mişkanî, Şikakî, Reşwanî, Rêswanî, Lewabî, Keşahî, Lewanî, Cemanî, Mihrîkanîkî, Wexşanî, Pismanî, Pûnyanî, Cezîranî, Mîranî, Bikanî, Dodanî, Dumkanî, Sêvkanî, Yûsûfanî, Sadkanî, Mêrkanî** ne.(32)

Ne dûr e ku Mamokyan bi Mehmûdiyan ve jî heman kom bin. Bi vî awayî Mehmûdî wek konfederasyonekê xuya dike û gelek zore, ku mirov wan bi Beraniyan ve jî hev safî bike. Lewra heman êl û federasyonan gelek caran

bi navên cûda mohra xwe li dîrokê xistine. Ew carna wek Beranî, carna wek Mehmûdî, Reşî û wekî din derdikevin pêşberî me.



**Jinên Sêvikan yên ji Gundê Omê-Qonya**

Wekî nivîskarên rojava dibêjin: Di **alaya Beraniyan de wêneya beran hebû**; navê xwe ji wir girtin û[(110-13)] tespîteka di cîh de ye. Di ala wan de, di kevirên goristanên wan de û di gelek alavên wan ên din de wêneyên beranî heye ku ew sembola wan bû. Eger mirov cografya Kurdan bide ber çavan, tê dîtin ku her cîhên ku çûnê ew heykelana çêkirine. Li gundên dora çiyayên Bingolê gelek heykelên berana ye hene. Van heykelana yên **Beraniyên Reş** û Akkoyûniyan/Pezgewran ên ku li dora Warto-Gimgim, Xinis, Kaliova û Şûşarê ne. Sala 1934 an min raporek da navçê û paşê hatin ji wan heykelan 8

heb birin muza Amedê. Wana yên bav û kalên Hormekiyan bûn. Yek ji wana jî yê Mehmedê kurê Hesen Xanê Hormekî bû.[127-63] Em wana li Loristan, Bakûrê Kurdistanê, Kutahyayê jî dibînin. Tenê ne kevir, cîhên çûnê jî bi navê xwe xwendine.

Li ser vê babetê Rişwanoglû niqtên balkêş dinivîsîne: Di salên 226-240 de ji Çînîstan/Kaşgar hatin Îranê. Ji wir jî hatin Mûş, Axlat, Ercîş, Bedlîs, Melazgir û Xinisê. Wan deran wek "Dûrûberan-welatê Beran" binav kirin. Navê zenda wan Mamikan bûn ku prensên xwe jî Mamik û Konak bûn. Di salên 412 an de tîpnivîseka mîna yên **Yenîsey** derxistin holê. Di sala 1295 an de bi Îlhaniyan ve misilmantî qebûl kirin. Piştî vê em wana wek Beranlû/Qere-Konlû dibînin.[128-58] Tîpnivîsa wek a Yenîsey jî dîtineka di cîh de ye; lê bi dîtina min, wana ew nivîs nû dernexistin, berê jî pê dinivîsandin. Kîtabeyên Yenîsey jî îspata vê ne; wekî me li destpêka pirtûkê jî nivisî, federasyoneka êlên Kurdan li wir jiyaye li ser keviran kurte dîroka xwe nivîsîne. Ne dûr e ku ew kalên Beraniyan bin.

Doç. Eroz radigihîne ku Tabarî wek: **"Al-Atrak al Baraniyan"** nivîsandiye.[99-24] Bi dîtina min ew tê wata Beraniyên koçber; lewra gelek jêder ji bo Kurdên niştecîh peyva Ekrad, ji bo yên koçber jî E/Atrak bi kar tînin. Ew jî vekirî dide xuyakirin, ku Beranî beşek ji Kurdên koçber in. Heman nivîskar bi berdewamî dibêje: Ev jî dide xuyakirin, ku Kurmanc bi Beraniyan ve û bi Qerekeçîliyan ve û bi Tirkan ve merivê hev in.[99-24] Ev hevok ji bilî Tirka raste û nivîskar îşaret bi dîroka Kurdan ya balkêş dike. Beranî gor dîtina min jî demekê li Asya bûn, dema li Yenîseyê nivîsîn û digotin: êlên min neh (9) in, salên min çil (40) e... Ew: Beranî, Germiyan, Qerekeçîlî yek êl yan jî federasyon/konfederasyona êlan e. Ew gotin di heman demê de dîroka wan jî dide xuyakirin. Nivîskar dixwaze bi vê rastiyê de Tirka jî bizeliqîne, lê ew pîne nagre.

Birêz Xemgîn jî wiha qala dîroka wan ê dem dereng dike: Ji alî Bayram Xoce ve di sala 1366 an de hate damezirandin. Sala 1380 Xoce mir û şûna wî lawê wî Qere Mehmet hat. Wî bi Tîmûr re şer kir û têk bir ku nekeve Kurdistan. Di sala 1389 an de mir û şûnê Qere Yûsûf hat. Di vê demê de artêşa Tîmûr Kurdistan bi temamî talan kir. Tenê li Îsfehanê 60 hezar mirov kuştibûn. Kurê Tîmûr Celalettîn Mîran Şah bû waliyê Kurdistanê, lê ew ji bavê xwe jî bê rehmtir bû. Tîmûr di sala 1405 an de mir, Qere Yûsûf bi alîkariya begê Bedlîs Şerefettîn, di sala 1408 an de dîsa dewlet avakir.[101-197] Ew qala damezirandina Beraniyan yên li Kurdistanê dike. Jêderên din jî dibêjin di dema Moxolan de ew ji rojhilat hatin. Rojhilat jî bê guman cografya navenda Xorasan e.

Di dema hukumdarê Îlhaniyan Argun Xan (1284-1292) de, qebîleyên ji rojhilatê Îranê, Turkistanê hatin li Tebrîz, Mûsil, Hemedan û Bakûrê Kurdistanê bi cîh bûn. Navê komê **Yîva** bû; ji serokê wan re jî Berçem digotin. Prof. Sumer; **êlên ji rojhilat hatin Kurdistanê bi yên vir ve merivtiya xwe hebûn; pismamên Şadiyan bûn**, dibêje. Damezinerê vê begligê Bayram Hoce û xwarziyê xwe Qere Mehmed bû.[39] Ez jî vê dîtine rast dibînim, lewra: Yîva federasyoneka Kurd û şaxekî Şadiyan bû. Gorî Torî jî, ji Tirkmenistanê hatin

û li newalên li bakûrê Diclê û Firat bi cîh bûn; koçber bûn. Havînan diçûn Aladaxê, zivistanan jî diçûn Amed û dora Firatê. Di sala 1380 an de Qere Mehmûd derbasî serokatiya êşîretê bû.[(58)] Ûzûnçarşili jî wek êl destnîşan dike, lê ew ji êlekê zêdetir in. Herî kêm federasyon e. Bi dîtina wî, Beranî ji ber Moxolan û ji Maveraûnnehîr û Xorasanê reviyane rojava. Pezreş û Pezgewr li bakûrê Dicle û Firat bi cîh bûne. Pezreş koçber bûne, havînê li Aladax zivistanê jî li dora Firat û Amedê bûne.[(31)]

Li ser vê xanedanê jî belge kêm in û yên hene jî di destê Tirkan de ne. Wekî dîroknûs dinivîsîn: heta nûka ti kîtabeyên berî kralê Beranî ya Cîhan Şah de nînin. Lê belge û perên bi navê Qere Yûsûf gelek in.[(110-1)] Sumer, ji A. Nîşabûrî radigihîne: ku Beranî bi êrîşa Moxolan re, di pêşengiya serokê xwe Tûre Beg de hatin bakûrê Kurdistanê û xanedana wan hemû Şîa bûn.[(110-7)] Çiqas girêdana vî Tûre bi Tûre yê ku Fîrdewsî qal dike ve heye nayê zanîn; lê Mumkune ku ew kevneşopiya wî navî ye. Yekê jî Şîa bûna wan girînge, lewra ji ber wê bi birayên xwe yên din re gelek salan û sedsalan têkoşiyane. Lê wekî xuyadike, li ser hatina wî jêder ne yek deng in û bi hev re di nav nakokiyan de ne.

Wekî hemû gelan, Beraniyan jî ji lewazbûna Moxolan sûd wergirtin. Wekî nivîskar dibêje: Împaratoriya Îlhanî di navbera şerê emîran de hate parçekirin; ji wê Tirkmenên Beranî fêde dît. Ew hêza xwe zêde kirin û di navbera Erzirûm û Mûsilê de bûn desthilatdar. Paşê ew desthilatdarî hetanî Sîstanê dirêj kirin.[(131-168)] Ew belavbûna jî dide xuyakirin, ku dûmahiyê Beranî li wan deran mane yan jî ew cografya ji wan re nas bû.

**Beraniyan, ji bo ku di xizmeta xwe de bi kar bînin, ji êlên Kurd 50.000 mal gîhandin hev û navê wan "Qere Ûlûs-Zendê Reş" danîn**. Ew sifatê reş; rîşê wanî qewmî û bi rewşa wan ê siyasî re girêdabû. Yanî, bi zanyarî dibêjin û ew pir xwezayî bû. Reş-Ûlûs wê demê li Îraqê dijîn. Gor Ebû Bekr Tihranî, Cîhan Şah lawê xwe Pîr Bûdak hîn ji walîtiya Bexda navêtibû, **Reş-Zend ajotin Ezerbeycanê**.[(110-32)] N. Seven dibêje: Beraniyan ji bo ku di xizmeta xwe de bikarbînin, ji Kurdên Tirk hêzeka ji 50 hezarî pêkanîn û ji wan re digotin **"Qere Ûlûs"**.[(150-202)] Ew îddeayên eceb hemû ji nivîskarên Tirk tên; çawa Kurdên Tirk? Gelo mentalîta di vir de tê fêhmkirin? Lê gotina Qere Ûlûs ji bo me girînge; mirov dikare bi kurdî bibêje Zendê Reş, yan jî federasyona Reş. Xelkekî bi vî navî di dema Medan de li Xorasan dijî û ji Medan re alîkarî kiribûn. Gereg ew kalên Reşî yên îro bin. Piştî Beraniyan, Reş belavbûn ew hêza jî ji holê rabû. Hinek ji wana li Anadolê hinek jî li Îranê jiyan û navê xwe demeka dirêj parastin.[(150-202)] Ûzûnçarşili jî li ser vê agahî dide û dibêje: di nav leşkerên Pezreş û Pezgewran de leşkerên bi navê "Çerîk" hebûn û ew ji êlan dihatin holê û serhejmara wan ji leşkerên din zêdetir bû.[(31)] Yanî eskerên ji êla hatibûn berhevkirin ji yên din zêdetirbûne û ew jî derdixe holê, ku ew herdû konfederasyonên Kurd bûn.

Dema Beranî bi hêz bûn Mûsil dagir kirin, di vê dagirkirinê de em dibînin ku gelek beg û begebegên Kurdan di navê de bûne. Serokê Beraniyan

Bayram Xoce di sala 1371 an de Mûsil dorpêç kir; di wê hewldanê de eskerên Heskîfê jî hatibûn alikariyê. **Ji serokatiya Xoce bigre hetanî dawiya mîrnîşînê, emîrên Heskîf, Cizîr, Bedlîs, Zirkî, Silêmanî û Kurdên din bi Beraniyan re girêdayî man**.[110-42] Êl û zendên ku Beranî pêk dianîn di alî olî de nêzîkî hevbûn û hemû jî Kurd bûn; li ser vê baweriyê, ew di şer de pir jêhatî û serkeftî bûn. Mînaka vê jî têk birine wana ya Tîmûr e, ku dewletên mezin nedikaribûn li ber wî rawestin û Beraniyan egîtiya Kurdan nîşanî wî jî dan.

Tîmûr di sala 1386 an de rojavayê Îranê girt, serê salê li Qerebaxê bi amadekariyan êrîşa ser Beraniyen derbas kir. Gor jêderên Ermenî, Ereb û yên din, Beraniyan mêraniyeke pir mezin nîşan dan û di vî şerî de Tîmûr têk birin. Bi alîkariya Kurdên ji çiyan daketibûn Qere Mehmed, Tîmûr têk bir; gor Ermeniyê bi navê M. Toma, Beraniyekî bi navê Marûf bi tenê serê 100 Çaxatayî jêkiribû (1387). Di heman salê de Mintaş li hember Siltan Berkûk serî hilda û Qere Memed bi Qadî Bûrhaneddîn ve jî alîkariya wî kirin.[110-50] Wekî di vê bûyerê de jî xuya dike, mirîtî û êlên Kurdan pir caran bi hevre alîkarî kirine. Vê demê mirov dikare bipirse, gelo hêza Beraniyan ji kîjan êl û zendê dihat?

F. Sumer dibêje: Ew Ûlûsê-konfederasyonan ji boy-federasyonên mîna **Şadî, Baharlû** (texmîn dikim ew Hewêdî ne-Ş), **Alpaxût, Dûharlû, Axaç-Erî, Hecîlû, Qeremanlû û Çekûrlû pêk dihat**.[131-168] Mirov dema li wê konsesûsê dinêre, xuyadike ku ew beşa hêzên Kurd berê dewlet, mirîtî û beglig damezirandin bi piranî yan nêzîkî hev kar kirine yan jî ew ji hev hayîdar bûne. Nêzîkbûn û hevkariya wan jî girêdayî dijminan e, dema dijber mezintir, dijwartir û bi hêztir dibin, Kurd jî mecbûrî yekîtiyeka mezintir pêk tînin. Beranî jî encama vê pêdiviyê ye. F. Sumer dibêje: Federasyona êlên Yîva bi Beraniyan vê xismên hev in; ji bo vê gelek îşaret hene. Berî êrîşên Moxolan, di bin serokatiya boy beyî Berçem de, ew li Hemedanê dijîn. Ya din; Şadiyên li Nahçiwanê (warê wan ê kevn) pismamê Beraniyan in. Ya sêyemîn jî; di dema tofana Moxolan de, beşek ji Yîva li cîhên xwe yê zivistanê Mûsil û Kerkûkê bûn.[110-14] Tiştekî din ku em li wan dîtinan zêde bikin nîne. Ew bi serê xwe îspate, ku Beranî Kurd in. Lê êlên Yîva min tam dernexist ku kîjan in; gor texmîna min, ji Reşiyan û Şêxbizinan yek e.

Ûzûncarşili dibêje Beranî konfederasyoneka Kurd û Tirkmenan bû.[31] Ez bawer dikim, mebesta nivîskarê bi Kurdan, êlên yan Dimilî yan jî Lerî ne; dibe ku Kurdên li Kurdistanê bin jî; Tirkmen jî Kurdên koçber in. Gor wî: Êlên mîna Çakirlû û Ayinlû endamê Beraniyan in. Dîsa êlên mîna Silêmanî, Zirkî, Mehmûdî jî bi Beraniyan re girêdayî bûn. Zirkî li bakûr û bakûrê rojhilatê Sêrtê dijîn. Şilêmanî jî li Xerzan û Heskîf ê dijîn. Mehmûdî jî li Wanê bûn. Berên Beraniyan ya herî mezin Baharli bû û serokê xwe jî Memedê Reş bû. Memed, hukumdarê Amedê Osmanê Reş yê ku girêdayî Tîmûr bû di şer de têk dibe. Di sala 1468 an de dawî li hukumdariya wî tê.[31] A. Ozer jî dibêje: Di nav Beraniyan de qebîleyên wek: Şadî, Duharî, Qeremanî, Çakirî, Bahar, Alpagût, Ayûnlû, Axaçerî, Hecîlû, Doger, Bayramî, Silêmanî, Zirkî û Mehmûdî

hene.[78] Li ser Şadî, Qeremaniyan de me agahî dan, ku kîjan êl girêdayî wan bûn. Dogerê nêzîkî Têrikî ya ne. Ew êlên ku di bin sîwana Beraniyan de îro bi piranî li navenda Anadolê û Xorasanê dijîn. Gorî Abdullah Varli radigihîne, em dibînin ku ew serokên hanê jî bi Beraniyan re bûne: Serokê Îmade, Siltan Ehmed, Bîrecîkê-Ristem Fexreddîn, Hezo-Şah Elî, Serokê leşkere Sor (Sûor-sîir) Huseyn, Sîncarê-Huseynê Xelîl, Tilefer-Xelîl, Suhrab, Mûsil, Erwaqiye.[23] Di van şertên îro de ez nikarim hemû êlên di nava Beraniyan de ji sedî sed diyar bikim, lê piraniya wan eşkere dibe ku kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Ew îşareta parçebûna Kurdên li dervayê welat li ser bingeha olî jî dide û yên misilmantî pejirandibûn di bin sîwana Pezgewran de, yên li ser ola Zerdeştî-Sersortî jî di bin sîwana Beraniyan de xwe bi rêxistin kiribûn. Ji bo wê em dikarin qetî bibêjin ku Kurdên îro li Anatoliya Navîn berê li ser ola Zerdeştî bûn û Beranî pêk dianîn.

Dema Pez-Reş belav bûn, êlên ku nexwestin têkevin bin desthilatdariya Pezgewran, beşek jê çû Xorasan û ketin bin desthilatdariya Tîmûr û beşekî jî berbi rojava koç kir.[39] Yên din jî ji neçarî xwe avêtin hembêza Pezgewran. Bi hilweşîna Beraniyan re Baharlû yê girêdayî wan serî ji Pezgewran re ne-tewandin û çûn Xorasanê. Ji wir jî hinek çûn Hindîstanê. Ji wan Siltan Kûlû Golkone (Dekkan) di sala 1512 an de dewleta Kûtûp-Şahiyan damezirand.[131-168] Pirsgirêka din di tespîta wan de jî nav in. Ji bo ku Osmaniyan navên êlan kirine tirkî, wek mînaka Baharlûya li jor, em tam nizanin ku ew kîjan êl in. Lê wexta em li êlên cara yekemîn çûbûn Xorasan û Hindîstanê dinêrin û ji bo ku serî netewandina Hewêdiyan jî dizanin, dikarin bêjin ku ew şaxekî Şadiyan û Hewêdî bin. Îhtîmala Berazî bûna wan jî heye.

V. Mînorskî dibêje: Beranî di navbera êlên Kurd de bûn sedema tev-lîheviya olî û siyasî. Raste, lê sedema vê yekê ne Beranî ne; sedema vê empery-alîzma Îslamî ya bi darê zorê dixwest dînê Kurdan biguhureye. Bê guman ew di nava Kurdan de bû sedema gelek şer, xwînrijandinê, parçebûn û bindestiyê. Li hember van jî, Kurdên bûn misilman di bin sîwana Pezgewran de kom bûn, ku navenda xwe li Amedê bû. Siyaseta wan jî li ser ji holê rakirina komên Kurdên mezin bû ku bi balkêşî û dîqet dom kirin. Bi taybetî jî, êlên têkiliyê xwe bi Beraniyan re baş (Çemîşgezek) bi dijwarî ceza dikirin.

Avcioglû dibêje: Ola Beraniyan **"Ehlî Heq"** bû; ev sedema girîng jî tevhev bûyinê hêsantir dikir û bû sedema gelek êlên Kurd bibin Tirkmen. Ji bo vê Kurdên **Çakirlû** yên ji Erdebîlê direje Mûganê dibin û **Hinûslû** yên çûbûn Îranê di sedsala XV an de bi tevahî bûn Tirk. Dîsa 24 êlên mîna Arapgîr, Çemîşgezek, Amarlû di dema Sefawiyan de li Ezerbeycanê, Qerebaxê dijiyan bûne Tirk.[84] Bê guman hinek êlên Kurd bûn Tirk; di serî de jî Qereçorî; heta mumkune xeyalî be lê bi dîtina min Azeriyên îro (ewe fizîka xwe mîna Kurdan) ew Kurdana ne. Êlên din ên ku nivîskar dibêje, nebûn Tirk. Nivîskar ferqa Kurd û Tirkmenan jî nabîne; yanê Tirkmen Kurd bixwe ne. Piraniya wan êlên ku tên qal kirin min çûn dîtin û hîna jî Kurd in. Ji zimanê kurdî bêtir hema

hema ti zimanên din jî nizanin. Amarlû li Gîlanê ne, yên din jî li Xorasanê ne. Li ser ola Beraniyan Ûzûnçarşili dibêje, mezheba wan Şîatî bû, heta Batinî bûn û ji ber vê hindê Memlûkî û Pêzgewr li dijî Beraniyan bûn.[31]

Li ser perê Îlhanî, Celayîrî û Eretna de, cîhe ku lê çêdibin (darpxane) jî navê xwe Beran e.[110-18] Gelek balkêşe! Ew dewleteke bi hêz û kudret bûye ku pere derxistine, lê pêdivî hîn zêde bi lêkolînan heye. Li Bedlîsê 9 sîkkeyên bi nave Qere Yûsûf û Pîr Bûdak hîna jî hene.[150-202] Li ser perê Beraniyan Kelîmei Şahadet û navê Çihar-yar î heye-Mecalis-ûl-Mûminîn.[31] Ew jî bi min zêde rast nayê.

Wekî min li destpêkê jî gote, Tirk îddea dikin ku Beranî Tirk in. Lêkolînerê dîroka wan F. Sumer, êlên Beraniyan dike du beş, werin em tevhev Tirkbûna wan bibînin?!

## Êlên Beraniyan

**a- Qara Koyûnlû (Beranî):** Di sedsala XV û XVI de li Anadolê gelek êlên bi vî navî hebûn; wek Qaraca Koyûnlû û Qara Koyûnlû. Ji wana ya dawî di dema Kanûnî de, di nav Tirkmenên Helebê de dijîn.[110-20] Tirkmenên Helebê kalên Reşiyên îro ne! Şaxekî wan jî li Yenî Îl (Yozgat) diçû zozanan. Di dema Mûratê III an de, ew li Qeremanê bi cîh bûn. Ew di nava Tirkmenên Helebê de 500 kon bûn. Li Amedê di nava Boz Ûlûs de bûn.[110-20] Ew jî Têrikî ne. Di dema Kanûnî de şaxê herî mezin li başûrê Eskîşehîrê, li herêma Seyid Gazî bûn. Di sala 1572 an de ew 18 êl bûn û nifûsa bacê 1116 kes bûn, ku texmînî nifûsa wan 6-7 hezar in. Li Ezerbeycanê jî dûmahiyên xwe hene.[110-20] Ji vê derdikeve ku bingeha Beraniyan êla Têrikî ye. Di hinek jêderan de jî Tirkan derbas dibe; lê di Kurdbûna wan de guman nîne.

**b- Şadî:** Jêderên Îranî dibêjin kurdên Şadî pismamên hukumdarên Beranî ne. Ji berê ve li Nahçiwan û Korta Şadî (Çûkûrî Şad-Sûrmelî) de dijîn. Piştre hatiye nivîsîn ku Şadî, ji êlên Beraniyan pêk tên, ji yên herî bi hêz a duyemîn e. Ji hilweşandina Beraniya bi şûnde, ew ber ketin xizmeta Pezgewran, paşê jî bûn hevalên Sefawiyan.[110-22] Me di beşa Şadiyan de jî qal kiribû ku di Kurdbûna wan de jî guman nîne.

**c- Bahar-lû:** Yek ji êla bingehîn a Beraniyan e. Mînorskî dibêje ew ji Hemedanê hatin. Ji hilweşandina Beranî ya bi şûnde, ew nexwestin tevlî Pezgewran bibin û çûn Xorasanê. Li wir ketin bin sîwana Tîmûr û tevlî nakokiyên Tîmûriyan bûn. Ji mirina Hesenê Dirêj îstîfade kirin, di sala 1479 an de, bi rêya Sîstan û Bamê, Kirmana Pezgewran dagir kirin. Paşê Siltan Yakûb ew têk birin û çûn Curcan. Ji wir şûnde li Xorasan man û beşek jê tevlî seferê Babûrê Hindîstanê bû. Li sedsala XVI an li Dekkanê dewleta Kutbşahî ava kirin. Baharlûyên îro li rojavayê Qazwînê li Hamse dijîn.[110-25] Ew êla min tam nikarî derxim, lê gor texmîna min êla Hewêdî ne. Dibe ku Lek yan jî êlên Hewraman bin, lewra li wê herêma tê gotin ew dijîn. Li bakûrê wan Kurmancên Amarlû,

li rojavayê wan jî Kurmancên Celikî dijîn. Yanê kîjan dibe bila bibe ew hemû jî Kurd in.

**ç- Tokarlû (Dûharlû):** Berê li dora Erzirûm û Baybûrtê dijîn. Serokê wê êlê di şerekî bi kralê Trabzonê de mir. Ji Pezgewran Tûr Elî heyfa wî heyna. Di dema Qere Yûsûf de serokê vê êlê Pîr Ahmet Beg bû.(110-26) Ew kî ne nizanim, lê divê Kurd bin.

**d- Qereman:** Vê êla navê xwe ji serokê Gêncê û Berda Emîr Qereman girt. Di dema Qere Yûsûf te E. Qereman begê began bû. Di gelek belgeyan de jê re **"Reş/Kara"** tê gotin. Di avabûna Sefawiyan de roleka mezin lîstin. Di dema Şah Ebbas de, bi Ûstacalû yan re hate girêdan ku ew yek ji heft êlên Sersoran bû.(110-27) Di Kurdbûna wan de jî guman nînin. Wekî me gotibû Ûstacalû jî serokên koma Layîniya ne û niha li Xorasanê dijîn, Kurd in.

**e- Alpaxût (Alpavût):** Wate nav; ew bi tenê êrîşî dijmin dike ye. Di dema Yûsûf de Hemedanê di destê wan de ye. Piştî Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Ji serokên mezin yek jî Pîr Mehmed Alpavût Beg bû. Di dema Sefawiyan de em dibînin ku ew li Şîrwan, Korta-Şad û Berda dijîne. Di dema Şah Ebbas de ew li sencexa Şîrwanê bûn.(110-28) Kurd in.

**ê- Çakîrlû (Çekîrlû):** Navê xwe, ji serok Emîr Çakirê di dema Celayîran de jiyayî girtine. Wexta Tîmûr Îran heyna kete xizmeta wî. Ji berê ve li Erdebîlê war girtibûn. Di dema Pezgewran de jî xwe parastin. Îbn Arabşah (Acaîp ul-makdûr-Qehîre) dibêje ew Kurd in.(110-29) Di wir de jî şuphe tune.

**f- Ayînlû:** Li dora Amedê jiyan û ew Kurd in.(110-30)

**g- Hecîlû:** Îhtîmalê ku ew şaxekî Dogeran bin. Lewra êla Hecîlû li Kerkûk û Hewlêr dijîn û beşekî Dogeran jî li wir war girtibûn.(110-30)

**h- Axaç-erî:** Di sedsala XIII de li Mereşê di daristanê de dijîn ew tê zanîn. Îro 2000 mal li Kûh-Gilûye li Îranê dijîn.(110-31)

**i- Doger:** Ew raste rast tevlî Beraniyan nebûn; li Sûriyê rêxistineka siyasî ya cûda avakiribûn û alîgirên Beraniyan bûn.(110-31)

**î- Bayramlû:** Navê xwe ji Bayram Begê ku bajarê Xoy di dest de bû wergirtin. Nivîskar ji bo wana dibêje ew Tirk in; lê ti têkiliya wan ji nêzîk û dûr ve bi Tirkan re nîne û hemû Kurd in. Nivîskar êlên li jêr jî wek Kurd nîşan dide:

**j- Êlên Kurdên girêdayî Beraniyan:** Ji bilî êlên Tirk, di nava Beraniyan de yên Kurd jî hebûn. Vana: **Silêmanî, Zerikî û Mehmûdî** û yên din bûn. Qere Mehmed, Kurd li dora xwe komkirin û li hember Tîmûr şer kir.(110-32) Ew jî êlên Kurd ên bi nav û deng in. Zerikî li Enqerê, Sêwas, Semsûrê û Xorasanê hene. Wekî hate xuyakirin ti têkiliya Beraniyan bi Tirkan re nîne; heta ti êlên Tirk jî di navê de nînin. Ew konfederasyon/ dewleteka ji êlên Kurdên ola xwe jî Zerdeştî û Şersortî ye.


Di nav Beraniyan de rêberê herî bi nav û deng Yûsûf Beg bû; di serdema wî de Beraniyan li Kurdistanê, Îraqê, bakûrê Îranê û welatên din gelek cîh girtin. Destpêk weqas serkeftî bû ku gelek dewlet jê ditirsiyan, lê dawiya wî jî mixabin pir bi xemgînî hat! Yûsûf Beg êrîşî ser Moxolên li Siltaniyê kir, Ebû-

Bekirê Çaxatay vekişî çiyayê Demawend. Di nava serleşkerên Ebû-Bekîr de kesekî bi navê Newruz jî heye ku balkêşe. Di sala 1408 an de, 20 hezar leşkerên Beranî wiha rêz dibûn: Li navendê Qere Yûsûf, milê çepê Huseyn Begê **Şadî**, milê rastê Emîr Bîstam (serokê êla **Çakirlû** ya li Gîlan) bû. Bi mêraniya Qere Yûsûf bi xwe, Çaxatay-Ebû Bekir belav bûn. Ji bo mêranî ya Yûsûf ev helbesta heye:

Dilawer Qere Yûsûfê namdar
Der Amed be heyca çû Îsfendiyar
Nîşete ber esbî kûh-î revan
Ber averde ez cism-î sad kes rêvan.[110-75]

Dîsa tê zanîn ku Yûsûf gotibû: Dilê min di text de nîne, em gelê Tirkmen (Kurd) dixwazin havînan herin Aladax, zivistanan jî herin dora Firat. Belkî sedema belavbûnê û nebûna xwedî dewleteka mayînde jî ew mentalîte ye. Yanî bi azadî û serbestî di nava çiyayên xwe de jiyan. Yek sedem jî; şerê navxweyî bû. Bi birayên xwe Kurd yên jê re Pezgewr tê gotin re herdem di nav şer û tekoşînê de bûn.

Di sala 1417 an de Qere Yûsûf bi xwe çû ser Qere Yûlûkê Pezgewran. Jêderên Misir wiha dinivîsînin: "Di heman salê de hukumdarê Memlûk Melîk Mehmûdî çû ser Meletiyê. Lewra Meletî, Darende, Besnî, Kolik û Gerger ketibû destên serokên Kurd. Memlûkan dixwest dîsa bikin bin destên xwe. Mehmûdî, Kolik dorpêç kir û bihîst ku Qere Yûsûf, Yûlûk têk biriye. Bi ser vê de waliyê Helebê Koçkarê ku Gerger dorpêç kirî tirsiya û reviya.[110-97] Dewleta Pezgewr di sala 1403 an de li Amedê hatibû avakirin; karê wan ê destpêkê jî êrîşa ser Kurdên bi Beraniyan re tekîldar bû. Ji bo wê dora Amed û Çêrmûkê şewitand û gelê Çêrmûkê qir kirin. Di navbera Kurd û Tirkmenan de cûdatiya mezhebî hebû; Tirkmen şîî (Êlewî) bûn. Mirov dikare wiha jî bêje: Kurdên koçberên ku ji rojhilat hatibûn elewî bûn û Kurdên niştecîh jî sunnî bûn û di wê demê de em şerê herdûyan dibînin. Hukumdarê Pezgewran Ûzûn Hesen ji bo ku mîrîtiyên Kurdan ji holê rake, gelek sedem didîtin û Kurd bi Kurdan dida kuştin. Di vî karî de pir bi hostatî dixebitî. Kurd di destê xwe de kiribûn lîstik û çawa dixwest wiha dikir. Wek mînak: êla Çemîşgezek bi fêleka pir hêsan li hemberî êla cîran derdixist û bi hev dida kuştin. Serbazê Hesen Sofî Xelîl û Arap Şah êlên Çemîşgezekê xapandin û ajot ser êla Botan. Di navbera wan û êlên Dumelî û Dembillî de şerên bi xwîn derketin[19] Di sala 1416 an da Meletî, Darende, Besnî kete destê Tirkmenan. Gerger û Kahta jî dîsa ketin destê Kurdan. Di heman demê da Qere Yûlûkê Pezgewran, aliyê Mêrdînê talan kir 8 qele girtin û gelê 220 gundan koçberî aliyê xwe kir. Keçik birin bazaran bi 2 dirheman firotin. Qere Yûsûf derkete dû wî, ew jî reviya Helebê. Bi ser vê de Qadî yê çar mezheban û xelîfe fetwa dan ku bi vî **"Kafirî!"** re şer wezîfe ye. Bi vê re êlên mîna Înallû, Bayat û Avşar ku welatê Beraniyan talan kiribûn warê xwe cî hîştin û reviyan Tarablûsê.[110-99] Wekî di wê fetwayê de jî xuya dike, Pezgewran hêza misilmanan jî dane pişt xwe û êrîşî gund û bajarên




Beranî-Woods-1451

Kurdên Sersor dikin. Li vê demê jî durûtiya misilmanan eşkere dibe; ewên jin û zarokan direvînin li gorî wan ne kafir in, lê ewên ku wana diparêzin kafir in, lewra ola wan cûda ye. Ew jî sînorên kûr di nava gêlê Kurd û miletên cîran de derdixe holê.

Qere Yûsûf amadekariya şerê bi Şah Ruh re dikir ku li dora Tebrîzê di sala 1420 an de mir; bi ser vê de Ahmedê Qeremanî û kurên xwe çûn dora Gêncê. Hinek jêder dibêjin kurê Yûsûf jî çûye.(110-109) Gerokên Memlûk û Tîmûrî dibêjin: ew mirovekî dirêj, navpî pahn bûye û bi 40 jinan re zewicî û her yek jê di qesrekê de bûye. Dibêjin têkiliya wî bi ol re jî tunebûye. Yên mîna Îbn Hacer jî dibêjin ew zindiq bû.(110-114) Kurd êdî wata wan gotinan dizanin, yên ku ola xwe dişopandin û tevlî misilmanan nedibûn re her gotin serbest bû.

Piştî mirina Yûsûf em dibînin ku ji alîgirên wî yê herî mezin Şadî, li Nahçivan û Surmeliyê ne. Di vê demê de Çaxatay dîsa artêşeke dişîne ser wan. Di heman demê de Boybegê Qereman li dora Gêncê-Berda êrîşî tehsîldarên Çaxatay dike; Şah Ruh dîsa esker şandin ser wan. Di 1421 an de dîsa artêşa Şah Ruh û Beraniyan hate hember hev. Beranî di binê fermandariya kurên Yûsûf, Îspend û Îskender de bûn. Dîsa li milê rastê, serokê êla Şadî Pîr Huseyn, birayê xwe û serokê Alpagûtan Korkan û Sorkan hebûn. Li milê çêpe jî Îspend Mîrza hebû. Artêşa Beraniyan 30-40, ya Çaxatayan jî 200 hezar bû. Bi rojan şer kirin lê di dawî de Beraniyan şer winda kir.(110-121)

Cîhanşah îcaze da leşkerên xwe, ew şandin malên wan. Bi xwe û lawên xwe; Muhammedî û Ebu Yûsûf ve li deşta Mûşê ma. Di sala 1467 an de Hesenê Dirêj bi 6000 eskerên xwe ve ji nişkava êrîşî wan kir, hemû kuştin. Hesen bi êlên Beraniyan ve berê rêya lihevhatine bikar anî û Hecîlî bi Alpavûtan ve tevlî wî bûn.(114-175) Piştî rêya lihevhatine jî bi şer û komkujiyan xwest wana bîne cem xwe. Bi vî awayî dawî li dewleta Beranî hat. Kurdên di bin sîwana vê dewletê de gihîştibûn hev jî belav bûn. Hinek çûn Xorasanê, hinek berbi rojava û hinek jî tevlî Pezgewrên Kurd bûn.

## PEZGEWR
## (AQ QOYÛNÎ-BAYINDIRIYE)


Li ser navê wan jî zêde agahî tunin. Lê wekî xuyadike, di navê wan de jî dijberiya Beraniyan xuya dike. Çawa ji bo Beraniyan navê Qerekoyûn-lû-Pezreşan bikar anîne, ji bo Kurdên din ên misilmantî pejirandî jî ber êqsê wê Pezgewr bi kar anîne. Xwestine bi nav jî, beşekî Kurdan wek pisîka reş ê bê oxûr; beşekî jî spî, paqij û helal nîşan bidin. Di vê navkirinê de jî mirov cûdaxwaziya olî û siyasî dibîne. Doç. Îrahîm Yilmazçelîk wiha şirove dike: Li Ovacika-Dêrsîmê êleka bi navê **Pezkel (Pekevran)**=Topuzlu heye ku navê Pezgewran tîne bîra mirov. Êlên li Dêrsîmê di dema Hesenê Dirêj de li Amedê dijîn û wexta Tîmûr hate Anadolê ew jî çûn Dêrsîmê.(116-105) Bi dîtina min jî ew şirove raste, lewra tê wata ewên ku xwedî pezên kel/şax/siro in. Ji bo ku ew

êlên di vê konfederasyonê de cîh girtibûn jî pez xwedî dikirin û heta demên dawî koçber bûn, mumkune ku navê xwe wek birayên xwe Beranî ji pez wergirtibin.

Hemû dîroknûs û lêkolînerên Tirk ji bo wan jî dibêjin ew Tirk in. Ew yeka bi nûserên biyanî jî dane pejirandin. Lê bi qasî em didin îspat kirin, ew Kurd in; îhtîmal heye ku hinek rêvebirên xwe yan jî fermandarên xwe Tirk bin, lê bi dîtina min di Kurdbûna wan de ti şik û guman nîne. Ew di nivîsandina defterên kevn de jî xuyaye. Memûrên defterên **"Osmanli Tahrir" (defterên nifûsê)** herkesên li rojhilat û rojhilatê başûr dijîn wek "Kurd" nivîsîne. Ew yeka hertim tê ber me. Wek mînak di 1520 an de, di belgeyeka sencex û eyalatan dide xuyakirin de, Tûr Elî Begê Pezgewran yê derbasî xizmeta Osmaniya bûyî jî Kurd nîşan dide.(118-56) Prof. Unal ji vê belgê acizî û nerihetiya xwe bi vî awayî eşkere dinivîsîne ku ew jî îspateke, Prof. dîtina dewletê ya fermî nîşan dide û ji belgan re jî hûrmet nîşan nade.

Ûzûnçarşili dibêje: Êleka ji Xorasan û Ezerbeycanê di sala 1284 an de hatiye û li 1480 an de li Ezerbeycan, Amed û Xarpûtê hatiye dîtin.(31) Torî jî dibêje, di salên 1248-1291 an de ji Xorasan hatin Ezerbeycan. Dema hîn êl bûn di navbera Amed, Xarpût û Ezerbeycanê de dijîn. Dewleta Pezgewran ji alî Qere Yolûk Qera Osman ê birayê Begê êlê Ahmet ve hate damezirandin. Di sala 1452 an de jî Hesenê Dirêj (1457-1478) hat rêvebiriyê.(58) Piraniya nûseran dibêjin ew ji Xorasan hatin. Dema hatina wan bi hilweşandina dewleta Şadiyan ve nêzîkî hev e. Eger mirov bibêje dûmahiyên Şadiyane, ne şaş e. Li destpêkê ew wek êlêkê xuya dikin ku piştre êlên din tevlî wan bûne. Vê yekê John E. Woods jî sererast dike: H. Dirêj, hêzên ji êlên mîna Qere Osmanî, Pîr Elî Bayindir, Avşar, Emîrî, Bican, Haydarî, Îvaz, Mûsilî, Pûrnak û Koca Hecîlî li dora xwe komkirin û li hember Beraniyan kete tekoşînê.(114-143) Berî dema Hesen jî ew ji êlêkê zêdetir in. Ew êlên li dora H. Dirêj bi piranî dûmahiyên mîrîtiyane; yanî ewên ku ji federasyon, êlan veqetiyane. Dîtina nêzîkî rastiyê ya F. Sumer e: Pezgewr bi piranî ji du êlên mezin ên mîna: **Pûrnek û Mûsilî** pêk tên. Piştî wan jî Hamza-Hecî, Qere-Hecî, Emîrî, Îzzeddîn Hecî yan pêk dihat. Bi pêşketina wan re Tirkmenên Helebê (êleka mezin, Kûtbegiyê ji Avşar û ji Bayatan jî beşekî girîng), Dulqadir, Çepnî (Trabzon) jî tevlî wan bûn.(131-170)

Baysanoglû dibêje: Di dema Tûr Alî Beg (1340) de derketin saha dîrokê. Di kitêba wan ê fermi ya bi navê **"Kîtab-i Diyarbekriyye"** de wiha tê nivîsîn: Piştî Pehlewan Beg êlên Pezgewr li dora Elî kom bûn. Nêzîkî 30.000 malbat bûn. Bi salan li Amedê, ji sînorên Rûm, heta Şam, Misir, Cezaîr, Îraqê serok bû.(138-398) **Di alên wan de sembola miyan hebû**, girêdayî totema pez bûn, bûn misilman şûnde jî, dest ji vê totemê bernedan. Woods îddea dike, ku dîroka Pezgewran ji Oxûz destpê dike; paşê Bayindir Xan, Pehlewan Beg, Tûr Alî (1300-1360), Kûtlû .... Marîa Komnene (1360-1389), Ahmet (1389-1403), Qere Osman (1406-1435) û berdewam dike...bawer dikim jêderên wî jî nûserên Tirk in, lê Oxûz kalên Beranî û Pezgewran herdûyan e.




Dema Hesene Direj (1453-1478) û Sînûrê dewletê ye herî fireh

Firehbûna Pezgewran


Îspata vê Ebu Tihranî dide; dema Qere Yûsûfê Beranî ji mirina Tîmûr bi şûnde ji zîndana Sûriyê hate Kurdistanê, dixwest xaka xwe ku Tîmûr ji dest girtibû dîsa heyne. Yûsûf: Ji Doxerên (Têrikî, Bexdilî-Ş) li Diyarî Mûdar koçber, ji pismamên Dogera yên li Mêrdîn Îsa yê Artûqiyên niştecîh, ji Kurdên Zerikî yê Tercîl, Farqîn û Cizîrê; ji Silêmanî û Kurdên Botî artêşek ava kir. Wan koman dizanibûn ku ji bo cîhên wan ê li Sûriyê û Amedê Qere Osman xetereke mezine. Ji bo wê dixwestin bila Yûsûf êrîşî aligirên Tîmûrê Pezgewr bike. 20 rojan bi hevre şer kirin, lê yekî zora yekî nebir. Ebu B. Tihranî ji devê Yûsûf, mektuba ji Qere Osman re hati nivîsî de wiha radigihîne. Yûsûf: **"Em herdû jî ji koka Tirkmen in, ji bo vê em hewl nedin ku zora hev bibin, bihevre tekoşînê nekin**. Em herdû jî bi dijminê xwe yê li Anadol (mebesta wî Osmanî ne-Ş) û Tîmûrî re mijûl bibin. Ji bo te baştire ku tu êrîşî Sûriye û Anadol bikî; ji bo min jî Çaxatay in". Qere Yûsûf, ji vê peymanê re rîayet kir û di salên 1406-1408 de li hember Çaxatayan du caran biserket û ew ji warê xwe yî qedîm Ezerbeycanê avêtin.(114-85) Tihranî bi awayekî eşkere ji devê Yûsûfê Beranî vê namê radigihîne; ku ew yekbûna koka wan dide xuyakirin. Lê dema ku ew di nava hevkariyê de ne, pir hindik e; bi piranî bi hevre di nava şer de bûne.

Qere Osman bi Îskenderê Beranî ve li Nisêbînê di sala 1421 an de şer kir. Piştî sê mehan Qere Osman têk çû; Beraniyan û şaxekî Doxeran ew heta Amedê qewitandin. Piştî wî şerî, êla Pûrnek keçika xwe dan Qere Osman û bi wî awayî Pûrnakî di bin serokatiya Kûh Ahmet Beg de tevlî Pezgewran bûn.(114-90) Ew zewaca girîng e, lê em nizanin sedema vê çi ye; bê guman vê gelek hêz da Pezgewran û piştî vê jî êdî ew mezin dibin. Ew parçebûn û nakokiyên navbera Kurdan yê vê demê heta roja îro hema hema bi vî rengî jî berdewam dike. Wekî êlêk dijminatiya xwînê ya din bike. Ew rewş di nava laşê Kurdan de bû vîrûsa ketî xwînê…

Yek ji lêkolînerê ku li ser Pezgewran nivîsî Woods e, niqtên balkêş derdixe holê, lê ceserat nake ku derbasî dervayî sînorên Tirkan bibe. Dibêje, di salên 1435 an de di nava cografya Îslam de, konfederasyoneka êlan ya nîvkoçer bê ehemiyet bû. Paşê ji Heratê heta Qehîrê û Bûrsa navê xwe belav bû. Her çiqas paşmayî be jî, dewleteka burokratîk ya Îranî-Misilman bû.(114-96) Li gelek cîhan dibêje ew Tirkmen in, lê li wir jî dibêje ewê Îranî-Mûsilman in. Îranîbûna wan Kurdbûna wan e. Dîsa tîne ziman: ku ji artêşa Pezgewran, ji sedî heftê eskerên êlan pêk dihat û şiklê artêşa êlan dida.(114-188) Ku bi temamî raste, lewra ew konfederasyona êlên Kurd bû, wek kevneşopiyê, her êl jî di bin fermandarê xwe de eskerên xwe birêve dibirin û di asta jor de jî girêdayî begê zendê yan jî Mîrêmîran bûn.

Hesenê Dirêj li destpêka dîroka xwe, li hember êlên Kurd riyên aştiyane bi kar dianîn; wek Osmaniyan bi riyên aştiyane, zevac, ol, şantaj û suîkastan xwest Kurdan bikişîne aliyê xwe. Piştî bi hêz bû, riya darê zorê derxist pêş. Bi Kurdên Bûldûkanî, Zerikî û Çemişgezekî re rêyeka aştiyane şopand; lê êlên li Eyûbî-Malikan, Rizagî û Botî re jî darê zorê derxist pêş.(114-189) Ew kîn û dij-

minatiya birayê xwe pir di kûr de ye û mirov ecêp mayî diminê ku Kurd pir hindik hatine guhartin. Di roja îro de jî, wekî wan rojên di dîrokê de pêk hatibûn, Kurdên xwedî îdeolojiya olî wek Pezgewran tevdigerin, di îcaza dijmin de ne û zirarekê mezin didin dîroka miletê Kurd. Wekî dîrok ji nû ve dibe… Ew hişkbûn û kîn di navbera Beranî û Pezgewran de jî xuya dike. Lê Beranî hîn hembezkar û aştîxwaz in; ber eqsê wan Pezgewr hîn zêde zalim û xwînrij bûne, ku tim dixwestine mîrîtiyên Beraniyan ji holê rakin.



Aq qoyûnî-Woods




**Hesenê Dirêj**

Berovajiya Beraniyan, Pezgewran mîrîtiyên Kurdan ji holê radikirin; ew ne ji bo nijad e; sedemê vê mezheb bûye. Her çiqas Ehl-î Heq ne ola Beranî ya fermî bûye jî, ji vê olê re toleranseka mezin hebûye. Ji bo vê Prof Sumer dibêje: ola wan ê fermî ne Şia bû, lê ew jê re germ û bi sempatî bûn. Wexta desthilatdarê Bexda Esfehan Mîrza mir, ew li ser navê 12 îmaman xutbe xwendin û sikke derxistin. Di vî warî da Mînorskî viha dibêje: Şîayên fundemantelist ji 12 îmaman hezdikirin li Ezerbeycan, Anadola Navîn, Mûsil, Dîlok, Loristan (welatê Goran) ê belav bûn. Waîzciyê "Ehl-î Heq" bandora xwe li ser wan dikir. Ev bawerî ji dema Beraniyan tê...

Hesenê Dirêj di sala 1470 an de Xorasan heyna û Yadîgar Mîrza wek Hukumdar tayîne wir kir. Piştî salekê Siltan Huseyn Baykara bû serokê Xorasan û Hesen bi wî re peymana aştiyê îmze kir û dev ji heynana wir berda. Piştî ew alî çareser kir vegeriya aliyê Sûriye, lê bi serneket. Fetîhkirina dora Bedlîsê ji dabû Silêman Begê kurê Bîçen.(138-427) Bîçeran li Xorasanê hene û nêzîkî Sêvika-Reşiyan xuya dikin.


DI DEMA KARAYOLÛK OSMAN DE PEZGEWR
DERYA RES
Trabzon
1421
Karahisar
Sinuç
Bayburt
1421
Akşehir
1421
1429
Erzincan
Erzurum
1434
Sêwas
Tercan
Kemah
1410
Kiği
Çemişgezek
1423
Palu
Harput
1429
Ergani
Meleti
Egil
Silvan
1424
AMÎD
1403
Hisn-Keyf
Cizre
MÊRDÎN
1432
Ruha
1406
Bîrecîk
Nusaybin
Heleb
Musul
Kağızman
Eleşkert
Alıncak
Erciş
Ahlat
WAN
BEDLÎS
Marand
Salmas
Tebriz
Herêma yekemîn carê zend û êlên Pezgewr (1390) lê bi cîh bûyî

Pezgewr

Beysanoglû dibêje êlên ku Pezgewran pêktînin ev in: Pûrnek, Mûsilî, Koca Hecî, Hamza Hecî, **Tabanî**, Ahmetî, **Îzzeddîn Hecî**, Haydarî, Emîrlû, Yurtçû ne.(138-397) Li ser vê babete îddeayên cûda hene. Lê Bayindir, Mûsilî û Pûrnek komên xwe sereke ne. Yên di dereca duyemîn de jî ev in: Şêxan, Silêman Hecî, Çavûndûr, Dodûrga, Doger, Karkin, Avşar, Bexdîlî ne. Wana bi ser dagirkirina Moxalan de, di dawiya sedsala XIII an ji Xorasanê hatine Ezerbeycan û di dawiya sedsala XIV an de jî, hatin dora Elezîz û Amedê û bi taybet dora Erxaniyê bi cîh bûn. Bi belavbûna dewleta Beraniyan re, ji wan gelek çûn Îranê û li wir bi war bûn.(138-397) Yên çûbûn Îranê di avakirina dewleta Safewî de cîh girtin. Di serdema Sefawiyan û piştî wan jî hebûna xwe parastin. Yên li Anadolê mabûn jî jiyana xwe dîsa bihevre berdewam kirin û di belgeyên Osmanî de ji wan re **"Boz Ûlûs"** dihate gotin. Ji sê milan pêk dihatin: **Pezgewrên esil yan jî milê esas, Tirkmenên Helebê û Dulqadir in**. Boz Ûlûs ji ber aloziyên siyasî di destpêka sedsala XVII an de (1022/1607) koçî Anatoliya Navîn kir. Ji wan pir hindik li Amedê man û ji wan re "Boz Ûlûs Mandesî-bakiye" dihate gotin.(138-397) Boz Ûlûs gelek caran cûda tê şirovekirin; gor demê naverok yan jî êlên girêdayî têne guhartin. Mumkune ku ew îddea jî rast be. Lê di demên din de jî ew cûda ne. Boz Ûlûs bi piranî ji bo êlên mîna Têrikî û Zerikî tê bi kar anîn. Lê dema hatin Anadolê Canbeg û yên din jî di navê de ne. Tirkmenên Helebê jî bi piranî Reşî ne.

Ahmet Ozer, ji Arvasî radigihîne ku; di nava Pezgewran de êlên mîna: Bayindir, Pûrnek, Mûsilî, Hamzahacî û Gedîn Hecî yî hene.(78)

**Woods êlên Konfederasyona Pezgewran wiha şirove dike:**

**1. Avşar:** Di sedsala XIV an de li bakûrê rojavayê Sûriyê em rastî wan tên. Li wir beşekî Tirkmenên Helebê (Reşî, Sewêdî…) pêk dianîn. Li destpêkê ji ber waliyê Helebê Cakam û siyaseta wî ya li dijî êlan direvîn; di sala 1407 an de xwe avêtin paş Qere Osman û ji ber wê bi Pezgewran re tên girêdan. Lê xuyaye ku di sala 1418 an de ew vegeriyane welatê xwe yê li Sûriyê.(114-325) Dema min unîversîte dixwend ji vê êlê hevalê min Mehmet Avşar hebû, bi xwe ji gundê Deşta Amîkê-Hatayê bû û di her alî de wekî me (Reşî) bû ku di Kurdbûna wan de guman nîne.

**2. Bûldûkanî-Mirdêsî:** Mirdêsiyê Kurd navça Exilê ya li bakûrê Amedê kiribûn kontrola xwe. Dewletşah Bûldûkanî bi Qere Osman, Hesenê Direj û zavayê wî kurê Hesen Elî re baş debar dikir. Dema Pezgewr li Îranê hilweşiyan Mirdêsî berê, di sala 1504 an de ketin bin destên Dulqadiran; piştî çend salan jî li hember Sersoran ketin tekoşînê. Piştî Osmaniyan ku di sala 1514 an de Kurdistan heynan, şaxekî Mirdêsiyan keleha Palûyê heynan û kontrol danîn ser riya Bozûlûs.(114-330) Li navenda Anadolê û gelek cîhên din hene ku Kurd in.

**3. Çakirî-Çakirî:** Bîstam Begê Çakirlû alîgirê Qere Yûsûfê Beranî bû; li hember Tîmûr li Ezerbeycanê şer kir. Serleşkere Beraniyan û serokê

Erdebîl, Kizilaxaç, rojhilatê Ezerbeycan û Mûganê bû. Paşê beşekî mezin tevlî Pezgewran bûn.[114-330] Di dema Beraniyan de, Çakirî ji Erdebîlê heta Mûxanê hakim bûn. Gor Îbn Arab Şah ew êla Kurd e.[112-2]

**4. Melkişî-Çemîşgezekî:** Di sala 1456 an de tevlî Pezgewran bûn. Hesenê Dirêj bi keça Suhrab Begê Melkişî re zewicî. Piştre tevlî Sersoran bûn. Kurd in.

**5. Qeremanî:** Di serdema Pezgewran de navê du grûban derbas dibe. Yek: Ji Hesenê Dirêj alîkarî xwestin û xwe avêtin paş wî, ku koma rêvebiran bû. Cara dawîn navê Qasim Begê Qeremanî di sala 1478 an de derbas dibe. Koma duyemîn jî: Li destpêka sedsala XV an de, li Berda-Gêncê bi cîhbûn ku neviyê Emîr Qereman bûn. Piştî belavbûna Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Cara dawî di şerê Xoy, sala 1478 an de tên binavkirin. Paşê tevlî Şah Îsmaîl bûn.[114-336] Kurd in. Li Xorasanê Kurdên herî xas ew in û hîna jî kevneşopiyên Kurdî dom dikin.

**6. Mûsilî:** Di milê çepê ya artêşa Pezgewran de êla bingehîn bû. Ji wan Emîr Beg serleşkerî kir. Birayên wî Sûfî Xelîl û Bekîr Beg hatin şandinî Arran-Şakkî û Esterabad. Şaxekî Mûsiliyan li Amed û Armeniyê man û di hejmartina nifûsa sedsala XVI an de di nava Bozûlûs te hatin hejmartin.[114-340] Îhtîmale ku Têrikî yan jî Lerî-Şêxbizinî bin.


**7. Tabanî:** Carekê di belgeyên Pezgewran de derbas dibin, di belgeyên Osmaniyan de jî berê li nava Bozûlûs, paşê jî li Anatoliya Navîn qeyd bûn. Têrikî yan jî Zerikî ne.

**8. Dulqadir:** Bi piranî bi Pezgewran re şer dikirin, lê carna serokên wan diketin xizmeta reqîban. Beşek di şerê ser Dicle de tevlî Hesenê Dirêj bûn. Beşek tevlî Şah Îsmaîl bûn û Pezgewrên li Îranê rûxandin. Kurd in û beşekî ji wan niha li Gîlanê dijîn. Ew bi serê xwe artêşa Rûs dabûn sekinandin û ji Gîlanê avêtibûn der.

**9. Zerikî:** Kurdên Tercîl, Atak-Hatak, Nûşad, Ayndar li destpêka ber eksê cîranê xwe Mirdêsî li hember Pezgewran heta sala 1446 an şer kirin. Di sala 1446 an de Hesenê Direj bi keça Omer Bege Zerikî re zewicî, lê dîsa jî heta 1460 stû xwar nekirin. Di sala 1504 an de Amed ji alî Sersoran ve hate dagirkirin, Zerikiyan desthiladariya wan hema qebûl kirin.[114-344] Kurd in. Niha jî li gelek deveran belav dijîn; li sînorê bajarê Eskîşehîrê gundekî xwe yê bi navê "Zerika" heye û min ziyaret kiribû. Li derdora Qastamonû, Sêwas, Semsûr û Xorasanê jî hene. Ew êl û federasyona êlan e ku Woods hejmartibûn bi temamî Kurd in, ew îspateke ku Pezgewr jî Kurd in. Lê mumkune ku di rêvebiriya dewletê de miletên din hebin. Lewra di gewherê dewletê de dijminetiyeka Kurdan bi taybet jî yên Sersoran heye. Kaniya vê dijminatiyê dikare dîn be.

Heman nûser diyar dike: ku êlên konfederasyonal hêza esasî ya dewlêta Pezgewran pêk dianîn. Dewletê ji êlan, ji koçberan û nîvkoçeran dewşîrme digirt, perwerde dikir, meaş dida û ji wan **'Hêzên Hasedsala'** pêk anîn; yanî mîlisên kral; bi vî awayî balans di navbera êl û dewletê de çêkir.[114-20]

Nikteyeka girînge; tê wê watê ku dewletê bi êlên Kurd bawerî nedianî û bi rêya dewşirman dewlet li ser piya girt.(114-19)




Parçebûna Aqqoyûniyan

Piraniya nûser û dîrokzanan van êlên li jor girêdayî Pegewran dest nîşan dikin û piraniya wan Kurd in. Di vê de ti şik û guman nîne. Wisa xuya dike ku êlên Kurd li destpêkê dewletên xwe yên serbixwe avakirine. Piştî şeran û lawazbûnan ew di nava komên mîna Beranî de gihîştine hev. Piştî rûxandina wan jî êdî ew hîn zêde parçe dibin. Hinek dikevin nav êlên Pezgewrên sunnî û hinek jî dewleta Safewî ava dikin. Gelek caran jî di nava Osmanî û Pezgewr û Sefawiyan de hatin perçiqandin û belav bûn.

Di destpêka ve beşê de jî min gotibû, li Dêrsîmê hîna jî êla Pezgewran heye.(151-132) Di vê berdewambûna dirêj de jî xuyayê ku ew Kurd in.

## Di Serdema Osmaniyan de Ferman û Komkujî

Di serdema Osmaniyan ya duyemîn de, yanî piştî salên 1500 û bi avabûna dewleta Sefawiyan re, li Anadol û Kurdistanê gelek nerazîbûn, şer û serhildan derketin holê. Li her demê Osmaniyan li hember wan serhildanan fermanên komkujiyê derxistine, Kurd kuştine û malê wan talan kirine. Ew yeka bi zimanê tirkî wek: **"Baş kesî, mal yaxmî"** yanê serê wan jêkin, malê wan ji dest bigrin tê formule kirin. Piraniya ew Kurdên bi wan qetlîaman re rû bi rû mabûn jî Kurdên îro li dervayê welat dijîne. Ew Kurdên ji ber zilma Osmaniyan reviyabûn bi piranî li Arranê kom bûbûn, ku ji wan re Sersor dihate gotin.

Hesenê Direj ê Pezgewran jî, ji wan û tevgera wan ditirsî û bihîstîbû ku li bakûrê welatê wî, yanê li Ezerbeycan û Arranê propaganda Şîatiya Rafizî tê kirin. Di nav êlên Tirkmen de ew propaganda dibû ku dewleta Hesen jî li ser hêza wan hatibû avakirin. Ditirsiya ku ewê li dijî dewleta wî ya sunnî derkevin û dijminatiya wî bikin. Wek tedbîra yekemîn mezinên wan û şêxê wan kurê Îbrahîm Safewî Cuneyt ji welatê xwe avêt.(138-416) Hesen di fikarên xwe de mafdar bû, bi rastî jî ewê li dijî wî û Osmaniyan tekoşîn bidana.

Piştî Şah Îsmaîl dewleta Sersoran avakir û gelek derwêşan li Anadolê di nav êlên Kurd de propagande kirin, hezkiriyen Şah Îsmaîl zêde bûn. Wek Pezgewran, Osmaniyan jî tedbîr werdigirtin. Ji bo ku gelê Kurd li Anadolê neçe alî Şah, yên nêzîkî sînoran koçî cîhê ku nû zept kirî dikirin. Yanî dixwestin Kurdan ji hev veqetînin. Wek Alî Kemal jî tîne ziman: Bi taybetî Elewiyan gelek sempatiya xwe ji Şah re hebûn. Tê gotin Selîm berî ku bi Şah re di nava şer keve, ev mirovên nêzîkî wî hemû dane tespîtkirin û dema çû şer jî ew gelê li ser riya xwe yê Elewî hemû di şûr re derbas kirin. Ev komkujiya 40 hezar mirovî taybetî li bajarên mîna: Qirşehîr, Enqere, Çorûm, Yozgat, Meletî, Elezîz, Dêrsîm, Ezingan, û Bîngolê bû. Leşkere xwe çûn ser Baybûrt û Kemahê û bi gelek xenîmet vegeriyan. Selîm, Ferahşah şand ser begê Tercanê yê Sersor û beg Emîr Ahmed dîl girtin.(25) Ewên ji ber reviyabûn jî, çûn çiyayen bilind ên mîna Ezingan, Pulumur, Dêrsîm û Bîngolê. Li cihê wan ê vala bûyî jî kesên ku yarmetiya Selîm kirin hatin bi cîh kirin. Dema Selîm nêzîkî Qeyseriyê bû xeber

ji hukumdarê Dulqadiran re şand ku bila bi hezên xwe ve tevlî artêşa Osmanî bibe. Lê hukumdar Alaaddewle vê daxwazê red kir û xwe bê teref îlan kir. Piştî şer Selîm ê êrîşî wê mîrîtiyê jî bike.

Ji şêre Çaldiranê bişunde Yawûz vegeriya Amasyayê û li wir bi 28 mîrên Kurdên ku rêberê xwe Îdrîsê Bedlîsî bû re civîn çêkir û bi wan re peymanek mohr kir. Ew peymana ji sê bendan pêk dihat:

a-Rêvebiriya mîrîtiyên Kurdan wek berê, bi çand û kevneşopiya wan ê ji bavan ve mayî, ji bavê derbasî lawan bibe û ewa bi vî şiklî berdewam bike.

b-Mîrên Kurd, parazvanên sînorên Kurdistanê ne, lê eger Osmanî bi welatêkî din re bikevin nav şer, Kurd ê bi leşkerên xwe ve herin alîkariyê; Osmanî jî bi wan re alîkar bin.

c-Mîrên Kurdan her sal bi navê diyarî hinek dirav ê bidin xezîna Osmaniyan. Di vir de tiştê balkêş ev ê ku bi nermî terin ser Kurdan, mafê wan nas dikin û baca ku Kurd bidin jî wek "diyarî" hatiye binav kirin ku ew ji Osmaniyan dûr nekevin. Yekî jî 28 mîrên Kurdên beşdarî civîna Osmaniyan bûne, diyare ku yên din ên li dijî Osmaniyan û hevkarê Sefawiyan bûne. Bê guman Şah Îsmaîl jî gelek şaşitî kirin û Kurd avêtin hembêza Osmaniyan. Wekî tê zanîn, 13 mîrên Kurd çûn cem şah û girêdana xwe bi wî re diyar kirin. Lê ji ber sedema fitneyên hebûn, Şah ew girtin û avêtin zîndanê. Yek ji wana jî serokê êşîreta Heskîfê Emîr Xelîl bû. Ji sê salan zîndanê şûnde rêviya û hat welatê xwe. Di tunebûna wî de, êlên mîna **Zerikî, Şêrvan** û yên din ên girêdayî Heskîf, bûn yek û kurê Emîr Xelîl, Silêman anîn ser hukum. Ji wan êlan **Reşan**, pismamê Emîr Xelîl yek anîn ser text.[58] Di wê demê de, di nava wan êl û federasyonan de ji bo serokatiya mîrîtiyê pirsgirêk û alozî derdikevin û beşek ji wan êlêna ji mîrîtiyê vediqetin.

Di vê dema şer û aloziyan de Osmaniyan elên bi hêz gor pêdiviya xwe bi cîh dikirin. Piştî şerê Çaldiranê yê li sala 1514 an, Îdrisî bi alikariya Selîm êla Hayderan û yên bi wan re girêdayî û bûbûn yek, ji bo ku Osmaniyan li sînorên xwe yên nû yê bi Gurcistan, Îranê biparêzin derbasî jorê, Ermenistanê kirin.[17] Ew êlana ji bo ku her tim wek mîlîsan kar bikin ji bacê hatin rizgar kirin. Gorî Lynchê êlên Kurdên li Ermenistan ev in: Zirekî, Cibran, Hesenan, Heyderan, Ademan, Sîpkan û Mamakan in. Hinek dîrokzan, Cemedanli û Celaliyan (Kotan, Soran, Saxan, Hesenan, Keçanan, Dûtkan, Kapdekan û Cinankan) jî tevlî van dikin. Hîna jî êlên Celalî li wê herêmê û bakûrê Kurdistanê hene. Bi dîtina min Saxan jî gereg bibe Sakan. Lewra di nava Celaliyan de Xelikan li milê çepê; Saka jî li milê raste şer dikirin; ji bo vê ji wan re Saxan tê gotin.

Ş. K. Seferoglû dibêje: Kurmancên li Anatoliya Navîn, ji alî Yawûz Selîm ve, ji şerê Çaldiranê yê li 1514 an de bi şûnde hatin şandinî rojhilatê Tirkiyê. Ji van re êlên Tirkmen jî digotin. Di dawî de vana, di belgeyên Osmaniyan de Aydin, Sarûhan û Kutahya wek niştecîhên **"Taîfên Tirkmen"** têne nîşandan.[91-68] Tê zanîn ku êlên mîna Cibran, Qerekeçî ji alî Yawûz ve ji Kurdistanê re hatin şandin. Di gelek jêderan de Cibran wek "Boz Ûlûs" tên nasîn û yên di nava

van de yên em nasdikin jî Zerikî û Têrikî ne. Qerekeçî niha li Serê Kaniyê-Ceylanpinarê dijin; hinek êlên mîna Şêxikan, Mûsikan û Rûtikanê ji wan veqetiyabûn niha li navenda Anadolê dijîn. Di heman demê de êla Qoçgirî jî li alî Zara hatibû bi cîh kirin. Hinek jêder jî dibêjin ew ji alî Qanûnî ve hatine bi cîh kirin: Bi fermaneke re êlên ku çûbûn çiya dawetî çandiniyê kirine. Ev belav kirina ji seferê Bexda yê bişunde bû û gorî vê: **Êla Qoçgîrî çû Zara**; Şahdelî çû Kixî û Palû; Îzol û Hîran hatin Pertekê; Balaban çû çemê Balaban; Şahveliyan, Kimsoran, Hamoçik jî çûn deşta Tercanê; Hormek çûn Nazîmiye-Civarik. Dîsa Balî yê girêdayî Hormeka jî çûn gundê Kiriktaş, Gurelik, Alacahanê girêdayî Refahiye û Halitler; Gawiryûrdû û Eskikonaka girêdayî Kûrûçayê.[17] Bi dîtina min ew hîn rastire. Lewra Qanûnî, piştî komkujiyên Selîm demekê polîtîkayeka bi vî rengî şopandibû.

Osmaniyan, Mekke û Medîne dagir kirin bi şunde, mîrîtiyên Kurdan yek bi yek ji holê rakirin. Gelek caran jî ji bo Elewiyên-Sersorên alîgirê Şah Ismaîl û yên ji wî re sempatiya xwe heyî re fermanên komkujî derxistin. Ji bo vê di navbera salên 1558-1591 an de gelek ferman derxistin û zordariyeka mezin li ser Kurdan dom kir. Ji van fermanan emê çendikan ji bo giringiya wan binivsînin. Bi taybetî jî evên li ser êlan derketine balkêş in:

**1. Ji Bege Bozok ê re!** Ew ên ku naxwazin nimêja Înê bikin û guhdarî bikin re ye! Li Huseynabadê 3-4 mizgeft hene, lê ji sipahiyên Bozdoxan hinek alîgirên Huseyn û Kaya Buken, Yol Kûlû Yakûb û Xizir Şahê bûne Rafizî; aligirên wan pêwîste hema bêne girtin û cezaya wan çi ye bê dayîn! Sal: **1568 Selîmê II.**[17-133] Li Amasya navça Bûdakozu Silêman Fakih bi kesên din re cîvînan çêdike û gel teşfîkê zindiqiyê dike. Eger ew raste, wî û ewên bi wî re di nava têkiliyê de ne, bi veşartî di çemê Kizilirmak de bifetisînin![112-79]

**2. Ji bo Sersorên bajarên Merzîfon û Amasya bên cezakirin!** Ji Qadiyê wan bajaran re! Li herêma we kesên bi navê Wahap Dede, Mehmet û Weliyên Sersor hebûne; ewên ku gelê herêmê dikine bin bandora xwe, serokê wan bûne û bi gelê girêdayî xwe ve cem û cemaatê dikine. Dema ev fermana min gihîşt destên we, ewana bigirin û cezaye munasip bide wan! **1570 Selîmê II**.

**3. Ji bo Qadiyê Qastamonû -Kure û Taşkopru- Ji bo kesên Kizilbaş!** Ew kesên …… hana bi şev diçine maleke û li wir cem û cemaatê dikine; tembûr lêdixine û araqê wedixune, bihevre şa dibine; piştre jî şemdanan vedimirînin û bi jinên hev re dikevine munasabetê…Hema fermana min bîne cîh, lîsta wan bişîne… 1571 -Selîmê II.

**4. Ji bo ku Sersorên Nîksarê werin heps kirin.** …kesana bigirin, navên wan li deftera **"Sûrhûser"** sersoran binivisînin û wek mehkûmên deryayî ji me re bên şandin. **1572-Selîmê II**.

**5. Ji bo ku Sersorên li Amasya, Ladik û Havsa werin girtin**-1574-Selîmê II.

**6. Ji bo waliyê Çorûmê!** Fakih Weliyê ku Sersor û Rafizî tê nasîn 34 cîldên pirtûkên Rafiziyê anîne û bi veşartî li gel belav dike. Kesan bigirin û

pirtûkan îmha bikin. **1576-Mûratê III**.

**7. Ji bo Begebegên Dulqadirî û Qadiyê Elbîstanê!** Di herêma we de kesekî Sersorî bi navê Abdal xwe wek serokê Elewiyan dihesibîne û bi civaka Elewiyan ve di pêywendiyê germ de ye. Dema ev fermana kete destê we wî kesî bigirin û ji dadgehê şunda bikujin!." **1577-Mûratê III**.

**8. Ji bo Qadiyê Artûkabad û Zilê ku kesên bi Îranê re tekildar werin ceza kirin!** Li herêma we Rafizi gelek bûne û li gundan cem ê dikine. Ji kesên beşdarbûyî 1500 sîkke yî komkirinê û teslîmî aligirê Şah, Mansûr Xelîfe bûye. Deftereka ji bo 3000 esker kom bibe hatiye amadekirin û li ser navê xelîfe şûrê banatî dane. Cem û cemaate kiriye... dema ev ferman kete destên te; ji bilî kesên mezheba sunnî, yên din ceza bikin! **1579-Mûratê III**.

**9. Ji bo Qadî û begê Amasya re!** Li bajarokên we mîna: Çorûm, Zile, Tûrhal, Îskîlîp, Osmancik, Artûkabad, Huseynabad, Guleş, Ortaparê, Înebazari, Mecitozu, Qerehîsari, Katar, Demîrlû û Havesa cem û cemaat dikine.... Nimêj û selatê nizanin; navên Ebûbekir, Omer, Osman li zarokên xwe nakine...Ji bo cezakirina Qizilbaşên li wir ev emra mine! **1583-Mûratê III**.

**10. Li Meletî kesên ku ji mirovê li ser navê Şah Îsmaîl derketî holê re diyariya dişînin pêwîste werin qetilkirin! Ji begê Meletî re!** Cemeetê (êlên) bi navê: Îzlû (Îzol-Îzdigan), **Rişvan (Reşî)**, Eşkan, Solak, Şêx Huseyin, Soydan, Exirbuk, Adak, Kalaçak, Bezki, Çakal, Mihriman, Qeresaz, Komur yê girêdayî wilayeta we, kesê (heydût, şakî) li ser navê **Şah Îsmaîl derê holê ketî** re qurban şandine û xulamtî kirine. Kesê bi navê Mehmet e ku ji me re gote; em fermanekê dişînîn ku gihîşte destê we, ji nav ew êlên li jor navê xwe derbas dibin, kesên ku xulamtiyê dikin **Rafizî** ne; wana derxin holê bigrin û cezê wan bidine û sicîlê nivîskî ji mera birêbikin. Ferman dibê! **2.Recep 986/1578-Mûratê III.** (Kurê Selîmê II ya yê kurê Qanunî ye. Pênc birayê xwe kuştin, Tiflîs û Fas hat heynan).

Bi vî rengî bi dehan fermanên din hene, beşekî mezin jî em nikarin bi dest bixin. Bi avabûn û firehbûna Osmaniyan re paralel, fermanên wek vana bi sedsalan bûn sedema Kurd kuştina sîstematîk, ku heta roja îro berdewam dike. Di fermana dawî ya me li jor dayî de navê hinek êlan derbas dibe: Wek Îzlû ku ew êla wek Îzol û Îzanlû derbas dibe. Îro Îzanlû li Xorasanê, Îzol jî li dora Maden-Amedê dijîn. Reşî jî hema hema li her cîhekî Kurd lê dijîn hene. Komurlu li Semsûrê û Xorasanê ne. Yên din ji bo ku nav hatine guhartin em nikarin tam tespît bikin. Ji vê jî tê xuyakirin ku ew êlêna (yan jî beşek ji wan) sala **1578 an li Meletî bûne**. Niqta din ê girîng jî ew aligirê Şah Îsmaîl, yanê **Sersor-Qizilbaş** in û ya din jî ew rastî komkujiyê hatine...Ew her sê xal îro ji alî Kurdên me ku bûne sunnî ve nayên pejirandin; lê qebûl nekin jî ew rastiyeka dîrokî ye û di van sedsalên dawî de guhartinên pêk hatî re mirov nikare çavên xwe bigire. Ji bo rabirdû ew tespîteka girînge. Ji alî din ve, heta roja îro jî ew niqtên me hejmartin dibin sedema kuştin, koçber kirin û zîndan kirina Kurdan. Piraniya wan êlan em **ji sala 1519 an vir ve li Gerger-Besnî-Semsûrê**

**dibînin.** Heta salên 1524 an em ji defterên nifûsê dizanin ku li vir in. Lê di sala 1536 an de em li wê herêmê nabînin. Tenê li dora Kolikê-Kahtayê hene. Mirov dikare texmîn bike ku ewên Kolikê yên niştecîh in, yên din jî koçber in.

Piştî ewqas ferman, êrîş, kuştin û şêlandina Osmaniyan, nerazîbûn zêde bûn û wek muxalefet-dijberî tevgera Celaliyan (1595-1610) destpêkir. Gor dîtina min, ew muxalefeta vê tevgerê heta roja îro dom dike, lê vê carê bi mentalîteka hîn pêşketî û hîn bi îsrar. Wê demê ji hemû serhildanên cûda cûda derketî re Celalî dihate gotin; sedema vê ew bû, ku serokê serhildana destpêkê Celal bû, paşê ew hemû di qarekterekê de bûn. Yanê felsefe, siyaset, ol û bingehê wan ên civakî yek bûn.

Ji ber hovitiya Kûyûcû Mûrat Paşayê Osmanî 20 hezar Kurd reviyan rojhilatê Kurdistanê û çûn cem Xanê dest bi zêrînê Mûkrî (Bradost). Lê ew jî bû sedema gelek nexweşî û nakokiyan. Di vê demê de, bi taybetî jî di dema wî paşayê xwînxwar de Kurdan zirarê mezin dîtin û ji axa xwe veqetiyan. Hoko dibêje; li hember serhildanan, Osmaniyan jî di salên 1603-1617 an de ji bo ku Kurdan ji welat derxin ferman derxistibûn.[32] Pêwîste ew hîn zû be, lewra Kurdên Reşî di sala 1601 an de şandibûn Gîlanê. Beşek ji Kurdên Celalî yên ku ji Anadolê derxistibûn, ji ber dijminatiya Sefawiyan a ji Osmaniyan kêm neyî ji Îranê dîsa vegeriyan. **24.000 mal bûn û li Kutahya, Eskîşehîr û li Menteşa Qastamonû bi cîh bûn.**[32] Gor defterên Osmaniyan wê demê, komên wek Boz Ûlûs tên binav kirin, berbi rojavayê Anadolê çûbûn. Heta gelek ji wan heta Îzmîr û Kuşadasiyê çûbûn. Gor texmîn dikim û hinekê jî bi îspat dizanim ew: êlên mîna Canbeg, Têrikî, Zerikî û yên din in. Yên li wan deran mabûn îro bûne Tirk, yên din jî vegeriyan nava Anatoliyê.

Di sala 1611 an de Şah Ebbas ji Osmaniyan aştî xwest û ew yeka pêk anîn. Di vê salê de Kûyûcû Mûrat Paşa yê ku Kurd dikirin bîra mir, cîhê wî Nasûh Paşa derbas bû. Ew jî mirovekî xwînxwar bû, bi waliye Amedê ve ji êlên serhildêr penc hezar jin û zarok kirin şikeftê û bi agirê li ber deriye şikeftê vêxistî hemû dane fetisandin. Peymana 1611 an ku hatibû îmze kirin, bi şerê di sala 1615 an de dawî lê hat. Damat Mehmet Paşa di vê biharê de çû ser Îranê. Emîrê Kurd Seyît jî çû ser Erîvan û Ahcûhanê lê nikarî heyne. Di navbera Kurd û Tirkan de gelek caran şer derketin û her rûpelê dîrokê bi xwînê hatiye nivîsîn. Di sala 1616 an de serokê êla Mililan Îbnî Gazî Beg êrîşî keleha navça Salmasê Karniyarik kir. Bi ser vê de waliye Tebrîz Pîr Bûdak Xan êrîşî ser Mililan kir û bi ser vê de Gazî Beg ji êlên Kurd û begê beganê Wanê Mehmet Paşa alîkarî xwest. Wî jî ji serokê waliye Hoşabê Zeynel Xan û der dora 10 hezar leşker komkir çû alikariyê û leşkere Pîr Bûdak têk birin. Vê bûyerê li Ezerbeycanê tirseka mezin derxist holê. Leşkere Şah Ebbas di 1617 an de heta Wanê hatin û her der wêran kirin. Di vê salê de sadrazamê Osmaniyan bi birek leşkerên Tatar ve hate Amedê ku zivistanê derbas bike. **Di 27 Îlon 1618 an de di navbera Osmanî û Îraniyan de peymaneka nû** hat mohrkirin. Ew peymanên hatinî kirin hemî li hember berjêwendiye Kurdan bûn. Di dema

Nadir Şah de (1727) êlên li Xorasanê yên mîna Çemişgezek û Qereçor bi Ozbekan re şer kirin. Paşê Şah ew ajotin Meşhedê û gelek jî jê kuştin.(19)

Di sala 1607 an de begê Kurd ê bi navê Canpolatê ku navenda xwe Kilîs bû, li dijî Osmaniyan serî hilda, lê li dijî artêşa Osmaniyên ku di emrê Kûyûcû Mûrat de bûn têk çûn. Gor Şerif Vanli: Canpolatî ji Kurdên Colamergê bû, tevlî artêşa Eyûbiyan bûn, li hember Xaçperestan şerên hêja kirin. Wekî mukafat jî keleh û der dorên Kilîsê dan wan. Di sala 1607 an de emir Saîd Canpolat serhildan kir. Di sala 1630 an de jî çûn Beyrûdê.(63) Wekî tê zanîn şêxsiyeta wana yê tê nasîn Welîd Canpolat e, me carekê hevdû dît, digot ez Kurd im lê mixabin kurdî ji bîra kirine û heliyane! Di sala 1650 de (1059) Murtaza Paşa qasid şande bajarê Safed û Sayda ku ji wan bacê bigre. Wana jî bersiva: "Em tiştekî nadin, paşe çi dizane bila bike!" dabûn. Piştî vê bersivê jêder dibêjin: Em ji çiyayên Libnanê derbasbûn û gihîştin bajarê Sayda. Dema ji geliyê Nakûre re derbas bûn me bi Durziyan re heft seatan ceng kir; heta piştî nîvro sê hezar Nusayrî hatin kuştin û em ji geliyê derbasbûn. Eskerê Murtaza Paşa 280 miribûn û jê 700 kes jî birîndar bûbûn. Şêxen Durzî ji bo ku dîlên xwe rizgar bikin mal anîn...(96/III/25)

Di serhildana Celaliyan de, Kûyûcû M. Paşa yê Osmanî, Kurd dikuştin û davêtin çalan, ji bo wê ew navê Kûyûcû-bîr lê danîn. Li Baybûrtê jî ji seriyê Kurdan pîramîd çêkirin. Dema Mûratê IV an çû ser Celaliyan, ew li ser riya xwe kuştin û êla li Ezerbeycanê ya bi navê Zeynellî û yên din ajotin Ezingan, Tercan û Pasînê. Li Hozatê jî êlên mîna **Koçûşaxi, Şamûşagi û Reşik**an êrîşê Tirkên li Kemah û Çemişkezekê dikirin. Di şerê 1908 an de ev her sê êlan serî hildan û heta dawiyê li berxwe dan.(25) Gor deftera bajarê Enqerê, li navenda Anadolê Şamî êlêka federasyona Reşiya ye. Li gundê Îspanakê girêdayî navça Polatelî (li Torosan) Îdrîs Kahya wiha digot: " Gundê me 40 xane ye û em ji êla **Damişkilî** ne. Dema êla me 700 kon bûye, texmînî 400 sal berê em ji Sêwasê rakirine, qir kirine û belav kirine. Demeke em bi Reşiyan ve tevhev jiyane. Paşê, Reşiyan dest dane ser 400 pezên me û 500 lehengên me dîl girtine û eme şandine Şamê. Ew bajara kalên me avakirine; heta derengî li Ûzûnyayla, Qonya, Enqere û li Şamê gelek malên êla me hebûn. Li gundê me çend malên ji êla Omeran û Bereketlî hene. Malên Berkatî di xelaya sala 1290 (îro 1428 in)/1869 hatine.(106-105) Ji vê îfadê jî gelek rastiyên dîrokî têne derxistin: Navê êlê ya esas ne Damişkli ye; ji bo ku ji wî alî hatine û îhtîmaleka mezine ku ji bo statûyeke bi riya ol bi dest bixin ew nava lê hatiye dayîn. Ya din ew bi Reşiyan re tevhev bûne û li Xorasanê navê wan Bîçeran-lû derbas dibe û bi Sêvikan re pismamê hev in. Di nava wan de hebûna Omerî jî, îşareta Reşîbûna wan e. Lewra Omerî li Qonyayê girêdayî Reşiyan e. Yekê jî di sala tê qalkirin de gelek êlên li navenda Anadolê ji ber bê şiliyê, ziwabûnê li dora xwe belav bûn û gelek ji wan jî çûbûn Çûkûrovayê. Berkatiyên girêdayî Reşiyan jî vê demê çûne. Wekî din jî gelek êl çûne; heta ji malbata me jî hinek malbat li wan deran mane...

Mûratê IV an Bexda heyna (1623) û êlên li Behdînan, Mûsil, Hewlêr, Kerkûk, Şehrîzorê jî tevlî leşkerên wî bûn. Îhtîmala zenda Şêxbizinî ya di vê demê de hatî koç kirin jî heye. Jixwe di vê demê de Mûrat gelek girîngî dida ku beg û mîrîtiyên Kurdan ji holê rake. Di sala 1715 an de emîretiya Baban û Soran ji alî Osmaniyan ve hate ruxandin. Herdû jî ji alî Huseyn Paşa yê nijadperest ve ji holê hatin rakirin. Osmaniyan ji Erdelan şunda êrîşî Loristanê kirin, waliyê Kurd yê bi navê Alî Merdan Xan dostê Şah bû, lê nikarî li berxwe bide. Osmaniyan zivistan li Kirmanşahê derbas kirin û paşê êrîşî Hemedan kirin û gelê herêmê di şûr re derbas kirin.

Di sala 1638 an de Bexda dîsa kete bin destên Osmaniyan û bi peymana Qesrî Şîrîn ya di sala 1639 an de sînor êdî diyar bûn! Cara yekemîn Kurdistan bû du parçe. Bi vê Osmaniyan dest ji Ezerbeycan kişandin û desthilatdariya li Bexda, Şehrîzor, Wan û Qersê Sefawiyan qebûl kir. Di sala 1732 an de jî Tebrîz, Loristan, Kirmanşah, Hemedan ji Îranê re ma; Şîrvan, Daxistan û Gurcîstan jî ji Osmaniyan re ma.[82] Bi aştiya vê care bi Îranê re kirinî re, êdî Osmaniyan giraniya hêza xwe dane dîzaynkirina hundur. Heta vê demê zêde nedikaribûn bi hişkî herin ser êl yan jî federasyonan; gelek caran çavên xwe ji Kurdan re digirtin. Lewra hêza wan têr nedikir. Di arşîvên Tirkan de gelek nameyên ku gîliya Reşiyan dike hene. Bê guman ji bo êlên din jî ew heye, lê ji bo ku Reşî bi hêz bûn, di nava babeta me de ye û em dizanin ku Osmaniyan çav li vê komê digirtine ku heta roja firsend ketê destê dewletê. Piştî peymana Qesrî-Şîrîn dewleta Osmanî ew rihetiya dît û vegerî ser êlên Kurdên koçber.

## BI CÎH KIRIN

Êlên koçer yan jî nîvkoçer sîstema dewletê ya hundur dikirin xeterê; bac nedidan, esker nedidan; li cîhên derbasbûyî jî talan dikirin. Reşî, dema ji Helebê yan jî ji bakûrê Sûriyê derdiketin diçûn zozanên Sêwasê, Tokatê, Amasyayê û cîhên din, di nava dewletê de gelek pirsgirek derdixistin. Li ser vê riya dirêj desthilatdar ew bûn, ti hêzên din nasnedikirin. Ji alî din ve bi taybet jî di başûrê (Sûriyê) sînorên dewleta Osmanî de jî ewlekarî tunebû. Ji bilî vê, gelek cîhên vala hebûn. Ji bo ku êlên Kurd li vê herêmê bi cîh bikin, êrîşên Ereban bidin sekinandin, ew hêzên ku dewlet bi çavekî cûda lê dinêrî bihev bide kuştin planên cîbicîh kirinê amade kirin. Ji bo vê yekê: Ji Hatay û Humusê bigre heta Rakka û Hesekê cîh dabeş kirin û sînorên êlan diyar kirin. Dewletê ji bo ku êlên Ereb ên mîna Aneze, Şammar rawestîne biryar da, ku êlên Kurd li hember wan li Hama, Humus, Heleb û Rakkayê bi cîh bike. Êlên Kurd jî: Tirkmenên Helebê 2400 xane yan jî 30 êl, 18 êlên girêdayî Yenî Îl; Lekvanik û 5 êlên mîna Heciyan, Akbaş, Kizil-Koyûnlû, Cîrîntilû yê girêdayî wan; 9 êlên Tirkmenên ji Bozûlûs manî yên mîna: Îzzeddîn, Koçekî, Avşar, Înalî, Anterî, Omerî, Çopî, Qaraca Arapli, Çaxirganî Şereflîsî; êlên bi Bozûlûs re girêdayî û li Keskînê rûdinên mîna: Cerîd, Koçekî, Yabaltûn, Tacîrî, Harbende,

Çepnî, Acûrî, Qere Araplû bi fermana 18 Adar 1692 an biryar dan.[90-107] Ew êlên ku hatin hejmartin îro li Anatoliya Navîn in û piraniya wan jê ji Reşiyan, Şêxbizinan (Ler), Oxçiyan û Têrikan in.

Em di belgeyên ji wê demê mane îro dizanin, ku Osmaniyan bi keviran sînorên navbera êlan diyar dikirine. Wek mînak: di 21 Çile sala 1691 an de Begebegayê Rakka, Kadizade Huseyn Paşe re ferman hat şandin ku li cîhên tespît bûne êlên Kurd werin bicîh kirin.[90-58] Di navbera Reşî û Canbegên ku piştre anîbûn li Anadolê bi cîh kirin de sînor diyarkirin; ew sînora li gundê Şûrçe û Dîkîlîtaş de kevirên ku ji rojhilat berbi rojava dirêj dibû wek sînor dihatin qebûlkirin.[90-56] Belê, cara yekemîn di vê salê de em dibînin ku Reşiyan dişînin wê herêmê. Li wir bûyerên bûne babetên romanan in: Ji alîkî ve êrîşên Ereban, ji alîkî ve zahmetiyên xwezayî û ji alîkî ve jî azadiya Kurdan ji dest hate girtin, ji bo êlan bû trajêdiyên mezin. Di bêşa êlan de emê qal bikin.

Ji bilî federasyona Reşî û Canbegan êlên din jî bi cîh kirin. Mufrizên eskerî li dû êlan geriyan û bi darê zorê ew şandin çolên Sûriyê û berpirsiyarek jî jê re tayîn kirin. C. Orhûnlû wiha dinivîsîne: Tirkmenên mezin ên girêdayî Walîde Siltan a Uskudarê, Bexdîlî (Canbeg), êlên din û yên girêdayî Canbegan Akçakale û Aynî Riza li keviyê çemê Belîh bi cîh kirin. Li destpêkê tenê Bexdîlî bi cîh kirin, ji ber êrîşên êlên Ereban, Bayindir, Mûsacali, Lekvanikê girêdayî Tirkmenên Walîde Siltan Uskudarê bi cîhkirin. Bi fermana di 28 Adar 1691 an de jî êlên mîna Tata, Acûr, Gunce, Çepnî, Kiliçli, Çeçe, Kaz, Tûx, Şêx, Elçî, Kûbaş bi cîhkirin. Ji bo ku firar nekin jî, bajarokên mîna Behisnî, Semsûr, Qeza Goynuk girtin.[90-58] Gor jêderên din Canbegan di sala 1702 an de şandine. Bi dîtina min jî ya rast 1702 ye, lewra bihevre hêza dewletê pê nedikaribû.

Di vê serdemê de em dibînin ku gelek êlên Kurdan li dora Sêwasê dijîn; Divrixî û cîhên din ên pir fireh de êlên mîna: Reyhan, Barak, Qereşêx, Kûzûguden, Îlbeg, Milan, Ûmran, Kangûn, Şefaat, Canbeg, Mamalû, Avşar, Qereçor yê mezin re, bi wata "Konfederasyona boylar/zendan" Reşî digotin. Kurmaç, Atma û Kiliç jî girêdayî vê bûn.[129-3] Herçiqas piraniya wan Reşî bin jî, bi temamî ne Reşî ne. Di serî de Canbeg, Milan ne Reşî ne, ew federasyon heta konfederasyonê serbixwe ne. Bi vî rengî gelek şaşîtî di nava belgên Osmaniyan de hene, ji bo vê başe ku mirov bikaribe jihev derxe. Van êlana ji Mereşê heta Haymana der-dor talan dikirin. Dewletê jî dixwest ew bi rêya kesên gotinên xwe derbas dibe li Rakkayê bi cîh bike. Yek ji wana jî **Kose Paşa** bû. Ji ber ku Reşî li hember dewletê di serhildanê de bûn, bi riya şexsiyetên baş ku ew nasdikin diketin kontrola dewlete jî. Di 7 hezîran 1697 an de ji waliyê Amedê re fermanek ji alî Mûstafa II an vê tê nivîsandin: " Qadiyê Divrîxî hat cem min û gîliyên gel anîn…Ji koçberan Cîhanbegî, Qereçorî, Şamatorî, Horekiyan gelek kes li Dîvrîxî talanê dikin…Pêwîste ew werin ji Rakka û Hemayê re bêne ajotin...!" gor defterên muhasebê tê fêhmkirin ku berên êla Canbegê mîna **Dîvrîxî, Taxrûdî, Diricanli**yê berê li Amedê rûdiniştine û teze dest bi koçberiyê kirine û hatine Gerger, Kahta û Semsûrê. Li wir ewlekariya gel xirab kirine.[129-

36) **Umranlû** yê girêdayî Canbegan ji cîhên xwe yên berê hatin Meletî û Kebanê. Ji bo ku ew ziyarê nedin dora xwe, ji mutasarifê **Meletî, Mehmet Paşa yê Reşî** re hatiye nivîsîn.(129-37) Ji vê fermanê jî tê fehm kirin, ku beşekî Reşiyan niştecîh in û beşek jî koçber in. Aliyê din, texmîn dikim Canbegên li navenda Anadolê yên ji milê Umranlû yê hatî li Meletiyê ne…

**Ji Waliyê Rakka Mûstafa Paşa re!** Êlên li Rakkayê bicîh bûbûn fîrar kirine û hatine herêmên mîna: Heleb, Şam, Trablûs Şam, Arzi Rûm, Mereş, Qers, Edene, Qereman, Sêwas û bajarokên li Anadolê. Fermana mine, ku tu wan dîsa bibî Rakkayê! Sal: 1110-**1697**.(161-117) Piştî ku ji bicîh kirina Rakkayê dest berdan; êlên girêdayî Harbendelî, Koçeklî, Sîlsûpûr û berên girêdayî wan, di sala 1721 an de li Çîçekdaxi-Kirşehîrê bi cîh kirin. Milan di sala 1707 an de li Mêrdîne bi cîh kirin. Kawî, di sala 1719 an de li Sêwasê li cîhê wan ê berê ji bo zivistanê bi kar dianîn bi cîh kirin. Li Gerger û Kahta Semsûrê jî 26 gundên Zurkanli bi cîh kirin.(90-109,110) Navê Zurkanliya yê esasî Zerikî ye.

Êla Tabanli ya li dora Enqerê di sala 1842 an de, bi qasî 1230 xane-li 30 gundan belavbûn û navça pêkanîn. Kildonlû (Sewedî), Tabanli (Têrikî), Boynû Incelî û Yenî Îl musteqîl kirin.(90-113)

Di sala 1696 an de hinek ji êlên Danişmendan li sencaxa Qere Hîsar-i Sahîb li navça Bûca, nahiya Pinarbaşi û Çolabadê bi cîh kirin. Li Edenê, Ayas, Kinik û Berendiyê jî 20 êlên (1303 xane) Dulqadirî bicîh kirin. Di heman salê de êlên Tirkmenên Mamaliyê mîna: Sorgûn, Akdax, Boxazliyanli, Buyuk Silêmanli, Emlak di nav sencaxa Bozok de bi cîh kirin. Hîn di sala 1693 an de zozanê Zamanti Pinarbaşi ya girêdayî Qeyseriyê wek cîhe îskanê hatibû destnîşan kirin.(90-108)

Derbarê êlên li Rakkayê bi cîh bûbûn û dîsa vegeriyan Anadolê gelek ferman û belge hene; di yekê ji wan de tê gotin: **Ji begebeganî Rakkayê Huseyn re!** Êlên ku li keviya çemê Belîç, Akça Kale, Aynî Zirî Rakkayê ji ber êrîşên rêbiran Ûrban belav bûne. Ji wana Îzzeddîn, Kuçekî, Avşar, Înalî, Anter, Acarî, Cemolî, Omerî, Şark Çaxiranî yê girêdayî Boz Ûlûs û Hamze Heciyan, Bidilêyê Mehmed, Ûlaş, Bûrak, Bexmîş, Ganem ê Hecî Alî, Qere Şêyhan yê girêdayî Bexdîlî, Bozkoyûnlû, …Bi giştî 3200 kes in. Ji ber rêbiran hinek ji wan hatine aliyê Rûm. Bi ser vê fermana min de, tu dê kesên bûne sebeb bigrî û di qeleyekê de cezê wan bidî; yên din pêwîste tu bibî cîhên berê! Sala 1102-1689.(161-102) Ji peyva Rûm mebesta wan rojavayê Sêwasê ye.

**Di sala 1721 an de, ji Kizil Koyûnlû (Şêxbizin-Ş) hinek malbat li navbera Îznîk û Sapancê bi cîh kirin.** Di vê navberê de êlên mîna Harbendelû, Koçeklû, Silsûpûr û êlên girêdayî wan, berê biryar hatibû stendin ku li Rakkayê bi cîh bibin; piştre, di sala 1729 an de li gundên li dora Çîçek Daxi-Kirşehîr hatin bi cîh kirin.(156-68) Hinek ji wan bi heman navî li Xorasanê jî hene.

Li herêma Toyca ya girêdayî Haymana-Enqerê ye xan hatin çêkirin û hinek êl li wir jî bi cîh kirin. Di sala 1730 an de qadiyê Bozûlûs xwest xanekê çêke, ew ji alî dewletê ve jî hat pejirandin. Lewra karwanên hevreşim li wir

dişêlandin. Giliyê gundiyên herêmê jî ji rêbiran hebûn û ji bo wan qirar hat dayîn ku derbend û mizgeft jî çêbibin. Ji bo ku derbend şên bibe ji zenda Bozûlûs, hinek ji civata Saki, Şêx Ahmet, Huseyn Heci û Kuşne ya girêdayî Oxulbey li derbend nivîsandin. Di 1731 an de ew malbatana xwestin ku vegerin cîhên xwe yên berê, lê hate red kirin.[156-72] Piraniya wan ji Têrikiyan pêk tên û hîna jî li herêmê ne, lê gelek ji wan jî vegerîn û hinek jî ji ber tîfoyê mirin û hinek ji ber şerê Yûnaniyan reviyan.

Di bicîh kirina êlan de Yalman agahiyên giranbiha dide: Em Tirkmen **84.000 mal hatin Colap** (çol) û li wir hatin bi cîhkirin.[106-49] Ew hejmareka gelek mezine; eger mirov wan konana bi 7 kesên malbatê ve lihevbide, nêzîkî 600 hezar kes dike ku ji gelek bajarên Tirk zêdetir e. Paşê, ji her obe (gund-qebîlê) yê mêrek dîl girtin, kerîk pez birin û em bi zorê bi cîhkirin.[106-49] Ji bo ku êl herin cîhê diyar bûyî, ji wan rehîne digirtine ku pir eceb e. Ji wê şûnde esîrên me serbest berdan û pezên me dan. Me can û malên xwe wergirt bi şûnde Colap terk kir. Ji Rakkayê em dîsa reviyan cîhê ku em jê hatibûn. Warê me yê berê Anadolu ye. Heta serok Fîrûz Beg dibêje: "Em nikarin li cîhekî wiha yê xerav bijîn, **lawikê xwe Memed û 30.000 malên wan yekser çûn Ecem**. Ewên mabûn niha ji Rakkayê heta Antakyayê bela dijin. Li ser çûyinê û şer gelek stran hene. Di yekê de wiha tê gotin:

| | |
|---|---|
| Benden selam soyleyin anam axlasin | *Dîya min silav bikin bila bigrî* |
| Biraqsin aklari, Qere baxlasin | *Bila spiyan rake, reşan girêde* |
| Mehmet Beg kucuk Kurt bey exlensin | *Memed Beg biçûk e, bila Kurd beg şa be* |
| Fîrûz Bey Aceme gîttî turnalar | *Fîrûz Beg çû Ecem qulingno* [106-102] |

Di wê stranê de jî diyar e û girînge ku bê zanîn hinek ji wan çûne Îranê (Xorasan) û şîna wan bûye.

Di bicîh kirinê de tengasiya herî mezin êla Bexdîlî kişand. Ew êlên li Torosan ji: Beydîlî, Barak, Elbeylî, Bayindir û 48 oban pêk tên.[106-49] Li wir jî diyar dibe ku beşekî mezin jê çûye Ecem. Li Xorasanê gelek gundên Bexdîliyan yên li navbera Bocnûrd û Aşxanê de hene. Dibe ku ewên qetiyanî ew gundana bin. Dîsa heman nivîskar ji devê gel li ser baweriya wan jî agahiyan dide ku bi yên Kurdên li Anatoliya Navîn ve wek hev e: Li wir ji agir re hûrmet pir mezine, eger zarokek bi agir de mîz bike emê lêxin[106-61] dibêje.

Dewletê gelek Kurd li wê herêmê bi cîh kirin; piraniya wan vegerîn Kurdistan û Anadolê; gelek jî çûn Îranê. Ji bo hejmara wan Yalman dibêje: Li Rakkayê êlên Tirkmen wek 29 bend hatin bi cîh kirin. Lê îro tenê 8 bend li wir man. Di nava wan de tenê wek biyanî Avşar hene.[106-93] Ew jî dide xuyakirin ku ji sisiyan dido reviyane.

Ji Tanzîmatê şûnde, Avşar li cîhê zozanên xwe berê Zamanti, li nehiyên mîna Sariz, Pazar Orenî yê navça Pinarbaşi û gundên Toklara girêdayî Tomarza bi giştî ji êlên din hemûyan zêdetir bûn.[90-117]

Ji xanedana Kozanoglûyan ku laqaba xwe "Torûn" e, ji begê wan Huseyn axazade Mehmet Axa, Derwêş Axazade Ahmet Axa û kurên wî Hemze û Mûstafa li Qeyseriyê bi cîh kirin û maaşê wan hatin girêdan.(83-164)

Georges Perrotê fransizî di sala 1861 an de, 12 rojan li Haymanê dijî û wiha radigihîne: Gava min li ser dema bicîhbûna gel ê wan û navçeyê pirs kirin, kalên wan baş nedizanibûn, lê digotin ku 100-200 salên wan li wê navçeyê çêbûbûn. Bav û bavpîrên wan li ser wê erdê hatibûn dinyayê".(34-30) "Kincên mêran bêtir dibiriqin û diyar e ew pir û pir ji qutikên sorî bi tayên zêr neqişandî hez dikin. Dênikên (kofî-tasên kolozan) serên wan kovikî ne, ne wek yên Tirkan li gora serî ne.(34-38) Heman nivîskar niqteka girîng jî dinivîsîne: " Li Haymanê, eger yek ji herdu regezên xwediyên vê erdê di bin tesîra ya din de be, tiştê balkêş ew e ku ne Kurd in ên di bin tesîra Tirkan de ne da ku rabûn û rûniştinên wan bigrin.(34-59)

Badilî berê li Erxaniyê rûdîniştin û diçûn zozanên Enqere û Çanqiriyê li Harranê hatin bi cîhkirin. Ewna: Arşûvan, Ûstûrgan, Çîmkan, Azman, Hecî Kir, Kurdîkan, Mamavî, Mûdan, Osmanli (Otmanli) bûn.(90-59) Bi vî awayî dewletê êlên Kurd jihev êxistin, parçe kirin û heryek li aliyekî bicîh kir û bicîh bûn...Ew jî li erdnîgariyeka gelek fireh pêk hat: Yên çûbûn Ecem li Xorasanê, hinek li bakûrê Sûriyê û beşekî mezin jî li navenda Anadolê bi cîh bû.

## SERSOR-ALAVÎ-QIZILBAŞÎ
## (Sûrhûser)

Heta vir min gelek caran qala ola Kurdên koçber yan jî yên dervayê welat kir û gor wan tespîtan Kurdên ku herî dereng ola xwe guhartibûn ew in. Kaniya ola wan Zerdeştî bû, lê gor demê û pêvajoyan di nav û naveroka wî olî de guhartin pêk anîn; ew neçarî vê yekê mabûn...Piştî tevgera Eba Muslimê Xorasanî û avabûna dewleta Safewî, em wana di bin navê Sersor-Qizilbaşiyê de dibînin. Dema mirov li dîroka Kurdên koçber dikole dibîne, ku ew di baweriyeka hişk a Sersorîtiyê de bûne; ji ber wê jî ew rastê êrîş û komkujiyên miletên cûda û misilmanan hatine. Sersor di belgeyên Osmanî de wek **"Sûrhûser"** derbas dibe; ji bo wan deftereka taybet hatiye girtin û navê defterê jî kirine Sûrhûser ku tê wata Sersor. Ew Sersortiya çi ye ku bûye sedema kuştina bi milyona însanan?

Kesrevî yê di vê mesêle de pispor wiha dibêje: Şêx Şafî ku navê wî yê din **"Zêrîn Kulah e"**, yanê: kizil şapkali an jî kizilbaş e bi zimanê tirkî. Bi kurdî jî tê wata kesê bi kumê sor.(24) Di seyehatnama Îtalyanan de jî hatiye diyar kirin ku wana li Anadolê kumê ku serê xwe zirav dibûn wek kovik ji 12 zûl û sor e didane serê xwe.(24) Ew kumê bi vî rengî em dikarin berî mîladê jî bibînin û Kurdên Xorasanê dema çûne wir jî kumên bi vî rengî bikar anîne. Di ser nivîsê de min navê **Alavî** jî bi kar anî, ku hinek dîtin jî dibêjin koka peyva Elewî ji wir tê. H. Kûtlû dibêje: Ji alîgirên baweriya Mazda re digotin Mecûsî yanê

agirperest; paşê gotin: zindiq, Gawir û hwd. Gotina Alavî jî ji agir te. Dr. C. Bender wiha dibêje: Alav kurdiye û wata gotinê ev e: kesê ku ji ronahiyê, tîrê hezdike û hurmet nîşan didî ye. Ji bo wê gotine Kizilbaş. Lewra sor, rengê agir û alavê ye. Ji bo wê jî Sersor bi Elewî va tên yek watê.[123-94] Bi dîtina min jî Alavî rastir e, lewra ji alî dîrokî, civakî û olî ve ew peyv giredana vî olî û Kurdan hîn watedar dike. Peyva Elewî jî, li destpêkê, ji tirsa misilmanan wek taktîk ji alî bawermendên Kurd ve bi kar hatiye. Pêdiviya veşartina dînê xwe dîtine û bi vî awayî Alaviyê kamûfle kirine. Ji alî din ve, ew peyva ji alî kesên ku dixwazin Alavîtiyê bi misilmantiyê ve û bi îmam Elî re girêbidin ve bi kar hatiye. Yanê li hesabê herdû aliyan jî dihat ku peyva Elewîtiyê bi kar bê û di dawiyê de ew bû. Di esas de ew herdû dîtin, îdeolojî û felsefeyên jihev gelek cûda ne.

Sersorîtî koka xwe bê guman ji ola Kurdan ya kevn Zerdeştî digire; di vî olî de jî agir û roj pîroz bû. Sora Alaviyan ji sorbûna rojê û pizota agir tê; îhtîmaleka mezine ku ew sora sembola roj û agir e. Wekî gelek nivîskar dibêjin, Sersortî; berdewamiya Zerdeştî ye; bingeha xwe ji kesên xizan digire û bi misilmantiye re hertim di nava nakokî û şer de bûye. Şiîtî jî ji alî Parsan vê hatiye girtin û bi Îslamiyetê re zêde neketiye nava pevçûnan û gor Sersoritiyê ji Îslamê zêde stendiye.[125-96] Dîtineka di cîh de ye; lewra di dîrokê de jî Pars bi hêsanî teslîmî misilmanan bûne; lê Kurdan heta dawiyê li berxwe dane; yan jî welatê xwe terk kirine. Bi êrîşên misilmanan re Kurdan nedikaribûn îbadeta xwe bikin, ji bo wê jî di ola xwe de guhartinên sivik pêk anîne. Bi emperyalîzma Îslamê re, Mazdaîzmê xwe nikarî eşkere îfade bike, lê wek: Batinî, Sofîtî, Derwîşîtî û Tasafûîtî xwe di nava ocaxan de bi rêxistin kir û îro navê vê Alawîtiya Sersor e.[122-14] Bi rastî di nava Kurdên li dervayê welat de girîngiya ocaxa pir zêdeye; ji bo misilmanekî girîngiya mizgeftê çi ye, ji bo Alaviyan jî wata ocaxê ew e. Kesekî zarokên xwe nebûn, dibêjin "Ocax kurê" yanê êdî mal şên, ronî û bi berdewamî nabe.

Gor felsefa Sersoriyê, berî dunyaye roj hebû û hertişt ji wê peyda bû: Berê roj, paşê agir, hewa, av û ax derket holê. Yanê vejîna mezin ji wan çaran derdikeve jiyane. Piştî wan jî, sê vejînên mezin tên ku ew jî: Ji axê nebat, ji wê jî heywan, ji wan jî însan çêbû.[122-33] Elewîtî û Sersorîtî berhema felsefe û şaristaniyeka pêşketî ye.[124-47] Diyare, ku ew felsefe bi ya Zerdeştî ve nêzîkî hev e.

Gor baweriya Sersoran vejîn hersal tê nûkirin. Salek ji çar demsalan pêk tê. Van çar demsalan çar derî ne. Pîr H. Cîlasûn dibêje: Çar derî: Dibistana seretayî, navîn, lîse û zanîngeh e.[124-93] Her derî ji sê, hersal jî ji 12 mehan pêk te. **Di Sersorîtî yê de sê, çar û 12 hejmarên pîroz in.**[122-36] Mumkune, ku federasyonên Kurdan yên ji 12 êlan pêk tên ji vê pîroziyê bingeh digirine. Yanê: 12 hêstir, 12 meh, 12 têla yên kuman û 12 êl... Yên dide û dizê di Sersorîtiyê de ha-da ye, yanî kesê ku xwe dide û dizê ye.[122-37] Di devoka Kurdên li Anatoliya Navîn de, ji bo Xwedê, Xudê tê bikar anîn. Xudê tê wata kesê xwe dide, yê ku ji wê zayînê tê.

**Şertên Sersorîtiyê:**

1. Maf di însan de dibîne.
2. Kemerbest bûyîn-Îkrar-kol dayîn.
   a. Rind bifikirî
   b. Rind bibêjî
   c. Rind tetbîq bikî
3. Muhasîb bibî
4. Girêdayî Pîr bibî (Ocax)
5. Divê xwe wek gelên çar derî û 40 meqaman bikî (perwerda wê bibinî).

Di nav Kurdên Anatolî yê de çilê zarokan bi merasimekê* pîroz dikin, ku divê koka xwe ji wê şertê stendibe.

6. Xwe li "dar" xî; yanê ji salê carekê di "Erkana Edebê" re derbas bibî (lêpirsîn). Di nav şertên Sersorîtiyê de: Dost û dijmin bûyîna, dost û dijminê Hz Elî û giredana 12 îmaman tune. Gotina: " Xwediyê dest, pişt û zimanê xwe be" jî, ji bo Sersorîtiye sist-xirav bikin tên gotin.(122-45) Eger di bingehê de baweriyeka bi vî rengî tenebe jî, di praktîkê de carna girêdana 12 îmaman heye; ew jî ji çespandinên zordaran tê. Lewra Kurd mecbûrî kamûfle kirina baweriya xwe mane. Îmam Elî dibêje: "Kesê cara yekemîn misilmantî pejirandî ez im".(123-9) Di misilmantiya îmam Elî de ti şik tune; lê ji bo ku îktîdar nedan wî û ew demekê ji xelîfên din re muxalîf bû, ji wê dijberiyê beşekî Kurdan jî piştgiriya wî kirin. Di pêvajoya demê de ew yeka zivirandin alîgirên Elî. Di alî îslamî de di navbera Elî, Ebûbekir û Omer de ti ferq tunebû. Lê ji bo îktîdarê, bo aboriyê û berjewendiyê nakokî kete navbera wan. Elî, bi ser gotin û hedîsên Pêxember de wergirtina rêvebiriyê garantî ditît; lê Ebûbekir bû şûnde jî, giredana xwe wî diyar nekir. Sedema aborî jî birêz Bender wiha radigihîne: Yek jî sedem ew bû, ku "Xurmelixa Fedek" ji dest malbata Haşîmiyan (Elî-Muhammed) girt. Bi ser vê bûyerê ve Fatma heta bimire bi Ebûbekir re deng nedikir-xeyîdî bû. Piştî ew mir, Elî, êdî Ebûbekir naskir.(123-30)

Di Sersortiyê de av pîroz e û mirov nikare tif/tu bike û yan jî qilêr bike. Ji ber ku av sebeba hilberîn û paqijiyê û ji bo jiyane bi kar tê pîroz e. Çiya jî wiha ne. Lewra çiya bilind in û nêzîkî Xweda/ê ne û ji bo parastinê baş in. Îbadet berbi rojê dibe; rojê nikarî bi tiliyan nîşan bidî yan jî berbi wê mîz bikî. Ew motîfên di Sersoritiyê de ji Zerdûştîzmê tên.(125-108) Heta dema dawî kalên

---

*Merasim wiha ye: Bêjingekê 40 kevirên biçûk, pariyek nan, bişqeleke ajalan, parçek neynik, sê heb ceh dikirinê. Sênîkî jî 40 kefçî av dikirinê. Ew bêjing li ser serê zarok digirtin û av lê dikirin. Dema avê lêdikin jî dibêjin: " 40 derket, tirs derket! " û dîsa dibêjin: "Çilê heywên, insan û yê hertiştekî derket..." Dîsa gor baweriyê; jineka din a di heman demê de welidî (zarok anî) jî nikare were ziyareta jina din. Jina ku zaroka xwe bi tivxê (nexwaşî) ketî jî nikare, heta nikare di ber mala wan re jî derbas bibe... Piştî çilî herkes dikare were û here. Piştî merasima avê, bi stûyê zarok digrin û radikin. Bi vî awayî merasim diqede...

me ji me re digotin tifê avê meke gunehe. Rojê bi tiliyan nîşan mede, pişta xwe bi rojê de mîz bike û gelek tevger û qedexe bi vî rengî hebûn. Li Sêwasê hê jî Kurd berê xwe berbi rojê îbadet dikin û çiya jî pîroz in. Hemû ew karên li jiyanê û rûhiyetiya Kurdên koçber bi emrên Sersortiyê ve hevdû ji sedî sed digire. Di sersortiyê de tenê şertêk heye ku ew jî: girêdana sozê yê.



**Li Qoçgiriyê jina ji rojê re îbadet dike**

**Şertên Îmana Sersoritiyê:**

Tenê şerteka xwe heye ku ew jî girêdayî kola-soz xwe biminî ye; yanî girêdayî Îkrarê bimînî. Ji ber ku soz sedaqat e û soz hatiye dayîn însan, kesên ku soza xwe tuneye cewherê xwe jî nabe, cewher jî îman bixwe ye.(122-44) Di nava Kurdên li dervayê welat de kol dayîn pir girînge; eger kesek soza xwe neyne cîh tê wata ew hîç e. Di rewşeka wiha de mirovê bi wî rengî qet ji mirovan nayê hesap kirin ku ew felsefe ji Alavîtiyê tê. Wekî Pîr dibêje: Di Elewîtî de Xweda însan e!(124-17) Hecî Bektaşî Welî gotiye: "Kabe ya min însan e".(124-20) Hecî Bektaş ji Xorasan hatiye û di baweriya Alavîtiyê de, bi Kurdên li dervayê welat ve ji heman kaniya dîrokî ne. Rêxistina Sersoran ya navendî **Agirgeh-Ocax** in. Sersor bi Şîa ve li hember misilmanan ketin nav îttîfaqê, lê paşê Sersoran ji wê yekê zirar kirin. Gelek caran Şîa ji bo berjewendiyên xwe Sersor

jî kuştin. Paytextê Sersoran bajarê **Yazd** bû. Yekê jî, misilmanan mîsyonerên sexte şandin nava Sersoran û mêjiyê wan tevlîhev kirin. Bi taybetî jî di dema Selçûqiyan û Osmaniyan de ev wek rêyekê bikar dianîn.(122-49) Di nava Sersoran de Agirgehên navendî-yên mezin 12 ne; navên wan wek sîstema asîman lê tên dayîn û ti têkiliya wê bi 12 îmaman re nîne. 12 Ocax mîna 12 bûrcên li asîman in. Xaka Agirgehan ne malê kesekê ye; mala hemû Can an e. Diçînin û tevhev dixwin. Di ocaxan de ji bo her xizmetî, postek heye. Gor hiyarerşiyê 12 post hene. Di serî de postê Pîr heye; paşê jî postê Xatûna bi Tac (Dayik) heye. Postê Pîr li rastê Ocaxê, yê dayikê jî li çepê ocaxê ye. Bi dorê: Postê Reyber, zakîr (Hozan), Êzingvan (Ocaxci-çeraxci-rûşen), Kurbanci, Lokmaci (xwarina hatî di nava Canan de wek hev parve dike-Cîlasûn), Kûyû, Supurgecî (Farraş)



**Cema şijinge ya Zerikiyan - Sêwas**

Gozcu (bekçiyê derî/ Çavûş jî heye ku civatê temaşe dike û kesên xirav ji Pîr re radigihîne û ew jî ji odê davêje-S. Firat), Îbrîkcî, Dolûcû (Sakî-dem-homa), Sofraci teqîp dike.(122-52-54) Post, ji bo ku Pîr li ser rûdiniştiye li cem Sersoran pîroz xuya dike. Ew li cem Kurdên Anadolê jî bi awayekî veşartî heye. Wek mînak: Berê li her malekê li jora odê postêk hebû û mêvanên hêja li ser rûdiniştin û giraniyek wî postî hebû. Hinek malan jî li dîwarê malê dadixistin. Ti şik û guman nîne ku ew kevneşopiya berdewamiya ola wan ê kevn e. Ocaxa dawî û

yên serekî şûna dibistanê yê li Ardabîlê (1500) bû.(122-89) Post, meqamê gel e, bê destûra gêl kes nikare li ser rûnê; serokên ku îzna gel sandinî dikarin rûnên û post cîhê ku serok lê rûdinê ye.(124-63) Ardabîl di dîroka Sersoran de cihekî pir stratejîke, tevgera Şah Îsmaîl jî ew cîha ji xwe re kiribû navend.

Îbadeta Sersoran bi hev re û di Cem û Civatan de pêk tê. Sîstema wê jî ya asîmanî ye. Semah û Sema peyvên Aryanî ne: Sê=3, Mah=meh, hîlal e û esmanî ye.(122-55) Semah, dansa baweriya Elewiya ne.(124-74) Muzîk û bawermendî bi hevre tenê di Elewîtiyê de heye. Eger di Elewîtiyê de tembûr nebe, gotin nabe; gotin tunebe nefes nabe; ew jî nebe beyt; ew jî nebe dozde; ew jî nebe Semah; ew jî nebe Bawerî nabe.(124-100)

**Diayên Sersoran;**

1. Destpêkê roj derdikeve, ku ew zayîn e. Berî ku roj hilkişe, li ber agirgehê rêz digrin û agirgeha pîroz vêdixin. Berê xwe ber bi agirgehê ve dikin û cem-civat digrin.

2. Nîvro: wê çaxê roj hukumdariyê îlan dike.

3. Roj dikeve xewê.(122-59)

Cem, di salekê de çend caran pêk tên; yên girîng ev in: Kosegellî (Beran berdan), Sing sing, Dar (Mahkema gel û riza gel tê stendin), Îqrar, Kemerbest û În-yanê vejîna însan e. Yanî: În=ruh e, **san** jî=Laş e û herdû bihevre can peyda dikin.(122-62) Heta demên dawî di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de beran berdan û Sîn-sînko ye pir girîngî didane; lê niha ew jî ji holê rabûye. Sîn-sînko gor ez texmîn dikim di cîhê Newrozê de ye…

**Aşûrê:** Di wata şîva rojê de ye. Wek xwarina rizgariyê, ji rê yan jî ji rojê hatiye çêkirin. Ji 12 çûreyên xwarinê ku li mal tên dîtin, aşûre çêdibe û piştî rakirina bênderan tê kelandin.(122-63) Li Anatoliyê heta demên dawî jî Aşûrê belav dibû. 40 sal berê pîrika min dikeland û dida destê min û min li cîranan belav dikir. Gelek bi tam û xweş bû.

**Ji Sersoritiyê avêtin:**

Cezaya herî giran; yê ji rê derketine, ku ji nava civakê tê qewitandin e. Eger kesek wan sûcana bike ji nava civakê tê avêtin:

**1.** Îqrarê xwe xirav bike û bi zilimkaran re têkilî û hevkariyê bike.

**2.** Here irzê û hurmet ji dê û bavan re neke.

**3.** Ji bilî parastina xwe ya nefsî kesekî bikuje, xesp û talanê bike.(122-78)

Alavîtî baweriyeka aîdê gelê Kurd û Arraniyan e; bi Ehlîbeytan (Muhammed-Elî) re ti têkiliya xwe nîne. Elî, xêr ji tekoşîna siyasî û navxweyî, ji alî îslamî û îmanî ve ti nakokiyên xwe û xelîfên din tunebû. Heta dawî jî girêdayî qanûn û biryarên îslamî bû.(123-90) Madem wiha ye çima Elewî ji Elî hezdikin û girêdayî wî ne? Çima Elewî, Emewî û Ebbasiyan wek zalimên mezin dibînin û ehlîbeytên ku li hember wan şer û tekoşîn kirine re jî bi dil girêdayî ne? Piraniya 12 îmaman (Ji bilî Zeynel Abîdîn) hatin kuştin; wê yekê

hîsên dil êşê pêkanîn û gor wê demê: Ji ber ku li hember Emewiyan derdiketin, gel bawer dikir ku ew eniya muxalefetê ne. Û Elewiyan, tekoşîna xwe gor wê bingehî danîn. Felsefa ku ji nava Zerdeştî tê, bi vî awayî xwe di nav baweriyeka din de kamûfle kir.(123-91)

Wek tê zanîn Sersorî 1400 sal in ku qedexe ye. Piştî Îslamê jî mecbûr maye ku xwe wek Îslamî nîşan bide û bi vî awayî heta roja îro karibiye bijî. Bi vê re girêdayî zêde bi navê Şîatî derketiye pêş, Şîa, bi erebî tê wata alîgir. Ew alîgiriya wê deme bi Şîatî ya îro ve eleqa xwe nîne. Alavîtiya ji bo Sersoran tê ziman jî wê çaxê tunebû. Şîatî di sedsala VIII an de derket holê, wek mezheba Caferî jî tê zanîn û piştî îmamê VI an Caferî Sadik şiklê xwe girt. Mirov dikare bibêje ku sentezeka Îslam û Mazdaîzmê ye. Cara yekemîn di sala 1500 an de li Îranê bû îqtidar. Wekî tê zanîn hemû îmam û Caferî Sadik jî wek kalê Elî şerîat dixwestin.(122-9) Sersorî û baweriyên din ên mîna: Zerdeştî (Mazda), Nûsayîrîtî, Sabîîtî û Durzîtî baweriya gelê Aryenî ne.(122-13)

Di demên derbasbûyî de cografya Sersoran ji Afganîstan, Pakîstan, Tirkmenîstan, Îran, Ezerbeycan, Kurdistan, Anadol û Xorasan dikire nava xwe.(122-8) Xer ji Çelebî û Bektaşiyên mîna Bedrî Noyan, yek ocaxekî Elewiyan li alî Tirkan tune.(124-15)

Hêz yan jî komên ku dewleta Safewî avakirin bi piranî Kurdên Sersor û kalên Kurdên îro li dervayê welat in; piraniya wan ji ber Osmaniyan ji Anadolê reviyabûn.

## SAFEWÎ-ŞÎÎ

Wekî min li jor jî nivîsî; êlên Kurdên ku ji Anadolê û ji ber zilma Osmaniyan reviyabûn li Arranê (Erdebîl) xwe bi rêxistin kirin û bingeha dewleteka olî avêtin. Navê dewletê jî kirin Safewî. Wekî berê jî min nivîsî, hinek nûser dibêjin ew nava ji êla Sêvikan hatiye girtin. Ew îddea jî mumkune; lewra yek ji avakarên vê dewletê êla Sêvika ye; dibe ku rêber ji nava wan derketibin, navê xwe dabin ser dewletê jî. Dewlet, ji motîfên nijadî zêdetir li ser motîfên olî û li hember misilmantî û Osmaniyên ku pêşengiya vî olî dikirin hate damezirandin. Rêber û êlên ku ew dewleta avakirin kê bûn? Em niha li bersiva vê pirsê bigerin:

Birêz Îzadî li ser vê agahiyên girîng dide: Reîsê xanedana Sefawiyan û şêxê xwe yê pîroz **Şêx Safî el-Dîn** e. Jêdera derbarê wî de ya herî baş, "Safwat el-Safa" ya Îbnî Bazzaz Erdebîlî ye, ku di wir de vekirî dibêje ew Kurd in. Gor Bazzaz: Kalê Şêx Safî, Pîroz Şah Zarrîn-Kula (Zêrîn Kulah) di sedsala X an de bi êleka Kurd a mezin ve ji herêma Sîncar barkiriye Erdebîlê. Îhtîmaleka mezine ku ew Dimilî ye.(154-113) Li ser Kûrmancbûna wî ez di şikê de me û xuyaye ku ew bi Şadiyan re hatiye. Lê ne diyare ku ew ji Kurdên bo heyfa Eba Muslimê Xorasanî hatine an na? Mumkune ku navê Kurdên Zerikî jî ji wî Zêrîn Kulahî hatibe û bi xwe jî Zerikî be. A. Tanerî jî wan dîtinan dipejîrîne: Xanadana ku

navê xwe daye vê dewletê Kurd in; kalê Safiyîddûn Îsheq Fîrûz Şah (ji Sîncarê) Kurd e.(89-32) Nivîskar dibêje: "Dewlet bi Tirkên ji Anadolê hatibûn li ser piya ma." Lê di rastiyê de ewên ji Anadolê hatibûn Kurd in û di beşên derbasbûyî de me anî ziman. Ev yeka di êlên avakirî de jî xuyadike: Êlên ku dewlet avakirine ev in: Rûmiyan (Sêwas), Ûstacûyan (Sêwas, Amasya, Tokat), Tekelî (Antalya), Şamî (Halep, Antep), Dulqadirî (Mereş). Ew êlên mezin di demeka ji 100 salî zêdetir de çûn rojhilat.(89-32) Rûmî me got ku Reşî ne; Şamî li Xorasanê ne û min ditin û dibêjin ew pismamên Sêvikan in. Çavên wan ê reş û tevgera wan jî vê hîsê dide mirov. Ûstacalû jî me got Kurdên îro li Xorasanê yên bi navê Laînî ne. Laîniyan bi Reşiyan ve axaftinên xwe nêzîkî hev in. Ne dûre, ku girêdaneka wan heye. Dulqadir jî me qal kiribûn ku Kurd in...kanî Tirkbûna wan? F. Sumer jî, ji A. Kesrevî û pirtûka wî ya bi navê "Şêx Safî û Tebareş" bi awakî vekirî radigihîne. Navê pirtûkê balkêşe: **Tebareş!** Wata wê gelê-reş e yanî Reşî ne! Sumer dibêje; Safewî ji alî Kurdekî ji Sîncarê yê bi navê Fîrûz Şah ve hate damezirandin û di vê de ti şuphe nîne. Mirov dikare texmîn bike, ku Fîrûz Şah kalê Safiyûddîn Îsheq e. Fîrûz Şah, di sedsala X an de, dema Kurd li Ezerbeycan û Arranê belavbûn hate Erdebîlê û nêzîkî bajer bi cîh bû. Piştî nîvê sedsala XI an Selçûqî hatin Ezerbeycan, Kurdistan, Arran û rojhilatê Anadolê. Dema hatin li wan deran bi xanedanên Kurd yên mîna Rewadî, Şadî, Merwanî û Annazoxûllari ve rû bi rû man. Emîr Ahmedilî ji Şadiyan bû û emîrê bajarê mîna Erdebîl û Tebrîzê bû. Hêza ku dewleta Safewî avakirî, ji Anadola Navîn û başûrê Anadolê bû û Tirkên nû bûn û ew Sersor bûn.(112-2) Bi dîtina min **Şêx Safî el-Dîn li Erdebilê** jiya û divê ocaxa wî ya pîroz jî li wir be, lewra ew hêrêma ji alî Sersoran ve pîroz tê dîtin. Yekê jî wê demê, ji Şêx Cuneyt bigre heta Şah Îsmaîl rêvebirên Sefawiyan ji alî gel ve wek "Mêhdî", "Pêxember" heta wek Xwedê têne dîtin.

Pêwîste mirov niqteyeka din jî zelal bike: gelê Pars jî ola Kurdan Zerdeştî pejirandibû; lê, li hember êrîşên misilmanan wana bi tevahî ji ola xwe ya kevn devberdabûn. Yên li hember vê sekinîn Kurd bûn, ku ji ber wê ji wir diçûn wir û heta dawî li berxwe didan. Di wê demê de jî ew pêk hatibû. Yanî, êlên Kurd û yên Talîşê her tim di nava muxalefetê de ew dewlet li ser esasê olî avakiribûn. Wexta ew dewlet li ser lingên xwe rawestî; Pars sunnî-misilman bûn. Sefawiyên ku koka xwe ji Zerdeştî, Alavîtî û Sersortiyê digirte bi zorê ew ol yan jî mezheba bi Parsan dîsa pejirandin. Ji bo wê; ola dewletê ya wê demê bi Şîatiya Îranê ya îro ve ji hev pir cûda ye. Wekî Rafael Blaga jî dibêje: Şiatiya îro li Îranê ji alî dewletê ve wek mezheba fermî derdikeve pêş. Caferî-Îmamî-Şîatî ya bi 12 îmaman e; wek sunniyan baweriyê bi şerîatê tînin. Sunnî ji vê Şîatî ya nerm re "Rafizî" dibêjin. Şiatiya din jî Şîatiya radîkal e, ku Îsmaîlî (Elewîtî, Ehlî Heq) û Mûatasavvifa temsîl dikin. Taybetmendiya wan kaîdên şerîatê di praktîkê de berbiçav nagirin.(95-43) Di Şiatiya îro ya li Îranê bi sunîtiyê ve ferq gelek kêm e. Şîatî di navbera Zerdeştî û Alavîtî û Îslamê de pire ye. Kurdên Xorasanê hîna jî dibêjin em Îsmaîlînî.

Şêx Şafî di demeka kin de bû rêberê êlên Kurdên li Ezerbeycan, Anadol, Sûriyê û Başûrê Kurdistanê. Li der dora xwe gelek bi hêz û hurmet bû, ku dawetiya Îlxanliyan red kir. Xaka li ser dijî, dewletan nedikarî têkevin û jê bacê bistînin. Bi dîtinekê Tîmûr ji Anadolê 30 hezar Tirkmen birine, lê Şêx ew îqna kiriye û wî jî ewana ji Şêx re cî hîştine. Ji wana gelek vegeriya bûn welatê xwe. Mirîdê wan li Anadolê gelek hebûn. Êlên li bakûrê Azerbaycanê yên mîna Qereman û Qaçar jî girêdayî Erdebîlê bûn.[24]

Torinê Qere Yûsûf, Cîhan Şah dema li ser rêvebiriya Beraniyan bû, hezkiriyê tekê Şex Safiyûddîn (1252-1334) ê li Erdebîlê bû. Ji bo derwêşên vê tekê di nava dewletê de rihet bikin alîkarî dikir. Torinê Safiyûddîn û xwediyê tekkê Şêx Cuneyt li Anadolê propaganda dikir. Wê demê Cuneyt serokê Elewîtî û Bektaşîtî yê Ruhanî bû. Kalê Cuneyt Kurd bû. Di sala 1449 an de Cuneyt bû serokê Beraniyan.[101-198]

Dîroka Sefawiya bi Şêx Cuneyt destpê dike; mirov dikare bibêje ku dawiya Beraniyan destpêka Sefawiyan e, lêwra ew dewlet li ser bingeha Beraniyan hate avakirin. Cuneyt li Anadolê geriya û ji alî Kurdan ve nêzîkayiyeka mezin dît. Gelek kes li dora xwe civandin û êrîşî (1456) dewleta Rûman ya Trabzonê kir, lê bi ser neket. Di vê navbera de ew dewlêta hanê jî, li hember gelek êrîşan de mabû. Ji alîkî ve Osmanî, ji alîkî ve Cuneyt êrîş dikir. Cuneyt paşê hat cem Hesenê Dirêj û bi xwîşka wî re zewicî.

Kralê Trabzone Kalo Îoannes kete tengasiyê, di sala 1457 an de qasid şande Amedê û li hember Osmaniyan ji Hesenê Dirêj îttîfaq xwest. Hesen jî keça wî ya xweşik, bi Kapodokya ve jê xwestin û kral ew daxwazan qebûl kir. Keça wî ya bi navê Despîna Xatûn hate cem Hesen. Ji wê Xatune sê keçik û kurekî Hesen hatin dinyayê, ku yek ji wan keçikana diya Şah Îsmaîl bû.[138-418] Yanê Hesenê Dirêj kalê Şah Îsmaîl e. Diya wî jî xwarzêya Grekiyan e.

Birêz Xemgîn dibêje: Cuneyt di sala 1456 an de mir. Di dema Heyder de oldarên (derwîş) di ocêx de perwerde bûbûn li serê xwe paçên sor girêdidan, por û rî berdidan û li urbê (qolcix) wan îşareta 12 hebû ku ew nîşana 12 îmaman e. Seva wan kincana navê "ser soran-kizilbaş" li wan danîn.[101-202] Lê gelek nûser jî dibêjin êlaqa wan bi 12 îmaman re nîne û wekî Sumer jî dibêje ew di sala 1460 an de mir. Şêx Cuneyt vegerî Arranê bi şûnde, êrîşî welatê Şîrvan Şah kir û di şerê li sala 1460 an de Cuneyt mir û bi alîkariya xalê xwe Hesenê Dirêj, Heyder li Erdebîlê bi cîh bû. Terîqeta Şêx Heyder, serê xwe li Erdebîlê, laşê xwe li Anadolê bû. Alîgirê terîqetê pir kêm li Îranê hebûn ku ew jî Talîş, Erdebîlî û Tirkên Qerecdax bûn; hêzên Qeremanî û Qacarên li Aran jî alîgirên Şêx bûn.[112-12] Talîş êleka balkêşe û bi dîtina min li ser wan lêkolînên taybet pêwîst in. Li Gîlanê rûdinên, şiklê wan wek Kurdan e, bi texmîna min ew êleka Kurd e, li cîhê asê bi tenê dijîn. Divê têkiliya wan bi Hewreman û Goranan re hebe. Heyder, di sala 1486 an de bi 10 hezar kesî êrîşê aliyê din ê Derbend û qewmên Qefqas kir. Di sala 1488 an de ji bo tola bavê xwe, dîsa êrîşê Şîrvan kir. Ferûh Yesar fêhm kir ku ew nikare li hember Heyder bisekine

û ji Yakûp Begê Pezgewran alîkarî xwest. Heyder êrîşî lawxalê xwe jî kir lê di şer de mir. Ji kêça Hesenê Dirêj a xwarziya Grekan sê kurên xwe hebûn. Yek ji wan jî Şah Îsmaîl bû. Mirîdên Heyder kurê wî Îsmaîl û Îbrahîm li Erdebîlê di malêka Dulqadiriyan de veşartin. Sumer dibêje: navê jinikê Aba (Ebe) bû ku ew ji êla Dulqadirî bû.(112-15) Ji alî êla **Şamî** yê Dulqadirî, ku kalê zarokê Heyder in ew revandin Gîlanê. Îsmaîl, di 12 saliya xwe de (1499) ji Gîlanê vediqete û diçe Ercûvanê. Îsmaîl ji welatê Deylem (rojavayê derya Kesk) tê Tarûmê û li dora wî 1500 mirîdên ji Şamiyan hebûn.(112-17) Wexta Îsmaîl vegerî Lahîcanê li cem wî mamostê xwe yê ji êla Şamî Huseyn Beg, kalê xwe yê Dulqadirî Abdal Beg, Hadîm Beg, Ristem Beg, Beyram Beg, Qere Pîrî û Aygût Beg hebûn.(112-17) Ew navê êl û begên li dora Îsmaîl jî didin xuyakirin ku ew ji Reşî û ji êlên bi Reşiyan re eleqedar in. Li Ercûvanê xeber ji mirîdên xwe yên li Anadolê re dişînê û ji wan daxwaz dike ku li Ezinganê kom bibin. Bi xwe jî diçe wir. Wexta tê Tercanê ew ji alî êla Ûstacalû ve tê pêşwazî kirin.(112-18) Ji wê jî em fêhm dikin ku wê demê êla Laîn-Layînî li wê herêmê bûye. Ji Anadolê û ji herêma Sêwas, Amasya, Tokatê: Ûstalcî, Şamî, Rûmî; ji Antalya: Tekelî; ji hêrêma Qeremanê Tûrgûtlû; ji Tarsûsê jî êla mîna: Varsak çûn cem. Ew êlana bûn ku dewlet damezirandin û dan berdewam kirin.(112-19)

Osmanî wê katê li Modon û Korûnê di şer de bûn. Beyazîtê II an li hember vê koça mezin dengê xwe nekir. Dulqadiriyê ku hakimê Mereş, Elbîstan û Xarpûtê jî bê deng man û deng nekirin ku gelek kes ji desthilatdariya wan herin tevlî Îsmaîl bibin. Di sala 1501 an de Qizilbaşê li Ezinganê kom bûbûn êrîşê Şîrvanê kirin. Paşê artêşa Pezgewran têk bir û fermî bû Şahê dewleta Safewî (1501). Di heman demê de li Antalya serhildaneka Sersoran ya girîng heye, ku serokê vê Şah Kûlû ye. Osmaniyan tîne vê astê ku temenmiya Kurdistanê dikarîbû ji kontrola wan derkeve. Sînorê Osmanî-Sefawiyan, Sêwas-Sûşehrî û Firat bû. Meletî, Dîvrîxî, Darende, Dîlok di destê Memlûkan de bû. Bi rû vê de serhildanên Celaliyan destpêdikin û ew jî dibe sedema gelek komkujî, sirgûn û koçberiyan. Kurd çûn Îranê û Anadolê. Di fermana 1578 an de jî tê xuyakirin ku Mûratê III an ji vê yekê acize.

Di şerê Pezgewran (Elvend) û Îsmaîl de, Safewî di 1501 an de bi serketin û Îsmaîl li ser navê 12 îmaman xutbe xwend û li textê Erdebîlê rûnişt. Bi ser vê Hoca Sadeddîn wiha got:

| | |
|---|---|
| Başina tac aldi çikti Îsmaîl | *Tac da serê xwe û derket Îsmaîl* |
| Îttî bi-îdrak **Etrakî** mirîd | *Mirîdên* Etrak ên *nezan (kûçik?) ew derxistin.*(112-22) |

Wata min ji wê derxistî ev e: ew kesa hêrsa xwe dide xuyakirin, ku Kurdên koçberên (Etrak) Sersor û kûçik (-ît/tî-yan jî ewê ku wî radikin) ew dane ser text. Wekî berê jî min nivisî dîtina min e; ji bo Kurdên niştecîh yan jî yên sunnî peyva Ekrad, **Etrak jî ji bo Kurdên koçber** bi kar dihatî li vir jî tê ispat kirin. Ku dîrokzanên Tirk ji wan re dibêjin Tirkmen.

Şah Îsmaîl bi keça begê Mûsil-lû re zewicî û jê kurê xwe yê bi navê Tahmasb hate dinyayê. Lawê xwe di sala 1515 an de kire waliye Xorasan û xezûrê xwe Emîr Begê Mûsilî jî kire mamostê wî, di sala 1522 an de jî ji wezîfê girt.[112-55] Îsmaîl ji alî bavan ve Kurd bû; Tahmasb jî ji herdû aliyan ve Kurde.

## Êlên Mezin ên ku Dewleta Safewî Avakirine

**1- Rûmî:** Ew ji alî êlên Sersorên li Sêwas, Qerehîsar (Şebîn), Tokat, Amasya pêkdihat. Piraniya wan li dora Şîrvanê di serokatiya Aras Xan de dijîn. Osmaniyan wira girt bi şûnde gelek mal û can dan û li alî Aras Baran xwe bi girtin dan. Hinek li Xoy û hinek jî li Xorasan-Nişabûr dijîn.[112-143] Rolêka pir girîng lîst û gelek beg jêderketin. Wek: Dîv Siltan, Pîrî Beg û Nûr Elî.

**2- Ûstacalan:** Ew jî li Sêwas, Amasya, Tokatê dijîn û hinek êlên xwe heta Kirşehîrê belav dibûn û ji wan re 'Ûlû Yoruk' dihate gotin (Şadî-Okçû?). Navê xwe ji Ûsta Hecî digirtin. (Tê zanîn ku ji Gîlan hatin Acemî Îraq, ji wir jî çûn Ezerbeycan û ji wir jî çûn diyarê Rûm (Qerehîsar). Şah Îsmaîl jî li ba wan bû mêvan (-Cimiû'i tevarîj-).[112-44] Gelek beg jê derketin, lê ya balkêş Kurd Bege. Li Halhal, Korta Şadî de bi Şamlûyan ve tevhev dijîn û warekî wanî herdemî tunebû.[112-144] Li van deveran hîna jî Kurd hene.

**3- Tekelî:** Li Antalya bûn. Ew li dijî Ûstacalî, Şamî û Dulqadirên ku di xizmeta Hamza Mîrza de şerkirin, perîşan bûn û reviyan Bexdayê. Di sala 1596 an de ji Şah derbeka mezin xwarin; yên ji ber wî reviyabûn jî xwe avêtin paş melîkê Amûl û Şah Ebbas ferman da, ku hemû Tekelûyan bikujin.[112-169)

**4- Şamî:** Havînan diçûn Ûzûn Yayla, zivistanan jî li Heleb, Dîlokê dijiyan û di dema Osmaniyan de wek 'Tirkmenên Helebê' dihatin nasîn. Begê xwe yê navdar Lala Huseyn e, ku berê li Şîrvan, paşê jî li Heratê walî bû. Ji Şamlûyan, Mecnûn di sala 1552 an de waliyê Esferayinê bû.[112-93] Ji dema Selçûqiyan ve, di navbera Heleb û Sêwasê de koçber in. Di tarîxên farsî de wek "Etraki Şam" yan jî "Tirkmanî Heleb" derbas dibin. Ew jî, êlên mîna: Avşar, Bexdilî, Înallû, Harbendelû û Bayat in. Beşekî girîng li Xorasan, Rêy, Ezerbeycan jî hene. Berên xwe jî ev in: Bexdilî, Înalan, Hûdabendeliyan, Avciyan, Bîçeran, Abdûllan, Kerametî, Acîran, Arabgîran, Nilkas in.[112-173]

**5- Dulqadir:** Li Mereş, Bozok-Yozgat dijîn û gor jêderên Safewî ew 80.000 mal bûne. Abdal Beg li Mervê walî bû, ji ber Ozbekan reviya û Şah kincên jina lêkir û li ser kerê ew gerand. Di 1546 an de di navbera Dulqadir û Avşaran de alozî derket. Ji Dulqadiran Şah Kûlû Xelîfe, ji Avşaran Sevûndûk Beg gihîştin hevdu û aram kirin.[112-95] Berên xwe ev in: Kavûrgan (Seraks), Soklen (Kirman), Şemseddînan (Qerebax), Eymûr, Heciyan (li Esterabad), Sarû, Şêxan, Camûsan, Çîçekan.[112-178] Bawer dikim Oxçû ji vê êlê ne.

**Êlên Biçûk:**

**1- Varsak:** Li Tarsûsê bûn.

**2- Çepnî (Şêxbizin?):** Di sedsala XVI an de beşekî xwe di nava Tirk-

menên Helebê de, beşek jî di nava Ûlû Yorukên Sêwas, Tokat û Amasya de bûn. Dîsa beşekî mezin jî li Trabzon, Baybûrt, Gîresûn û Canîkê dijîn.

**3- Arabgîrî:** Li Meletî bûn û ji wir gelek Sersor çûn Îranê. Paşê tevlî Şamiyan bûn.

**4- Tûrgûtî:** Qereman in.

**5-Bozcaî**: Girêdayî Heleb Tirkmeniyan e.

**6- Acîrî:** Girêdayî Heleb Tirkmeniyan e.

**7- Hinisan:** Kurd in.

**8- Çemîşgezekî:** Kurd in û ji Dêrsîmê ne.

**9- Qeremanî:** Di dema Şah Îsmaîl de ew li Arranê dijîn. Navê xwe ji begê bi navê Qereman wergirt. Ji begê wê êlê Beyram, Xorasan hate girtin bi şûnde bû waliyê eyaleta ku Belh, Murxab û Garcîstan di nav de ye. Di sala 1512 an de di şerê Ozbekan de mir.(112-54)

**10- Avşar:** Begê xwe Şah Ruh di heynana Xorasanê ya cara duyemîn de (1513) navê xwe derbas dibe. Siltan Elî Mirza jî di Çaldiranê de got Şah ez im û jiyana Şah Îsmaîl rizgarkir.(112-56) Di dema Tahmasb de piraniya Avşaran li Kûh Gîlûyê û Xuzîstanê dijîn. Di sala 1548 an de waliyê Kûh Gîlûyê jî Avşar Mehmûd Xan bû ku 3000 siwariyên xwe hebûn. Dema Tahmasb mir serokê Avşaran Xelîl Xan bû ku di bin fermana wî de 10.000 kon hebûn.(112-100) Di sala 1580 an de Şah Îsmaîlekî sexte derket û Lor li dora xwe komkirin. Êrîşê Avşarên Kûh Gîlûye kir û hemû belav kirin.(112-132) Êlên Avşar: Gunduz, Araş, Alp, Eber û Îman Avşari ne. Eberî ji ber Şah Ebbas li Kazwînê dijîn. Ebbas ew şandin Abiverd û Cemşîdê Gurcî jê re kire serok.(112-191)

**11- Tirkmen:** Beşên êlên Mûsilî û Pûrneken ji Pezgewrên di nava Sefawiyan re tê gotin. Di esas de ecêb e, ji ber ku êlên din jî Tirkmen in çima tenê ji wan re gotine? Tahmasb jî bi keçikeka begê Mûsilî re zewicî; kurên xwe Muhammed û Mirza Siltan jê vê jinikê bûn.(112-101)

**12- Qajar (Kaçar):** Li **Erranê** bûn. Piştî Osmaniyan wira girtin, çûn aliyê Îranê. Berê xwe ev in: Axcakoyûn, Axçan, Şam Bayad, Yîva, Îgirmî Dort.(112-184) Axcakoyûn, yek ji êla Dulqadiran pêk tê ya herî bi hêz e. Li sedsala XVI an li Mereş-Elbîstan, Sêwas, Amedê bûn. Sala 1527 an tevlî serhildana Kalender Çelebî bûn. Li Kirşehîr, Qonya, Afyon û Aydinê jî ew hene. Yîva: bi vî navî di nav Tirkmenên Helebê, Dulqadir û Yenî Îl de êl hene.(112-186)

Koçberiya ji Anadol berbi Îranê sedsalan ajot; koça yekemîn di sala 1336 an de waliye Moxolan yê Amedê Alî Paşa, Ûyrat êrişî hukumdarê Îlxanli Arpagaûn re destpêkir. Bi serketina Ûyrat re ji Kurdistanê gelek Moxol û Tirk çûn Îranê. Di heman salê de, ji Anatoliya Navîn koçberiyek pêkhat.(112-4) Di sala 1618 an de Kurd bi zorê koçberî Îranê kirin. Piştî wê demê ji salên 1692 an bi şûnde jî, Kurd ji çolên Sûriyê çûn Îranê. Lê mirov dikare bibêje ku demên ku nüser tîne ziman koçkirin hîn ne sîstematîk û bi berdewamî bûn. Yekê jî tenê Beranî yan jî Sersor neçûn Îranê. Kurdên di nava Pezgewran û Osmaniyan

de yên sunnî jî çûn; sedema vê, bê tehamûla Tirkan ya li hember Kurdan bû. Çobanli Şêx Hesen û Demîrtaş ji Anadola Navîn grûbek bir, ku ji herdû komên din pirtir bû. Di sedsala XV an de Beranî û Pezgewr jî çûn Îranê. Beraniyan ji dora Mereş-Elbîstanê Axaç Erî birin. Ji bo ku di nav daristanê de dijîn ew nava lênan. Berdewamiya wan koçana hertim hebû.(112-5)

Di sedsala XVI an de li Îranê xelk wek Heyderî û Nemetî bûn du beş; damezinerê Heyderîtiyê Şêx Heyder e, ku li sedsala XIII an li Xorasan hatiye dinê û radîkal e. Îbrahîm Faxraîce jî vê cûda şirove dike: Safewî alîgirê Şêx Heyder (bavê Îsmaîl); Pezgewr jî alîgirê Şêx Nemetullah bûn û herdûyan jî ji bo desthilatdariyê têkoşiyan.(95-54) Mumkune ku di vê demê de guhartin di nava mezhebê de pêk hatibe. Yanî pêvajoyekî ji Alavîtiya radikal (wek Zerdeştî) berbi Şîatiya îro destpêkiribe. Ji bo ku nefreta misilmanan zêde nekişînin ser xwe, rêvebirên dewletê ew pêdiviyan dîtibin.

Îsmaîlê didûyan ji nişkeva mir; êlên di nava dewletê de ketin pêşbirka text û herkesî dixwest ji yên din zêdetir cîh bidest bixin. Bi ser vê de, Tirkmen bi Tekeliyan ve li hember Şamî û Ûstacaliyan ketin tekoşînê. Emîrên Xorasan kom bûn; wana Alî Kûlû Xan ji xwe re kirin xanedanê xanê û Ebbas Mîrzayê 10 salî jî kirin hukumdar.(112-126) Tirkmenên bi vî awayî têne bi navkirin piranî êlên ji Pezgewran veqetîne, yên din jî di damezirandina dewletê de rolên sereke lîstibûn. Di vê tekoşîna navxweyî de aliyê êlên Xorasanê bi serket û Ebbas anîn ser text.

Şah Ebbas hate ser desthiladariyê bi şûnde, êlên Kurd ku ew anîn wê astê û kirin Şah jî re, pişta xwe çexkir û gelek ji wan li nava Îranê belavkirin. Ji wan êlana: Avşar, Dulqadir, Qaçar, Bayat û yên din warên xwe yên berê winda kirin. Ji ber wê: Avşar ji Kûh Gîlû, Dulqadir ji eyaleta Fars, Qaçar ji Qerebax, Bayatan jî Kezzaz û Girûhrûd ji dest çû.(112-148) Ew spasiya Ebbas bû. Sedema vê jî tirs û bihêz kirina desthilatdariya xwe bû. Ji wan êlana ditirsî, ku rojekê dê wî jî ji text deynin. Ji bilî wana desthilatdariya Lor, Gîlan, Mazenderan, Sîstan û **Lar** jî belav kir. **Heta li nava hinekan nifûsa Tirk bi cîh kir.**(112-152) Dîrokzanê Tirk xwe li vir dide dest. Bi rastî jî li Xorasan min dît: Li navebra gelek gundên Kurd, yên Tirk û Farisan bi cîh kirine ku wan asîmîle yan jî kontrol bikin. Ew kiryarana li Îranê bûn; li bakûrê Kurdistanê û cîhên din heman kiryar berdewam bûn. Ji Anadolê jî koçberiye domkir. Di sala 1603 an de Erîvan dorpêç kiribû ku ji Anadolê 2.000 mal hatin. Ji bo ku wana li Anadolê gelek talan kirine, ji wan re "Sîl Supuren" yanî ewên erdê paqij û rêş dikî gotine. Şah, wana li Savê, Rêy, Huvar û Fîrûzkûh bi cîhkirin. Sala din komek din hat. Dîsa êla Mukadema li Pasînlerê jî çû û wana li Meraxa bicîh kirin. Dîsa ji Beydîliyan êla Gundogınûş kete xizmeta Şah û vê re gotin "Şah seven".(112-154) Di sedsala XVII an de Fîrûz Begê Begdîlî ji Rakkayê çû Îranê. Dema Şah Ebbas mir 93 beg li ser karbûn; ji wana 72 serokên êlan bûn. Ji wan dudu Afgan, yekî ji Sîstan û 12 de jî Çaxatay bûn.(112-156) Yên din serokên êlên Kurd in. Demeke jî begên biyanî didan ser êlên Kurd. Wek mînak: Gurcî Gûrgîn waliyê Gîlan û serokê Çepnî

yê. Gurcî Cemşîd jî hakimê Abiverd û serokê êlên mîna Avşar ê Eberlû yê ku sirgûne wir kirine.[112-156]

Nadîr Şah (ji Afşaran oba Kirklû bû),[131-176] artêşeka ji komando û hêzên çalak pêk anî, bi wan: Afgan ji welatê xwe avêtin, Osmanî û Rûs jî tirsandin. Bi wî awayî di sala 1736 an de artêşeka ji 80 hezarî avakir ku ew ji: Afgan, Tirkmenên deştê û Kurdên Xorasan, Tirkmenên Qizilbaş û hêzên ji rojavayê Îranê wek partîzanên Safewî pêk dihatin. Serbazên xwe bi piranî ji Qizilbaşan hilbijartibûn. Di sala 1741 an de artêşa xwe bûbû 150.000. Sala 1744 an tenê ji Hemedan 90 000 eskerên wî hebûn. Yên din wiha belav dibûn:

| | |
|---|---|
| Ji Xorasan (Kurdên sunnî) | 65.000 |
| Îraqî Ecem (şîa)-tufengcî | 45.000 |
| Lor, Bextiyarî, Erebên Xuzîstan | 50.000 |
| Ezerbeycan, Gûrcîstan, Ermenî, Şîrvan | 50.000 (Tirkmenên Şîa ne |

û ji çîna tufengcî-tivingê ne).[172-506] Wekî diyar dibe di artêşê de gelek Kurd hene. Lê Kurdên Xorasanê ne sunnî bûn, di wir de şaşitiyeka nûser heye. Ew Kurdana bûn ku dewleta Safewî li ser milên wan hate avakirin û ti caran sunnî nebûn. Bi vê awayê nebûn xwedî tiştekî jî. Ew jî nezanîna Kurdên demê nîşan dide, ku ji bo ol û mezhebê xwe feda kirin, mala xelkên din ava kirin, welatê xwe terk kirin û di dawiyê de jî sûcdar ew bûn...

## Êl
## (Eşîret)

Eşîret peyveka bi zimanê erebî ye, di kurdî de jî wek êl tê binavkirin. Êl çi ye, yan jî ji kê re êl tê gotin? Mirovên di organîzasyonan êlê de; ji bo ku xwe li dijî karasatan, komên mirovên din, xweza û xeterên din ji bo ku xwe hîn baştir biparêzin kom dibin; êl ji bo vê yekê pêk tê. Êl ji malê dest pêdike, bi kon, zom (1+3 malbat), oba û qebîle berdewam dike. Ahmet Ozer êlan wiha tarîf dike: Ewên bi xwîne bihev giredanî û li cîhekî bi şertên xwe taybet dijî û yên koçeber re tê gotin. Di nava êlê de giredana bi xwînê pir giringe û bi vê riyê girêdana bi malbat û merovatiyê têkiliyên di nav û dervayê êlê de tesîreka mezin çêdike.[78] Koma li ser bingeha malbatekê belav bûyî û pir bûnî re mirov dikare bibêje êl; mîna dareka şax, çilo û pel dide mirov dikare tarîf bike. Di vê de bingeh heman malbat û xwîn e. Dema malbatek derket dervayê sînorên merovatiya xwînê û meydaneka hîn fireh belav bû dibe êl. Dema malbat fireh bû, girêdana têkilî û hêzkirina malbatî kêm dibe û şûna wê yekê berjewendî, ol û edet digirin.[12-210] Ethem Xemgîn dibêje: Di dema berê de, êlitî ji malbatê destpêdikiriye û wek, qebîle (ber), êl berdewam dikiriye û êl jî girêdayî federasyona êlan ya bi navê **"Gaû"** ya bûne.[52]

Dema qala êlan tê kirin, koçberî, pêz, kon û komên gerok tên bîra mirov; gelo êl tenê koçber in? Dikare niştecîh jî bibin, lê dema êl niştecîh bê piştî demekê jî derdê êlên din yan jî mirovên din jî di navê kevin û êl taybetmendiya

xwe wenda bikin. Birêz Beşîkçî taybetmendiyên êlan û koçberiyê wiha dide xuyakirin: Koçberî, di pêşketina civakê di destpêkê de tê dîtin û sîstemeka ekonomîk û polîtîk e. Ji bo, ku bi dewar û jiyana civakê re têkildar e ekonomîk e û ji bo ku bi civakê din re tekîldare jî ew polîtîk e. Mirov dikare êla koçber wiha tarîf bike: Civakek: bi mal û cîhekî sabît re ne girêdayî, tenê bi sewalên serçûk re mijûl in. Ji bo ku zozanên hîn baştir peyda bikin, ji zozanan terin stepan û ji wan jî terin zozanan. Hertim di konan de dijîn, bi giredana xwînê û bi hîsên "em" ve girêdayî hev, tim dixwazin girêdayî serokekî bibin, xwediyê ekonomiyeka kêm-zêde girtî, girêdayî çanda xwe û laîk e.(167-68) Bi dîtina min mirov dikare li wê, sîstema eskerî jî zêde bike, lewra gor tarîfa Beşîkçî êl tenê wek koma ekonomîk xuya dikin. Lê ji piyê girîngî êla û koçberiyê yek jî eskerî ye û êrîşên ji derva ne. Bi piranî ew êrîş ku bûne sedem ew êl ji cîhên xwe barbikin û xwe wek rêxistineke eskerî jî organîze bikin. Li ser wî bingehê êlan sê taybetmendiyên xwe hene: Alî aborî, civakî û eskerî. Aborî li ser ajalan û hatina wan e, lewra tu dikarî ji cîhekî bibî cîhekî û mirov dikare li wê hêştir, hesp û ga jî zêde bike. Êl di nava xwe de û bi mirovên dervayê xwe re jî di têkîlî û bazarê de ne. Ji bo parastina êlê ew xwedî hêzaka eskerî ne jî. Gelek caran ew hêzên êlan tên cem hev federasyon û konfederasyonan pêk tînin. Di civaka Kurdên koçber de, rêxistinên hîn bilind ên mîna dewletê jî (Şadî, Germiyan, Qereman, Beranî û hwd) hebûne, lê ji bo ku ew xwe ji mentalîta êlîtiyê tam rizgar nekirine û yekîtiyeka hîn fireh û kûr pêk nanîne, dewletên avakirine dirêj nejîn. Wek mînak: Eger Şadî û Merwanî; Germiyan û Qereman bigihîştana hevûdu, îro Kurd xwedî dewleteka mina Rûsya fireh, bi serhejmareka pir û bi hêz bû.

Êla Kurd; yekîtiya kom û komên; ku endamên xwe ji tehlûkên derva biparêze û ji bo berdewamiya edetên kevn e. Rondot wiha bi beş kiriye: **Êl**: di bingeh de ji malbatê destpê dike, paşê çend mal dibin **bavik**, çend bavik **ber** a derdixin û ew jî êlan derdixin holê.(2-170)

Di nava êlên Kurd de rêvebiriyeka bi sîstem jî heye û di asta herî bilind de em Boy Beyî dibînin. Lê ew peyva Boy Beyî ne kurdî ye û ji tirkî ketiya nava zimanê me û di kurdî de peyva Mîr û Mîrêmîran heye. Li ser vê babetê Dr. T. Gunduz dibêje: Ji ber ku êl li cografyekê de, di nava hiqûqekê de him di nava hev de him jî li hember dewletê di nava sîstemekê de bûn. Gihîştina hevdû ya êlan ji alî rêvebiriyê de Boy begî tanî holê.(115-113) Wekî min gotî ew di kurdî de Mîrêmîran e; yanê serokê federasyonê ye. Heman nivîskar dibêje: Di derece yekemîn de Boy Beg hebû; wana bi pêşniyara pîrên êlê, kethûda û voyvodan û ji alî padîşah ve dihatin tayîn kirin. Di nava dewlet û êlê de kesê tekiliya bû.(115-113) Ew sîstem ji bo Reşiyan ne bi vî awayî bû; serokên êla ji alî gel ve dihatin hilbijartin û wan serokana jî Mîrêmîran di nava xwe de hildibijartin. Ew sîstem Osmaniyan ji bo federasyon êlên bihêz pêk dianiye; yên lawaz ji alî dewletê ve dihatine tayîn kirin. Serokên bi hêz, pir caran navê xwe didan ser êl an jî federasyona êlan.

C. Orhûnlû dibêje: navê êlan li destpêka ji navên serokan dihatin wergirtin. Paşê jî gor cîhê ku lê rûdiniştin dihate tespîtkirin. Sê-çar beşên ku ji nava êlekê derketî û bi navên cûda hatine destnîşan kirî jî rastiyeke.(90-105) Bi piranî êlên Kurd navê xwe ji serokên xwe digirtin; wek mînak: Xel-Xelika, Bil-Bilika, Şêx-Şêxika, Sêfo-Sêvika, Mil-Milan û hwd. Lê di dema Osmaniyan de, ew yeka ji alî dewletê ve bi zanistî hatiye guhartin. Gor herêman êl dabeş kirine û gelek êlan bi navekî xwendine. Ew jî karê me dijwartir dike. Wek mînak; ji bo gelek êlên li dora Helebê dijî re gotine "Tirkmenên Helebê" ku di nava wan de federasyona êla Reşiyan, Têrikan, Sewêdiyan û yên din hene. Di nava "Boz Ûlûs" de jî gelek êl û federasyonên êlan yên cûda hene.



**Ji gundê Beşqardeş malbateka Reşî**

## Parçên êlên ji hev veqetîne

Kurdên li dervayê welat, yanî ew ên îro li dervayê sînorên Kurdistanê dijîn, gelek caran hatine parçekirin. Sedemên vê yekê gelek in. Di serî de êrîşên ji derva ne; nakokiyên olî ne û şerê di nava êlan bi xwe de ye. Ew parçên ji hev veqetiyane li cografyaka gelek fireh belav dibin. Parçê Kurdên îro li navenda Anadolê dijîn: ji Lazqiyê bigire heta Heleb, Dilok, Gumgum, Meletî, Semsûr, Dêrsîm, Erzirûm, Qers, Agirî, Erîvan, Erdebîl, Tebrîz, Qazwîn, Reşt-Gîlan, Mazenderan, Xorasan, Herat û Hindîstanê belav dibin. Mirov dikare Xaneqîn û cîhên din jî li vê zêde bike...Îmkan û derfetê me niha bi sînor in û em nikarin

hemûyan tespît bikin; lê, yên ku hatine tespît kirin, emê li ber çavên we raxin, ku ji vê belavbûnê wêneyek derkeve holê.

Li Navenda Anadolê federasyona Reşiyan ji wan êlana pêk tê: Berkatî, Bilikî, Cûtikî, Celikî, Mifikî, Molikî, Nasirî, Oxçî, Omerî, Sêvikî, Şêxikî (Şêxbilan), Xelikî ne. Êlên din jî ev in: Canbeg, Şêxbizin-Lek, Şadî, Rûta, Mikaîlî, Têrikî, Zerikî, Sewêdî, Milan, Badilî, Pisî, Dimilî-Zaza-Qilorî, Sidûni, Doykan, Hêcibî, Atma, Bazikî, Şêxan (Haymana) ne.

Dîroknûsê Kurd M. E. Zekî di pirtûka xwe ya bi navê "Dîroka Kurdistan" de ji bo Kurdên li Qonya, Enqere, Sakarya û Sêwasê dibêje: Di dema Selim û birêvebirên din de û ji ber sedemên navxweyî hatine. Lê ez sedema ji ber şerê navxweyî hatine nabînim, bi piranî ji ber zilma Osmaniyan hatine. Zekî, êlan wiha dest nîşan dike:

| **Êl** | **Rewşa wan ê civakî** |
|---|---|
| **Şêx Bizinî** | 120 malbat in, bi Kurmancî dipeyivin û milekî yên li Kerkukê ne. |
| **Hecîbanli** | 300 mal in, ji Miliyên Hecîmanli ne, li rojavayê Qeyseriyê dijîn. |
| **Xatûnoglû** | 400 mal in, ji Miliyên Qerecdaxê hatine, li bûşure Yozgatê dijîn û nivkoçer in. |
| **Mahasî** | 300 malbat in. Nêzîkî Qirşehîrê rûdinên û ji Mila ne. |
| **Umranli** | 800 mal in, ji Mila ne û li rojavayê Qirşehîrê rûdinên. |
| **Bereketli** | 10 hezar mal in, li başûrê Qirşehîrê rûdinên. |
| **Tabûroglû** | 300 mal in, li bakûrê Qirşehîrê rûdinên, nivkoçer in. |
| **Şêx Bizinî** | Li Rojavayê gola Qoçhîsarê rûdinên. |
| **Cûdikanli** | 200 mal in, li başûrê Qoçhîsarê rûdinên, nîvkoçer in û tê texmînkirin ku ji Cûdî hatine. |
| **Halkanî** | 400 mal in. Ji herêma Kalifanî ya Rewandûzê hatine. |
| **Sifkanî** | 500 mal in. Li bakûrê Halkaniyan rûdinên. |
| **Nasirli** | 700 mal in. Li başûrê Enqerê-Qerealî rûdinên. |
| **Tirikan** | 400 mal in. Li rojavayê Enqerê rûdinên. |
| **Etmanîkan** | Ji Etmanîkên aliyê Bedlîsê ne, nêzîkî Enqerê ne. |
| **Zirikanli** | 500 mal in, li rojavayê bakûrê Enqerê rûdinên û beşekî ji yê Xinisê ne. |
| **Cihanbeyli** | 5.000 mal in, li rojavayê bakûrê Enqerê rûdinên. Beşekî li Haymana beşekî jî li Akşehîrê rûdinên. |
| **Lek** | 1000 mal in, Li Ardalanê-Leylakê dijîn. Lek Ji Şîrazê hatin û li Salmaz dijîn |

Beşek ji tespîtên rehmetî Zekî rast in; lê îro cîhê hinekan hatiye guhartin û gelek jî bi kêmasî ye. Piraniya Şêxbizinan Kurmancî dizanin lê zaravê wan Lerî/Lekî-Lorî ye. Wekî ku rehmetî diyar dike, Lek li Erdalanê û Salmasê

dijîn. Lek û Şêxbizin yek e. Hecîbaniyan re jî îro Hêciba tê gotin. Xatûnoglû îro niştecîh in. Berkatî ji Reşiyan tên hesibandin. Cûtika îro niştecîh in, lê ti têkiliya wan bi Cûdî re nîne. Tirikan di esas de navê xwe Têrika ye. Zirikan wek Zerîkî, Cîhanbeylî jî wek Canbeg tên zanîn.



**Gundê Heciba li kêleka Kizilirmak e - Qirşehîr**

Gorî nûserê herêmî Xelîl Îbrahîm Uçak jî, li Anadoliya Navîn; êla Modan, Şêx Bizin, Kallaç, Têrkan, Rişvan, Mikail, Şihan, Şerefli, Cambek hene û Şêxbizinî li 29 gundan belav bûne. Kalaç û Şereflî nizanim kîjan êl in û êla herî mezin jî Reşî ne. Bi dîtina Cevdet Turkay di dema Osmaniyan de êlên li dorê Haymanê wiha belav dibûn:

| Navê Êlê | Cîhê lê dijî | Civaka Girêdayî |
|---|---|---|
| **Qerekeçilî** | Amed, Balikesîr, Sîwerek, Haymana, Birecik, Kutahya, Mêrdîn, Gordes, Rakka | *Tirkmen* |
| **Yuzukûtlû** | Haymana, Aksaray, Sêwas, Qirşehir, Qoçhîsar | *Tirkmen* |
| **Boynu Încelî*** | Qonya, Qereman, Bozkir, Hecîbektaş, Edene, Mereş, Ilgaz, Nevşehîr, Develî | *Yoruk* |

*(*Ji êla Boynû-încelî û taîfa Tirkmenên Danişmendî ne. Zozanên xwe Dewelî û Erciyes in. Zivistanan jî li Aksaray û Qirşehîrê bûn. Ewên li Nevşehîrê bi cîh bûn Qaraca Kurd, Hereklî, Savcili û nefs-î Boynû Încelî û 10 êlên ji wan peydabûyî ne. Îro em nizanin ku Qerekeçîliyên li Haymanê bi kîjan navî ne? Êlên din ên Boynû Încelî û Yuzukûtlû jî nizanin kîjan in).*

| | | |
|---|---|---|
| **Cîhanbeg** | Erzirûm, Meletî, Enqere, Kutahya, Qers, Çildir, Ilgaz, Sêwas, Xarpût, Îskilîp, Akşehîr, Qonya, Bozok, Amasya, Çorûm, Qastamonû, Rakka, Çêrmûk. | *Ekradê Konar-koçer* |

| | | |
|---|---|---|
| **Mikaîl** | Haymana, Kengirî, Ergûvan, Xarpût, Adana, Çerkeş, Sencaxa Uzer. | *Tirkmenên Koçer* |
| **Modan (Modanlû)** | Rakka, Erzirûm, Qers, Çildir, Sêwas,Haymana, Qoçhisar, Qereman, Kocaelî, Biga, Rûmelî, Balikesîr. | *Ekrad* |
| **Rişvan** | Meletî, Enqere, Rakka, Halep, Dîlok, Kirşehîr, Tosya, Mereş, Nîzîp, Birecik,Sîwerek, Sêwas, Qonya, Şam, Kilîs, Çorûm, Erzirûm, Besnî, Zîle, Qeyserî, Bozok | *Konar-Goçer Ekrad* |
| **Sayfan (Sayfkanlû)** | Enqere, Çanqiri, Qonya, Bozok | *Ekrad* |
| **Şeref (Şereflû)** | Sêwas, Mereş, Qoçhisar, Kirşehîr, Nevşehîr, (Wêranşar-Torbali) Amed, Aksaray, Aydin, Soma, Çanqiri, Qonya, Kutahya | ------ |
| **Şeyh Bizin** | Kutahya. Îskîlîp, Palû, Geyve, Haymana, Mêrdîn, Çanqiri, Rakka, Amed, Erzirûm, Qastamonû | *Ekradê koçber* |
| **Terikanli** | Erxanî, Haymana, Meletî, Qonya, Mereş, Kirşehîr, Mûcûr, Sêwas, Çerkeş, Kutahya, Rakka, Erzirûm, Şarkî Qerehisar | *Ekradê koçber* |

Ew êl û federasyonên ku nivîskar li jor hejmartine bi tevahî Kurd in û ez piraniya wan ji nêz ve nasdikim û bi hinekan re xisimatiya me heye. Di Kurdbûna wan de ti guman û şik nîne, kesek nikare vê îddea jî bike. Wekî nivîskar dibêje ew Yoruk in, ne raste. Tirkmenbûna wan jî raste, lê bi wata ku min di destpêka vê pirtûkê de gotiye; ne ku wekî mebesta nivîskar bi wata Tirkbûne ye!

Di deftêra Enqere Tahrir a ji sala 1463 an de mayî, girêdayî Enqerê Kizilcihamamê (Yabanabad-Çamlidere) gundekî bi navê "Kurtler" derdikeve holê. Gor vê defterê ew gund di sala 1463 an de 35 xane ye, 1523-30 an de 32 xane û 18 bekar; di sala 1571-72 an de 65 xane û 2 mucerred e.[179-41] Mirov dikare vî gundî, di fermiyetê de gundê yekemîn hesab bike, lê berî vî gundî jî bi sedsalan gundên Kurdan li Anadolê hebûn. Ew bi navên cûda û bi navên hatî guhartin derbas dibin. Em baş dizanin ku piştî sala 1000 an Kurdên Koçber li Anadolê koçer, nîvkoçer û niştecîh in.

Dr. Celîlê Celîl ji dîrokzanê Ermenî Încîciyan radigihîne, ku di sedsala XVIII an de li aliyê Mûşê ev êlana hebûne: Ban Çinarî, Sînanî, Batikî, Şatkî, Sîpkî, Hasnî, Berazî, Mimanî, Omirî, Şêxbizin. Tê gotin ku di çiyayên Erzirûmê de 1500 malbatên Şêxbizinî û Sewêdî ji dijîn. Ji wan ên ku nûser dinivîsî Sîpkî, Şadî, Omerî, Berazî, Şêxbizinî li navenda Anadolê hene. Eger bûyîna Sewêdan raste, ew jî li Anadolê hene. Dîsa beşên wan em li Arran, Erzirûm û Ezinganê jî dibînin. Torî li ser wan agahiyan dide. Êlên li Azerbaycanê ev in: Rawadî, Celalî, Milan, Radran, Reşî, Seklûz, Lek û Gardavarî ne. Evên ku li bakûre Wan, Çorûh, Bedlîs-Mûş, Erzirûm û Ezinganê jî: Pencîhan, Seylokan, Şeker, Ez, Lolan, Hesnan, Îsavî, Cebran, Belikan, Memekan, Zirikan, Reşî, Bazik, Gerdî,

Pizyan, Şêxhbizinî, Zeylan, Şadîr, Başman, Hemdîgan, Manûran, Haydaran, Yezidi û Adaman in.[38] Ji wan gelek êl hîna jî li Anatoliya Navîn û Anadolê dijîn. Dîsa di nav wan Celaliyan de em beşekî parçên wan li Anadolê jî dibînin. Ji wan Xelika û Bilika di nav Reşiyan de xuya dikin û li navenda Anadolê dijîn:

**Celalî:**

| **Êl** | **Tirkiye** | **Îran** | **Rûsya** | **Bi Giştî** |
|---|---|---|---|---|
| Xelikan | 250 | 260 | 40 | 550 |
| **Sakyan** | 230 | 200 | 50 | 480 |
| Balhekan | 250 | 150 | 160 | 560 |
| Misirkan û Banoka | 30 | 110 | 20 | 160 |
| Cenûkya | 200 | ---- | ---- | 200 |
| Hesê Soran | 200 | 10 | 30 | 240 |
| Qizil-Paşih | 40 | 150 | ---- | 190 |

Bi dîtina min Balhekanên derbas dibin Bilikî yên li Qonya ne; Cenûkya jî Cûtîkî ne û Sakyan jî Saka ne û ew girêdayî Reşiya ne. Li Xorasanê jî gundekî bi navê Xelikan heye ku min ziyaret kiribû û Hecî Elî Esker Xanî digot "em Xelikî" ne.



**Gundê Xelikan, Hecî Elî Esker- Xorasan**

Wekîl Mûstafayev dibêje: Celalî dibin du bêş: Yek Sêvikî yek jî Celalî ye.

Bahaeddînan, Cemaldînan, Hesenan, Bîndanan bi Harbendelî, Badilli, Mamavî, Bozkoyûnan, Anteran, Koçûr Avşar, Guneş û Omerî girêdayî Milan in. Di sala 1711 an de li dora Qers, Erzûrim û Çildirê hatine bi cîh kirin, lê piştre hatibûn dora Amed û Mêrdînê. Kiliç, Pirol (Pirdil) Tacîr, Bektaşan jî hatibûn Heleb û Mereşê. Ji bo ku wana dîsa vegerin cîhên xwe yên berê waliyê Rakka Huseyn Paşa di 1730 an de ji hemû kesên eleqeder re ferman şandin.(90-95)

Waliyê Ezinganê yê kevn Ali Kemalî, di sala 1930 an de pirtûkek bi navê "Ezingan" nivîsandiye; di vê pirtûkê de jî mirov dibîne ku rêvebirên dewletê bi çavêkî çawa li Kurdan dinêrin û çiqas li dijî Kurdan nijadperest û faşîst in. Ew kes bi navê dîrok nivîsandinê heqeratan li gelê Kurd dike û kîna xwe vedirêşe. Em nikarin di teraziya wan kevin, em miletekî esîl in, ji gelan re ti dijminatiya me tune. Ji bo ku pirtûk kevne û di cîh de lêkolîn li ser hatiye kirin, emê cîhên bi istifade bi xizmeta we kin:

**Êlên li Kîxî yê:**

| **Navê Êlê** | **Şênî** | **Gundên lê rûdinên** |
|---|---|---|
| **Canbeg** | - | Başkoy |
| " | - | Cibo |
| " | - | Geylan |
| " | - | Kolanli |
| " | - | Kizil Çûbûk |
| " | 174 | Hunzan |
| **Canbeg** | 72 | Kari kom |
| " | - | Sanûcak |
| " | - | Şarûk |
| " | - | Şilikan |
| " | - | Zirzanos |
| " | - | Dimlek |
| " | - | Dizmori |
| " | 1756 | Qereliyan |
| Pûtikanli | 1108 | 7 gund in |
| Zimtik | 3188 | 15 gund in |
| Kûbatli | 2002 | 7 gund in |
| **Lertik** | 1610 | 9 gund in |

Kemalî tîne ziman ku ew êl ji Şadiyan veqetiyane. Bi dîtina min jî ew êl hemû di bin sîwana dewleta Şadiyan de gihiştibûn hev. Wek em dizanin

beşekî mezin ê Şadiyan û hinek Canbeg jî li Xorasanê rûdinên.

Di nav konfederasyona Mila yê ku li Serxetê û Binxetê dijî de gelek êl hene; ji wan hinekan parçên xwe li Anadola Navîn in. K. Yeşîloz wan wiha radigihîne: Di nava Milan de êlên mîna: Têrikan, Nasiriyan, **Çûyereş (Çûxreş)**, Mirdêsî û Canbeg jî hene.(39) Ji wan navê Çûxreş balkêşe. Min li destpêka pirtûkê jî nivîsî bû, ku li ser kevirê ji Alallah derketî de agahîyên ji salên 1650 BÎ de manî û navê Çûxreşiyan jî hatibû nivîsîn ku ew hîna jî hene û li dora Hatay/Sûriyê dijîne û pismamê Reşiyan e.

| | | |
|---|---|---|
| **Oxçiyan** | **116** | **Haçator** |
| **Oxçiyan** | **900** | **----** |
| Qerebaş | 1416 | 20 gund |
| **Sêvkar** | **290** | **Sêvkar** |
| Çarikli | 1083 | 8 gund |
| Giransor | 2502 | 14 gund |
| Bilice | 754 | 2 gund |
| Kureyşanli | 390 | 4 gund |
| Hormek | 2974 | 16 gund |
| Seter | 382 | 2 gund |
| Karsanli | 480 | 3 gund |
| Kimsorlû | 479 | Holhol |
| Maskanli | 333 | Maskani Herdif |
| Çêkanli | 320 | Çêkan |
| Kamhût | 453 | 2 gund |
| Îzolli | 184 | Hallan |
| Şavalyan | 125 | Elbegi |
| Kir | 408 | 2 gund |
| Maksûdanli | 1402 | 20 gund |
| Çerkes | 194 | 2 gund |

Wan êlana jî bi yên li Dêrsîmê ve girê dide. Di navça Mazkirtê de jî gelek êlan bi nav dike û yên ku ji bo me girîng Yûsûfane û dibêje qebîla xwe jî Gevran, Şêxbizinî û Mila ne. Hejmar 1330 kes in.(25) Sêvika û Oxçûyan li navenda Anadolê jî hene. Sêvika li Xorasanê jî hene. Kemalî êlên wêder dike du beş: Şêx Hesenî û Dêrsîmî. Evên girêdayî Şêx Hesen jî du beş in: Seydan û Şêx Hesen. Ji Seydan yan jî Koçûşaxi hene ku ev jî sê beş in: Koçûşaxi, Reşikûşaxi û Şamûşaxi (Ovacik). Êlên Dêrsîmê jî beşek jê wiha ye; Îzolî (Mazgirt), Oxçiyan (Kîxî), Rûtanli (Bahtiyarûşaxi-ev li Xorasanê jî hene û emê li ser bisekinin), Alanî (ji Xorasanê hatine), Demenanli ji Xorasanê hatine.(25) Koçûşaxiyan navê xwe ji Beraniyan wergirtine û dûmahiya wan in; ku bi Reşî û Şamliyan ve ji kokekî têne û berê jî me qal kiribû. Ew êlana giştik di nav Çemişkezegiyên Xorasanê de jî hene.

Bi qasî Kazim Yeşîlgoz radigihîne piştî belavbûna Beraniyan, êlên ku nexwestin xwe bi Pezgewran re girêbidin belav bûn. Beşek jê çû Xorasan û

ketin bin birêvebiriya Tîmûr, beşek jî berbi rojava çûn. Ji wana yek jî **Çaxûran-Çakanlar** bûn ku gelek alîkarî bi Qere Yûsûf re kiribûn û li Ezerbeycan (Erdebîl) war girtibûn û hatin Qerekoçanê. **Ew ji Kurdên Sadic bûn. Oxiyan (Oxçûyan) jî girêdayî Kurdên Qefqasê yên bi navê Sadic tên nasîn bûn** û ew hîna jî li Tepê hene.[39]

M. Kalman agahiyên eceb dide: li Dêrsîm-Mazgîrtê êlên mîna Alan-Kurmanc (350 xane-li Nazimiyê 26 xane-Zaza) Şadî (598 xane), Şêxbazan-Kurmanc; Li Ovacikê Pezgewran/Kevan-zaza; Reşikan/Kocan-zaza; li Pertekê Halikan-zaza hene.[151-179] Wekî em dizanin Alan Zaza ne, Şêxbizinî Ler, Xelikî Kurmanc in. Reşiyên Zaza jî hene. Gelo ew tenê navên wek hev in, yan jî ew êlana tevhev bûn û hinekan zaravê yên din fêr bûn? Alanên zaza (li herêmê Alîz jî tê gotin) di navbera Dêrsîm, Nazmiye û Mazgîrtê de hîna hene û di gundên mîna Gomemîş, Kortesor, Pax, Xezerî, Kocakoç û yên din de ne, ku nêzîkî 20-30 gund in. Di şerê Dêrsîmê de em dibînin ku artêşa Tirk cîhên êlan tespit dike. Gorî vê: Li Qers-Tûzlûcayê; Rûtikan û Cûtûkanî hene. Li Eleşkirtê, Şadî, Badili, Barzan (gereg ev Berazî be) hene. Li Patnosê: Sîpkan; li Bazîtê Xelikan hene ku hejmara wan 3842 kes in û 700 kes bi çek in.[44] Ew êlên ku navî xwe derbas dibin hemû li Anadolê jî dijîn.

Li Edenê-Kozanê pênc gund hene ku navên wan: Aslanli, Hayvali, Hacilar, Uç Dût, Hamam in. Ew Kurdana ji êlên mîna Kiliçli û Afşaran in. Gundî dibêjin ew ji Xorasanê hatine û ji êla Lek û Kirintiya ne. Li Afganistan, Tirkiye û Îranê jî ev êl hene . Wek tê nivîsandin di belgeyên Osmanî de Lek, Haciyan û Karnitlû.[49] Bi qasî ez dizanim ew êl girêdayî Şêxbizin-Lera ne.

Li bajarê Wanê jî neh êlên mezin dijîn; Nimiran, Bililan, Mehmûdî; Denbili Beht, Mamî Rişan (li kela Hoşabê dijîn), Pazûkî, Beradost, Rozkî-Rojkî, Roçkî (du qebîle ne, Balbaşi û Kûvalisi).[8] Têkiliya Mamî Rişan û Reşiyan heye.

Li Helebê jî 27 êl hene û wanê li eyaletê Mereş, Heleb û Riha yê dijîn: **Reşî, Rişvan**, Qere Bezîkî, Karik, **Okçezenî**, Mûsûbeyî, Simarî, Çimkanî, Malbî, **Şêxan, Turun**, Bameriyanî, Şakakî, Berazî, Hinanî, Cemaldinî, Kûmankiş-Kemankeş, Şerfanî, **Selîfanî, Ohyanî**, Ekradîcûm, Kasri Ekradî, Bizik, Berazî Danel, Biracûn ekradî, Berazî Bakan, Elbeyî. Di nav wan de Reşî pir bi qedir tên hesibandin. Berazî li ser kaniyên Firat dijîn, çandiniyê dikin û piraniya wan êlana ne misilman in. Êlên mîna Ekradîcûm, Kasri ekradî li navenda navça Harmê bi cîh bûne. Bizik, Daneî, Bakikminc û Elbelî li kêleka milê Firat bi cîh bûne.[8] Piraniya wan û eşîretên li çiyayên Elazîzê dijîn, jiyana xwe mîna jiyana êlên Êzîdî yên li Sîncarê ye. Îro jî li dora deşta Amîkê gelek êlên Kurd hene ku parçên xwe li navenda Anadolê ne. Dîsa li Lazqiyê êlên mîna **Zirikan**, Abadli, Koçan, **Şêxanî**, Mamlê û Mûşane hene. Dîsa li Hama û Humusê jî gelek parçên wan Kurdan hene, lê zêde agahî li ser wan nînin. Dibe ku gelek ji wan asîmîle bûne.

Navça herî zêde koç girtî Semsûr e, di sala 1516 an de kete nava sînorên

Osmaniyan bişûnde, qeyda nifûsê yekemîn pêk hatin. Di sala 1519 an de 28 tevgerên koçberiyê qeyd bûne. Yên ji Gergerê hatine di dora yekemîn de ne. Çar xanên Durzî jî hene. Di sala 1524 an de 26 xane hatine.[109-101] Ji vê demê heta roja îro li Semsûr û navçên wê gelek êlên Kurdên ku parçên xwe li navenda Anadol û Xorasanê ne hene.

**Êlên li Semsûrê:**[85-52]

1. Bereket
2. Payamli Huseyn
3. Berehat
4. Cûyban
5. Rişvan
6. Dikan
7. Xelikan
8. Kavî
9. Çelîkan
10. Komur Kawî
11. Zerikan
12. Muzikan
13. Zaxfena
14. Turogan
15. Rûmyan
16. Secan

**Cemeetên li Semsûrê:**[85-53]

1. Belikan
2. Qeler
3. Bereket
4. Komur Kawî
5. Çelîkan
6. Benam
7. Çûdikan
8. Hoşnîşîn (Reşî)
9. Xelikan
10. Koseyan (Reşî)
11. Mahyan (Reşî)
12. Mirdêsî
13. Nasirî
14. Okçûyan
15. Reşî
16. Rişvan (Badilî)
17. Rûmiyan (Reşî)
18. Sevir (Sêvika)-Reşî

19. Sinik-Senek (Reşî)
20. Sevkan
21. Şêxbalan
22. Zîkokan (Reşî)
23. Zerikan
24. Diranan
25. Dimişkan
26. Hecîlar
27. Qere Şêxan (Bexdilî)
28. Kaskan (Milan) ( ji nava 50 heban me girtin. Ji bilî wan êlên mîna Cûtikan, Xelikan, Terikan jî hene).

**Besnî:**[85-54]

Êla Reşî, Atma hene; Cemeet jî ev in: Bexdilî, Kawî, Mirdêsî, Rişvan, Kurdû, Reşî (Bexdilî) û Oymak a Terikanê heye.

**Gerger:**

Êlên Rûtan, Reyhan, Kawî, Canbeg, Dirêjan û civata Mirdêsî hene.

**Kahta/Kolik:**

Êlên Malkanî, Kawî, Rûta, Zerîkî, Canbeg, Îzol û civatên mîna Zîrokan (Reşî) hene.[85-55]

Gor Mûstafa Sûcû jî ev hene:[120-10]

**Semsûr (Navend):** Bereketî, Kawî, Komur Kawîsî, Payamli Huseyn, Rişvan, Rûmyan, Tirkoglû, Belikan, Dimişkan, Hidirsor/Hizirsûr, Mûsûrkan, Şêxbalan, Hinût, Hamzeyîn, Rûtan.

**Besnî:** Çakal/Çakalli (koçber in), Rişvan, Dêrîk, Alîşîr, Arap, Mansûr, Bayat, Koseyan/Keseyan, Hesenan, Mehman, Atma, Îza, Besnî (Çerkez), Afşar, Qerelar, Oyrat.

**Çelîkan:** Çelîkan, Bistikan, Qeler, Bûxara, Abdulharap.

**Gerger:** Kerker, Kawi, Mûsaoxûllari, Reyhan, Alkeçî, Merdisî

**Golbaşi:** Çelîk, Haciyan, Nasirî.

**Kahta:** Mûlûkan, Merdis, Kawî, Bezikî, Alût, Îzolî, Gevûz.


**Samsat:** Bazikî/Bazûk, Merdisî, Hecîhalan, Arap, Sînanli.

**Sincik:** Halikan, Hamzakan, Sinikan/Senek, Çûkan, Arnût.

**Tut:** Avşar, Kasikan.[120-11] Wekî ji wir jî xuya dike, gelek êlên li Anadolê parçên xwe hîna jî li Semsûrê hene. Ne tenê ew, mirov dikare wan êlana di nav piranî rêxistin (Saka, Şadî, Germiyan, Beranî, Celalî…) û serhildanan de jî bibîne.

Li navça Semsûrê Sincikê em rastî êl û têkiliyên muhtemel ên ecep tên. Yek ji wana êla bi nav û deng a Qereçorî ye. Ekrem Îzî dibêje: Baş nayê zanîn ku ew kingê li Sincikê bi cîh bûne, lê îhtîmaleke ku di sala 1691 an de bi cîh bibin. Qereçorî li Palûyê sê bira bûn. Vana: Memo, **Mikaîl** û Maksût bûn û li ser erdê şer kirin û du kes kuştin. Welatê xwe terk kirin û hatin Kolikê/Kahta cem serokê Reşiyan. Wî jî li bakûr herêma çiyayî (Sincik) da wan.[121-45] Li vir

mirov dixwaze bipirse gelo Mikaîliyên li Haymanê ji wan Qereçoriyane? A. Korkût jî dibêje, di navbera 1650-1700 an de bi cîh bûn. Salnama Mamûrat ûl Azîz li ser Reşiyan wiha agahî dide: 12 êl girêdayîne: Taşil, Tişîl, Kawî, Cebel, Mahacan. Taşikan, Alikan, Aşaxi Keller, Y. Keller, Qereçor û Komik in. Di sala 1536 an de ji bo Reşiyan tê nivîsîn ku 10 êlên bi hev ve girêdayîne. Di nava wan de Qereçorî û Alikan nîne. Ev jî dide xuyakirin ku di sala 1536 an de hîna jî Qereçorî nehatine Sincikê. Qereçoriyên li Sincikê dibêjin "Em Reşî ne".[121-46] Dibe ku Mikaîlî yên niha li Haymanê ji Sîpkan yan jî Qereçorî zû veqetiyabin û hatibin herêma Semsûrê. Ji wir jî bi beşekî Reşiyan ve çûbûn Anadolê. Lewra gor qeydên di sala 1536 an de Qereçorî ne girêdayî Reşiyan e, ew jî dide îspat kirin ku ew ji derên din hatine. Piraniya Qereçoriyan li cîhê Aras û Kûr digîje hev de û li Xorasanê dijîn.[121-127] Gor tespîtên A. Caferoglû di sala 1966 an de li herêma Nişabûr û li dora Cûmeyn û Esfaraînê nêzîkî 130 hezar Qereçorî hene. Di sala 1980 an ev hejmara gîhîşt 200 hezarî.[121-125]



**Pinarbaşi-Taxa Jêr / Kolik**

Dr. Fritz êlên di sînorê Tirkiye de gorî sîstema birêvebirinê beş dike û

gorê vê dibêje êlên girêdayî bajarê Amedê nêzîkî 50 heb in; li gorî nivîskarên din jî nêzîkî 72 an e. Dr. Fritzî ew dijmêrê û dibêje çend ji wan niha tunin. Em çend binivîsînin: **Zorkî**, Soydî, Korkî, Garizan, Dirmagarî (niha nîn in); Şakakî, Mîran, Kumya, **Celkî yan jî Çelkan**, Brasî (Berazan), **Şêx Bezinî**, Maskî, **Reşkî-Reşan-Reşî, Bilan**.... Ew êlên li vir piranî koçer in û piranî zivistanan diçin aliyê Riha û Bexda yê. Hinek ji wan jî koçî Helebê dikin, ji wan êlana her çar qebîle Korkillî ya yekemîn li navça Korkil dijîn. Ev êlên li vê herêmê dijîn di çandiniyê de gelekî bi pêşketîne û bi Ermeniyan re reqabetê dikin.[8]



**Reşiyên Konyayê**

Heta vir me gelek alî û cûreyên êlên parçebûyî dan, lê wekî bê texmîn kirin ne tenê ew in û mumkune ji wan jî zêdetir me nikariye tespît bikin an jî binivîsînin. Ji yek van parçeyên ku herî zêde lê dijîn jî Xorasan e. Wek tê zanîn di bin mêjiyê gel de dema Xorasan tê gotin Tirk tên bîra mirov û yên ji wir hemû wek Tirk tên pejirandin. Bi taybetî jî li bakûrê Kurdistanê û Anadolê ew yeka bi vî rengî ye. Lê dema mirov ji nêzve lêdikole û bi awakî pir zelal eşkere dibe, ku ew têzeka li ser derewan ava bûye û Xorasan ji hezaran salan vir ve war û wargehê Kurdên li dervayê welat e.

## KURDÊN XORASAN Û GÎLANÊ

Heta vir min hewl da ku cîhên Kurd lê belav bûne raxim ber çavan, ji bo ku Kurd li erdnîgariyeke gelek fireh belav bûne, zahmete ku mirov di şertên îro de bigihîje hemûyan û agahiyên ji sedî sed rast û konkret bide. Ji van Kurdên belav bûne komên herî zêde ye, li Anadola Navîn û Xorasanê bicîh bûne. Emê di vê beşê de bi kurtî qala Kurdên Xorasanê bikin. Qala wan gereg bibe pirtûkek serbixwe, lê ji bo ku dîroka Kurdên koçber bi giştî bê fehm kirin em neçarin bi kurtî bidin. Lewra hemû bihev re girêdayî ye û hevûdu temam dikin. Ji bilî wana, li Afganîstan, Belûcîstan û Hindîstanê jî Kurd hene. Min hewl da ku herim cem wan jî, lê mixabin bi serneketim. Gor agahiyan êla bi navê Brahoyî li Belûcîstanê û li bakûrê bajarê Lyg-Ketata dijîn. Serhejmara wan 300 hezar e û wek koçer çûne wir. Li eyalata Hindîstanê ya bi navê Sind jî dîsa Brahoyî hene û hejmara wan 48 hezar in. Gor Morgonîstrîn ê rojhilatzan, li Herata Afganîstanê jî Kurd hene. Tê pejirandin ku ew ji Xorasan yan jî ji Tacikîstanê çûne. Ibn Haldûn qala du êlên mezin ên li başûr dike ku navê wan Loyen û Tabir e û ew di dema Moxolan de hatine. Bê guman pêdiviya wan bi lêkolînên firehtir heye. Hêvîdarim rojekê dîroka wan jî bê ronî kirin û têkilî bên dayîn.

Di dirêjiya vê pirtûkê de me car caran qala Xorasan, Kurdên Xorasanê, Xorasan welatê kê ye, hatin û çûyîna wan kir; bi kurtî mirov dikare bibêje: ku Kurdên ji ber sedemên cûda ji navenda Xorasanê hatine li rojavayê Bakûrê Kurdistanê û Anadolê bi cîh bûn şûnde jî, ola xwe ya kevn û kevneşopiyên xwe berdewam kirine. Ola wan Zerdeştî û olên di bin navên cûda yên girêdayî Zerdeştiyê de bûn. Avcioglû ji bo ola wan "Ehlî-Heq" bûn dibêje. Li ser bingeha olî ew hêzên Kurdan xwe li hember dijminan birêxistin kirin. Navê yek ji wan rêxistinan Beranî bû. Dewleta Beranî li ser esasên ola Zerdeştiyê ji alî êl û federasyonên êlan ve hatiye damezirandin. Berî wan jî mîrîtiyên din ên mîna Germiyan, Qeremanî û yên din hebûn ku min qal kiribûn…Bê guman Beranî xeleka herî girînge. Lewra, piştî belavbûna wan ya di sala 1467 an de em dibînin ew rê li avakirina dewleta Safewî vedikin. Yan jî bi navê xwe yê esasî dewleta Sersoran (Sûrhûser, Alavî). Girîngiya Beraniyan ji vê tê: Êlên di nava vê dewlete de misilmantî qebûl nedikirin. Yên misilmantî pejirandin Pezgewr damezirandin û di nava wan de xwe bi rêxistin kirin. Ji bo wê, ew hêza ku ola nû nepejirandî di dewleteka nû de xwe derxist pêş, yan jî bi awayekî nû xwe bi format kir. Di nava vê dewletê de jî ola wan hinek din hate nerm kirin û hîn zêde nêzîkî Îslamê bû; ji berku, taqeta tekoşîna wan ê li hember misilmanan nemabû û îslam bûbû hêzeke emperyal. Ji bo wê eger mirov bêje ku dewleta Sersoran li destpêkê dewleteka Kurd bû, raste û di cîh de ye. Gelek jêder didin xuyakirin ku kalê Şah Îsmaîl, Şêx Cuneyt di dema dawî de serokatiya Beraniyan kir û tekê/ocaxekî wî li çiyayên Gîlanê hebû. Beşek ji Kurdên îro li Xorasan bi dewleta xwe li ser esasên olî hatibû avakirin re vegerîn Xorasanê.

Ew cîh ji Kurdan re ne xerîb bû, lewra kalên wan jî ji wir hatibûn. Hîna jî çîrokên wan yên hatibûn qalkirin di guhen wan de bûn...Lê divê ev niqte jî bê zanîn ku Kurd berê jî li Gîlan hebûn. Yanî berî Sersoran. Ji bo wê Kurdên Xorasan bi wan ve di demên cûda de çûne. Beşek (Emarlû) ji yên li Gîlanê piştre ji Xorasanê anîn û li wir hatin bicîh kirin.



**Gundiyên Emarlû yên li Gîlanê**

Gor Faik Bûlût ji K. Tewahûddî radigîhine, Kurdên Xorasanê di sê caran de hatine koçber kirin. Bi dorê di dema Şah Îsmaîl, Şah Tahmasb û Şah Ebbas de hatine koçber kirin.[36] **Êla Qeremanî di dema Şah Îsmaîlê Safewî de, ji bo parastina (berewaniya) tixubên Xorasanê anîne wir.** Paş vê bûyerê, cîgirên Şah Îsmaîl jî ew siyaset domandin û Kurd ji cihê bav û kalê wan koçber kirine Xorasanê.[192-25]



**Qeremaniyên Koçber-Aşxane, Xorasan**

Bi dîtina min jî ew raste. Lê pêwîste em Kurdên li Gîlan û dora derya Kesk ji wan cûda bifikirin. Lewra dema Şah Îsmaîl hîn biçûk bû di nava Kurdên li wir de hate veşartin, yanê Kurd ji berê ve li wir hebûn. Yekê jî, di cîhê gotina: ewên di dema Ş. Îsmaîl çûyînî de, ez dixwazim bibêjim ewên ku dewleta Sersoran damezirandine. Bi taybetî dumahiyên dewleta Qereman û Kurdên din ên (wekî ewên bi navê Rûmiyan têne nasîn) li rojavayê Kurdistanê û Anadolê ji ber zilma Osmanî, Moxol û Ereban gelek zirar dîtin û ji ber vê dîsa berbi rojhilat çûn. Ewên li destpêkê çûbûn di nava dewleta Safewî de rolên sereke lîstin. Lê vê yekê jî hestiyê pişta Kurdan şikand; lewra, Kurd li ser esasê olî, bûn du-sê beş û bi navên dewletên cûda bi hevre şer kirin.

Dîsa di dema Şah Tahimasb, 1553 an de, êlên Kurd cardin hatin şandinî Xorasan. Di heman salê de lawikê rêvebirekî êla Siyah Mansûr ê bi navê Xelîl, Şah bir Rê/Tehran û perwerde kir. Paşê bi navê Xan 30.000 esker da wî û kire mîrêmîranî ya Kurdistanê. Ewê aramî pêk bianiya, bacan kombikira û li hember êrîşên Osmaniyan bibiya hêza mertal. Lê piştî demekê Xelîl guh neda Şah. Şah jî erdê dayî ji dest girt û ew şande Xorasanê. Êla Siyah Mansûr (divê ew Atma û Elxas bin-Ş.R.) ve tev hev li Xorasan xizmet kir. Piştî mirina Xelîl lawikê xwe Dewletyar derbasî şûna wî bû; Sefawiyan jî ew anîn Ezerbeycanê ku li hember Osmaniyan parezvanî bike. Cîhên mîna Kerşeb, Zerînkeme, Secas, Sencan, Sorlûk, Keydar, Şebîstan, Engûran, Kancûka Kor û Jêr Kelêh çêkirin, bajar avakirin û piştre jî serxwebûna xwe îlan kir. Sefawiyan, di serleşkeriya Murşît Kulî Xan Şamlû de, 6000 siwarî şandin ser. Piştî şerekî mezin Safewî têk çûn. Cara duyemîn, Mêhdî Kûlû Siltan Şamlû bi veşartî hat û Dewletyar neçarî teslîmbûnê kir. Sefawiyan Dewletyar û 300 rêber îdam kirin.[100-352] Ew bûyer û yên bi vî rengî trajediya dîrokî ya Kurdan e, yên bihevre şer dikin dîsa Kurd in. Yên li ser milên wan, hespên xwe didin lîstikandin jî Pars in. K. Tewahûddî jî dibêje: Di dema Şah Tehimasbê yekan de, Oxlan Bodaq Xanê Çegenî emîrê mezin ê bi nav û deng bû serokê hikumeta Meşhed û dure jî bû yê Qoçan. Hikumeta Esferaîn ji vê demê heya dema Şah Ebbasê yekan di bin fermana Kurdan de bû. Kurdên Esferaîn di dema êrîşa Ebdul Mu-imên Xanê Ozbek ku bû sebeba qîrkirina milet û wêraniya bajarê Meşhed; pir berxwedan û parêzerî ji bajarê xwe Esferaîn kirin û bi mêranî û camêrî şer kirin, heya yek ji wana ma li berxwedan. Birc û keleha bajêr ketin destên dijmin. Keçel Qûbad Kelhûr tenê di wî şerê berxwedanê de sax ma û şerê Ozbekan mîna şêr û pilingan kir. Çaxa ew esîr kete lepê dijmin, serdarê Ozbek zanî ku bi şêrê-mêrek mîna wî nikare bikujê, çek, sîlah û kincên wî yên şer je kirin û ji bajêr dûr kirin. Tenê ew Kurda di wî şerî berxwedanê de canê xwe bi saxî xelas kir. Agahiya li ser şer bir Qezwîn ku Şah Ebbas li wir bû. Xebara dagirkirina Esferain û qirkirina milet da wî.[192-25] Di vî şerî de jî mêranî û berdêlên Kurdan dayî derdikeve holê, ku çiqas liberxwe dane û çiqas şehîd ketine. Îro jî hemû înkare; ti nikarî li wî bajarî heykelekî Kurdan bibînî...

Koça herî mezin jî di sala **1598 an de (hinek dîtin jî dibêjin 1593) pêk**

**hat**. Kurdên ji bakûrê Kurdistanê çûbûn li nêzîkî Tehran-herêma Xwar û Veramîn (niha di nava bajar de ma ye) bi cîh bûn. Piştî du salan bi piranî berbi Xorasan ve hatin şandin. Ji wana du hezar malbat li cîhê xwe man û îhtîmaleka pir mezine, ku ew îro heliyane. Tê gotin ku bi giştî 45 hezar malbat (225 hezar kes) bûn. Paşê Nadir Şah ji wana pênc hezar xane şandin sînorên Osmaniyan-Îranê û li Erzirûmê bi cîh kir. Bi vêra, **ji bo ku êrişên Rûsan bidin sekinandin 2000 malbatên A/Emarlû li Gîlanê bi cîh kirin**. Nêzîkî 60 gundên wan li herêmê hene.[36] Bi vê yekê re girêdayî mirov dikare dema Celaliyan jî daxilî vê bike. Ji ber ku wê demê jî gelek Kurd ji ber zilma Osmaniyan berbi rojhilat çûn. Tê zanîn, ku hinek Reşî di sala 1601 an de li Gîlanê bicîh kiribûn. Li ser hejmara Kurdên li Xorasanê gelek dîtinên cûda hene, lê mirov dikare bêje ku ji milyonekî zêdetir Kurd li Xorasanê dijîn. **Nêzîkî 1600 gundên** Kurdnîşîn hene, ku li bajarên mîna: Aşxane, Bicnûrd, Cacarm, Sebziwar, Nîşapûr, Şîrvan; Qoçan, Çinaran, Meşhed, Deregêz û Kelata Nadir de dijîn. Dr. Behrewan li vana Cacerm, Xaf, Mane Dilheqan û Ba Xezer (Koma Zengenê) zêde dike.[197-12] Zengenê Kurdên em li navenda Anadolê wek Şêxbizin binav dikin in. Cîhê wan jî li başûrê Derya Xezer e. Ba Xezer jî gereg ew der be. Ji bilî van û Kurdên Goranê li heman herêmê, piranî bi zaravayê Kurmanciya jor dipeyivin. Li Kelatê hinek Lor jî hene. Xêr ji wan 5 hezar malbatên heta niha jî bi awakî koçerî di konan de dijîn. Îro mezintirîn eyaleta kombûna Kurdan li Xorasanê bajarê Meşhedê ye, ku tê gotin tenê di nava bajar de 400 hezar Kurd hene. Li wan bajaran û beşek jî li gundên wan geriyam; pir caran di rewşa ew tê de giriyên min dihat. Kurd çawa jihev veqetandibûn, çawa bê hêz, perîşan kiribûn, çawa mêjiyê wan dişûştin û çawa diheliyan!...Ewên li dora bajarên mezin û yên di nava bajaran de bi tevahî heliyabûn. Pêwîste êdî Kurd vê yekê nepejirînin qedera xwe bixin destên xwe.



**Koça bi hêştiran**

Ji bo bi cîhkirina Kurdan li Xorasanê ez ji pirtûka pismamê xwe Kelîmûllah Tewahûddî ya bi navê **"Hereketa Tarîxa Kurdên li Xorasan"** ku ji heft cîldan pêk tê, wek jêdera bingehîn bigirim û bi piranî tercûma wê peşkeşî we bikim. Bi rastî jî wî şêrî karekî pir hêja kiriye û hemû dîrok, çanda devkî û zimanê Kurdên Xorasanê nivîsiye. Gereg Kurdên Xorasanê ji bo kêda ew bazê serbilind heykelekî wî li Xorasanê çêkin. Ji bo vê lêkolînê ez di sala 2001 an û di sala 2003 an de çûbûm Xorasanê. Sala siftê min bi kurmamê xwe Tewahûddî re hevdîtinek pêk anî; ji zîndanê teze derketibû û seva min dil nebû ku ez wêneyê wî bikişînim û vê re hevpeyvînekê pêk bînim. Digot: "ji bo min pirsgirêk nîne, ez teze ji zîndanê derketim, fermana min bi stûyê min ve ye, bila tu bizanî ku hertiştekî min di bin çavderiya dewletê de ye û dikarin serê te biêşînin; ji bo ewlekariya te, em nekin baştir e!" bi vê gotinê re, min jî helwesta xwe veşartibû...



**Tewahudî (yê di navê de)**

Min got pismamê min, lewra em herdû jî ji êlêkê ne û derdê me herdûyan jî tiştek bû; ku dîrok, çanda wî gelî derxin holê û rola wan ên dîrokî bidin ber çavên dost û dijminan... Çi tesadûf! Piştî 400 salî wî ji Xorasanê, min jî ji Qonya yê destpê kiribû ku em li bajarê Meşhedê gihîştin hev. Çi trajedî bû! Piştî çar sed salan pismaman hevdû didît! Kurapê min Tewahûddî jiyana xwe feda kiribû bo Kurdên Xorasanê, mal û milkê xwe bo wan firotibû û dikir berhem. Deng xweş bû, ji me re kilamên herêmî gotin. Mala xwe hemû bi xalîçe, wêne û neqşên Kurdên Xorasanê xemilandibû. Sala din ez dîsa çûm

malê, lê tunebû; bûyera dilê min dax kirî jî min wê demê dît. Keça wî digot: "Ez Kurdî nizanim!" gelo ew çawa dibû?! Şêrekî li hember zilimkaran stû xwar nakî û weqas tekoşîn dayî keça xwe bi Kurdî nedizanî! Bi rastî pir heyf bû…Lê mixabin min nikarî vê care mamoste bibînim. Cara dawî min xeterê dabûn ber çavan û sê rojan li dû wî geriyam lê min peyda nekir. Di pirtûkên birêz Tewahûddî de, piştî hemû navên kes, êl û deveran de "lo" heye, min ewna bi piranî bikar neanîn; ji bo ku wî di bin zexta yasayî de ew kara kiribû û hewce nake em jî şaşiya ji neçarî nûva bikin.

## Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê

Di sala **997** an de (621+997=1618-bi dîtina min gereg ew sala **1593** an be) Kurd birin Weramîn; hinek dîtin jî dibêjin: du saliya Şah Ebbas (1587-1628) bû ku hatibû ser textê Îranê. Carek din Ozbekan êrîş kirin, seranser bajarên Xorasan talan û wêran kirin; qirkirin û bûn sebaba belangazî û bedbextiya miletê herêmê. Ebidil Mûîmîn Xanê Ozbek eskerên xwe kişandin bi şûnde, Şah Ebbas cûret kir ku here Xorasanê. Di hikumeta Xorasan de pir guhartin çêkirin. Bodaq Xanê Çegenî ku mêrekî mêrxas bû û li şêre Xorasan gelek berxweda bû û nehişt ku Ozbek bikevin bajarê **Qoçan (Xebûşan)**. Şah Ebbas ew kir fermandarê Meşhed û nîşana lelegî/lala (mamostê zarokên kralan) yanî kurê xwe Şahzade Siltan Hesen jî de cem wî, ku zarokê wî bi edeb û mêranî mezin bike. Di wê demê de, carek din Kurmanc di Xorasan de bûne xwediyê hikûmet, leşker û pir karê mezin ketin destê wan.

Dema ku di nava serdarên Sersoran-**Qizilbaş** an de nehezî û nakokî çêbûn, Şah Ebbas jî ji vê tevlîheviyê qezenc wergirt û du serdarên herî bi nav û deng yên bi navên Silêman Xelîfê Tirkmanî û zavayê wî Murişêd Qolîxan dan kuştin. Bodaq Xanê Çegenî ku xizmê (jin dabûn hev) Murişêd Qolîxanê Qizilbaş bû, ji vê bûyerê tirsiya ku ewa rojekê bê serê wî jî. Bi wê tirsa canê xwe hemû rêkeberên Şah Ebbas mêvan kirin Qoçanê, Şêxzade Siltan Hesen Mîrza ji Meşhed anî Xebûşan û banga milet kir ku guh bidine Şahê nû. Lewra Şah zarok bû, xwe kire cigirê wî. Şah Ebbas wê demê li başûrê Xorasanê bû. Kor Hesen Ûstacilo şande Xebûşan ba Bodaq Xan ku wî karî neke, lê Kor Hesen tiştek bi dest neanî û bi destên vala vegeriya cem Şah. Ji wê demê ve êdî Qoçan jî bû paytexta didu ya Îranê û bû cîhê siyaset û rêkeberên Şah Ebbas û hikumeta wî. Di heman demê de Ebdul Mu-imin Xanê Ozbek êriş anî ser Xorasan û der dora bajara Meşhed girtin (sala 998 qemerî-1580). Şah Ebbas ji alî Qezvîn ve hate Xorasan lê serdarê qizilbaş ku nedixwestin şer bikin, hêvî ji Melê Celaladdin Mihemed Yezdî monecimbaşi kirin ku nehêle Şah bê Xorasan.

Şah Ebbas; miroveki pir xurifî, serserî bû; pir guh dida mela, sihêr, nivişt û pîrikan. Dema monecimbaşi jêre got; "Talih û bextê te ji çûna Xorasan de reş e!" Şah xwe bi nexweşiyê xist û hate Tehranê û kete nav vexwarin, henek û laqirdiya li ba jinan...



**Du Kurdên Xorasanê**

Çar meh dor-pêça Meşhed derbas bûn; Omet Xan Ûstacilo hakimê Meşhed, alîkarî ji Bodaqxan hakimê Qoçan xwest; di heman demê de jî Nûr Mihemed Xanê Ozbek li aliyê Deregez dihat bo Meşhed. Bodaqxanê Çegenî ji wê tirsê ku ew negihiştiye Ebdol Muimin Xan êrîş bire ser wî. Çaxê êrîşê de şerekî pir giran çêbû û di destpêkê de Kurdên Qoçan serkeftin û êsîr dane hev çek û sîlahê wan berhev kirin. Lê belê Ozbekan ji alî piştre êrîşek kirin. Şervanên Kurd jihev belav bûn, Ozbekan, Kurd dorpêç kirin û gelek ji wana kuştin. Bodaq Xan û hinek hevalên wî ku hespên baş dibinde bûn canê xwe xilas kirin û reviyan çûn Qoçan. Lê gelek mixabin ku Bodaq Xan nekarî here alîkariya mirovên Meşhed. Ozbek dizanîn ku qasîdê xelkê Meşhedê yê li Tehranê tê girtin û Şah Ebbas newêre biçe Xorasanê. Ozbekan bi dilekî rihet çar mehan Meşhed dorpêç kirin, paşê jî bajarê Meşhed girtin û ketin talan û kuştina gel. Weraniya bajêr kirin, xanî xirav kirin, pez û heywan kuştin gelê bê guneh jî pir kuştin. Şairêk Îranî dibêje: Eger xaka Meşhedê bigûvişe çemê xwînê derdiketî heya Kerbala yê here...Deh hezar barê heştiran zêr û zîv û gewherên pir bi biha jî Meşhedê derxistin û birin Herat û bajarê Meşhed kavil û wêran bû. Şah Ebbas newêribû were.

Bodaq Xanê Çegenî Xanê Kurd ku ji her alî ve kete ber êrîşên Ozbekan bi tenê nedikarî pêşiya wan bigire. Mecbûrî kurê xwe Husên Elî Siltan şande baregeha Şah ji bo alîkariyê. Lê pir mixabin Şah Ebbas kurê wî wek rehîn li


cem xwe hîşt û paş demekê dirêj bi navê xayin da dest Kor Hesen Ûstacilo û di sala 999 (1581) ên qemerî de, bi destê wî celadî hate kuştin. Piştî demekê Bodaq Xan jî xwestin û Xorasan vala ma û ji her çar aliyan ve Ozbekan êrîş kirin ser Xorasanê û heya Şimnan jî pêş ve çûn. Lê belê bext li gel Şah Ebbas yar bû. Di sala **1007 (1589)** an de, Ebidol Muimin Xanê Ozbek bi destê hevalên xwe hate kuştin û Şah Ebbas ji wê bûyere jî qezenc wergirt û çû Xorasanê. Hinek guhartin li wir jî çêkirin, hinek mîr ji kar dûrxistin û hinek jî anîn ser kar. Paşê çû ziyareta Îmam Riza, li rêya Çinaran û Qoçan re çûbû aliyê Mazenderan neçîrê û **di heman salê de bû ku Kurdên Çemîşgezek hatin Xorasanê**.

**Wê demê serdarên artêşa Îranê hemû Kurd bûn**, wek Gênc Elî Xan Zîk fermandarê Kirman û rojhilatê Îranê; Xan Ehmed Xan Erdelan fermandarê Kurdistanê; Emîrxan Xanê Lepzêrîn fermandarê Mihabad û Ûrmiyê; Bodaq Xan Çegenî fermandarê Qoçan û bakûrê Xorasanê û ji aliyê Tehran jî di bin fermandariya êla Celil Qolî Cedîdil Vêrûd Çemişgezik de bû. Şah Siltan Çemişgezik fermandar û mîrê wir bû. Şah Qolî Siltan Çemişgezik, jî Şah Ebbas xwest ku îzna wî bide ku ew here herêma Xorasan şerê Ozbekan. Şah Ebbas bi wê xwesteka mîrê Kurmanc pir kêfxweş bû, îzna wî de ku herê şerê Ozbekan.

Xorasan bûbû cîhê kêşmekêş, cirîda hespên Ozbekan, di sala 1006 ên (1588) qemerî de, heya Îraqê pêşve çûn. Her şûna têde çûn talan û kawil kirin, malê gel ji dest girtin, jin-mêr-zarok kuştin. Husen Xanê Çegenî emîrê Kurd ku emîrê Bestam û Damixan bû, bi hevkariya Mîrza Elî Beg Ereb, serokê polîsê parastinê ku rê diparastin, êrîş kirin ser Ozbekan. Lê bextê reş, Ozbekan li pêşiya wan kemîn danî bûn û ketin kemîna Ozbekan û hinek hatin kuştin û pir ji wana jî reviyan. Hesen Elî Xan birayê biçûk yê Husen Elî Xan û Mîrza Elî Ereb herdu jî şehîd bûn. Ozbek xurt bûn, êrîş kirin ser bajarên Kaşîmer, Damxa, aliyê Alkaya xwar û Bîcqûl Kaşan heyanî beriya Îranê ajotin. Simnaniya jî êrîşek ser Ozbekan kir, lê bi ser neketin, ew hinek hatin kuştin, hinek jî reviyan.

Şah Elî Xan Mîr Çemişgezek ji Alkayxwar ew rewşa mal wêran zanî û bi leşkerên xwe vê çû pêşiya Ozbekan û êrîş kir ser wan. Çend mezinên Ozbekan hatin kuştin. Heyanî wê rojê ew yek bi serê Ozbekan nehatibû ku hemû reviyan. Piraniya leşkerên wan yan êsîr ketin, yan jî hatin kuştin. Şah Elî Xan wisa riha wan şikand ku ti caran êdî nedivêrîn êrîş bikin. Psîkolojiya wan di şer de xirab bû û leşkerên Îranê ku pir tirs û lerz li hember Ozbekan di dilê van de bû, rihê mêranî kete laşê wan, yan psîkolojiya wan çe bû, êdî ji Ozbekan neditirsiyan... Ew yek bûbû çîrok, di nav gelê Ozbek de digotin: "Ticar neçin nava daristanê, belkî piling an jî şêrek di nava daristanê de welidî be...

**Piştî derxistina Ozbekan ji Xorasanê, êla Çemişgezek cîhê wan girt û êdî di Xorasanê de bi cîh û war bû**. Ozbekan nedikarî êrîş bike, malê gel ji dest bigire û gel bê hikumet bike. Lê Şahê Îranê pir di fikra xapandina Kurdan de bû; ew ji hev dûr dikirin. Hinek birin rojhilatê Îranê. Ji aliyê rojava, yanî Ezerbeycanê, pir ji yekbûna Kurdan ditirsiya. Xanê Lep Zêrîn ew mîr di kela Dimdim a di Geliyê Dimdim de dima, ku li ser rêya Ûrmiyê û Şino ye. Şah



Keleha Sêvika / Bijnûrd-Xorasan

Ebbas ji Emîrxan ditirsiya û dixwest ku wî bixapîne û bikuje. Emîrxan ew yek dizanî û di kela xwe de rûniştibû û kar barên xwe birêve dibirin. Şah Ebbas êrîşî ser kela Dimdim kir, armanca wî Emîr êsîr bike, yan jî bikuje bû. Emîr Xan tam çar salan di nava kela Dimdim de li berxwe de û şerê leşkerên Îranê kir.


Siyasetzanê Îngîlîz Lord Kîrîzîn dibêje: Şah Ebbas bi tîrekê li du armancan xist: Yek, Kurdên ku li rojavayê Îranê şerê wî dikirin û serê wî diêşandin xelas bû. Didu, li rojhilatê Îranê ku bûbû keşmekêşa Moxol û Ozbekan xelas bû û Kurmanc belav kirin. Hinek birin rojhilat û hinek jî birin rojavayê Îranê. Kurmancên Xorasanê, êl û zendên Kurdan bac nedidan Şahê Îran û bi serê xwe bûn. Dema şer diçûn alîkariya leşkerên Îranê. Serokên êlên Kurd bi nîşana êlxanî hatin nav kirin. Êlxaniyên mezin serokê êlê, ew nav û nîşan Şahê Îran li van serokên êlan kiribûn.

Di sala 1010 an de carek din Şah Ebbas hat bo serdana herêma Xorasanê û leşker kişand ser bajarê Belix; paşê di sala 1011 an de hate aliyê bajarê Çinaran û Radikan û çû bajarê Xebûşan. Hikumeta Deregez jî de bin fermana Şah Qolî Siltan, serokê êl û emîrê Zaferan, her wisa bakûrê Xorasan bi tevayî kete bin fermana Kurmancan. Şahê Îran, serok, rêvebir û emîrên Çemişgezik bi nîşana serokê herêmê û Xan bi nav kirin û fikra xwe ji bakûrê Xorasanê ji alî şer, êrîşên dijmin ve rihet kir û berê xwe de leşkerên xwe, li bajarê Alkay gihişte wan.

Êl û zendên Kurd di rojhilatê Îranê de bi cîh û war bûn. Her tim di fikir û xeyala serbixwebûnê de bûn, ku rojekê bê û ew serî hildin. **Dema Nadir Şahê Efşar bû Şahê Îranê, keça yek ji wan êlxanan re zewicî û kire jina xwe. Ji wê fikra ku Kurd bibin mirovên wî û alikariyê bidin wî**. Lê dema Nadir Şah berê xwe de Hindîstan ku wî welatî bigire, Kurmancan dîtin ku meydan vala ma, serxwebûna xwe diyar kirin û dest bi şoreşê kirin. Nadîr Şah dema ew agahî bihîst vegeriya welat ku şerê Kurdan bike û Qoçanê jî wêran bike. Çaxê Şah gihîşt Xorasan, êrîş bir ser Qoçan, konên xwe jî dervayê bajêr danîn. **Kurdan firsend nedan wî û bi şev avêtin ser kona wî û ew di bin de kuştin**.

Bi cîh û war bûna Kurdan ya li Xorasan re rewşa wir hate guhartin. Çawa ku Mûtelivl Şemis dinivîse; Şah Ebbas, Şah Siltan bi nîşana Emîrilûmeyra serbilind kir û tixubên axal yanî ji **Xarezîn heya Xorasan da dest wî û çil hezar malên êla Çemişgezik ku li wir diman dan barkirin bo aliyê Xorasan ku bikevin bin fermana Şah Qolî Siltan emîr û xanê Çemişgezek** ku ew li hemberî Ozbekan şer bikin. Di serdema hikumeta Şah Siltan Husên di welat de tevlihevî û sergêjî çêbûn. Kurdên Axal ku ji dest keşmekêşî û êrîşên Ersenicî û Bûharayî westiya bûn, dest bi şoreşê kirin û çûn çiya. Di vê serdemê de herêma Şîrvan û Qoçan, Bicnûrd û Similiqan bûbû cîhê keşmekêş û şerên êlên Kurd li zevî û erd û zozanan. Şerê hevdû pir kirin û cûdahî kete nava milet. Qerexan kurê Mihrab Beg neviyê Şah Qolî Siltan wê çaxê emîr û serokê êla Çemişgezek bû. Êlên Kurd ji hev cûda kirin ku şerê hevdu nekin. 40 hezar mal ku ji êla

Çemişgezek bû bi navê Zaferan (lo), Şad (lo), Kawan (lo), Umar (lo) û Qereçor (lû) di zevî û erdên Xorasan de belav kirin. Ji **Qoçan, Şîrvan, Bicnûrd û heya Çinaran da destê êla Zaferan. Ji Çinaran heya Simliqan da êla Şadî. Kawan (Kawî) jî birêkirin aliyê Meşhedê. Ji bakûrê Meşhed heya kela Yusif Xan da bin fermana êla Canîqorban.** Kurd li wan şûnan bi cîh û war bûn. Paşê, Qerexan kurê wî Samxan Beg kete dewsa bavê xwe û şûna wî girt. Dûre jî kurê Samxan Beg Mihemed Husên Xan bû êlxanê êla xwe.



**Dawet / Xorasan**

## Êrîşa dîlekî Kurd a ser Şah Ebbas

Di sala 1014 (1596) ên qemerî de, şerekî mezin di navbera Şah Ebbas û serdarê Osmanî Sînan Paşa (Çixaloglû) de li bajarê Tebrîzê çebû. Leşkerên Osmanî şikeştin, êsîr ketin û reviyan. Şah Ebbas, ji bo wê destpêka mezin, şahî û cejn dan çêkirin. Şah û emîrên leşkeran li ser girekî rûniştibûn û li êsîran mêzedikirin.. Her serbazekî ku êsîrek girtibû û tanî, Şah lê temaşê dikir ku eger ew êsîr ji malbetaka mezin yan jî nav û nîşanek wî hebûya nedida kuştin; yên reben û bê nav û nîşan jî dikuştin. Serbazekî, xortekî pir mezin û pir hêja anî cem Şah. Şah ji êsîr pirskir ku kî ye, ji kîjan malbatê ye? Xortê êsîr got: Şah ez

Kurd im, ji êla Mukriyanê Kurdistanê me. Hinek emîrên Şah jî Kurdên Mukriyan bûn, ku navê yekî ji wan Ristem Beg bû. Kesekî ew esîrê bext reş nasnekir. Ristem Beg dengê xwe kir û got: "Di navbera êla me de nakokî û dijminatî heye, ew xorta jî yek ji wan dijminê me ye." Şah ferman de serbaz ku wî êsîrî bidin Ristem Beg. Lê Ristem Beg got: Şahê min, di navbera me û dijminê me de peyman heye ku em tola xwe ji êsîran heyneynin û ev êsîr e û ez wî nikarim bukujim... Şah bi gotina Ristem Beg xeyîdî û emûr de serbaz ku xort bukujin. Xortê êsîr dema gotina Şah bîhist, xencereka serbazekî bi dest xist û êrîşî ser Şah kir. Şah li erdê xist, şah deste wî girt ku xencer lê nekeve. Serbaz û leşker û emîrên li cem Şah êrîş kirin ser wî xortê belangaz, reben û êsîr, parçe parçe kirin. Ew bûyer di nozdeh saliya hikumeta Şah Ebbas de çê bû. Bi şev Kurdan êrîşî ser çeperên Menoçirxan Sipehsadar Şahê Dirûnger kirin.(36)

Bûyera herî girîng di taliya hikumeta Şah Ebbas de bû, Kurdên Çemişgezik şerê Menoçirxan Sipeh Salar hakimê Xorasanê kirin. Wê çaxê **Emirê Kurd Yûsûf Xan Siltan kalê êla Şadî serokê êlê bû**. Şah Ebbas di dawiya temenê xwe de herêma Xorasan dabû destê Menoçirxan Sipeh Salar, Kurdan wê demê serî hildabûn û şerê Şah dikirin. Têkoşîna Menoçirxan ew bû ku zorê li Kurdan bike ku guhê xwe bidin Şah û werin bin fermana wî û Şah. Menoçirxan êrîş kir ser Kurdên bakûrê Xorasanê û Dirûngerê yên li herêma tixubê Xarezim. Şerek pir dijwar di navbera Kurd û Menoçirxan de çê bû, lê Menoçirxan kela Kurdan ya bi navê Kelata Dirûn girt û ji destê Kurdan anî der. Kurdan şêwra xwe kirin, leşkerên xwe gihandin hev û bi şev avêtin ser kelê. Menoçirxan kuştin û leşkerên wî êsîr kirin; hinek jî reviyan. Di wê serdemê de Yûsif Xan Şadî emir û serokê Kurdên Çemişgezek bû. Paş mirina Şah Ebbas ti şer û lêdan li herêma Xorasan çênebûn.(36)

## Şerê Nadir Şahê Efşar bi Kurdên REŞÎ Û QEREÇOR re

Nadir Şah ji bo şerê Ozbekan bike çû Xarezim, birayê xwe Ebrahîm Xan şande cem Mihemmed Husên Xanê Zeferan, ku şoreşa êlên Kurdên Qereçor û Şadî yên dest pêkirî rawestîne û şerê wan bike. Serhildan di herêmên Germexan û Semqan ku dikeve bakûrê rojavayê bajarê Bicnûrd de bû. **Mihemmed Husên Xanê Zefaran nedixwest şerê êlên Kurd bike û bi Nadir Şah re jî hevkarî bike; dixwest ku êlên Reşî û Qereçor di şer de bi birayê Nadir Şahê bi navê Ebrahîm Xan pîroz bin** û bi serkevin. Lê Mihemmed Husên Xan nedixwest ku şerê Nadir Şah jî bike. Ji ber ve yekê jî alîkarî neda birayê Şah û ew bi tenê çû ser Kurdên Qereçor û Reşî. Dema serokên êlên Qereçor û Reşî yên bi navên **Necef Siltan û Şukur Beg** zanîn ku birayê Nadir Şah di rê de ye û dixwaze bi wan re şer bike. Wan jî tewahiya Kurdên herêma Aladax li hev civandin û leşker kom kirin; şerek pir mezin û giran çêbû. Ebdirehim Xan nedikarî şerê Kurdan bike û revî çû kela Yuzbaşî. Kurd li pey çûn û kelehê dorpêç kirin, dor û berên kela Yuzbaşi girtin. Çaxê Ebdirahim zanî ku dê bikeve destê Kurdan, êsîr bimîne bi

şev rêvî çû aliyê Kela Raz. Necef Siltan Xanê Qereçor û **Şukur Beg Xanê Bacivan** careka din ketin pey birê Nadir Şah û dor bera kela Raz jî dor pêç kirin. Heft roj heft şevan şer çêbû. Ji herdu aliyan gelek kes mirin. Ebdirehman Xan di kelê de êsîr ma û nekarî şerê Kurdan bike û çend serok leşkerên xwe jî kuştin ku nekarîbûn şer bikin. Xebera êsîrbûna Ebdirehim Xan gihîşt Nadir Şah ku di wê demê de li deşta Qebiçan xîvet û xergal de bûn, li wir dima. Nadir Şah dizanî ku birayê wî ne meriyê şerê Kurmancan e. Bi xwe leşker civandin û ber bi keleha Raz ve ketin rê. Şah Qolî Beg yek ji serdarên wî bû, şandê şerê Şukur Beg û Necef Siltan. Di navbera Kurdan û leşkerên Nadir de şerek pir giran çebû. Serdarê leşkerên Nadir Şah, Şah Qolî Beg jî nekarî Kurdên Reşî û Qerçor têk bibe...Nadir Şah hewara xwe ji Şah Tehmasib re kir. Ew jî bi top û tifingên xwe hate alîkariya Nadir Şah. Di wê demê de Kurmancan top û tifingên xwe tunebûn û bi şûr şerê tivingê dikirin. Di wî şerî de jî mixabin pir êlên Kurd jî alîkarî dan Nadir Şah. Necef Siltan bi Şukur Beg ve nikarîn şerê wan hemûyan bikin û êsîr ketin destên Nadir Şah. Ji ber mêranî û mêrxasiya wan, Nadir Şah, Şukur Beg û Necef Siltan danîn cem xwe, ew ceza nekirin û tiştek negot. Ew bi hurmet û rêz li cem xwe danîn. Şukur Beg, Xanê Baçivan mirovek pir zana û mêrxasekî gelek baş bû, ji ber vê yekê Nadir Şah pir qîmet dayê û paşê jî keça wî li xwe mar kir û bû zavê Şukur Beg. Îro jî di herêma Xorasan de dibêjin ku şer û cengên Nadir Şah pêş de çûyî hemû Şukur Beg sebeb bû, ew yek egîdiya Şukur Begê bû ne mêraniya Nadir Şah. Êla Bacivan îro jî jiyana xwe didomîne û bi piranî ji wana koçer in û di çiyayên Ûmaret Qoçan û Şaycan de dimînin û zivistanan jî bardikin herêma Mazenderan ku li wê herêmê berf nabare.

Gelo em bizanin çi bi serê Necef Siltan Xanê Qereçor hat. Ji Necef Siltan re digotin **"Şêrê Kurd"**, ji ber netirsî, mêrxasî, camêrî û pehlewaniya wî ev bi vî navî binav dikirin. Dema êsîr kete destê Nadir Şah, Şah pir qîmet, hurmet, rêz û qedra wî zanî; danî ba xwe û dîsa kire serok leşker. **Qereçor êl û eşîrên pir mezin û bi nav û deng bû ku berî 300 salî ji herêma Wanê hatine Xorasanê.**(192-85) Qereçor bi piranî li alî Qefqasya jiyan, heta wê demê ti agahî negihîştin destê min ku ew ji dora Wanê çûne. Mamoste Tewahûddî wiha berdewam dike: **Her tim di dîrokê de bi mêrxasî hatine naskirin. Hemû leşker û serleşkerên Nadir Şah yên şerên bi Afganan re li Daxistan, Qefqasya û Hindîstanê Kurmanc bûn**. Di dîroka Îranê de Nadir Şah bi navê Cîhan Gosa (Dinya girt destên xwe) tê naskirin, lê hemû saya şerê Kurd û êlên Kurmanc de bû ku Nadir Şah karîbû ji Qefqesan heta Hindîstan bigre destên xwe.(192-85)

Ji Kurdên Rûsyayê dîroknûs Wekîl Mûstafayev yek ji Kurdên Qereçorê ye, dayika wî ji wê komê ye û ji alî bav jî Celalî ye. Dibêje: Berê li Ermenîstanê Celelî û Qereçorî hebûn. Serokê Qereçoriyan Qaçax Nebî ye û bere serokê Qerebaxê (1813), paşê jî yê Nahciwanê bû. Qereçorî ji milyonekî zêdetir asîmîle bûn. Niha 10 malên Qereçorî ku dibêjin em Kurd in tu dikarî peyda bikî. Nav mane lê Qereçorî tunin. Navên gelek gund û cîhan wek Qereçor î ye...Celalî û Qereçorî misilman û sunnî ne.

## Şerê Romiyan û Kurdên Xorasanê

Hecî Xan Sipehsalar (serokê fermadariya artêşê) leşkere Nadir Şah bû. Dîroknas dibêjin ku Hecî Xan di fena leşkerî û zanabûnê de serokatiya mîrovekî pir zana, netirs, mêrxas û camêr bû. Pêş vê çûna leşkerên Nadir Şah li Hindîstan, Xarezim, Qefqesya û Îraq jî saya şerê zana û xweşmêrê Kurd Hacî Xan de bû ku Nadir karîbû Daxistan bigire destên xwe.(192-149)

Di sala 1156 (1777) ên Îranî de, şer di navbera Îran û Rom (Osmanî) de çêbû. Şerê olî bû. Nadir Şah dixwest ola Şîa bike ola Îslamê ya fermî; Osmaniyan jî xwe temsîldarê Xelîfê Îslamê dizanîn û ev yek qebûl nedikirin. Mistefa Paşa serokê leşkerên Romê bû ku êrîş kir ser xaka Îranê. Hecî Xan serleşker û fermandarê leşkerên Îranê çû pêşiya leşkerên Osmanî ku bi wana re şer bike. Şer di herêma Kerkûkê de dest pêkir. Wê çaxê Evdila Paşa waliyê Îraqê bû. Şêrên Kurd di bin serokatiya şêrê Kurmanc Hecî Xan de şerên giran çekiribûn. Mistefa Paşa yê Osmanî êsîr ket destên leşkerên Hecî Xan û heşt hezar jî leşkerên Romî hatin kuştin û yên mayî jî reviyan. Bi tevayî artêşa Romê bi mal û jin û bi hemû çekên xwe ve ketin destên Kurmancan. Hecî Xan cîhad şand ba Şahzade Nesirelah Mîrza, ku me hemû leşkerên Romî kuştin û Mistefa Paşa jî êsîr girt. Paşê berê xwe de bajarê Hemedan û çû ziyareta Şahzade Nasirelah. Piştî demekê kin Evdile Paşa yê Romî yê ku waliyê Bexda bû, **bi Kurdên Bilbas** ve hat tola Mistefa Paşa bistîne. Dema Şahzade Nesirelah û Hecî Xan ew yek bihîstin, hatin pêşiya leşkerên Evdila Paşa. Li Mûsil herdû artêş rastî hev hatin, şerekî giran çebû û Romiyan vê carê jî nikarîn. Kurmanc di wî şerî de 3000 bûn, eskerên Evdila Paşa piranî hatin kuştin û yên mayî jî paşve reviyan. Hecî Xan serok leşkerên Îranê bû ku 7000 ji leşkerên Evdila Paşa yê Romî êsîr girtin. Bersiv dan Nadir Şah, çar hezar ji esîrên Romî şandin Tehran û 3000 jî şandin Tebrîzê. Nadir Şah ku di wê çaxê de li Mirad Tepê dima, berê xwe de Mihabad û çend êsîren romî jî azad kirin û bi zanyarî şandin nava leşkerên Osmanî ku xebera şikandina Romiyan bide leşkerên ku êrîş kiribûn ser Ûrmiyê û Mihabadê. Nadir Şah êrîş kir ser çeperên Osmaniyan û ew reviyan û hinek jî êsîr ketin. Nadir Şah kon û alavên xwe ji Mihabad danîn, Şahê Rûsya ji bo pîrozkirina wî hat Mihabadê cem wî. **Di sala 1158 ên Îranî de, Kurdên Zeferan li bajarên Qoçan û Teqîxan Şîrazî li herêma Şîraz û Mihemed Xan Qaçar li herêma Êstirabad dest bi şoreşê kirin**. Çaxê Nadir Şah ew yek zanî pir xeyidî û berê xwe de Xorasanê. Gund û bajarên li ser riya wî bi tevayî bac ji wan stend, pir zilim û zor jî li gel hate kirin. Zêr û zîv civandin serhev, birin bajarê Kelat kirin xezina dewletê.

Di destpêka sedsala nozdan de Kurmancên Qoçan li hemberî Fetîh Elî Şah Qacer dest bi şoreşê kirin û di sala 1832 an de serî hildan. Fermandarekî Îngîlîz bi navê Bornez li Xorasan dima, avêtin ser bajarê Qoçan, leşker û qumandarê Îngîlîz bi alîkariya Ebbas Mîrza kurê Şah û cigîrê Şah bi top û topxan bajar girtin destê xwe.(192-25)

## Niştecîhbûna Kurdên Çemîşgezek / Zaferan li Xorasan

Bi fermana Şah Ebbas (1589-şoreş) û bi alîkariya Kurdên Çemîşgezek, bajarê Herat hate dagir kirin. Erdê rojhilatê Îranê jî di navbera serdar, leşker û mezinên ji êlan hatin bêş kirin. Her wisa jî welatê Sîstan (bajarê Îranê) û Kirman (wîleyeta ji nava Xorasan li Kirman) gihîşte Gênc Elî Xan serok û rêvebirên êla Zîk. Kurdên Çegene li Meşhed û aliyê başûrê Xorasanê jî desthelatiya xwe hebûn.(193-152/167)

Bakûre Xorasan gihîşte Kurdên Çemîşgezek, ku tixubê wir heya Xarezim (Rûsya) dirêj dibû. Serok û rêvebirên êla Çemîşgezek (Mamoste wek êl bi nav dike, lê di esas de ne êlekê, konfederasyoneka êlan e)- ku mêrekî pir mêrxas û egît bû- bi navê **Şah Elî Xan Mîr Celîlê Çemîşgezek** dihat gotin ku pêş de bi navê Şah Elî Siltan dihat naskirin. Pêş nîşana xanî, nîşana wî ya Siltanî hebû. Di sala 1011 (+621=1632) an a koçkirinê de ku Şah Ebbas hat Xorasan wîleyata bakûrê wir bi fermî da destê Şah Elî Siltan. Şah Ebbas paş vegera xwe li Meşhed dora çemê Radîkan de kon û alavên xwe hildan, ketin karê leşkerî û îdarî. Paşê bi çend wezîr û rûspiyan ve çûn Elkaîdirûn (Dirunger-navê nû Deregizê û bajerê Xorasanêye ku Kurd lê dijîn) kelaha wir çend çek û sîlah têda bûn dest danî ser û Şah Elî Siltan û ew bi nîşana xanî serbilindkir û Şah Elî Xan kire xanê Elkaidirûn/Deregez. Paşî Şah Ebbas vegeriya nava leşkere xwe, paş wê bûyerê seranser bakûrê Xorasanê ket destê Kurdên Çemîşgezek (Zeferanlo û Şadî) ku ji Gunbedkawûs (bajarê Xorasan) heya Meriw (bajarê Xorasan) û Sebizewar û bajarê kevnare Nesa (bajar bû li Xorasan) ku haya çaxê Nesredin Şah ew erd û xak di destê Kurdên Çemîşgezek de bû.



**Kurdên Şadî**

Paşî di biryarnama 1299 an a koçî de bi navê axal ew erd û zevî û xak Rûsa dagirkir. Kurd bi darê zorê ji wir derxistin. Rêxistina siyasî, leşkerî û gelî ya êla Çemîşgezek (Zeferan, ew êl bi wî navî tê naskirin) Zaferan êla herî

mezin ya Xorasan bû, di serdema Sefawiyan de rêxistin û rêveberiya vê êlê ji hemû êlan bi hêztir û rêkûpêktir bû ku **ji 32 êlên mezin û biçûk pêk dihat**. Êla Zaferan ji alî kesekî bi navê Îlxan ve dihate birêvebirin ku berpirsê êlan a beranber hikumeta Îranê, bo parastina tixubên bakûrê rojhilat û rojhilatê Îranê bû. Çaxê karekî girîng dihat **pêş Îlxan, serokên her 32 êlan kom dikirin û civîn pêk dianîn û biryar werdigirtin.**(193-152) Wekî di beşên derbasbûyî de jî min nivîsî; ew sîstema heta demên dawî di nava Kurdên li navenda Anadolê jî bikar dihatiye. Serdema Sefawiyan û Qaçaran de serokên êla Zeferan yên cûrbecûr wek Îlxan hebûn. Mîr Çemîşgezek, Wekîl Ekrad, Xan, Siltan û Begêbegan. Şah Ebbas nîşana Mîr Çemîşgezek da serokê êla Zaferan, paşê jî Wekîl Ekradxan. Çaxê Nadir Şah jî Sambeg (wekîl ekrad) nîşana begêbegan stend û bû fermandarê Xorasanê. Di serdema Qaçaran de jî, digotin Îlxan ku Emîrgone xanê Zaferan piştre ji malbata wî Riza Qolixan Samxan û Emîr Hesen Xan û serokên êla Şadî nîşana Îlxanî wergirtin.(193/152-167) Şadî jî ne tenê êlek e.

Nivîskar Îreç Efşar Sîstanî serokên Çemîşgezekan wiha rêz dike:

1. Ristem Beg
2. Oxlan Bûdak ( 967-1000 texmînî:1549-1582)
3. Şah Qulî Siltan, 1011 (gereg ew Şah Elî Siltan be)
4. Yûsûf Siltanî Kurd, 1037 qemerî (1619).
5. Qere Xan
6. Sam Beg (1736)
7. M. Huseyn Xanî Zaferanî, 1148 qemerî (1730)
8. Emîr Gonexan, 1198 şemsî, (1819).
9. Riza Qulî Xan, 1249 qemerî (1831).
10. Sam Xan II, 1275 qemerî (1857).
11. Emîr Huseyn Xan, waliyê Qoçanê, 1272 şemsî (1893)
12. Xan Baba Xan
13. M. Nasir Xan
14. E. Riza Xan
15. Emîr H. Xan II, di serdema Şah Riza Pehlewî de jiya.(195) Begê yekemîn Ristem divê ew ji Şah re deriyên mîrîtiya Kurdistanê vekiribe, piştre Şah ew şandibû başûrê Kurdistanê.

Êla Zaferan 32 êlbegî di bin fermana xwe de hebûn.(193-153) Di cîhê êla Zaferan/Çemîşgezek de mirov bêje konfederasyona Zaferan/ Çemîşgezek hîn baştir e. Lewra ew ji 32 êl yan jî federasyonan pêk dihatiye û her êlekê ji alî begê xwe ve tê temsîl kirin. Her êlbegî yan xan serokê êla xwe bû. Çend beg jî di bin fermana êlbegî yan jî xan de hebûn.(193-153) Ew jî îşareta konfederasyon ye. Beg jî rêveberê du yan jî sê gundan bû, u malbat û berebab û pismam û xizmên beg bûn. Êla herî biçûk hezar mal bû. Hinek ji wan êlêna wek: Kîkan, Şêxkan, Qereman, Kîvan, Sofiyan û Topkan bûn ku ji 5.000 malan pêk dihatin. Gelek caran navê wan wek êl derbas dibe, lê piranî ne êlek e. Wek mînak: Kîkan, Qereman di hîn dem û rewşan de federasyon, di hîn deman

de jî konfederasyon in. Di sohbetan de gelek caran wek êl derbas bibe jî, ne raste. Hinek jî berebab (Berebav: Kurên yek mirovî. Berebab: ji çend bavan pêkdihat) bûn, wek pismam û mirov û xizmên hev ku ji 500 malan heya 300 malan bûn. Her berebab ji çend malbatan pêkdihat ku malxweyê malê birêve dibir û bac ji wan dihat stendin, wek Samanpolî, Çopanpolî, Şaxpolî, Gilînpolî û Tutunçîxerpolî (Pol; perê Îranê-diraw jê re dibêjin.). Ez (nivîskar) êla Kîkan qenc nasdikim û didim ber çavên xwendevanan.

Di konfederasyona Zaferan de federasyona herî mezin **Kîkan** bû, di dema Emîr Hesen Xan de ji sê êlan pêkdihat:

a. Sêvkan

b. Bîçeran

c. Kîkan.(193-153)

Berê jî min got, li rojavayê Kurdistanê û li navenda Anadolê, Sêvkan êleka girêdayî Reşiyan xuyadike. Li bakûrê Kurdistanê Kîkan wek komeka ji Sêvkan cûda xuya dike; heta me gotibû têkiliya wan Canbegan jî heye. Em baş nizanin ku li Xorasanê ew bi hev re îttîfaq kirine an heman êl in... Lê di axaftinên Sêvikiyên li Xorasanê guhdar dikî, tê texmîn kirin ku ew bi Canbegan ve tevhev mane. Ew jî dîtina Kîkî Canbeg in û li Xorasanê bi Sêvikan re ketine nava federasyonekê piştrast dike. Tewahûddî dibêje: Serokê êla Sêvkan Sadet Teqî Xan Qobadî êlbegî bi jêhrê kuştin, birayê wî Qadîr Qolixan Qobadî li cîhê wî rûnişt. Êla Sêvkan di gundê Oxaz de rûdinên. Digotin ku gund bi destên Mihemed Beg hatibû avakirin û malbata wan li wir diman. Êla Sêvka begên xwe hebûn:

**Komkilan:** Li gundên; Kelata Sefa, Xakistes Kelat, Qoç Kelat, Xwedîkan (bi Xûkan navûdeng in) rudinin û Bacgî ku jî êla Sêvkan bû ji hemû berbaban bêtir bû qasî 500 mal bûn.

**Şokran:** Gundê Şokran ji bajarê Mûşê hatine wir û di gundê Ozdek de rûdinên.

**Olaş:** Ji gundê Olaşê ji Kurdistana bakûr hatine Xorasanê.

**Bovan:** Ji gundê Bovan û Qerçixê

**Sefkan:** Ji gundê Sefkanli yê kavil buyî gundiyan barkirine çûne Oxaz û cîhên din.

**Hemzekan:** Ji gundê Hemzekan.

**Zortan:** Ji gundê Zortan.

**Bîware:** Ji gundê Bîware ku hinek ji wana xwe Sêvkî û hinek jî xwe Bîçerî dizanin.

**Xuraskan:** Ji gundê Xersekan ji Kurdistana başûr û cîhe Îngîlîz Îraq dagirkirî hatine.

**Zaxoran:** Gundekî kavil (Zaxoran-Zakoran) bûye.

**Şerkan:** Ji gundê Şerkan navça Bîçeran, mirovên gundên Oxaza kevnar (Kohna Oxaz), Dorbadam, Îmanqolî, Şarek, Kelata Velo, Qizilqan, Çarbûrc, Bîr Zeynel Beg, Qeleta Çox Tirik û Xetab ew malbat û berebab hemû Sêvkan in.

Wek **em dizanin koma Sêvkan ji 12 êl** û çend berebaban pêk hatiye ku piraniya wan di gundan de cîh girtiye û hinek jî koçer in.

## ZEFERAN (-LO)
## ÇEMÎŞGEZEK

Kurdên Xorasan, ku îro bi Zaferan tên naskirin di bajarên: Esferayîn, Nêyşabûr, Şîrvan, Qoçan, Deregez, Kelat, Çinaran û Meşhedê de cîh girtine. Di serdema Selçûqiyan de ew êl di Kurdistan de diman ku îro jêra dibejin Tirkiyê û Îraq navê wê êlê Çemîşgezek bû. Îro jî pîremêr û pîrejin xwe bi wî navî nêzîktir dibînin û dibêjin em ji êla Çemişgezek in.(193-155) Çemîşgezek rastire, lewra ew ji navenda Çemîşgezekê hatine û di dema Osmaniyan de ew herêm bi navê Kurdistanê dihate zanîn. Ji bo mîrîtiya wir zû bi zû têk nediçû û Kurdên wir gelek şervan û bi rêxistin bûn. Di beşa Osmaniyan de me qala vê kiribû. Navê Zaferan gereg di dûre girtibin. Lewra ew navekî tirkî ye û ji serkeftina şer tê. Yan jî ewên têk naçin û hertim bi serkeftin ji şer derdikevin e... Êla (Hûn wek konfederasyon fêhm bikin-ş) Zaferan û berbavên vê êlê bidin ber çavên xwendavanan:

**Îzan:**

Ew êl bi gotina nivîskarê cografya Îranê Mesûd Kêyhan, 1200 mal bûn û di bajarên Xwar-Weramîn û di gundên bajarê Şîrvanê mîna: Badam, Qizilhîsar, Şorik, Kelat û Evdevê û gundê Kelatê Sora de jiyana xwe berdewam dikin. Gor çavdêriya min ew êla hanê, nêzîkî Reşiyan e, di axaftin û qerekterên wan re ew xuya dibe. Wekî berê ji min nivîsî ew di sedsala XVI an de li Semsûrê êleka girêdayî Reşiya bû.

**Şair Maîde Îzanlo**



**Baçiyan:**

(Baç+î+y+a+n) Baçiyan bi kurdî ye. Baçiyan (lo) bi tirkî ye. Peyveka paşnav yan li ser êl, malbat, bajar û gund ku xwedîtiyê dide xuya kirin bi kurdî, bi tirkî lo ye. Ji ber vê yekê her paşnavên kurdî ku xweditiyê li ser tiştekî tê nivîsandin, gotin bi du cûreyî hatine gotin û nivîsandin; carekê bi kurdî carekê jî bi tirkî. Lê Baçiyan navê rast û durist yê vê êla hêja û rind a Kurdan e. Gelo em bêjin ew êl bi navê bac bû yanî bac/xerac dane kesekî yan jî kesekî stendine. Yan em bêjin "baş" bû ku bi tirkî ye û bi kurdî dibe ser carna gotine wana başkanli yanî mirovên ser bi xwîn. Ev yek cihê lêkolînê ye. Li ser şirovekirina mamoste, mirov dikare vê zêde bike: Başkanli ku tirkî ye û dikare bibe kesên ser bi xwîn yan jî kesên bi serok. Dikare di herdû wateyan de jî bê şirove kirin. Ew navekî tirkî ye ku wekî hemû êlên din ên Kurd di dema Osmaniyan de navên tirkî li êlên Kurd kirine. Nasiredin Şah çaxê çû Xorasanê gote wana Başqanlo û got ew êl hinek ji êla mezin ya Şikak ku di Azarbeycana rojava de dijîn û hatine wir. Hinek rewşenbîr jî dibêjin Bacvanlo, Bacvanlo û Başkanlo. Piraniya wana di gundên Doletxan û dorûberên wî gundî de dijîn. Rehma xwedê li ser be, Mihemed Elî Sehrayî pêhlêwanê (bersînganê) ku nimûne bû di Îranê de, ji êla Baçiyan bû û li gundê Doletxan hate dinê. Sehrayî malbetek û berebavek ji êla Baçiyan e û 400 mal in û li bajarê Esferayîn û di gundê Babaçeşmê de cîh girtine û jiyana xwe didomînin. 50 mal jî li bajarê Bicnûrd û li gundê Aşxanê dijîn û yê herî bi nav û deng Ebbas Elî Qoçanî. Yên din li bajarê Esferayîn û di gundên Qaracah, Mengelî, Nisiretabad, Hesarî, Dehenî Şûr, Dehene Şîrîn û Doletçah de dijîn. Karê wan pez xwedîkirin û cotkarî ye. Zivistanan diçin Meravê Tepe û havînan jî di zozanên çiyayê Şahcîhan/Şaycanê de dimînin. Hinek jî êla Baçiyan di Kurdistanê cîhe nû Îraq dibejin de dijîn. Nivîskarê heja Mardûx Kurdistanî nivîsandiye ku Başmanli di navbera Melazgir û Eleşgirt de ji wir hatine Xorasan. Pismamê min gelek caran girêdana van êlan bi başûrê Kurdistanê re dike, lê ez rastî giredaneka dem-dereng nehatim û piraniya van êlana jî ji rojava û ji bakûrê bakûr-Kurdistanê çûne. Di karaseta sala 1323 an de ku Ozbekan avête ser kon û malên êla Baçiyan, bû sedema kuştina hinek mêrên êlê û keç û jin jî êsîr kirin û birin bazara firotinê. Ew yek gelek deng veda û bû egera şoreşa meşrûtiyet li Îranê û damezrandina dadgeha fermî bo cara yekê di Îranê de.

**Badilî:**

Di salan çûyî de navên xwe kirin Bihadran-lo yek ji berebavên herî mezin ya êla Zaferan e. Mamoste Mardûx dibêje li Badilî qasî 1.000 mal li Eleşgîrt û Yûzxadand û 700 mal jî li Zara dijîn û hemû jî li ser ola Şîa ne. Serokên Badilî di serdema Nadîr Şah de pir bi hêz û navûdeng bûn. Nasireddîn Şah dibêje di cîhê wana wîleyeta Xorasan û di tîxubê bajarê Qoçan û Çinaran de dimînin û dijîn. Di navbera Bîzgî û Çeşmegîlar jî cîh girtine ku berebava Badilî û Hemzekan li wir jî dijîn. Malbat û berebava Badilî mêren bi nav û deng û

bi heybet in, gelekî mêrxas in. Badilî di bajarên Deregez, Kelat, Qoçan, Kelata Gol, Elaqecinban, Mergzer û dor û berên Qendab jî cîh girtine û jiyana xwe didomînin. Nasreddîn Şah dibêje: dema min ew dîtin, ew tiştana hatin bîra min: Mirovên bi mirûz, gir, bi hêz, aram û zanayî ji wan xuyadikir. Xwedê lê xweş bûyî Tac Mihemed Xan bi hadirî nav deng bi navê Sitûtêl Melîk ji malbata Badilî bû. Serokê êla Çemîşgezek ew yek jî wan xana bû ku di ceng de alîkarê Kolonêl Mihemed Teqî Xanê Pisiyan bû. Me berê qala Pisiyan kiribû û li wir têkiliya Pisiyan-Berazî û Badiliyan derdikeve ku mirov dixwaze bipirse gelo ew yek kom e?

**Birîvan/Birîman/Birîkan:**

Birîvan, li bajarê Meşhed û Kelat û di gundê der dora wan bajaran de dijîn. Hinek ji li tixubê Kelat û Serezis de koçerên pêz in û 15 kerî pezên wan hene. Ew ji Kurdistana Îraqê hatine.(192) Min ew ziyaret kiribûn, li rojhilatê başûrê çiyayê Hezarmecîd dijîn û dibêjin em 1500 mal in û toperê-berê me ev in: Mella, Goseran, Mezlûman, Pelûlan, Endêrîsan, Şertûsan (ji bajarê kevnare yê Kurdan Tûs), Qarxê xûran, Hecîeseniyan, Hecîxaniyan (Hişmetî), Xevriyan, Maqan, Ekremiyan, Însafiyan in. Mirovên xwîngerm, esmer û kin in. Ti îşaret nînin ku ew ji başûrê Kurdistanê hatine. Ew tespîtên bi vî rengî ne rast in, piraniya wan ji bakûrê Kurdistanê û ji rojavayê (Dêrsîm-Dîlok) Kurdistanê hatine.



**Komeka ji Birîvan**

**Bîçeranî (Şamlû, Sêvkan):**

Berebava Bîçeran yek ji malbaten pir bi nav û deng yên Xorasanê mêrên netirs, mêrxas, xweşmêr û egîd in. Wana tixubê Xorasanê ji destê Ozbek û Tirkmenan rizgar kirin. Bîçeran, Sêvikan û Kîkan heya taliyên Hikumeta Emîr Hesen Xan Şicaidûle yek berebav û malbat bû ku bi navê Kîkan dihat naskirin. Nasiredîn Şah gotiye, ku ew berebab jî hemû berebav û malbatên êla Zaferan girîngtirîn û mêrxastirîn heya roja îro bawername (senedû secerename) ku di çaxe wana dihatine xuyakirin. Îro jî di destên min de ne, dibejin; ku Bîçeran, Siverkan (Sivkan-Sîfkan) bi navê Kîkan in û serokatiya wana jî di destê emîrên Sêvikan de bûye. **Emîr Hesen Xan Şûcaidûle di sala 1310 (1891) an de êla Kîkan kire du beş. Yek bi navê Bîçeran, yek jî bi navê Sêvkan**. Kîkan (Keykî) jî ku li bakûrê rojava û bakûre Qoçan dijîn, jihev veqetiyane û cûda bûne. Serokê êla Bîçeran, Elî Xan Beg Bîçeran di temenê 95 salî di zivistana sala 1362 an de çû ber dilovaniya xwedê û mir. Bîçerî di bajarê Şîrvan û gundên: Qelê Hesen, Qelebeg, Tûranli, Kelata Balî, Qelê Nexdû, Qeleta Dol, Gedogan, Qolan, Berder, Hename Zîndan, Qalîtman, Korkan, Duab, Buriczolifqar, Xelac, Locêlî, Bîk, Qereçîşme, Postîndûz û Memedoran de cîh girtine û dijîn. Hindikên wan jî koçer in. **Elxas jî berebavek ji Bîçeranê** ku di Kurdistanê de, îro jê re dibêjin Sûriyê ne û îro jî di gundên tixub yên Xiristiyan de jiyana xwe didomînin.(193)



**Jineke Bîçeranî - li milê rastê**

Elxas piranî li dora Mereşê û heta Sêwasê jî belav dibin; nêzîkbûna wan bi Sêvikan re xuya dibe, lê mixabin beşek ji wan heliyane. **Bîçeran min di pirtûka yekemîn de pir nivîsandiye ku ji aliye Şam hatine wir. Ew bi navê Şamalî û Şamlo (Şamî)** jî tên naskirin. Serok û emîrên Bîçeran di bargeh û hikumeta Sefawiyan de xwediyê karên pir mezin bûn û gelek jî bi hêz û hurmet bûn. Her wisa çaxê Şah Ebbasê II wezîre agah û rewşenbîrê xwe Mîrza Mohemmed Teqî Itimadolê bi navbangê Sarotteqî bi alîkarî û xiyaneta karbidestên bargehê bi rewşeka hovane dikuje, mal û pergalê wî zevt dike. Ana Xanim dayika Şah Ebbas ji bo tolhildana wî, wezîrê nû ji emîrên Bîçeran ku xwedî hêdbar û hêz e hildibijêre. Ku ew yek jî netirsî û mêrxasiya Bîçeran derdixîne holê (Kuştina Sarotteqî di sala 1055 (1635)de, di heyva Şabanê ango heyva piştî Remezanê de bûye). Hecî Silêman yek ji rûspî û xwedî hêz yên Dergezê bû û di dema ciwaniya Nadir Şah de dijî. Dema ku Nadir Şah li her aliyan bû hedefa kîn û kerba dijminên bi hêz, rabû alikariya Nadir kir û Nadir Şah ku birîndar bûbû di mala xwe de xwedî kir û yek ji hekîmên herî binavûdeng ji bo dermankirina birîna Nadir ya kûr anî Ebîwerdê (Yek ji bajarên girîng yê Xorasanê bû ku li gor biryara Axalê di dema Nasireddîn Şah de dane Rûsan).

Birêz Ebolfezl Qasimî di pirtûka xwe ya hêja de dibêje,"Pirsgirêka Nadir Qolî (Nadir Şahê paşîn) bûbû pirsgirêka rojê di Ebîwerdê de, xaniyê wî ku niha bûbû mala Hec Silêmanê bazerganê Bîçeran bûbû navenda hêvî û daxwazan û bûbû qibleya gelê renc dîtî û dîl mayî di desten bê rehm û yên dagîrkerên biyanî de bi awayeke dizî hevûdin. Ji halê silametiya wî agahdar dikirin û diçûne serlêdana wî. "Diyare ku kesek dikare dijminê hakimê Ebîwerdê di mala xwe de derman ket ku dilê Sêhrî hebû û ew yekê jî taybetî Hac Silêmanê Bîçeran bûye. Ku paş başbûna Nadir, wî bi rê dike bo destgirdî û ji hevalê xwe Mîrza Nûrollahê Kurd ê Şêxan ku li destgirdî dijî daxwaz dike ku her gavê li Nadir xwedî derkeve û canê wî biparêze. Her ew Mirza Nûrollah Xanê Şêxan yê ku bûye baîsê pêşkevtina Nadir û ji ber piştvanî kirina ji Nadir re, di bin îşkenca giran ya hakimê destgirdê de tê kuştin. Hatem Begê Bîçeran (ji ejdadên Qobadiyan) Hac Xan Begê Hemzekan (serdarê ku Dêhlî xiste destê xwe) û Îlyas Begê Mamiyan û Xosroxanê Qereman çend kes ji mezinên Kurd in, ku piştgiriya Nadir kirin. Hec Silêmanê Bîçeran jî şevekê bi destê neyarên Nadir ve hate kuştin.

**Palûkanî:**

Ji êlên Kurmancên Zeferan yên Xorasanê ne, ji eslê xwe ve ji "Palo" ya ku deverek ji Kurdistana bin destê Tirkiyê de ye hatine û Şeref Xanê Bedlîsî di Şerefnamê de wan ji Kurdên Rojkî binav dike. Palûkaniyên Xorasanê ku di mêrxasî û netirsiya xwe de bi navûdeng in, di bajarê Deregezê li herêma sînora Bacgiran dijîn. Cîh û warê wan yê eslî li qiraxa rastê ya Çemê Firatê ye, ku 95 km ji Amedê dûr e. Xwedê lê xweş bûyî Merdûx dibêje ku: "Balekan ji gundê Balekan li Kurdistana bindestê Îraqê ne. Êla Balekan 1200 malbat in, ku Serayî

çemê Rewandûzê li Hewlêrê dijîn ku zêdeyî 60 gund di destê wan de hene û nêzîkî 300 malbat jî ji êla Zerza têne zanîn. Du gundên Palûkanî ya jorîn û jêrîn ketine herêma Bacgiran li gundên ser tixub, Cîristanê herwisa du gundên Palûkanî ya jorîn û jêrîn li bajarê Deregez yên Kurdên Palokan in. Bi dîtina min Palûkan bi Balekan ve ji hev cûda ne. Beşekî Palûkan îro jî li dora bajarê Agiriyê hene ku ji yên Xorasanê veqetiyane. Palûkaniyên li Xorasanê min ziyaret kirin, hevalên min ên hêja ji wan hene û qerektera wan mîna Sêvika û Reşiyan e. Îhtîmaleka pir mezine ku ew bi hev re girêdayî bûn.



Gundê Palûkan

**Pehlewanî:**

Bi navê "Pelûlan" jî bi navûdeng in ku di dema derbasbûyî de li herêma navbera Îmamqolî û Dûrbadam û Bajgiran û Oxazê dijîn. Karê wan pez xwedîkirin bû. Zozanên wan her ew herêma bû, di dema zivistanê de bardikirine aliyê Eşqabad û bajarê Nîsa. Êla Pehlevanî di sala 1226 ên qemerî de, anku di 1846 zayînê de, zozan û çiyayên ku bindestê wan de bûn firotine Mohammedî Begê Kîkan û hatine Oxazê. Dibe ku ji wê herêmê koç kiribin niha jî li bajarên Qoçan, Meşhed, Bocnûrd û Şîrvanê belav bûne. Nivîskarê pirtûka Metleûşşems ku di sala 1300 ên qemerî de dema ku Deryam Nasireddin Şah bi rêya Bocnûrdê diçû Şîrvanê ser rêya xwe li qeleya Mûsaxanî nêzîkê Gîliyan, rastî Kurdên ji êla Pehlewan hat û herwisa nivîskar dibêje ku Kurdên Pehlevanî ku ji êla Zeferan in, li wêderê dijîn û nêzîkê 50 malbatan in. "Di pirtûkên Osmanî yên kevn de navê vê êlê wek Pehlivanli derbas dibe û hinek ji wan li Anatoliya Navîn in, lê mixabin min navê wan ên kurdî nikarî derxim holê.

Di beşa Pezgewran de min nivîsîbû, ku gor hinek jêderan bavê vê komê yê sêyemîn navê xwe Pehlewan Beg e. Gor Ebû B. Tehranî jî bavê Pezgewran yê VI an Îdrîs di destpêka sedsala XIII an de hinek keleh û herêmên li Amedê birêve dibirine. Torinê Îdrîs, Pehlewan Beg jî serleşkere kela Alicaka li Nahçiwanê ye. Pehlewan, bi zora waliyê Moxol Cûrmagûn di sala 1330 an de çû rojavayê Anadolê(114-70) û min gotibû mumkune ew kalên Têrikiyên îro ne.

**Topkanî:**

Pismamê min Tewahoddî dibêje: Bi navê "Topan" jî tên nasandin. Top di Kurmancî de tê wata komek ji kesan an jî komek ji daran. Ew yek jî tê wê watê ku Topan ji çend êl û beran pêk hatine.

Bi dîtina min navê vê êl yan jî federasyonê di bingeh de ne Topan e, ew navekî tirkî ye û kesên ku topên şer lê dikirî re digotine. Wekî berê jî min gotî, ewên di şer de tîr çêdikirî re gotine Oxçû, yên baca xwe bi hespan didanî re hotine Hespîkeşan û hwd. Navê vê êlê jî ji karekî wiha tê, yanê di artêşa Osmaniyan de wan ya top dikişandin yan jî top lêdikirin û Tirkan ew navê lê kirin. Ji bo ku ew koma ji axa Osmaniyan çû Xorasan ew nava li ser ma. Navê kurdî bi texmîna min Avşar e...

Niha jî yek ji êlên herî mezin û belavbûyî yên Kurmancên Xorasanê ne ku li Coweyn, Îsfarayn, Sebzîvar, Şîrvan, Qoçan, Deregez, Meşhed, Bakûrê Nêyşabûrê û rêze çiyayên Bînalûkê dijîn. Hinek ji wan cihgir bûne û gelek ji wan jî hîn koçber in. Min ewên koçber ziyaret kiribûn û di konê wan de, di sala 2001 an de şevekê raketibûm. Mirovên pir ciddî, bi mirûz û nîvanperwer in. Di dema nû de gelek ji wan jî Meşhedê li taxa Ab û Berqê niştecîh bûne û li herêmên rojhilat û rojava diçine zozanan. Helbet Îvanof qala herêma sisêyan jî dike ku ew jî qiraxa berûyê ye û dibêje "Topkan li herêma Cowîn û hinek ji Nîşabûrê û di zivistanê de jî bi der û berê deşta Teqî koç dikin. "Herêma rojhilat komên ji hev belavbûyî li deverên Nîşabûr, Exlûmed, Bînalûd, Klîder û Mohammed Begî hereket dikin û li qiraxa çemê Keşfrûdê û bervê Serexsê ve diçin. Di meha Kanûn û Çile de li qiraxa çemê Keşfrûdê ne û li qiraxa rêya Serexs-Meşhed, 90 km mayî be Mozdûran têne jêrê. Hinek ji wan zivistanan, 60 km ji Meşhedê dûr, li dor û berê Miyamî yê derbas dikin. Yên din jî di destpêka meha Çile de hereket dikin û ji Geviya Mozdûranê derbas dibin û di dewsa boriya gazê de ber bi Çeko ve diçine pêş ku zozanên xwe yê zivistanê berhevkin û pezên wan jî li wêderê dizê. Ava xwe jî kaniya Mozdûran ku gelek ji cihê wan dûre dibin. Li gel hemû zehmetiyan ku di anîna avê de dikişînin jî, gelek paqij in û herdem kinc û bedena xwe dişon.

Beşek ji wan jî diçin aliyê Aqderbenda Serexsê li gel hatina biharê di dewsa xwe ya hatine de paşve dizivirin û li rêze çiyayê Binalûdê heya Nîşabûrê belav dibin. Pişka zor ya berhema pezên xwe li Meşhed û Nîşabûrê difiroşin.

Li herêma rojava jî komên Topan yên ku ji deverên Qoçan, Şîrvan û Esferayinê hatine dimînin. Ew kom havînê li rêzeçiyayên Şaycan û çiyayên

nêzîkê Oxazê ne û di destpêka Tirmehê de ji çiyayan ber bi xwarê ve tên û pezên xwe di nav zeviyên ceh û genimên ku hatine dirûn de diçêrînin û hêdî hêdî li qiraxa çemê Etrekê, berbi rojava ve diçine pêş. Di destpêka heyva Îlonê de li deverên Şîrvan û Bocnûrdê ne û paşve jî diçin herêma Merawê Tepê. Eger di demsala payizê de baran baş bibare û çêre bo pezên wan hebe, di meha Cotmehê de dikevine herêma fireh ya Merawê Tepê û li ber çemê Etrek belav dibin. Piraniya Topkanî yên ku li herêma rojava dijîn bê mêrg û zevî ne. Ji ber vê yekê jî her sal perekî zêde ji bo çêrandina pezên xwe li nav mergan de, didine xwediyê mêrg û zeviyan.



**Topkaniyên koçber**

Beşekî Topan jî li bakûrê Kurdistanê, bi qasî min (Ş.R) lêkolîn kirî li alî Dîlok, Mereş û navçên wê mîna Goksû, Elbîstan, Pazarcik û Besnî-Semsûrê Topkira-Tofgirayê hene. Topkirayê li vê herêmê, bi Topkaniyên li Xorasanê ve yek êl yan jî federasyon e. Hinek ji wan xwe wek Atma, hinek wek Canbega, hinek xwe wek Sinê Milî û hinek jî xwe wek Topkira nîşan didin. Dibe ku ji konfederasyonekî belav bûbin. Kerekterên wan pir hişk in û zû şer dikin; Elewî ne.

Jin û mêrên Topkaniyan nav mil pan, çavreş û mêvan perwer in û ew yeka jî ji ber xêra xwezayê ye. Jinên Topkan di lixwekirina kincên bedew de li nav Kurdên Xorasanê gelek bi nav û deng in. Komên Topkaniyan ku min kariye berhev bikim wiha ne:

**1. Korkanî/Kerkanî:** Ne diyare ku girêdanek êla Kêrika bi Kurdên Libnanê û êla Kêrik ya wêderê heye an na. Kêrik li herêma Cebel Amilê ku gelek rewşenbîr û kesayetiyên navdar ji wêderê derketine.

**2. Kalmişî:** Ev koma li deverên Klîdar û Sebzewarê ne, ku li pirtûka hêja Dewlet Abadî li ser navê Klîder qala wan hatiye kirin.

**3. Ferhadxanî/Beyan:** Ku koka vê komê digihêje Ferhat Xanê Topkan ku li gel Welî Xanê Qeremanî di sala 1305 an (1926) de dixwestin Riza Şah li Qoçanê bikujin û li gor xwe rêya dîrokê biguhurînin. Koma Ferhadiyan bi navê **Beyan** jî tên naskirin û nêzîkê 1000 malbat in ku li du gundên 350 û 650 malî nêzîkê birek baş tax dijîn û nêzîkê 25 kerî pezên wan hene. Ferhadxan di dema Riza Şah de zikata di nav Topkaniyan de bi xwe dicivand û nedida dewletê.

**4. Letîfî:** Nêzîkê 200 malbat in û 10 kerî pezên wan hene.

**5. Torabi:** Nêzîkê 400 malbat in ku 11 kerî pezên wan hene.

**6. Şîr Qazî:** 300 malbat in ku 6 kerî pezên wan hene .

**7. Aqa Mohemmed Xanî:** 500 malbat in û 15 kerî pezên wan hene.

**8. Simkan:** 300 malbat in û 10 kerî pezênn wan hene.

**9. Zeynelî:** 300 malbat in û10 kerî pezên wan hene.

Êla Topkaniyan li hemû deverên Xorosanê belav bûne ku zêdeyî 7000 malbat in û zêdeyî 145 kerî pezên wan hene. Hinek ji Topkaniyan zivistanê ber bi Meravê Tepê ve diçin û havînan têne çiyayê Şaycan û Aladaxê. Yên din jî zivistanê diçine Serexsê û havînan jî li dor û berên Abrevan û Keçîbar û Gavmîşînê dibohirînin. Min ewên li Şaycanê ziyaret kiribûn, ku mirovên bi hestên netewî tijî ne û di derbarê dîroka xwe de gelek detayan dizanin.

**Celalî:**

Navê Celalî li her cîhê ku Kurd lê dijîn mirov dikare peyda bike; ew ne tenê êlek e, bi sedan êl di bin vî navî de hene û Osmaniyan ji êlên dijber û serhildêr hemûyan re gotine Celalî. Li ser Celaliyên herêmên din em rawestiyan û emê di beşên din de jî rawestin; li ser yên li Xorasanê mamoste wiha dibêje: Yek ji êlên herî bi nav û deng, giring û şoreşger yên Kurdan êla Celaliyan e; kupişka herî mezin ji wan ber bi Xorosanê ve birin û ji ber netirsî û şervaniya wan li tixubê Îran û Xarezm li bakûrê Şîrvanê hatine bicîh kirin. Li ser Kurdên Celalî yên wê herêma hessas û pirxeter, divê pirtûkek din bê nivîsîn. Ku li dema wan 400 salên bihurî de çi hatiye serê wan û çawa jiyane, di wê demê de çand, ziman û edetên xwe bi taybet li nav Sovyetê de bi rengek herî xurt zindî hîştin û lê xwedî derketin yek ji wan karên ku tê meraq kirin e.

Zêdeyî ji sedî notê Kurdên Celali îro di axa Sovyeta berê de dijîn û yek ji navendên giring yên kombûna wan bajarên Aşkabad û bi taybet Fîrozê (tê gotin ku li vî bajarî 100 hezar Kurd hene-Ş.R) ye. Rûsan di salên 1299 an de (1879) û 1311 (1891) ji Îrane veqetandin û pêwîste mirov li ser mêrxasiya Celaliyan û bûyerên ser tixubê Fîrozê cûda qal bike. Her wekî Celalî dibêjin û dîrok

ji qal dikin, ew ji bakûrê welatê Sûriyê (Şam) ji herêma Heleb, berbi Amed û Çemîşgezekê koç dikin, lê ji ber ku nedişiyan jêr zextûzor û zilma Osmaniyan bijîn, neçar man berbi Îranê ve koç bikin.(193-152/167) Bê zanîn başe, ku dema Celaliyan serî hildan, wê demê bi tevahî li Anadolê û rojavayê Kurdistanê bûn. Mamoste dibêje: Di dema Şah Ebbas de ketin nav Îranê; lê ew tam ne di cîh de ye, eger mirov ji bo beşekî bibêje ew raste, lê berî wê demê jî gelek Kurd û di nava wan de kalên Celaliyan jî çûn Îranê. Şah Ebbas, wezîrê xwe yê mezin Hatem Xanê Ûrdûbadî Îtimadoddole berbi wan şand, mezin û rûspiyên Celaliyan vexwende Îsfehanê. Paşê jî destûra wan da ku bizivirine welatê Mukriyan û bi rêberî û hevkariya Emîrxanê Biradostê Lepzerîn êrişê bibine ser wî parçê Kurdistanê ku di bin dagirkeriya Osmaniyan de ye. Her wisa destûr da ku her êla Kurd ya desthilatiya Îranê nepejirîne divê ji holê bêne rakirin. Lê ji ber ku nakokiyên olî û mezhebî di navbera Îran û Osmaniyan de gihîştibû radeya herî bilind û her yek ji wan yê din bi kafir û bê dîn bûnê tawanbar dikir ji ber ku Kurdên di bin desthilatdariya Osmaniyan de bûn girêdayî mezheba sunî bûn û ji hikumeta Şîa ya Sefawiyan heznedikirin û nediçûn bin barê hikumeta Sefawiyan. Eger Emîrxan guhên xwe bida Şah Ebbas û di gel Kurdên Celalî li dijî Kurdên rojhilatê Osmaniyan şer kiriba, bê guman ê zêdetir xwîn hatiba rijandin û piraniya êl û tayifên Kurdan li rojhilata Romê wê bihatana kuştin. Emîrxan ku mirovekî pir zana û jêhatîbû têgihîşt ku Şah Ebbas dixwaze ku Kurdan bi destê Kurdan bide qirkirin. Ji ber wê yekê jî li gel Celalî û hêzên Şah hevkarî nekir û di Kela Dimdim de serhildana xwe li dijî Şah Ebbas ragihand. Nûserê pirtûka Arayê Ebbasî li barê nasandina Celaliyan de dibêje ew kesên ku li dijî împaratoriya Tirkên Osmanî serhildidan re digotin Celalî. Eşkereye ku ji bilî Kurdan ti miletekê newêre li dijî Osmaniyan xebat bikin.

Nivîskarê pirtûka "Alemê Ara" dibêje: Ji Bûrsa heya Erzirûmê ew wîlayetên ku Anatoliyê ketibûn bin simê hespên Celaliyan û Siltan Ehmed Xanê Xwandegar û karbidestên dewleta Osmaniyan derxistina dijminê nav malê de yek ji karên serekî yê xwe dizanin û di fikra paşvedana Celaliyan de bûn. Ji ber wê jî Mûrad Paşa ku mirovekî zana û xwedî hêz bû, kiribûne wezîrê mezin û serleşker şandibûn şerê dijî Ewrûpiyan, di wê demê de xeber dane Mûrad Paşa ku Celaliyan kareke wisa kiriye. Lewma jî ew mecbûr ma li gel Ewrûpiyan aştiyê bike û hêzê xwe ji Rûmelî, Kapikûle, Anatolî, Menteş, Qereman û Trablos û ji cîhên din yên memleketê Osmaniyan kom bike û li dijî Celaliyan şer bike.

**Hemzikanî:**

Nûser bawer dike ku ew êl ji Hazoyê ne. Hazo, herêmêke li Kurdistana Tirkiyê û Kurdên Hezo li wêderê binav û deng in. Dibe ku Hezoyan eslê wan be ku paşê dibe Hemzoyan û Hemzekanî. Hemzekan ku Hecî Xanî Hemzekan ewê ku Dehlî girtî û yek ji serdarê Nadir Şah e. Ew li Bocnûrd, Qoçan û devera Golmekan nêzîkê Meşhedê belavbûne ku gelek ji hev dûr in. Nasireddîn Şah,

di Sefernama xwe ya sala 1300 (1880) dema ji Qoçanê diçe Meşhedê û nêzîkê Tûsê dibe dibêje: Li binê çiya gundê Şandîz û Golmekan û hinek mal û zevî ji dûr ve xuya dikirin. Aliyê milê çepê kela Şah Bendê, Çengê Kelax, Şûnevarên tayifa Hemzikaniyan ser bi Golmekan kelatê Hebeşî ya Bêyzekane, kelata Hesen, Seyid Abad, Çûqûr Aleng ceh cehe. Uç Deften, Mihemed Abad, Şems Abad, Abdûşkan, Çar Birc, Kelata Badlo, Qehqehê ew gundana heya Divînê ya Bêzekî, yane du–sê gund jî li ser Golemkanê ne. Gelên wan gundana ji êlên Badilî û Hemzekanî ne: Nivîskarê pirtûka "Metleoşşems" dibêje: Di bloka Golmekan ku ketiye heşt fersengiya Meşhedê 14 gund hene û du tayife li wir dijîn. Yek ji wan tayfan Tacik in ku hemû Faris in û li gundê Galrîzê dijîn. Tayifa din jî ji êla Hemzekanî ne ku li nav zevî û kelêyên Golmekan cîh digrin.



**Reşiyê Xorasanê**

**Reşî:**

Êla Reşiyan jî yek ji êlên mêrxas yên Kurdên Xorasanê ne ku piraniya wan li gundên ser tîxub wek Ceristan û Quşxanê dijîn. Şerê wan ya li dijî Nadîr yek ji mêrxasiya wan e. Reşî wek êl qet min nedîtine, ew herî kêm ya wek federasyona êlan yan jî wek konfederasyon xuya dikin. Nûserê pirtûka Alemê Arayê Nadirî nifûsa Reşiyan 2000 malbat dinivîsîne. Emîn Zekî dibêje Reşî 70

malbat in ku koçber in û li başûre Erzirûmê li Kurdistana Tirkiyê dene. Îvanof dibêje: Reşî li Xakister, Layîn û nêzîkê Kaxekê di bin konan de dijîn. Mardox dibêje: Reşî 70 malbat in, li başûrê Erzorûmê koçber û gerok in. Reşî 500 malbat in li devera Qazwînê. Reşewend çend malbat in li herêma Ezerbeycanê wekî Îvanof dibêje, li herêmên Kelat û Xakister û malbatên Reşî hene, nabe ku ewe paş ve zivirîbine Quşxanê û dibe ku Kurdên wê herêmê hinek jê Reşî bin. Mirovên ji gundên Emrûdek û Tolfûr û Derniyan ji beşa Çinaran jî Reşî ne. Li Quşxanê Reşî li wan gundana dijîn: Qopoz, Kakilî, Bax, Emîrxan, Qolika Jêrin û Jorîn, Gundê Dehxan, Cenga, Helva, Çişmê, Kela Mihemmed Elî, Hisar (zav), Pîran, Sincek (Sinceq), Çûrçûrî, Îzman, Teftazan, Yêngî Qelê. Wekî me di beşa Reşiyan de jî gotibû serhejmara wan nayê hesap kirin, gelek in û li gelek cîhên Kurdistanê, Anadolê, Sûriyê, Xorasanê û herêmên din hene. Bi rastî, ew serhejmara hatine dayîn yên lokalînê ne; bi giştî hesap kirina serhejmara Reşiyan karêkî pir bi zahmet e.

**Rûtika:**

Bi navê Rûtan jî bi nav û deng in ku ji peyva rût tê. Yek ji mêrxastirîn û di heman demê de yek ji bedbextirin Kurdên Xorasanê ne di aliyê jiyanê de. Hinek ji wan di konan de dijîn ku navbeyna Qoçan û Meravê Tepê her tim tên û diçin û havînan jî li çiyayên Oxazê ne. Hinek li Şîrvanê dijîn. Rût tê manaya tazî û Rûtan jî yên tazî. Dema ku mirov li jiyana wan ya li konan dinêre, jiyana mirovên di dema Esrê Hecer an ku perîna Sengî yê tê ber çavê mirov. Ku ew jî li ser mirov pir bi bandore û mirov pê diêşe. Merdûx pê işaret dike dibe ku ew ji tayifa Cafan bin. (Merdûx Cild 1 rûpel. 77)

Rûta Kurmanc in û ti têkiliya wan bi Cafan re nîne. Rûta bi piranî bi Şadiyan re û li hinek deran jî bi Milan re tên girêdan. Li Anatoliya Navîn û girêdayî bajarokê Polatliyê jî gundên Rûta hene. Li bakûrê Kurdistanê gelek Rûtayî hene ku li herêmên cûda dijîn.

**Zeydanî:**

Bedlîsî di Şerefnamê de Zeydaniyan ji êleka mezin ya Rojka dizane û cihê mayina wan jî herêma Colemêrg yê li Kurdistana Tirkiyê dinivîsîne û dibêje: "Êla Rojkiya di nav êl û tayifên Kurdistanê de bi mêrxasî, mêranî, xîret, binamûs, rastî, dîndarî û xerxwazî de bi nav û deng in. Di nav Kurdan de dibêjin ku berdêla her kevirê ku di dîwarê kelê de miroveki Rojkiyan hatiye kuştin û ew tayifa bûye 24 beş ku ji wan pênc beşên Qêysanî, Bayikî, Mulikî, Zoqêysî û Zeydanî êlên kevin yên wilayeta Bedlîsê ne.

Li Xorasanê li gundên Zeydaniyan tê gotin, ku 2000 heştirên Zeydikan tişt û barên Qoçanê tanîne Bajgiran û ji vir jî dibirin Eşqabad a Rûsya yê.

Reîsê Kurdên Zeydanî yên li Deregezê bi navê Îsmaîl Kurt dihat naskirin ku paş wî jî kurên wî bûn serokên êlê. Gundê Zeydanî yê Qoçan ku dikeve bakûrê bajar yek jî gundên ava û xweş û boş e ku zêdeyî hezar kes lê dijîn.

Berhemên wan çandina ceh û genim û tirî ye. Piraniya Zeydaniyan niha li Laînê li herêma Kelatê ne.

**Sîl Supuran (Şahseven):**

Ew navê hana wekî bê texmîn kirin tirkî ye; ji alî Osmaniyan ve li vê êlê hatiye dayîn û di wata kesên ji xwe şûnda tiştekî neynin, yanê reşdikî ne. Bi rastî jî vê êlê cîhên tê re derbasbûyî xirave dikirine pişt xwe tiştekî nedihîştiye. Dîsa navê Şahseven jî tê wata kesên ji Şah hezdikine. Bere jî nivîsîbû ku ew beşekî Celaliyan e, yanî ewên serhildan kiribûn yek jî ew êla bû. Pir mixabin ku em hîna jî navê wan ê kurdî nizanin. Mamoste Tewahûddî dibêje: Sîl-supuran gundekî ji rêzegundên Cîristanê yê li herêma Bajgiran e. Sîl Supuran li ser tixub dijîn. Kurdên Sîl-supur jî hevalbendên Şah Ebbas bûn, lewra jî ji wan re digotin Şahseven. Ji ber vê yekê jî li Kela Dimdim bi Kurdên Celalî ve li dijî Emirxanê Biradost şer kirin. Qûrçiyên Celalî, Pazûkî, Kurdên Bavanî (Bovanlo) û Gêncelî Canê zîk hakimê Kandeharê ku gişt Kurd bûn û dijî Emîrxan şer kirin û koka Emîrxan qelandin, lê ya rast ewe ku bi vê yekê koka xwe jî qelandin.

Di sala 1012 ên qemerî (1594) de, Kurdên Sîl-supur li Kurdistana Tirkiyê gelek Romî kuştin û malê wan talan kirin û wekî reş bikî derbas bûn loma ji wan re dibêjin Sîl Supur, wekî Şah Ebbas dibêje; "Sel gibî supurduler " ango wekî lehiyê malîn.

Nûserê pirtûka Arayê Ebbasî dibêje: wan Kurdana ji wê demê vir ve hevoka bi tirkî ya "Sîl supur" wekî nav ji xwe re danîne. Bûne Şah Seven û nêzîkê 2000 malbat in. Rû kirin dergeha Cehan Penah (Şah Ebbas) û li her wilayeta Romê ku lê derbas dibûn her tiştê ku didîtin talan dikirin, mezin û rû spiyê wan bo secdeya Şah Ebbas diçûne ber kela Erîvanê. Ji bo ku bêne hebandin û her wisa ji bo ku li wîlayeta Rêy, Sav, Xar û Fîrozkûh bo tayifa xwe zozanên havîn û zivistanê peyda bikin ber bi Îraqê ve çûn. (Ji pirtûka Alemê Arayê Ebbasî rûpelên 648 û 782) Nivîskarê pirtûka Metleoşşems jî qala **Emirêl-Omera** Kebl Elî Xanê Sîl Supur Beylerbegî û hakimê Meşhed pîroz dike ku ji Qûrçîbasiyanê dema Şah Silêmanê Safewî bûye û di nivîskekê de ku di sala 1091 ên qemerî de (1673) li ser derê kerwansaraya Şahvêrdî Begê nivîsî bû, navê wî jî têde heye.

**Sêvkan (Keykanî-Bîçerî):**

Ji herêma Sîwerek an jî Sîwek li Kurdistana Tirkiyê tên. Kurmancên Xorasanê yek ji giringtirîn parêzerên ziman û çanda Avesta û Zerdeştî ne. Gelek taybetiyên zimanê Avesta parastine. Bo nimûne mirov dikare bêje ku ew "w" bi carekê dibêjin an ku telafuz dikin ku kesek bilî Kurmancan nikare bêje. Lewra jî "w" di peyva "Sîwkan" de wek "w" ya Avestayî bikar tînin. Hinek jêre Sîvekan jî dibêjin. Seadetqolî Xanî Qobadî di nameya xwe ya ji bo kurê xwe Siyavûş Xan de binê namê wiha îmze dike: "Seadet Qolîxanî Sîfkanlo".[193] Mamoste li wir dikeve şaşitiyê, lewra tu têkiliya Sêvkan bi bajarê Sîwerek

re nîne. Tenê herdû peyv nêzîkî hev in. Sêvikî bi piranî li herêma Semsûr û Meletiyê jiyane. Navê Sêvkan, ji begê bi navê Sefo yan jî Seyfeddîn tê.

Piraniya şerên navbera Îran û Romiyan li ser Kurdên Sîwerekê bûn, ji ber ku ew zêde alîgirê Îranê bûn. Împaratoriya Osmaniyan hertim ew tehrîk dikirin û li hember wan komplo çedikirin û biryarên derew didane wan. Heya ku Sîwerekê bixin jêr destê xwe. Sîwerekî ku beşek ji êla Çemîşgezek bûn bi serokatiya Ristem Begê Çemîşgezek piştgiriya Şah Îsmaîlê Safewî kirin û ew li dijî Împaratoriya Osmaniyan bi hêz kirin. Ji wê demê wir ve jî, Kurdên Çemîşgezek yek ji binexwedanên Hikumeta Safewî têne naskirin.

Pêşketina wan li nav Xorasanê bi serokatiya Şah Elî Siltanê Çemîşgezek ve bû. Ew jî wek êlên Kurmancên din li deverê bi cîh bûn. Her ku di beşa Bîçeran de hate gotin, Bîçeran, Sêvikan û Kîkan her sê taîfe li jêr navê Kîkan kom bûn û bûne yek. Li hemû herêmên ser tixubê Îran û Xarezmê bi cîh bûn ku îro jî Aşxanê ya Bocnûrdê û Ciristan li Bakûrê Şîrvanê heya Deregezê belav bûne.

Nasireddîn Şah di Sefernama xwe ya sala 1300 (1921) an de, li Xorasanê Kîkan, yek ji girîngtirîn êlên Zeferan binav dike û hejmara nifûsa wan 5000 malbat dinivîsîne. Dibêje, ku ew ji ber mêranî û lehengiya xwe parastina tixuban pejirandine û wê yekê bi cîh tînin. Serokatiya êla Kîkan, gor belgeyan di deste Emîrên Sêvikan de, yê ji malbata Qobadiyan bûne. Di dîrokê de xizmetên mezin kirine û bi navên mîna Bîçeran, Kîkan û Sîvekan hatine naskirin. Yê herî girîng ji wan Hatem Begê Bîçeranî ye ku di daweta Nadîr a bi keça Sam Beg re, ku gelek xwîn ji bo wê hatiye rijandin. Wezîfa anîna bûkê li bajarê Şîrvanê bo Meşhedê hebû. Hatem Beg û begên din yên Kurmancan li wêderê paşnavên Xan bo wan hatiye dayin.

Navê serokên Kîkan, paş Hatem Xan, li gor sened û belgên di dest nivîskar de ne wiha ne:

**Mohebbet Xan Kîkan:** Kurê Hatem Xan e.

**Mohemmed Begê Kîkan:** Kurê Mohebbet Xan e û gundê nû yê Oxazê li gor seneda 1130 (1710).

**Hatem Xanê II:** Kurê Mohemmed Beg e.

**Mohemmed Begê Kîkan:** Kurê Hatem Xan, Qebale (Sened)a sala 1226 ên qemerî (1825).

**Mohemmed Hesen Begê Kîkan:** Kurê Mohemmed Beg qebale seneda 1245 ên qemerî (1827).

**Seadet Qolî Xanê Kîkan:** Kurê M. Hesen Beg, seneda sala 1285 (1865) ku tev li şerê Aqderbenda Serexsê di sala 1279 ên qemerî (1861) de bûbû û tê gotin ku bi fermana Emîr Hosên Xanê Şacaoddolê bi tifingê Qodretollah Aqa Roşenî kuştibû.


**Hatem Xanê Kîkan yê III an:** kurê Seadet Qolî Xan e.

**Mehemmed Hesen Xan Şêxolxevanîn Sîvekan:** Kurê Hatem Xan e û di sala 1310 an (1931 zayinî) de çû ber dilovaniya Xwedê û tê gotin ku gelek zana û bi aqil û siyasetzan bûye.
**Seadet Qolî Xanê Sîvekan:** Kurê Mehemmed Hesen Xanî ye ku kesek rewşenbîr, pêşverû û demokrat bûye û di sala 1314 an rojî (şemsî 1935) an de wefat kiriye.
**Qadî Qolîxanê Qobadî yê Sîvekan:** Birayê Seadet Qolixan ku hê jî dijî. Tevgera wan ya herî dawiyê Serhildana wan ya mehên Tebax û Îlona sala 1320 (1941) an de bû ku bi serokatiya Ferecollah Xanê Bîçeran pêk hat û paşî şikest xarina wan li hember Artêşa Şah û girtin û darizandin û teb îda Xan an êlên Kurmancê Xorasanê ji hev belav kirin û ew gelek lawaz kirin.

Gundên Bîçerî (Şamlû) ev in: Adîne Qulî, Ûlaşli (Şîrvan), Înçeyî Keykan (Qoçan), Bûrcû Zulfikar (Ş), Bûrc Kalê (Deregez), Berder, Bibehre, Zakîran, Zortanlû, Serdarabad, Kalê Beg, Dewletxan, Kalteman, Qeletê Balî, Qeletê Çinar, Bîg, Tûranlû, Tirk, Çarkaldî, Xezkanlû, Xelaçlû, Dûav, Taşlikalê, Dûrbadem, Gedîganlû, Gûlîl, Lûcelî, Mihemed, Naman û Hinema ne.

Yekê jî pêwîste bê zanîn ku di nava serokên Keykan, Bîçerî û Sêvikan de gelek Xane bi navê Canbegê hene. Hinek Xane jî navê xwe Qelehesen in. Dibe ku navê gundê Kelhesanê ya li Anadolê ji wir tê.

**Serdarên Keykanî**




Gundên tayifa Sîvekan ji Deregezê haya Şîrvanê rêz dibin û hinek ji wan hê jî di konan de dijîn û hê jî koçber in. Ew gundên wan wiha ne: Oxaza

Kevn, Oxaza Nû, Ulaş, Bivan, Şerkan, Çepan, Şokran, Xodkan (Xokan), Sefkan, Zortan, Zaxûran, Xoraskan (Xirskan), Bîvare (Biyare), Dûr Badam, Îmam Qalî, Şark, Kela Sefa, Bajgiran, Qer Çoxe, Kela Velo, Qizilqan, Bîr Zeynel Beg, Çar Birc, Kela Çûq, Deh û Danlo ku li gundê bi navê Tork nêzîkê tixub li bakûrê rojavayê Şîrvanê dijîn. Dema zivistanê konên xwe dibine navbeyna Bîgan û Sîsabê ku dikeve bakûrê fabrîqa şekir ya Şîrvanê.

Êla Sêvikan yan ku nivîskarê vê pirtûke jî yek ji wana ye, li bajarên bakûre Xorasanê û Tehranê belav bûne û piraniya wan di karên îdarî û çandî û bijişkî de xerîkin û kar dikin û xizmeta gelê xwe dikin.

Beşa din ya Sêvikan li Kurdistana Tirkiyê mane. Hêja Qolam Hosên Rehîmiyan dibêje ku di şerê cîhanê yê yekem de hinek ji fermandarên Kurdên Sêvikan yên Tirkiyê dîl ketibûne destê Rûsan û li Sibîryayê zindanî bûn. Gor nexşeyên ku hebûn, ew dizanîn ku Kurdên Sêvika li herêma Bacgiranê dijîn. Paş zor û zahmetiyan karibûn xwe bigihînine Bacgiranê û bavê min ew gazî kirine mala me û qedrê wan girtiye. Ew her wisa di axaftinên xwe de digotin ku li Tirkiyê jî malbata Qobadiyan serokatiya êla Sêvikan dikin.

**Şeran:**

Bi mêraniya xwe bi nav û deng in. Hinek ji wan li bakûrê Qoçanê di konan de dijîn û xerîkê karê heywandariyê ne û nêzîkê 20 kerî pezên wan hene. Şeran li gor texmînan dibe ku ji "Şervanlo" û "Şîrvanlo" hatibe. Şîrvan navê yek ji êlên xwedî hêdbar yên Kurd ku berê li herêma Loristanê zozanên havîn û zivistanê hebûne û li wêderê bajarê Şîrvanê ava kirin. Paşê bo zozanên zivistanê pez çûn Başûrê Kurdistanê. Li vêderê gundek bi vî navî hebû û ji wêderê jî çûn Qefqasya bajarên Şîrvan û Êrîvanê ava kirin. (Ewa sedî sedê ew xete ku Kurdên Şamê jî di wê rêyê de çû ne) Di nav Xorasanê de jî bajarê Şîrvanê yê îro ava kirin û ev bajara yek ji bajarên serekî ye, ku ji aliyê Kurdên Zeferan ve hatiye damezirandin. Piştî wê Qerexan kurê Şah Elî Siltan (Şah Qolîxan) navenda êlê ji Şîrvanê bire Qoçanê û di avedankirina wir de rol lîst û ji bo têkoşîne cîhekî baştir bû. Piraniya Şeraniyan di konan de dijîn û hinek jî li gundê Şehranlo ji rêzegundên Çirî ya Qoçanê dijîn.

Merdûx dibêje: Şîrvan nêzîkê 1500 malbat in û li Hewlêrê dijîn. Şîrvanî: Ew tayfe ji tayifên Kurdên Îraqê ne, dibe ku beşek ji êla Şîrvanê bin ku ew jî du beş in: Kirnî û Îrevanî. Wîliam Egelton nifûsa Şîrvani ya li Kurdistana Îraqê ku li qiraxa çemê Zê dijîn, di sala 1906 an de 1800 malbat in dibêje. (Ji pirtûka Komara 1946 ya Kurdistanê bi wergerandina Seyid Mohemmed ê Semedî rp. 93)

Şîrvana Xorasanê di sala 1300 (1921) de li gor Senbeoddolê di pirtûka Metleoşşems nêzîkê 1500 malbat bûye. Di van salan de bajar pêşve çûye, lewra hersal gelek ji Zeferaniyan dest ji jiyana konan berdan û li bajarê Şîrvanê bicîh bûn. Beşeka pir a ji Şeraniyan hê jî di konan de dijîn û hinek ji wan li gundên Şah Mohemmed li bakûrê Qûçanê bi cîh bûn.

**Şêx Emîran:**

Bi navê Şêx Emîran bi nav û deng in. Li gundê heman navî li bakûrê Şîrvanê nêzîkê tixubê Îran û Rûsyaye dijîn. Dibe ku esle wan bigihîje Şêx Hesen Beg, yek ji emîrên Çemişgezekê yê bi nav û deng e. Ji ber ku emîrên Kurdên Xorasanê ku serokê êla Çemişgezek bûne ji vê êlê bûne. Tê gotin ku Şêx Emîrî bi dilsafî û sadeyiya xwe di nav Kurdên Xorasanê de bi nav û deng e. Lê belê di dîrokê de mêrên bi nav û deng li nav wan de peyda bûne ku malbatên Şocaeddolê, Raşenî û Nigehban li Şîrvanê ku serokê bakûrê Xorasanê bûne ji wan in.

**Şêxkan:**

Yek ji êlên herî mezin ê Kurmancên Xorasanê ne ku li bajarên Qoçan, Meşhed, Çinaran, Deregez, Kelat û Esferayînê dijîn. Karê kişt, kal û kêmekê jî pez xwedî dikin. Beşa din a Şêxkan li bajarê Xoyê li wîlayeta Ezerbeycanê, rojavayê Îranê û hinek jî li Kurdistana Tirkiyê dijîn. Kurdên Şêxan yên Xorasanê ku li Çinaran, Kelat û Meşhedê dijîn, di anîna Nadir Şahê ser desthilatdariyê û her wisa ji text xistina wî de roleke mezin lîstin, ku Şahvêrdî xanê Şêxan bû. Wekî din Silêman Beg, Qoce Xan û Şikrî Beg birayê Nadîr ji wan kesan in. Jin û keçên Şêxan, di şerên Îran û Romê de di dema Şah Tehmasbê yekan an de raste rast di eniya şer de beşdar bûn û tifinga mêran ji bo wan tijî dikirin ku ew pê li dijmin xin. Her wisa karê rakirina birîndaran bo derveyî meydana şer û peyda kirin û anîna xwarin, av û tiştên hewce yên din ser milê jinên qehreman yên Şêxkan bû û Merdox dibêje; ku eslê wan digihîje Şêxekan ku li Tirkiyê navbeyna Bedlîs û Mûşê dijîn û li gel êla Cibran ku 2000 malbat in bûne yek.



**Xortên Şêxan**

**Sofiyan:**

Ji êlên giring û xwedî hedbar yên Kurmancên li Xorasanê ne ku li Meşhed, Kelat û Deregezê dijîn. Di dema Sefawiyan de qala serdarên Kurdên ji wan tê kirin. Dibe ew bi Şah Îsmaîlê Safewî re gelek girêdayî bûne. Ew paşnavê li wan kiribûn û ji ber ku piraniya wan li Kurdistanê li herêmekê nêzîkê Celdiyanê dijîn ew der jî bi navê Sofiyan binav kirine. Sofiyanên Xorasanê di dema Nadir Şah de xwedî hêzeke berbiçav bûn. Di gîhandina Nadir bo ser text gelek fedekarî û mêranî kirine. Nadir Şah jî hertim hurmeta wan digirt û ew di karê mezin de wezîfedar dikirin. Di van salên dawiyê de xebatên Dr. Mohemmed Moseddêq yên li dijî rejîma Şah li aliyê Kurdên Sofiyanî ve hate destek kirin û Kurdan piştgiriyek mezin dane Moseddiqî.

**Emar:**

Ez dibêjim, dibe ku ew bi şaşî hatibe nivîsin û di eslê xwe de "Amar" be. Kurdên Xorasanê wan bi "Amaran" bi nav dikin. Amar tê wataya enbarê. Fikir dikim ku di eslê xwe de ji bajarê "Enbar" nêzîkê Medayinê bin ku di dema Sasaniyan de ewder diparastin. Piştî ku ew bajara kete destê misilmanan ew Kurdana ber bi Medayin ku ji Kurdistanê zivirîn û paşê jî bi heman navê cîhê xwe yê pêş de (Enbar) hatine binav kirin û ji ber ku Kurd bi xwe dibêjin Enbarê, Amar lewra jî dibêjine wan Amaran. An ku ew kes in ku li Amarê dijîn bûne Amar. Amara yek ji êlên xwedî hêdbar yên Kurmancên Xorasanê ne û li bajarên Nîşabûr, Qoçan û li beşa Emarlo ya Gîlanê û deverên Qazwînê dijîn.



**Jinên Emarî**

Merdox nivîsiye, ku Emar 2000 malbat in û li başûrê Gîlanê navbera Rûdbar û Qezvînê bi cîh bûne û çend tayifên ku Qebe, Qeran, Şemkan, Beşan, Behadir û Şahkelan çend tayife ji wan in. Emîn Zekî jî wan bi "Enbar" û "Amar" dide naskirin ku nivîskar jî ser wê baweriyê ye.

**Qaçkan:**

Hinek kes wan ji êla Qoçan dizanin û dibêjin ku ew ji berevajî kirina Koç-Koyûn çêbûye. Divê em bibêjin ku qoç tê wata beran (pezên nêr) û qoyûn jî tê wata mîh (pezên mê) û ne hewce ye ku mirov bêje Qoç-mî tê wata "nêr û mê". Eger bê gotin ku "Qaş qoyûn" bûn baştire, ji ber ku Qaş tê wata pezên Spî ku dora serê wî reş bin. Qaçkan li gundekî bi heman navî li bakûrê bajarê Qoçanê dijîn. Jinên wan kincên Kurmancî yên xweşik li xwe dikin, ku ji terza Qeremaniyan e. Qaçkan, yên din li Dîzavend li 12 km û Ce efeabad li 15 km ya Qaçkanê dijîn û hinek jî li gundên Deregezê yên wekî Şemsî Xanê dijîn. Nêzîkê 200 malbatên Qaşkanan hê jî koçber in. Zivistanan li Deregez, Serexs, Meravê Tepe û havînan jî li çiyayên Hezar Mecid li mintiqa Daş û Kanî Sarê dimînin. Serokên êlê Ehmed Qaçkan û Hecî Mohemmed Rehîm Recaî yê Daçkan bûne.

**Qereçor-lû:**

Qereçor yan jî Qereçolo yek ji girîngtirîn êlên Zeferan yê ku cîh û warê wan yê eslî li bakûrê Amedê û rojhilatê Gola Wanê, li bakûrê Kurdistanê ye. Kela Qere Çolan yek ji kelayên bi nav û bang li Kurdistana Tirkiyê bû ku wekî dibêjin dewleta Tirk di van salan de bendavek çekiriye ku zevî û erdên Qere Çoliyan ketiye bin avê. Qala zîrekî û şervaniya Kurdên Qere Çorlû ku ji Kurdên mêrxas yên Xorasanê ne hatiye kirin ku li dijî Şahê Efşar şer kirine. Çeperên ku Kurdên Qere Çorlû ser rêya Şîrvan Bocnûrdê çêkirin û têde li dijî Nadîr dema ku ji deşta Qebçaqê dizivirî şerekî dijwar kirin hê jî ser dola ku ax ketiye aliyê rojava ya fabrîqa şekir ya Şîrvanê û heya nêzîkê gundê Sîsa direje mane. Ew şerên Qere Çorlûyan bi fermandariya Necef Siltanê Qere Çorlû di dîrokê de cîhekê taybet nivîsiye. Ew şer heya ber bi rêzeçiyayên Aladax û Şahîncanê ve jî çûn û paşê ji ber ku Nadir Şah di warê topxanê de xwedî hêzekê mezin bû ku bi serket û Necef Siltan mecbûr kir ku aştiyê bike. Necef Siltanê Qereçor di dema çavpêketin û lihevhatina gel Nadîr de wiha got: Ji berê heya îro, nêzîkê 300 sal in ku Kurd li vir dijîn. Her rih li berek dibe ku tevahiya welatê Îranê pê agah be ku ji şûrê gelê Qereçorî tirsiyane û niha jî cemeta Zeferan û Kîvan ku bêtir nêzîkî te bûne bin êşa fitnê ne. Ji wê rojê wir ve Nadir xwest ku dilê Necef Siltan xweş bike û Kurdên Qereçor jî razî bike. Qereçoriyan jî karîbûn hatina xwe nîşanî Şah bidin. Şokir Begê Qereçor di nav êlê de ma û serdarên din yên Qereçorî bi fermandariya Necef Siltan di kela Nadir de çûne şerên Herat, Îran, Romê û di leşker kêşiya Nadir de ji bo Hindîstanê roleka mezin hebûn. Piştî dema Nadîr û piştî ku gelek ji serdarên wê êlê di şerên dema Nadîr de hatine kuştin, Êla Qereçorî kete nava zor û zehmetê, ji ber ku Nadir êdî nemabû.

Lewra ji Necef Siltan, Ristem Begê Qereçor, Şahbazek, Mûhammed Riza Xanê Qereçor, Mohemmed Xanê Qereçor û yên din nedikarîn tiştekî bikin, ji ber ku mêrên mezin li cem mêrên mezin perwerde dibin. Dema Şah Rox û Şah Siltan Hosên û yên wekî wan jî zeîf û lavaz digeheştin. Zanînên niviskarî li ser wê êlê û bûyerên piştî Nadir heya dema Riza Şah hindik in. Lê di dema Meşrûdê de ye, ku carekî din Hosên Qolixanê Qereçor mêraniyê dike; jin, zarok, mal û milkê gelê Sebziwar û herêmên devera wê ku demeke dirêj bû di bin simê hespên Ozbekan de bûn, ku li rêya Şahrûd-Sebziwarê dihatin û ew talan dikirin, rizgar kirin. Di wê demê de kesek di xema gelê Sebzîwarê de nebû heya ku Hosên Qolixan hat, şerê talanker û dagirkerên Ozbekan kir. Ser xençera xwe hilanî û anî Meşhedê û bi wê awayî dilê gelê Xorasanê yê daxdîtî derman kir.

Hosên Qalî Xan ku apê hêja xanlerxanê Qereçor bû, bi destûra Riza Şah û bi alikariya Emîrcan Mohemmed Xanê Qaçar fermandarê artêşa rojhilat (Meşhed) tevî 70 heval û mezinên Kurdên Xorasanê yên wekî serdarê mezin yê Kurdên Şadî hatine tîr baran kirin.

Hosên Qalî Xan, kurê Hecî Mohemmed Elî Xanê Morteza Qolî Xan ku bi Xan Nayîb navdar bû, kurê Hecî Sebz Elî Xanê Qereçor bû ku hikumeta Somleqan Şûxan û beşek ji tayifên Goglan di Înçe Êmend û Gilîdax û deverên wê birêwe dibir. Dibe ku ew Sebz Elî Xanebît ku Mohemmed Hesen Xanê bavê Aqa Mohemmed Xanê Qaçar kuştiye. Kurdên Qereçor gişt cîgir bûne û li devera Bocnûrd û Aladax û bi taybet li Şûxan û Somleqan, Toyzar ya Esferayinê û Qûrî meydanê karê çandiniyê dikin û hinek pez jî xwedî dikin û navenda wan rêzegundên bi navê Kurdên Qereçorî navbeyna zozanên havîn û zivistanê yên Kurdên Xorasanê li herêmekê ne ku av û hewayê wê xweş e dijîn û hewce nîne ku koç û bar bikin. Jiyana wan li gorî yên din baştir û rihettir e. Hinek ji Qereçoran li Xwarû- Veramîn, Demawend û Meşhedê û hinek jî li Dergezê dijîn.

Nasireddîn Şah di Şerefnama xwe ya di roja yekşem, çarê heyva zîheccê sala 1300 an de wiha qala Kurdên Qereçorî yên herêma xwarê dike: "Divê îro em biçine bo pavê xwar. Nêzîkê cihê rawestana me 400 siwarên Ûsan, Qereçor û Hudavendê Ebolcemî Emine Siltan ku li xwarê dijîn li gel mezinên xwe ser rêya me bo rêzgirtinê û silav kirinê rawestiyabûn. Seyfollah Xan serokê Ûsan, Sefer Elî Xan serokê Qereçoran û Rehîm Xan serokê Hudavendan hatine hizûra me." Her wisa Nasireddîn Şah li Bloka Yatrîxwar qala du gundê bi navê Hosên Abad û Elî Abad dike ku Kurdên Qereçor lê dijîne.

Gor agahiyên min li Xorasanê komkirine êlên Qereçoran ev in: Sîlûr, Şaqulî, Dewelî, Qere Welî, Kersan (Sersan) in. Li gundên bajarê Aşxanê yên mîna: Gazî, Şerebadî Kurd, Şaaba, Qele Necef, Çîlîk, Qelê Mûsalî, Qelê Mola Hesen.

**Qereman:**

Wîleyeta Qereman li Kurdistana Tirkiyê li rojhilatê derya Wanê nêzîkê

Sêwasê û derya Reş e.[153] Ew bi tevahî şaş e, Qereman bajarekî li başûrê Tirkiyê, di navbera Qonya û Behra Spî de ye, hinek Kurdên Kurmancî axêf lê dijîn. Berê paytexta dewleta Kurdên Qeremanî (Bi tirkî Qeremanogullari) bû. Pişti ku dewleta Osmaniyan li dinyayê fireh bû û li nav emîrzadên Qeremaniyan de li ser desthilatdariyê nakokî derketin, emîrên ku şikest xwaribûn berê xwe dane siltan Muhemmed Împaratorê Romê (Osmanî) û xwestin ku bi alikariya Osmaniyan herêmên Qereman dagir bikin. Di wê demê de li Îranê jî desthilatdariyake yekgirtî tunebû ku piştgirtiya mafê Kurdên ku li ser tixubên Romê dijîn bike. Di sala 873 an de yek ji emîrên Qeremanan çû cem Ûzûn Hesenê Aq Qoyûnlû ku ji bo warên xwe yê zivistanê ye li Tebrîzê danîbû ji wî destek xwest. Lê Ûzûn Hesen bi xwe re nedidît ku bi Osmaniyan re şer bike û daxwaza Qeremanan red kir. Bi vî awayî Qeremanên ku hêviya xwe bi Îranê re nemayî tevlî artêşa Romiyan bûn. Di şerê sala 877 (1498) an de, ku navbera Ûzûn Hesen û Romiyan de qewimî de beşdar bûn û Ûzûn Hesen şer winda kir. Di gel peydabûna dewleta Sefawiyan, piraniya Qeremaniyan gihîştine Şah Ebbas û bûne xwedî statû û hêz. Yek ji kesên herî binavbang yê wê demê **Biram Begê Qeremanî** ye, ku bi xwîşka Şah Ebbas re zewicî.



**Jinên Qeremanî**

Bi dîtina min di vê îddeayê de kêmasiyek heye, ew jî, dîtina ku bi gihîştina Şah Ebbas, ew bûn xwedî hêzê. Di beşa Qeremaniyan de jî min nivîsî bû ku yek ji koman bi hêza Safewî damezirandî Qeremanî ne. Eger Qeremanî û hêzên din ên Kurd nebûyana Safewî jî Şah Ebbas jî dernediket holê. Li ser milê wan Sefawiyan hêz komkirin û bûn dewleteka mezin.

Bîram Beg, Xorasan ji destê dagirkerên Ozbek rizgar kir û tixubên berê yên Xorasanê carek din çêkir û dest danî ser Herat û Belhê. Di sala 967 an de ji ber mêrxasî û netirsiya xwe ku çûbûn nav dilê dijmin de hate kuştin. Wekî din mirov dikare qala Zolfeqarxanê Qereman bike ku di îdare kirina welat de,

piştî Şah wek kesên herî bi hêz û xwedî desthilat bû û di dema Şah Ebbasê yekan de li niqta herî bilind bû û paşê jî bi destê Şah hate kuştin, ji ber ku Şah ji hebûna wan ditirsiya.

**Mayvan, Îgan, Qasiman, Şadkan û Heşt Merxî** ji êlên Qereman in. Nivîskarê dîroka Qizilbaşan dinivîse: "Emîr Qereman di dema Qere Yûsûf (yek ji emîrên Beraniyan) ji hemûyan mezintir bû. Di şerê Siltan Îbrahîm Paşê yê Şîrvanê de mêraniyeke mezin kiribû. Her wisa qala Pîrê Qereman Emîrê mezin Biram Begê Qereman û yar Ehmed Begê Qereman jî dike.

Qeremaniyên Xorasanê gelek jêhatî û mêrxas bûne. Hêja Ebolfezl Qasimî dibêje: Li Xorasan serokê êla Qereman alîkar û piştvanên Nadir bûye. Berê ku Nadir bibe Şah serokê herî dawî yê Qeremanan gelek netirs û jêhatî bûye. Welî Xanê Qeremanî yek ji wan kesan e ku hem bû sebeba kuştina Ceco Xanê Zeferan û hem ji bû sebaba serkevtina Kurdên Xorasanê li hember Kolonel Mohemmed Teqî Xanê **Pesiyan**. Êla Qereman li bin çiyayê Şaycanê dijîn; nivîskarê dîroka Qizilbaşan bi şaşî Qeremanan ji qewmên Tirkên Selçûqî yên Akkoyûnlo binav dike. Lê tê zanîn ku di Kurdbûna wan de ti cihê gumanan nîne. Ji ber ku ji herêma Qereman ku di bin desthilatdariya Osmaniyan de bû, Qereman, piştî ku ji bo alikariya Şah Îsmaîl çûne nav Îranê her bi navê welatê xwe yê eslî Qereman hatine binav kirin. Herêma Qereman li rojhilatê derya Wanê ye.[193] Min di beşên din de jî nivîsî bû, ku beşekî Qeremanan, piştî hilweşandina Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Mirov dikare bibêje ku ew bûne du parçe; yekî Safewî damezirand ya din jî tevlî Hesenê Direj bûn.

**Kawî-yan:**

Bi Kavan jî bi nav û deng in. Tê gotin ku Kawa yê Hesinkar, Kurd li dora komkirin û dijî Dehak serhildan pêk anî û Ferîdûn anîne ser text. Yek ji wan Kawayiyan e ku di demên pişt re Kurd xwe ji Kawe dizanin û navê xwe danîne "Kawe'î" û paşê jî bûne Kawanî.[193] Kawî li bakûrê Kurdistanê li bajarokê Kolik-Semsûrê jî hene. Di sedsala XVI an de li Semsûrê girêdayî konfederasyona Reşiyan e. Ji alî rûhiyat û qerekterê ve jî wek Reşiyan e.

**Kox Binik:**

Dîrokzan bi taybet Muhemmed Kazim di pirtûka Alemê Arayê Nadrî de dibêje: "Ew Koxbinik in." Lê belê ya rast Kox Binik e. Herêmêka di navbeyna Kora, Espçîr, Tîtkan, Zeydan, Dovletxane û Şêxkan de ye. Navê Koxbinik ji Kox li hember Kax anko qesr û serayê tê. Hinek ji kesên ku li Koxê dijîn re dibêjin "Kloxnişîn" an ku kesên bê ser û ber, kesên belengaz, kesên ku li nav klox û axê de kardikin, dijîn û bi rêya çandiniyê jiyana xwe didomînin. Helbet Kloxnîşin an jî Koxnişîn li hember "Çarvadaran" dihate gotin. Ji kesên ku pez xwedî dike û di konan de dijîn re Çarvadar digotine. Çarvadirî ku geleke azad û serbest bûn; li çolê dijîn, jiyana li xwezayê bi ya bajar, gundan, şert û mercên jiyana bajarî û temedonê nediguherîn. Bi çavêkî biçûk dîtî ji gundiyan re di-

gotin koxnîşin an jî kloxnîşin. Desthilatdariya Koxbinik di wê dema dawiyê de di destê Mîrên Roşenî ji xizmên Roşen Xanî de bû. Muhemmed Îbrahîm Xan Roşenî berê serokatiya êla Zeferan, hakimê Kox Binik bû. Piştre ew meqamê xwe (hakimî) da kurê apê xwe Eslan Xan. Eslan Xan jî ku her tim li bajarê Qoçanê dijî desthilatdariya vêderê siparte zavayê xwe Seadet Qolixanê. Oxazî gêncekî Şerzan û jêhatiyî bû. Dema ku Kolonêl Mohemmed Teqî Xanê Pisiyan êrîş bire ser Qoçanê Seadet Qolîxan jî ji Koxbinikê birê ket û xwe gihande Xan (mezin) ên Zeferanî.

**Kîkan:**

Hate gotin ku Kîkan yek ji êlên herî mezin yê Zeferaniyan e ku li seranserê tixubên bakûrê Xorasanê ji Aşxana, Bocnûrdê bigre heya Dergez û Qoçanê belav bûne. Nasireddîn Şah di Sefernama xwe de bi giringî ser Kîkan radiweste û hejmara wan 5000 malbat dinivîsîne. Êla Kîkanlo berê havînan li bakûrê Azerbaycan û başûrê Qefqazê bûn û zivistanan jî ber bi herêmên germ yên Kurdistana Tirkiyê ve diçûn.

**Kîvan:**

Yek ji girîngtirîn êlên Zeferan e ku li herêma Çinaran, Rasekan û Deregezê bi cîh bûne. Heja Ebolfezlê Qasimî dema qala bersîngana (çûxê, gilaş) ya Kurdên Xorasanê dike navê Kazim Begê Kîkan jî Radikan ê tîne. Ji ber ku Kîkan li Serhedê dijîn ne li Radikanê. Nasireddîn Şah jî di Sefernama xwe de qala giringî û rola Kîkaniyan dike. Nisamosedsalaeltenê apê Nasireddîn Şahê jî dema ku ji Qoçanê tê Meşhedê li Radikanê radiweste û ji aliyê Xanler Xanê Kîvan ve tê pêşwazî kirin ku hevrêyên Hisamosedsalaeltenê ji mêvandestî ya Xanlar Xanî û bicîh anîna hemû pêdiviyên leşkerên Hisamosedsalaeltenê ecêbmayî bûn.

G.S. Nîpîe, subayê ragihandina Îngîlîzan ku bo sîxuriyê di sala 1291 (1873) de hate Xorasanê, di warê pêşveçûna Rûsên dagîrker de helwesta Kurdan û Ozbekan li hember wê dagirkeriyê lêkolîn bike. Ew, qala hejarî, belangazî û derbideriya gelê Îranê ya li wê demê dike û dibêje: Gelek kes ji ber hişkî û birçîbûnê mirin. Lê dema ku ew dikeve nav herêma Radikan dibîne ku rewşa jiyana gelê Kurd li wêderê rihet û xweş e. Ecebmayî dibe û hemû gundên wê deverê bi taybet Tevîl û Yûsûf Abadê dixe bin çavderiya xwe ku gelên wan gundan gelek keyf xweş, rihet, xweş rû, rind û cîhê wan jî bi şînahî, pir av, bax-baxçe û rezên wan tijî mêweyên cûr bi cûr yên wek tirî û sêv in û keriyên pezên wan jî qelew û serxwe ne. Li bara qiyafe û tîpa Kurdên Kîvan de dibêje, ku "Hemûyan kincên bedew û xweş li xwe dikirin û ez bê hesiyam ku ew mêrên bejin kurt, lê hestî gir û bi hêz in. Di nav wan de çavşîn pir zêde hebûne". Nivîskar di wê barê de dibêje, ku "Min jî zanî bû ku çavê wan e rûyê wan xweşiktir dike. Gîşt êla Kîvaniyan niştecîh bûne û karê çandinî, baxdarî yê dikin û li cîhê xwe de pez jî xwedî dikirine. Welatê Radikan ji bo çêra pez,

karê çandiniyê baş û kêrhatî ye. Navenda Kîvaniyan gundê Radkanê ye, ku pêş êrîşa Cengîz Xanê Moxol xwedî girîngiyek taybet bû û gelek avedan bû. Serokê êla Kîvaniyan di dema Nadîr Şah de Xoda Bexşê Kîvanan bû. **Torsan, Goverişkan û Miyan** ji tayifên din yên Kîvanan in.

**Goliyan:**

Dibe ku ew ji "Golmanrûd" ji Loristanê bûn, Bedlîsî di Şerefnamê de qala vê yekê dike. Di wê demê de yek ji girîngtîrin êlên koçberên Xorasanê ne ku havînan li rêzeçiyayên Aladax nêzîkê Şûxan û zivistanan jî li "Berojî" Meravê Tepe li qiraxa çemê Etrek û nêzîkê Aytemûr û Aq Gemiş pez xwedî dikin. Ji wana hemûyan girîngtirîn û bi nav bangtir Hecî Axa Xan û Şah Riza ne ku her yekê 3000-4000 pezên wî hene. Di dema rêjima Şah de ku mêrg û zeviyên Goliyan li Aladaxe ji aliyê dewletê ve hate qedexe kirin û beyî ku ji bo wan mergan bidin, karê Goliyan pir zehmet bû, ew jî kêmekê berxwe didin, lê belê li hember artêşa Şah ya bi çek nikarin karekî bikin û ji hev belav bûn û her desteyek çû aliyekî. Bi taybet Aqa Xan çû Çiyayên Oxazê û yek-du salan li çiyayê "Petlegah" zozan danîn. Lê piştî bi serketina şoreşa gelê Îranê carek din êla Goliyan zivirîne ser cîh û warên xwe yên li çiyayê Aladax û niha jî li wêderê dijîn û berhevên xwe yên ji pezên xwe yên bên firotinê rêdikin bajarê Bocnûrdê. Êla Goliyan gelek şerzan û mêrxas in ku ew jî di dema bihurî de tevî Qereçoriyan çûne şer heya dema ku êla Qoliya bi yekîtî û ligel hev bûn ti kesê heya Seyid Reşîdê diz û rêgir jî nekarîbûn ji wan bac û xeracê bistîne. Lê ji ber cûdahiya ku kete nav wan, Seyid Reşîd bi alîkariya desteyek ji Goliyan derbeyeke mezin li Goliyên din xist û Eliyê Golî bavê Aqa Xan di şereke bi nişke de têk bir û zar û zêç û jinên wan dîl girtin û mafên wan binpê kirin. Her ew Goliyana bûn ku xirabkarên Bovan û Ûlaşiyan ku li geliyê Kelayinê êrîş kiribûne ser wan û mafê wan binpê dikirin. Giş girtin û kuştin. Neyê ji bîrkirin ku gol tê wateya kendal û cîhekê kûr û dibe ku navê Goliyan ji wê hatibe.

**Mojdîgan:**

Yan jî Mozdakan, ku yek ji êlên girîng ê Xorasanê ne ku tevî Amarliyên Nîşabûrê li deşta Marûskê dijîn. Êla Mojdigan, di leşker kêşiya Nadir bo dor û berên Îranê de roleke mezin hebûn. Mesûdî di pirtûka Morevîcozzeheb de qala Kurdên Mozdakan li herêma Cibal dike, dibe ku bê şik ew bin.

**Milan:**

Her wekî tê zanîn Milan û Zîlan du bira bûne ku her yekî serokatiya êlekê (gereg zend be-Ş) dikiriye. **Kurdên Sêvikan navê Zîlan danîne ser çiyayekî xwe yê bilind û qehîm yê di navbeyna Bajgiran û Oxazê de ye**. Hinek ji Milaniyan li gundên "Mîlana Jor" û "Mîlana Jêr" ku navê rêzegundên Cirîstanê ser tixubê Îran û Rûsya qedîm de dijîn û serokê wan yê dawiyê jî Misir Xan e. Cirîstanîyên mayî jî li Esferayin û bin çiyayê Şaycan de dijîn, ku

nivîskare Metleoşşems dibêje: "Tayifa Milan yên ku Kurd 1.000 malbat in û ji êla (konf) Zeferan in. Li çiyayên Şaycan dijîn û çend gundên wê tayifê hene ku wiha ne: Qeleyên/gund Doletabad, Qasimabad, Pertan, Ebbasabad, Nûşîrvan, Erdexan û Bidvaz e.



**Malbateka Milan-Şîrwan**

Serokê êla Milanê Esferayinê Emîrên Roşeniyan bû, ku yê dawiyê Mohemmed Îbrahîm Xanê Roşenî Mozefferosedsalaeltenê bû. Hêja Hecî Mohemmed Xanê Roşenî kurê Mozefferosedsalaeltenê di nameyek de ku bo nivîskarê vê pirtûkê dinivîsine de wiha dibêje: Tayifên Milan û Kurdên Esferayinê li ku dijîn û wisa dibêje: **Navê 24 deste ji tayifa Mîlan ji êla Zeferan ev in :**

**Qaniyan:** Navbeyna Geliyana Şîrvanê û Sorxqelê (kela sor) û Zevarim.
**Pehlewan:** Sorqelê (kela sor) û Hisar Geliyan paşmayiyê êla Pehlewan e.
**Melevan:** li gundê derdor in (Paşmayiyê êla Melavan e li Bacgiranê ne).
**Hosêynan:** Ser çişme (ser kanî).
**Şêx Emîr:** Erdexan-Kelatecat bin deşta Esferayinê (Paşvemayî yê êla Şêx Emîran). Li gundên bajarokê Haymanê-Enqerê jî hene û gundekî bi heman navî jî heye.
**Hesenan-Hesen Abad:** Hesenan êleke mezin bûye ku Merdox êla Zeferan yên Xorasanê beşek ji wan dizane, lewra ji wî gelek tişt aliyê Kurdên Zeferan de

nedizanî. Ew dibêje: "Hesenan ku Hesenanniye jî dibêjine wan, nêzîkê 3.000 malbat in û li Serhedê, Îran, Îraq û Tirkiya û çiyayê nezik Bedlîsê û wîlayeta Kerkar dijîn û heşt deste (Tîre) ne. Têlye (Ji Têliyên Nêyşabûre) Cakiye, Heyderan, Xorasan (Xoraskanlo ku niha li rêzegundên Oxaza Qoçanê ne û bi şaşî dibêjine gundê xwe Xirskan), Spîkan, Cobran, Zîlan, Îdman ku ew sê tîre dawiyê li Serhedê Bedlîse nê. Di rûpela 95 an de dinivîsîne" Spîkan nêzîkê 3.000 malbat in li bakûrê derya Wanê dijîn.

**Qaçkan:** Gêncdan, yên din li bakûrê Qoçanê ne.

**Cemalan:** Kelê yê Sifîd (kela Spî). Li bakûr û rojavayê Kurdistanê wek Cemaldîna derbas dibin.

**Pîrkan-Îzî** navê gundê wan e.

**Sarkan (Sarman):** Sarkan û yên din jî li Xoyê û Serhedê Îran û Tirkiyê û piranî jî li Kurdistana Tirkiyê dijîn.

**Perkan:** navê gundê wan e.

**Xaniyan-Qezaqî:**

**Qolan-Kelatê Sencar û Nesrabadê Serçişmê:** Hinek di wê baweriyê de ne ku tayfa Qolan yek ji tayifên êla Bîçeraniyan e ku yên din jî li gundekî bi sernavê xwe dijîn li Tekmerana Şîrvanê.

**Hecîkan:** Qasim Xan.

**Meskana:** Zemanabad (Mesûdî di pirtûka xwe de navê Meskanê aniye).

***Qere Şêx Emîran:*** Kelatê Kerbelayî Hesen (Paşvemayî yên êla Şêx Emîran in).

**Mêreban:** Çêşmê yê Xalabad (Kaniya Xalava ya wîlayeta Mêhreban li Azerbaycanê ku berê Kurdên Erdelanî lê dijîn).

**Xodkan:** Çihil Doxteran (Xodkanên din navbeyna Oxaz û Kuran li bakûrê Qûçanê li geliyeke teng û kûr de dijîn ku gel ji ber cihê wan yê nebaş ji wan ra dibêjin Xodkan).

**Pehlewan:** Toyzarî (ewana beşa din ya êla Pehlewane ku ew êl bixwe bi "Pelûlan" hatiye naskirin).

**Xosrovan:** Fertan (Pertan) a berê.

**Emîran:** Navbeyna Geliyan û Sorx Qelê li Per Çîn ê.

**Cafkan:** Can Ehmedî; Ayetûllah Merdox dibêje; "Caf nêzîkî 12.000 malbat in ku her tim li Silêmaniyê dijîn. Ew tayife du tîre ne. Cafê Îranê û Cafê Îraqê. Hin malbat jî li Qoçanê ne.

**Sîvedan:** Kelatê Şerefxanî (Ku Nasireddîn Şah di Sefernama xwe de qala wan di heman herêmê de kiriye). Li gundên girêdayî Cîhanbeylî-Qonyayê jî Sewêdî hene.

**Kelmişan (Kelmîsî):** Ku li Kelatê Şûr û deverên Siltanabada Sebzîwar û Klîderê bi cîh bûne. Pirtûka binavbang a Klîder ya hêja Dewlet Abadî qala wan Kurdan dike; hate gotin ku ew ne ji êla Topkan in. Piraniya êla Milan li ser xeta tixubê Îran û Tirkiyê û bajarê Xoyê dijîn. Hêja Menû Çehr Kelanterî di meqaleya xwe ya balkêş bi wêneyan şiroveyeke balkêş dike ku ê beşek ji wê jî were qalkirin.

Êla Milan li welateke firê û pir bereket li qiraxa çemê "Zengmar"

navbeyna Maku û rêzegundên Qotur yê Xoyê wek gundî an jî konnîşînî dijîn. "Xuya nîne ku peyva Milan ji kê yan ji çi hatiye, hinek ji Milaniyan dibêjine ji ber ku mêrekê (Milekê) navê wê êlê di serî de danî, lewra jî jê re dibêjin Milan û hinekê din jî dibêjin ku ew ji Mêl naku çiya hatiye. **Êla Milan dibe du desteyên mezin bi navê Mîlan û Xelikanî**. Milan jî dibe pênc tayife bi navên: "Memekan, Dûdkan (dibe ku ji Tîtkan yên Qoçanê bin), Mendolkan, Şêxkan, Sarman (piraniya wan li Tirkiyê dijîn). **Xelîkanî** şeş tayife bi navên: **Keçelan**, Golikan, **Omûyî**, Moroyî, **Qordiyî**, Xozûyî ne. Her wisa di wê meqalê de hatiye gotin ku serokatiya êlê di nav Milan de ji bav digihîje kur, lê belê eger serokê êlê heya dema dawiyê ya serokatiya xwe de ti kurên gehiştî (balix) tunebin, rêberiya êlê dikeve deste yek ji mêrên herî hêja û jêhatî yê malbatê. Milaniyên Xoyê Şafiî ne (lê Milanê Xorasanê û her wisa piraniya Kurdên Xorasanê Şîa yên dozdeh Îmamî ne). Koçberî û xwedî kirina pez du meh ji biharê bihorîn beşek mezin yê xwedî pez yên êla Milan jî gundên Qişlaqî (germiyan) yên qiraxa başûrê çemê Arasê û deverên Xoy, Maku û Şapûrê tevî pez û lawiran siwar û peya ber bi zozanan ve birê dikevin. Bi destpêka havînê digîhîjin cîhên xwe, bi kêf û xweşiya xilasiya ji zehmetiyên rê û bi dîtina mêrg û di konên xwe yên reş de dimên. Sê mehê tijî li wêderê pezên xwe diçêrînin û di rojên dawiyê yên havînê de dizivirine qişlaqê. Êla Milan ku qiraxa çemê Arasê de rûdinên ev çend salên ku jiyana şivantiyê ya bi wateya koçberî û bi tenê pez xwedî kirin berdane, ber bi bazar, sûkan ve diçin, pere û qîmeta pere ya rastî jî hîn bûne û ew naskirine. Lê beşek ji Keçelaniyên Esferayinê têkilê êla Milan bûne û hinek jî di nav Keçelaniyên Qoçanê li gundê Cefer Abadê de ne, berê li Mêrdînê li Kurdistana Tirkiyê jiyane. Nivîskarê Diyarbekirî wan bi navê Ak-keçî û Qere-keçîlî bi nav dike ku li Mêrdîn nêzîkê Siwerekê û ê li wilayeta wê dema Amed de jiyane. Emîn Zekî dibêje "Keçel 1.000 malbat in, nêzîkî Palûyê dijîn. Deh Xoda dibêje ku "Keçeran gundekî ji rêzegundên navendî yê herêma bajarê Bocnûrdê deşt e û av û hewaya wê xweşe, nufusa wê 1124 kes in.

**Wêran:**

Wêran êleke nivkoçber e, ji berku piraniya wan li gundên ....... û Xêrabad, Îbrahîmabad, deverên Radkan û Çinaran malê xwe hene û hejmarek pir hindik hene ku mala wan li piştê bê û koçer bin. Zêdeyî nîvê hezar malbatan wêraniyan di konan de dijîn û havînan li rêze çiyayên Bînalûd li çiyayen Klîde û Exlûmed dibin. Di dema payîzê de li qiraxa çemê Keşfrudê ji rojhelat berbi roj ava ve koçdikin û wek Topkaniyan demekê li deşta Keşferûdê li nav darên dewara polê Mozdûran û Rebat Mahî (Rebat Çahek) ku 95 km dûrî Meşhedê ye dadikevin û konên xwe vedigirin û bi destpêka çile ber bi Serexsê ve diçin. Pêş û li sorûberên Şorlûk (Sarloq ji ber ku ava wê şor bûye û di dema êrişa Hisamoselterê bo ser Ozbekên talanker be aliyê dinyê Serexsê hêzên Îrane ji ber ku pir tî bûn ew av vexwarin û gelek pê mirin. Ew nav bi tirkmanî ye – (berê navê wê Telx Ab bû) heya Gonbedli (gonbedli ku duratiya wê heya

Serexsê 45 km û heya Meşhedê jî 150 km ye cîhe Erebên xwezayî ye ku niha bi farisî diaxifin.) û nêzîkê Xangiranê belav bûne. Rêya ku ev êla dide ber xwe li gor koçberên herêma rojava rêyek kin e û ji destpêkê heya dawiyê zêdetir ji 200 km nabuhure. Wêraniyan ti heştirê xwe tunin. Weraniyan 140 kerî pezên xwe hene.

**Hîzolan:**

Êla Hîzolan li Qoçan û deverên wê belav û bi cîh bûne û hinek jî hê koçber in. Çend malbatên wan di zivistanê de tevî Wêraniyan ber bi Serexsê ve diçin, lê yên din li herêma rojava hatin û çûne dikin û di zivistanê de jî ber bi Meravê Tepê ve diçin. Li Taqera Biçûk bin Narliyê cîh digirin û di havînan de jî ber bi çiyayê bakûre rojavayê Qoçanê ve diçin. Yek ji kesên binav û deng yên Hîzolan Xwedê lê xweşbûyî Xoda dad (Xodê da) Kuhistanî ye, ku yek ji dewlemend û xwedî hêz û mezinên Qoçanê dihat naskirin.

**Hîwedan:**

Hîwedan an jî Hiyedan dibe ku ji "Hîwedil" bin. Lo jî tê wateya cîh bûn. "Hîwedil" cîheke li Cizîrê ku Bedlîsî di Şerefnamê de wan wekî Kurdên Êzîdî bi nav dike. Ji ber ku gelek rê û remên ola Zerdeştî di çanda xwe de xwedî dikin û dibêjin wana Êzîdî ne. Lê misilmanên radikal jî, ji bo biçûk xistina wan dibêjin Yêzîdî û wan bi Yezîdê kure Mûaviye ku mirovek gelek ne başe û mirovekî zalime ve girêdidin. Mirov dikare bêje ku Kurdên Hîwedan gişt niştecîh bûne li Qoçan û Duxaî û li gundên deverê belav bûne. Hebibollah Xan Nasir leşker yek ji emîrên dawî yê Hîwedan bû. Ji mêrên bi nav û bangên Hîwedan divê em qala Emîr Qolîxan Serkeng bikin ku di dema Emîr Hesen Xan Şocaoddolê û kurê wî Mohemmed Nasir Xan Şocaoddolê xwedî hêdbareke berbiçav bûye.

E. Xemgîn dibêje: Begê begliga Silêmanî li Qulp, Ciska, Taş, Hasolî û Farqînê kelehê heynan û serokê xwe yê yekemîn jî Silêman bû. Paşê kalên Bidiyan, Karûkan, Dilkelokiya, Ribat, Cirîs, Îdnîk û Gêncê jî heynan. Li wê herêmê êlên Hevêdî, Dilweran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zikziyan û Berazan birêve dibirin. Di dema Sefawiyan de têkiliyên wan baş bûn û mîritî berdewam dikir. Di sala 1514 an bi şûn de, di dema Osmaniyan de jî her hebû.[101-190] Di wan salan de hîna jî Hevêdî li dora Amedê bûne ku gor dîtina min Hîwedan jî Hevêdî ne.

**Pirsgirêk û astengiyên êlên Kurmancên Zefaran di karê pezxwedîkirinê de:**

Wek nivîskarê pirtûka "Metle û Şems" dibêje hejmara êlên Kurmancên li Xorasanê pir in û nayên hejmartin û ji hejmara stêrkan jî zêdetir e. Ji xwe wilayeta Xorasanê ya berfireh wilayeteka eşîretî ye. Êlên cor be cor yên Kurd, Tirk, Belûc, Ereb, Tirkmen, Xezarê Cemşîdî, Berberî(Moxol-ş) û her wiha Qereyî ku beşek ji êla Qeşqaiyane û yên wek Tat û Tacik jî li wêderê dijîn. Ji

ber ku nivîskar li ser êlên din nexwedî agahdariyên berfireh e, loma nikare ser wan gelek tiştan binivîsîne. Bes dikare bêje ku Erebên Şêbanî, Xerizme Xezaî Mîşmest, Zengûî û Behlûlkuli bakûrê Xorasanê anku li deverên Firdos, Tebes, Qayinat, Bircend û Serexsê dijîn bi zimanê farisî diaxifin (Ev Erebana di dema Xelîfê sisiyan, yan jî Osman de hatine Xorasanê. Pîremêrê wan car caran bi erebî diaxifin, lê zarokên wan tev bi farisî diaxifin). Tirkên Beyan (di dema Sefawiyan û Efşariyan de hatine Nîşabûrê) piraniya xwe li Nîşabûrê ne. Tirkên mihacir li Deregez, Şîrvan, Qoçan û Bocnûrdê belav bûne. Hinek ji Tirkmenên li devara Zûrabada Torbetê Cam û du-sê malbatên li Serexsê û hinek jî li geliyê Cergolan û li bakûrê rojavayê Bocnûrdê dijîn û bi Gugolan û Nixur têne naskirin. Yemutî jî li dor û berên Gonbedê Qabûs Bexayirî û Gerayilî ku ji nesla Moxolan in li Bam û Bakûrê Sebzêvarê bi cîh bûne. Berberî ku ew jî ji Moxolan in li devera Xaf û Baxerz û Ferîmanê dijîn. Divê were gotin ku Tirkên mihacir piştî şoreşa Rûsya koçî Îranê kirin û her wiha divê bê gotin ku çiqên ji Moxolan di dema êrîşa Cengîz ya sala 616 an de û piştî wê hatine Xorasanê.



**Pez**

**Gundên Kurdan yên li Deregez:**

Gundên ku mamoste nivisîne gelek in, lê min yên ku me zêde eleqadar dikin nivîsandin:

**Xelan yan jî Xelkan:** Cîhê jiyana Kurdên Xelkanî ku nêzîkî 50 malbat in û nêzîkê Noxendanê ne. Gundekî Xelika yê 20 km nêzîkî Qoçanê jî heye ku navê xwe Xelikan e; min ew ziyaret kirin û bi apê Hecî Elî Esyer Xanî (80 salî bû-2003) re li ser dîroka wan deng kir.

**Zîndîn:** Nêzîkî 180 malbat in û ji Kurdên Sêvikan in.

**Şemsîxan:** Nêzîkî 150 malbat in û hinek ji Kurdên Kîkan û hinek jî ji Kurdên Mamiyan in.

**Şêxkan:** Cîhê jiyana Kurdên Şêxkan, nêzîkî Drunger e.
**Şêxwan:** Du gundên biçûk in ku nifusa wan nêzîkî 60 malbatî ye û li binê çiyayê Koçerê ye. (Gundên Şêxwan û Şêxkan li herêma Qoçan û Çinaran e û Kurdên Şêxkan in). Merdox dibêje, ku Şêxekan ê ji êla Cibranî ne ku li Bakûrê Kurdistanê navbeyna Bedlîs û Mûşê de dijîn.
**Madan:** Gundekî li qiraxa çemê Derunger nêzîkê geliyê Eli Bulaxê ku 60 malbat e û di nav wan de ya herî bi nav û deng Hecî Qilicxan e.

**Welatê Eşkaniyan Qoçan (Xebûşan):**

Xebûşan bajarê mêrxas û egîdan e, cîhê gotinê ye ku em dîroka wî bajarê bidin ber çavên xwendevanan. Bi gotina piraniya dîrokzanan û dîrok dinivîsî **Qoçana nû cîhê miletê Parta ye ku bi navê Eşkanî yan jî Pehlewî** bi nav û deng e.



**Qoçan**

Bi gotina dîrokzanên Iranî Mişirildulê Pîrniya, Ustad Pûrdavûd û yên mayin dibêjin; ku peyva Pehlew yan pehlewî yan Pehlewan ji Pertu yan Part yan jî Paris hatiye wergirtin. Eşkanî mirovên mêrxas, pehlewan û egîd bûn. Miletê Part yan jî Paris welatê xwe ji bin hikmê Romiyên kewnar anî der ti caran jî nedan destê biyaniyan. Ji ber wê yekê, ew milet bi nav û deng bûn. Gelo çima ji wan re dibêjin Eşkanî, lê navê wan **Ereşik** bû.(192-47) Hinek dîtin hene ku dibêjin; Eşkanî di esas de Aşkanî ye, yanê kesên xwedî aşan. Lê niqta

pismamê min fîne holê Ereşik hîn rastir e; wek peyv, ew tê wata kesên reş-ik; hîna jî li navenda Anadolê em wê peyvê bi kar tînin. Di beşa Medan de jî min nivîsî bû ku ji mîlîsên Medan re Reşan dihate gotin. Di heman demê, 674-673 an de jî gelekî bi navê Reşan hebû, gelekî bi çek bû, alîkarî dida serhildana Medan. Bi dîtina min di navbera wan, Aşxanî û Reşiyan de têkiliyek heye. Eşkanî di sala 256 BM heyanî 224 an PM Şahên Îranê bûn. Yanê 500 salî hikmê wan domiya. Di dawiya 224 an de bi destên Erdeşîr Babekan ew hikumet û Şahên Şahî têk çûn û dawî li hukma wan hat. Zanyarên dîrokê piranî dibêjin ku welatê Eşkaniya Xorasan bû û pêda diçin û dibêjin, Eşk yan Ereşk cihêkî bi navê Asak yan Aşak yan Asaek jiyana xwe domandine û li wir jiyane. Navê Qoçana nû (Xebûşan) di dema berê de **Aşak yan Ariska** bûye ku navê kalê Eşkaniyan li wir çêbûye.

Di beşa Arî-Aryan-Arran de jî min gotibû û gelek mînak li ser navên cografîk ên bi Ar–agir re tekîldar nivîsandibûn. Navê Qoçanî yê kevn jî balkêşe û xuyayê ku ji alî heman çandê ve hatiye dayîn. Ji vir ev encam dikare derkeve ku xwediyê vî bajarê kevn yan jî yên berî zayînê jî Kurd in.

Dîroka Qoçan di dema Sasaniyan de tevlîhev e, ne diyar e. Di dema Eşkaniyan de ku leşker şandibûn her derê, ji çiyayên Himalaya heya Dicle û Ferat; li bakûr, ji Mazenderan heya çemê Aras û Ceyhan û li başûr heta Xelîca Faris bû. Li wê leşker şandina wan kêmasiya mirovan çêbû û welat vala ma kesek têde nema.

Erdeşêrê Sasanî ku pir kerb û kîn beranber Eşkaniyan di dil de hebû, bajarê Eşkanî bi tevayî kawil û wêran kir, tiştik ji şûna vana nehîştin. Yezdgurdê Sasanî di navbera Meşhed û Qoçanê de hate kuştin lê wê demê bajarek bi navê Qoçan yan Xebuşan hê çênebû bû.(192-48)

Di destpêka Îslamê de navê Qoçan Esto, Estova, Xocan û Xebûşan hatiye gotin. Lê ya eşkere ew e, ku Îslamiyet di sala 31/32 koçî de di dema Xelîfê Îslamê Osman de ew herêm û bajar girtine destên xwe.

## ŞADIYÊN XORASANÊ

Qereçor û tayifên girêdayî wan, êlên Şadî û Qereçor ku li bajarê Bocnûrdê dijîn her yek ji wan gelek şax û tîrên xwe cûr bi cûr hene. Ji hev cûdakirina wan karek hêsan nîne, êla Qereçor ji êla Şadî biçûktir e. Lê belê êla Qereçorî ji her êlên din yên Xorasanê mêrxastir û zîrektir û jêhatîtir e. Êla Qereçorî piştî ku Nadir Şah hate ser kar têkiliyên xwe li gel Zeferaniyan birîn û zêdetir nêzîkê êla Şadiyan bûn û bi zewacan Emîrên her du êlan roj bi roj têkiliyên xwe xurttir bûn. Mezinên wan du êlan jî, wek Zeferaniyan û hemû Kurdên din hostê şûr in û nebûne xwedî zaniyarî, qelem û kaxizê. Ew cihê ku mêjiye xwe bikar bînin heza milê xwe bikar dianîn. Lewra jî ti dîrok û sened û belge ji xwe bi cih nehîştine. Lewra karê lêkolînê bo min pir zehmet bûye û pêwîste bêjim ku ji bilî wî nivîskarî ti kes nikare wî karî bike. Çend caran ez çûme herêma

Bocnûrdê û hemû gundên herêmê geriyam lê mixabin ji ber ku vê daviyê hiseka xirab û bê hêdbarî di nav gel de zêde bûye ti kesan nediwêrî ku hest û ramanên xwe ji me re bêje. Piremêr û mezinên wan ên xwedî agahiyên êlê jî, ew çend sal in ji nav çûne. Hinek sened û belgeyên dema Safewî û Nadir de nav tayifên Kurmanc de hene lê mixabin ti kesî newêrî wan nîşan bide. Lewra jî karê lêkolînê dijwartir dibe. Lê nivîskar ji ti tiştan natirsin û baweriya wî bi nifşa ciwan heye û hêviya wî rewşenbîrên Kurmanc in ku dixwazin heysiyet, nasname, kesayetiya xwe ya dîrokî, çandî, hunera bav û kalên xwe yên li wî mekanî biparêzin û ew pirsgirêkê bi nîşandana qebîle û hukim û belgeyên zikate wê bê çareser kirin.



Muza Şadiyan ya li Bojnûrdê

Ji têkiliyên din ku êlên Şadî û Qereçor nêzîkî hev dike, du tiştên giring û bingehîn e, ku yek ji wan ew e; ku her du jî li başûrê Qefqasya cem hev bûn. Ya duduyan jî, her du êlan jî pir ji zimanê tirkî hez kirine û wisa lê hatiye ku zimanê kurdî di bi kar anînê de wek zimanê duduyan e. Lê di cil û bergên kurdî û çand û rê û risimên Kurmancî de jî Zeferaniyan pêştir bûne. Bilî ji Hindê ew du elêna li herêma Bocnûrd de bi cîh bûne hinek êlên Zeferanî yên wek Kîkan, Hemzekan, Bêrîvan û Barzan jî li herêmê bicîh bûne...

Piraniya agahdariyên ser êla me ji seferên Nasireddin Şahê li ser Xorasanê bi dest xistin. Nasireddîn Şah di salên 1284 (1866) û 1300 (1882) de du caran çûbû Xorasanê û ji ber ku wî Şahî elaqayek zêde bo dîrok, çand, edebiyat, bi taybetî jî ji folklara gelerî hebû û mirov dikare bêje ku xisaret û zerara malî ku ji wan seferên Şah digihîşte êlên herêmê bi tene ew yeke jê baş bûye ku hinek tişt ji aliyên Seniôddolê û yên din an jî Şêxsê Şah ji bo me ronî kirin. Her çiqas jî dîrokzan dibêjin ku ketina leşkeren Şah bo her herêmekê wek êrîşa kuliyan bûye ( Her tiştên ser rêya xwe talan dikirin û diçûn).

Nasireddin Şah di Sefernama sala 1300 (1882) an xwe de bo Xorasanê ku ji rêya Bocnûrdê çûye Meşhedê. Dema ku digihîjê gundê Fîrozê û gelên gundî ji 250 malbatên Kurdên Şadî dinivîsîne û dibêje ku êlên Şadî ku li ser rê zozanan dikin tayifên Xemperan û Dêran e. Eslê Şadiyan Dêranî ne. Senioddolê ku li gel Nasireddîn Şah bû dibêje, ku nifûsa gundê Fîrozê zêdetir ji 200 malbatan û dibêje: "Gelek gundên Kurdên Şadî ne ku bi zimanê tirkî diaxifin."

Her wiha dinivîsîne ku: " Li gundê Çarbendê 40 malbat ji Kurdên Şamê hene." Mirov dikare êla Şadiyan wek **Bedran, Qolîçan, Qapran, Alan, Gerîvan, Capan** bihejmêre û hinek din ji tayifên Şadî di dema Axa Mohammed Xanê Qaçar de ji bo parastina ewlekariya rêyan û kolanên nêzîkî Tahranê birine Demavend, wekî Nadir Şah, Emarî ji Qoçanê biribûne Gîlanê. Senîoddolê dibêje ku: Gundê Cabanê (li Demaven) ku rêya (Tehran bo Xorasanê) di navê re derbas dibe. 200 malbat in û gelê wê jî ji Kurdên Şadî ne. Kurdên Şadî ku li wêderê dijîn di dema Şah Şehîd Seîd Axa Mohammed Şah Tab Serah de hatine wêderê. An ku di sala 1210 (1792) an de bi destûra Şah Rizvan ew ji Bocnûrdê Cabanê ketiye geliyekê de ku çendsed metre yeka wêdayî Cabanê Gundê Serbendan heye ku 80 malbatên wan Kurdên Şadî ne ku ji Bocnûrdê koç kirine vira. Bi destûra Şah Şehîd (Axa Mohammed Xan) baxçeyek hate çêkirin û navê wê jî danîn Baxşah.. Ji ber ku hêdî hêdî ew baxçe xirap bûbû çend salan berê niha (Ku îsal 1300-1882) ye bi destûra Nasireddîn Şah ew carek din ji nû ve çêkirin û carek din ji nû ve dar lê çandin û niha jî gelek dar û şînahiyek xweş heye. "Tiştên ku nivîskar guh lêbûye ev e ku tayifek bi navê **Gawestiyan**, anku kesên ku di dema koç kirina mezin ya Kurdên Mahabad û Ezerbeycanê bo Xorasanê ga û çêlekên wan li Demavêndê westiyan û nekarîn ber bi Xorasanê ve biçin û li wêderê man û li Demavendê bi cîh bûn. Hêja Qolam Hasên Rehîmiyan ku ji çand û dîroka Kurdan pir hez dike, li ser Kurdên Demavendê ku ji nêz ve bi wan re axifiye û dibêje:" Kurdên Şadî ku li Capana Demavêndê

dijîn, di dema Mozeffereddîn Şah de serî hildan û şoreşa wan mezin bû û bû sedem heya ku Şah neçar ma wezîrê xwe yê mezin hem ji bo lêkolîn û hem jî ji bo razî kirina wan şande Demavendê.

Dr Mesûd Kayhan dibêje êlên Şadî di sala 1932 an de 18.300 xane bûn; Henrî Fîld jî dibêje di sala 1938 an de 80 hezar kes bûn. Kayhan, êlên Şadî wiha rêz dike:

1. Boxî (Şêrî, Hecîkî, Huseynî, Mişî)
2. Alanî
3. Bedrî
4. Qaçkî
5. Qerebaş
6. Kopirî
7. Qeçerî
8. Meterî
9. Hemzikî
10. Çekmaxî
11. Qereçorî (36 ber in)
12. Sirî
13. Dirî
14. Îzanî
15. Qiliçî
16. Dirîqanî
17. Înranî
18. Gordanî
19. Cûyanî
20. Girîvanî
21. Capanî
22. Kaqanî
23. Xinzor

Hinek ji Şadiyan jî li Kelardeştê hatine bi cîh kirin, beşek ji Kurdên Kelardeştê ji êla Xacêvend yên Kirmanşahê ne. Kurdên Heskîfê jî li navenda Kelardeştê ne. Gundên Demavend yên ku Kurd lê dijîn wiha ne: Ecevît, Meka, Rûdbarek Mecel, Kurd Mehele, Toy Dere, Meka Rûd, Lahû Feşeh, Kurdî Çal û çend gundên din in.

**Caban:**

Îhtîmalek mezine ku eslê wê "Capan" be ku ew jî navê serdarekî Kurdên Îranê bûye. Di dema şerê dijî Ereban pêş bûyera Qadîsiyê. Kurdên Capanî yên Bocnûrd û Demevendê dibêjin ku esil û neseba me digehîje wî serdarê Kurd (Capan). Hêja Mohemmed Cabanî ku bi xwe jî xwedî agahî ye û di karê lêkolînê de ye dibêje ku : "Bav û kalên me ji Kurdên Caban yên niştecîhên Demavendê ne ku li wêderê hatine Qoçanê û tevî êl û eşîra xwe an ku Zeferan

bûne û eslê me digehîje Caban ê ku serdereke Îranî bûye di şerê li gel Ereban de."

Nivîskar ku digot: "Caban" dibe ku ji "Cavan" û "Cafan" ji êla mezin ya Caf a bin. Lê belê heja Cabanî wê yekê red dike. Ez jî neçar mam ku di warê Caban de hinek lêkolîna bikim û ez gihîştime wêderê ku: Caban yek ji serdarên bi nav û deng yên Îranê ye ku di dema Erdeşîrê III an yê Sasani de li gel Behmen Cadûyê serlêşkerê Îranî bû serdarê Îraniyan bû di şerên Alîs û Nemarêq ku piştî heyva seferê sala 14 ên Qemerî (596) zayinî de rû da. Kurdên Caban dibêjin ku me ji bav û kalê xwe bihîstiye ku ew Caban Kurd bûye û em jî ji neslê wî ne û ji tayifa wî ne.

## Kurdên Şadî Girîngtirîn Parêzerên Tixubên Îranê ne

Kurdên Şadî li Ezerbeycan, Qerebax, herêmên başûrê Qefqasya yek jî girîngtirin parêzerên tixubê Îranê yê li hember dagirkerên biyanî bi taybet Tirkên Osmanî bûne. Li Xorasanê jî yek ji girîngtirîn parêzerên tixubên bakûrê Îranê bûne li hember dagirkerên biyanî. Herêma hikumeta Kurdên Şadî bi sînor bûye û li bakûr bo Xarezmê û li başûr bo Şahrûd û Çola Xorasanê. Li rojhilat Esferayin û Şîrvanê (Cîhê Qere Xanê Bendî û Tunela niha ya rê ya mezin ya Asya) û li rojavayê Esterabadê.

Emîrên Kurdên Şadî ku navê wan di dilê dîrokê de hatiye nivîsîn wiha ne:
**Qûrçî Yûsûf:** Cedê Emîrê Kurdên Şadî yên Xorasanê ye, ku piştî Şah Elî Siltan (Şah Qolî Siltan) emîrê êla mezin ya Çemişgezekê bû hakimê eseh yên Kurdên Xorasanê û ew yeka bi destûra Şah Ebbasê yekan di sala 1037 ên Qemerî (1619) de pêk hat. Çawa Siltan Emîrê êla Çemişgezek Kurde û hakimê "Xebûşanê ye" û her ew Yûsûf Siltan jî Qûrcî Yûsûf bû ku êrîş bire ser Ebdolmimin xanê Ozbek û gelek mêrxasî û fedakarî ji xwe nîşan dan û ji meqamê "Qûrcî" yê hate meqamê "Siltanî" yê.

**Necef Elî Beg:** Elî Beg kurê Qûrçî Yûsûf bû ku piştî bavê xwe bû serokê êla Şadî.

**Emîr Gûnê:** Kurê Necef Elî Beg e.

**Tolî Xan:** Kurê Emîr Gune Beg, her ew kese ku bajarê Bocnûrdê ji bo biranîna kela Bicengird a qedîm ku li devera Çoqûr-Şad a Azabeycanê ye, damezirand û çêkir.

**Cefer Qolî Beg:** Kurê Tolîxanê (Dulî Xan).


**Necef Elî:** Kurê Cefer Qolî Beg e ku hinek dîrokzan bi şaşî dibêjine Necef Qolî û ew bi fermana Şah Tehmasb li Qoçanê hate kuştin.

**Îbrahîm Beg:** Kurê Necef Elî Beg Cefer Qolî Xan e, ku di şerê dijî Nadir li Qoçanê hate kuştin.

**Necef Elî Xan:** Kurê Cefer Qolî Xan e.

**Tolî Xan:** Kurê Necef Elî Xan e (di dema Şah Rox Nadirî de Emîr Elî Xan veşart).

**Îbrahîm Xan:** Kurê Tolî Xan e ku bû hedefa êrîşa Axa Mohammed Xanê Qaçar û li Esferayînê hate sekinandin.



**Xanê Şadiyan yên li Neynikxanê -Bijnûrd**

**Necef Elî Xan (Necef Qolî Xan):** Necef Elî Xan Îlxanî donzdeh kurên mêrxas û reşîd hebûn ku navê hinek kesan ji wan wiha ye: Cefer Qolî Xan, Heyder Qolî Xan, Qehar Qolî Xan, Elî Merdan Xan, Mohammed Rehîm Xan, Azad Xan, Sobhan Qalî Xan, Yezdan Qolî Xan, Mohammed Qolî Xan, Şîr Mohammed Xan. Kurê Îbrahîm Xan e ku Feth Elî Şahê Qaçar jê re zêdenav digotê Îlxanî.

**Cefer Qolî Xanê Îlxanî (Sehamoddolê):** Kurê yezdan Qolî Xan e

û biraziyê Cefer Qolî Xan û Heyder Qolî Xan e. **Heyder Qolî Xanê Îlxanî (Sehameddolê)** birayê Cefer Qolî Xanê Serî ye. **Yar Mohammed Xanê Îlxanî (Sehameddolê)** Kurê Yezdan Qolî Xan e û biraziyê Cefer Qolî Xan û Heyder Qolî Xan e.

**Ezîzollah Xan:** Serdarê mezin ê Bocnûrdê kurê Yar Mohammed Xanê ku bi fermana Riza Şah hate darde kirin. Senîoddole di pirtûka Metleoşems de li jêr navê "Esl û neseba Îlxaniyan û Emîrê Bocnûrdên" de dibêje: "Cedê wan yê mezin Qûrçî Yûsûf bûye ku bi fermana Şah Ebbas bû hakimê Kurdên Şadî. Paş wî kurê wî Necef Elî Beg cîhê bavê xwe girt û dû wî re jî kurê wî Emîrgune Beg piştre jî Tolîxan kurê Emîrgene Begê bû hakim. Her wisa piştî wî jî Cefer Qolî Xan kurê Tolîxan Paşê Necef Elî Beg kurê Cefer Qolî Beg û dûra jî Îbrahîm Beg kurê Necef Elî Beg e (di şerê li dijî Nadir ser zewaca gel keça Sam Begê Zeferanî de li Qoçanê hate kuştin) dûra jî Necef Elî Xan kurê Cefer Qolî Xan, piştre Tolî Xan kurê Necef Elî Xanê Îlxanî kurê Îbrahîm Xan e ku ....... Dû wî re jî Cefer Qolî Xan kurê wî ew paşnavê li gel hakimiya Bocnûrdê wergirt û Şahê Şahan Nasireddîn Şah dereca Mîrpencê (serleşkeriyê) dayê. Di vê demê de hukumeta Esterabad û Bocnûrdê yek bû. Piştî Cefer Qolî Xan, Heyder Qolî Xanê Semoddolê kurê Necef Elî Xan, bû hakim. Heyder Qolî Xan û Cefer Qolî Xan û Yezdan Qolî Xan bira bûn, piştî Heyder Qolî Xanê Yar Mohammed Xan Sehamoddolê kurê Yezdan Qolî Xan bû hakimê demê yê Bocnûrdê ku gelek mirovekî xoş reftar û baş bû û cîhê mamê xwe girt. Ev xanên han giştik di dema xwe de bi mêrxasî û fedekarî û mezinahiya xwe hatine naskirin û gelek xizmetên ber bi çav ji bo dewleta her dem zindî kirin.

Li bajarê Bocnûrdê, ji Şadiyan gelek îmaret mane; ji wana yên bi nav û deng: **Neynik Xan, Bimaristana Şadiyan û Goristanên Şadiyan** in. Bi taybetî Xan gelek balkêşe û wekî qesreke ji bo xan û mîran hatiye avakirin. Di nava wê de ku niha bûye muze, gelek amûr, dest nivîs, belge, cil û wêneyên xanên Şadiyan hene. Ji derve ew bi çîniyan hatiye çêkirin ku di alî pêşî de gelek sembolên Şadiyan yên watedar hene. Di nava wê qesrê de odeyeka taybet heye ku her dera wê bi neynikan hatiye çêkirin. Ji bo mêvan û diplomatan ew ode bikar dianîne. Her xanekî Şadiyan jî wênên xwe li dîwaran e... Li baxçê wê heykelekî ji Xan yan jî şervanên Şadiyan mayî heye ku rûyên wî yê dirêj bi rengê sor hatiye boyax kirin. Mirovekî pir bi heybete ku mirov dema lê mêzedike xofê dide ser mirovan. Sedema rengê sor min pirsiyar kir û gotin: Dema şervanên Şadî diçûne şer rûyên xwe bi sor boyax dikirine, ku dema ew birindar dibin ma xwîna wan xuya neke û morala hevalên wan xira nebe, ya dijmin jî xurt nebe...Xuyaye ku komeka pir mêr û egîd bûye. Li alî din jî, gor demê gelek amûrên zireetê û bazirganiyê mina terazî û tizxera cotkariyê/ makîna pê axê lihevdixî heye ku gelek balkêş in. Di alî sûsa jin û keçan de jî dewlemendî û cûrbûneka pir heye ku ew jî nîşana mîrîtî û şaristaniya wan e. Disa nexweşxaneyeka pir mezin avakirine ku ji her alî ve nexweş lê têne derman kirin..



Bimaristana Şadiyan-Bicnûrd

# GÎLAN (Reşt):

Gîlan eyaleteka piraniya niştecîhê xwe Kurd in û ji her zarava axifên kurdî lê dijîn; bi dîtina min hinek komên di bin sîwana navên din de dijîn jî Kurd in. Eger ji alî lînguîstîkî ve lêkolînekê kûr bê kirin, bawer dikim hemû kevir ê têkevin cîhê xwe û di nava nijada wan de standartek pêk bê. Wek mînak: Li navenda Anadolê Kurdên bi zaravê Şêxbizinî dipeyivin hene, di esas de navê wanê giştî Ler-Lek û Lor e, lê li herêmê bi navê Şêxbizin tên nasîn. Li cografyayê din jî ne dûr e ku heman kom bi navekî din bin. Li ser vî esasî koma bi navê Talîş jî bi dîtina min Kurd in...Lê ew yeka li hêviya lêkolînên kûrtir e.



**Gîlan**

Herêmêka çiyayî ye; eger mirov wir navend bigire, çiyayê (Sevalan) wir heta Xorasan û Afganîstanê dirêj dibin, ji alî rojava ve jî heta Erzirûmê dikarin bên. Kurd li başûr, rojava û rojhilatê derya Kesk dijîn. Texmîn dikim gelek ji wan heliyane. Gîlan ji bo ku çiyayî ye, cotkarî kêm e, xelk gelek belengaz e, têkiliya xwe bi dinyayê û Kurdên din re nîne. Ji bo ku çiya û derya ye gelek şilî/avî û şepelî jî heye. Ji alîkî ve jî gelek erdhej li wir pêk têne û min bi çavên xwe dît ku çiyakî ji nîvî ve hatiye xwarê û hilweşiya ye. Gundên li ser wir jî kavil bûne. Piştre ew gundên derûdorên wir li çar navendan kom kirine ku ji wê re "Çar Mihele" tê gotin.



**Mihemmed Elî Pûr**

Ji herêma ku Kurmanc lê dijîn re E/Amarlû tê gotin, ku gund û bajarokên li dora du çiyan avabûne û li hember hev in. Li wir gund û bajarokên mîna Çorê, Xaskûl, Çilkeser, Reşî, Zîbin, Talûkû, Sûrmil û Çarmihele hene. Li gundê Reşiyan, li ber postexanê jineka genca bi cilên reş û meleseke reş rûniştibû; çavên wê, rûyên wê û didanên wê yên spî mirov bernedida; te nedikarî li wê binerî... Xwîna mirovan dikelî ser, te digot ew xanga/xwîşka min a 500 sal berê wenda bûye û min niha peyda kiriye! Ew tiştekî ji xwîn û hestan tê, mirov nikare wê hestên wek miqnatisê hevdû dikişîne bîne ziman. Wê digot: "Em Reşî nî" paşê em bûn mêvanê Apê Şaban Mihemmed Elî Pûr (75 salî) ku digot: " Cedê me Reşî-Rehmetava ye" ji gotina wî min ew derxist: Gund wek Reşiyan tê zanîn lê piştre ewî kirine Rehmetava.

Wekî gundên me li Anadolê. Mirov navê kurdî nabîne, lewra ew bi navê êla xwe tên xwendin, lê her êleke îro bûye herî kêm çar-pênc gund, mirov nikare hemûyan bi navê êlêkê bixwîne. Ji bo wê jî navên cûda ku piraniya wan tirkî ne lê danîne. Li wir jî navê farisî lê danîne.



**Emarlûyê li Qirşehîrê**

Nêzîkî vê herêmê bajarê Mencilî heye ku gundê xwe bi E/Amarlû re cîran in. Gor agahiyên gundiyên Kurmanc dayî, hinek ji wan ev in: Pêlangerê Bala, Defraz û Racê ye ku gel digot ew ne Kurmanc in. Raste, ew gereg Ler yan jî Kurdên Goranî axêf bin.


Berî ku mirov here wê herêmê, gund û bajarên Kurd lê dijîn hene ku hin ji wan li dora bajarê Qezwînê ne. Gundên mîna: Bacilan, Spaplî, Çekenî, Celîlwendî, Reşwendî, Geyaswendî, Kakawendî, Mafî, Behtûî, Kirmanî, Yemenî, Weliyarî, Baharîwendî, Papaî, Pîremerwendî Kelwendî, Gûderzwendî, Nîzamîwendî, Mîrxanwendî, Paçnarî, Xerkanî, Pîrqulîwendî û Gogir in. Li rojavayê herêma E/Amarlû jî herêma Xalxalê heye ku Kurd niştecîh in. Dîsa li bakûrê Xalxal berbi sînorên Ezerbeycanê jî koloniyên Kurdan hene, lê em nizanin ka gelo rewşa wan çawa ne.

Dîman: Êla Omeran di sala 1780 an de ji Qerebax û Qeredaxê anîne sînorên Ozbek û Afganiyan. Di Gulogan de rûdinên. Bi vê re girêdayî Faîk Bûlût tiştên balkêş nivîsandine: "Şah Ebbas reisê Çemişgezekan Şah Elî Xan wek mîrê herêma Xorasan tayîn kir. Bi îhtîmaleka mezin ew komên din hemû bi navê Çemîşgezek binav kir û beşek ji wan Çemîşgezekiyan bi Şah Ebbas re tevlî sefera Afganîstanê bûn. Di sala 1600 an de 40 hezar malbat mecbûrî koça bakûrê Xorasan (Aşkabat) kirin. Lê Kurdan di wê xakê de bi Ozbekan re şer kirin, zahmet dîtin û şûnda vekişîn çiyayên Guşan (Kuşhan). Li wir Çekeniyên girêdayî Pîr Budax Beg bi Çemîşgezekiyên ve hîn zêde tevhev bûn. Şah, ji bo ku Kurdan zayif bixê Yûsûf Siltanê eslê xwe Gurcî wek walî-mîr şand herêmê. Plana ku wî hêvî dikir nebû û êlên Kurd yekîtî û aştî çêkirin. Bi ser vê yekê de êla Şadî li navenda bajarê Bojnûrd û li rojhilat jî li Zaferanî bi cîh bûn. Ji bilî wan gelek êlên din ên serbixwe jî hebûn. Wek mînak Emarî (Nadîr Şah şandibû) û Qereçorî (Tîreka Şadiyan e), lê serbixwebûna wan gelek najot.[36] Dr. Behrewan jî dibêje: Qerê Xan serokê Çemîşgezekiyan bû. 40 hezar ji komên Zefaran, Şadî, Kawan, Emar û ji Qereçoriyan pêk dihat. Zefaran li Bicnûrd, Şadî li Çinaran, Kawan li Xakçilaya li bakûrê Meşhedê bi cîh kirin. Şah Ebbas piştî şer ew êlana ji hev cûda kirin û serokê wan êlana bi nemerdî kuştin ku ma ew li dijî wî dernekevin.[197-16] Di vî awayî de Osmanî û Sefawiyan heman siyaset dimeşandin. Mumkune ji hev fêr bûbûn.

Dema Nadîr Şah Hindîstan wergirt, Kurd ji bo ku bacê kombikin şandin Nû-Delhî ye ku ew ji êla Hemzikî bûn û serhejmara wan nêzîkî 50 hezarî bû. Hemzikî û Hewêdî Ezîdî bûn.

Şerefname jî, qala êleka bi navê Gil (Kil) dike û Çekenî çawa çûne dinivîsîne. Va êla bi qehremaniya xwe li rojhilatê Kurdistanê bi nav û deng bû ye. Serokên wan ê mezin tunebûne û bi şêlandina xwe ya xelkê meşhûr bûne. Dewletê zexta li ser wan zêde kir û ew jî koçî Hindîstanê kirin. Paşê ketin bin emra waliyê Heratê yê serhildêr, lê Şah Ebbas (1588-1629) serhildan têk bir. Ji muhafizê xwe yekî (Budax Beg) ji Çekeniyan bû ew kire serleşkere herêmê. Bi alîkariya Çekeniyan Ozbek têk birin. Lê gelek muhafizên din bi Şah pêwîst bûn û Çemîşgezekî yên koçber ên nêzîkî Rê anîn li wir bi cîh kir. Êlên din Kurdên Qefqesya bûn û dema Osmaniyan di sala 1576 an de Qefqesya dagir kir, ew reviyan Îranê. Di şerê Osmanî-Îranê de Ebbas ew li Gîlanê bi cîh kirin.[36]

# Dara Êlan


ALXAS
SILSUPUREN
NAMAN
TAYAN
SAMI
PALKAN
TIRAN
QURDAN
KOSAN
ŞEXENÎRAN
SIYAMANSUR
ZAXURAN
BIÇERAN
GEUKAN
XERASKAN
DUDAN
BIYERAN
ŞUKRAN
QEREKAN
ŞEVÎKA
KULIMAN
KOMBELEKAN
CELALÎ
KÎKAN
ULAŞ
BIYAN
ŞUKAN
ZURTAN
BEGAN
ŞERKAN
HESENAN
Milan
Pehlivan
Izan
Hizan
Qackan
QULAN
KELMISI
CANBEG
Kurdekan
Kuran
XELIKAN
Kuxbinik
Seran
ZIDAN
Tukan
Serman
Murdikan
Zirkan
Qereman
Hemzekan
Qercori
Afşar
Zerdikan
Ziwirani
Purtekan
Odikan
Qirekaşi
Sirani
Marian
Qurcan
Titekan
Nergisan
Mamedan
Badilan
Cafkan
ŞEXKAN
Xendeqi
Derusan-Tursan
Xaxiyan
Mistikan
Qirekan
Baçiyan
Qaniyani
Berivan
Veran
Zengilan
Alani
Diriqan
Lalu
Hevêdi
Milan
Qopirani
Teman
Cafkan
Birzilan
Diriyan
Xelani
Keyvani
Kepkani
Zeriki
Reşi
Tarixçi
Girivani
Xadiman
Zaferan-Qocan
Qopirani
Emar
Caban
Tomasi
Bedrani
Boqani
Mojgan
Topkan
Elen
Qerebaşi
Şadi-Bojnurd
Rutikan
Çexmexi
Kavyan
Kurmancên
Çemişgezek
Zengene
Kurdên Xorasan

# BI GIŞTÎ ÊLÊN KURDÊN LI XORASANÊ

Mamoste Tewahûddî êl û zendên Kurdên Xorasanê mîna dareka bi şax û çilo nîşan dide. Ji wan şaxên mezin yek Şadî (Bojnûrd), yek Keyvan û ya din jî Zefaran in (Qoçan). Ya herî mezin û bi şaxên zêde Zefaran in.

**Êl û Zendên Kurdên Xorasanê:**

Cegenî, Zengene, Erdelan, Pazûkî, Baban wek şaxên biçûk nîşan dide.
**I- Şadî (bajarê Bojnûrd):** Çexmaxî, Qerebaşî, Boqanî, Bedranî, Qompiranî, Girîvanî, Qopiranî, Alanî, Qaniyanî, Xendeqî, Qereqaşî, Caban, Xadimanî, Kepkanî, Diriyanî, Temanî, Diriqanî, Qirêkanî, Nergîsî, Sîranî, Ziwîranî ne.
**II- Keyvanî:** Mistikanî, Vêranî, Milan, Dêrûsan (Tûrsan), Bêrîvanî, Zengilanî, Lalû, Cafkanî, Xelanî û Zerikanî ne.
**III- Zefaranî (Çemîşgezekî):**
1. Topkan û Rûtikan.
2. Mojganî, Emarî û Tomaşî
3. Reşî, Tarîxcî û Birzilanî
4. Hevêdî
5. Baçiyanî.
6. Badilî, Xaxiyan, Tîtêkan, Zerdikanî (Bajarê Aşxanê), Afşarî, Tûkanî, Xelkan, Qaçkan
7. Hemzekan, Şerman
8. Zîdan
9. Kuxbinîk, Şeran, Kûran, ….
10. Îzan, Pelîwan
11. Şerkan
12. Şevêkan/Sîvikan: Ûlaşlû, Buwan, Xukan, Zurtan, Kulîman, Şokran, Bîware, Dûdan, Xêraskan û Geugan in.
13. Kîkan, Zaxûra, Guyan, Tîran, Şam, Bîçeran, Tayan.
14. Siyamensûr, Kasan, Naman, Sîlsupurên, Alxas, Palikan
15. Şêxemîran, Qurdan (Bojnûrd).
16. Celalî, Qerekan, Kombelakan, Began.
17. Milan, Qulan, Kelmişî, Kesanan
18. Canbeg
19. Kurdikan
20. Qereman, Murdikan, Zîkan, Purtêkan, Odikan.
21. Qereçor, Qurçan, Manaîn, Mamêdan, Kêrikan
22. Şêxikan in. Bi vî awayî nêzîkî 110 êl tenê li Xorasan û 123 êl jî li herêmê bi giştî hene.

## NAV LÊ DANÎNA ÊLÊN KURD

Di gelek jêderên Tirk û biyanî de mirov dibîne ku Osmaniyan êlên Kurdan bi piranî li gorî herêman bi nav kirine. Berî Osmaniyan hê desthilatdariya xwe bi hêz nekirî jî, piraniya êlan bi navê serok û rêberan dihatin binav kirin. Ji bo ku Osmaniyan li ser navê herêmê bi navkirinê û di herêmekê de jî bi sedan êlên Kurdên ji zendên cûda dijînê û ew yeka dibe sedema gelek tevlîheviyan. Di roj û şertên îro de hemû arşîv di destê Tirkan de ne; em nûserên Kurd jî ji wan sûd werdigirin; lê ji bo ku di qeydên dema Osmaniyan de navê êlên Kurd bi zanîstî hatine guhartin û li gor herêman hatine nivîsîn, ji bo me zelal kirina êl û zendan mîna bîrê bi derziyê kolandin e. Li ser vê bingehê emê hewl bidin ku ji binavkirina Tirkan êlên Kurd zelal bikin. Wek mînak; gotine Tirkmenên Helebê, Boz-Ûlûs û hwd. lê di bin sîwana wan navan de bi sedan êl û zendên cûda hene. Ji vê kiryarê jî tê fêhm kirin ku înkara Tirkan ya gelê me çiqas kûr û dirêj e.

Î. Şahîn, li ser binavkirina êlên Kurd analîzeke baş kiriye: Di dema Osmaniyan de, êlên koçber bi navê Tirkmen yan jî yoruk dihatin nasîn. Wek grup li cîhên dijîn bi navên mîna: Tirkmenên Helebê, Tirkmenên Yenî-Îl (carna jî dibêjin Tirkmenên Uskudar=Yaban erî), Boz-Ûlûs, Esb-Keşan, Remezanli Ûlûsû, Yorukên Dulqadir, Yorukên Enqerê, Kutahya, Bolû, Teke,.....Yên li Rûmeliyê jî bi navên mîna: Naldoken, Qeregoz, Selanîk, Vize... Navê Tirkmenên Helebê navekî cografîk e; yên mîna Qeremanî, Danişmend û Remezanî jî ji ber nasnama wan a siyasî ye; Yorukên Kelaha Cemele (Kirşehîr) jî ji navê wê qelê ye; ji bo ku Canbegan hespên bi cins xwedî dikirine û baca xwe jî bi hespan didane navê wan Ûlûsê Esb-Keşan hate dayîn.(168-196) Li başûrê Sêwasê, Yenî Îl, di sala 1548 an wir de ava bû, ku cîhekî pir fireh ji xwe re war girt, nayê zanîn ku navê xwe ji ku wergirtiye. Lê gor texmînê, ji bo ku Atçeken a Eskîlê hîn kevn bû ew navê Yenî-Nû lê danîn, ew jî kirin Yenî îl.(168-197) Gor ez texmîn dikim di nava Yenî Îlê de êlên: Têrikî û Sewêdî ye hene. Boz, di kurdî de tê wata zer-rengîn; ji bo wê navê zenda Zerikî kirine Boz-Ûlûs, yanê zendê Zer. Di nava Boz-Ûlûsa ku Tirk bi nav dikin de gelek êlên Kurdan hene. Ewa ku min tespît kirine: Têrikî û Zerikî ne; yên din jî yek Şam Tirkmenî û yek jî Dulqadir e.

Navên êlan, carna ji serokê zenda wan, carna ji keya û carna jî ji rûspiyên êlê dihate wergirtin. Wek mînak: Înaliyên girêdayî Tirkmenên Helebê navê xwe ji serokê xwe yê sala 1520 an Hemze yê kurê Înal girtin. Dîsa di dema Yawûz de, di 1519 an de hejmartina nifûsê hate kirin û di serî de "Mehmed Veledî Hecî Omer" hatiye nivîsîn ku ev êl navê xwe ji Hecî Omer nivîsiye. Di deftera 181 an de em rastê navên mîna Mendol, Mansûr û Celikan hatin. Dîsa li gelek deveran navê Şah jî heye.(176-41) V. Hecî Omer wekî em dizanin îro li navenda Anadolê wek Omerî tên nasîn. Mansûr jî şaxekî Reşiyan e û li Semsûrê dijîn. Celikan jî mumkun e navê xwe ji Celal girtibin. Li ser vî bingehî, niha jî em êlên di nava wan zendana de ji nêzîk ve analîz bikin.

# CELALÎ

Bi dîtina birêz Îzady, cara yekemîn, di destpêka qirna navîn de qala Celaliyan tê kirin; wê demê li başûrê Zaxrosan û li Farsê navê wan derbas dibe. Ji wê qirnê ve ew berbi bakûrê rojava belavbûne û di roja îro de ew li (Gelû yan jî Kuh Gilûya) başûrê Zaxrosan; wek Galawand, Kalalawand, Celalawand li Zaxrosa Navîn; wek Celalî jî li bakûrê Zaxrosan hene. Berê jî şaxekî din 300 sal BÎ, ji heman herêmê Gelûlan û Dilaman/Deyleman jî çûn keviya Derya Kesk (rojavayê Elbrûz) û navê Gîlan jî ji wir tê. Piştî sedsalakê ji bakûrê Dicle jî xismên Dilaman hatin herêmê û ew yeka heta sedsala IV an PÎ domkir.[154-183] Wekî gelek çavkanî didin xuyakirin û encama ji wan derdikeve ku Celalî demeke gelek dirêj di navbera Şehrîzor Gîlan û Arran de diçûne zozan û germiyan. Ji bo ku li başûr bi Ereban re şer dikirin û di şer de gelek serkeftîbûn, Ereban navê Celalî li wan danîne. Wata vê kesên şervan yan jî ji şer hezdikin bû. Di esas de navê wan ne Celalî ye. Gelek êl û federasyonên êlên Kurdên di bin sîwana vî navî de hene. Mirov dikare bibêje ku Şadî, Badilî, Reşî, Kîkî û gelek êl û komên din di bin sîwana vî navî de hene. Dema zivistanan dadiketin başûr, navenda wan Zehrîzor bû. Li wir bi Ereban re diketin têkiliyên şer, lewra ji bo wan Şehrîzor herêmeka stratejîk e û ji bo ewlekariya xwe heta dema dawî dev ji wir bernedan. Bi taybet di derdora salên 876/77 an de dora Şehrîzor kirin qada gelek şeran. Gor Poladyan dinivîse; serokê Xariciyan Şarî mir bi şûnde, Xarîcî çûn cem Muhemmed îbn **Hurzade yê Kurd**, ku li Şehrîzor bû û jê xwestin ku ew bibe serokê wan. Wî li destpêkê nexwest bibe, paşê Harûn Al Bagyalî Aş Şarî bû rêber. Piştî ew pêk hat jî Hurzade xwest bibe serok û ev yeka di navbera Xariciyan de bû sedema şer. Îbnî Haldûn dibêje: "Hurzad bi Harûn ve li Mûsil gihîştin ber hev. Lê niştecîhên bajêr aliyê Harûn girtin û Hurzad bi hinek Kurdan ve bi serê xwe ma. Harûn êrîşî wan kir, Hurzad mir û Kurdên **al-Celaliya** jî belav kirin. Bi vî awayî Hurzad heta Mûsil çû lê îxaneta alîgirên wî bû sebeb ku ew têk here.[3-56] Ew teklîfa ji kûdret û muxalîfbûna wan a li hember misilmanan tê. Berî wê demê, artêşa Ereban di dema Xelîfe Omer de (643) êrîşî ser Şehrîzor kiribû û têk çûbû. Piştî vê artêşa duyemîn jî di serokatiya Utbe bîn Farkad de çû û Kurd teslîm bûn.[19-59] Di wî şerî de teslîm bûn tê gotin, lê bi dîtina min wê demê lihevhatinek heye, eger ne wiha be, di demeka kin de ew teklîf ji serokê Kurd re nedikirin. Piştî ew şer û têkçûyîna Kurdên li dervayê welat ku wek Celalî têne binavkirin hîn bêtir berbi bakûr hilkişiyan. Ew yeka dê paşê rê li ber avabûna dewleta Şadî veke…

Li ser vê babetê Îzady dibêje: Piştî sedsala IV an (PÎ) heta sedsala XI an Deylemîn ewqas pir bûn, ku cîhên din ê Elbrûz jî dagirkirin û berbi xaka îslamê ya li rojhilat jî belavbûn. Rewandî jî, li bakûrê Xorasan bi tevahî bi cîh bûbûn. Ji wê deme vir ve, ji wê herêmê re dibêjin "Girên Rewand".[154-184] Bi dîtina min di nava Deylemiyên ji ber Ereban rêviyabûn çiyayên Elbrûz de êlên Goran, Hewraman û Lêr-Lek jî hebûn. Li herêma Şehrîzor hîna jî navê Celali-

yan li ser herêmên cografîk û li ser êlên Kurd heye.

Mesûdî (893-965) di berhema xwe ya bi navê "El-Tembîh" de 16 êlên Kurdên bingehîn dijmêre û cografya Kurd lê dijîn wiha rêz dike: Fars, Kirman, Sîstan, Esfehan, Xorasan, Cibal (Zagrosên navîn û bakûr), Hamadan, Ermenîstan, Îran, Lorîstan, Ezerbeycan, Anatoliya Navîn, Sûriye, Antakya, Edene.(154-186) Li Anatoliya Navîn, Xorasan û Sîstanê jî Kurd hebûne. Ew Kurdên li Anatoliyê kîjan bûn û kengê hatibûn? Me gotibû ku berî Îslamê Kurd bi navê Cûnûkî li Anadolê dijîn, dibe ku ew bin. Yan jî ewên di dema Harûn el-Reşîd (786-809) de li dora Qeyseriyê hatine bi cîh kirin bûn. Mesûdî di nav êlên Kurd de Celaliyan jî dijmêre.(3-92) Ezerbeycan: Hazbanî û Sarat (îhtîmaleke ku Şurat=Xaricî), hîna jî li xwarê Şadacan, Lazba (Lûrrî?), Madancan, Mazdanakan, Barisan, Xalî (Celalî), Cabarkî, Cavanî, Mustakan.(2-64) Di vir de Celalî wek Xalî jî tên nasîn ku gelek girînge. Gelo wê demê wek Xalî yan jî Xalîkan jî dihate binav kirin? Dibe ku herdû nav jî ji bi kar hatibin. Lewra Xalî navê wan ê kurdî û esasî, Celalî jî navê ku Ereban li wan kiriye ye. Yekê jî em dizanin ku Xelikî şaxekî Celaliyan ya girîng in.

Hezbaniyên di bin serokatiya Mehmet bîn Hîlal de di sala 906 an de serî hildan û heta Mûsilê hatin. Waliyê Mûsil Ebûl Hecca li hember derket û şer winda kir. Xelîfe Muktedîbîllah hêzaka nû şand, Kurd vekişiyan çiya û ji wir jî çûn Ezerbeycanê. Artêşê, çiyayê Qendîl û hemû Kurd dorpêç kirin. Kurdan ji neçarî Hîlal teslîm kirin û Ereban li Mûsilê ew kuştin. Di wê navberê de **Îbrahîmê Deysem, dewleta Hezbanî yê Kurd ava kir. Paşê Mehmet Rewadî rêvebirî heyna û navê dewletê kir Rewadî.**(19-62)

Di sala 925 an de Celaliyên li Şehrîzor serî hildan lê Hamdaniyan ew raperîna pêrçiqandin.(3-60) Di sedsala IX û X an de Kurdên Şehrîzor serî li ber xelîfe xwar nekirin û hîna jî zêde ketin nav tevgerê. Abû Dulaf wiha dinivîse: li wir Celalî, Yabsan, Hikmiya, Suvliyayên xwedî 60.000 malî rûdinên û xaka ku ew biçînin jî heye.(3-97) Gor demê hejmareke zêde ye, navê Suvliya jî bala me dikişîne. Dibe ku ew êla Sewêdî bin. Lewra gelek caran em Celalî û Sewêda jî bi hev re dibînin. Me gotibû, ku wana berê ji Ebbasiyan re wezirtî kiribûn û piştre li dij wan şer kiribûn. Ne dûre ku li wir gihîştibin hev. Kurê Huseyn dewleta Hesnewiyan di sala 981 an de li Şehrîzor û Demarê ava kir. Lê di sala 1122 an de ji alî Tataran ve hate rûxandin.(9-313) Ji vê dîtine mirov dikare vê encamê û pirsê derxe: Gelo Celalî li vir parçe bûn, yên çûn bakûr dewleta Şadî-Rewadî ava kirin û yên din jî li Şehrîzor man desthiltdariya Ereban pejirandin?

Îro jî li wê herêmê hîn şopên Celaliyan hene. Edmûnd Leach dibêje: Piştî şer (şerê Cîhanê yê yekemîn) û bi avakirina rê re, li Rewandûzê di navbera Rayat û Celalê de, qişleyeka eskerî ya mezin hate ava kirin.(140-23) Hîna navê bajarokekî li herêmê Celalî ye! Li Rewandûzê ji bilî niştecîhan, komên koçberan jî hene û yên herî mezin Herkî ne. Ez di nava Soran, Dergela û Balikan de mam. Balik êla herî fireh e. Ew êla ji sê milan pêk tê: Melle Şerîfî, Şevdinî (yan jî Şûyîzûrî) û Şukrî. Melle Şerîfî jî li Valaş, Rast û Celalê belav bûne, wêder ji

xwe re wek navend dibînin.(140-26) Melle Şerîfiyan dibêjin ku koka wan ji êla Celalî ya li herêma Silêmaniyê tên. Navên xwe bi giştî ji bav û kalên hevbeş digirin.(140-35)




Rewanduz

**Herêma Rewandûz**(140-110)

Di sala 926 an de êlên Kurdan yên bi navê Gilalî-Celalî, Hemîdî (Behdînan), Muzûrî û Zîbarî îttîfaq kirin. Xelîfe jî ji bo ku îtîffaqa wan xira bike gelek fên kirin. Bi ser vê de gelek paye dan Celaliyan û li dora Tikrîtê bi cîh kirin. Serokê Celalî yê bi navê Heca Ebdullah bi lêşkerên Kurd û Ereb ve êrîş anî ser Hemîdiyan û dawî li mirîtiya wan anî. Hemîdiyan di sala 947 an de bi Buweyhiyan re îtîffaq kirin û Behdînan heynan destê xwe. Paşê ew Hemîdiyan ji welat derdikevin û li ser hewara Selehettîn bi Eyûbiyan re diçin Misirê. Bi vî awî heta hatina Tirkan ya Kurdistan û Anadolê, navê Celaliyan bi piranî li dora Şehrîzor, Mûsil, Arran û Xorasanê derbas dibe. Piştî salên 1000 an, navê Celalî kêm derdikeve pêş. Gelo sedema vê çi bû, Celalî çir bûn? Bi dîtina min; bi êrîşên Ereban re Celalî-Xelikî çûn Arran û Xorasanê. Ji wir jî bi hatina Tirkan re hatin Anadolê û çarçova wan teng bû. Yanî, eger berê ew konfederasyon bûne, xêre piştre belav bûn û wek federasyon û êl jiyana xwe berdewam kirin. Gelek jî di nav mîrîtiyên Kurd de belav bûn. Lê piştî sedsala XV an, bi êrîş, zext

û komkujiyên Osmaniyan re serhildanên Kurdan dîsa destpê kirin. Ji ber hêz û şîddeta wan Osmaniyan ew bi navê Celaliyên berê yê ku Ereban nav lêdanîbûn binavkirin. Bi kurtî Kurdên di serhildanên piştî sedsala XV an de cîh girtine bi tevahî ne Celalî ne. Dibe ku dendik Celalî be, lê hêzên din ên Kurd jî mil dane wan. Ji bo wê Celaliyên destpêkê ji yên dema Osmaniyan ve jihev bi tevahî nebe jî, cûda ne.

Cara pêşîn em di sala 1519 an de dibînin ku kesekî bi navê Şah Welî, bi 4.000 kesî ve li Sêwasê serî hildide; Welî, begebeganê Sêwas Şadî Paşa têkbir û hêza xwe zêde kir. Lê di şerê duyemîn de têk çû. Gor jêderên nûjen ew wek Celalî bi nav dibe.[131-191] Begê Şadî bi Celaliyan navê xwe derbas dibe ve, berpismamên hev in û ew ji heman kokî ne. Lê carna jî bi vî awayî ew tên hember hev. Dîsa şêxekî Elewî yê bi navê Celal di nava sedsala XV an de li Tokatê raperîn pêk anî. Di vê serhildanê de begê Dulqadir Elî Begê kurê Şehsuwar ew têk bir; piştre Elî jî ji alî Qanûnî ve bi dizî hate kuştin. Mixabin gelek xizmetên wî jî ji dewletê re bûbûn. Serhildana Şah Welî gelek deng da û ji ber vê sedemê ji hemû serhildanên piştî vê re Celalî gotin.[131-191] F. Sumer jî vekirî tine ziman ku yên serhildan kiribûn ne tenê Celalî bûn. Yekê jî wê demê gelek balkêşe ku rêvebirên Osmanî, wek Sefawiyan, rêberên Kurdên ku jê ditirsiyan bi sûîkastan dikuştin. Bi vî rengî gelek serokên Kurdan kuştine. Ew yeka hîna jî berdewam e…

Di sala 1595 an de ji Atçekenê li Tûrgûtê (Canbeg) û ji êla Dawidlar kesek bi heman armancê derket holê. Îddea dikir ku ew ji koka hukumdarê Selçûqî Aladdîn e û eger bê ser text ewê dadê û wekhevîtiyê pêk bîne.

Piştî serhildanên carna derdiketin, tofana esas di sala 1596 an de destpêkir û bû sedema gelek mirin, komkujî , koçberî û tevlîheviyan. Ji wê salê bigre heta sala 1775 an, ew tevgerana berdewam kirin. Ji ber wê, ji 38 gundên Enqerê-Baciyê 33 ê gund vala bûn. Dîsa di sala 1604 an de 36 gundên Haymana bi tevahî vala bûn.[156-34] Ji vê îstatîstîkê jî diyare, ku Kurdên li wan deran bicîh bûbûn bi tevahî cîhên xwe terk kirin.

Tevgera yekemîn a mezin ya Celaliyan Qere Yazici derxist û gor zanyaran, armanca wî ew bû ku Osmaniyan ji Anadolê derxe. Li Rihayê di sala 1599 an de derket tevgerê û begebeganî Helebê Huseyn Paşa jî tevlî wî bû. Wê demê sefera Awûstûrya berdewam bû û ji bo wê jî hate afûkirin û berê bû begebeganî Amasya, paşê jî bû yê Çorûmê. Ji sala 1603 an heta 1607 an li gelek cîhên Anadolê ji serhildana Yazici xûrttir raperîn derketin. Ji wana yek jî li bakûrê Sûriyê ya Elî Paşayê kurê Canpolat bû.[131-205] Di sala 1609 an de li Goksûnê di navbera Celalî û Kûyû Mûrat Paşa de şer derket, li aliyê Celaliyan, boybegê Bozkir Mûslî Çavûş, ji Şam-Trablûsê kurê Seyf Yûsûf, ji Adanê Cemşîd, ji Sêwasê Meymûn, ji Enqerê jî Kalender Oglû bû. Celaliyan bi mêranî şer kirin, lê Osmaniyan top bikar anîn û Celalî têk çûn. Celalî reviyan Tebrîzê û dema gihîştin wir hejmara wan 13.605 kes bûn. Bi vî awî 30 hezar hate kuştin.[131-207] Ji wan bûyer û serhildanan jî diyar e, ku Celalî ne tenê êl yan

jî federasyonek e; ji serhildanên Kurd û Sersoran giştî re ew nav dihate gotin. Mumkune ku di dema Ebbasiyan de ew konfederasyon bûn, lê li Anadolê mirov nikare navekî wiha lê bike.

Hinek nûser dibêjin Celalî 24 êl in û konfederasyon e. Pişt re ew dibin du şax, aliyekî 12, aliyê din jî 12 êlên xwe hebûne. Beşbûna Reşiyan a Anadolê ya wek 12 êlan jî ji wir tê. Lewra **Celalî du şax in û yek Xelikî yek jî Saka** ne. Saka bi Reşiyan ve li ser heman bingehî ne û mirov dikare bibêje ew Reşî ne. Konfederasyona Celalî, li navbera Maku, Qers û Bazîdê de dijîn. Êlên girêdayî ev in: Alîmohaw, Belikan, Hasow Halef, Cenikan, **Halkan** (serokên Celalî piranî ji Xelika ne), Misrikan, Otabli, Kadikan, Qizilbaş û **Sekan (SAKAN)** in. Celalawendî li başûrê Kurdistanê dijîn, bi Gelû yên berî Îslamê li başûrê Zaxrosan dijîn re girêdayî ne. Bilikan, Cenikan (bi dîtina min ew Celikan yan jî Cûtikan in) û Xelikan niha li navenda Anadolê dijîn. Lê niqta girîng ew e ku hin êleka bi navê Saka di nava Celaliyan de dijî. Seferoglû dibêje: Sakan, yek ji 24 êlên Celalî yê li dora çiyayê Araratê dijîn e. Gor ve Saka li destê çepê yê Celaliyan şer dikirin. Destê raste jî Xelîkan e ji 12 qebîleyan pêk dihatibûn şer dikirin.(91-70) Mûrad Celalî, êlên Celaliyan wiha dinivîsîne: Xelikî, Cindiyan-Sule'êtîman, Qorixçiyan-Hesoxelefan, Butkan-Meyaka, Qotan-Keskoyan, Gêloyan-Elemhoyan, Soran-Cumkan, Elyan-Gelturan, Misirkan-Pîlekan, Birxikî, Keçelan, Hesesoran, Sakî, Êla Bozxorê-Pêyala, Qatkan-Qîmkan, Mametkan-Giskan, Qeleşan-Qûrrûyan, Deloyan, Banûkan-Hîndîrîsan, Şemkan, Reşreşkan, Qizboxşoliyan, Omkan, Şêxbiziniyan, Qereçoliyan, Zilfoyan in.(xelkedondurma.com) Pilekan niha li Xorasanê ne. Şêxbizinî zaravê Lorî diaxifin û Reşî jî di navê de cîh digirine, ew yeka jî îddeayên me li ser Celaliyan bi hêztir dike. Yanî, Celalî ne tenê êlêk, zendek yan jî zarava axifek e; Celalî navê Kurdên serhildêr û Kurdên li hember sîstema Ereb û Osmaniyan e...Ew wêne jî dide xuyakirin ku navên din ên mîna Tirkmenên Helebê, Bozûlûs û hwd jî bi vî rengî ne.

Ş. Firat dibêje: Celalî berê li zozanên Qonya û Qeremanê dijiyan; paşê hatin dora çiyayê Ararat û bi cîh bûn.(127-8) Gor "Tarîxa Varto", Celalî berê li Qonya û Qeremanê bûne û Yawûz ew şandin Agiriyê. "Tarîxa Wanê" jî dibêje: Ew hatin zozanê Abaxa û li dora Makuyê zivistan derbas dikirin. 24 ber/tîrên wê êlê hene ku 12 Xelikan e û 12 jî Saka ne. Şaxên wê:

- Keçelan
- Goran
- Budikanî
- Reşkî
- Çumkan
- Hasasuran
- Temehoran
- Berxikanî
- Misrikanî.(128-127) Misrikanî re Pîlekan jî tê gotin û beşekî niha li Xorasanê ne.

Birêz Wekîl Mûstafayev dibêje: Serokê Celaliyan yê Ezerbeycanê navê xwe Koroglû ye. Bavê wî kor bûye û ji bo wê jî Tirkan ev leqeba lênan. Navê xwe yê rastîn Rewşen bûye. Li hember Tirkan û Ezeriyan serhildan çêdike. Ermenîstan di destê Celaliyan de ye; wê demê 4-5 zend êlên Kurdên li wir in. Yek ji wana Celalî û yek jî Qereçorî bû. Serokê Qereçoriyan Qaçax Nebî ye û berê serokê Qerebaxê (1813), paşê jî ê Nahciwanê bû. Qereçorî ji milyonekî zêdetir asîmîle bûn. Niha 10 malên ku dibêjin em Kurd in tu dikarî peyda bikî. Navê gund û çiyayan maye, lê Qereçorî bi xwe tunin. Celalî dibin du beş: Yek Sêvka yek jî Celalî ye. Eger ew îddea rast bin, wê demê Sêvka bi Saka ve têne heman watê.

Şaxên Celaliyan: Kotanli, Soranli, Sagan, Keçalan, Dutkan, Kapdekanli, Hesenan, Cînankan.(12-279) Kotanli niha wek êleka di nava Qerekeçîliyan de xuya dike û li Serxetê dijîn.

Di salên 1850-56 an de rewşenbîrê Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: "Ew ji 2000 malan pêk tên, li dora Agirî û Bazîdê dijîn û mala axê wan her dem ji Mala Xidir Lale der tê û diçin Îran û Rewanê jî. Êlên xwe:

| | | |
|---|---|---|
| Xelkan | 500 xane | |
| Qizilbaş Oxliyan | 500 | " |
| Conkan | 500 | " |
| Hesen Soran | 300 | " |
| Time Xûran | 200 | (177-1) |

Dr. Frîtz jî di wê fikrê de ye û bawer dikim çavkaniya wî jî rehmetiyê Beyazidî ye.

Gor rapora dewleta kûr a Tirkiyê (Arteş-Îstîxbaretê) bi mora "pir pir bi veşartî" hazir bûyî (1970) Celaliyên li Kurdistanê bi vî awayî ne: Hejmara wan: 83.445 kes in; henefî û şafiî ne; Kurmanc in. Mil û berên wan:

- **Başimî:** Agirî; Hallesînî: Diyadîn û Agirî navça navend.
- **Bilikan:** 1400 kes in û şafiî ne. Li Bazîdê û gundên: Gozukara, Saxdiç, Kazan, Sariçavûş dijîn.
- **Bilikan (Hasedsalaasoran-milê Badilî):** 4200 kes in, henefî û şafiî û Kurmanc in. Li Eleşgirt gundên wê tevlî serhildanan bûne.
- **Bilikan (Milê Şadî):** 3250 kes in; şafiî û Kurmanc in. Li navenda Wanê-bi Kinyas Kartal ve girêdayîne. Eleşgirt û çend gundên wê tevlî serhildanan nebûne.
- **Cumukanli (Cutukan):** 2675 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Eleşgirt û çend gundên wir dijîn. Tevlî serhildanan bûne.
- **Xelikan (Milê Hindîrîs):** 400 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Taşliçay û Tûtakê dijîn.
- **Xelikan (milê Sîpkî):** 18.000 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Tûtak û gundên wê dijîn.
- **Xelikan (milê Sîpkî):** 10.600 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Eleşgirt û gundên

wê dijîn.

- **Xelikan (milê Sîpkî):** 2.650 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Tûtak, Patnos û der dorên wir dijîn.

- **Hasedsalaasoran:** 11.650 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Bazîd, Taşliçay û Diyadîn û gelek gundên wê dijîn.

- **Kotan:** 10.260 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li navça Bazîdê rûdinên. Îddea dibe ku ji Qonyayê hatine; tevlî serhildanan nebûne.

- **Kotan (Gelturan û Keskoyî):** 1650 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Taşliçay dijîn.

- **Sakan:** 6590 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Bazîde dijîn; berê reviyane Îranê, **paşê vegeriyane û demeke li Qeyseriyê bi cîh bûne.**

- **Şemkan:** 800 kes in, şafiî û Kurmanc in. Li Taşliçayê dimînin û tevlî serhildanan nebûne.(108-42)

- **Celalî:** Li Qers, Dîgor, Sûsûzê dijîn, henefî ne û Kurmanc in. Bi tevahî 3306 kes in.

Xelikan (şaxên xwe: Alîmenolû, Aliyanli, Geloyî, Geltûran, Hindirîsî, Keskoyî, Kotan): Tevayî hejmara xwe 21131 kes in; li Tûzlûca, Aralik û navça navendiya Qersê dijîn. Kurmanc û şafiî ne. Tevlî serhildana Agirî bûne, têkiliya xwe bi Îranê re hene.(108-188) Yên min li Xorasanê ziyaret kiribûn divê parçê wan bin.

Tê îddea kirin ku di dema Osmaniyên pêşîn de, Xelîfe Alaûddevle mirovekî bi navê Hallîgan ê zanyar dişîne Anadolê. Ew mirova mêze dike ku xwendin û nivîsandin kêm e û peşniyaz dike ku dibistan bên vekirin. Bi ser vê de li Xelikên Jêrin-Qonya Îbn-î Hallîgan mektebekê vedike. Bi ser vê de navê vê navçê bû Xelikan.(134-33) Ew dîtin bi min rast nayê, lewra navê gundên li navenda Anadolê bi piranî ji navê êlê tên.

Tarîxa Wanê, Dînaiyan (Donuyî) wek milekî Celaliyan nîşan dide; di kovara "Tarama" de tê îddea kirin ku ew tê wata tobekaran; Ew êlên: **Reşkan (Eşkanî)**, Mesgûran (Beşguran-Bûlxaran) û Bedirxanan dikin nava xwe.(104-27)

Şerê Şah Ebbas û Emîrxanê Çeng Zerinî yê Kurd sewa Celaliyan derketibû; yan jî ew kiribûn bahane. Şah Ebbas xwest ku Emîrxan 8000 ji Celaliyan di nava êla Biradost de bi cîh bike, lê Emîrxan ew yeka qebûl nekir û bû sedema şer. Celaliyan û hêzên Îranê êrîşî Xan kirin (1608). Şer çar mehan dom kir, Emîrxan têk neçû. Paşê Celaliyan jî li hember Îraniyan şer kirin û beşek bi veşartî derbasî xaka Osmaniyan bû.(19-95) Di wê bûyerê de çima Celaliyan berê bi Şah re paşê jî li dijî Şah şer kiribûn, sedema vê çibû? Bi dîtina min eşkere bû, ku Şah ewana ji bo armancên xwe yên qirêj bi kar tîne û yekê jî hovîtiya Sefawiyan ya li dijî Kurdan divê Celaliyan tahamûl nekiribe û li dijî Şah şer kiribin.

Li ser navê Celaliyan em salnameyekê jî dibînin. Ew salname dibe ku Tirkan ji Kurdan girtibe, lewra sîstema wê bi kevneşopiya Kurdan ve yek e. Li ser vê yekê nivîskar dibêje: Tirkan salnameka bi navê Celalî jî bikar dianîn û ew li ser navê Melîkşah hatibû avakirin. Gor sala-rojê hatiye avakirin û sersal

21 ê Adarê û piştî mirina Melîkşah dev jê hatiye berdan.(148-21) Bi vî awî hertiştê Kurdan jê stendin û kirin malê xwe.

Dema mirov sîstema Celaliyan, êlên di nava wan de û pêvajoya dîrokî ya ku ew jê hatine baş lêkolîn bike, dibîne ku ew Saka bi xwe ne. Bi hezaran sal berê, wek Saka dihatin binav kirin, paşê Ereb û Osmaniyan jî ew kirin Celalî. Navê Celal jî ji ber şervanî û lehengiya wan li wan hatiye dayîn.

## TIRKMENÊN HELEBÊ

Heleb navendeke girîng a bazirganî û pireka di navbera gelê Kurd, Ereb û Ewrûpiyan de ye. Ji Xorriyan heta dema Osmaniyan ya dawî, gelek caran Kurd bûn xwediyê wî bajarî û rêvebirî jê re kirin. Îro her çiqas wek bajarekî Ereb tê xuyakirin jî di esas de bajarekî Kurdan e. Berî desthilatdariya Osmaniyan ji alî Kurdên Mirdêsî ve dihate birêvebirin. Paşê, di sala 1516 an de, piştî şerê Mercîdabiqê kete nava tixubên Osmaniyan. Ji bo defterlixa Helebê jî Abdî Çelebî yê kurê Abdullah Paşa hate tayîn kirin.(170-688)

Gor sîstema rêvebiriya Osmaniyan wîlayeta Heleb ji van bajaran pêk dihat: Şam, Dîlok, Bîrecîk, Hama, Sûrûç, Ravendan, Mûnbîç, Rûk-Kala, Gunduzlû, Bagras, Kinik û Meletî digirte nava xwe. Tirkmenên Helebê, heta Tirkmenên Yenî Îl (Yozgat), Dulqadir û Boz Ûlûs jî belav dibû.(170-689) Di nav êlan de koma herî mezin Tirkmenên Helebê bûn; zivistan li Helebê, havînan jî heta Qastamonû yê belav dibûn.

Heta sedsala XVI an du kom hebûn ku bi tevahî koçber dijiyan; yek ji wana Tirkmenên Helebê bûn ku di navbera Ûzûn Yayla û Helebê de diçûn û dihatin, di salên 1540 de 9316 xane ne.(131-193) Yên din jî Boz Ûlûs bûn.

Di sedsala XVI an de Tirkmenên Helebê ev bûn:

**Dulqadir (Boz Ok):** Li Elbîstanê dijîn. Zivistanan li Amîk, Heleb û Çûkûrovê dijîn. Gelek jê çûn Îranê; zendek jê çû Amedê û tevlî Boz Ûlûs bû. Dîsa hinek ji wan li Yozgatê bi cîh bûn û hinekan jî Yenî-îl pêk anîn. Di sedsala XVI an de ji wan hinek êl heta Enqerê çûn; Qeyserî, Kirşehîr jî herêma wan bû. Paşê hinek ji wan (Cerîd, Tecîrlî û Axca Koyûnlû) li Çûkûrovê bi cîh bûn. Li Qers-Qadirliyê jî êlên Dulqadir hebûn, ew: Varsak, Demûrcî, Qeremanî, Selmanî, Zakirî, Kavûrga, Geçlik, Eşkînciyan in.(131-195) Beşek ji êlên li Anadolûyê, di serî de Şêxbizin dibêjin beşekî me ji Qersê hatiye. Varsak îspata vê ye. Ew zenda mezin ji van êl û federasyonan pêk tê:

**a-** Anamas/Qaraca: Yazir, Sevînç, Orûç-Beg, Ûlaş, Ûrçan, Kazanca, Soylemez, Yol-Basan, Qere-Haytal.

**b-** Dokûz/Bişan: Karkin, Qeremanî, Kurd Mihmad, Avci, Demrek, Haciyan, Neccar, Dokûz-Koyûn, Bazlamaç, Qere Goncû.

**c-** Kureciyan.

**ç-** Cerîd: Bayir Cerîd, Qere Hesenî, Orûç Gazîlî, Mamali.

**d- Peçenek**

**e-** Kavûrga-Sîs (Kozan)
**ê-** Elçî
**f-** Dongele
**g-** Kuşne
**h-** Yûva (Qere Yuvali)
**i-** Teke-lû
**î-** Varsak: Li Qers-Kadîrliyê Varsak, Demûrcû, Qeremanî, Selmanî, Zakîrî, Kavûrga, Geçlîk, Eşkînciyan. Ji marûzatê tê fêhm kirin ku ew Şêxbizinî ne.
**j-** Axca Koyûn: Çaliş, Mûsa Hecî, Mûsaca, Kozan, Hamîdî.
**k-** Eymîr/Eymûr: Bûsûz, Dundarî, Tosûn, Qere-Goz, Çarik, Affan, Sancakî, Yûsûf, Hecî Bayram, Afşar Eymûrî ne. Ew di sala 1692-3 an de li Humusê bi cîh kirin. 50 malên xwe li Kirşehîrê gundê Nusretlû bi cîh bûne.(131-340)
**l-** Çîmelî.
**m-** Kizil.
**n-** Îman-Afşar.
**o-** Çaxirxan.
**p-** Avci.
**q-** Gundeş.
**r-** Tecîr/Tacîrî.
**s-**Eşkîncî: Dede Karkin, Qere Ahmed, Sûlî Şêxan.(131-194)

Eşkereye ku ew zendên han, piştî mîrîtiya xwe bi navê Dulqadirî hatin belav kirin bi şûnde, di qeydên Osmanî de wek Tirkmenên Helebê têne binav kirin. F. Sumer dibêje: Di destpêka sedsala XVI an de êlên girêdayî vê zendê heta Enqerê hatibûn; Qeyserî û Kirşehîr jî di nava herêma cîh bûna wan de bû.(131-195)

Î. Şahin jî êlên girêdayî Tirkmenên Helebê wiha dijmêre û gor salan serhejmar û navê serokên wan dide.
Êlên girêdayî, hejmar û Begên wan:

| Nav | 1520 | 1525-30 | 1536 | 1552 | 1570 |
|---|---|---|---|---|---|
| **1- Beydîlî:** a: Bekîrbeg b: At-guden Bey, c: Yalvaç Beg | 3 | 43 cemeet | 39 | 66 | 69 |
| **2- Bayad: Seyf Begê** kurê Xelîl Beg, boy Begê xwe. Ji 11 êlan pêk tê û 12 Begên xwe hene. Bozca, Pehlewan, Çunker, Îldîlek, Şemek, Salvat, Tohtemûr ne. | 11 cemeet | 20 | 31 | 52 | 47 |
| **3- Avşar:** | 9 | 15 | 19 | 5 | 4 |
| **4- Gunduz:** Di sala 1482 an de li hember Osmaniyan li Edenê şer kirine. | 5 | 8 | 7 | 6 | 6 |
| **5- Înal:** | 5 | 15 | 24 | 10 | 11 |
| **6-Avşar (Beylik)** | 6 | 5 | 6 | 6 | 9 |
| **7-Harbendelî:** | 1 | 18 | 22 | 19 | 35 |
| **8-Peçenek:** | --- | --- | --- | 6 | 6 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 9- Oyrad: | --- | --- | --- | --- | 3 |
| 10- Toktemûrî: | --- | 2 | 2 | Bayat | Bayat |
| Serbixwe: | 40 | 62 | 59 | 47 | 51 |

(Eymîr, Hama, Doger, Çepnî, Kizik, Karkin, Bûxdûz, Kinik, Bayindir, Yûrexîr, Hayî-Yîva, Kaçilû, Acûrlû jî hebûn ku serbixwe dijîn.[170-711]

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **Serhejmar:** | **6712** | **40396** | **47113** | **49024** | **59289** |

Di sala 1570 an de bajarê Osmaniyan ê herî mezin Stenbol, yê duyemîn jî Bûrsa bû, ku şêniyên xwe 55 000 bûn.[170-712] Serhejmara Tirkmenên Helebê jî 59 hezar e ku ew texmînî ye. Rastiya Kurdan eger mirov bide ber çavan ew hejmara hîna jî zêde dibe. Lewra di hinek jêderan de ew yeka wek 80 000 tê nîşandan ku bi dîtina min ya rast ew e.

## BOZ ÛLÛS


Dr. Tûfan Gunduz dibêje: Ji ber çi ew nava girtine nayê zanîn. Farûk Sumer jî mecbûr maye ku texmînan bike: Ji Pezgewran xêr ji Bozok û Uçok an hinek êlên Kurd jî mabûn; ji bo ku ew ne ji rengekî bûn îhtîmaleke ku Bozûlûs bi kar anîne, dibêje. Navê Boz di nava Pezgewran de nîne û îhtîmaleka mezine ku Osmaniyan ew nava dane ser.[115-46] Min li jor jî gotibû ku ew nava ji Zerikiya kurdî û ji bo ku Kurdên wan êlana bi piranî çîl-kej-zerî bûn ew nava lê nan.

Bozûlûs bi tevahî nebe jî, beşekî xwe piştî şerê Eba M. Xorasanî hatin bakûrê Kurdistanê; demekê jî diçûn Sûriyê lê di dawî de di navbera Erzirûm û Mêrdînê de dijîn. Ew berî hatina wan ê Anadolê bû. Ew yeka ji alî nûserên Tirk ve jî tê qebûl kirin: Bozûlûs di navbera Erzirûm û Beriyê de dijî. Hîna ku neçûbûn Anadolê 250 salî li vê herêmê jiyan. Ew jî teqrîben dibe sala 1290 an.[115-148] Bi vî awî sedsalan jiyana xwe berdewam kirin.

Me di beşa Tirkmenên Helebê de jî ragihand ku komên heta sedsala XVI an tevahî koçber dijiyan yek jî Boz Ûlûs bû ku zivistanan li dora Mêrdîn û Firat, havînan jî di navbera Ezingan-Erzirûmê de derbas dikirin. Boz Ûlûs jî di sala 1540 an de 8013 xane ne. Di vê sedsalê de Tirkmenên Helebê, Boz Ûlûs, Dulqadir û Boz Ok bi peyva Tirkmen dihatin xwendin.[131-193] Gor wê demê gelek kes in, mirov dikare texmînî bibêje 50 hezar kes in. Ya herî girîng jî ew e, ku heta wê demê kalê me wek Tirkmen dihatine bi navkirin, ku ew jî sîstem û teoriya Tirkan ji serî heta binî hildiweşîne.

C. Orhûnlû jî dibêje: Boz Ûlûs, di sedsala XVI an de li dora Amedê dijîn. Zivistanan ji Mêrdînê bigire heta Deyrî Zor belav dibûn; havînan jî heta Erzirûmê diçûn. Lê di destpêka sedsala XVII an de hatin Anadol û Qeremanê.[90-17] Ji bo ku dawî li vê bînin, di salên 1613 û 1614 an de ji Qadî û Begebegan re emirname hatine şandin. Lê dîsa jî nikaribûne pêşî lê bigirin. Yên ku li Enqere, Aydin, Kutahya, Qeremanê dijîn bi navê herêman û yên li Enqere li navça Keskînê dijîn jî bi navê Keskîn ji yên din dihatin cûdakirin.

Bi dayîna Mukataaya ew îdare dibin.(90-17) Ji vê şirovê em fêhm dikin ku navên êlên li van herêmana bicîh bûne, hatine guhartin. Bi navên nû û yên herêmê hatine qeyd kirin. Yên li Qeremanê 13 êl bûn û cotkarên has bûn.(90-17) Eger mirov bibêje ku yên îro li wan deran dijîn ew in, dikare şaş bibe, lewra piştî wê demê jî gelek tevlîhevî, serûbin bûn pêk hatine. Ji bo me xala girîng ew e, ku dewletê nexwastiye ku ew bên. Mumkune ku dewletê wê demê jî dixwest wana li dora Deyrî Zor bi cîh bike.



Êlên Kurd

Boz Ûlûs ji sê beşan pêk dihat; ew: **Tirkmenên Amedê, Dulqadirî û Tirkmenên Helebê ne.**(131-196) Gor tespîta min, Tirkmenên Amedê mirov dikare li dora federasyona êlên Têrikî, Oxcû û Zerikiyan kom bike. Bê guman gelek êl hene, lê ji bo ku hêsan bê fêhmkirin wiha baştir e.

Tirkmenên Helebê jî dikare li dora Reşiyan kom bike. Ew yeka ji alî Orhûnlû ve jî tê pejirandin: Tirkmenên Helebê û êlên girêdayî Yenî îl (Haslari) ji çend salan wir ve li edetên xwe yên kevn muxalefet kirin, diçûn eyaletên Anadol, Qereman û Rûm. Ji bo ku dawî li vê tevgerê were 26ê Kanûn a 1613 û 25ê Çile ya 1614 an de ferman ji waliyên eleqeder re hatin şandin. Lê dîsa jî bi ser neketin. Li Yenî îl (Newşehîr) zozanên xwe yên musteqîl hebûn. Dîsa jî bi hemû giraniya xwe ve dihatin Qereyela di nava eyalata Rûm ê; mal dişewitandin, zeviyên gel didan pezên xwe. Ew êlana Barak, Bayindir, Duresînlî û **Reşî** bûn. Di sala 1686 an de, ji bo ku ew êlana ji zozanên xwe yên musteqîl neçin cîhekî din, bala kesên eleqedar hatiye kişandin.(90-40) Di Dulqadiriyan de jî gelek êl hene, mîrîtî avakirine û mirov dikare komên mîna Canbeg, Sewêdî û Milan di navê de kom bike. Wekî Î. Şahîn dibêje: Di nava Bozûlûs de, ji Dulqadiran 40 êl hatine tespît kirin, lê ji ber ku êlên mîna: Avşar, Çaxirgan, Cerîd, Qaraca Arap, Gundeş, Çîmelî, Dodurga ji êlekê zêdetir têne temsîlkirin 101 êl di nava Bozûlûs de hene. Li destpêke, rexistina zendê ya ku bi yekbûna êlan pêk dihatî di nava Bozûlûs de tunebû. Piştî hatina Anadolê êlên ji Taban û Oxûlbey veqetiyan, ji alî boybegan ve dihatin birêvebirin.(115-46) Yanî wekî Reşiyan ne federasyoneka bi rêxistin bûn.

Taybetmendiya Tirkmanên Amedê ew bû, ku ew êlên ji Pezgewran mayî bûn. Di bêşa wan de jî me gotibû, lê vir jî qetî dibe ku di navenda Pezgewran de Têrikî hebûn. Tirkmenên Amedê baqiyê Pezgewran e û ji van êlana pêk tên: Taban, Oxûl-Beg, Mûsilan, Pûrnek, Hamza Heciyan, Koca Heciyan, Îzzeddîn Heciyan, Silêman Heciyan, Şêxan, Danişmend, Salar, Çavûndûr, Dodurga, Doxer, Karkin, Avşar, Bexdilî, Alpavût ê. Dulqadirî jî ji van êlêna pêk tên: Cerîd Siltan-Heciyan, Kurd Mihmadî (ji zenda nehan/9 an e), Koçekî, Kuşne, Anamas, Avci, Dodurga, Cecelan, Çîmelan, Avşar, Qaraca Araban, Eymîr, Gundeşî, Çaxirxanî, Kizil Koca, Şam Bayadi, Karkin Mûsaca-Mûsa Heciyan (ji Axca Koyûnlûyan e). Tirkmenên Helebê jî ev in: Kopeklî Avşari, Gunduz Avşari, Harbende, Begdilî, Acûr, Înal, Bayat û Qara Koyûnî ne.(131-196)

Nûserên Tirk serhejmara Bozûlûs didin, ku li gor wê demê gelek e: Bozûlûs di sala 1540 an de 23.516; yên Dulqadiran jî 13.847 kes in. Di dema Selîmê II an de Bozûlûs 63.056 kes in.(115-105) Tirkmenên Bozûlûs ji alî serhejmar de ji gelek bajarên Anadolê zêdetir bûn; ji bo wê hikumetên navendî tim dixwestin ku wê hêza muazzam a tim di tevgerê de, têkin bin kontrolê.(115-165) Di gelek jêderan de jî serhejmara Bozûlûsan a sala 1540 an 37.363 nefer in; herdû serhejmar jî ji gelek bajarên Osmaniyan zêdetir in.

**Êlên ku Bozûlûs pêk tînin:**

Aba Kurklu, Acurlû: (523 malbat/ 361 nezewicî). Berê li Keskîne bûn. Paşê di nav Pehlewanî, Reyhanî, Hecî Ahmedî de belav bûn û 20 xane jî çûn Balikesîrê.[115-48] Axcalû, Ala Hecî, Alî Goren, Aliyan, Anamasan, Anter, Arap, Atçi, Avanan (Enqerê-Tabanli), Avci, Avşar (di 1407 an de li hember Memlûkan serî hildan û tevlî Pezgewran bûn. Li Enqerê, Rakka, Hamayê hene), Azaplû, Bayat, Bex Coker, Bexdilî, Bekîr Heciyan, Bozhan-Borcan, Cerîd/Sîl-Supur (Keskîn. Li sala 1613 an hatin Çanqiri û bi Tecîrî ve şerkirin. Ji Rakkayê bi şûnde li Qirşehîr Çîçekdaxi û alî Bozokê belav bûn), Cerîdî Siltan Hecîli, Çaxirgan, Çavûndûr, Çayan (li Qereman, Nevşehîr, Ûlûkişla, Erexlî), Cecelî, Celahîr, Çîmenî, Çepnî, Çîçekî, Çopû, Çûbe, Danişmendî (di navbera Aydin, Enqere, Qereman), Îsheq Danişmendî. Dodurga, Dokûz, Dolûlî, Doyran, Doxer, Ensalî, Eymûr, Gevherî, Gundeşî, Gunduzî, Heciyan, Xelîl Hecyan, Hamza Heciyan (Qereman, Sêwas, Antalya, Qerehîsari Sahibe), Harbende, Haydarî, Huseyn Heciyan (Haymana-Toyaç niştecîh bûn), Îlanî, Îlbexî, Îl-Emîn (Derbentçî), Înalî (ji şerê Moxol û Memlûkan bi şûnde 40 hezar xane xwe avêtin bextê Memlûkan û wan jî ji Gazê heta Antakya ew bi cîh kirin ku Înalî jî di nav de bûn û li Enqerê Tabanî jî hene), Îvaz, Îzeddîn Heciyan (Sêwas û Qereman, Espkeşan gundê Atlandi), Kamkam, Qerebax, Qaraca Arap, Qereman, Kargaç, Qere Hesen, Qerekoyûn, Karkin, Kufur, Kilhor, Kiçi, Kizil Koca, Koca Heciyan, Koç, Kozgucek, Kutbex, Kûtsîn, Koçek, Kurd Mihmad, Kurdenkûre, Kûşer, Kuşne, **Lek (Di nava Bozûlûs de, di sala 1540 an de du cemaat û 108/14 xane hebûn. Şaxekî xwe li gundê Şêx Alî Dorcû yê girêdayî Harranê bi cîh bûn. Tevlî koça Bozûlûsan ya Anadola Navîn nebûn; bi Bozûlûsên li Amedê ve tevhev koçberî Rakka bûn.**[115-89] Mûsaca, Mûsil, Oxûlbex, Pûrnek, Salar, Sari, Silêman Hecî, Ser Kovan, Şêx (Keskîn), Şêx Mihmad, Taban (Enqere), Tecer, Tekelî, Tûtgak, Evran, Ûzûnan, Yabaltûn, Yavila (Enqere), Yellî, Yûrtçû, Zaxferan, Serkeme û Aşiyan ne.[115-104] Wekî xuya dike gelek êl di nava Boz Ûlûs de hene. Balkêşe ku êleka bi navê Zaferanî jî heye ku di beşa Xorasan de me qal kir. Ew jî îspateke ku ew nava ji alî Osmaniyan ve lê hatiye dayîn û yên Xorasanê jî ji bakûrê Kurdistanê çûne. Ji navên din mumkune ku mirov zêde tişt fêhm neke; lê, bi kurtî dikarim bêjim ku di nava vê zendê de: Canbeg, Sewêdî, Zerikî, Têrikî, Milan, Şêxbizin, Oxçû û komên din hene…

Dr. T. Gunduz dibêje: Hinek Tirkmen ji alî Hesenê Dirêj ve ji Tebrîze re hatin birin. Hinek derbasî jiyana rûniştinê bûbûn û hinek jî li Rakkayê hatibûn bi cîhkirin. Li Anadolê jî destûr hate dayîn Boz Ûlûs, ku ew herin zozan û germiyanan. Lê di sala 1673 an de nikarîn li ber giraniya malî rawestin û dîsa belav bûn. Ji ber vê li hinek bajarên navendî ew kom bi kom bicîh bûn. Li navenda Aydinê herêma ku Afyon, Bolvadîn, Emîrdagi, Sandikli û Manîsa dikire nava xwe de komên mîna: Germenc, Çokelek, Şam, Çatak, Kirca, Maksût…hwd dijîn.[115-148] Em dizanin ku hinek malbatên Canbegî yên li Kuşadasi ya **Aydinê** di sala 1659 an de bi cîh bûn. Taxeka Kuşadasiyê ew ava

kirin. Li **Qeremanê** komên mîna: Heciyan, Qereman, Abdurrahman, Deriyan, Qerehesen, Qerexelil, Çavûndûr û cemaatên mîna: Çatak (îro jî gundekî bi navê Çataqê li Cîhanbeyliyê heye), Emrîud, Îzzeddîn, Kuşne, Silêman Heciyî, Çayan bicîh bûn. Li **Enqerê**; Taban, Qereman, Avan, Kûşçû, Bayati Atik, Bayati Cedîd, Çaxirgan, Qerekoyûn, Dokûz, Bayram Bex, Alî Goren, Emin, Yûlar, Avşar, Înal û Danişmend, Yîva û Konûrûyê girêdayî Taban û Danişmendî, Çarsak, Kose, Silêmanî, Tokmak, Emîn, Kose Avşaryê girêdayî Qereman bi cîh bûn. **Sêwasê** komên mîna: Alî Goren, Kaya, Emîn, Seydî, Çayan, Hamza Hecî, Kufur, Îzzeddûn, Avan, Kuşne, Oxûlbeyê bicîh kirin. Bi vî awayî çar beşên îdarî pêk anîn.[115-148] 14 salan piştî belav bûna Bos Ûlûs ji wan re fermana tevlî şer bibin tê. Bi vî awî dixwazin ku Kurda bi Kurdan bidin kuştin.

Ji bo serhildana Gedîk, wazîfedarkirina Boz Ûlûs: **Ji begebegan yê êla Tabanlûya girêdayî Boz Ûlûs û ketxûdayên û rûspiyên wan re!** Gedîkî ji dewletê re îxanetê dikin û şîddete bikar tînin, bi bajar bi bajar digerin û li gel xirabiyan dikin. Ji bo pelçiqandina wan min wezîrê xwe Ahmet Paşa wazîfedar kiriye. Hûn jî bi êla xwe û kesên destên wan çek digirin pêwîste bi paşa re alîkar bin. Yek ji kopya wê fermanê ji: Êlên mîna Koçeklî, Mamali, Bayaz, Akbaş, Recep, Çîxdem, Pehlivan, Ketiş Oglû, Kizik, Abal, Îl Bexliyên li Tokatê re û yek jî ji voyvoda **Reşiyan Yûsûf** û ji serokên civatên **Hecî Bereket, kurên Ferhat Paşa**, Esme Hesen û Hesenê Mezin re ez dişînim, sal 1100-1687.[161-78]


Osmanî ji hêzeka mîna Bos Ûlûsan ya mezin nerihet bû; eger ew li cemhev bibiyana ji kontrola wan ditîrsî; lewra serhejmara wan ji gelek bajaran zêdetir bû. Ji bo wê biryar dan ku wê hêza mezin parçe bikin. Di sala **1691 an de kirin çar parçe**; koma yekemîn li **Bala** bi cîh kirin, ji ber ku serokatiya wan êlan Taban dikir ji wê re "Mukataa Tabanlû" gotin. Malbata begê wan li gundê Uç-em rûdinişt û heta îro jî ew hene. Qaraca Kurd Tirkmen (bi dîtina min ew ji Milan in) û Tirkmen Kurdî li Kirşehîr û Nevşehîrê bi cîh bûn. Milê didûyan li **Akşehîr-Îlginê** bi cîh bû. Ev mila ji Hamza Hecî, Avşar, Kuşne, Şerefî, Danişmendiyan pêk dihat. Milê sêyemîn li **Afyon û Kutahya** dijîn û ji Oxûl-Bex, Koçek, Îzzeddîn, Kurd Mihmad û Gundeşî yan pêk dihat. Milê çarêmîn jî li **Aydinê** niştecîh bû.[131-209] Ew êlên hanê yê bi vî awayî hatin parçekirin û dewletê xweste bicîh bike jî, bûn sedema gelek aloziyan. Ji bo wê dewletê vê carê jî biryar wergirt ku wan bişîne Rakkayê yan jî deştên Sûriyê.

Ew hewldana dewletê jî bi tevahî bi ser neket; êlên li wir hatin bi cîh kirin di firsenda yekem de reviyan Kurdistan û Anadolê. Ji bo ku êlan dîsa bişîne deştên Sûriyê, dewletê şîdeteka mezin jî bi kar dianî. Wek nûserê Tirk jî dibêjin: Ji bo ku êlên ji Rakkaye reviyabûn dîsa vegerînin carnan şer derdiket û top jî bikar dihat. Li ser wê gelek ferman hene ku yên neçûn cîhên îskanê bi tevahî di şûr re bên derbas kirin.[115-151] Bi vî awayî gelek Kurd di komkujiyan de derbas kirin. Îro li Çûkûrovê û gelek cîhên Kurdistanê mîna Dîlok û Germiyanê, cîh û herêmên mîna **"Rişvan Gedîxî"**(Geliyê Reşiyan) hene ku bi wan komkujiyan tên xwendin.

## YENÎ ÎL

Gor sîstema Osmanî, cografya Yenî Îl: herêma di navbera bajarên mîna Qeyserî, Sêwas û Meletiyê û navçên mîna Mancilik, Gurun û Hekîmxanê de ye. Ew herêma bi milên çemê Kizilirmak, Firat ve hatiye sînor kirin û ji başûr ve jî çemê Seyhan û Ceyhanê hene. F. Sumer dibêje: Ji navbera Mancilik û Gurunê re jî Üzûn Yayla tê gotin.(131-197) Üzûn Yayle ji bo Kurdên Koçber cîhekî stratejîk û navdar e.

Wekî me berê jî gotî, gor herêman bi navkirina êl û zendan ji bo Yenî Îlê jî derbas dibe. Osmaniyan bi vî navî qeyd kirine, lê em dizanin ku navê wan ê esasî beşekî Reşiyan û Sewêdî ne. Di belgeyan de ew kom wek "Uskudar Tirkmenî" jî derbas dibe; seva ku ji bo diya Mûradê III an Nûr-Banûyê li Uskudara-Stenbolê mizgeft çêkirine ew nava lê hatiye danîn.(131-197) Uskudar Tirkmenî ji bo Sewêdiyan bi kar tê, ew ji alî mezinê wan vê jî tê piştrast kirin. Ji Beşqewaxa Biçûk (Cîhanbeyli-Qonya) Seyid Tewfîqê Hecî Îbrêm (Altinpinar) jî di hevpeyvîna min ya di sala 1999 an de kiribû, ev yeka dipejirand: Koma Yenî-Îl ji du milan pêk tê: Yek **Dulqadirî** ne, yek jî **Tirkmenên Helebê** ne. Ji Tirkmenên Helebê re **Yaban Erî** jî tê gotin; ji bo ku tenê havînan dihatin Yenî Îlê ji wan re Şamî jî tê gotin. Piraniya Yaban Eriyan Bexdilî ne, ku ji van êlana pêk dihatin: Bexdilî, Bayat, Avşar, Bayindir, Harbendelî û Beranî ne.(131-197) Yaban Erî Reşî ne; têkiliya Bexdilî û Nasirên girêdayî Reşiyan jî heye, dibe ku yek êl bê.



**Seyidê Tewfîq**


Sîlsupur-Sîlsupur Cerîdî ji Boz Ûlûs in. Ew ji 250 xanan pêk tên û ji baca malê wan 450 kuriş zem hate kirin û li Yenî Îlê bi cîh bûn.[160-668] **Sîlsupuren ji bo Milan û êla Hewêdî û carna jî ji bo êla Reyhanî/Celika-Kabalar bi kar tê**. Kadizade Huseyn Paşa di sala 1140/1727 an de Sîlsupur şandin Rakkayê. Lê paşê, piraniya wan firsend ditibû ku birevin dora Rûm û Bozokê. Gîştik niha li Keskîn, Bozok, Kirşehîr û Çîçekdaxiyê rûdinên û li ser nifûsa wan hatiye qeyd kirin. Ew li Rakka, Amed, Qereman, Aydin, Enqere, Çanqiri, Bûrsayê jî hene.[160-668] Bi piranî peyva Rûm ji bo Sêwasê bi kar tê; mezinên me digotin: rojavayê Sêwasê Rûmê.

Ji belga ku di navbera dewleta Osmanî û êlên Kurdan hatiye çêkirin de, em êlên Yenî Îl û gelek êlên nav hatine guhartin fêr dibin. Belge wek senet yan jî peymaneka ticarî yê, ku êlên Kurd ji bo genim kişandinê tên memûr kirin. Kovara Dîrokî wiha dibêje: Êlên koçberên girêdayî Yenî îl û Tirkmenên Helebê bi kişandina genim hatine perpirsiyar kirin. Di sala 1048/1638 an de herdû kom hatine wezîfedar kirin ku ji Bîrecîkê genim bikişînin Bexdayê. Em ji nêzîk ve li wan cemaatana binêrin:

**1- Ûlaşlû:** 80 hêştir û Alî weledî **Bonsuz**- Heleb.[169-231] Îro jî li navenda Anadolê gundekî bi navê Bumsuz heye û ew girêdayî Nasiriyan e-Reşî.
**2- Bexdilî yê Kurd:** 80 hêştir, weledî **Nasir**- Heleb.[169-231] Wekî Ûlaşlû ew jî girêdayî Reşiyan e û îro li Anadolê çar gundên xwe hene.
**3- Dimleklû:** 40 hêştir, Hecî **Omer**, Tirkmenên Helebê.[169-231] Ew jî Omeriyên girêdayî Reşiyan e, li Anadolê pênc gundên xwe hene.
**4- Dimleklû:** 30, Bekir-Heleb.[169-231] Gereg ew jî girêdayî Omeriyan bin.
**5- Qadirlû:** 25, Huseynê **Sevîndîk**-Heleb.[169-231] Gereg ew Sêvika bin. Li Anadolê girêdayî Reşiya pênc gundên xwe hene.
**6- Kabali:** 20, Alî-Heleb.[169-231] Gor tecrûbêyên berê ew îhtîmaleka mezine ku Celikî ne. Ew jî sê gund in (hinek jî dibêjin çar in).
**7- Yalvaç:**15, Omer Şeh Bey- Heleb
**8- Tatlû:** 30, Îsa- Heleb
**9- Boz-Koyûnlû:** 100, Pîrî Bey- Heleb
**10- Doxerlû:** 15, **Seyf**- Heleb.[169-231] Gereg ew jî Sêvikayê girêdayî Reşiya bin.
**11- Abalû:** 100, Muhyeddîn ê Hecî **Bekir**, Şamli – Heleb
**12- Qere Şêxlû:** 22, Huseyn bin **Sevîndîk**- Heleb.[169-231] Sêvika.
**13- Seçen:** 25, Pîr Zade Dawid- Heleb
**14- Qere Hesenlû:** 15, Mehmet Hecîli- Heleb
**15- Çoban Bexlû:** 12, Tohtemûr, Îbrahîmê Xalîd- Heleb.[169-231] Îhtîmaleke ku ew Xelikî bin, sê gundên xwe li Anadolê hene.
**16- Sekîz:** 8, Gundeş-Guvendîk-Delî Şêxlî-Heleb.[169-231] Dibe ku ew Şêxbila bin.
**17- Kaçar-Îsa Afşar:** 2, Weledî Hecî Hamza-Heleb.[169-231] Ew Şêxbizin in.
**18- Şêxler:** 10, Xelîl-Aydoxmuş-Heleb yan jî tabiî Qere Dîken
**19- Otamişlû:** 8, Hecî Înal- Heleb.

**20- Bozlû:** 7, Afşar Şêx- Heleb.(169-231) Şêxbila.

**21- Bexmîşlû:** 86, Hecî Hamza-Heleb. Bi giştî 730 hêştir û 18.250 qûrişên bên dayîn xwediyê hêştiran.(169-231) Bi rastî jî ew ji bo me belgeyeke girîng e. Ji wê belgê em dizanin ku wê demê êlên Kurdan xwedî hêştiran bûne. Lê mixabin hinekan jî em nizanin kîjan êl in.



**Ferman-Peyman** (161-80)

Piştî vê belgê em rastî belgeyeka din a girîng tên. Ew jî hewldana dewletê ye, ku dixwaze êlên Kurd bişîne şerê Awûstûryayê. Ji bo wê li bajarê Qonyayê peymaneke bi serok û berpirsiyarên êlan re çêdikin û hemû jî binî wê îmze dikin. Ji bo vê A. Refik wiha radigihîne: Ji têkçûna Viyana bi şûnde, pêwîst kir ku em Tirkmenên Boz Ûlûs jî bişînin şer. Li Qonya, di hûzura Elî Paşa de, serokên hemû êlan hatin cem hev û qebûl kirin ku ji wan 300 kesî here şer. Hemûyan pejirandin û me ew muqawele şandê Stenbolê. Ew navên ku di kitêbê de hatine nivîsîn û kesen navên xwe li jêr soz dan: (ji Tirkmenên Danişmendî yên ku beşdarî seferê nekirin: Yenî îl, Tirkmenên Helebê, Kilîs, Reşî, Dulqadir, Danişmend, Mamitî, Boz Ûlûs, Badilli û yên li dora Mereş, Adana, Qers, Rakka, Payas, Mêrdîn) Cafer Beg, Abdullahê kurê Matar, Mehmedê kurê Hesen, Mehmedê Hemze Hecîli, Silêmanê kurê Keşne, Hesenê Şedîd, Çepenî Kantemîr, Armûtli Nazar Beg, Harbendelû Kurê, Koçeklû, Abdal Xelê Îsa 300 lewendê sexlem û bi çêk şandin, qebûl kirin. Şahîd: Muderîs: Mehmet Efendî, Fahrulkuzat: Seyid Şêx Hesen, Qeymeqam: Abdûl Hay Efendî, Muftu Mehmet Efendî Esînî û Fahruêkuzat Mûstafa. Sal 1101-1688.(161-80) Piştî vê peymanê jî em ji fermana duyemîn dizanin ku Kurd beşdarî şer nebûne.

Cemeetên ku soz dabûn tevlî sefera Awûstûrya bibin beşdar nebûn! Ji boybeyî, cemaatên Tirkmen û ji ketxûdayên wan re! Yenî Îl, Tirkmenên Helebê, Kilîs, Reşî, Dulqadir, Danişmend, Mamalû, Hecî Ehmed, Boz Ûlûs, Rakka; Ekradên Mereş, Edene, Qers, Payas, Bilan, Êlên li dora Mêrdînê yên Kurd û Badilî re! Bahane mebînin û şev û roj bikin yek û beşdarî artêşa li Edîrnê bibin; sala 1101-1688.(161-91)

Ji bo dagirkirina Viyana yê duyemîn û dirêj bûna şer, pêwîstiya eskeran derxist holê; ji bo sefera di 1690 an de dewletê ji Tirkmenan (Kurdên koçber) jî esker xwestin. Boz Ûlûs, Tirkmenên Helebê, Yenî-îl û Dulqadir beşdarî seferê bûn, lê Salankaman xwe li ber topan negirtin (1691) û reviyan.(131-209)

## KACAR (Bayat, Yîva, Şêxbizin-Lek)

Li ser Yîva zêde agahî tunin, li ser navê Yîva jî gelek cûre hene, Kaşgarli Mehmûd wiha dinivîse: Îva, Yawa, Yîva, Yava û Awa…Ji sedsala XVI an bi şûnde wek Îva derbas dibû.(131-349) Di dema Selçûqiyan de bi navê Perçem-Oxûllari derbas dibin û li dora Hemedanê (Dînaver, Kirmanşah, Hûlwan û Şehrîzor) ê dijîn. Îmadeddîn Zengî ji wan komek anî Helebê. Îhtîmaleka mezine ku Yîva ji Seyhûnê bi Avşar û Salxuran ve tevhev di sala 1130 an de hatin.(131-349) Ew dîtin bi min jî rast tê; Lewra Yîva jî beşekî ji Saka, yan jî di bin navekî din de bi Saka re diketin tevgerê. Ew li navenda Xorasanê dijîn û heta mirov dikare hîn pêş ve here û wana wek **Kipçak** jî bi nav bike. Nûserên Tirk Kipçakan Tirk dihesîbînin lê bi dîtina min ew ne raste. Piştê gel ji cihê dijîn leqiyan Yîva jî bi Avşaran re hatin Loristanê. Piştre jî belav bûn û hatin Anadolê. Di sala 1158 an de Tirkmenên girêdayî **Îva Perçem** li Cebelê talan kirin, Xelîfe di fermandariya

Mengû Bars de hêzek şand ser wan û gelek zirar dayê.[131-349] Ji ber wan êrişên Ereban, ew jî berbi bakûrê Kurdistanê hilkişîn. Di destpêka sedsala XIII an de gelek (10 hezar siwarî) Yîvayî li Ûrmiyê bûn.[131-352] Min di beşa Candariyan de jî qal kiribû ku ew koma li dora salên 1200 de hatine Anadolê û ew ji Xoy û Ûrmiyê hatibûn. Bi dîtina min ew heman êl yan jî zend e. Yanê Kurdên îro em wek Şêxbizin û Ler tînin binav kirin in. Ew yeka ji alî Îbnî Bîbî ve jî tê gotin: Di sedsala XIII an de li Anadolê jî Yîva hene û Selçûqiyan (Kiliç Arslan) ji wan esker girtine, îhtîmaleke mezine ku ew ji dora Ûrmiyê hatine.[131-354] Di nava Tirkmenên Helebê de jî Yîva hebûn ku heta dema Reşî bi cîh bûn beşek ji wan jî bi Reşiyan re tevhev bûn.

Lê ew beşa, piştre girêdayî Têrikan bû û îro jî li Haymana û Polatliyê bi Têrikan ve gundên xwe cîran in. C. Turkay belavbûna wan wiha dinivîse: Yîva-Yava-Yavalû Yorûge girêdayî Tabanî yê girêdayî Bozûlûs in. Li; Haymana, Mereş, Edene, Anamûr, Soxutê dijîn.[160-783] Li ew cîhên hatine hejmartin giştikan jî, Şêxbizinî hene.

Êla Şam Bayadi di avabûna Kacaran de rol lîst; agahiyên li ser wan ê herî kevne ji sala 1491 an vir ve ne, ku wê demê li Qerebaxa Arranê dijîn.[131-249] Ji vê hevokê tê fêhm kirin ku ew, piştî hatina Anadolê çûne Arranê. Di vir de rola şer, êrîş û bi darê zorê koçkirinê heye. Ew beşa çûbûn Helebê jî pişt re berbi bakûr hatibûn. Îbê Siltanê Kacar, Ristem Beg anî ser textê Pezgewran û piştî vê jî di sala 1493 an de êrîşî Gîlanê kir. Kacar, di sedsala XVI an de ji êlên mîna: **Şam Bayadi, Axca Koyûnlû, Axçalû** û **Yîva** pêk dihat ku esasê wan êlan li Yozgatê dijîn.[131-249] Şam-Bayatên li Bozokê jî mîna yên Îranê Sersor bûn; di sala 1578 an de kesekî ji wan îddea kir ku ew Şah Îsmaîlê II an e û li Hecî Bektaş gelek kes li dora xwe kom kirin. **Şam Bayadi li di sala 1613 an de hatin Anadola Navîn.**[131-250] Di wê demê de divê di nav Boz Ûlûs de hatibin. Di sedsala XVI an de li Kerkukê hinek Qaraca-Bayat hebûn. Mûnşî Muhammedê ji Bexdayê dinivîse; ku girêdayî waliyê Bexdayê Dawid Paşa (1817-1831) ji Bayatan 1000 siwarî di eskerên wî de bû; li Kirmanşahê 2000 kon, li Tavûkê jî nêzîkî 2000 konên wan hebûn. Dîroknûsê Ereb Ebbas ul-Uzzavî dibêje ew niha (1939) li Kerkukê niştecîh in.[131-251] Gor zanîna min jî beşekî ji wan niha li Kerkukê, beşekî mezin li bakûrê Kirmanşah, beşek li Xaneqînê û beşek jî li Gîlanê ne; lê dibe ku hinekan cîhên xwe guhartibin.

Di belgeyên Osmanî de navê Yîva gelek derbas dibe; gor "Deftera Tahrîra-Malatya" ew di sala 1560 an de li dora Meletiyê ne; yan jî beşekî wan li wir xuya dike. Girêdayî nehiya Qerehîsar, karye-î (gund) Yîva Ozî hatiye nivîsîn. Dîsa Mezra Koçaç, Yazi, Gullûce, Tekne Taş jî hene. Dibêje welatê xwe terk kirin û çûn zozana xwe ya bi navê Aspûzî.[96-231] Îhtîmaleka mezine ku ew ji alî Hums û Helebê hatibûn.

Li Îranê jî Kacaran rolêka dîrokî lîstin, emê di beşa Şêxbizinan de qal bikin; lê pêwîste bê zanîn ku berî Sefawiyan, Bayat li Îranê li cîhên cûda dijîn. Ew, jî dîroka wan ê cûda dihat; ew bi navê Bayat li Hemedanê dijîn û tê nivîsîn

ku di dema Tahmasb de ew 10 hezar kon bûne. Di navbera Bayat û Loran de li Nihavend (navça Burucird) de dijminatiyek hebû. Di dema Şah Ebbas (1593) de serokê Bayat Ûxûrlû Beg hate kuştin û ew dijminatî hîn zêde bû. Şah çû ser Şah-Verdiyê Lor, piştî sê salan wî îtaat kir û bi ser vê de Şah serokên Bayatan kuştin.(131-252) Ji Bayatan Huseyn Elî Beg bû balyozê Spanya; Geda Elî Siltan bû waliyê Bakû; Yar Elî Siltan bû serokê kela li Erîvanê.(131-253) Bi kurtî mirov dikare bi rihetî bibêjê ku Kacar kalên Şêxbizinên îro li Anadola Navîn, Adapazari, Edene û cîhên din dijîn in...

Wekî tê zanîn li keviya Derya Reş êla Şêxbizinan heye. Gelo ew kingê çûn wir? Em baş nizanin lê dibe ku ji alî dewletê ve hatibin bi cîh kirin. Mîna Orhonlû jî dibêje: Ji bo ku xelk tevlîhev bibe, "Ji Trabzonê di sala 1487 an de eskerên xiristiyan hatin derxistin û li şûna wan ji Tokat, Samsûn, Bafra, Çorûm û Amasya xelk birin. Vê yekê ji bo rêveberiya navendî bi hêz bibe û ji bo xelkekî homojên pêkbînin dikirin.(90-104) Îhtîmaleka pir mezine ku ewên biribûn Şêxbizin in.

## Bûyerên demên dereng û girîng ên li Anatoliya Navîn

Li destpêka sedsala XVI an piraniya êlên îro Anatoliya Navîn û li Anadolê dijîn bi piranî li bakûrê Kurdistanê bûn. Ji wana Canbegê-At-Çeken li Qonya; Lek-Şêxbizin jî li dora Çorûmê bûn. Orhûnlû dibêje: At-Çekenan Qonya ji xwe re kiribûn war. Ji Afyonê heta Qeyseriyê direj dibû. Di nav sê herêmên îdarî de hatibû beş kirin; wana: Tûrgût, Eskîl, Baybûrt bû. Civata Îzzeddîn (Oxçû-Ş) jî li dora Kilîsê bû ku tevlî Hasedsalae Walîde Siltan bûn. Yeka din ê tevê vê komê jî Reşî bûn; li Meletî diman û zivistanan diçûn Sûriyê.(90-19) Tevlîbûna wan ê li Kilîsê bi kompozîyona îro li Anadolê ve hevûdu digre û heman êl li Anadolê jî hene û cîran in. Ji Îzzeddînan re Oxçû jî tê gotin; Walîde Siltan jî îhtîmaleke mezine ku Sewêdî be. Her sê civat tevhev bûne. Lekvan (Şêxbizin-ş) jî li Çorûmê bûn.(90-19) Wan komana û yên din tevhev hatin Anadolê bi şûnde pirsgirêk zêde dibin.

Bi cîh bûna Reşiyan ya li dora Semsûrê di sala 1560 an, li Mereşê jî 1563 an de destpêkir, ev yek ji defterên tahrîr tê fêhm kirin. Ew beşên wê demê bi cîh bûbûn, hê jî li Semsûr û navçên wê niştecîh in. Ew beşana êdî ji cîhê xwe ranebûn. Lê di serê beşê din re gelek bûyer derbas bûn. Kurdên li Kilîsê yên bi navê Şêxan, Amîkî, Oxçû-Îzzeddîn hema hema bicîh bûbûn û bax-baxçe û çandinî dikirin. Lê di sala 1705 an de dest bi talanê kirin. Ji ber vê yekê mal û milkên wan ji dest hatin girtin û firotin.(90-37) Êlên mîna: Barak, Bayindir, Dûrsûnlû, Reşiyan li xaka Yenî Îlê zozanên xwe hebûn. Lê ew çûn nav eyalata Rûm û nehiya Qereyel; xanî xelandin, zeviyên gel dan malê xwe ji bo ku ew ji zozanên xwe berê bêtir nerin cîhekî din. Di sala 1686 an de bala eleqadaran hate kişandin.(90-40) Ew tê wê watê ku dewletê ew hişyar kirine, yan jî wiha tê hesabê wan, lê tiştê tê zanîn ewe, ku piştî çend salan dewlet ê wan bişîne

Rakkayê. Di Çileya sala **1691** an de ji **Beg û Ketxudayê Begdilî** yê girêdayî Uskudar Walîde Siltan hasedsalai re ferman hate şandin ku wan li Akçakale (Belîh), Aynî Riz û heta Rakkayê bi cîh bike. Berê, tenê Beydilî bi cîh kirin, lê Ereban ji başûr ve êrîş anîn ser. Bi ser wê ve Bayindir, Mûsacali, Lekvanikên girêdayî Uskudar Evî jî anîn.(90-58) Êlên li Yenî Îlê dijîn yên bi cîh dikine piraniya wan Reşî ne û di navê de Şêxbizin jî hene. Lê wekî me gotî Bayindiran navê xwe dabûn Pezgewran ku ew jî îşareta kûrbûna parçebûna Kurdên koçer dide nîşandan.



**Jinên Reşî**

Reşî, êl û bavikê girêdayî wan li deştên Sûriyê bi cîh bûn şûnde, di sala 1697 an de dîsa vegeriyan. Li Torosan bi Osmaniyan re şer kirin û têk çûn bi şûnde, destûra çûyîna Nava Anadolê danê wan. Emê di beşên Reşiyan de qal bikin. Em dibînin ku fermana duyemîn jî di sala hicrî 1141 (1729) an de ji Mûtasarifê Aksarayê, kurê Momali Osman Beg re hatiye birêkirin:

**Ji Qadiyên Enqere û navçên mîna Haymana, Tûrgût, Taban û cemaatên Bozûlûs Tirkmenî, Îzzettîn û Hecî Ahmetî yê li Qeremanê niştecîh, Voyvoda û begên zendan re!** Qereheci yê girêdayî Mûsacalû û Yaqûbê Kose; Afşar,

Kaçar, Caber, Hecî Fatih, Neh Cemeetên Tanbûracelûyan, Ekradê Mûdan, Memavî û gelê civatên din ên ku li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin; li Rakkayê ji wan ra cîh, mal û arazî hatibûn diyarkirin, derketina dervayê wan deran hatibû qedexe kirin; zivistan û havînan li wir bi cîh bûna wan, gorî şerîatê destkeftin û bi cotkariyê debara xwe derbaskirin hatibû plankirin. Ji ber çend sedeman ji wan çend cemaat ji cîhe xwe derketine. Ji êla Mûsacelû Huseyn Kahya, serok û mezinê civatan yên ji berê ve ji hev belavbûyî kom kir û li Haymana, Tûrgûtlû û Emîrdaxê niştecîh kirin. Dûre cemaatê boy bega, komên din, Kabaabali, civatên Dokûz (neh) derketin çûn. Cemeeta Çepniyê Kandemir li aliyê Bergama, Afşar, Kaçar, Caber, Hecî Fakihî jî li aliyê Haymana û Tûrgûtlûyê bi cîh bûn. Tevgera wan aşîretana derbasî êlên din jî bû û ew hewl dayina ku sîstematîk bi cîh bibin hate hilweşandin û peymana sîstema welat hate xelandin.

Ji bo êlên mîna Mûsacali (berên xwe li wir: Çil, Oşî, Kaçar, Tanbûraci, Încî, Hecîfaki û Caber) û Kantemir Çepnisî, berpirsiyarê Aydinê wezîr Abdullah Paşa xwest 103 malên Mûsaca û 87 xane ji Kantemîr Çepnisî ji sînorên Akşehîrê re bêne şandin. Li herêma nêzîkî Sarikavak û Xana Husrev Paşa jî 100 xane Mûsacali hebûn û dixwestin wana rakin. Xelkê êlê jî got: "Li alî Erzirûm, Çildir, Amed û Mihalîçê komên me yên biçûk hene; heta ew hemû li cihekî kom nebin em narin cihekî din. Yekê jî em narin Rakkayê, emê şer bikin dîsa narin!" ji bo wê **ferman ji waliyê Akşehîrê re** hate şandin ku eger pêwîst be zorê jî bi kar bîne, sal 1729 bû.[160-806] Gor texmîna min ew jî êleka ji Lek-Şêxbizinan e.

Berên mîna Tacîr, Kiliç, Bektaşî yên girêdayî êlên koçber ên bi navê Tirkmen û Kurdler, ji bere ve li Elbîstan û Tûtarlûyê rêbirî dikirin û diçûn Alacahan, Delîklîtaş û Sêwasê û zirar didan gel. Ji bo wê ferman ji berpirsiyarê Sêwas Osman Axa re, ji serokê Reşî û Mama re û yên din re hate şandin ku rêyan bigirin û wan rêbiran jî bişînin Rakkayê, sala 1733.[160-809] Bi qasî em dizanin Tacîrlî Oxçû ne, lê yên din kîjan êl in nayê zanîn.

Tenê ne fermanên bicîh kirin, bi darê zorê koçber kirin, gelek caran jî fermanên kuştinê didan ku yek ji wana ji serokên Recepiyan re hatiye dayin. Ew jî mînakek din e ku dewletê çawa Kurd li hember Kurdan bi kar aniye. Di derbarê îdam kirina giregirên êla Recepî de: **Ji êl, boybegî, serok û gelê Pehlewan re!** Avşarên Recepî yên ku li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin reviyane û li der û dorên xwe mêrîvan dikujin û talanê dikin. Tê fêhm kirin ku ev êla ji wan karên xirab ên kirî jî tobe nakin. Kuştina wan êdî vacib e! Ji bo wê, min begêbeganî Edenê Silêman Paşayê Reşî şande ser wana. Hemû belav bûn û 200 siwariyên xwe ketine nav êlên din. Ji bo wê qetiyen kes wana neparêze û îxbar bike. Ew rêbiranên Avşarê dizin, hûn xwedî şan in û girêdayî dewletê ne. Kesên ku guh nedan vê fermanê dê bêne cezakirin, sala: 1155-1742.[161-210] Îro jî ew polîtîka li ser Kurdan berdewam e; perê û meqam dide hinekan û dajo ser yên din.

Gor lêkolînên min, Kurdên piştî sala 1697 an hatine Anatoliya Navîn

û rojavayê Anadolê bi hatine re hema bi cîh nebûne. Di nava Anadolê de jî zivistan li cîhekî, havîn jî li cîhekî derbas dikirin. Bi taybet jî ew diçûn rojavayê Tirkiyê. Carna endamên êlêkê mirov li Derya Reş û Aydinê dibîne. Carna jî ji ber ziwabûn û xelayê ew mecbûr dibûne ku belav bibin. Ew gera wan ji neçarî bû; lewra gel xwe bi pez xwedî dikir, eger hişkî û şertên wan xiraw dibûn jî ew ji neçarî diçûn der û doran. Li hember vê tevgerê nerazîbûna gelên niştecîh, dewletê û êlên din ên Kurd jî zêde dibûn. Lewra di çûyîn û hatinan de zirar didan malên gel û ji nava êlan gelek komên rê dibirî, şêlandin dikî û êrîşî gundan dikî jî derdiketin. Ji ber vê gelek ferman û zordariyên dewletê hebûn.

Ji bo êlên Kurdên di sala 1697 an de hatine navenda Anadolê em dibînin ku ji bo cîh kirina wan di sala 1729 an de fermanekê tê dayîn. Ji wê jî em fêr dibin ku hinek êl çûne dora Qers û Erzirûmê. Ferman wiha ye: **Ji êlên ku werin bi cîh kirin re! Bedilî (Badili), Reşiyên girêdayî Îsmaîl** (-rêberekî êla Sêvika yê bi vî navî jî heye û koma girêdayî wî niha li Cîhanbeyliyê dijîn. Gor Necîp Şahîn ew Îsmaîl di sala 1851 an de miriye, lê ew ferman di sala 1729 an de ye. Yan navê wan mîna hev in, yan jî rehmetiyê Şahîn şaşiyê dike.), Ûstûrikan, Kurdîkan, Hecîkir, Cemokan, Ûzman, Adaman, Zivan, Parîçkan-Acûr, Kaskan ên girêdayî Milî Kebîr, Perdel-Tacîrî, Gundeş, Kuçuk û perekende ji Rakka reviyabûn, li Erzirûm, Qers, Çildirê dijîn bên girtin, kesên ew pê bawer dikin wek rehîne bên zîndan kirin û Rakkayê re bên şandin, ji begên Erzirûm, Qers û Çildirê re ferman hatiye derxistin.(160-808)

Di wê dema tevlîheviyê de em dibînin ku dûmahiyên zenda Qeremanî ji Mersînê têne nava Anadolê. Li ser wê Sumer wiha dinivîse: Tirkmenên ji Îçelê hatibûn piranî ji zenda **Qeremanî ne**; Îçel di dema Beyazidê II an de li şeş herêman hatibû parçe kirin. Lê êlên li wir hîna jî rêxistina xwe ya êlan xira nekiribûn; ji wan Bozdoxan li (Silîfke), Yîva (Anamûr), Oxûz Han (Selîntî, Anamûr), Bozkir (Taşlik û Silîfke), Bexdilî (Gulnarê), Şam (li Taşlik û Silîfkê) dijîn. Di dema Beyazîtê II an de ji Silîfke û Taşlik-Silîfkê milên giring hatin navenda Anadolê û **Qoçhîsarê**. Dîsa ji wir hinek çûn Qibris û Antalyayê jî.(131-200) Îro li dora Qoçhîsarê bi piranî Reşî dijîn, ewên ku hatibûn man an neman û kîjan êl bûn em baş nizanin. Lê hinek ji wan em dizanin ku wekî berê jî me gotibû: Yîva êlên Şêxbizin in, Şamî pismamên Sêvikan in, Bexdilî Reşî yan jî dibe ku Têrikî bin jî; lewra di wata herdûyan de bi kar tê.

Afşar, Reşî û Tirkanliyan bi hev re îttîfaq dikirin. Di sala 1846 an de mutasarifê Bozok û Qeyseriyê, Celalettîn Paşa ji navendê re ragihand ku rêbirên wan 2000 xane ne. Ew ji gelê Qeza Gedîkcîkê ji 7000 zêdetir heywan dizine.(171-235) Tirkanliyên navê xwe derbas dibe, Têrikî ne; Afşar jî gereg Celikî bin. Dema mirov li hejmara xanan jî mêzedike, ji wê tê fêhm kirin, ku hîna jî ew bi cîh nebûne. Di hinek jêderan de, em rastî tarîxa bicîh bûna berî wê demê tên, lê mumkune ku ew nîv koçer bin. Yanê zivistanan li gundan rûdiniştin û havînan jî diçûne koçberiyê. Lewra di wê demê de êla Nasirî 125 xane ne. Vê dîtina min Hûtteroth jî dipejirîne.




Tevgera Zendên Kurd

Wekî me gotî, êlên hatibûn Anadolê ji ber ku debara xwe bikin, pezên xwe xwedî bikin û zikên xwe têr bikin carnan zirar didan gelê niştecîh. Dr. A. Saydam ji bo wê belgeyeka gîliyan radigihîne: Di sala 1840 (1256) an de, ji êlên mîna Reşî, Tirkan, Şêxbizinî yê li Aksaray, Siltanhani, Emîrgazî, Kolûkişla, Esbkeşan û Îlginê zirarê dane gel û lawê muxtarê gundê Gozluyê birîndar kirine û hêzên di fermandariya Xurşîd Axa de jî têk biribûn û tevlî êla Umranli bûbûn. Dîsa Lek, Afşar, Kirinti û Kûzûguden jî êrîşî gel kiribûn. Hinek bûyerên wê deme (1848) wiha ne:

| Xwediyê Giliyê | Bûyer |
|---|---|
| Qeza Gelemfed gelê **êla Xelikan** | Qerebekîrê ji êla Kûzûguden bi siwariyên xwe ve û 28 **Afşaran** ve êrîş kirine û 825 miyan dizîne. |
| Xelkê Paşa Çayiri-Sêwas | Reşiyan 259 sewal, alavên malan, kinc û pere dizine. Ew dîsa li xwediyan hatiye vegerandin. |
| Di 1841 an de | **Mamalû**yên girêdayî Reşiyên Bozok, bi qasî 24.175 quruşan mal dizîne. Dîsa li xwediyan hatine vegerandin. |
| Gundê Çakmak-Yildizelî | Kurdên rêbir 17 hesp û 8 sewalên din dizîne. |
| Qeza Gelemfed Gundê Bayindir | **Afşaran** 11 hesp dizîne. |
| Qeza Îlbey Gundê Sur-u Koncak, Xelîl | 15 rêbirên Afşaran êrîş kirine, 27 hesp dizîne û hespê Xelîlê şopger jî kuştine. |

Hûtteroth di derdora salên 1959 an de diçe Anadoliya Navîn û li gundên wir digere. Di heman salê de pirtûkek nivîsî ye û navê wê jî kiriye: "Di Torosên Navîn de, koçberên çiyayî û gundiyên zozanan" û çap kiriye. Gor wî nivîskarî, jiyana êlên li Anadolê yên mîna Reşî û Canbegan ên bi yên Kurdên li rojhilatê başûrê Torosan dîjîn ve wek hev e. Dîsa gor tespîta wî, koçberiya êlên li Anadolê piştî 1870 teva bû û ew bi tevahî derbasî jiyana niştecîhî bûn. Wê çaxê Kurdên Xelîka (Dondurme) gotiye: "Em di sala 1858 an de bi cîh bûn; Qeregedîkî di 1846 an; Bûrûnsûzşereflî 1844 an; Bûldûk-Sêvika 1853 an û Şêxbizinan jî gotine sala 1800-1810 an de em bi cîh bûne.(165-22) Ew tarîxên têne dayîn hema hema ez jî rast dibînim. Tenê gundiyên Sêvika dibêjin ew di sala 1842 an de bi cîh bûne. 2000 malên ku wek rêbir têne dîtin ew Kurdana ne; mumkune ku Şêxbizin di nava wê de tunebin.

Bi cîhkirina êlan ya di salên 1841-42 an de, di rojava Hikumetê de bû. Tê fêhm kirin; ku tevgera yekemîn û ya girîng, hinek komên êlên Reşiyan û Molûkan yên li gundên sencexa Bozok, wek du-sê xane hatin belavkirin. Heciyan xwedî 147 xane û 347 serhejmara wan heye, ji Kûredaxi hatin heynan û li

gundên Haymanayê hatin belavkirin. Dîsa Têrikî yên xwedî 56 xane û 171 serhejmara xwe heyî li kasaba-i Zir û Murtazaabad a Enqere hatin bi cîh kirin. Êla Taban ya xwedî 35 gund û 1230 xane li Tabanlûya girêdayî Enqere hatin bicîh kirin û pêwîst bû ku ew ji şeş mehan carekê hejmara xwe pêşkêş bikin.(171-250) Ew belav kirin, îro jî di nava gundên li navenda Anadolê de xuya dike. Dema malbat tên hejmartin mirov dibîne ku hinek ji êlên din hatine û hinek jî di dûre tevlî bûne. Lê zêde kes nizane ku ji ku û çawa tevlî bûne.

Di sala 1843 an de, Sirozlu Ahmet Paşa waliyê Qonyayê bû û ji Reşiyan 1600 kesan zêdetir li Esb-i Keşan (Cîhanbeylî) bi cîh kir. Lê wan di demeke kin de dîsa berbi Sêwasê firar kirin. Di sala 1848 an de tenê 200 xane mabûn. Tê gotin sedema wê jî waliyê Qonya Hesen Hakki ji wan pere, mal û hesp xwestibû. Ji ew kesên reviyabûn di sala 1847-1848 an de 517 xane dîsa bicîh kirin:

| Dem | Êl | Xane |
|---|---|---|
| 1846-47 | Nasirî | 125 |
| " | Sefkan | 110 |
| " | Cûtikan | 50 |
| 1847-48 | Celikan | 100 |
| " | Sefkan | 33 |
| " | Umran (Omera-Ş) | 30 |
| " | Îlxan | 25 |
| " | Belikan | 25 |
| " | Mûlûkan | 10 |
| " | Komekûşaxû | 9 (171-247) |

Ew belge gelek teferûatan dide me; Nasirî îro 4 gund in û serhejmara wan dikare bigihêje 20 hezaran. Sêvika jî pênc gund in û hejmara wan 15-20 hezar in. Komekûşaxû îro wek Gundê Kutuga derbas dibe. C. Turkay vê êlê wek Kutukanli-Kûlûkanli û Ekradê gocerên girêdayî Mila-Kebîr nîşan dide,(160-550) ku em jî rast dibînin. Bê guman Celikî û kesên ji êlên din piştre tevlîbûne em hesap nakin. Ûmranlûyan jî Turkay wek **Omeran**, ekradê yoruk û nîvkoçerên girêdayî Reşiyên Mila nîşan dide.(160-748) Omerî girêdayî Reşiyan e, lê ew hejmar ya beşekî wan e; lewra Omeriyên li Anadolê ji wê hejmarê zêdetir in. Ji bo Îlxanliyan jî heman nivîskar dibêje, ew ji Mûsacalûya ne, lê min pê dernexist ku kîjan êl e.

Di bicîh kirina êlên Kurd de, dewletê her rê, ji xwe re rast didît, ji bo riyan ti pirsgirêk tunebûn, serokên êla dîl digirtin, ji gel bi zorê mal û pere distendin û gelek rêyên din bi kar dianîn. Saydam dibêje: Vecîhî Paşa got, eger êl ji dil werin li Ûzûnyaylayê bi cîh bibin, ezê erd bidim wan. Wî dixwest êla Haremeyn (ew gereg Cutikî bin, lewra hîna jî bi vî navî tên bilêv kirin-Ş) li wir bi cîh bike û rê li ber talana Afşaran bigire. Vecîhî Paşa çû Yozgatê û bi serokên êlan re û bi taybetî jî bi Reşiyan re peyivî. Ferman da ku heta ew bi cîh

bûna pêk hat, begên êlan bikin bin çavan. Bi bicîh bûna Reşiyan re, êlên din jî bi hêsanî bicîh bûn. Malê ku êlan dizîbûn ji destê wan hate girtin û bi îlanê li gelê herêmê yî maxdûr bûyî hate belav kirin. Bi vî awayî ji Reşiyan 2400 kîs, ji Lek, Afşar û Kirintiyan 3000 kîs pere li kesên gilî kiribûn hate belavkirin. Ji 600 Reşiyên hatibûn girtin 200 avêtin zîndanê û 400 jî bi kefalet hatin berdan. Serokê Reşiyan 2000 akçe teklifê walî kir ku dev ji bicîhkirina wan berde, lê wî qebûl nekir. Serokê Canbegan **Alîşan Beg** ji bo bicîhkirina Reşiyan hatibû wazîfedar kirin, lê wî jî bi zorê pere ji gel stendibû ku di lêkolîna hatî kirin de, ew rastî derket û hate tazmîn kirin.(171-250)



**Gundiyên Bilikan**

Vîtal Cûinet di pirtûka xwe ya bi navê "La Turquie d' Asie" de, di derbarê Kurdên derdora Enqere de wiha dibêje: "Di nav sînorên wîlayetê de Kurdên koçer jî hene. Bi tevahî ji neh êlan pêk hatine:

1. Reşî: Bavên xwe hinek ev in: Misirî, Quaranî, Xelikan, Şilikiyan û hwd.
2. Şêxbizin: Xorasanî, Heyvedanî, **Leranî**, Jirdikiyan û Nosalanî.
3. Badilî
4. Têrikî
5. Mikaîlî
6. Cambegî: Gurekî, Derweşanî, Tûzonanî, Topîşaxî û Toîkiyanî
7. Seîfanî (Sêvika).
8. Koyîbanî: Alîkiyanî, Nafkiyanî
9.Atînanî: Gêzeranî, Celikanî, Dawûdan û Elîasanî (min rast nivisî).[174-79]

Mirov nizane ku Vîtal ew nava ji devê gel an ji jêderên din girtine, lewra mirov ji bilî Xelika nizane ku êlên girêdayî Reşiyan yên din kîjan in. Di nava êlên Şêxbizinî de jî navê êla Xorasanî balkêşe û ew jî îspateke ku ji wir hatine. Dîsa navê Leran jî bi vî awayî ye, ku heta vir min gelek caran qal kir. Em nizanin Alîkiyanî û yên din jî kîjan in, lê li ser êla Alikanê agahiyeka wiha heye ku ne diyare ew herdû yekin, an na? Alikanê (di navbera Sêrt-Qozlix û Mûş-Kurtikê de terin û tên) koçber ji 8 qebîlan pêk tê: **Cûdikan**, Çengovan, Ozigan, Necîman, Mehman, **Birîvan**, Şehîdan û Şeheven (gereg Şahseven be-Ş) in.[167-76] Êlên li Anadoliya Navîn ên girêdayî Reşiyan yek jî Cûdigan-Cûtikan e; îhtîmaleke ku bi êla di nava Alikan ve yek bin. Yek ji Birîvan e ku li Xorasan jî gelek berên Birîvanê hene û ji alî ziman, civak û rûhî de wek yên Anadolê ne.

Dr. Abdullah Saydam niqteyeka balkêş tîne ziman, ji bo ku mentalîta dîroknûsê Tirk bê fêhm kirin girînge ku em li ser rawestin: Tiştê bala me kişand; êlên li Anadoliya Navîn di salên 1839-1853 an de bi cîh bûne nêzîkî 40 000 kes in û bi piranî di qeydên dewletê de ew wek "ekrad" hatine nivîsîn. Mirov vana hemûyan Kurd bihesibîne şaş e, lewra em ji sedî sed dizanin ku ew **Afşar, Lek, Kirinti, Reyhan, Kûzûguden Tirkmen in**. Ew jî tê wê watê ku Osmaniyan zêde girîngiyê nedidane etnîsîtê.[171-255] Ji vê şirovê em fêr dibin ku serhejmara Kurdên li wê herêmê bi cîh bûyî 40 hezar kes bûne, ew girînge. Mirov dikare ji wir nifûsa nû jî hesab bike. Wek mînak: Sêvika wê demê 143 xane ne (gundê Bûldûk di 1940 an de texmînî 100 xane, îro jî ew ji 1000 xaneyan zêdetir e), di her xanekê de em 6 neferan hesab bikin dibe 858 kes. Îro jî serhejmara wan nêzîkî 18 hezaran e; yanê 21 caran pir bûne. 40 hezar jî 21 caran pir bibe dibe 840 hezar kes. Di dûre jî kesên tevlî bûne mirov hesab bike dibe yek milyon. Saydam, gor qeydan tevnagere û dibêje: Afşar, Lek, Kirinti, Reyhanlû, Kûzûguden Tirkmen in. Ew êl û zendên ku hejmartin Şêxbizin, Celikî û Kurmancên din in. Ew jî ispateke ku çawa navê Kurdan guhartine.

Di heman demê de li bakûrê Kurdistanê jî hinek parçê êlên li Anadolêye ji alî Beyazidî ve hatine ragihandin. Di salên 1850-56 an de rewşenbîrê Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: " Êlên ku li Aleşkerdî (Eleşgirt) û li gundên wê dijîn ev in:

| | |
|---|---|
| Memtî | 400 xane |
| Banokî | 50 xane |
| Bilincanî | 50 xane |
| **Berazî** | **150 xane** |
| **Millî** | **50 xane** |
| Dilkî | 50 xane |
| Mankî | 50 xane |
| **Şadî** | **100 xane** |
| Horkî | 100 xane |
| Îwazlî | 50 xane |
| **Mirdîsî** | **60 xane** |
| **Siwêdî** | **70 xane** ne. |

Dîsa yên li Wanê yên ku bi navê Ekradan tên nasîn û girêdayî Şikakan in û axayê wanî her dem jî ji mala Hemze Begê e êlê xwe ev in:

| | |
|---|---|
| Şikakî | 800 xane |
| Şemskî | 300 xane |
| Takorî | 200 xane |
| Miqrî | 300 xane |
| Şûyî | 200 xane |
| Lûwî | 200 xane |
| Ademî | 500 xane |
| Sê Çarikî | 100 xane |
| **Reşî Yezidî** | **200 xane** |
| Mendkî Êzîdî | 200 xane |
| Barawî Êzîdî | 150 xane |
| Bilekortî Êzîdî | 100 xane |

Herwiha êlên li **Amedê** û derdora wê jî wiha radigihîne:

| | |
|---|---|
| Millî | 4000 xane |
| **Qere Çorî** | **3000 xane** |
| **Badilî** | **2000 xane** |
| **Reşî** | **6000 xane** |
| Lork | 8000 xane |
| Sîlwî | 4000 xane.[177-1] |

Êlên girêdayî Milan bi piranî di qeydên dewletê de wek Sîl-Supuren derbas dibe; ew ji mêraniya wan dihatiye ku cîhên derbas dibin hemûyan reş dikirine û kesî nedikariye li hember bisekine. Ewe li dora Keskînê bi cîh kirine. Sîl-Supurên ji Cerîdan jî li 12 gundên Keskînê bi cîh bûne, li milê Cerîd î esasî li gundên Cerîda biçûk û ya mezin a girêdayî navça Çaxlayan Cerîda li Mereşê bi cîh bûbûn. Sîl-Supuren li Rakkayê mêraniyeka mezin nîşan dan. Avşar jî li Sariz û Zamantiyê bi cîh bûn. Lê bê şensiya mezin ewe, ku zozanên wan dane mihacirên ji Qefqasya hatibûn.[131-216] Avşar îro jî li wê herêmê dijîn û ji wê re Tapkiran-Sine Milî tê gotin.

# REŞÎ

Tarîf kirina Reşiyan gelek zorê, ji ber ku ew koma carna û li hinek cîhan federasyon, li hinek cîh û deman konfederasyon û li hinek deman jî mirîtî û dewlet e. Mirov dikare wekî pûzelê jî bi nav bike; li hinek cîh û deman êl ketina navê û piştre derketine; jihev veqetiyane û gor şertên demê şikl û navaroka wê tê guhartin. Ji bo wê jî wêneyekî ji wê komê yê safî dayîn pir zehmete.

Li ser wata navê Reşî Hoko dibêje: Reş=mezin; Reşemêreke=mêrekî mezin; pirtûka pîroz a Êzdîtiyê=Mishefareş û Çiloyê (=Huzwareş).(32) Reşiya di nava pirtûka pîroz de derbas dibe jî bi ditina min ji vê konfederasyonê tê. Li ser nav li derdora Semsûrê di nava gel de tê gotin ku ji **rişandinê** tê, lê ti girêdana wan bihev re tune. Wekî me di beşên derbasbûyî de jî gote, di dema Xorriyan de navê Çûxreşiyan, piştre di dema Medan de Reşan, paşê jî Êba Reşan, Kum Reşane hene û dibe ku ew nava ji cilên reş ên li xwe dikin jî girtibin. Ev alternatîfa yekemîn e. Ya duyemîn jî ev e, ku ji mêraniyê-egîtiyê hatibe wergirtin. Heta roja îro di nav Kurdên li Anadola Navîn de gotinek heye û dema yekî karekî mêranî kir ji vê re dibêjin: "Qeremanî Reşo!" yan jî "Şêrê Reşo!" xuyaye ku têkiliya xwe bi merxasiyê re heye. Yekê jî di nav civak û jêderan de gelek cûreyên wî navî hene, wek: Reşwan, Rişwanlû, Rişî û hwd; mirov dikare 50 navî bi wî rengî bijmêre, lê ya rast Reşî-yan e. Ew navên din hemû ji alî gelên biyanî û dewletên dagirker ve hatiye dayîn.

Navê Reşiyan û êlên girêdayî Reşiyan mirov dikare li erdnîgareka gelek fireh rast were. Ew yeka jî bi pêvajoye dîroka ew tê re derbasbûne ve girêdayî ye. Wî navî mirov dikare li Afganistan, Xorasan-Îran, Gîlan-Îran, Qefqasya, Erzirûm, Qers, Dêrsîm, Meletî, Semsûr, Dîlok, Germiyan, Kilîs, Heleb, Hama, Humus, Lazqiyê; navenda Anadol û gelek bajarên li Anadolê bibîne. Eger mirov cîhên êlên girêdayî Reşiyan jî bijmêre, divê mirov bi hezaran cîh û war binivîse.

Berê jî min nivîsîbû, ku Reşî parçeyek ji Xorriyan e; piştre em wana di nava Saka de (bi gotineka din Saka Reşî bi xwe ne) û alîkariya bi Medan re dibînin. Li ser girêdana Saka, mêjiyê dîroka Tirkan C. Turkay dibêje: **Cemeeta Rûmiyan-Rûmiyanli SAKA Yûsûfê ji êla Reşiyan e**. Ew li: Siwerek, Semsûr, Nîzîp, Bîrecîk, Rakka, Dîlok, Erzirûm, Qers, Çildir, Ahiska, Sêwas, Meletî, Tokat, Qereman û Aydinê dijîn.(160-637) Ew nav ne tesadufe; heta vir jî me gelek caran têkiliya Reşî û Sakan car caran îşaret pê kiribû. Rûmiyanli berî Tirk werin Anadolê hatibûn dora Sêwasê, piştre jî çûbûn Îranê û hîna jî li Xorasanê ew bi vî navî hene, Kurmanc û Reşî ne. Rişwanoglû jî şiroveyeka gelek balkêş dike: Gelek êl ji Hindîkûş, çiyayên Elbrûzê di welatê Goran re derbasbûn û hatin Kurdistanê. Di nava wan de **Reşiyên ku bûne Tacik û şaxekî Saka ne jî hene. Zekî V. Togan jî dibêje: Reşan/Roşan Sakayên koçber in**.(128-149) Bi rastî lêkolînên min jî didin xuyakirin ku têkiliya Tacik û Reşiyan-Kurdan yê nêzîk heye; lê ji bo wê pêdiviya lêkolînên zêde û serbixwe hene. Hêvîdarim kesek wî

karî hilde ser milên xwe û wê babetê ji miletê Kurd re ronî bike. Yekbûna Saka û Reşiyan, ji alî wan nûseran jî tê pêjirandin ku rastî jî ewe.



**Giregirên Reşiyan û Înonu**

Heta vir min gelek caran têkiliyên gelên ji navenda Xorasan û Kurdistanê û Anadolê destnîşan kir. Gor lêkolînên li Samsatê hatî kirin de îspat bûye, ku ew bajara 6000 sal BÎ ji alî gelê **proto-Hititên** ji Asya Navîn hatine ve hatiye damezirandin. Gor belgeyan cîhekî giring bûye. Dîsa di defterên Osmanî de hatiye dîtin ku di sala 1560 an de li gundê Zortî (Zertî) civata Reşî lê bi cîh bûye.[109-71] Di dema Xorriyan de jî gelek êl ji Helebê terin dora Derya Kesk û bakûrê Kurdistan ku ew kalên Reşiya û Kurdên li dervayê welat in.

Dîrokzanê Kurd Îzady jî têkiliya Xelikên girêdayî Reşiyan û Xorriyan wiha diyar dike: Êla Xelikan îro li Hewlêr, Kirmanşah-bi navê Qalxan, Qonya-Enqere, Xorasan, Tirkmenîstan û Ermenîstanê dijî. Jêderên yekemîn nîşan didin ku ew cara yekemîn di navbera bakûrê Gola Wanê û Erzirûmê de jiyane. Di dema antîk de, **yek ji êlên Xorriyên dora Wanê Xelikan bûn**.[154-160] Dîsa ji Ksenophon wiha radigihîne: di berhema xwe bi navê "Cyropaedia" de, ji cîhekî li bakûrê Kurdistanê û ji gelê çiyayî bi navê Haldîan/Keldanî dirêj dirêj qal dike. Îro jî ew êla wek Halidî, Halikan, Qalxan berdewam dike.[154-157] Bi dîtina min jî tespîta wî raste.

Em dizanin ku Reşî di nava dewleta Şadî de hebûn, lê heta dema Moxolan û piştî wan navê Reşî zêde dernakeve pêş; navê êlan li pêş e. Ji bo wê mirov carna dipirse, gelo Reşî piştî zext û zora Moxol û Tirkan bûn konfederasyon? Yanê li hember êrîşên wan neçar man ku hêza xwe bigihînin hev? Ew alternatîfa jî heye; lê pêdiviya îspatê zêde heye. Hinek jêder dibêjin: Dema desthilatdariya Dulqadiran (sedsala XIII an) li Mereş-Elbîstanê xwestin sînorên xwe fireh bikin, bi êlên der dorê ve ketin şer. Bi vî awayî bi Atma, Çakal, Begdilî, Kabalar û bi milên din ên Reşiyan ve her tim di şer de bûn. Êlan gelek zirar dîtin û nikarîn herin zozanan. Lê mirov dibîne ku Reşî di nava Dulqadiriyan de jî hene. Mumkune piştî wan şeran ew jî ketibin nav.

Gor Şerefname dinivîse Reşiyên wê demê li dora Heskîfê bûne. Navê wî bajarî jî "Re's el-Qule" derbas dibe. Gelo wata wê ne Kela Reşan e? Ji rîwayetan tê neqil kirin ku di sala 1264 an de, li Misr û Şamê, dawî li desthilata Eyyûbî hat û rewşeka wan ê xwe li ser piya bigire nema. Zarokekî ji vê xanedanê xwe li Hemayê veşart; piştre çû Mêrdînê. Lê nikarî li wir bimîne û berê xwe de Re's el-Qulê-Heskîfê. Sêzdeh êlên girîng li Kela Reşan hene: Aştî, Mihalbî, Mîhranî, Becnewî, Şeqaqî, Îstûrkî, Kurdlî Mezin û a Biçûk, **Reşan**, Kişkî, **Cilkî**, Xendeqî, Suhanî û **Bidyan**.(157-191) Ji vê agahiya girîng em dizanin ku Reşî li wir hebûne. Dûre em dizanin ku li wir Celikî û Reşî ji hev cûda têne hejmartin. Dîsa Bidyan-Biyan jî em dizanin ku **Oxçû** ne. Hinek dîroknûs van êlana di bin sîwana Reşiyan de kom dikin, lê bi dîtina min ew ne raste. Dibe ku mirov û xismên hev bin û mil dabin hev, lê ne yek federasyon e. Dikare bibe konfedarasyon. Xaldî, Dêrmexarî û Îzzeddîn-Ezîzan jî êlên Kela Reş bûn, lê li Sason rûdiniştin.(157-225) Hesenê Dirêj Kela Reşiyan girt bi şûnde; Melîk Xelîlê xwe li Hemayê weşartî, vegeriya û bi alîkariya Mihemmedê Şêrwanî Sêrt heyna û bi riya aştiyê jî Kela Reşiyan rizgar kir.(157-195) Mirov dikare ji wê bûyerê jî xismatiya Eyyûbiyan û Reşiyan an jî êlên Kela Reşiyan bibîne. Paşê, dema Şah Îsmaîl hate welatê wî, ew bi xwîşka Şah re zewicî. Piştî demekê ji wexta bi Şah re îtaata xwe diyar kirin, li Tebrîzê ew girtin avêtin zîndanê. Yek ji wana Melîk Xelîl bû, ew fermandarê hatî teslîm kirin jî Zeynel Begê Şamlû bû. Dema Melîk di zîndanê de bû, êla Şêrwan, Zirkan û yên din li hev kiribûn û Melîk Silêmanê kurê Melîk Xelîl ji bo fermanrewatiya xwe hilbijartibûn. Lê êla Reşan tevlî vê hevkariya han nebûbû û pismamekî Melîk ji bo serokatiya xwe helbijartibûn.(157-195) Wê demê Zerikî di nava wê konfedarasyonê de ne, lê xuyaye ku piştî wê bûyerê ew yekîtiya wan belav dibe. Piştî wê bûyerê jî gelek caran em dibînin ku ew federasyon ne li cîhên cûda bin jî benda hev bernedane û hevkariyê kirine.

Ji hatina Tirkan û Moxolan bi şûnde, gelek êlên girêdayî Reşiyan (Rûmiyan) çûn Îran û Arranê. Hinekan jî di bin navê mîrîtiyên li Anadolê de jiyana xwe berdewam kirin. Piştî ewên li rojavayê Anadolê hatin bakûrê Kurdistanê em dibînin ku ji Reşiyan beşekî li dora Meletî û Semsûrê ye. Di sala 1516 an de Yawûz Selim êrîşî rojavayê bakûrê Kurdistanê dike. Meletî û

Doxanşehîrê di sala 1519 an de begliga Besniyê (Girêdayî eyelata Mereşê) ye kete destê Tirkan. Serokatiya sencaxê Alî Beg hat û Meletî bi Besniyê re hate girêdan. Di vê demê de êla herî mezin Reşî ne û Atmali bi Çakalli ve girêdayî wan ve Doxanşehîr û der dorê ve wek welatê xwe bi kar dianîn. Gor hejmartina serhejmara di sala 1560 an de ji bac stendinê li Meletî û gundên wê hatî kirin de; serhejmar wiha ye: 26 navçe, 672 gundên xwe hebûne û bi gîştî 31.148 kes li vê herêmê dijiyan (Deftera Tahrîra Dema Kanûnî).(15) Bê guman berî wê demê gelek Kurd li hemberî êrîşên Osmaniyan goç kiribûn. Êlên Reşiyan sedsala XVI an li sancexa Meletiyê war girtin û zivistanan jî diçûn çolên Sûriyê.(90-19) Wê demê hîna berbi bakûr nediçûn.



**Gundiyên Reşî**

Ji defterên wê demê ve mayî tê fêhm kirin, ku beşek ji Reşiyan di sala 1560 an de li Kahta-Turus, Paginikê, Kozkenar, Hartût, Încîrlûyê bi cîh bûne û çandiniyê dikirine. Dîsa li gundê Tiginkar-Kahta aşê Hemze Axa hebûye.(176-44) Berê jî min gotibû ku ew Reşî hîna jî yên nîştecîh in. Dîsa di sala 1563 an de Reşiyên di nava eyaleta Mereşê de bi cîh bûne û çandiniyê dikirine.(176-44)

Li ser wê xalê di deftera Tahrîra Meletî de wiha tê nivîsîn: "Girêdayî Kaza-î Kahta; mezraî Kozkenar, Hartût, Încîrlû Reşî lê çandiniyê dikin.[97-337] Girêdayî Nehiya û Qaza Kahta Teroş jî mezra Alî Taş, Tûralî Bûrcî, Çakal, Keferkeros, Babek, Akpinar, Kûyûcak, Kepîrlî, Tahnalû jî Reşiyan çandinî dikirin.[97-413] Qeza Semsûrê gundê Mermer û mezrayên mîna Meşhedî û Kargilyuce; mezra Înablûca ya gundê Koprullu; gundê Geranî, Hosterî Kuçuk, Gûyez, Exdîr, Taşbûdak, Nûman jî hinek ji wan in.[176-44] Li wir nav lênana gundê Meşhedî girînge, ew jî delîla vê ye ku ew ji Xorasanê hatine. Dîsa di deftera Tahrîr a Meletî de: Mezra Veranî, Bilviranî[97-430]yê hene ku li Xorasanê jî ew navana hîn li ser êlên Kurd hene. Ji bo wê hatine, me li dora Semsûr û Kolikê lêkolîn kir û ji şêniyên wir pirskir ka kengê û çawa hatine; sê dîtin derketin holê:

**1- Osman Yucel (Ji gundê Kilîsk û ji êla Çelebî):** Di dema Selçûqiyan-Ertûxrûl Beg de ji Îranê hatine. Reşî bi hev re hatine û li Torosên li dora Kolikê bi cîh bûne…

**2- Galip Dede (Ji êla Xidirsoran):** Reşî ji Xorasanê hatin. Kîngê em nizanin, ew êla xwe Tirkmen dizane û Elewî ne.

**3- Elî Fatkimê (Ji Kolikê):** Reşî di sala 1700 an de ji Îranê hatin û li Kolik, Enqere, Qonya, Kirşehîrê bi cîh bûn. Reşiyên eslî ji herêma Enqere hatin. Ji van hersê ditinan ya yekemîn hîn bi giranî tê qebûl kirin. Bi dîtina min di her gotinekê de rastiyek heye: Rastiya yekemîn ew ji Xorasanê û di dema Selçûqiyan de hatine. Xwe Tirkmen zanîn jî me gelek qal kir…Ji Enqere hatin jî raste; mîrîtiyên (Germiyan, Qereman…) li rojavayê Anadolê wan Kurdana damezirand û ji wir vegerîn Kurdistanê.

Yrd. Doç. Farûk Soylemez radigihîne, ku di sedsala XVI an de Reşiyan li Kahtayê zivistan derbas dikirin, havînan jî diçûn nehiya Subadra û gundê Surguya Besniyê. Li Surguyê derbendekî mezin heye ku Reşiyan riya vî gundî bi kardianîn. Îro li zozana navçeya Surgu ya li Doxanşehîr-Meletiyê nav û şopa vê êlê hîna jî heye.[176-43] Çima nediçûne Sûriyê em nizanin, bi dîtina min nivîskar di vir de şaşitiyê dike, eger ne wiha be sedemeke wan digire divê hebe ku li Kolikê zivistan derbas bikin. Di hinek defteran de, şûna navê Reşiyan pir caran **Asvan** jî derbas dibe. Wek mînak, wiha derbas dibe: Karyaî (gund) Zernî tabî êla Asvan çandiniyê dikin.[97-405]

Hemû belge û jêder nîşan didin ku di sedsala XVI an de Reşî li dora Semsûr, Mereşê dijîn û zivistanan jî ew diçûnê Sûriyê; di vê yekê de guman û şik nîne. Bê guman komkujiyên Selîm û serhildanên Celalî-Reşiyan jî bûn sedama gelek koçberî,


**Reşî-Gundê Kilisk**

cîh guhartin û bi darê zorê bi cîh kirinê. Di heman demê de Reşî jî wek gelek êlên din parçe bûn; êl û federasyonên di navê de hatin guhartin.

Beşêk jî dîsa çû Xorasanê. Berê jî me got, ji komkujiya Reşî û êlên din ya di sala 1578 an de Muratê III ferman derxistibû û Hoko, ji çavkaniyê xwe radigihîne (Reşwendiyan) di sala 1601 an de ji Anadolê hatine derxistin. Ew li Kilîşim, Laye, Kakostan, Behramabad, Kiya Kelaye, Hesenabadê û li bajarê Siyahgul û Şardirmen dijîn. Ola wan Dawidî ye.(32) Ew Reşiyên li wir, yanê li Gîlanê min dîtin, di nava çiyayên başûrê Derya Kesk de dijîn. Lê gor K. Tewahûddî ew piştre şandine wir. Piştî wê tevlîheviyê em dibînin ku beşekî ji Reşiyan, bi taybet yên nîştecîh li herêmên xwe bûne desthilatdar. Di heman demê de ew tê wê watê ku ew bi Osmaniyan ve li hevkirine û bi awayek otonom jiyane.



**Reşiyên li Gîlanê**

Ji bo wê N. Sakoglû navê gelek began dinivîse: Begên Besniyê (1650-1850) ji Reşiyan in û 200 salî li ser Mereş, Meletî û Besniyê xwedî gotin bûn. Ji vê komê gelek Mîrê mîran derketin, ew: Xelîl Paşa, Omer Paşa, Mehmet Paşa, Silêman Paşa, Abdurrahman Paşa, Omer II. Paşa, Abdurrahman II Paşa ne. Dewletê nediwêrî ji derve birêvebir ji wan re bişine. Mînaka herî baş Begê Besnî ye, baca sê salan komkirî ku 123 hezar kuriş bûn û jê kurişek ji dewletê re neşand. Ew jî hêz û qudreta wan dide xuyakirin. Koma Reşî di vê herêmê de şêlandin jî dikir. Tewerê gelek caran qenterên dewletê yên ji Bexda dihatin

û karmendên dewletê jî dişêlandin. Dewletê nediwêrî nêzîkî Reşiya bide û jê re çavê xwe digirtin. Wek mînaka di sala 1750 an de pêk hatî: Silêman Paşayê Reşîzade bi 2000 siwarî çû Darendeya dervayê sînorên wan, çar rojan ma, ji gel êm, xwarin bê perê stend û ji gundan gelek xugî civand.

Li Elbîstanê jî tiştên bi vî rengî kirin. Li ser gelek giliyan, dewlet mecbûr ma here ser Reşiyan. Artêşeka gelek mezin di navê de top jî heyî şand ser Reşiyan. Artêşê biryargeha xwe li gundê Çixlika girêdayî Doxanşehîrê ava kir, kemin ji lêşkerê Kurd re danî, top bi kar anîn û Kurd têk birin. Eşîret belav bû, kon û malên wan hemû hate talan kirin û careke din natin. Dewletê nediwêrî ji derve birêvebir ji wê konfederasyone re bişine.[129-13] Bi ser wê de şaîrêkî ji gel wiha gotiye:

| | |
|---|---|
| Sen Rişvanoglûsun bûlûnmaz narhin | *Tu kurê Reşiyayî, bi gelek nirx î-Tu nayê kirîn* |
| Aşiklar oldurur verdîgin vergin | *Baca tu didî evîndaran dikuje* |
| Altinda arap atin elînde kargin | *Di bin te de hespê Ereb, di destê te de mertal* |
| Kollarinda çingirakli bazlar de doşer | *Di bazkên te de bazin jî hene.*[129-14] |



**Reşî-Taxa Jor a Pinarbaşi-Kolik**

Nadir Şah di dema paşeyê Osmanî Ahmetê III an de êrîşî ser Bexda (1732) kir û heta ber deriyê Bexdayê çû. Begêbeganî Erzirûm Osman Paşa bi artêşekê çû ser Nadir Şah. Osman, hêzeka di bin emrê Rişvanzade Mehmet Paşa de şande Mûsilê. Ji vir jî çû ser Bexdayê, artêşa Nadir têk bir û Bexda

rizgar kir. Nadir bi ser vê, êrîşî Tiflisê (1734) kir û şeş hezar Kurd jî di parastina bajêr de cîh digirtin.[51] Bi vî awayî em dibînin ku mîr û beşek ji hêzen Reşiyan gelek caran li kêleka artêşa Osmaniyan çûne şeran û bi wan re alîkarî kirine. Li hember vê jî li herêma ku lê dijîn mîrîtiya xwe otonom birêve dibirine. Bi hêza dewletê ya li pişt jî, ew gelek zilm û zextan li gelê xwe û yên cîran dikirine.

Di vê demê de hinek jêder qala zilma Reşiyan ya li ser gelê herêmê kirine dinivîsîn. Wek mînak: Li gundê Kirlangiç navê jinekê bi xeravî der tê. Şahînoglû, Begê Besniyê yê Baliyan birêve dibe diçe gundê Kirlangiç. Vê jinê girê dide û tîne ser kaniyê li darekê dardixe. Meha Tebaxê ye û jinik çend heftan li dar dimîne û termê wê genî dibe. Ji bînê kes nikare di rê re derbas bibe, ji tirsa Şahînoglû jî kes nikare ji darê deyne û paşê jê rica dikin û dadixin. Di sala 1838 an de nexwaşiya ku jê re "Mittika Romê" digotin (kolêra) der tê û bi hezaran mirov dimirin. Bê guman ew bûyerên wiha di dîrokê de hatine qeyd kirin, divê yên bi vî rengî yên nehatine qeydkirin jî pir bin.

Ji ber serhejmara zêde û hêza Reşiyên nîştecîh di dema Osmaniyan de herdem otonom dijîn û ew yeka ji alî gelek nûserên ve tê pejirandin. Mereş û Meletî tim di destê wan de bû ne. Yên koçber jî, ji Rakkaya hetanî Sêwasê bi heywanan re mijul dibûn û dijîn. Gelek êl û tîrên xwe hebûn. Cîhên têde derbas dibûn xirav dikirin û ji bo wan Derbent (koricitî) hatin avakirin. Di dema paşayê Osmanî Mûradê IV an de (1648-1687) fermanek di sala 1677 an de ji bo 800 kesên ji Reşiyên di bin fermandariya Rişvanzade Îbrahîm Beg yên li Semsûr û gundên wê de bi zorê rûniştin derket. Ferman derket ku ji cîhê lê nîştecîh rabin û li gundê Sixnazê girêdayî Besniyê bi cîh kirin.[39-90]

Sîstema Osmaniyan li ser êlên Kurd wek zilmekî dihate meşandin; ji êlan esker dihate girtin û ew careka din li mala xwe venedigerîn; dîsa ji êlên Kurd zêdetir bac dihate stendin û dixwestin mesrefên dewletê yên giran ji ser milên Kurdan derxin. Ew yeka li gorî demê jî dihate guhartin, yanê dema êl-Kurd bi hêz û dewlet jî lewaz dibû qet bac jê nedistend, ku me li jor mînaka 123 kurişan dabû. Kata dewlet bi hêz û Kurd lewaz dibûn jî du qat ji Kurdan distendin. Ew jî dibû sedama nerazîbûn û serhildanan. Ji Reşiyên li navça Hizn-i Mansûr (Semsûr), ji sala 1685 an vir ve, sê sal in ji baca di defterê de hatî diyarkirin zêdetir: ji salê 2507 qûriş mehane, bi navê "zamîme" ji 150.000 pezan, ji bo her 100 pezî jî 60,5 qûriş xarcirah, xer ji wê ji 100 pezî bi navê dalya 1-2 pezên ji bo has voyvodasi hatine stendin.[90-41] Eşkereye ku barekî girane û Kurd xwe nadin ber ve yekê. Ji bo wê di sala **1686 an de Reşiyan serî hildan** û gor hin belgeyan, serkeşê vê Qere Mehmûd Rişvan e. Ji Osmaniyan Cafer Paşa ew serhildana mezin têk bir û di stranekê de em dizanin ku ew ji Rakka ye û jina xwe jî keça Toraman bûye. Carekê êrîşî kela Tokê jî dike û dibêjin koka wî ya ji bavê Reşiyên li Divrîxî ye. Îhtîmaleka mezine ku ew ji Dalyanlûyan e. Di sala 1690 an de îdam dikin. Hevalên xwe jî Qere Xelîl û Bayindir Halît bûne.[129-50]

Navên serokan balkêş in; Bayindir êla ku navê xwe daye Pezgewran

ku min qal kiribû. Ji bo Reşî wê demê konfederasyoneka gelek mezine, di her firsênde de seri hildida û dewletê jî dema xwe bi hêz didît û Kurd jî lewaz didîtin êrîşî wan dikir. Bi vî awî Osmanî bi Reşiyan ve, mirov dikare bibêje ji salên 1500 heta 1800 an di nava tekoşînê de bûne. Di dema wê tekoşînê de gelek êlên Kurdên ku dixwazin xwe biparêzin jî li dora Reşiyan kom dibûn û ji bo wê mirov nikare Reşiyan di qalibekî ke. Mirov dikare bibêje wê demê ew konfederasyon bûn; lê dikare wek mîrîtiyeka nîvkoçer jî bê tarîf kirin...

Doç. Soylemez ji defterên Osmanî radigihîne ku di sedsala XVI an de Reşî li Meletî û Mereşê diçûn zozan û germiyanan. Wê demê hejmara êlên girêdayî wan 15 bûn, paşê ew êla mezin bû û heta Rûmeliyê belav bû.[176-1] Di defterên Tahrîr de êlên Reşiyan wiha rêz dibin:

| | |
|---|---|
| | **Rastnivîs (Ş):** |
| 1. Hecî Omer Cemeetî (Cematî Ahmed veledî H. Omer)–Kaytanî | **Omerî-Qeytanî** |
| 2. Xizir Soranî | Xizir Sora |
| 3. Kellelû | --- |
| 4. Celikanlû | Celikî |
| 5. Mûlûkanlû | Molikî |
| 6. Mendûbalî (Mendollû) | Mendolî |
| 7. Zerûkanlû | Zerikî |
| 8. Boxraşî | Boxreşî |
| 9. Rûmiyan | Rûmiyan |
| 10. Mansûr | Mansûr |
| 11. Îzdeganlû | Îzdegan |
| 12. Mansûrganlû | Mansûrî |
| 13. Karlû | --- |
| 14. Rişvan | Reşî |
| 15. Çakallû | Çakal |

Ev wêne konfederasyonekî nîşanî me dide; êlên mîna Zerikî, Îzdegan, Çakal, Mendolî em nasdikin û bi yên din ve êlên nêzîkî Reşiyan in, lê piranî serbixwe ne jî. Demên di navhev de derbaskirin qerekter, devoka wan nêzîkî hev bûne; lê bi ferqên pir hindik mirov dizane ku ew êl û federasyonên cûda ne. Di xebateka li ser vê niqtê de mirov dikare bi hêsanî wan cûdahiyana tespît bike... Di roja îro de H. Omer, Molikiyên li Qonya girêdayî Reşiyan in; Celikan hinek dikin nav hinek nakin. Lê ji bo ku berê girêdayî Reşiyan bûne mirov gereg wan jî wek Reşî hesab bike. Zerikiyên li Qonya, Enqere, Sêwas û Xorasanê cûda ne. Îzdeganiyên li Xorasanê jî serbixwe ne. Ew êl yan jî federasyon li Xorasanê hîna jî bi wan navana dijîn. Yanî wek: Îzdeganlû, Rişwanli, Zirkanlû derbas dibin. Bi kurtî ew tablo ji êla Reşiyan zêdetir wek konfederasyonekî xuya dike. Heman nivîskar dibêje: Ji qeydên wan salan bi şûnde em dibînin ku êlên mîna: **Bereketlî,** Bektaşli, **Belikanli**, Benamli, **Cûdikanli**, Dalyanli, Dimişkli, Heycebanlû, Hidiranli, Hoşnîşîn, **Mahyanli, Nasirli, Okçûyan,**

**Sevirli**, Sinkanli, **Şêxbalanli** û **Terziyanli** jî di nav de hene. Bi rû wan de ji Reşiyan Hamîdlû û Hacîlar hene ku li gelek cîhên Anadol û Rûmeliyê gundên bi navî van hene.(176-41)



**Ji gundê Sêvika Mehm û Meda Erif bi zarokên xwe re**

Îro li Anadoliya Navîn êlên girêdayî Reşiyan ew e ku me reş kirî (rast nivîs: Berkatî, Bilika, Cûtika, Nasirî, Mifika, Sêvika, Şêx-Bilan) bi yên mîna **Omera, Molika, Oxciyan(Mahyan-Mihîna?), Xelika, Celika** yê li jor ve me tevî kiriye hene û hejmara wan digihîje 12 êlan. Heciban giredayî Milan in li dora Kizilirmak (Bala) xwedî gelek gundanê. Ev tablo li jor li Semsûrê tê guhartin û yên li cîhên din ên Anadolê jî haya me jê tune ne. Wek Hamîdliyê girêdayî Reşiyan li gundên Malkara, Akçekîzanlik, Edîrne, Sarûhan-Kirkaxaç, Îzmîr û Qastamonûyê hene.(176-45) Îhtîmaleka mezine ku ew hatine helandin.



**Celika**

Di sala 1784 an de Reşiyan, li nêzîkî Alacahanê qadiyê Bexda şêlandin û meriyên wî kuştin. Ji bo wê ji waliyê Sêwasê re hate nivîsîn ku wan bigirin. Piştî salekê, li Alacahanê li karwana Îzmîrê xistin. Melûkanliyên (Molikî) girêdayî Reşiyan û li Akçadaxa Madenê rûdinên tezmînatê xwestin.[129-63]

Îro li Semsûr-Kolikê tê gotin ku 12 êlên girêdayî Reşiyan hene; lê kesek nikare wana hemûyan bijmêre. Ji gelek hevditinan bi şûnde encama me derxistî ew êl in:

**1- Çelebi**-Gund: Kilîsk, Hopak, Berwîdol, Bûtbax, Elût, Bersomik, Sako û hwd…

**2- Teşik**-Gund: Kergurak, Çerxenek, Çavçûk, Qelan, Berazî, Kefirme û Derberî.

**3- Qerçor/Qerçol**-Gund: Aksû, Alancik, Kiran, Serinde, Yarpûzlû, Qerekose, Arikonak, Narli…Bala we bikşînim ku ew nava bi yê li ser kevirê Yenîsey ve yek e…

**4- Alikan**-Gund: Çamdere, Huseynlî, Dilektepe, Hesenlî ne.

**5- Xidirsor**-Gund: Koçalî, Recep, Aktaş, Çalxan, Kûrûdere, Pinarbaşi, Koseûşaxi, Bistigan, Abdulharap, Çamgazî, Bolgenek in. Li vê herême jî rûspî dibêjin Rêşî 12 êl in, lê kesî nikarî hemûyan bijmêre.

**6- Mamrek** (Elewî).

**7- Mansir** (Elewî). Li Xorasanê jî hene.

**8- Geller** (Jêr û Jor).

**9- Mihican**.

**10- Taşil/Tişil**.

**11- Kaw** (Tê gotin ku: Sêvikî, Nasirî, Omerî, Bexikî, Bilikî, Mifikî, Biraketî û Xelikî berê girêdayî Kawiyan bûne…).

**12- Gomik**. Li Xorasanê jî hene.

Wekî xuya dike ti nêzîkbûna navan bi yên li Anadolê re nîne. Lê sîstema wan wekî me di beşa Celaliyan de jî gote mîna ya Celaliyan e. Ew jî du beş bûn ku heryek ji 12 êlan pêk dihat. Reşiyên li Anadolê û Semsûrê jî ji 12 êlan pêk tên. Sine Milî 12 êl in, Atma 12 êl in. Li Xorasanê jî sîstema wan bi tevahî cûda ye. Lê gelek ji wan êlana li Xorasanê jî hene. Li Semsûrê êl wekî sîstema sedsala XVI an, yanî wekî 15 federasyonên me li jor ragihandî ye.



**Reşiyên Elewî yên li Kolikê**

Gora M.Zekî êlêka bi navê:

**1. Etmanîkan** ê li dora Derben, Bedlîs û havînan jî li alî Mûşê heye û serhejmara wan 5 hezar malbat in. Nêzîkî Enqere rûdinên, lê hejmar negotiye.(19-189) Şaxên Atma ev in: Tilkî, Kizir, Haydar, Ketî, **Sadaka**, Kizkapan, Qerehesenan, Qere, Axca, Tûrûç, Kaba, Mahkan.(128-198) Etmanîkan 5000 mal in. Pir caran li alî Bedlîs û Botan tên dîtin. Havînan diçin Mûşê û koçber in.(100-177)

**2. Belikan** 7000 mal nîşan dide û Zazakî diaxifin.

**3. Reşî** li başûrê Erzirûmê dijîn û 7000 mal in.(19-185)

**4. Berkatî**: 10.000 mal in li başûrê Kirşehirê û nêzîkî Kizilirmakê rûdinên.(19-188)

**5. Taburoglû:** Bakûrê Kirşehirê û 300 malbat in û nîvkoçer in.

**6. Cûtikan:** Li başûrê Qoçhîsarê rûdinên, 200 mal in û nîvkoçer in.

**7.Xelikan:** Ji herêma Kalîfanî ya Rewandûz hatine, 400 malbat in.

**8. Sêfkanî:** Li bakûrê Xalikan rûdinên û 500 malbat in.

**9. Nasirî:** 700 malbat in, li başûrê Enqere, Qerealî rûdinên.

**10. Mahasî û Umranli** yê Milan jî, li Kirşehîrê rûdinên, tevhev 1100 mal in.(19-189)

Umranli di jêderên din de wek Omeran derbas dibe; di hinek cîhan de jî wek êlêka girêdayî Canbegan xuya dike. Lê ez li Bilikiyên bi ziravê Kirmanckî deng dikin rast nehatim. Ew êlên hatine nivîsîn, xêr ji Atma îro li Anadolê girêdayî Reşiyan xuya dikin. Lê girêdana Atma ya bi Reşiyan re tam ne zelal e. Belê herdû jî di heman pêvajoya dîrokî re derbas bûne, herî kêm xism û meriyên hev in û di praktîkê de ew gelek dikevina nava hev. Hîna jî êla mîna Atmiyan, Çeqelan, Xelka (ava Şîro), Delika-Celika, Bîstîka, Omerî (Ahû Dere), Sêvika, Bilikî (Gurlevîk), Nasûrliya (Şîro) li Meletî hene. Doç. Eroz dibêje: Wekî tê fêhm kirin Reşî konfederasyon e, Atma jî girêdayî Reşiyan e. 50 sal berê (1920) li Bala û Haymanayê di nava Kurmancan de Reşî jî hebûn û wek milê: Şix Pojîn, Togali, Mîkaîl, Rişvan, Herkatli dihatin beş kirin. Êlên Atma 12 ne: Tilkî (Hesena, Bikler, Tono), Kizirî, Heyderî, Ketî, Sadaka, Kizkapanî, Qerehesen, Qere, Axca, Tûrûçî, Kaba, Mahkanî ne. Tilkî bi eslê xwe Tirkên ku Kurmancî deng dikin e ne, dema ji Asya Navîn hatin, li Loristanê di bandora Farsî de man û zimanekî tevlîhev deng dikin.(99-43)



**Reşiyên li belda Omera ya girêdayî Konya**

Me di rûpelên derbasbûyî de jî ew dîtina eşkere kiribû û wekî Kocadax ji "Dîroka Wanê" radigihîne: Êla bi navê Atma tê gotin ku ew êla berê li bakûr û bakûrê rojhilatê Derya Kesk dijîn û zemanekî pir kevn de ew hatina dora Silêmanî; ji wir jî beşekî bi riya Midyat, Stewr, Mêrdîn, Amed û Qulpê çûne Bedlîs û Araratê. Hinek ji wan li dora Bedlîsê dimînin ji ber ku gayê wan westi-

yane ji re gotine **"Gawestiyan"**. Beşek jî tere Qastamonû û Antakya yê.(17-198) Ji gundê Hesen Elî yê girêdayî Elbîstanê, Hesen Elî Gurarslan wiha dibêje: 400 sal berê ji ber zilma Osmaniyan em reviyan ser Akdax-Nûrhaq; paşê em daketin jêr lê gundê me sê caran kavil kirin. Gundî me û dora wî, li Goksûn, Avşîn, Nûrhaq û Elbîstanê Atma, Sinemîllî û Alxas dijîn. Piranî Elewî ne, lê hinek pişt re bûne sunnî. Berê, jinên me zebûnên bi sê şeqan li xwe dikirin, kofî didan serê wxe, keçikan bi zêr û pîlikan ew dixemilandin. Êla me ji dîrokeka nayê zanîn de ji Xorasanê hatiye Xorasana Erzirûmê û paşê jî ew hatine Semsûr, Meletî, Mereş, Qeyserî û Anadoliya Navîn.

Rişwanoglû li ser Reşiyan wiha dinivîse: Reşî konfederasyon e, ji çiyayê Kurmenc heta Enqere, Bala, Haymana belav dibin. Herî zêde li Mereş, Dîlok û Islahiyê têne dîtin. Atma û Sinemilî yên di nava Reşiyan de ne. Xêr ji wana berên Reşiyan: Şix Pojîn, Togal, Mikaîl, Rişvan û Berkatî ne. Di nava Reşiyên Mereşê de em Çixilan jî dibînin. Dîsa di navbera Araban û Besniyê de em dibînin ku Çepnî jî di nava Reşiyan de ne. Beşekî xwe bi Kurmancî, beşek jî bi tirkî deng dikin; **mirîdên Hecî Bektaşî Welî yên yekemîn in.** Cara yekemîn di sala 1277 de li Sînopê bi cîh dibin.(128-197) Nivîskar, Atma û Sinemiliyan dike nava Reşiyan; di alî ziman, rûhiyatî û tevgera rojane de, endamên herdû koman gelek nêzîkî Reşiyan in; lê bi dîtina min ew federasyon bi Reşiyan ve mil dane hev in, îttîfaq û yekîtî pêk anîne. Mikaîla jî di nava Reşiyan de dide xuyakirin, lê ew piştre tevlî Reşiya bûn û bi eslê xwe ne Reşî ne. Xala herî balkêş jî yên wek mirîdên H. Bektaşî nîşan dide ku ew jî ji Xorasanê hatibû Anadolê û îhtîmaleka mezine ku Kurd bû. Hejmara tîrên Reşiyan wiha dide xuyakirin:

**Rişvan**, Kizilirmak û çiyayê Ilgaz.

**Axê Reşiyan**, herêma Alacana Sêwasê, Sencaxa Meletî, Sokûllû.

**Reşiyan:** Mereş, Rakka û Yozgat.

**Kurdên Reşî:** Hisni Mansûr, Besnî

**Reşiyan:** Qastamonû, Çanqiri

**Îrişvan:** Qeyserî, Edene, Bîrecik, Şam, Kilîs, Dîlok, Rakka

**Azîzan:** Edene, Edene-Sîs.

**Reşiyen Berekat:** Edene, Semsûr û Meletî

**Birsan:** Semsûr û sencaxa Meletî

**Bezikî/Bazikî:** Rakka Rûmkale, Meletî, Riha, Sîwerek, Amed, Mereş, Erzirûm.

**Cûdûkan:** Adiyaman, Meletî, Bozok û Sêwas

**Reşiyen Dimişk:** Kilîs, Meletî, Heleb.

**Ekradê Heciyan:** Hisni Mansûr, Meletî, Mereş, Qeyserî, Haymana, Îçel-Anamûr, Yozgat.

**Reşiyen Hecî Omeran:** Mereş, Kilîs û Dîlok.

**Xidiran:** Heleb, Semsûr û Kilîs

**Hadder:** Meletî, Kilîs, Besnî, Heleb

**Hamit Kebîr:** Hisni Mansûr, Kilîs, Dîlok, Edene û Tarsûs.

**Xalikan:** Nîxde, Rakka, Erzirûm, Kangal.

**Xiziran:** Besnî, Meletî, Adana, Îçel.

**Hosnişîn:** (Koçber-Ekrad) Mûsil-Kerkuk, Semsûr.

**Qelerli (Koçer-Ekrad):** Semsûr, Exin, Arapkir, Erxanî, Meletî, Akçadax, Kurecîk û li Dîlok û Kilîsê jî bi cîh bûne.

**Koseyan Ekradi:** Semsûr û Meletî bi cîh bûne.

**Mandan-Mandol (Koçer-Ekrad):** Bîrecîk, Kilîs, Dîlok, Arapgîr, Mereş, Rûmkale, Edene, Heleb

**Mikailan (Koçer, Ekrad):** Besni, Meletî, Bala, Haymana

**Mûllûkan û Oba Hecî Bekir (Koçer, Ekrad):** Divrixi, Meletî, Bozok.

**Omahyan (Koçer,Ekrad):** Li Enqere û Sêwasê bi cîh bûne.

**Rûmiyan (Koçer,Ekrad):** Sewerek, Amid, Semsûr, Nîzîp, Firat (Bîrecîk), Rakka, Erzirûm, Qers-Çildir

**Sevirli (Koçer,Ekrad):** Semsûr, Meletî, Rakka, Mereş.

**Senek/Sinkan (Koçer,Ekrad):** Erxanî, Qers, Çildir, Rakka, Sêwas.

**Terziyan/Derziyan:** Semsûr, Şerqî Qerehisar.


**Umran/Umranli Ekradi:** Meletî, Amed, Mereş, Bîrecîk, Mêrdîn, Kilîs û Îçel (Mût)

**Zerikanlû (Koçer,Ekrad):** Kahta, Aksaray,Mereş, Rakka, Mêrdîn, Hinis, Agirî

Ji wan eşîretên li jor hemûyan re Reşî tê gotin.[39]

Ekrem Îzî nivîskarê herêmî yê ji Kolikê, wiha beş dike: Tîrên xwe yên serekî ev in: Atma, Sinemîllî, Mikaîla, Şihpojîn, Togal û Herkat in. Wana jî di nava xwe de ji êlên cûda pêk tên.[121-141] Xuyayê ku bi Rişwanoxli vê heman federasyonan dijmêre û koma ku ew terîf dike jî konfederasyon e. Wek mînak Atma 12 êl in: Tilkî, Kizir Haydar, Ketî, Sadak, Kizkapan, Qerehesen, Qere, Axca, Turuş, Kaba, Mahkan. Kiziroglû Mûstafa heye ku bi 150 hevalên xwe yên Kurd ve rêbirî dikir. Reşî ji êlan pêk tê. Di salnama Mamûret-ûl Azîz de, berên êla Zûrevkan a girêdayî Reşiyan wiha tên rêz kirin: Alikan, Teşikan, Geller û Qereçor.[121-141] Di nava Atma de jî em rastî 12 êlan tên, ku ew hejmara ji bo wan hemû êlan bingehîn e...

C. Turkay jî wênekî cûda dide: **Hacaban, Halikan** û **Omahyan** êlên Reşiyan in; civatên xwe jî ev in: Azîz (Kutahya, Edîrne, Adana, Rakka), Bektaş, Benam, **Berekat** (Adana, Nîxde), Birsan, Bizikî, **Cûdikan**, Dalyan, Dimişkî, **Hacaban**, Hecîyan, **Hecîomer**, Hadran-Xidiran, Hadrasûr, Hamîdî-Kebîr, Hamîdî-Saxir, Hoşnîşîn, Qeler, **Koseyan**, Mahman, **Mandalî** ne.[160] Ewên me reşkirî em dizanin; lê yên din me tam dernexistin. Koseyan bi min balkeş tê; bi dîtina min ew ji xanedana Kose Paşa tên û şaxekî Reşiyan e. Îro jî gereg ew di nava Omeriya-Omahyan de bin. Bi vî awî herkesek wêneyekî jî Reşiyan dide û herkesek tabloyekî derdixe holê û piraniya wan jî rast in. Lewra me di destpêkê de jî gotibû, ku wê konfederasyonê mirov nikare bi hêsanî safî bike. Li deverna mezin li deverna biçûk e û formatekî wê ya sabît nîne.



**Reşî-Gundê Bervidol-Kolik**

Avcioglû jî hinekan cûdatir û mezintir dike: Ji wan re di wata "Konfederasyona Eşîran" de digotin Reşî û ji wan êlan pêk dihatin: Reyhan, Barak, Qereşêx, Kûzûguden, Îlbex, Mîllî, Umran, Kangun, Şefaat, Cihanbax, Namû, Avşar, Qeleçorlû. Kurmaç, Atma, Kiliç jî girêdayî vê konfederasyonê bûn. Çepnî di nav Reşiyan de bûn.(24) Milan bi xwe konfederasyone, Canbeg gereg federasyon be û ne di nava Reşiyan de ne. Nivîskar di vê babetê de şaşitî dike. Reyhanli li deşta Amîkê li ser daxwaza wan, di sala 1721 an de bi cîh kirin. Reyhanli 2000 xane û 12 êl bûn.(90-109) N. Şahhuseyinoglû dibêje: Berên Reşiya gelek in, hinek ji wan ev in: Kaba, Qere, Qerehesen, Mahman, Horan, Atma, Mahîhan, Îzol û Çakalî ne.(15-25)

Me li jor gotibû ku li hember mesrefên dewletê yên giran, karmendên dewletê yên diz pişta gel şikandin û pere bi navê "Îmdadîseferiye" yê di sala **1686** an de ji gel kom kirin bû merhala dawî. Reşî û êlên din ên Kurd li hember dewletê serî rakirin. Dewletê ew serhildana jî vemirand û di sala 1691 an de ji bo gel hîn baştir bidoşin fermana bi cîh kirinê derxistin. Bi vê armancê gelek Tirk anîn li aliyê Riha û Dîlokê bi cîh kirin. Li aliye din jî dixwestin êlên Kurd jî li sînorên dewletê yên bi xeter bi cîh bikin. Ji wana yek jî sînorên bi bedewiyên-Ereb re bû. Ji bo ku ew venegerin, Kurd li hember Kurdan wek koruciyan bi kar anîn. Ji bo ku êlên Kurd, bila derbasî Elbîstan û Meletiyê nebin, vazîfa "Derbentçî-Bekçî "dan gelê Besnî û Goynukê yên girêdayî êlên Kupelî Hesen û Xelil Beg.

Ji fermanê şunda jî Reşiyan dewletê guhdarî nekirin, zeviyên gel çerandin, komên şelandinê avakirin û koçberiya xwe dom kirin. Bi ser vê de, Osmaniyan ji waliyê Riha û Sêwasê re ferman şandin ku bila herin ser Reşiyan. Reşî û êlên din ên Kurd di sala **1691 an de bi zorê şandin Rakkayê**.

Bi cîh kirina Kurdan cara yekemîn ji bo Reşiyan fikirîn; ji bo vê, ji Rakkayê heta Sêwasê heft herêm tespît kirin:

**Rakka:** Ji ava Rakka heta Firat û li bakûr heta Akçakale (berê cîhê Reşiyan yê zivistanê bû)

**Samasat:** Li bakûr Samsat, li başûr Bozova, Haran, Payamli û Akçakale (cîhê zivistanê).

**Navbera Îskenderûn û Firata li Suriyê** (zivistanan dihatin wir)

**Li bakûr Antakya, li başûr Humus** (êlên Ereb dixwestin li wir bi cîh bibin)

**Edene, Îskenderûn û Mereş**

**Amasya, Tokat, Sêwas, Sûngûrlû, Yozgat, Çanqiri û Enqere**.

Reşiyên li Sûriyê hatin bi cîh kirin, di sala 1697 an de vegeriyan û xwe avêtin Çiyayên Torosan. Mufetişê Anadolê Yûsûf Paşa çû ser êlên Kurd. Kurdan bi 5000 xane û 15.000 kesan ve xwe avêtibû Torosan û Çiyayê Gawir. Yûsûf Paşa ji wan re xebereka wiha şand: "Padişah qetî emir daye, hunê mecbûr vegerin Rakkayê, eger hun neçin emê we bikujin! " Kurdan jî ev bersiv da ne: "Ji heywanên me re giya tune, gelek jê mirin, gelek zarok û mirovên me can dan. Em nikarin herin Rakkayê! Bila padîşah cîhekî din nîşanî me bide, yan jî em dikarin herin Menbîçê, eger cîh nede emê heta mirovê xwe yê dawiyê şer bikin! ji bo ku herin Menbîçê 25 roj muhlet dane. Lê xebar şandin ku ew ne diçin Menbîç ne jî Rakkayê. Çar-pênc gundên Azaz, Dîlok û Helebê rûxandin. Casûsên Yûsûf Paşa xeber anîn ku xwarina wan teva bûye, bi giya xwarinê çavê hemûyan perçifîne... Ji paşayê Osmanî re 2500 siwarî, 40 tabûr pêya û gelek esker ji êlên Kurd jî hatibûn. Paşa derbasî tevgerê bû. Koma di bin serokatiya Hecî Mûstafa û Hecî Îvaz Ogûllari aman xwest û teslîmî Paşa bûn û vegera Rakka qebûl kirin. Di wê navberê de: Kethûdayên waliyên Heleb û Sayda, cîgirê bege beganê Trablûs-Şam, **begê Tirkmenên Reşî; Rişvanoglû Xelîl Beg**, Şahîn Begê Îl-beylî, Îbrahîm Begê Koyûnoglû, Çobanoglû, Kurd Kiliçli, êlên Bektaş Beg û ji gelên Kilîs, Azaz, Antep, Meletî 10.000 kesên bi tifing û weqas jî bi rem û eskerên waliyê Edenê li deşta Amîk tevlî Paşa bûn. Pehlewan-oglû Îsmaîl Beg bi 10.000 siwarî û piyade ve geliyê Arslanli girtin. Paşa ji Antakya hate pira Mûrad Paşa. Êlên Kurd bi 1100 kesî êrîşî paşa kirin lê têk çûn û reviyan. Êlên li Aktepê bûn. Paşa dixwest wana ji holê rake. Ji ber wê êlan mektûp şandin û lêborîn xwestin. Ji bo ku careka din wî karî nekin efû bûn; paşê Osmanî xeftan li serokên wan kir, dane ber xwe û birin cîhê îskanê.[90-92] Osmaniyan **30 serokên êlan kuştin**. Bi ser vê de jî rê nedan ku herin Kurdistanê, lê **Anadoliya Navîn li ber wan bû ku jê re bibe welatêkî nû**. Ji defterên wê demê manî de tê fêhm kirin, ku li Dîlokê cîhekî bi navê "Kabir Gedîxi" yan jî **"Reşî Gedîxî"** heye ku wata wê goristana Reşiyan e. Ji gundê Sêvikan Reşoyê Hemê (1907-2006) dema çû Çûkûrovayê li ser riya Torosan: **"Ew geliyê li wir ji seriyên Reşiyan tijî kirin! "** digot, ku ew gotin ji kalên xwe bihîstibû...Reşiyên li Kurdistanê mabûn yên girêdayî Begê Besniyê bûn. Di navbera salên 1750-1770 an de ji Semsûrê heta Sêwasê dagir kirin.



**Jineka Reşiyan ji Kolikê**

Piştî vî şerî ji gelek êlên Kurd xwestin xwe bavêjin nava Reşiyan û bi vî awayî şopa xwe ji ber dewletê bidin winda kirin. Lê dewlet jî heta dawî kete dû wan û heta ji dest hat li Sûriyê bi cîh kirin. Ji bo wan êlên hatibûn nav Reşiyan ferman hatin derxistin. Yek ji wana wiha ye: **Ji waliyê Rakka Huseyn Paşa re!** Tirkmenên ku min ferman derxistî ku li Rakkayê bi cîh bibin, fîrar kirine û hatine nav Reşiyan. Wana îskanê qebûl nekirine. Ji te re ew fermana min e, ku tu wan derxî û li ciyê wan bi cîh bikî! Sal 1103-1700.(161-124) Di heman salê de Giriziyên girêdayî Reşiyên li Kilîsê cîhê xwe terk kirin û hatin gundên Taşeliyê li sencaxa Meletî. Îddea kirin ku di destên wan de ferman heye. Xelkê wan gundana derxistin. Ji memûrê bacê re gotine: "Em Reşî ne û baca xwe didin" lê derket holê ku ew bac jî nedane. Piştre soz dan û tahûd kirin ku ew xirabî nakin û ji ber wê di wan gundana de man. Lê di sala 1714 an de wan dîsa dest bi xirabiyan kirin û bi ser vê de dîsa hate hewldan ku wan bişînin Kilîsê.(156-79)

Reşiyên di sala 1560 an de bi cîh bûbûn, em dibînin ku piştî salên 1650 an, ew rutba paşatiyê digirin, ew jî tê wê watê; ku yên niştecîh dikevine xizmeta dewletê. Encama vê yekê wekî me li jor jî qal kiribû dewletê ew li dijî Reşiyên koçer, di şerê li dijî Îranê û li hember Kurdên din jî bi kar anîn. Heman tevgerê em li hember Kurdên koçber jî dibînin. Bi vî awayî parçên heman êlê li

hember hev jî bi kar anîne. **Ji waliyê Heleb, Dîlok û Boybegê Reşî re hukim!** Dedeşlû û Selmanliyê li Mereşê nîştecîh, ji salê 1855,5 quriş bac didan… Pêwîste hûn îttîfaqê bikin û wana li alî Helebê bi cîh bikin, sal: 1139-1726.[161-169] Ji bo ku êl li Heleb Alaca Xanê bi cîh bibin fermanek hatiye derxistin û kopiyeka wê ji berpirsiyarê sencexa Meletî Mehmet Paşayê Rişvanzade re jî hatiye şandin, sal: 1146-1733.[161-195] Fermanek jî ji bo talana êlên Avci û Afşar, ji bo begêbeganî Mereşê Silêman Paşayê Rişvanzade re hatiye birêkirin, sal: 1147-1734.[161-200] Di sala 1155-1742 an de begêbeganî Edenê jî Silêman Paşayê Rişvanzade ye.[161-209] Bi wî şiklî her ku Kurd ketin xizmeta dewletê, ew jî sînorên desthilatdariya wan fireh kirin. Bi wê riyê bi kevirekî li çend çûkan dixistin. Gor wê dorpêçê jî Reşî nediketin bin kontrolê.

Li alî Mêrdînê konfederasyona bi navê Milan dihate naskirin dijî, Milan bi Reşiyan ve gelek caran tevlîhev bûne, hinek êl li nava herdû koman belav bûne û li ser çanda hev gelek bandorê kirine. Mirov nikare ji hev cûda bike û ji gelek aliyan ve wek hev in. Lê mixabin dijmin ew jî li hember hev bi kar anîne. Serokê Milan ya wê demê Tîmûr Paşa bû. Mirovekî li Stenbolê perwerdê bûyî, liserxwe û bi hêz bû. Waliyê Heleb û Amedê yê wê demê ji Tîmûr Paşa ditirsin lewre ew aliyê Amed, Heleb, Mûsilê girêdayî xerecê kiribû. Bi erê kirina Siltan, waliyê Bexdayê Silêman Paşa di sala 1791 an de êrîşeka mezin anî ser Milan. Silêman Paşa cîranê Milan yê ku qet ti carî bi tenê nikare wana têk bibe; her tim alîkarî stend û 30 leşkerî zêde tevlî artêşa xwe kir. Evên ku tevlî bûn jî, waliyê Helebê Koca Mûstafa Paşa û waliyê Meletî Reşvanzade Omer Paşa bûn. Teymûr Paşa nikarî li hember wan bisekine û reviya Helebê. Gelek Kurd hatin kuştin. Teymûr paşa di sala 1800 an de bû birêvebirê Rakkayê, di sala 1803 an de jî bû waliyê Sêwasê.[26] Alexîs Kuylenstîerna ku gerokekî Swêdî ye û li başûr û rojavayê Kurdistanê geriyaye dibêje: " Kurd di nava serhildanan û Ereb jî li hemberî dewletê di şerekî vekirî de bûn. Hafiz Paşa gor her zahmetî, tekoşîn li hember hemû dijminên xwe bilind kir. Eskerên Hafiz bi dizîka bi çiyan ve hildikişiyan û dijmin dişewitandin. Paşê, serokên êlan yek di dû yekî dikirî û êlêk li hember ya din dikire şer. Di dawî de bû fermandarê Kurdistan û Mezopotamyayê. Lê li hember Misiriyan şer winda kir û Sûriyê jî di destê Îbrahîm Paşayê Kurd de bû.[188-21] Bi vî awayî dewletê Reşiyên nîştecîh, yan yên desthilatdariya Tirkan pejirandî wek maşeyeke desta li gorî dilê xwe bikar dianî. Beşek ji Reşiyan jî nediketin bin kontrolê.

Êlên girêdayî Reşiyên ku nediketine dest, di salên 1750-1770 an de ji zozan û cîhên xwe yên zivistanê yên kevn derketin ji Semsûrê heta Sêwasê gelek gund talan kirin. Ji êla Sêvika ya girêdayî Reşiyan, Milê Hemî Kur (1898-1996) li ser koçberiya wê demê ji min re kilamek striya:

*Hawar hawar Zewa min hawar!*
*Saltî li Zewê minî ber bi kaw e* ***(ji vir mirov fêhm dike ku di cîhê pişkovan de kaw hene)***
*Ezê xêr ji Elê xwe giya bi qurban kim*
*Daka Memê minê ku mayî li binî Mereşê saltê ber bi kaw e.*

Ji wê êlê mêrê malê Çolo, jina xwe li binê Mereşê dide erdê û vê kilamê li ser dibêje. Ew jî nîşan dide ku wê demê jî ew diçûnê Mereş û Kurdistanê. Bi ser terk kirina Reşiyan ji cîh û zozanên xwe de Qadiyê Divrîxiyê ji Stenbolê re nivîsî. Bi ser wê de gelek ferman ji waliyên herêmê re hatin şandin ku wana dîsa bişînin Rakkayê. Ji bo çûyîna zozanan jî bilî ji Besnî û Semsûrê wir de, destûr nedin ku bila derbas bibin.(129-40) Cewdet Paşayê ku nijada xwe ji Balkanan e û destê xwe heta ber di nava xwîna Kurdan de, li ser Reşiyan wiha dinivîsîne: Êlên Reşî, malên dewletên nedidan, zilim li gel dikirin, riya bazirganan dibirîn û roj bi roj talan û rêbirî zêde dikirin; tewerê berê karwanekê Îzmîrê ji holê rakiribûn. Qadiyê Bexdayê kuştibûn û rê hemû girtibûn. Eger wana bi vî awayî berdewam bikira, Anadolû dê xirab bibûya. Padîşah, qetî qerar dabû, ku guhên wan bikişîne û ceza bide, li cîhekî bi cîh bike û têke bin kontrolê. Ji bo wê ji gelek begêbegan û waliyan re ferman hatin şandin. Ew êlana bi marîfeta waliyê Rakka wezîr Kekî Abdî Paşa û mîrêmîran Omer Paşayê Reşî li deşta **Ereban** hatin bi cîh kirin. Şertên amana wan ev bûn: Zirarê nedin gelê dor û ber; deynên xwe ji sala 1198/ (1785 yan jî 1782) an de manî bidin Omer Beg û ji bo karwana Îzmîrê jî 1500 kîse akçê dayîn bû.(162-671) Ew nivîs tirsa dewletê ya ji Reşiyan eşkere dike; bi rastî dema êlên Kurd diketine tevgerê, rewşa dewletê û ewlakariya wê xirav dibû. Heman jêder dibêje: Di sala 1812 an de şêlandineka balkêş pêk hat: li Sînorê Sêwas, li herêma Delîktaş memûrên dewleta Îrane ji alî Reşiyan ve hatin şêlandin. Bi qasî 9250 quriş mal girtibûn. Serkêşê vî karî jî Moroglû Hesen û hevalên xwe bû. Tê fêhm kirin ku Reşî hîn koçber in û li zozan û cîhên zivistanê rûdinên.(129-144) Ew Reşiyên ku rê li karmendên Îranê girtine, dê piştî çend dehsalan li navenda Anadolê bêne bi cîh kirin. Reşiyên li bajarê Edenê jî di nava liv û tevgerê de bûn. Reşiyên li Edenê ber bi ber belav bûbûn û her yekî cîhek zebt kiribû. Carna serî hildidan û riya hecê digirtin. Dewletê carna dest li mil dixist û carna jî ew berdidan hevûdû û bi kevirekî li dû çûçikan dixist. Di sala 1200 an de jî Reşî belav kirin, lê ew reviyan çiyan û dewletê jî dora wan girt. Xelîl Begê Reşî reviya ser çiyayê bi berf.(162-851) Kalê wî Xelîl Begê Reşî jî di sala 1697 an de, bi hêzên dewletê re êrîşî birayê xwe dikir û niha jî dewran hatibû guhartin û ew bûbû hedefa heman dijminî…

Reşiyên li dora Edenê, yên ku me li jor qal kiribû bi yên Anadolê ve çend girêdanên xwe yên girîng hene û hinek êlên parçe bûne li herdû herêman dijîn. Yalman li ser wan lêkolîn kiriye û dixwaze wek Tirk nîşan û îspat bike, lê hewldaneka ne raste. Di heman demê de em jê fêr dibin; ku li Torosan, gundên Berkatî, Omerî û Mihmanli hene. Berkatî 80 sal berê (teqrîben 1840) ji Yozgat-Mecîdiye hatine û 60 kon in. Omeran jî li wê demê hatine û 50 kon in. Mihmanli ji Elbîstanê hatine. Oxçû jî ji Çîçekdaxi hatine û hindik in.(106-108) Bi vî awî em dibînin ku êl çawa fireh-belav û parçe bûne. Sakaoglû, girêdaneka din ê dîrokî bi me dide xuyakirin, dibêje: Ewên ji êlên xwe veqetiyabûn û çiya ji xwe re war girtî re digotin "Akçadaxli". Hevalên wan êlên ji Reşiyan veqetiyan wek: Şamali, Gurne, Kurecîk, Kerûşaxi, Leventoglû bûn. Ji êlên

girêdayî Reşiyan wek: Mandalî, Hamûlî, Çelganî, Rûmanî (Rûmyan), Turkanî jî, li biharê ji dora Riha û Semsûrê derdiketin û dihatin Akçadax û di navbera wan de şer derdiket.(129-156) Ew êlên wekî Kurecîkan hatin hejmartin, îro li dora Meletî dijîn û qerektera wan di her alî jiyanê de wek Reşiyên li cîhên din in. Min gelek hewl da ku li ser wan agahiyên berfireh di nava vê pirtûkêkim lê mixabin rêvebirê komelên wan alîkarî nekirin.

Berî ku em derbasî çîroka belavbûna Sêvika-Reşiyan bibin pêwîste em taybetmendiyeka Reşiyan bînin ziman. Heman demê ji alî Sakaoglû ve tê ragihandin ku ew jî ji bo veguherîna koma Reşiyan girîng e. Nivîskar dibêje: Reşiyan berê yek boybegekî-mîremîrakî xwe hebû, lê çend sal in, **1763**, ew ji holê rabûye û herkes azade.(129-40) Tê wê watê ku heta wê demê konfederasyona Reşî yekîtiya û rêxistiniya xwe parastiye û ji wê katê bi şunde, ew yekbûna xwe dawî ji dest berdane. Ew tarîxa ji bo veguhartina wan ê rêxistinî mîladeke xirab e. Piştî vê demê jî dîroka belav bûn, yan jî herkesî li çara serê xwe geriyaye dest pê kiriye…


Ew sîstema belav bûnê, di gotina mezinê me rehmetiyê Îbrahîm Şahînê ji êla Sêvikî, gera bavanê xwe qal dikî de jî xuya dike û ew di heman demê de wek secera Sêvikan ya demê dereng e jî: Bavê wan Kawas Axa di sala 1765 an de dimire. Lawê wî Nûrî li cîhê bavê xwe rûdinê û bavê xwe li goristana bi navê Avcilar a Govdelî ya girêdayî Xarpûtê vedişêre. Wek bavê xwe, wek serokê êla xwe li navça Semsûrê ya girêdayî Meletiyê li zozanên beriyê di konê xwe de jiyaye. Zivistanan jî li Govdeliyê, di quntara çiyayekî de çend metre ji erdê dikole û konê xwe li ser vedigire, bi xwe û bi heywanên ve têde dijîn. Nûrî Axa, ji zenda **Berazî** ya girêdayî Semsûrê, ji êla Ziravkî, bi jineka pir hezdikî re cara duyemîn dizewice. Sênîka ji dema wî (1737) ve ma ye, li cem neviyê wî yê heftan Îbrahîm Şahîn e. Nûrî Axa, texmînî di sala 1797 an de mir. Ahmet Axa jî wek wî di nava sînorên Elezîz û Xarpûtê de jiyana êla xwe berdewam kir. Di sala 1824 an de Ahmet Axa ji mir û li cîhê wî Sari Îsmaîl rûnişt. Îsmaîl, termê bavî xwe jî bir Govdeliyê veşart. Sari Îsmaîl sê zarokên xwe hebûn: Yek Molla Îbrahîm, Hecî Huseyn (Molla Mehmet û Mûstafa jî lawê xwe ne) û Hecî Osman bûn. Sari Îsmaîl, serokatiya **1700 kesên Sêvikî** dikir. Îsmaîl Axa, havînê li Ûzûn Yaylê, zivistanan jî li **Haymana li gundê Çaliş** derbas dikirin.(156-8) Li gundê Tirko û Xabûra yê girêdayî Haymanayê du komên ji goristanên kevn hene. Gelê herêmê wan wek goristanên "Gundê Buldix-Sêvika" bi nav dike. Gor hevpeyvînên min bi kalan re kirî, ew gorana ji dema berî nîştecîh bûnê ve mane. Dibe ku ew ji wê dema ku rehmetî dinivîsî de mabin. Îsmaîl Axa di sala **1851** an de mir û li nehiya Mecîdiye ya girêdayî Kamanê binerd kirin. Melle Îbrahîm **dema li alî Kamanê koçber bûn, hikumetê dawetê (emir) bicîh bûnê kir**. Beşek ji êlê ew qebûl nekir; lê Melle Îbrahîm qebûl kir û li cîhê gundê Beşkardeşê bi cîh bû. Ew kaniya li wî gundî û ya li Gundê Qerê Fakili-Boxazliyan jî, ji bo xêra diya xwe çêkir. Li ser mermer wiha nivîsî: "Sahîbul Hayrat, vel hasanat" Melle, di fermana hikumetê ya duyemîn de hat

li Gundî Omê bi cîh bû.[158-3] Gelek dîtin hene ku ew gund di sala 1800 an de hatiye avakirin. Dewleta Osmanî di sala 1842 an de biryareke wergirt, ku cîh guhartina êlan tê qedexe kirin. Yên ku bi dilê xweş ew biryara nepejirandin re rêya bi dilê reş (darê zorê) jî vekirîbû. Yên ku bi cîh dibûn re jî erd dihate tanzîm kirin. Bi vî awî komên mîna: Yenî Îl, Reşî, Reyhanli, Avşar li Amasya, Sêwas, Qonya û Qeyseriyê bi cîh kirin. Li ser hate rawestandin ku; ji vana Reşî û Avşarên serhejmara xwe zêde ne, belav hatin bi cîh kirin.[156-8] Bi rastî di praktîkê de jî xuya ye, ku piştî wê biryarê bicîh kirina êlan lêztir dibe. Navçeya Celeb (1839) û Bûldûk (1854) avakirin.[158-3] Gor gundiyên ji Bûldûk-Sêvika ew di sala 1272 (=1851, hinek jî dibêjin 1842 ne) an de îskan, 1282 an de bi cîh dibin; di 1305 an de mizgeft çêdibe, di 1325 an de ji konan derbasî malan dibin û di 1314 an de seferberlix destpê dike. Bawer dikim rehmetî ew çîroka ji devê mezinên xwe bihîst û nivîsî; tiştê em ji wir derdixin ev e: Êlên hatin navenda Anadolê ji qirnekî zêdetir rewşa xwe ya berê domkirine. Eger ew gotin rast bin, ji Reşiyan êla Sêvikan çûyîn û hatina xwe ji welat qut nekiriye.

Birêz Yeşîlgoz dibêje: Piştî hatina Reşiyan ya Anadolê, em dibînin ku ew konfederasyon belav dibe û dibe federasyon. Wekî jêder dibêjin di sala 1713 an de tam 12 êl bûn û gora demê gelek kes bûn.[39/90-16] Me li jor jî dîtina Sakaoglû ragihand ku dibêje di sala 1763 an de sîstema boybeyî jî betal kirine. Wek nakokî xuya bike jî herdû dîtin rast in. Bi dîtina min ji sala 1713 an bi şûnde sîstema konfederal betal kirin û wê demê beşek hatibû Anadolê. Beşa hatibû Anadolê, li destpêkê sîstema xwe ya federal dom kirin. Yanî bi boybeyî dihatin temsîl kirin. Piştî salên 1763 an, êdî ew sîstema jî betal kirin û derbasî sîstema gundan, bi gotineka din sîstema feodal bûn. Ew jî di rojekê de pêk nehat, dema Komara Tirk bandora xwe zêde bû, sîstema êlan jî lawaz bû. Di wê federasyonê de kîjan êl hebûn û kîjan li Kurdistan û herêmen din mabûn? Min gelek caran ji mezinan pirs kiriye û hemûyan gotiye ku 12 êlên Reşiyan li navenda Anadolê hene. Lê kesekî wana tam dijmêre jî rastê min nehat. Ewên ku bi piranî têne qebûl kirin ev êl in: **Berkatî, Bilikî, Cûtikî, Celikî, Xelikî, Molikî, Mîfikî, Nasirî, Omerî, Oxçî, Sêvikî, Şêxbilî**. Hinek kes, Oxçiyan û Molikan nakin nava federasyonê. Hinek mezinan digotin Molikî Saxincî ne, lê tê çi watê nedizanibûn. Divê ew nava jî Tirkan lê danîbe û tê wata kesên pez didoşî; mumkune ew ji artêşê re pez didotine. Rastiye, ku ew êl yan jî federasyonan berê ketine konfederasyona Reşiyan. Hinek êl jî hene ku di nav gelek federasyon yan jî konfederasyonan de cîh digirin.

Yek ji wana jî Nasirî ne. Nasirî di nava Milan de 70 mal in.[19-178] C. Turkay dibêje: Nasirî-Nasirlû ji Reşiya ne û ji taîfa Konar-Goçer Ekrad Yorukan e. Li Semsûr, Rakka, Bozok, Erzirûm, Tarsûs, Edene, Mereş, Kutahya, Kirk Kilîse-Vîze, Boyabad-Qastamonû, Qereîsali-Edene, Sînop-Qastamonûyê dijîn.[160-602] Bi dîtina Ziya Gokalp Nasiran wek qebîle li paş tevlî Milan bûne.[22] Raste, ji ber ku êlêka Reşiyan e û dema Reşî belav bûn ji ev beşên veqetiyan beşek jê tevlî Milan bûye. Gorî rojnama Hurriyetê nivîsî jî, li Riha Wêranşehrê û gundên êlên


bi navê: Şihan, Kuran, Milan, Nasiran, Poran, Devan, Çemikan, Tirk, Dodkan, Qeregeçî, Hidrekan, Metinan, Kejan, Çûvan, Ûbeyan, Begara, Behiman, Şûrûfan, Axavatan, Naiman, Seydan, Mendan, Kumlahşan, Bergûhana û Cemaldinî hene.(46) Lê wekî jêderên din jî didin xuyakirin ew li cografyeka pir fireh belav bûne û mumkune gelek jî jê heliyabin.



**Reşî-Xelikî**

Ji van êlana ya bi navê Oxçî em dizanin ku ji artêşa Osmaniyan tîr-ox-ok çêdikirine û ji bo wê jî ew nava lê danîne. Di eslê xwe de jê re êla Îzzeddîn yan jî Biyan tê gotin. Gor Roger Leskot: **Biyan (Ocaq Îzedîn)** şaxek ji Reşiyan in ku ew êla li başûrê Meletiyê rûdinê. Hinek jî dibêjin şaxek ji Milan in.(132-19) Di nava Pezgewran de jî êlêka bi navê Bîcan hebû, dibe ku heman êl be. Dîsa di nava Berazî (Bûrazî) de jî êlêka bi navê Oqane heye; heta êlêka bi navî Reşiyan jî di

nav de heye. Biyan dora 10 hezar kes hene û li 45 gundan belav bûne. Serokên wê hozê berê ji mala Hec Omer derdiketin. Di sala 1850 an de axayê wan ê dawî Delî Xelîl, ku Amkan pişta xwe dabûnê, şerek li dijî Şêxan ku Tirkan pişta wan digirt kir. Di şer de Axe direve Gawûr Daxi û paşê dîsan êrîş dike. Paşê Tirk wî digirin û dibin Edenê. Etmankan ji Dêrsîmê hatine, hîn beşek jî li wir in. Ew di nava sedsalên XVII û XIX an de hatine Sûriyê.(132-16) Buyereka balkêş jî di şerê Şêx Seîd de pêk hatiye. Axê Biyan Kor Reşîd di dema şer de, diviyabû pira riya hesin li ser diçû, wekî ya Heşargê bihatana hilweşandin, ku ji Kemalîstan re alîkarî neçe; lê Kor Reşîd bi tenekeyek zêr milet firot.(132-19) Oxçî-Biyan, Berazî, Reşî hemû girêdayî Şadiyan bûn.




**Gundê Nasira-Beşekî Încovê**

Omerî jî carna di nava Canbegan de carna di nava Milan de xuya dikin. Lê êlêka ku demeke gelek dirêj di nava Reşiyan de ma ye. Wek gelek êlên din ew jî li Xorasanê dijîn. Gora ku Melîkonf dinivîsîne: Ev êla Axa Muhemmed Xanê Qecerî, di sala 1780 an de ji Qerebax û Qeredaxê ji bo ku sînorên xwe ji Afgan û ji Ozbekan biparêze aniye wir. Serokê Omerî Axa Muhemmed Xan bûye. Ew di Gulogan de rûdinên. Paşê jî navê xwe bi Gulbadî guhartine. Du par in: 1. **Gogî:** Esfendiyarî, Eskerî, Emîr Xanî, Xadimî, Muhacirî, Mucawirî, Melîkanî. 2. **Omeranî**: Xewanîn, Seydan, Azîmî, Fazil Elî, Mehmûd Canlo, Melik Mehmûdî. Xêr ji wana êlên mina Mirdêsî, Canbeg, Reşî jî di nava Milan de hene. Bi wî rengî êl û zend û konfederasyonê gelek caran ketina nava hev û ji hev veqetiyane. Ew yeka di rewşa Reşî îro lê belavbûne de jî diyare. Êlên girêdayî wê konfederasyonê li her derekê tên dîtin û carna navên nû jî mirov dibîne ku ne ecêbe.

Yek ji êlên girêdayî jî **Cûtikî** ne, ku li Mereş, Semsûr û Meletî dijîn.

**Mûlûkanli-Melle Bekir** ji Reşiyan e û Tirk wana wek Konar -Goçer Ekrad Yorukanî Taîfesî bi nav dikin. Li Semsûr, Kolik, Înecîk-Gelîbolû, Meletî, Erxenî, Dîvrîxî, Bozok, Sari-çîçekdaxi, Arapgirê dijîn.(160-598) Molikî li Meletî di gundên mîna: Ozel, Fatih, Kûyûlû û Egîn de dijin. Hecîmûstafa Ûşaklari cemaatî girêdayî êla **Omerî** ye, ku li navça Gordos-Sarûhan, Kizilhîsar-Sixla, Sêwas, Heleb û Rakkayê dijîn û ji Tirkmenên Yorukani taîfesî ne.(160-396) Cemeeta Hecîomerî ji Reşî ye û li Semsûr, Mereş, Kilîs, Dîlok, Meletî, Tirhala, Helebê dijîn.(160-397) **Halikan-Xelikî** jî bi eslê xwe ji Îranê ne û girêdayî Reşiyan e. Ew jî li: Meletî, Mereş, Qonya, Bîrecîk, Rakka, Erzirûm, Qers, Ahiska, Sêwas, Amasya, Qerehîsari Şarkî, Heskîf, Semsûr, Tokatê dijîn.(160-401) Xelikan li van gundên Cîhanbeglî belav dibin: Xelikên Jêr/Dondûrma (Golyazi), Qemera (Yapali), Qolita (Saxlik), Xelikên Jor (Qerecdax). Serhejmara wan bi tevahî digihîje 25-30 hezaran. **Omeranli-Umranli** girêdayî Reşiyên Milan e; li Şiro, Semsûr, Rakka, Amed, Bîrecîk, Mereş, Canîk, Kutahya û Mûtê rûdinên.(160-748)



**Malbata Dûmanlidax-Qemera**

Omeriyên li Anadolê ji ev gund in: Omera (Tavşançali) 1845, Tavlioren 1870, Çopler 1900, Acikûyû 1920 û Beşkardeş in. Tê gotin ku berata Osmaniyan ya boybegiyê ji Altilara di destê Hesen Beg de bûye. Ew bi pêşniyara Mistefayê

Berkatî (Alîşîroglû) ji alî waliyê Sêwasê ve hatiye dayîn. **Bilikî** jî li nêzîkî bajarokê Şereflî Qoçhîsarê, li gundên mîna: Buyuk Kişla, Kanli Kişla, Hesina (B. Damlacik), Heciyan (K. Damlacik), Kaynar (Odunbogazi), Açikkûyûyê dijîn.



**Du gundên Bilika**

Bilikî-**Şêxbilî** jî li dora bajaroka Çîçekdaxi ne û li gundên mîna: Çewîrme (Çamalî), Torina (Bahçepinar), Hocik/Oçko (Çanakpinar), Çîdeli (Çîxdelî), Uçkî (Uçkûyû), Gedere (Pûhrenk), Qişle (Mehmûdlû), Zekere, Okço, Ramko (Dogankaş) ne. **Mifkî** jî li dora Çîçekdaxi ne û li van gundana dijîn: Kanîkurik (Korpinar), Qişle (Terziyanli), Çîmelî (tevlîhev e), Kûlik (Kûlhoyuk), Pizbênka Jêr (Şûayîplî), Mala Benê-Pizbênka Jûr (Tosûnbûrnû), Ûsînli (Huseynlî), Gûrîo (Yeşîloba), Golî (Gollû), Sêrek (Seyrekkoy), Tawira (Taburoglû), Sira (Ûzûnpinar), Xaladîno (Hatûnoglû), Otko (Arapli Cedît) û Solax (Horla) in. Navê gundên Mifkan bi navê gundên Xorasanê ve gelek nêzîkî hev in. Ji alî din ve Mala Kosê-Kosê Paşa jî li vê herême gelek gund avakirine. Ew bi navê Qerehalîloxûllari ji dora Islahiyê û Meletî hatin bajarê Kirşehîr bicîh bûn. Kalê wan jî dibêjin em ji Xorasanê hatine û ew bîranîn gelek bi nirxe…

Gelek jêder, nûser û keseyetî dibêjin; Reşî konfederasyona Kurdistanê ya heri mezin bû û dema koçber bûn gelek zirar didan gelê nîştecîh û êlên din ên Kurd. Xelkê girêdayî wê komê hatin Anadolê bi şûnde wek nîvkoçer dijîn. Di biharê de diçûn zozanên Yama û Çîçekdaxi. Di payizan de jî diçûn Çûkûrova, Dîlok, Sûriye û Helebê. Riya xwe ya koçeriyê jî di nav aşîreta Baliyan re derbas dibû û hîna jî jêra dibêjin **"Riya Reşiyan"**. Reşiyan di sala 1780 an de mecbûrê îskanê bûn. Di deftera Meletî ya Tahrîr de navê Gundê Çixlikê derbas dibe û di sala 1560 an de wira cîhê Atmali û Çakalliyan ya zivistanê bûye.[15-23]

C. Orhonlû dibêje: Ji bo dewletê pirsgireka herî mezin Reşî bûn. Berê zivistanê diçûn Arabîstanê (gereg Sûriyê be-Ş), lê niha ew terine Bozok û Ûzû-

nyaylayê. Di sala 1830 an de li eyelata Sêwasê ber bi ber cîh kirin. Lê ji bo ku ew bi serê xwe nekevin tevgerê, dewletê **"Nazir"** ji bo wan tayîn kir. Ji bo wê li Qonya û Enqere jî ew kara kir. Nazir ji begê êlan bûn. Bi vî awî rutbek danê û beşdarî berpirsiyartiyê kirin. Êlên mîna Reşî û Avşar ên hejmar zêde, gîştik li derekê ne, bela bela bi cîh kirin. Avşar li Ûzûnyaylê bi cîh kirin. Di sala 1831 an de hîna jî bi cîhkirina Reşiyan berdewam bû.(90-115) Belkî ew sîstema nebûya, dewletê nedikarîbû êlan bicîh bike. Yekê jî wê sîstemê di nava gel de çîneke xwedî îmtiyaz û pişta xwe dayî dewletê derxist, ku wana mala gel şewitandin. Zilma dewletê berê li gel dikirî niha bi destê axayan dibû û ew çi bixwestana dikirin. Yên ku jê heznedikirin dişandin eskeriyê û careka din venedigerî, baca gel giran kirin, xelk wek xulaman bi kar dianîn û dest davêtin ar a gel. Eger wî sîstemî jî têr nedikira dewletê wê carê serokên êlan dîl digirtin.

Di encama wê de Reşiyên di sala 1848 an de zivistan li navça Cîhanbeylî, havîn jî li Çîçekdaxi derbas dikirin bi vî awî hatin bi cîh kirin. Ji bo ku ew bi cîhekî din ve nerin û bihara wê sale bi darêzorê wana bi cîh bikin, ji wan rehîn hatin girtin.(171-239) Qeymeqamê Bozok, di sala 1842 an de ji bo nîştecîhbûna êla Haremeyn (-Cûtika) hema dixwest ku ew kes ji eskeriyê re bêne şandin. Heman tişt ji bo êlên mîna Taban, Heciyan û Têrkan, yên li Enqere hatin bi cîh kirin jî xwestin.(171-242) Îro jî ew navê **Haremî** bi kar tê. Bi vî awî me hewl da ku li ser wê federasyon/konfederasyonê agahiyên girîng bidin. Li ser hejmara wan jî gelek kesan hewl daye ku agahiyan bidin, lê ew bi giştî nayêne hejmartin. Ew ne mumkune jî. Lewra ji bo wê kadro û îmkanên mezin pêwîst in.

Di sala 1290 (1869?1874?) an de li navenda Anadolê xela dibe. Gelek êl belav dibin. Lê ew belavbûna kom bi kom û malbatên nêzîk bi hevre belav dibin, li her çar aliyan pêk tê. Bi taybet Reşiyên ku diçûn Kurdistanê li herêma **Berêz** dijiyan; ku Beraz navê herêmeka li Rihayê ye û ji navê koma Berazî tê. Hinek beş diçûne Çûkûrovê, dora Ceyhûn. Beşekî heta Aydin-Sokê û hinek jî diçûne Samsûn-Bafrayê. Ewên ku rewşa xwe baş jî li cîhê xwe diman. Ewên ku çûn bi piranî vegeriyan cîhên xwe yên berê, lê hinek jê nehatine. Gelek serpêhatiyên bi wê goçê re tekildar in hene, ku hêjayê nivîsînê ne. Emê wê, ji lêkolînêka din re bihêlin, niha jî em li ser serhejmara Reşiyan çend dîtinên nivîskaran ragihînin.


M. E. Zekî dinivîse ku ji Reşiyan 7000 malên xwe li başûrê Erzurimê dijîn.(19) Dr Frîtz jî dinivîse ku li Erzirûmê êlên mezin hene û yek ji wan jî Bilikî ne.(8-26) Di heman pirtûkê de tê nivîsîn ku Mehmûdî û Memî Rîşanê li kela Hoşapê dijîn.(8-43) Li Helebê 27 êl hene, wana: 1-Reşî, 2. Rişvan, 3. Oxçû, 4. Şêxika, 5. Torina....Ji wana tê zanîn ku Reşî Tirkmen in. Borkar di seyahat-nama xwe de wek Tirkmen dide nasîn.(8-52) Li Helebê zivistan, li Sêwasê jî bihar derbas dikirin. Di 1766 an de Nîebuhr dinivîse ku ew 12.000 kon in.(156-112) Niqta balkêş ewe, ku li cîhê gelek jihev dûr Reşiyên bi hejmarên mezin dijîn. Nîebuhr ji bo yên koçber vê yekê dibêje lê bi dîtina min mirov nikare serhejmara Reşiyan hesab bike. Lewra Reşî beşekî gelek mezin ê Kurdên koçber

dike nava xwe.

Mirov dikare ji rapora dewletê dawî îstîfade bike. Lewra dewleta Tirk a kûr hesabê serhildana Kurdan ya dawî dikir û ji bo amadekariya xwe dixwest hejmar û taybetmendiyên êlan bizane ku hesabê xwe bide meşandin...Gor rapora dewleta Tirka a kûr-MIT-artêşê, ya bi mora **"pir pir bi dizî"** hazirbûyî, Reşiyên li Kurdistanê taybetmendiya xwe ev in: hejmara xwe 38.254 kes in, Kurmanc û henefî ne. Li Kolik, bûcaxa Yarpûzlû û gundên wê bi tevahî. Gundên girêdayî bûcaxa merkezê jî ev in: Şêxbaba, Baglar, Arili, Çiralik, Salkimbax, Yelkûvan, Erîkdere, Zeytîn, Çobanli, Ortanca, Çataltepe, Damlacik, Çatbahçe, Koçtepe, Sarikaya, Dolûca, Texmenli. Akicilar: Olûklû, Yixinak. Narînce: gundê Tutenocax e. Beşek ji êle li navenda Kolik û gundên wê; navenda Çelîkhan û gundên wê belav bûne. Ewên li Kolikê û gunden wê nîştecîh, têkiliya xwe bi yên derve û bajarên din re tunin. Girêdayî welatê me ne û tevlî serhildanan nebûne. Agahî: berên (qebîle) mîna: Avûcan, Bekiran, Bişaran, Delî Yûsûfan, Garinan, Gaziyan, Geller, Hecîelî, Hecî Huseyn, H. Osman, Haçmaha, Hamkadom, H. Dedeler, Hesenogullari, Husabahan, Husunan, Kalenderan, Kalvan, Koseûşaklari, Maden, Mahûhan, Memzaran, Mestikan, Mûllan, Murtan, Mûtan, Sixikan, Şîgan, Şîman, Şîşan, Sûrbahan, Teşikan in.[108-24] Dîsa êla Bilikan wek 1717 kes li Xinisê tê xuyakirin.[108-123] Sefkanî li Tekmanê 159 kes xuya dikin.[108-134] Li Nîzîp û Yawûzeliyê bi gîştî 21.275 Reşî hene; Kurmancî, tirkî deng dikin û henefî ne. Girêdayî Reşiyên wir:

- Tûrnalar (Qulingan): Êzîdî
- Arapli: Henefî û Elewî û li Oxûzelî ne.
- Qereşikli: Bi tirkî deng dikin, henefî ne û beşekî jî li Sûriyê ye.
- Çepnî: Tirkî dengdikin û Elewî ne, li Nizîp û Sûriyê hene. Li Îzmîr, Aydin, Erzirûm û Qersê şaxê xwe hene.
- Bereketlî: Li Kercewzê wek 8000 kes nîşan didin. şafiî û Kurmanc in.[108-220]
- Reşkotan: Li Bişêriyê 7500 kes dijîn, Kurmanc û şafiî ne.[108-274]
- Reşiyan: Hîlwanê dijîn, 659 kes in, henefî ne, ji Îraqê hatine.[108-334]
- Nasran: Li gundê Bakimli yê girêdayî Wêranşehrê dijîn 786 kes in.[108-333]
- Mûsil: Êlên mîna Seyhan, Reşkan, Havarî hene ku ew Êzîdî ne.[108-362]

Gor texmîna min Reşiyên li Semsûrê mirov dikare bêje ku ji gundê Narînçê yê girêdayî Kolikê bigire, bi tevahî bakûrê çemê Kahta û bi tevahî Navça Sincixê digre nava xwe û li rojava heta navça Tûtê tere û bi tevahî Kolikê jî dike nava xwe û herêmeke çiyayî ye. Li Meletî jî Atmiyan-Çeqalan, Xelkaşeşin, Delika-Celika, Bistika û Sêvikî hene. Navê Bistika, Pisiyên li Kirşehîrê tînin bîra mirov lê pêwîste hîn kûr bê lêkolîn kirin. Şêniyên Kolikê 100 hezar in ji wan sedî 80 Reşî ne. Sincix 10 hezar in bi tevahî Reşî ne. Wekî din li Çelikhanê (25 hezar) ji % 60 in, li Pinarbaşi û Kûrû Dere jî nêzîkî 20 hezaran însan hene û bi tevahî Reşî ne. Texmîni li wê herêmê 250 hezar serhejmara Reşiyan heye. Wekî min gotî, dewletê ji bo Reşiyan çavên xwe digirtin û zêde nedûçû ser wan. Ji bo wan di bac sitendine de jî em dibînin ku sîstemeke cûda bi kar dianiye.




Nexşa êlên li Kolikê [76]

Wek mînak, gor kanûna kevn: Tirkmenên ku pezên xwe heyî -ji bilî Reşiyan- û ji Ekradan, ber biharê ji her keriyekî (300 pez) miyek û ji her malekê pereyek, yarek penêr û hiriyek dihate stendin. Paşê, şûna penêr û tiştên din sêperê distendin. Tirkmenên ku miyên xwe tuneyî jî pereyek dihate stendin.... Dema ji zozanan vedigerîn jî wek wê bac distendin. Ji Reşiyan, ji berê ve bac nedihate stendin, lê ji bo zozanan pere dihatin wergirtin.(97-411) Reşî bûyîn xwedî îltîmaseke bû, ku dewletê nêdiwêrî jê pere û esker bistîne; eger bixwesta ew dibû sedema serhildan û aloziyên mezin.

Taybetmendiya Reşiyan yek jî ew e, ku li hember zilimkaran mazlûman diparastine. Di komkujiya Ermeniyan ya di sala 1894 an de serokê Reşiyan Yakûb Ragip Paşayê Besnî, Ermeniyên Meletî, Besnî û Semsûrê parastin û nehîşt bila ew zirar wan bibînin. Tewerê ji êla Huweydî yên ku êrişê Ermenan kiribûn 16 kes kuştin; serokê êla Kurd Dirêjan Şatiroglû Mistefa jî hewl da.(100-236) Me ji mezinên xwe bihîst ku heta Komara Tirk bê îlan kirin di nava Reşiyan de gelek Ermen hebûne. Bi taybetî jî ewên ji ber zilma li Zeytin-Mereşê reviyabûn hatin nava Kurdên Anadolê. Tenê li gundê min 15 malbatên Ermen hebûne. Heman tevger li nava Kurdên Sarizê jî pêk hatiye. Gor gotina herême: Mehmet Qahya ji 12 gundên Sine Milî berpirsiyare. Rojekê xeber didinê ku eskerên Tirkan Ermeniyan dawêjine Bîra Comcomê ku ew bê binî ye li çiyayê Qilcanê. Heta digihîje wir 300-400 Ermenî avêtibûn, lê ew 585 kesî ji destê Tirkan digire û heta Helebê dibe, li wir teslîmê Fransizan dike. Jêderên Ermenî, dewlet yan jî mîrîtiyên nêzîkî xwe wiha rêz dikin: Memikan, Boxoran, Reşîdiyan (Reşiyan-Reşkotan) û Mendikan.(19-47) Bê guman bingeheke xwe ya dîrokî û olî ya wê nêzîkatiyê heye.

Li ser ola Reşiyan lêkolîneka serbixwe pêwîste, hêvîdarim kesek wî xizmetî bike; lê bi kurtî; mirov dibîne ku li ser ola Reşî û federasyonên din ên mîna Atma, Sine Milî, Milan, Canbeg û yên din giranî û şopa Zerdeştiyê hîna jî heye. Mezinên me digotin ji Sêvika bûkêkê agirê xwe yê bûkaniyê heta dawiya jiyana xwe şen parastî ye. Di dema koçeriyê de jî wê li ser hêştir di tenekekî de diparastiye. Di çîrokên Reşiyan de agir qet venamire û pîroz e! Cîhê baweriyê jî **Ocax in**. Heta vê dema em têde ne jî, mezinên Reşî, Zerikî, Sine Milî û êlên din sibê li ber rojê dia dikin. Hîna jî gelê me dibêje: ***"Bi vê rojê be!" "Bi rojê sor hîva zer be!" "Bi ocaxa te be!" "Heqê êr/agir!" "Bi serê te be!" "Bi agir ve mîz mekin gune ye" "Tûkê êr mekin gune ye"*** û gelek sond û nifirên bi wî rengî hene. Li gundê Kizilkale-Sêwas du ocax hene. Talîbên-mûmînên ocaxê Babamansûr êlên Sêvika û Balabanê li Zara û Koyulhîsarê dijîn.(164-163)

Hinek dîtin hene ku dibêjin: beşbûna êlan ya wek 12 an ji Sumeriyan û Dûmûzî yê Xwedayê heyiyê tê. Yanî di wî olî de seks pîroz e û ew jî ji 12 salî ve dest pêdike. Sêvika êla min e û girêdayî Reşiyan e. Lêkolînên me di nav Reşiyan û Kurmanc û Zazayên li Kurdistanê kirî de, çanda agir û ocaxan cîhekî xwe yê gelek girîng heye. Agir bi avê nayê vemirandin, tiştên pîs nayên avêtin, dora ocêx hertim paqij tê girtin, ji bo agir hertim vêkeve û ocax dû bike

hertişt tê kirin û ji bo berdewamiya malbatê jî cîhekî xwe yê girîng heye; ewên ku zarokên xwe tunin re dibêjin "Ocax kor" ku ew jî nîşana pîrozbûna agir e. Ew di alî folklorîk de jî bi lîstika Sinsinî hatiye temsîl kirin û di nav Avşar û Reşiyên li Kurdistanê de bi nav û deng e.[128-169] Niqta din a balkêş jî di nav êlêkê de yan jî di nava federasyonekê de olên cûda tên ditin. Wek mînak: Reşiyên li Xorasanê Şîa ne; yên Rûsya û Ermenîstanê hinekê Êzîdî hinekê sunnî ne; yên Kurdistanê him elewî him sunnî ne û yên li Anadola Navîn jî sunnî û elewî ne. Ew belav bûn hêjayî lêkolînê ye. Lêkolîneka bi wî rengî dê naveroka vê pirtûkê ve hevdû temam bike.



**Reşî-Sersor-Kolik**

Gor rapora dewlata Tirk a kûr ku amede kirî (1970) û bi mohra "pir pir wêşartî" hatî bi dest xistin de, Omeran/Omerî li Hezro dijîn, 6400 kes in û şafiî ne.[108-98] Li Ixdirê jî Bilikî hene lê hejmar nîne.[108-169] Li Meletî Argûvanê 2000 kesên Atmekî dijîn ku ew Caferî-Elewî ne.[108-203] Atmaliyên li Pazarcikê jî 19. 029 kes in û şafiî ne. Yên li Afşînê jî Elewî-Sersor in.[108-206] Disa gor wê êla Sevkarî û Sûveydî girêdayî êla **Siyakarî** xuya dikin. Sevkarî ji 1500 kesî pêk tê, şafiî ne û Kurmancî deng dikin. Li gundên mîna Çatmaolûk, Adakli, Yeldexîrmenî û Arica ya girêdayî Kîxiyê dijîn. Bi serhildana Şêx Saît re alîkarî kirin, dîndar in, aram in û girêdayî welatê me ne.[108-79] Selîfkan 900 malbat in, koçber in û havînan tên deşta Mûşê.[19-176] Bi vî awayî em dibînin ku di nava federasyona Reşiyan de gelek ol û mezhebên cûda hene. Ew jî îşareta wê yekê ye, ku ew olên piştî Zerdeştiyê bi darê zorê bi Reşiyan dane pejirandin.

Kincên êlên li dervayê Welat ji herêmen din ên Kurdistanê cûdatir in. Di piraniya êl û zendan de kinc hema hema wek hev in. Jin, xeftan-zebûnê sê etek-ber li xwe dikin; berên pan li paş û herdû berên din li pêş bi ser jûniyan de dirêj dibûn. Di bin de jî hêvalkiras-derpêkî dirêj li xwe dikirin. Bi ser wan de jî pêştmal-bervang berdidan û heta lingan dirêj dibû. Di lingan de jî keloş hebûn. Di jor re jî kirasekî bê sukir û bi ser wî de jî kolcix-salte li xwe dikirin. Bi ser wan de bi ser zendê xwe de kolçix li xwe dikirin. Nav jî bi pişta terêbûsê dipêçan. Di demên berê de, yanî berî 50 salan, jinan kofî didan serê xwe. Taseka bilind didan serê xwe û bi şara girêdidan. Serî şarê jî gor qudreta malê pîlîkên zêrînî, zîvînî û yên hesin pê ve dikirin. Lê niha ew neman; tenê serlihêf û şar e. Mêran jî, derpê û bi ser wî de fîstanê sê etek; di jor re jî kiras û çakêt bû. Ew jî kaloş dikirin lingên xwe. Serî keç didane. Kincên êlên Anatoliya Navîn bi yên Xorasanê ve gelek nêzîkî hev in. Mirov dikare yên rojavayê Kurdistanê jî li wan zêde bike.

Li kêleka mîrê êlê, ji her qebîleyekê kesek hebû û koma rûspiyan pêk dianîn.[158-3] Ew jî sîstema êlan ya rêxistinî dide nîşandan. Heman sîstem ji bo federasyonê jî hebû ku her serok-êl di civata serokê zendê (mîrêmîran) de kom dibû û biryar tevhev werdigirtin.

Halaçoglû dibêje: Zend (boy) ji alî Boybeyî (mîrêmîran) ve, êl jî ji alî Mîr ve dihate birêvebirin. Beg ji nava Zendê û ji nav kesên bi cesaret, maldar û rast dihatin hilbijartin. Mîrîtî ji alî dewletê ve dihate pejirandin bi şûnde dikete kiryarê. Lê di nav Reşiyan de ew cûda bû; mafê hilbijartina Beg tenê di destê rûspiyan û kesên din ên peywêndîdar de bû.[156-17] Sîstema Reşiyan gor wê demê gelek pêşketî û demokratîk e ku beg ji alî mîr û rûspiyên zendê ve dihatiye hilbijartin.

Gelek kevneşopiyên Reşiyan hene ku bi yên êlên din ve wek hev in. Wek mînak: di dema koçberiyê de wexta yekî kesekî xwe dimiriye; Êlan derdawê konên xwe berdidane, telikê ser kumên xwe jê dikirine, benê bi ser saqoyên xwe de berdidane, balîfên jûrê-odê ku enîşka xwe didan serê dizivirandine, kincên xwe vajî dikirin, neynikan paç dawêtin ser, tazî nediketin nav nivînan

û mehekê li cîhê şîne rûdiniştine...

Dema jinek mêre xwe dixapîne yan jî jinek bi mêrekî ve li ba hev didîtine, porê jinikê jî kur dikirine û ew tazî dikirine û ji mala bavê re dişandine. Ecêb e ku ew nedikuştine û ji bo ku di nava gel de rezîl bibe jî ew yeka dikirine.


Di dawetê de jî jin û mer diketin destên hev û dîlanê dikişandin û ew dibûye sedem ku xort û keçan hevûdû dîtiyê, qewl ji hev distendine. Yekê jî berê di malan de bi desdarê savar dihêran û di malekê de keç û xort digihîştin hevûdû. Li nava odê destar bi cîh dikirine û li dora destar yek keç yek law rûdiniştiye û bi darê destar digirtine. Ew hevdîtin tiştekî eşkere bûye. Gor wan kevneşopiyana civakeka gelek serbest û demokrat bûye; ti têkiliya vê civatê bi êdetên Îslam û misilmantiyê re jî tunebûye.



**Gundê Sêvika kincên Reşiyan yên nû**

# ŞÊXBIZIN
# (LER-LEK-LOR)

Li Anatoliya Navîn êl yan jî federasyoneka Kurdên bi navê Şêxbizinan heye, ji zaravê xwe re jî ew dibêjin Şêxbizinkî. Gor lêkolînên min kirî û hinek cîranên Şêxbizinan yên Kurmancî axêf ji van Kurdan re dibêjin **Ler-Leran**. Hinek wek **Şazî** jî bi nav dikin, dibe ku cîhên jê hatibin; ew jî dibe ku Şehrîzor, Şîraz yan jî Şîrvan be...Hema hema piraniya Şêxbizinan navê Ler li xwe nakin û nizanin jî; mumkune berî 50 û 100 salî ew bizanibiyana lê îro tenê dibêjin em Şêxbizin in. Wata wî navî jî Kurdên herêma Haymanê kes tam nizane; herkes gora xwe şirove dike. Ji gundê Kosê Abdal-Haymanê Hafizê Sadûlah (di 1997 an de 67 salî) dibêje: Şêxekî me hebûye û bi tirkî gotine "Şêxê me-Şêx bizim" û bûye Şêx-bizin. Hinek jî dibêjin: Ew bizin xwedî dikirine û ji bo serokê wan jî şêxek bûye gotine: Şêxê-bizinan û hwd...Eger mirov li secera (dara jiyana êlê) Şêxbizinan mêzebike, tê dîtin ku gelek navên kesan wek Şêx têne xwendin. Ew jî îşareta wê yekê ku navê Şêx di nav wê êlê de kevneşopiyek e. Eger ew xwe bi bizinan jî xwedî dikiriye-ku ew jî sedî sed e, lewra ji çiyayê hatine tenê dikarin bizin bijîn- xêre ew nava koka xwe ji wir digire. Niha pirs ev e: Gelo Şêxbizin Lek in an na û herêma wan ê dayik ku jê hatine kuder e?



**Hafizê Sadûlla**

R. Blaga ji pirtûka "Qewmê Lor" wiha radigihîne: Cîhê ku Lek lê dijîn re Lekestan tê gotin; di navbera bakûrê rojavayê Loristan (li sê navçên mîna Horru, Selsele, Delfanê dijîn), Kurdistan, Ezerbeycan û Farsîstanê ve cîran e. Îlam, Lûmar (Şîrvan Çardavol), Mehran, Nehevand, Melayar (%50), Hurremabad (%40) û Burucerd jî dikeve nava Lekestan.(95-160) Ji wir em fêr dibin ku herêmeka bi navê Lekestanê heye û bê guman ji gelê li wir dijî re jî digotin Lek. Gelek jêderên din jî wê dipêjirînin û zaravê Lekî bi Lorî û Goranî ve girêdidin.

E. Yawûz dibêje ew li başûrê çemê Guyê rûdinên.(104-50) Dr. Roûsseaû dibêje: Bextiyar, Feylî, Lek-Lok bi Lorî diaxifin.(104-59) Xuyaye ku ew koma Kurdên başûr pêk tînin. Li Loristanê (Lakîstan), zaravayên kurdî yên başûr bi navê **Lakkî** tê zanîn.(142-47) Herêm, ji alî gelê wir ve wek Lakîstan tê binavkirin. Hema hema tevahiya nifûs bi **Lekiya ku zaravê Goranî** diaxivin. Goranî û lehça xwe ya jêrîn Lakî, Pehlî/Feylî û Hewramanî li herêma bloka ziman pêk tînin.(154-32) Di alî ziman de nêzîkî Kelhorî û Kirmanşahiye. Lekî nêzîkî Goranî ye û ji gîştiya wan re Lorî tê gotin, lê Lekî nêzîkî Kurmancî ye. Zimanê helbestê ye; nivîsên olî ye. Ehlî-Heq û Şîitî bi wê zaravî ne.(95-160) Ji zanyariya wan nûserena bi şûnde mirov dikare bêje ku: **Lek-Şêxbizin şaxekî Goranan e**.

Di pirtûka herêmî ya bi navê "Yenice û Şêxbizin" de tê nivîsîn; ku welatê Şêxbizinan yê yekemîn navça Bazanê girêdayî Silêmaniyê ye. Ji bo Bazan di "Kamûs'ul Alam" de wiha tê nivîsîn: 30 km li rojavayê bakûrê Silêmaniyê, li kêleka milekî Dîcle ye, sê hezar nifûsa xwe heye, bi nehiya Sêvkê ve tevhev 159 gundên xwe hene û heft êlên Kurd lê dijîn. 10 hezar serhejmara xwe heye û hemû misilman û Kurd in. Şêxbizin ji ber sedemên nayê zanîn çûne Yêmenê û demekê li wir mane. Di dema Emewiyan de, Kurdên li Yêmenê hatin koçber kirin û ew çûn Xorasanê, di nava wan de yên Ehl-î Beyt jî hebûn.(92-5) Ji wir jî em fêr dibin ku herêmêk yan jî navçeyek bi navê Bazan jî heye ku îhtîmala yekemîn ewe, ku navê xwe ji wir wergirtin. Ew herêm li ser silsila çiyayê Zagros e û bi dirêjahiya dîrokê re bûye welatê Kurdan.

Li ser wan çiyana wekî berê jî me got gelek êlên din ên Kurd jî jiyane. Dibe ku di dema koçberiya wan de, yan jî piştî tekoşîna li dijî Ereban tevhev hatibin bakûr û Anadolê. Nivîskarên Ereb dîroka di sedsala X û XI an de qala Kurdên li Şehrîzor, Kirmanşah, Hamadan, Nehavendê dikin û wê demê Şehrizor navenda eskerî û politîk e. Yane herêma di navbera Hewlêr û Hamadanê di destê Kurdan de ye. Li gorî Ebû Dulaf, xaka Şehrîzor ji aliyê qebilên wek al-Calaliya, al-Yabsan (Basiyan), al-Hikmiya û al-Suvliya ve dihate çandin.(3) Ji wan Celaliyan em nasdikin û me qala wan kiribû. Bi dîtina min Suvliya jî Kurdên îro em wek Sewêdî bi nav dikin e. Yên din ez nizanim kîjan in, lê dibe ku Şêxbizin jî di navê de hebin. Dîsa li gora heman nivîskarî, Kurdên wê herêmê ji xelîfe re seri nedanîne. Gorê belgeyên dîrokî heta sedsala X an hebûna Kurdan ya li Xuzîstanê tê qebûl kirin, ji wê demê bişunde êdî Ereb dagir dikin. Ibn Haukal û al-Îdrisî, dibêjin Loristan cîhekî dewlemend ku Kurd lê dijîne. Cografyazanê meşhûr Yakût jî dibêje li çiyayên Isfahan û Huzistanê qebîleka Kurdên bi navê al-Loriya dijî.(3) Bi vî awî em dizanin ku Loristan-Lekestan welatê Şêxbizinan yê kevn e. Ew kevnbûn jî diçe bi hezaran salan dibîne.

Wekî Şerefname û Şahname jî didin xuyakirin, berî hezaran salan Kurdên wir kalên Loran, **Lar** bûne. Gurgîn Mîlad ku di meydana ceng û şeran de tekemêr, çavnetirs û di merdîtiya xwe de bêmîsal bûye Kurd e û nêzîkî 4000 salan e neviyên wî di wîlayeta Lar û Fars de fermanrewayên serbixwe ne.(157-65) Ez jî di wê baweriye de me ku ew der welatê Kurdên Lor e. Lê hinek

dîroknûsên Tirk dinivîsînin; ku li Turkîstanê bajarê Lolan ji Loran ma ye.[91-21] Ew bajar ji sedî sed ji Lor-Lekên di dema Saka de li wir jiyane de ma ye. Di beşên derbasbûyî de jî me gotibû, ku çûyîna Macaran re û bi tevgera Atîlla re (Bi dîtina min Atîla bi xwe jî Kurd e-Reşî) jî gelek Kurd berbi rojava çûn. Li ser wê bingehê: Lekên (-Erdalan) ku çûbûn Romanya navê Erdel cîhîştin; xelîca li bakûrê rojhilatê Derya Kesk Erdelî jî navê xwe ji wan wergirt.[104-54] Ewliya Çelebî dibêje: Ew ji ber êrîşên Asûr hatin Anadolê û Qefqasya; beşek ji wan derbasî bakûrê Qefqasan bû, bi artêşa Attîla re heta Macarîstanê çûn. Lewra li Macarîstan êlên Kurd û Tirkên ku nav danî cîhan de **Keleha Lek** jî heye.[104-61] Ew nav lênana jî îspateke ku Kurdên çûbûn Macarîstanê û ewên ku dîrokzanên Macar qal dikin beşek jî Ler in. Fîrdewsî, di pirtûka xwe de qala serpêhatiya çûyîna xwe ya Bexda (1031) dike. Ew li ser Xelîfe helbestan dinivîse, xelîfe ji şiîrên wî hezdike, lê ji bo ku wî ji bo padîşahên Îranê yên bi agir bawer dikirî re jî helbest nivîsîne, ji vê yekê hez nekir. Ji ber wê û ji ber tehdîtên padîşahê Zabilistanê Mehmûd ji Bexda derket çû Ehvazê. Li wir ji derbasî Kuhîstanê bû. Hakîme Kuhîstanê **Nasir Lek** bû û ew bi awakî merasîmî pêşwazî kir. Nasir dostê Mehmûd bû. Mehmûd paşê Firdewsî efû kir.[86-16] Ew jî dide xuyakirin ku Lek wê demê li herêmê desthilatdar in û navê serokê xwe jî Nasir Lek e. Îhtîmala duyemîn ewe ku Lekan navê xwe ji wî kralî girtibin. Ya seyêmîn jî ji Şêxen xwe pir girtin.

Dîroka Lek-Şêxbizinan ya kevn mirov dikare di nava Saka de jî bibîne û ji 24 êlên Oxûzan **Beçenek** jî kalê Şêxbizinan e! Îhtîmaleka pir mezine ku Şêxbizin di dema Ebbasiyan de jî hatibin Anadolê. Lê pêdiviya vê bi lêkolînên kûr hene. Di qeydên kevn de û di Şerefnamê de tê gotin, ku di sala 1156 an de serdarekî Lora yê serbixwe tunebû, ew girêdayî xelîfe bûn. Di dawiyê de, Husameddîn Şûhlû ku ji Tirkên Avşar û girêdayî Selçûqiyan bû, kirin fermanrewayê Loristanê.[157-84] Wekî di beşên berê de jî me got, Avşar Kurmanc in û girêdana wan bi Selçûqiyan a di wata Tirkan de jî me qal kiribû ku nîne. Tirkan ji Kurdên koçber re gotine Selçûqî. Bi dîtina min wê demê Kurmanc bi Lekan ve tevhev fermanrewayê ava dikine. Piştî Şûhlû, Şuca'eddîn Xurşîd bû hakimê Lora Biçûk. Xurşîd, herdû kurên xwe şandin ser êla **Cengrûyî**-wîlayeta Simhayê. Dema herduyan Kela Reş kirin bin dorpêçê, Heyderê Xurşîd hate kuştin. Xurşîdê bav, sond xwar ku kesek ji vê êlê sax nemîne; bi ser wê de hemûyan malê xwe barkirin.[157-85] Ew **ji bo koçberiya Şêxbizinan alternatîfa yekemîn e**; eger ew bin, wê demê Cengrûyî jî navê federasyona Şêxbizinan a li destpêkê ye. Lê dîtineka balkêş ji alî Seferoglû ve tê: Lor, di navbera çiyayên Xuzîstan û Isfahanê de dijîn. Qebîleka tevlîhev e, hîna jî di nava wan de Avşar, Bexdilî, Çaxatay û Qerebaxli dijîn.[91-20] Ew dîtineka gelek girînge; lewra, ew êl yan jî federasyonên têne hejmartin bi piranî Kurmanc in û piraniyan wan kalên Kurdên li Anadol û dervayê welat in. Ew dîtina min ê li jor jî piştrast dike. Ew yeka derdikeve holê, ku wê demê beşek Kurmanc û Şêxbizin niha li navenda Anadolê li Loristan tevhev bûne. Ku em dizanin ew ji navenda

Xorasanê hatibûn wir. Ew bûyera me li jor neqil kirî jî, ya di alî demê de bi kêmasiye yan jî ew beşekî din ê Lekan e. Heman niviskar dibêje; zimanê xwe jî Kurdî (mebesta wî Kurmancî ye) cûdatir e, lê ew bûne Kurd. Bi pêşengiya Kurdên Fazlûyî ji Sûriyê koçkirine, **li rojhilat û başûrê Gurcîstanê di sala 1155 an de Lora Mezin hate damezirandin**. Bi hatina êlên Kurd û Erebên mîna Bextiyarî, Haşîmî bi hêz bûn û heta sala 1423 an mîrîtiya xwe dom kirin.[91-20] Ez tevlî dîtina cografya tê tarîf kirin nabim; bi dîtina min wê demê Şêxbizin ketin nava dewleta Şadiyan. Dema damêzirandinê rastê serdema Şadiyan ya dawî tê. Fermandarekî Şadiyan yê bi navê Fazlûn (1126) heye ku Anî rizgar kiribû. Berê jî me gotibû ku **di nava dewleta Şadî de Lek** hene. Ji wir ew encam derdikeve: Lekên-Şêxbizinên di nava dewleta Şadî de, bi belavbûna dewletê re hatin Anadolê. Ew ji bo koçberiya Şêxbizinan îhtîmala herî bi hêz e. Dibe ku ew Şêxbizin li Erzirûm, Gîlanê binemalê wan bin. Yekê jî em dizanin ku hinek ji Şêxbizinên li Haymanayê ji Erzirûmê hatine. Dîsa têkiliya wan bi Şebankarê vê jî heye ku me qal kir ew di wata Şivanê-kar/bizinan de ye, eger mirov wê tercûmê tirkî bike dikare bibe Şêxê/Şivan-bizinan... Îbn Batûta radigihîne ku; **Mîrên Lor ji Loristanê êla Şûlan qewitandin û ew çûn Farsê**. El-Omerî jî radigihîne, ku Şûlan bi Şebankaran ve têkiliya xwe pir nêzîk hebûye. Di sala 1260 an de eskerên Kurd, Şûl û Tirkmen bajarê Mûsil li hember Hulagû parastin. Dîsa qebîleka din a Lor li bakûr û rojavayê Loristanê bi alîkariya Tirkmenên Şûmlû di sala 1155-1186 û 1184-1597 an de Lora Biçûk ava kir. Bi êlên mîna Bayat, Yîva, û Avşar re tekoşîn kir û heta serdema Sefawiyan jiya.[91-20] Şamlû-Şamî jî Kurd in; lê em baş nizanin ku ew Ler in an ne û nêzîkbûna wan bi Reşiyan re heye. Herdû bûyer dişibin hevdû, dibe ku di bingeh de bûyerek be û bi vî awî beşekî Lekan ji Loristanê derketin. Şerefxan dibêje: Kralê Bayata ku yekî Tirk bû, êrîşê (texmînî sala1220-Şoreş) ser Loristanê kir lê şikeşt û vekişiya. Hemû wilayeta Bayat kirin ser Loristanê.[157-86] Bayat jî Kurd in, îhtîmaleke ku ew Têrikî bin û ji wê herêmê hatin rojavayê Kurdistanê. Tîmûr di sala 1389 an de kela Damyanê li Berûcerd heyna û emîrê wê Elîk Îzzûddinî şand Semerqentê.[39]

Kurê Tîmûr **Şahrûx bi leşkerekî pir di sala 1427 an de hate ser Loristanê û dawî li hikumeta wan anî**. Li Loristana Biçûk jî di sala 1502 an de Şah Ristemê Xurşîdî bû serokê hikumetê. Osmaniyan bi Sefawiyan xwestin ku ew hevalbendiya wan bike. Wî jî hevaltiya Sefawiyan hilbijart. Wek tê zanîn ew şafîî bûn. Di sala 1576 an de Şah Ristemê III an bû serokê Loran û bi Siltanê Osmaniyan Mûradê III an re hevkariyê kiriye û bihev re li dijî Sefawiyan şer kirin. Lorên biçûk 487 salan hukumdarî kirin, lê di dawiyê de nikarîn xwe li dij dijmin biparêzin û hilweşiyan. Di sala 1682 an de dawî li hukumdariya wan hat.[32] **Dibe ku di dema Şahrûx de jî hinek Kurdên Şêxbizinî koç kiribin; ew alternatîfa duduyan e.** Lê berî wê dîrokê em wan li Navenda Anadolê dibînin.

Piştî êrîşên Moxolan em Şêxbizinan li Anadolê û di qeydên Osmaniyan

de dibînin. Di **deftera Osmaniyan tahrîr-nifûsa ji sala 1539 an de mayî dinivîse, ku Şêxbizin ji Qastamonûyê heta Erzirûm-Otlûyê bela wela wek koçeran dijîn**. Ji ber ku adetên kevn ên Êzîdiyan di nav wan de hene, Sunniyên derdora wan heqaret li wan dikirin. Lê di eslê xwe de navê wan ji "Şah Basnî" tê.[174-82] Dîtinên din jî hene ku dibêjin Şêxbizinî li Mûş, Malazgirt, Varto, Elezîz, Palû, Ezingan, Gumuşhane, Baybûrt û Amedê nîştecîh in, ji ber şerê Çaldiran û êrîşên Selim di bandora wan bûyerêna de ma û di bin serokatiya Şêx Huseyn de li herêma Haymanayê bi cîh bû. Alakom dibêje; di aloziya navbera Îran û Osmaniyan de gelek Kurd hatin şandinî Anatoliya Navîn; tê gotin ku Şêxbizinî di serokatiya Şêx Huseyn de hatine li Haymanê bi cîh bûne.[126-40] Di we demê de niqta derepêş dikevî ev e, ku Şêxbizinî bi Osmaniyan re tevdigerin û ew ji êrîşa Selîm jî zirar nedîtin.


Di pirtûka Cewdet Paşa ya bi navê "Ma'rûzat" de: Li sencaxa Kozanê civatên Tirkên ji Selçûqiyan mane yên bi navê **Farsah (Varsak)** dijîn. Ew gelê çiyayî û eskerên Kozanoxûllari ne. Êlên li keviya çemê Ceyhan jî eskerên wan in. Ew êlên han havînan diçûne nava Anadolê û zivistanan jî li Çûkûrova diman. Yanê di navbera Kozan û Edenê de. Ew êlên mezin: Avşar û Sarkintili bûn. Yen biçûk jî: **Kirintili, Lek û Hecîlerê Kurd** bûn. Ew Kurdana pir şervan û talanker bûn.[83-120] Bala xwandavana bikşînim ku ji bo êlên girêdayî Leran peyva Kurd bi kar tê. Yanî di qeydên Osmaniyan de êlên wek Kurd derbas dibin re, eger mirov bibêje êlên Ler in raste. Nehiya Hecîler bi deşta Amîk re cîrane. Li vir êla bi navê Qerefakili dijî; ew jî hov û asî ne.[83-128] Hîna jî li navenda Anadolê gundê Qerefeqiyan heye. Ew jî dîtineka cûda tîne holê: Ji wê em dizanin ku Tirkan **êla Şêxbizin wek F/Varsak binav kirine**. Ya din têkiliya wan û Kozanoxûllari ye. Ya herî girîng jî ewe, ku di dema Selçûqiyan de ew hatine. Ji bo wê jî sê alternatîf hene:

**1-** Ewên bi Kurmancan-Şadiyan re yanê ewên li Arran, ji ber Tirkan revîn, hatin Anadolê. Berê li dora Qastamonû paşê jî çûn Çûkûrovê.

**2-** Ew Kurdana wek Şivankaran dihatine binavkirin, di derdora salên 1200 an de ji dora Ûrmiyê hatibûn. Ew dikare bi ya yekemîn ve jî bibe alternatîfekî û em dizanin ku di sala 1357 an de Sînop û Qastamonû di destê wan de bû. Mumkune ew du şaxên Şêxbizinan bin.

**3-** Ew ji Loristanê bi êlên Avşaran ve tevhev hatine bakûrê Sûriyê.

Tê îddea kirin, ku di şerê Çaldiranê de (1514), Şêxbizinan alîkarî dan Yawûz û piştî şer ji wan re Secere hatin avakirin û di wan de hat nivîsîn ku ew: "Ewladê Resûl Seyyîd" in û li kuderê bixwazin dikarin nîştecîh bibin.[92-7] Secere raste, lê ji bo wê hewcedariya alîkariyê ne pêwîste, yan din jî, li ku bixwazin bi cîh bibin jî bi min zêde rast nayê. Lê dibe ku wê demê Yawûz destûr dabe ku bên navenda Anadolê; lewra têkiliyeka baş di navbera wan û dewletê de xuya dike. Lê nayê wê watê ku ew her tim wiha bû. Ew ji bo demeka kin dibe ku mumkun be. Lewra li ser Şêxbizinên Anadolê jî gelek fermanên komkujiyan û bicîh kirinê hene. Yek ji wana ev e:



Rûpela secereyê ya bi mohra Padîşah


Di sala 1576 an de fermanek heye, lê di wir de ne diyare ku ew li ku dijîn. Dibe ku cîhê wan Çûkûrova yan jî dora Elezîz û Palû be. Ferman wiha ye: **Ji Begêbeganê Mereş û ji Qadiyên Samantû, Goksûnê re!** We ji min re name şandiyê ku Danişmendiyan êrîşê Avşaran kiriye. Dema tu çûyî parastina Wanê, ji ketxûda yê civata Avşar Recep, Behrî û Kuçuk Mînnet hatine û ji kethûdaye civatên Tirkmanî Danişmendlû û Lekvanik Zekeriya û Xûdawerdî re girêdayî 400-500 siwarî hatine, malên wan talan kirine û şeş kesên wan kuştine...Sal 989-**1576**.(161-48) Wekî berê jî min nivisî di sala 1578 an de ji bo Reşiyên li Meletî jî fermaneka bi vî rengî derxistibûn...Di vê fermanê de tiştê din ê bala me dikişîne ev e: Gelo ji bo Şêxbizinan dibêje Danişmendî an Şêxbizinan bi Danişmendiyan ve tevhev êrîş kiriye? Gor dîtina min ji Têrîkiyan re Danişmend tê gotin, lê dibe ku ji bo Şêxbizinan jî bi kar dihatiye...Piştî vê tarîxê jî jêder nîşan dikin, ku Şêxbizin li Çorûmê bûne. Dibe ku berê jî girêdayî wê eyaletê bûn û êrîşî Avşaran kirine.

**Ji bo tamîra zilma li Danişmendan!** Tirkmenên Lekvanik arûzû hal kirine, ku we ji bo eskerên Îslamê pênc qenter (her qenter şeş hêştir e-Ş.R.) hêştir û 500 miyên rêş xwestine. Dema ev fermana gihîşte destê we, miyên ku te ji wan sitendibûn dîsa vegerîne û zilmê li wan meke! Sal:1019-1606.(161-64) Di vê fermanê de jî navê Danişmend bi gîştî tê xuyakirin, dibe ku di nava konfederasyona Danişmend de federasyona Lek-Şêxbizin jî hebû.

C. Turkay dinivîse, ku **Lekvanik-Lek-Farsah-Varsak-Şêxbizin di salên 1600 an de li Çorûmê dijîn.**(160) Orhonlû jî dibêje: Cemeetên Lekvanîk li sencaxa Çorûmê diman (XVI), sê civatên girêdayî wan li Rûmelî ne, di nava navçeyên Malkara û Kavakê de belav niştecîh bûn.(90-18) Ew kîngê û çawa çûnê em nizanin. Ew qeyd gelek girîng in, lewra: di destê me de secera Şêxbizinan heye, ew cara yekemîn di sala 1622 an de hatiye pejirandin.

**Secere bi gelek navan dest pêdike**: "...Seyid Şêx Îlyas- lawikê Seyid Şêx Xizir, lawikê Seyid Şêx Yûsif, lawikê Seyid Şêx Hûsên lawikê Seyid Mihemmed Mûsayê II yê lawikê Seyid Îbrahîm el Murtaza- lawikê îmamê hîman El Mûsa Kazim Îmam- lawikê îmam Cafer El Sadiq, lawikê Îmam Mihemmed El Baqir Îmam Zeynel Abîdîn, lawikê Elî Seyidê Bextewer torinê pêxember Eba Abdullah Hûsenê kur şêrê serketî Elî lawikê Ebû Talîb ku pêxember gotiye: "*Ez bajarê zanînê me û Elî deriyê wê ye*". Riza xwedê li hemûyan be û em ji bereketa wan xêr û xweşiyê bibînin. Bereketa wan li ser me hebe, li dinya û qiyametê Xwedê tu heşra me di nava wan de bike selam û selatên Xwedê li ser Seyyidê me baştirîn mehlûqê Xwedê û li ser alê wî hemya Xwedê tu lime û li hemû ummeta Mihemmed xweş bibe. Naveroka wê dara jiyanê, di 10 parçe kaxezên ku bi hevre hatibûne zeliqandin bû, ku ev edet e. Ji wan 5 parçên beşa yekê ye û li ser wan nesebên pîroz hate nivîsîn. Lewra ev destûra bo hemû neseba digel îmza kirine û 5 parçên kaxizên din ku bi hevre zeliqîne, meqseda me li nivîsana wan ku 62 nav (yan jî 62 xet) li destpêkê heta dawiyê têde ne û me nivîsîna wê temam kir di roja 2 ye meha 11 Muherremulheramê sala 1047

ê hicrî qemerî, yanî li **sala 1622** ya zayînî. " ew dara jiyana êla Şêxbizinên li bajarê Amedê hatiye pejirandin.



**Rûpela Secereyê ya yekemîn**



Secera Şêxbizinan ya bi mohra Padîşah

Wekî tê tespît kirin, carna têkiliya Şêxbizinan û Osmaniyan re başe, lê ew Kurdana jî, ji bicîhkirina bi darê zorê para xwe distînin. Di sala 1691 an de bi Reşiyan ve tevhev û bi darêzorê ew li Rakkayê hatin bi cîh kirin. Wê demê em dibînin ku çar berên wan hene:

**1. Heciyan.**
**2. Akbaş:** Ji Rakkayê hatin Anavarza-Edenê, lê dewletê di sala1699 an de dîsa şandin.
**3. Kizil Koyûn:** Kizilkoyûnlû yên girêdayî Lekvanik, li sala 1721 di navbera Îznîk û Sapancê de bi cîh kirin; paşê li Qeremursel rastî êlên bi cîh bûnî jî hatine.[90-109]
**4. C/Kirinti.**[160]

Di beşên derbasbûyî de jî me qal kir, ku Reşî di sala 1697 an de vegerîn û xuyayê ku Şêxbizin jî vegerîne û beşek ji wan çûye Edenê û çiyayê Anavarzê. Di sala 1721 an de ji bo Lekvanik û Kizil Koyûnlûyan herêma Anavarza hatibû tayîn kirin. Ji Lekvanikan berê Akbaş li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin, lê ew reviyan Anavarza-Adanaye; ji wir jî di sala 1699 an de rakirin û dîsa şandin Rakkayê.[90-81] Dewletê beşekî ji wan li Îznîkê û beşekî disa şandiye Rakka û beşek jî hate Haymanayê. Ewên li Rakka, agahiya me li ser tune, lê îhtîmaleka pir mezine ku piraniyan ji wana fîrar kiribin. Li ser bicîh kirina bi darê zorê û şerê bi Osmaniyan re gelek kilam hene, lê em tenê çarînkî binivîsînin:

| | |
|---|---|
| " Yozgat tarafından de çıktı bir paşa | *Ji alî Yozgatê paşeyek derket* |
| Avşar'ınan Kurdü yaktı ateşe | *Avşar bi Kurdan ve şewitandin* |
| Çadırcı emeğin gitmesin boşa | *Xwediyê kon ma keda te vala neçe* |
| Beri gel hasmın gor Mecît Paşa " | *Pêşde were Mecît Paşa reqîbê xwe bibine* |

Di vê stranê de Kurdên ku derbas dibin gereg Şêxbizin bin, lewra Avşar jî Kurd in, lê di belgeyan de navê Kurd carna ji bo Kirmanca-Zaza carna jî ji bo Lekan tê nivîsandin. Di vê kilamê de îskana bi darêzorê tê qalkirin û ew Kurdên derbas dibin jî li Edene-Kozanê nîştecîh kirine. Gundên xwe ev in: Aslanli, Hayvali, Hecîler, Uçdût û Hamam in. Gelê wir dibêjin **"em ji Xorasanê hatine û navê me Kurdên Lek û Kirinti"** ye. Di belgeyên dîrokî de bi navên: "Lekwanik Ekradi" û "Lekwanik" û "Tedavîî Kirinti û Heciyan" sê camaat derbas dibe.[99-12] Berê ferman hatibû dayîn, ku hinek ji Lekvanik li dora Çemê Belîh bi cîh bibin; lê ji ber ku cîh nemabû, ji wana 466 kes li nehiya Riha-Çîtîlî bi cîh kirin. Lek û Yîva li Akçakalê, qebîla Akbaş li gundê Maxarcik, Hecîler li gundên mîna: Koprulu, Harmanlik, Celavend Kûyûsû, Kizilorûç, Bexdat Vîrani, Hoyukler û Bozorûçê bi cîh kirin. Ji bo ku li Rakkayê cîh nemabû, Kizilkoyûnlûyên Lek li Rihayê li gundên mîna: Kizilca, Guneyvîrani, Kaab Dexîrmenî, Gobeklerê bi cîh kirin.[90-62] Piştî vegera ji Rakkayê em gelek fermanan dibînin.

Êlên mîna Gungordu, Delîlî û Kirintili 400 şakî, du-sê sal in ku li deşta Develiyê nîştecîh in, di sala 1699 an de xwestin bişînin Rakka û li wir nîştecîh bikin. Lê ew neçûn û di navbera Bor, Nîxde, Urgup, Ûlûkişla, Kaymakli, Kayî û Erexlî de digerin, zilim li gel dikin û bênderên wan talan dikin. Di sala 1702 an de, Begê Beganê Mereşê Reşî Xelîl Beg re fermanek hate şandin, ku wan bişîne Qibrisê.(156-47) **Dulqadir li navbera Kinik û Berendiyê bi cîh hatibûn kirin ku baca xwe bidin, lê ew qewlê xwe neanîn cîh û bi Lekvanik ve bûn yek û li Kurt Kulaxiyê êrîşê Îsmaîl Paşa kirin û malê wî talan kirin.**(156-50) **Kozanoglûyê li Mereşê nîştecîh re hukum e! Berendiyê ji êla Kinik ên li Zulqadir rûdiniştin û bi çandiniyê re mijûl in ji deh salan vir ve ew baca xwe nadin û bi mafê xwe ne razî ne. Li wê herêmê, ew talan dikin û mirovan dikujin. Ew bi Ekradê Lekwanik re îttîfaq kirine û li herêma Kurd Kulaxi êrîşî Îsmaîl Paşa kirine û ceseretê dane rêbiran. Ji Waliyê Qeremanê Hesen Paşa ji bo wan ceza bike re wezîfe hatiye dayin. Tu jî meriyên xwe bi çek heyne û here alîkariya wî, sal: 1118-1705.**(161-134) Gor Niebuhr, Lekvanik di sala 1766 an de li Sêwas û Enqere 1000 kon bûn.(156-61) Di sala 1703 an de xwestin ku li Anavarza bi cîh bibin lê dewlete qebûl nekir û bi malê xwe yên 6000 qûriş dikin ve şandin Rakkayê. Pir hindik li Rakkayê bi cîh bûn; yên din belav bûn. Ji wan 500 xane li cem torinê Pehlîwan, **500 xane li cem Taban, Danişmend û Ketiş-oglû û hinek jî Salar-i kebîre ji Boz Ûlûs man.**(156-61) Ew hevoka dawî ji bo me pir girîng e: em ji wê fêhm dikin ku di nava Boz Ûlûs de Têrikî û Danişmend hene. **Yanê Danişmendoxûllari Têrikî ne!** Sala 1726 an li alî Newşehîrê, hinek ji êla Lekvanik û Kirinti bi cîh kirin. Ji êlên din nêzîkî 2000 xane bi cîh kirin.(156-130)

**Ji waliyê Heleb û Rakkayê wezîr Yûsûf Paşa re!** Me ferman dabû ku êla Afşarên Receplûyê ekradê ji cîhê xwe rabûne û niha ew li Qeyserî û Zamantiyê ne. Ekradê Lekwanik jî ji cîhê xwe reviyane. Boybegê Receplû Bekîr û Mûsacalû û begê Lekwanikê hatine Stenbolê û ji yên li Rakkaye re jî name nivîsîne ku ew wan jî bînin Anadolê. Hetanî ew li Rakkayê bi cîh nebin, gelê li wir rehet nabe. 500 malên wan li aliyê Rûm di nava Pehlîwanliyan de ne. 500 malên xwe li nava Tabanliyên Boz Ûlûs, Danişmend, Avşar û Ketîş Oxlû de ne. Ekradê Lekwanik jî li sencexa Qayseriyê li navça Develî, Harmancik, Yahyalû û nehiya Zamantiyê ne. Ew hertim di nava rêbiriyê de ne...Lekwanik û tevayî Kirintili, Hecîler li Develûyan li cîhên xerab bûne; Kizilkoyûnlû li sencexa Qirşehîrê û navça Silêmanli; civata Akbaş li Axbe û Boxali ya Edenê bi cîh bibin. Ji ber ku ji Rakkayê reviyane baca wan hersal bê girankirin...sal 1124-**1711**.(161-146)

Li ser dîroka Lek-Lera gelek jêder qala parçebûna wan û nakokî û şerê mezin ên di navbera wan de dikin. Ji bo wê, Lekên ku hatibûn Anadolê û bi yên li cîhê xwe mabûn û yên çûbûn dora Derya Kesk ve dîroka xwe dem nêzîke cûda ye. Eger mirov Bextiyariyan jî bide ser wan ewê hîn zêde belav bibe. Heta vêderê me beşek ji dîroka ewên ku hatibûn bakûrê Kurdistan û Anadolê, da; ewên li rojhilatê Kurdistanê mabûn jî xwedî dîrokeka hîn dewlementir û

xwedî dewlet in.

Gor "Tarîhî Alem Ara" Lek, bi fermana Şah Ebbas re li Loristanê bi cîh bûn. Êla wan a bi navê Silsila berê li rojavayê Kirmanşah-Mahidesttê rûdinişt. Rabîno jî dibêje: Şah Ebbas, ji bo ku hêza Welî Hasîn Xan bişkêne Lek ji Qefqasya anîn û li bakûrê Loristanê bi cîh kirin. Di dema Qaçaran de gelek êlên Lek belav bûn; Zend hema hema ji holê rabûn.(104-60) Îzady jî koçberiyeka berovajî wê dide xuyakirin. Li Xorasanê Kurdên Yarisanê ku bi Lakî diaxivin jî hene. Ew di nav sedsala 18 an de ji alî monarşiya Afşar ve ji başûrê Kurdistanê hatine koçber kirin. Kerîm Xanê xanedana Zend li cîhê Afşaran avakirî jî ji wan Kurdana bû.(154-39) Wekî xuya dike Zend malbateka ji Kurdên Ler-Lekê ye. Ew Kurdên bedbext ji vir birine wir ti caran rûyên rihetiyê nedine. Şah Ebbas bi xwîşka serokê Lor a biçûk Şahwerdî re zewicî û keça pismamê xwe jî da Şahwerdî. Ebbas jî Beyat an Ûxûr Beg şand ser Hemedanê û ew jî bû sebaba şerê Ebbas û Şahwerdî. Ebbas, Ebbas Mehdî Qulî Siltanê Şamiyê neviyê Oxûzwar Siltan danî ser textê Xuremabadê.(157-104) Şah Ebbas Atabekê Lorê biçûk Şahwerdîxan îdam kir û şûna wê derbasî sîstema walîtiyê bû. Qaçar Axa Muhammed hinek êlên Lor şandin Qezwînê. Şahên Qaçar ji Loran ditirsiyan û ji bo wê tim û tim serokê êla Lor li Tehranê digirtin.(95-194) Ew Lor-Lekên şandibûn dora Qezwînê, hîna jî li başûrê Derya Kesk li herêmên çiyayî dijîn.

Di sala 1160 (-1747) an de Nadir Şah li Xorasanê hate kuştin û artêşa wî belav bû. 4000 esker di bin fermandariya Ahmet Xan de li Afganistan kişand Kandahar. Li eyelata Bextiyarî, artêşa di bin fermandariya Elî Merdan Xan û êlên li Zagrosan de yên mîna Zend û Feylî-Lor guhdarî Adîl Şah ê piştî Nadir hatibû nekirin û xwe kişandin Zagrosan. Heta dema Zend ew parçabûn dewam kir, heta ku dewleta Zendê bi hêz li rojavayê Îran û kraltiya Afşarê xwe li Meşhedê bi rêxistin û merkezî kir. Artêş di dema Kerîm Xanê Zend de ji êlên mîna Lor, Lek û Kurdan pêk dihat. Ew Bextiyariyên Şîa, Feylî, Lor, Zend û Zengenê, Vand û Kelhorên ji Zaxrosan Hemedanê bûn. Ji sala 1760 an bi şûnde, artêşa wî bi Tirkmenên Qizilbaş (Afşarên ji Ûrmiyê, Qaçarên ji Astarabad), Kurdên Tirkiyê ji Ezerbeycan (Dumbelî û Şikakî), Erebên ji Daşteştan û Îraniyên ji Ler û Kerman hîn bi hêztir bû.

**Di artêşê de:**

| | | |
|---|---|---|
| Lor û Lek (Feylî, Zend, Zengene û hwd) | 24.000 | esker |
| Bextiyarî | 3.000 | esker |
| Ji Pers a Îraq | 12.000 | esker |
| Persên ji Xuzîstan û Daşteştan-Ereb | 6.000 | esker bûn û bi gîştî |

45.000.(172-507)

Berê jî me gotibû ku Qaçar Kurd in û bi texmîna min bi giranî ew Lek in. Di dema koçberiya Tirkan ya berbi rojava, ew jî hatin Anadolê. Binemalên wan hîna jî li Torosan hene. Yalman dibêje: Li zozanên Torosan ez nêzîkî li 300 konan geriyam, piranî Qerehecî û Qaçar in. Ji Qereheciyan Elî Axa dibêje: Em di sala 1862 an de ji Aydinê hatine. Beşek ji me li bakûrê Edenê bi cîh bûye,

beşek li Ceyhanê û hinek jî li çiyan koçber in. Qaçar li çiyayê Bûlxar-Toros in. Li cem wan keçikên qenterê koçberan dikşînin re dibêjin "Aladorlak" û ji serokên koçê re jî dibêjin "Savranbaşi".[(107-26)] Mezinên Reşiya jî digotin em bi kesê qenterê hêştiran dikşinin re dibêjin savranbaşi. Navê Qaçar jî wiha derketiye holê: Di şer de, kesên ji êla Qaçar e li pêş êrîşî dijmin dikirine û ji nişkeva jî vedikişine û rola rêve dikirine û bi vî awayî dijmin dikine kemînê.[(107-26)] Yanî di tirkî de tê wata kesê revok.

Lê Nîkîtin dîtina min ê li jor pûç dike û dibêje: Qaçar bi Zendan ve dijminên hev bûn.[(12-308)] Di nava êl û zendekê de jî dijminatî dibe, lê wek min gotî ez tam ne bawerim. Ji wê komê Şêx Elî, keleyên dora Derya Kesk girtin û bi Kerîm Xan ve bûne yek. **Kerîm Xan Zend** di sala 1758 an de bi Hikumeta navendî ya Îranê re şer kir û dewlet têk bir. Xwe wek wekîlê Şah û bi vê re dewleta xwe îlan kir.[(100-41)] Dema Kerîm Xan Zendê Kurd (1760-1779) textê Îran kire bin destên xwe, Qaçaran jî bi alîkariya Ardelan û Mukriyan ew têk birin.[(12-308)] Mixabin disa şerê Kurdan yê bihevre li wir jî derdikeve holê û dibe sebeba lewazbûna dewletê. Dewlet di alî aborî, huner, tîcaretê de gelek bi pêşket û gelek êlen Kurd jî li Şîrazê bi cîh kirin. Lê di sala 1789 an de Xan ji nişkeva mir û di navbera kurê wî Abdul Fetah û serleşker Alî Murat de şerê hundirîn derketin. Bi ser wê aloziyê ve Axa M. Qaçar jî ji hepsê revî û çû Mazenderan, bi Kurdên wir ve êrîş kirin. Leşkeren Qaçar Şîrazê xirav kirin û şewitandin; çavên 20 000 kesan kor kirin, sal 1794 bû.[(100-41)] R. Blaga jî rewşeka cûda diyar dike: Lek di qirnên kevn de ji bakur ve hatin warên xwe yên niha.[(95-158)] Li başûrê rojhilatê Kirmanşahê li herêma Hersîn Osman Vend, Celalvend û Dorûd Faramanê çend malbatên Lek Zend dijîn. Ji Lekên li Hemadanê komek di dema Sefawiyan û Qaçaran de derbasî Nehawend, Melayer û Tuvîserkan kirin. Ew li Bakirabad, Hactepe, Huseynabad, Ruknî, Abad Mafî, Miyan, Gozaz û Jalal Miyankuh dijîn.[(95-158)] Kerîm Xanê ji êla Zendelekî ye, ku ew êl ji alî Nadir Şah ve koçê Xorasanê hatibû kirin. Ji gelek şeran bi şûnde Kerîm Xan Tehran, Esfehan, Erak û Şîraz di sala 1754 an de bi dest xist. Sê mehan Îran Ûrmiyê îdare kir. Di sala 1797 an de Bayranvendî û Bacîlanî li hember malbata Qaçar, li dora Muhammed Xanê Lek Zend civiyan û ketin raperînê ku dewletê ji dest bigrin. Kralê Qaçar Axa Muhemmed Han Zendiyên Gayenî, êlên mîna Sedvend, Ebûlmelikî, Kelhor, Leşenî û Korzobar ajotin navbera bajarê Qûm û Sava. Di wê demê de Lekî hema hema ji holê rakirin û hemû belav kirin.[(95-161)] Li Kirmanê, li dora bajarê Sicanê Afşar û Lek hene. Li Xorasanê: Nadir Şah çend êlên Lek û Lor li Deregez, Destger û Kepekan bi cîh kirin. Li Tehran-Veramînê Lek hene. Li Erak-Siltanabat êla Zendelekî heye. Li Gîlanê: Mekarud, Tildere, Kecur, Kelardeşt, Geykelayê Lek dijîn.[(95-158)] E. Cemîlzade jî tarîxeka din dide: Kerîm Xan Kurd bû; ji êla Zend bû, di sala 1760 an de padîşahî ji destên Nadiriyan derxist û bû padîşahê Îranê. Padîşahiya wî 20 salan ajot û bajarê Şîraz paytextê xwe bû.[(9-216)] Êlên Zend Lakî dengdikin û îro li Kifrî û Malayer dijîn. Taybetmendiyeka Zenda jî ew bû, ku jin jî tevlî şeran

dibûn. Bûka Kerîm Xanê yekemîn bi wî re mil bi mil li hember Afganan şer kir. Zend ji olên cûda re pir bi hurmet bûn.[154-120] Ew jî nîşana wê ye, ku ola wan a kevn ne Îslame. Konfederasyona Zend di navbera Hemedan û Malayîrê de dijî û di dema Nadîr Şah de li Xorasanê mecbûrî jiyanê bûn lê ji mirina wî şunde vegeriyan welatê xwe. Yên ku venegerîn jî li Gîlanê man.

Îzady dibêje: Li Gîlanê konfederasyona Amarli heye, ku di navbera Deyleman, Siyahkal û Şahrûd de dijîn. Şamî (Şamkan), Devali, Şakûlan û Stacli (Îstacli) hinek ji wê konfederasyonê ne û sunnî ne. Ew êlên ne di wê konfederasyonê de jî Bacalan, Çiginî (Kurmanciya xwarê), Çemîşgezek (Dimilî), Celalewend, Kakî, Kiyasvend (Lakî) in.[154-164] Lek, di navbera Abivard û Çahçaha de dijîn û bi Lekî deng dikin. Di heman herême de Zend jî hene ku bi Lakî deng dikin û Yarîsanî ne.[154-163] Raste ew êlên A/Emerlûyê ji mîrîtiya Dulqadiriyan e û ew nêzîkî Reşiyan e, yan jî şaxekî wan in. Di alî civakî, ehlaqî û fizîkî de wek Reşiyan e û hinek ji wan jî dibêjin "em Sêvikî ne". Êla Şamî, ji Sêvikan e. Lek û Hewramanên li wir jî min dîtin, 50 km bi rû rûbar de 50 gund hene ku ji wê re Qiyasawend jî tê gotin. Bajarê Lûşan (Lowshan) jî 150 000 hezar kes dijîn. Emranlû li Mazenderanê herêma Ester Abadê dijîn û di destpêka sedsala XIX an de 4000 kes bûn. Li Qezwînê jî Emvarlû dijîn ku hejmara xwe 5000 kes in.[131-444] Êlên mîna Zohap û Bacilanê Lek di wê baweriye de ne ku ew ji Mûsilê û di dema Şah Ebbas de hatine ku şûna Kurmancî êdî bi Lekî diaxifin.[95-162] Piraniya Lekan Şîa û Ehlî-Heq in. Navenda Ehlî-Heq navça Lekestan-Delfo ye.

Dîroknûsê Kurd M. E. Zekî û C. Turkay li ser belavbûna Lekan lîsteyeka dirêj didin: Lor, Bextiyarî, Goran û Lek Kurd in û ji heman rîşeyî tên, li Îranê rûdinên lê heta Meletî, Riha û Mereşê jî hatine.[19-25] Li dora Enqere 120 malbat in, şaxekî Şêxbizinan li Kerkûkê ne, Kurmancî deng dikin.[19-188] Ew dîtin ne raste, piraniya Şêxbizinan Kurmancî dizanin lê ew esas bi zaravê Lekî dengdikin. Li rojavayê gola Qoçhîsarê dijîn, bi piranî li dora Qerecdax-Kûlûyê ne.[19-189] Piranî li Haymanayê ne. Şêxbizinî/ Şêxbizinli/ Şêxbûzûnî li: Kutahya, Îskîlîp-Çorûm, Palû, Amed, Geyvê-Kocaelî, Haymana, Enqere, Mêrdîn, Rakka, Erzirûm, Qastamonû, Çanqiri, Sêwas, Çildir, Qeremanê dijîn.[160-154] Çorûmlû-Çorûmlû Ekradî yan jî bi navê xwe yê din Ekradi Lek, wek konar-goçer Ekrad Yorukani Taîfesî derbas dibe û li Mêrdîn, Çorûm, Bozok, Çanqiri, Sêwas, Teke, Kilîsê dijîn.[160-304] Wekî tê diyar kirin gelek belav bûne. Êla Şêxbizinî ya girêdayî civata Hivedanli (Hayvadanli) ji sûlala Îmam Mehmet-el Bakir û Zeyn-el Abidin û Şêx Selheddîn in û li sencexa Enqere hatin bi cîh kirin.[160-418] Êla Hewêdiyê heye û ew Kurmanc û Êzîdî ne. Li Hindistan, Xorasan û bakûrê Kurdistanê belav bûne. Têkiliya wan bi Şêxbizinan re nîne. Lê ew binemala ku tê qal kirin, di secera Şêxbizinan de jî heye. Kiran-Kiranli-Kirantali ji êla Lekvanikan e. Li: Sêwas, Aydin, Amed, Çanqiri, Rakka, Bîga, Qirşehîr, Samsûn, Bafra, Canik, Çorûm-Îskîlîp, Nîxde, Qereman, Qonya, Mereş, Kilîsê dijîn.[160-518] Cemeeta Velîlî girêdayî Lekvanan e û li: Nîxde, Qereman, Qonya,

Rakka, Çorûm, Çolabadê dijîn.[(160-758)] Lekvan-Lekvanî-Lekvanik Ekradî li navça Dewelî ya girêdayê Nîxde û li cîhên bi navên Harmancik û Gezîlî yê girêdayî Qeyseriyê bi cîh bûbûn. Li alî Dewelî diçûn zozanan. Yek ji êlên Tirkmenên ku hatine şandinî Rakkayê ne. Li: Rakka, Çorûm, Qeyserî, Nîxde, Sîs, Qereman, Mereş, Adana, Aydin, Qibris, Nîxde, Mereş-Zamanti, Anavarza-Adana bi cîh bûn.[(160-570)] Kurdên Lek jî li kortala çemê Ceyhan û rojhilat û rojhilatê bakûrê Edenê dijîn.[(154-177)] Ewê ku navê xwe derbas dibin kalê Şêxbizinên li Anadolê ne. Beşêkî din ê Lekan jî li Îranê bûn; yên ku berê çûbûn Qefqasya ji alî Şahê Îranê ve dîsa li Lekestanê hatin bi cîh kirin.

Nivîskarên ji êla Şêxbizinî îddea dikin, ku ji bo şerê Çaldiranê alîkarî kirine, ji bo wê jî, ji Şêxbizinan re sê ferman hatina dayîn ku li kuderê bixwazin lê bicîh bibin; ew fermana: 1756 û 1780 li Amed û ya din jî li sala 1815 li sencexa Enqere hatiye dayîn. Ez di wê baweriyê de nînim; lewra belge û fermanên di dest de hemû berovajî wê didin xuyakirin. Beşek ji wan me li jor nivîsî. Agahiyên din ên ku tên dayîn ne di cîh de ne. Lewra hinek Lek paşê tevlî yên li navenda Anadolê bûn. Beşekî Şêxbizinan heta sala 1800 an li Palûyê bûn.[(92-7)] Alî Delle jî dibêje: Kalê min Nasir ji Palûyê hate Haymanê.[(92-8)] Nazim Benlî jî dibêje: Em ji Palûyê 12 malbat hatin.[(92-11)] Lerên li Navenda Anadolê, di nava xwe de bi çend navan tên binav kirin. Hinekan re **Silenî** tê gotin.



**Sincik - Haymana**

Bi koma li dora çiyayê Mangalê û gundên mîna Mandira, Durutlar, Derekoy û Sarigol re **Kelatî, Xewend** û **Jirkî** tê gotin. Navê Kelatî balkêşe, mumkune ku ew ji Kelata Xorasanê hatibin û ew nava li ser mabin. Yên ji navça Palûyê hatine re **"Palanî"** tê gotin. Ji yên li Ewliyafaqi, Yaprakbayiri û Koseler re jî dibêjin **"Ler"**. Li ser malbat, êl û serhejmara Lekan jî gelek dîtin hene:

Gorê Torî dinivîsine, êla bi wî navî û komên nêzîkî wan li başûrê

Kurdistanê jî wiha ne: li **Kerkûk**: Şeref Beyanî (Korakî, Emîrhan Begî, Azîzbeyî, Kahar û Nadirî), Delo (Camrizî, Pencankeştî, Kaşkehrizî, Tarkondveysî, Kazaniye), Berzencî, Omermil, Tilşanî, **Zengene** (Faris Axa, Ristem Axa), Cebbarî, Eylanî, Talabanî, Şuvan in. **Li Xaneqîn jî: Şêx Bezinî, Palanî**, Sûremirî (Kelhorî, Totik, Memecan, Eyne, Anteri), Bacillan (Cumur, Kazanlû), Kahur, Geze ( Sadaleguha, Baramserkala), **Zende** (Muhammed, Salih Axa, Ulan, Tahiran, Ganî), Ganî, Dawide, Salihî, Kakeyi, Kagenlû, Beyanî, Zerguş, Hilanî, Feyli, Gevazî, Neyrci, Havramî (Havram Taht, Havramî, Lihon, Merîvani, Çengî, Caf ( Harûnî, Îsmaîl, Azîzî, **Mikaîl, Reşobori**, Terhanî, Şatirî, Sadanî, Badagi, Başkî, Amola,Yûsûf Cani, Nevruli, Kemali, Bezdengehşî, Tavguzî, **Gelalî**, Pêştmale, Biseri, Yariveysi, Şêx Îsmaîlî, Îsaî, Sofiyevend), Pêşder (Babkeraxa, Ebbasmahmudiaxa), Îsmaîl Azîzî, Hemavendi (Beyzade, **Reşavend**, Remevard, Sefrevend, Sinebeser, Kafruşî, Piryayî, Cengî) hene.[38]

Nûserê Tirk E. Yawûz dibêje ew wek: **Alan**, Kak, Maman, Bîtlî, **Becenelî** (Peçenekli), Çuvarî, Dirik, Sekî, Koşklû, Mirahur, Katirci, Dinarli, Bala, Doşlû, Bacalan, Muhlû, Hanimli, Gunduzlû, Eşeklî, Sîtlî, Mankirevarî (bajarî) tên beş kirin.[104-67] Tiştê balkêş ewe, ku li wir Alan di nava êlên Lek te têne hejmartin. Wekî tê zanîn Alan bi navûdeng ji rojhilatê Ûralan bi êlên Macar ve berbi rojava û başûr çûbûn. Lê piraniya wan Kirmanc-Zaza ne, dibe ku nivîskar tevlîhev dikin. Becenek1î berê jî me gotibû ku Lek in û li bakûrê Derya Kesk dijîn. Navên êlan: Kelhur (kelgur), Tiloku (tilekli), Gulbahî, Koşkî, Şîmşîrî, Koregiyi, Cibraşî (Cibranli-şaxekî Qeregeçîliyên li Varto û Wêranşehrê ne).[104-54]

Subayê Îngîlîz Mark Sykes jî dibêje: Şêx Bizinî 4000 malbat in û êlêka pir şervan, hov û şêlankar in. Siwariyên pir baş in û sîlaha martînî bi xwe çêdikin. Ji Kurdên Baban in.[100-175] Ji şervaniyan Şêxbizin re gotin nîne lê ew ne ji Kurdên Baban in.

Birêz Mehmet Bayrak (Ozgur Politika 2005.02.09) nifûsa bajarê Mûsil û Şehrîzor (Kerkûk) ên di sala 1905 an de dide û ji bo Şêxbizinan jî dibêje ku li bajarê Hewlêr 2710 kesên ji wan hene. Dîsa li Kerkûkê êla Şerefbeyanî dest nîşan dike û şaxên wê jî wiha dinivîsîne: Korakî, Emîrxanbegî, Azîzbeyî, Kahar, Nadirî ne. Li Xaneqîn jî Şêxbizinan îşaret dike. Ziya Gokalp jî dibêje: Lor di nava Îranê de ne. Şêx Bizin ji Sorane û ew li her derê hatine belavkirin. Li Amedê, Trabzonê, Enqere jî mirov wê eşîretê dibine.[22] Ditineka bi kêmasî ye, ji ber ku Şêxbizîn ne Kurdên Soran in.

M. E. Zekî: Li Xaneqîn 700, li Erzirûmê 450 malbat Şêxbizinî radigihîne û dibêje beşekî wan li Kerkûk-Tortayîn in. Koka navê êla Lekkerdî digeheje Lekên li Edenê dijîn. Qala Palaniyan jî dike û dibêje ew 350 mal in, bi çandiniyê re mijûl in û wiha beş dike:

**A.** Nêzîkî Enqerê rûdinên, 120 malbat in, şaxekî yên Kerkûkê ne.[19-188] Li Qerecdax-Kûlûyê jî hene.[19-189] Gor mezinê Şêxbizinan Hafizê Sadûllah ew li destpêkê li Qerecdaxê-Kûlû-Qonya bi cîh bûne û piştre çûnê dora Haymanê.

Mezinê gundê Tirko (Canbeg) jî dibêjin berê li şûna gundê me Lerî hebûne, ew ji ber nexweşiya nêynik-reşiyê çûne. Beşekî Ler jî ji wir çûne Adapazari-Gumuşova-Akyazi. Gundên giredayî Akyazi ya Adapazari yên Ler navên xwe wiha ne:

1. Bêdil Îsmo
2. Yortan (Yuksel)
3. Teke Tapan (Çeşmebaşi). Ew her sê gund wek Lek tên bi lêv kirin.
4. Hecî Îwîşgel (Kûm Kopru). Ew gunda wek Ler tê xwendin.
5. Kûtîpingal (Yazili Gurgen).
6. Potûklar.
7. Kûzîlixê (Kûzûlûk).
8. Caf (Caferanli).



**Sexbizinên li Akyazi ya Sakarya - gundê Yortan**

Wekî xuya dike hîna jî navê Caf di nava wan Kurdana de zindî ye û ew ji bo tekiliyên dîrokî girînge. Niqta din jî piraniya wan gundîyana xwe wek Tapan û Şêxbizinî jî bi lêv dikin. Giredayî Sûlûoava jî gundê Armûtlû heye; ji 180 malan pêk tê û gundî dibêjin: "Berî 150-200 salan em ji Haymanê hatine…" Bi vê re giredayî em hinek gundan jî li Duzcê-Bolû yê dibînin. Li taxa Duzcê yê bi navê Camîbekîr bi temamî Ler dijîn. Gundên giredayî Duzce yê ku ew koma lê dijî jî ev in:

1. Balica.
2. Bahçe.
3. Paşa Konaxi.
4. Îçmeler.
5. Tinaz.
6. Mamûrê.

Ew gundana hemî xwe wek Caferanli didin nasîn. Lê niqta balkêş ewe ku mezinên wan gundîyana bo nijada xwe digotine: "Kurdî" û bo zarava xwe jî digotine: "Kurdekî". Bi dîtina min navê ji bo vê komê yê herî xweş û bi wate

ew e. Yanî bi lev kirina wek Ler an Lek navê wan ê zendê ye. Şêxbizin jî navê êlî û herêmî ye, ku dikeve nava Lek an Ler. Lê navê Kurdî û Kurdekî ye vê kome, di nav netewa mezin de yê herî rast e. Pêwîste ji vir û pêde em vî navî bikar bînin.

**B.** Li Leylakê rûdinên û 1.000 malbat in.[19-192]


**C.** Beşek Lek li bajarê Salmas (bakûrê Ûrmiyê) dijîn û ew ji Şîrazê hatine.[19-193]

**D.** Lekkerdî: Li Edenê tevlî Belikan û Delikan dijîn û tevhev 10.000 şînî ne.[19-187]

**E.** Nêzîkî Erzirûmê rûdinên, 450 malbat in, beşek ji wan li Tortayinê, ew jî nîşan dide ku wana şaxekî Şêxbizinên Kerkûkê ne.[19-185] Ew Tortayîn divê bibe Toyçayir-Haymana.

Li wê herêmê gelek malbat ji Erzirûmê hatine. Gora dîtina gundiyan, berê ew havînan diçûne Aydin, Samsûn û Antalya yê. Gundiyên ji Derekoy, Mandira, Durutlar û Kayabaşi re hinek dibêjin **"Kerkûklû"** û hinek jî dibêjin **"Sîwerekî"**: Gorî efsanê du birayên bi navê Xelîl û Îbrahîm ji Varto tên mala Kose Abdullah-Haymanê ji gundê bi navê xwe Kose Abdali (Yurtbeylî). Di wê demê de komek rêbir tê mala Kose û ji wî xerecê dixwazin; ev herdu xort li dij derdikevin û bi wan ra dikevin pevçûnê. Di dawiyê de xort komê têk dibin û xwe bi apê xwe didin nasandin. Apê wan keçên xwe dide wan û li wan gundana bi cîh dike: Balçikhîsar, Baltalîn, Yenicik (Torûn), Sûflîbala, Yurtbeylî, Sînanli, Bostanhoyuk, Dîkkûlak, Sazaxasi ji heman milî ne. Kaltakli, Bahçecîk, Încîrlî, Gedîk, Evcî, Harhor jî ji vê êlê ne. Gor lêkolînên min, mirov dikare Lekên li Anadola Navîn, gor herêmen jê hatî bike çar beş:

**a- Sîwerek:** Gundên mîna Kose Abdali, Sînanli, Şaîloa, Torina, Baltali, Bostan Hoyuk, Balçik Hîsar, Dîk Kulak, Saz Axasi, Canimana û hwd.



**Sînanli**

**b- Erzirûm:** Malbatên hatine li gundan belav bûne.

**c- Palû:** Sindiran. Ji wê komê re dibêjin: "Palanî" .

**ç- Qastamonû-Sînop:** Qaltakli, Yaprakbayir, Derekoy, Mandara, Sarigol, Êmîrler, Xarxor, Gedîk, Qerepinar, Evcil, Doxan û hwd...

Dîtineka cûda jî ji birêz Yeşîlgoz tê: Berî ku li Haymana bi cîh bibin ew

di nav êla Badilî de bûne. Badiliyan zivistan li Rakka, havîn jî li Ûzûnyayla û Erzirûmê derbas dikirin. Êlên girêdayî jî: Arşûvan, Ûstûrgan, Çimgan, Azman, Haci Kirli, Kurdukan, Mamavî, Mûdan û Atman bûn. Di nava wan de Kurdên bi navê Lek/Lekvanik jî hebûn. Wek Badiliyan ew jî li zivistanê diçûn Akça Kalê, havînê jî Çorûm, Yozgat, Çiyayên Kixî, Qerecdax, Erzirûm (Îspir). Ji bo Lekan jî berê Amed fikirîn ku lê bi cîh bikin lê wan nexwest. Bi ser vê de hemû li herêma Kizilca, Vîrani Kotî, Kaap Dexirmenî û Gobekli ya Rihayê bi cîh kirin. Dîsa, êlên **Acûran û Yivo** (her yek 600 kes bûn) yên girêdayî wan li Akçakale bi cîh kirin.[39] Êla bi navê Yivo belkêşe û di nav 24 êlên Oxûzan de navê êlekê wek Yiwa-Yîva derbas dibe ku ew in û li vir jî derdikeve holê ku ew Şêxbizinî ne.

Piraniya êlê di sala 1800 an de hatiye Haymanayê.[92-1] Gelek mezinên wê êlê jî dibêjin "200 sal in ku em hatine û 150 sal in ku me gund çêkirine". Li Haymanê 29 gundên Şêxbizinan hene. Wekî din jî li Enqere-Yenîdoxan, Kirikkale, Elmadax, Kalecîk, Boyabat, Îskîlîp, Kocaelî-Geyve, Akyazi-Adapazari, Çerkez-Çanqiri, Merzîfon, Qerebuk, Bafra, Duzce, Gerede, Polatli, Kûlû, Erzirûm, Oltû, Narman, Şîran, Şam, Rakka, Îran û başûrê Kurdistanê jî ew hene.[92-1]

Di "Salnama Enqere" (1882) û "Qamûs ul Alam" ê de (1888) navê Haymana "Nahiyeyî Şêxbizin" û nifûsa wê jî 12170 mêr û 11674 jin derbas dibe. Gundên Şêxbizinan:

1. Sindiran-1826/Yenîce
2. Horhor (Sogut tepe)
3. Bacihesar
4. Încîrlî
5. Yurtbeylî
6. Baxçecîk
7. Torin (Altinpinar)
8. Xewend-Alacik
9. Bostanigi
10. Qaltax-Kaltakli
11. Baltali (Pinarbaşi)
12. Qerepinar
13. Sazê
14. Mandira (Qereomerlî)
15. Şavlû (Sebîlî Bala)
16. Derekoy
17. Yergom
18. Qavax
19. Tikkûlax (Yeşîlkoy)
20. Sarigol
21. Sînanli-Sînay

22. Doxan (Eskî Kişla)
23. Tabaxê
24. Dûrûtlar
25. Tolosman
26. Ewliyafeqîr
27. Gedîklî
28. Kelatî-Yaprakbayiri
29. Evcî-Cingil
30. Çayraz (tevlîhev)
31. Yamak (tevlîhev)
32. Canimana*
33. Dipdede*
34. Qere Kilîse (Qaraca Dere)*
35. Ewliya Çeşme (Soxuk Kûyû)*
36. Kaya Başi **
* Kûlû
** Polatli.(92-9)



**Kalê Şêxbizinan-Koseabdali**

Kandemîrê di sala 1930 an de hatî Haymanê dibêje: **Êla Şêxbizinî ji qebîlên wek: Xorasanli, Hawedanli, Herfodanli, Jirdikanli, Leranliyan pêk tê**. Êla bi navê Xorasanî jî îspate, ku ew ji wir hatine û Leran ji gotina gundiyên

cîran e, me li destpêkê gotî piştrast dike. Êlêka Kurmanc ê bi navê Hewêdî jî heye; lê xuyayê navê êlêka Şêxbizinan ya nêzîkî vê heye. Di dema şerê cîhanê yê yekemîn de, li aliyê Baybûrtê 50 hezar Şêxbizinî dijîn. Ji ber êrîş û tirsa Rûsan hemû reviyan Anadolê. Bedrettîn Dalan (şaredarê Îstanbûlê yê berê), rojnemevan Selahattîn Dûman û serokwezîrê Tirkiyê yê berê Bulent Ulûsu jî ji vê êlê ne. Heta îhtîmaleka pir mezine, ku serokwezîrê berê Bulent Ecevît jî esle xwe Lerî ye. Ji vê êlê gelek li Şam, Erzurûm, Palû, Kutahya, Çanqiri, Mêrdîn, Îskîlip, Çerkeş Geyve, Baybûrt, Qers, Şîranê jî hene. Ahmet Cevdet Paşa yê Tirk zendên mîna Lor, Bextiyarî, Goran û Lek Kurd qebûl dike û dibêje ji eslê xwe ve li Îranê bi cîh bûne, lê beşekî ji wan li Meletî, Riha û Mereşê rûdinên. Ev koma bi navê Zend ê bi nav û deng e ji wan e.

Sala 1914 an de êlên mîna Lek Selsele, Delfan û Tarhan li dora Nezeralî Xane ji êla Amrayî gihîştin hev û raperîn derxistin. Di heman salê de êla Bayranwend cendirme têk birin, Huremabad û Loristan bidest xist. Lê bi hatina Rûsan re ew reviyan Herroyê.(95-161) Di belgeyên Îngilîzan ên di dema şerê cîhanê yê duyemîn de wiha tê nivîsandin: Êla Şêxbizinî 100 sal berê, di serokatiya Melle Ebbas û Hecî Hemze de ji dora Zaxo hate Ze yê. Li herdû aliyên çem nêzîkî 50 gund ( 430 malbat, 70 siwarî 500 piyadê xwe hebûn) avakirin û lê bi cîh bûn. Kêm be jî, hîna malbat li Hewlêr û Zaxo dijîn. Wê êlê gelek caran li hember Tirkan raperîn derxistiye. Gundên xwe li Kerkûk, Silêmanî û Koy Sancaqê belav bûne.(144-72)

Gor rapora îstîxbareta Tirk, Şêxbizin li Kurdistanê: navça Oltû, Îspîr û Tortûma girêdayî Erzirûmê Şêhbizinî 1414 kes in, Kurmanc in, henefî ne.(108-136) Li Wanê êlên Şêxbizinî yên wek: Karkî, Hecîmkî, Kirmizkî, Elîkî, Bekçî dijîn, lê hejmara wan ne diyar e.(108-343) Li Xaneqîn, dora çemê Kûyê 600 kesên Şêxbizinî dijîn û sunnî ne.(108-358) Hatiye qeyd kirin.

Zimanî Şêxbizinan jî dikeve koma Lorî, lê yên li Anatoliyê zimanê xwe nêzîkî Kurmancî ne, ji bo ku demeke dirêj e bi hevre ne, dibe ku ew nêzîkatiya çêbûye. Yên li herêmên din em nizanin û ew cîhê lêkolîneke ye. Lê mixabin îro li Anatoliyê jî zimanê Lekî hêdî hêdî cîhê xwe ji tirkî re dihêle û ew jî cîhê xemgîniyê ye. Li peyvên jêr mirov dikare zimanê herêmî bide berhev:

| **Lekî-Şêxbizinkî** | Kurmancî | **Lekî-Şêxbizinkî** | Kurmancî |
|---|---|---|---|
| Hero | Here | Biro | Warê |
| Dê | gund | êstam | li pê |
| Man | hîv | înişim | rûnê |
| Sovedî | sibe | nûmerû | nîvro |
| Biye | paşnîvro | şîmê | şev |
| Merd | mêr | jîn | jin |
| Dod | keçik | xûrt-kûre | xort |
| Çêv | çav | dem | dev |
| Diran | diran | sînê | çiçik-pêsîr |
| Kîlik | pêçî-tilî | rîş | rih-rî |

Kurdên Şêxbizinî di sala 1997 an de dikaribûn çar bavên xwe bijmêrin; ew li Reşiyan heta 8-9-10 bavan diçe. Wek mînak: Hafizê Sadûllahê Elî (di sala 1997 an de 67 salî ye), Eliyê Memed, Memedê Qaraca, Qaracayê Qereman. Bavê dawî Qereman jî li gundê Kose Abdaliyê mirî ye. Di alî kevneşopiyê de jî wekî Reşiyan e. Di alî kincan de, di alî govend, destar û olî de wek hev in. Tenê Şêxbizinî şafiî ne, Kurmancên herêmê jî beşekî mezin henefî ne. Li gundê Kose Abdali mezinan digot: dema kesek nexweş diket, kûlig qul dikirin û nexweş di bin re heft caran derbas dikirin. Ew li her cîhekî Anadola Navîn wiha bûye. Dîsa mezinan digot di xortaniya me de kesên nimêj dikirîn pir kêm bûn. Di edet û tevgera wan ê civakî de şopa Zerdeştî heta dema dawî jî hebû.



**Kincên berê-Koseabdali**

# CANBEG
## (Bexdilî)

Li ser navê vê kome ti agahiyên ku dilên mirovan rihet bikin min nedîtin û dîroka wî navê jî ji 650 salan zêdetir naçe. Ew jî îşareta wê yekê ye ku ew nava piştre wergirtine û ew berê xwedî navekî din bûne...Dema li ser peyva Canbeg analîz bê kirin, derdikeve holê, ku ew ji Begê bi navê Can tê. Ew jî di nava Kurdan de kevneşopiyeke ku navê êlan an ji seroka/ê êlê tê wergirtin, an ji lehengekî yan jî ji herêmê... Li Anatoliya Navîn carna ji bo Canbegan navê Gawestiya jî derbas dibe, lê ew ne zelale, lewra carna ji bo hemû êlên li herêmê jî bi kar tê. Niha em li çend alternatîfan binêrin ka ew nav ji ku tê:

F. Sumerê li ser dîroka Beraniyan nivîsî dibêje: Ezerbeycan, Erran û Acemên Îraqê di bin kontrola Melîk Eşrefê Çobanli de bûn (1356).(110-41) Li vir Çobanliyê ku navê xwe derbas dibe, ji konfederasyona Beraniyan e. Ji ber îdara wî ya xirav gelek kesan welat terk kiribûn. Ji ber wê hukumdarê **Altûnordû Cani-Bek Han** (1357) hate Ezerbeycanê ku gel ji zilma wî xelas bike. Eşref kuşt, lawikê xwe li Tebrîz cîhîşt û vegeriya welatê xwe.(110-41) Bê guman em nikarin niha îspat bikin an jî îddea bikin, ku Canbegan navê xwe jî wî wergirtiye. Lê ew îhtîmala heye; bûyereka bi vî navî re têkildar jî di dema Memlûkan de xuya dike.

Baybarsê Memlûk di sala 1438 an de li hember Pezgewran derket sefera xwe ya seyêmîn. Sedama wê seferê yek jê ew bû; ku dixwest cara dawîn dijminê xwe yê kevn ê asî û maceraperest **Memlûk Canîbak ûl Sûfî têk bibe**...(114-131) Piştî mirina Baybars, Memlûk li sînoran ketin tengasiyê û du mîrîtiyên bi hêz ava bûn. Ew Dulqadir û Remezanî bûn ku di navbera Osmaniyan û Memlûkan de bûn tampon.(114-132) Ew herdû mîrîtî jî ji alî Kurdan ve hatin damezirandin. Memlûk Canîbak jî ne Ereb e, ew Kurde û piştre ji ber tirsa Memlûkan xwe davêje paş mîrîtiyên Kurd û ew jî dibe sedema aloziya navbera Kurd û Memlûkiyan. Piştî wî begî jî em yekî di serdema Sefawiyan de dibînin.

Di şerê Çaldirane de, Safewî têk çûn û gelek serleşkerên Şah jî li meydana şer mabûn. Ew: Ji Ûstacaliyan M. Han, ji Şamiyan Lala H. Beg, ji Afşaran Siltan Alî Mirza, ji **Turkmenên Velî Can Beg** (ji êla Kazakli ye), Mîr Abdûlbakî, Seyid M. Kemûne û Mîr Seyid Şerîf miribûn.(112-36) Ji wana em dizanin ku Ûstacalî, Şamlî, Afşar û Tirkmen Kurd in. Ew êlên ku Safewî avakirin jî piranî êlên wan begana bûn. Velî Canbegê di wî şerî de mir jî, serokekî Kurdan e û îhtîmaleka pir mezine ku ew ji Qeremaniyan e. Lewra ew her çar begên dawiyê mirine hemû ji wê êlê ne, ew Kurd in û bingehên Sefawiya ne. Li vir mirov hîn zêde bawer dike ku êla Canbeg navê xwe ji wî begî girtiye. Ew yeka ji alî dîrokî, olî, civakî ve tê îspat kirin. Bi vê re girêdayî, di beşa Kurdên Xorasanê de jî min navê xanên êla Kîkî nivîsî bû û îşaret pê kiribû, ku têkiliya wan bi Canbegan re heye. Ew yeka jî ji vê tezê re îspateke.

Ji alî gelek nûseran ve te pêjirandin ku Canbeg şaxekî Kîkiyan e, yan

jî **Kîkî** bi xwe ne. Eger ew îddea rast bin, dîroka wan jî digihîje navenda Xorasanê. Rişwanoglû dibêje: **Di sedsala VI an de li rojavayê Gola Baykal zendekî bi navê Kîk-û dijîn**. Paşê ew ketin bin destên Muku Xanê Tirk. Îhtîmaleke mezine ku Kîxiyê navê xwe ji wan heyna. Ew bi **Xalaçan** ve bira ne.(128-27) Seferoglû jî dibêje; di sedsala VII an de li Kuhîstana Xorasanê, Xalaç bi Kurdan ve tevhev wek koçer dijîn; bi pez û hêştiran debara xwe dikirin.(91-10) Di vir de mebesta nivîskar di Kurdan de; yan Kurdên Kirmanckî yan jî Lekî axêf in. Di êrişên Îslam ên yekemîn ên li ser Xorsanê de, nivîskarên Ereb vana hemûyan wek "Ekrad" nîşan didin. Li Hindistanê, demeka direj êlên Tirk (mebesta wî Kurd in) bûne desthilatdar (1230-1321); ji vana Xalaçan tam 30 salan ew îdare kirine destên xwe. Di artêşa Gazne de, tîmen lêxistine hemû Xalaç bûn. Gaznelî hilweşiyan bi şûnde, cîhe wan **Gûr-Lûx**an wergirt. Gûr di navbera 1284-1304 an de dewlet bûn. **Kîkî û Xalaç di dema êrîşên Îslamê de gihîştin hev û wek Gûrî derbas dibûn**.(128-27) Wekî berê jî min nivisî Gûrî/Gor dewleta Kurdên Lek e û xuyaye ku ew demekê Kurdên ji zaravê din jî kirine bin baskên xwe. Al Masûdî (943) dema êlên Kurd dinivîse êla Kîkî û Curkan jî dihejmêre: Di navbera Mûsil û Ararat de Yaqûbiye û **Curkan** û nêzîkî wir Hemîdiye-Merwanî dijîn. Dîsa li dora Mûsil jî Kîkan dijîn digot. Berî Selçûqiyan, di nava Kurdên Dîcle de Xalaç bi Goran ve tevhev dijîn.(91-10) Seferoglû dibêje: Kîkan 48 zend-boy in û Çurikan/Çurukan jî bi 24 zendan girêdayî wan in.(91-61) Îro, Zaza û Çareklî yên Dêrsîmê ku li Bîngol, Dêrsîm, Sîwerek dijîn, ji wan Gûrlu-Goranan hatine.(128-28) Di wê herêmê de hîna jî êlên Canbegan hene. Kîkî li Mêrdîn, Amed û Rihayê dijîn û 24 berên xwe hene. Milekî wan ya bi navê **"Kîkî Xalaçan"** jî heye.(91-10) Tê xuyakirin ku ew koma wê demê wek federasyon li navenda Xorasanê di bin wî navî de dijî. Waliyê Ezinganê Kemalî jî îdeka din ê cûda dike ku mirov nikare di ser re derbas bibe, ew jî dibêje: Canbeg girêdayî Şadiyan e. Ez jî di wê baweriyê de me, lewra Şadî dewleteka ji konfederasyona êla pêk hatî bû. Ew Kurdên ku îro Kurdiya xwe şikestî, bi piranî di navê de bûn. Seferoglû dibêje: piştî ew hatin Anadolê navê wan di bin sîwana **Badiliyan** de xuya dike. Canbeg, girêdayî Bexdiliye, ku yek ji 24 zendên Oxûzan e. Di deftera Osmaniyan ya Tahrîr de wek "Konar-goçer Tirkmen Ekradi Taîfesî" derbas dibe. Ji keviyên Dîcle hatin Qonyayê, navê xwe dan navça Cîhanbeylî. Beşek li Akşehîrê û beşek jî li Haymanê bi cîh bûn.(91-62) Li ku û kîngê bi vî navî bûn û kîngê bûn Canbeg nanivîse. Bi texmîna min, ew, dema hatin rojavayê Kurdistanê ketin bin sîwana Badiliyan. Bi qasî tê zanîn dema Badilî li destpêkê hatin Anadolê 125 êl girêdayî wan bûn.

Li Sincik-Semsûrê girêdayî Qereçoriyan êlêka bi navê Canbeg heye. Kalê me yê pêncan Yûsûfê Qereçorî rojekê tere gundekî Poturgê nava Canbegan. Piştî bûyera kûçik kişandî odê, Canbeg keçikikê didine Yûsûf. Navê wê zendî wek **"Heft Zend-boy"** derbas dibe. Di dema Osmaniyan de li Kutahya-Sarisû û Qereçamê bi cîh kirin. Canbeg ji Bexdîliyên Oxûzan e. Bexdilî, yek ji pênc êla ku hukumdar derxistiye ye. Li bakûrê Sûriyê, milê Tirkmenên Bozok pêk

tînin. Di nava Tirkmenên Helebê de jî hene û di avabûna dewleta Safewî de cîh girtin.(121-144)

Gundê Kadioglû-Akşehîrê di sala 1891 an de ji alî 8 malbatan ve hate avakirin. Ew Kurd in. Gor kalên wan gotî; ew ji Turkîstanê hatine. Demekê li Îranê jiyane. Ji bo ku mange/ga xwedî dikirine Îraniyan ji wan re gotiye **"Gawestiya"**. Êl û zendên Kurd bi vî awayî navên xwe hatin guhartin.(89-17) Gelek kes dibêjin ku Canbeg şaxekî Kîkan e. Kîkî li Kiziltepê û li gelek gundên girêdayê wir dijîn ku hejmara wan 21. 883 kes tên nîşandin. Kurmanc û şafiî ne. Bi xismên xwe yên li Sûriye re di têkîliyê de ne û rêxistinên Kurd re alîkar in.(108-238) Canbegên li navenda Anadolê henefî ne. Kîkan ne êlêke, herî kêm ji du êlan pêk tê. Di navbera Milan û Kîkan de hertim hevkarî hebûye û ji berê ve cîranê hevbûne, havînan zozanên xwe cûda bûn.(113-13) Kesên mange xwedî dikirin bi Kîkiyan re diketin tevgerê û zivistan li deştên Bismil, Çinar û Amedê derbas dikirin.(113-139) Bi wî rengî gelek nûser û jêder yekbûna Kîkiyan û Canbegan didin xuyakirin.

Canbeg di nav tevgera Eba M. Xorasanî de jî tên dîtin. Piştî Eba ji alî Ebbasiyan ve hate kuştin, ew bi gelek êlên din ve hatin ser Ebbasiyan (748) û sê mehan bi wan re şerê tola Eba kirin. Hêza wan şikest û ew vekişîn navbera Hama, Heleb û Meletiyê. Em dibînin ku heta sala 1164 an li wê herême dijîn. Piştre tên navenda Anadolê. Li Anadolê di bin kîjan navî de yan jî kîjan dewlet û mîrîtî avakirin? Ji fermaneke em dizanin ku ew li destpêkê di nava Qeremaniyan de bûne:

**Ji Begê Enqere û ji Qadiyên li wê herême re!** Te ji min re name şandiye, ku **Canbegê ji taîfa Qeremanlû** ye di nav sînorên Aksaray û Enqere de dijîn, Bozcalû yê ji taîfa Haymana diziyê dikine. Bazirgan, rêwî û gelên wir dişêlînin û mirovan dikujin. Gelek êl in, ji ber ku li wir nîştecîh in merin ser. Lê dema va fermana gihîşte destên te, here ser wan û bixe dest. Yên ku van karana nekirine dest nedin wan. Sal **998/1585.**(161-54) Ji wê fermanê vekirî diyare ku ew girêdayî Qeremaniyan in û hîna jî ew li cîhê xwe yê kevn in. Lê wê tespîtê Şerafnamê şelpêzê dike: Gelek zarok û kurên mîrên Kurdistanê diçûn tên Bedlîsê û wextê xwe vala li vir derbas dikirin. Zarokê êla Rojkî û kurên Begên Bedlîsê, ji bo xizmet an jî ji bo wexta xwe vala naçin ber deriyê mîrên din ên Kurdistanê. Derwêş Mehmûdê Qeleçêrî yê mezinê qebîla Qeleçêriyan ji welatê xwe çû dîwana Siltan Silêman. Mirovêkî bi gelek huneran bû. Siltan paşê ew kir serokê Sencexan (texmîna min:1550-1566) û bi rêvebiriya kar û barên êla Cîhanbeg û jê re dayîna navçek ji wîlayeta Paloyê ya bi riya mulkiyeta Îqtaî serfiraz kir.(157-379) Di tercûma Soranî de wek êla "Beglû" derbas dibe, lê di tercûma Z. Avci de dibe Canbeg. Yan di vir de şaşitiyeke heye yan jî êla Canbegan parçe bûye. Îhtîmala parçebûna ji bo zozanan jî heye, lewra di sala 1541 an de li zozanan tam 112.500 pezên Boz Ûlûs hebûn. Boz Ûlûs û yên mîna Dulqadirî, Qere Ûlûs bi wan re girêdayî û êlên: Şam, Ekradi Îzzeddîn û yên din ên belav bûyî, xwedî 1.998.246 miyan bûn. Ji bo wê, Boz Ûlûsê ku dihatin Çemîşgezek şaxekî biçûk

bû.[118-74] Ji wê belgê jî xuya dike ku ew berê parçe bûne. Ew parçebûn mumkune tenê ji bo dema zozanan be jî.

Di dema Beyazîdê II an de, defterên tapoyê **Esb-keşan** (-Cîhanbeylî) hatin avakirin û di wê defterê de jî wek herêma rêvebir navê Eskî-Îl derbas dibe.[168-197] Cemeeteka girêdayî Hesb-keşan di dema Beyazîdê II an de Qerepinar ji xwe re war girtibû. Ji bo wê navê wê civatê wek Qerepinar derbas dibe.[168-207] Ji wê hevokê jî xuya dike; ku di bingeh de navê êlê Canbeg e, lê carekê kirine Atçeken-Hesp Keşan û hinek jî kirine Qerepinar…Hinek jî bi navê bavê wan hatine xwendin. Wek mînak: Taşgunlar û Ewladî Azîz yan jî Kosunlû (Kosunlû Yûsûf).[168-203] Di defterên Osmanî yên berî fermana jor de, ji bo êlên li sencexa Qonya navê "Atçeken" yan jî "Hesbkeşan" derbas dibe. Cografya wan bi piranî; di navbera Aksaray-Akşehîr û Enqere-Qonya de bû.[111-11] Balkêşe ku îro jî ew li ser wê axê dijîn. Di sala 1530 an de bajarên mîna Eskîîl, Tûrgût (Yûnak) û Baybûrt (Emîrdax) cîhê rêvebiriya wan êlana bû. Ji bo ku Hespkêşanan hespên bi cins xwedî dikirin va nava lênan. Ji ber wê di defteran de ew nava hate nivîsîn û ji hespên xwe jî bac didan dewletê, "at akçesî", lê baca çandiniyê jî nedihate stendin. Gelek salan berî Osmanî dawî li Qeremaniyan bînin, xuyadike ku rêxistineka zendî ya hespkêşanan hebûye. Di belgeyeka sedsala XVI an de tê fêhm kirin; ku gelê cotkar paşê hatiye warê Canbegan. Baca wan jî Canbegan kom dikiriye.[111-11] Ji wê desthilatdarî û rêxistina bi hêz jî tê fêhm kirin, ku Canbeg lingekî dewleta Qeremanî yên bi hêz bûye. Di pirtûka "Cîhanbeylî" de tê îddea kirin, ku herêm ji Bîzansiyan bi şûnde kete destê Tirkan û navê xwe yê yekemîn Esbî-Keşan e.[143-23] Ew ne raste, lewra yekemîn kete destên Kurdan û navê kurdî wek H/esp-keşan lênan. Wata wê jî kesên hespan dikişînin e. Piştre dibêje: Kesên ji rojhilat hatine, li (În)-şikeftên ku li girên niha navçe lê bi cîh bûyî de, bi cîh bûn. Ji bo ku şikeft wek mal bi kardianîn nav kirin Înewî. Cîhanbeylî ji Selçûqiyan bi şûnde kete nava sînorên Qeremaniyan, di sala 1466 an de bi Qonya re kete nava sînorên Osmaniyan.[143-23] Tê xuyakirin, ku piştî dikeve destên Tirkan navê bajêr jî diguhurin û dikin Înewî-mala şikeftî û piştî Qeremanî hatin belav kirin jî bi tevahî kete destên Osmaniyan û nav careka din hate guhartin. Gor heman defterê di sala 1530 an de li eyaleta Qereman 26 qeza, 6 qesabe, 2129 gund û 1831 mezra hebûn. Ji bilî wana 1887 êlên Tirkmenên koçber hebûn.[111-11] Xanên/malên Hespkêşan (Canbeg-li) li lîva-î Qonya 7.087 in.[111-16] Heman hejmar bi wilayeta Qereman jî derbas dibe.[111-36] Di dema Beyazidê II an de 343, di dema Selîmê I an de 680 xanên bac didin hebûn.[131-237] Di dema Yawûz de ew 1080 mal bûn.[131-198]

Piştî belavbûna Qeremaniyan, min gotibû beşekî mezin jî çû Xorasanê û hîna jî li wir bi wî navî dijîn û li dora bajarê Aşxanê beşekî hîna jî koçbere. Yên li Anadolê mabûn jî em di belgeyên Osmanî yên fermî de di nava "Boz Ûlûs" de dibînin. Me gotibû ku Seferoglû dibêje: Kîkî yên bi navê Ûlûs ji 48 êlan pêk tên. Dibin du beş, yek ji wan beşana Curîkan e û ji 24 êlan pêk tê. Wek êlên xwe yên li Turkistanê bi tirkî diaxivin.[91-61] Ez ne di wê zanînê de me ku

ew bi tirkî diaxifin, lê her nûserên Tirk wê yekê dinivîsîn. Dr. Gunduz radigihîne ku hinek êlên Dulqadir piştre tevlî Boz Ûlûs bûn.(115-10) Dema mirov wêna belavbûna êlên li Anadolê dibîne, ew yeka rast dibe, gelek ji wan nêzîkî hev û wek cîran dijîn. Ewên ku îro li navenda Anadolê mane dûmahiyên Boz Ûlûs in.

Dr. T. Gunduz dibêje: Boz Ûlûs, heta destpêka sedsala XVII an li Kurdistanê bû, ji ber wê hukumetê kêm mudaxelê wan kir û zêde belge derbarê wan de tunin. Lê dema hate Anadoliya Navîn û ji wir jî li Enqere, Aydin, Keskîn, Sêwas û Qeremanê belavbûn bi şûnde, hikumeta navendî di derheqê wan de gelek belge hîştine.(115-11) Me diyar kir, ku berî wê demê jî Canbeg li Anatoliya Navîn in. Ewên ku di dûre hatinî dibe ku beşa din ê Boz Ûlûs bin. Ew zenda ji bo zozanan diçû Mûş, Çewlîk, Çemîşgezek, Erzirûm, Gurcîstan û Îranê. Bi navê Etrak û Ekrad gelek êl di nava xwe de xwedî dikir. Xwedî gelek pez bû, di sala 1675 an de, tene di destê Canbegan de 204.621 mî û 9.138 jî hêştir hebûn.(90-21) Berê jî me gotibû ku di nava Boz Ûlûs de gelek êl hene û mirov dikare bibêje ew konfederasyonê. Jêderên Osmanî Canbega jî dikin nava wê konfederasyonê.

Di beşa Reşî û Şêxbizinan de jî min nivîsî bû, ku piştî sala 1691 an dewletê dest bi cîhkirina êlan ya bi darê zorê kir. Ew yeka piştî Reşiyan ji bo Canbegan jî xistin jiyanê. Di salên 1700 an de biryar hate wergirtin ku çar berên Canbegan werin îskan kirin. Ew: **Barçigan, Hudîl, Zival û Dirjan** bûn.(90-94) Gelê ji gundê Tirko digotin: êlên me Xurma, Baçika, Doxika ne. Baçika gereg ew Barçikanli yên Orhonlû nivîsîne be. Di sala 1700 an de jî ji Xarpût û Kîxiyê xwestin derbasî bakûr bibin, lê nekarîn. Bi ser vê de, li herêma dikeve hundirê Kizilirmakê ku nexweşiya ta lê digerî Canbeg bi cîh kirin.(39) Îhtîmaleke mezine ku yên li Qoçgirî-Sêwasê mabûn ev in. Yan jî ewên ku di sala 1702 an de ajotine Rakkayê ne.

Halaçoglû li ser Canbegên li Kurdistanê van agahiyan dide: Canbegan, zirar li gelê Xarpût, Amed, Kolik û Gergerê dixistin û ji ber giliyên gelê herêmê, di sala 1702 an de ferman hat derxistin ku wan bajon bajarê Rakkayê. Ji ber ku Rakka cîhê cezakirinê bû.(156-46) Cîhanbeg, Şêx Hesen, Dede Sûlû ji berê ve li Gergerê rûdiniştin, lê wêder terk kirin û berbi Pertek, Çemîşgezek Saxaman çûn; gundên wir vala kirin û bi xwe di cîhê wan de rûniştin. Ew bû sedema giliyan. **Di sala 1705 an de ji waliyên Erzirûm, Sêwasê û begê Palû, Kîxî, Çemîşgezekê re ferman** hatin şandin ku Canbeg bên şandinî Rakka û yên din jî bên şandin cîhên wan ên kevn.(156-50) Di sala 1704 an de Canbegên li dora Mêrdîn, Riha û Semsûr; bi taybetî jî beşên li Gergerê xwestin derbasî herêma êla Dêrsîmê ya bi navê Şêx Hesen bibin. Bi ser vê de şer derket û **Qadiyê Çemîşgezek hukumet agahdar kir û ew jî di sala 1705 an de fermanek derxistin ku Canbeg herin Rakkayê**. Ji ber ku li nava milê çemê Firat lîlav û nexweşî gelek bû. Şeş salan şûnve, Milan jî li Rakkayê bi cîh kirin, lê di sala 1724 an de dîsa vegeriyan. Evên din jî di şûna xwe de man.(39)

Kesên bi Koçurzade Koyûnoglû Îbrahîm, lawê wî Çolak Mehmed, Huseynê lawikê Mistafa, Çobanoglûyê Canbegî berê bi Hama re girêdayî, li Humus û keviya çemê Belîh hatin bi cîh kirin (1711), lê hate dîtin ku ew ji cîhên xwe çûne. Ew ji ber êrîşên Ereban û germê firar kiribûn. Di sala 1720 an de ferman derket ku ew dîsa werin cîhê xwe, lê nehatin. Paşê, hikumetê got; eger neyên deşte Havran xêre, ma herin keviya çemê Belîh. Di kontrola dewletê ya di sala 1733 an de hate dîtin, ku ew li der û doran belav bûne. Gor wê jî, hewldan ku dîsa binin.(90-97)

Prof. Halaçoglû dibêje: Ji wan êlên ku li Anadolê rêbirî dikin, gel dişêlînin û rêwiyan dikujin dihate xwestin, ku bên ajotin Rakkayê. Di serî de Canbegên ku wek Ûlûs dihatin nasîn, Şûcaeddînlû û Gullu Çorlû hatin şandinî Rakka. Ji wana, Japova, Dirêjan, Yarçekan, Herdillî û Zirgan yên girêdayî Canbegan, bi 1000 malên xwe ve birin Rakkayê û cîhêkî ji Rihayê sê seetan dûr. Lê hinek malên wan li Meletî, Dîvrîxî û Arapgîrê man, ku ji bo wan jî di sala 1712 an de ferman derket.(156-113)

Di 1721 an de ji Boz Ûlûs, êlên mîna Sarili, Derîlî, Abdurrahmanli, Qeresirili yên girêdayî Oxûlbeyliyê li Kadinhaniyê bicîh kirin (Gereg ew Şadî bin, li wir niha Şadî dijîn-ş). Dîsa, komên Boz Ûlûs ên mîna Şêx Ahmet, Huseyn Hecî, Sakili li Haymana herêma Tunca (Toyçayir); bi Kuşna li Qereman di 1731 an de bi fermanê şandin. Atlandi-Qeremanê di 1752 an de, êlên mîna Kuşne, Qere Xelîlî, Danîşmend û Çayanên girêdayî Boz Ûlûs bi qasî 200 xane hatin bicîh kirin.(90-111) Di sala 1753 an de, li sencaxa Qonyayê û Navça Tûrgût û herêma Espkêşan û gundê Atlanti; ku li ser riya Hama, Şam û Misirê cîh digire; xwestin derbendekî ava bikin. Ji Tirkmenên Boz Ûlûs: Îzzeddîn, Kuşne, Hamza Hecî, Emrud, Danişmend, Qere Xelîl û Çayan bi cîh kirin.(156-104)

Qeymeqamê Çanqiri ji bo ku bajarê xwe biparêze bi dil û can kar dikir; lê di wê demê de êla Canbeg û Tirkmenên Mûsaca, ji cîhên dijîn derketin hatin. **Li Çanqiri, di herêma bi navê Kirpilî digerin, rêwî tazî dikirin û zirar didan gel. Bi ser wê yekê ve ferman derket** û di wir de dihate xwestin, ku Canbegên hîna li ser qeyda Rakkayê xuyadikin, niha li sencaxa Meletî digeriyan. Ji bo ku zirar û ziyana gelê wir jî ji wan bê stendin pêwîste ew bên girtin û bên şandinî Rakka, **sal 1740**. Cemeetê Mûsaca jî bi qasî 3000 quriş malê xwe hebûn û li Barcinli ya girêdayî Afyon Qerehîsar (Qerehîsar-i Sahîb) pêwîste bi cîh bibin, sal 1752.(160-811) Mûsacalû ji kîjan êlê ne em hîna jî nizanin, lê dibe ku êlêka Boz Ûlûs be.

Cengîz Orhonlû dibêje; di destpêka sedsala XVI an de Dulqadirî di nava Canbegan de heta Enqere hatibûn. Hinek komên din ên ji wan jî heta Şamê çûbûn. **Canbeg di sedsala XVI an de li Amedê dijîn**. Zivistanan ji başûrê Mêrdînê bigre heta Deyr-î Zorê li çolê derbas dikirin. Havînan jî heta Erzirûmê diçûn. Di sedsala XVII an de hatin Anadol û Qeremanê. Paşê, li Qereman, Enqere (Keskîn), Kutahya, Aydinê bi cîh bûn.(90-17) Li sala 1659 êlên girêdayî Kurt Mihmadli beşek ji şûna xwe veqetîn hatin Kuşadasi û mal çêkirin. Di sala

1713 an de ji wana çar xane li Derbend a Qaracaliya girêdayî navça Ilica, çar xane li Îzmîr û 36 xane jî li Kuşadasi bûn.(90-71) Canbeg û Boz Ûlûs piştî vê demê li rojavayê Anadolê bi tevahî belav bûn. Ewên ku li wir mabûn bi tevahî heliyan, lê beşek jî vegerî. Wek mînak, Zerikiyên di nava Boz Ûlûs de heta Bûrsayê çûn, piştre hinek jê vegerîn dora Enqere.

Li ser êlên Canbegan zelaliyeka berbiçav nîne, lê hinek jêder diyar dikin ku ew heft êl in. C. Turkay dibêje: Canbegan navê xwe yê din **Heft Boy/Zendan** in û ji van êlan pêk ten: Herdî (Herdîlî), Omeran, Omerûşaklari, Umranli-Umran, Zeyvelî ne. Yên din jî Barîckan, Diran-Deranlû, Dirzan, Herdî ne.(160) Gereg Omeran bi Omerûşaklari ve yek be; yekê jî, Omera û Umranli girêdayî Reşiyan e û navê wan ê kurdî jî Omerî ye. Boz-Ûlûs/Tabanli li Eyeleta Qereman, Eskîl, Akçeşehîr, Enqere, Aydin, Emîrdax (Qerehîsari Sahîp Sencaxi) dijîn. **Canbeg bi navêkî din Heft Zendan girêdayî êla Bexdilî ne**. Li Sarisû û Qereçam a girêdayî Kutahya hatine bi cîh kirin. Wekî din jî li Haymana, Koçgirî, Kirşehîr, Çêrmûk...(160-276) Canbeg li Meletî, Erxaniyê dijîn.(160-24) Êla **Zeyveli**yê ji Canbegan e û li: Enqere, Xarpût, Amed, Çorûm, Bûdakozu-Sêwas, Mecîdozu-Amasya, Rakka, Çerkeş-Çanqiri, Sînop, Meletî, Qers-Çildir, Sêwas, Erzirûm, Qerehisarî Şarkî, Amasya, Tokat, Çêrmûk, Mût-Îçelê dijîn.(160-169) **Barîçkani**yên girêdayî Canbegan li Xarpûtê rûdiniştin û ji bo ku li Rakkayê bi cîh bibin ferman hatiye dayîn. Ew li: Xarpût, Keban, Rakka, Erzirûm, Qers, Çildir, Yozgat, Meletî, Ahiska-Çildir, Arabgîr, Sêwas, Mereş, Amed, Golê rûdinên.(160-226) Beşekî ji wê êlê niha li Gundê Tirko yê girêdayî Haymanê rûdinê. Ji gundê Palancî, Hesenê Mihkê (80 salî-1997) digot em ji Meletî hatin.



**Canbeg-Palancî, Hesenê Mihkê**

Li Meletî êlêka bi navê "Baliyan" dijî; berî ew bêne Meletiyê li Dêrsîm û Madenê dijiyan. Baliyan ji milê Seydanliyên Dêrsîmê û ji Balaban û Şavalanliyên girêdayî êla Dêrsîmê veqetiyane. Gora deftera Meletî ya Tahrîr di sala 1560 an de di cîhe Baliyan de ev gund hebûne: Zeydanlû (2 xane), Kirlangiç (22 xane), Mamazar (26 xane), Kilîse (4 xane), Gozene (44 xane), Cafena (44 xane). Ji wana Cafana û Gozene ne Baliyan in. Beşa din ên di dema Yawûz de reviyabûn jî, çûn çiyayên Sêwas, Mereş, Akçadax û Dêrsîmê. Beşêk jî derbasî aliyê Yûnak û Cihanbeylî ya girêdayî Qonyayê, beşek jî derbasî Haymanê bûn. Beşêk jî derbasî Sûriyê, Mereş, Ezingan, Pulumur, Tercan û Semsûrê bûn. Evên ku çûbûn Qonyayê beşek jê vegeriya û li Eskikoya girêdayî Doxanşehrê bi cîh bû. Cevdet Turkay dibêje ew ji Kurdên Îranê ne û girêdayî Bozkoyûnan e û li Qonyayê koçer in. Baliyanên li Meletiyê mane Elewî ne, lê ewên çûne Cîhanbeylî, Yûnak û Haymanê bûne sunnî.[183-57] Bi qasî ez dizanim li Yûnak û Haymanê ti êlên bi navî Baliyan tunin û li wan herêmêna jî êla Canbeg rûdinê. Dibe ku beşa ji nav Baliyan hatî jî Canbeg bûn.

K. Yeşîlgoz, êlên girêdayî Canbegan û cîhê wan wiha dide nîşan:

| **Êl:** | **Cîhê ku berê lê dijî:** | **Cîhê ku koçber bûne:** |
|---|---|---|
| Derg/Zin, Deran | Mûsil, Amed, Mêrdîn | Sêwas |
| Dirêjan | ? | Sêwas û Kahta |
| Xerdî | Meletî, Xarpût | Qeyserî |
| Modan (Melle Huseyn, Yûsûf) | Amed, Erzirûm | Haymana, Qonya, Aksaray |
| ------ | --------- | Bozok, Çanqiri û Çorûm |
| Perîçkan | Mêrdîn, Riha | |
| | Mereş, Çorûm û Yozgat | |

Yeşîlgoz pênc êlan girêdide. Ji wana Modanli, wekî berê jî me gotibû, yên yekemîn li navenda Anadolê bi cîh bûne. Lê îro di cîhê wan de bi heman navî gundên Tirkên ji komê biçûk hene. Bi dîtina min ew di dema dewleta Qeremanî de bi cîh bûn û piştre dîsa vegerîn Kurdistanê.

M. E. Zekî beşekî ji Canbegan di nava Milan de destnîşan dike û Canbegên li Enqere û Qonyayê jî wekî 5000 malbat diyar dike. Di nava Milan de dû êlên bi navên Canbeg û Cîhanbeylî hene. Bi dîtina min sedema vê yekê ev e: Cîhanbeylî ji Anatoliya Navîn vegerîn û ji bo wê ew nava li ser ma, yên bi navê Canbeg jî nîştecîhê Kurdistanê bûn û ew cûdahî ji wir tê. Di bingeh de herdû jî yek in. **Gorî deftera Osmanî ya Tahrir, êlêka bi Kirmanckî axêf, êrîşkar û gelek zirar dayê derûdor, berê li Amed û Xarpûtê koçere û li Çanqiri, Çorûm, Kutahya, Enqere û Kirşehîrê bi cîh kirine. Dîsa we jî bi Milan ve girêdidin. Gor Kazim Yeşîlgoz jî ew berê li Agirî, Arapgîr, Gole, Qersê dijiyane û ji ber êrîşkariya wan ew rakirine Qonya, Kirşehîr û Sêwasê.[39] Der-Zin/Deranli û Dirêjan jî Canbegî ne û berê li Mêrdîn, Mûsil û Amedê dijiyan, rakirin Sêwasê.**

Xerdî jî ji Canbegan bûn û li Xarpût û Meletiyê bi cîh kirin, lê li wir jî nesekinîn û rakirin Qeyseriyê.(39) Bakûrê rojavayê Enqere rûdinên, 5.000 malbat in, beşek li Akşehîr, beşek jî li Haymanayê ne.(19-189)

Gerokê Danmerkî Cersten Niebûhr, di sala 1766 an de li Anatoliyayê geriyaye û li ser Canbegan wiha dinivîsîne: Ji 1766 an vir ve, ji Amed, Mêrdîn û heta Başûrê Mûsil 10 hezar konên Canbegan hebûn. Canbeg li Agirî, Arapgîr, Gole, Qersê jî xuya dikine; nayê zanîn ku ewên hatinî şandinî Rakkayê ne, an beşekî din in. Li wê herêmê jî xerê bi der û dora nekirine û li Qonya, Kirşehîr û Sêwasê bi cîh kirine. Ew yeka ji alî gelê herêmê ve jî tê pejirandin. Ji gundê Tirko-Haymana Huseyn Candan û Mûstafa Yildiz (65 salî-1997) digotin em ji Qersê hatine. Gor wana digotin ew 300 salan berî vê hatibûn. Dîsa gora Deftera Osmaniyan a Tahrîr (1850?) ew ji Amed û Xarpûtê rakirine û li Çanqiri, Çorûm, Kutahya, Enqere, Qonya û Kirşehîrê bi cîh kirine.



**Ji gundê Tirko jineka Canbegî**

Gor rapora dewleta Tirkan kûr a bi mora "pir pir bi dizî" hazirbûyî (1970), Canbegan nifûsa xwe li Gerger, navça navendî û gundên mîna: Beşgoze, Korûlû, Kiliç, Guzelsû û Gumuşkaşikê 500 kes in; henefî ne û kurmac in. Ji bilî vê, dibêje: tevlî serhildanan nebûne û girêdayî welatê me ne.(108-15) Dîsa gor heman raporê beşek jî li gundên bi navê: Arica, Şenkoy, Kabaolûk, Çatalolûk, Aktaşê girêdayî Kixiyê 900 kes hene.(108-68) Li navça Çatê 319 kes xuya dikin, lê ziman tirkî hatiye nivîsîn.(108-124) Canbegên li Kangal jî 3215 kes in û Elewî ne.(108-279) Li Bozovayê 317 kes in.(108-314)

Gor lêkolînên me bixwe kirî li Semsûrê sînorên Canbegan li rojava: ji belda Akincilarê destpê dike; li bakûr: beşekî ji navça Gergerê digire û berbi rojhilat dirêj dibe; li başûr jî: gundê Geldîbûldû dikeve nav û li rojhilat jî: heta sînorê Rihayê dirêj dibe. Nifûsa xwe texmînî 20 hezar kes in. Gundên xwe yên têne zanîn ev in:

| **Kurdî** | **Tirkî** | **Serhejmar** |
|---|---|---|
| --- | Kefeyrî | --- |
| --- | Akgun | --- |
| Tomak | Îkîzce | 1.300 |
| Hinç | Adali | 250 |
| --- | Akçaveran | 500 |
| Kêtîş | Bostanli | 1.500 |
| --- | Yaprakli | 1.200 |
| Tezenût | Ekînci | 500 |
| Kêlîlan | Kapili | 1.000 |
| Arga | Bozpinar | 700 |
| Gerbû | Samanli | 200 |
| Hud | Balli | 600 |
| Çepek | Eceler | 600 |
| Hunî | Dûmlû | 1.000 |
| Pîrhak | Kavakli | 700 |
| Êncûz | Eskîtaş | 2.000 * |
| Uçek | ----- | 200 |
| --- | Dîkmetaş | 150 |
| Kûdan | Teknecîk | 100 |

* Girêdayî Gergerê ye û gundê Canbegan ya navendî ye.

Li gora rûspiyên Canbegan li Kolikê ev e : *"Texmînî di dema Osmaniyan de êdî firehbûna xwe sekinî, yan jî dema ku ev êdî parçe bûn ji Haymanê-Enqere hatine "* hinek ji wan jî dibêjin: *" Em heft bira bûn û ji Cîhanbeylî-Qonya hatin vira.."*. Rûspiyên Reşî û Mirdêsa jî dibêjine; ew berî sedan salan li wir bûne; lê li Canbegan dîtîneka bi wî rengî nîne. Xuyaye ku ew dûre hatine li dora Reşî û Mirdêsiyan bi cîh bûne.

Canbegên li Anatoliya Navîn; Ji Yûnak-Cîhanbeylî bigire heta Polatli-Haymanê belav dijîn. Gundên girêdayî Yûnakê yên Kurd ev in: Yûnak, Beşişikli, Çayirbaşi, Kamaran (Hecîfakili), Hecîomeran, Gundê Xofê (Hatirli), Bodan (Îmamoglû), Qereyayla, Killar, Civikan (Koçyazi), Kurdan (Kurtûşaxi), Meşelîk, Halisînan (Odabaşi), Ortakişla, Ozyayla, Golan Ga (Saray), Suşe, Sûlûklû, Y. Yeşîlyayla, A. Pîrbeylî.(178-27) Gundên girêdayî Polatli ye jî: Tecîra, Uzunbeg, Hecosmana, Tufekçî, Micixa, Milsefa û Qirpoli ye. Giredayî Cîhanbeyliyê jî Kelhesan, Turana ne. Giredayî Çeltîkê jî: Rengan, Sorikan, Sagan, B. û K. Hasan in. Giredayî Kadinhaniye jî Sarikaya ye heye.




**Gundê Kelhesen**

Li gundê Tirko yê Canbegî xelk dibêje ji me re Qere Mehmet Oxûllari tê gotin. Mûstafa Yildiz (65) di sala 1997 an de digot malbata me ev in: Xurma-Xurba, Doyika û Parçikan e. Canbegên li Anatoliyê xwe bi Gawestiyan ve girêdidin. Li Mereş û navçên wê jî Canbeg hene û vê re "Tafkirar" tê gotin. Bi tirkî jî "Tapkiran" tê gotin; li Xorasanê jî ew hene. Li gundên Kangal-Sêwasê yên mîna Dawidoglû, Pinarozu, Kuleklî, Qereahmetlî, Kabakçevlixi, Killik, Qeregol, Gebelîkatran, Îxdelî, Minarekaya, Kirlangiç, Sultanpinari, Kapikaya, Kurkçu û Diboglûyê Canbegî dijîn. Serhejmara wan 3215 kes in, zarava wan kurmancî ye û ew elewî ne.(164-175)

Di nava koma Canbegên ku îro li bakûrê Kurdistanê bi cîh bûne de zêde koçberî nayê dîtin. Gorî em ji rûspiyan hîn bûne, di derdora salên 1910-20 an de ji bo ku gundên mîna: Siver, Givdiş û Rûzirî baca xwe nedan, ew ji alî Qer Osman Paşa (axa) ve hatine şewitandin. Lê dîsa jî ew dest ji gundên xwe bernedane û koç nekirine. Gundên xwe ji nû ve ava kirine. Hêza Qer Osman nagê wan gundana û gundê Gerbû (Gerbas) dişewitîne û gundî diçin Wêranşehrê. Dema bendava Atatirk di salên 1988-1990 an de hate çêkirin 10-15 gund di bin avê de man û gel koçî der û doran kir.

Dema G. Perot di sala 1861 an de diçe gundê Tirko (Canbeg) û Taburoglû çavdêriyên xwe wiha dinivîsîne: Serê jinan wek gulokek mezin hatiye girêdan, mîna beroşeke nuxumandî. Xavikî spî bi ser wê qelafetê kofiyê ve girêdayî bi ser milan dadikeve. Kincên mêran dibiriqin û ji qutikên sor ê bi tayên zêr neqişandî hez dikin. Dênikên (tas) serên wan kovikî ne. Dema ku

Kurd li welatê jêr bi cîh û war bûne, wan dev ji tasên qerase berdane. Jinên Haymanê bi mêran re vekirî û bê şerm diaxivin. Di oda mêr têda rûdinên û rûye xwe venaşêrin. Wek gundiyên Fransa bûn.[34] Ew destpêka bi cîh bûnê ye, wêneyê ku gerok dide, rewşa Kurdên wê herême berî bi cîh bûnê jî dide. Yanê, hîna jî ew bi kofî bûne, şalê sor bûne û hîna jî bandora ola Îslamê li ser wan tune ye. Ew dem ji bo êlên Kurd destpêka guhartin û kevneşopiyên netewî winda kirinê ye...Ew jî dide xuyakirin ku di alî kincan de ti cûdabûna Reşî, Şêxbizin û Canbegan nîne. Canbeg tenê di alî devoka xwe de cûda ne.

Ew jî Kurmancî deng dikin lê dema mirov devoka wan bi federasyona Reşiyan ve bide ber hev, cûdabûn hema derdikeve pêş. Kurmanciya Canbegan, hîn baştir û hîn dewlemendtir bû. Ew dema ez qal dikim salên 1970 an e. Niha hemû xirav bûne û gelek tirkî ketiye nava ziman.


Jineka Canbegan

| **Devoka Reşiyan** | **Devoka Canbegan** |
|---|---|
| Kurik | Zarok |
| Penêr | Çolik |
| Şijing | Sêzig |
| Niha | Nika |
| Êcer | Teze |
| Weng | Aka |
| Devyek | Yanzdeh |
| Bîstîne | Bikirê |

Di alî olî de cûdahî di navbera êl û federasyonên din de hene, di nava Canbegan de jî hene. Li gor herêma lê dijîn, baweriya wan ê olî tê guhartin. Canbegên li Anatoliya Navîn û yên li Semsûr û Kolikê sunnî û ji mezheba henefî ne. Ewên li Qoçgîriyê elewî û yên li Xorasanê şîa ne. Di nav Canbegên li Semsûrê de kesên ji mezheb û olên din dîtin zahmete. Ew bi kesên ji olên din re zêde têkiliyê danaynin. Ji alî din ve jî, roja Çarşem û Înê bi şev, devê şûjingê dişewitînin û pê hundirê odê rêşdikin, ku bila cin ji malê derkevin...Di dawetan de, di şevê hinê de jî, li mala bûkê govend tê kişandin û paşê jî ew lambê vedimirîn û findan vêdixin. Di ronehiya şemdanan de ew semahê dikişînin û li dor bûkê çerx dibin.

# MIKAÎLÎ
## (Sîpkan)

Navê vê êlê wekî di navê wê de diyare, ji navê kesekî tê, ku ew jî îhtîmaleka pir mezine serokek yan jî kesekî ku girîngiya wî di nava êlê de bû.

Li ser dîroka vê êlê agahiyên kevn nînin; ew jî îşareta wê yekê ye, ku ew berê di bin navekî din de jiyane. Tespîtên herî kevne ku em dizanin ji dema Tîmûr in. Di sala 1386-1387 an de Tîmûr êrîşî ser Spîkan, Zêtikan, Sewêdiyan û Bazokayan kir û hemû ji ber revîn. Bi ser vê de, ew bi Beraniyan ve ketin nav hevkariyê. Piştî wê, tespîta din jî ji alî Torî ve tê kirin: Mehmed Begê Rewandûzî, teslîmî Osmaniyan bû şûnde, êlên mîna Bekrean û Reşkotan bi qehremaniyeka qet nayê dîtin li ber xwe dan. Hafiz Paşayê Osmanî, bê îstîsna guh, poz û tiliyên jin, zarok û kalên li berxwe dabûn jêkirin. Xelk li hember vê hovîtiyê koç kir û teslîm bû. Li hember berxwedana êla Sîpkî ya li Ezinganê jî Osmanî derbasî şer bûn; Sîpkî têk çûn û belav bûn.(38) Ji bo me xala girîng ew e, ku ew wê demê li Ezinganê bûne.

Di beşa Reşiyan de jî min dabû xuyakirin ku gelek nûser Mikaîlan di nava Reşiyan de didin xuyakirin. Ew dîtin bi min zêde balkêş nayê; ji ber ku ew îddea li ser hinek agahiyên kêm hatiye hûnandin. Mikaîliyên li navenda Anadolê bi Reşiyên wir vê ji hev cûda ne, çavdêrekî baş dikare ferqa wan ên: fizîkî û devokî bibîne. Dîsa jî rastiyeke ku êlêka bi wî navî, yan jî ew, di sedsala XVI an de li dora Semsûrê tên dîtin. Gor dîtina birêz Dr Mikaîlî, ew êla han, bereki ji **Adaman** e. Adaman ji van berena pêk tên: Kaskan-**Nezoî**, Kaskan-**Reşoyî**, Kaskan-**Seboyî**, **Şemsikan**, **Delikî**, **Plakan**, Kaskan-**Çetoyî**, **Çomoyî**, Kaskan-**Amuçeto** ne. Serhejmara tevahî Adamanan nêzîkî 20 hezar e. Li Anadola Navîn tenê ji wan Mikaîla hene.(180-62) Di nav êlên Adamanan de wekî xuya dike Mikaîlî tunin. Dîsa heman nivîskar dibêje: Li başûrê Kurdistanê jî tê gotin ku beşek ji Caf an Mikaîlî ne.(181-38) Caf ne komeka kurmancî axêf in, bi vî navî êlêk di nav Cafan de heye û dibe ku nav wek hev bin, an jî dema Caf hatin (1774) Serhedê beşek ji Sîpkiyan ketibe bin sîwana wan. Berovajî wê di nav Sîpkiyên bi nav û deng de Mikaîla hene. Ji alî fizîkî û civakî ve jî ew dişibînin hevûdû.



Gundê Mikaîla

Wekî tê zanîn piraniya Sîpkiyan di Sovyeta kevn de û li bakûrê Kurdistanê dijîn; yên çûbûn Rûsya ji bakûr çûne. Endamê Kongra Netewiya Kurdistanê hevalê birêz Ezîzê Cewo jî ji wê federasyonê ye, belavbûn û şaxên wê wiha hejmartin:
1. Mikaîla: Li Pampana Kurdan (Sîpan) û Elegezê dijîn. Ezîzê Cewo ji wê êlê ye û ew Êzîdî ne.
2. Kilera: Li Talînê gundê Qibixtepê dijîn.
3. Çiliyan: Li deşta Araratê dijîn.
4. Şemsikan: Li Pampa Kurdan û Elegazê dijîn.
5. Îsêdizan: Li nehiya Talîn gundê Heko dijîn.
6. Ûtî (Witî).
7. Stûrkiya.
8. Kerreya ne.

Heta vir ew pirsa derdikeve holê, gelo têkiliya Adaman û Sîpkiyan çi yê? Em îşaretên wê pirsê di rapora dewleta Tirk de dibînin: Gor rapora dewlata Tirk a kûr ku amade kirî (1970) û bi mora "pir pir weşartî" hatî bi dest xistin, êla **Heyderî** li Kurdistanê xwedî 56.790 nifûs e; kurmanc û şafiî ne. Ew li Patnos, Diyadîn, Taşliçay, Hamûr, Bazîd û gundên wan dijîn. Şaxên xwe ev in:
- Adaman, Adaman (milê Badoyî)
- Adaman (milê Çomoyî. Dibêje navbera wan û Plakanliyan baş e.)
- Adaman Kaskan, Adaman (milê Mikaîl): 2510 kes in, li Hamûrê dijîn û bi Bilikaniyan ve nakokiyên xwe hene.
- Adaman (milê Mikaîl): 630 kes in, li Taşliçay dijîn.
- Adaman (milê Kaskan-Reşoyî): 1840 kes in, şafiî ne û li Diyadînê dijîn.
- Adaman (milê Plakan): 3540 kes in, şafiî ne û li Taşliçay û gundên wê dijîn, li Mûşê şaxê xwe hene û bi Tirkan re li hev nakin.
- Atmanekî (milên: Melle Dewsî, M. Kalender): 2630 kes in, şafiî ne û li Hamûrê dijîn.
- Hevîdî: 1250 kes in, şafiî û li Patnosê dijîn.[108-45/55]

Ji wê wêneyê tê fêhm kirin, ku ew dem bi dem di bin sîwana federasyon û konfederasyonên mîna Adaman, Heyderî û Sîpkî yên cûda de jiyane. Li Ercîşê jî êla Heyderanî dijî ku hejmara xwe 21.100 kes in. Berên wê êlê wek: Sarmali, **Xelikan**, Şahkolû, **Mikaîla** û Dawidî hene.[108-346] Ji ber şer û komkujiyên li hember êlên Kurd, ew jî mecbûrê yekîtî û hevkariyê bûne; ji bo wê gelek caran wêneyekî safî em nabînin û êlêkê tevlî ya din bûye ku ew yeka divê bi me ecêb neyê. Ji wan êlên navê xwe derbas dibin em dizanin Delikî, Celikî ne; dîsa Plakanê li Agirî û Xorasanê wek Pilekan derbas dibin û Kaska jî li Xorasanê hene. Hewêdî li Xorasan û Hindistanê hene. Reşî jî me qal kiribûn.

Avyarov ji arşîva Rûs radigihîne, ku êla Spîkî û Rediki (Reşikî?) ji ber baca giran di sala 1834 an de reviyane Erîvanê. Li Erîvanê navê cîhên mîna Zîlan, li Ahaska Şêx Hesenan, li Sûrmeliyê Redikan, li başûrê Eledaxê **Heyderanli**, li Tûtak û Hamûrê **Spîkan** bi navê êlan ve tevhev dihate xwendin.[28] Di navên li

jor me nivîsîne de, tenê Adaman nîne, dibe ku ew jî ji wan navên li jor yek be û hemû li herêmekê ne. Ew jî piştrast dike ku ew wek konfederasyon bi hev re tevdigeriyane. Di sala **1855 an de êla Spîkan bi beşên xwe gîştikan ve Beyazît terk kir çû navbera Patnos û Tûtakê**, ango li çiyayê Qertwinê bi cîh bû. Berê li wir Kurdên Êzdî hebûn, lê di sala 1790 an de Siltan Ahmet ew di komkujiyê re derbas kiribûn. Spîkiyên bi "Êzdiyên Misilman" têne navkirin wêder ji xwe re kirin war. **Di sala 1774 an de ew ji Îsheq Paşayê Kurd veqetîn û çûn Erîvanê.** Paşê bi teşwîqa Osmaniyan vegeriyan. Di heman salê de beşekî Cafan jî hatin. Caf, êlêka (konfederasyoneka-Ş.Reşî) ji 10 hezar xaneyan bû, zivistanan li Silêmaniyê, havînan jî li Îranê dijîn.[28] Cafên ku Dr Mikaîlî qal dike ev in. Ji bo wê, di sala 2006 an de ez çûm Bruxselê û bi Wezîrê Eşo re min hevdîtinek kir.

Wî li ser koma xwe Sîpkan wiha got: Piştî salên 1800 an, serokê Sîpkan, Sari Silêman Axayê Sîpkî ye. Ji ber beşekî ji Sîpkiyan misilmantî qebûl kirin, beşê ku wek Êzîdî mabûn hertim biçûk dihatin dîtin û ji aliyê misilmanan ve bi qerfan re rû bi rû diman. Bi ser wê ve, di navbera salên 1820 û 30 an de, êla Sîpkan jihev veqetiya. Yên baweriya xwe Êzîdî bûn hatin Eleşgirtê û heta salên 1878 an li wir man. Dema xebera veqetandina êlê gihîşt Silêman Axa, ew pir xemgîn bû, mirovên xwe li dû wan şandin, lê ew venegerîn û tê gotin ku axa pir bi ber vê yekê ketiye û li jinûyên xwe xistiye... Îhtîmaleka mezine ku ew ji dora Entebê hatine Eleşgirtê. Dema li Eleşgirtê bûn, şerê Osmanî û Rûsan destpê kir. Rûsan Qêrs wergirt bi şûnde, biryar dan ku derbasî alî Rûsan bibin. Bi wan re hevdîtin kirin, ji bo ku Roma Reş (Tirk) pê nehese bi şev karwanên xwe derxistin rê û bi berbangê ve gihîştin (1880) Qersê û nav sînorên Rûs. Di sala 1918 an de çûn Ermanîstan û Tiflîsê. Ew gotin parçeyekî dîroka Sîpkiyan e, lê xuyaye ku ewên bûne misilman li cîhê xwe mane. Wê demê pirsgirêkek derdikeve holê, yên li Haymanê kîngê hatin?




**Gundiyên Mikaîla**

Gundiyên Mikaîla dibêjin em ji Riha-Wêranşehrê hatine, lê di jêderên Osmaniyan de ew ji Agirî û Bazîdê hatine.(180-62) Dibe ku wekî Êşo dibêje ji dora Dîlok û Rihayê çûbin Bazîdê. Ji wir jî hatibin Polatliyê. Li gundê Mikaîla gorên herî kevn ji sala 1802 (1222) an de mane. Dîsa li ser kevirê gora Hec Ehmedî Mehê 1274 (1855) û li ser Oçoyê Mehê jî 1271 (1852) hatiye nivîsîn. Li ser kevirê camiya kevn jî 1258 (1837) tê xwendin. Gor gotina Îzetî Osikê, gund di sala 1227 (1806) an de hatiye avakirin.(180-62) Di navbera gundiyên Mikaîla bi Êşo ve cûdabûneke pir hindik heye; lê jêderên din jî gotina Êşo piştrast dikin. Di sala 1855 an de ji Bazîdê hatin û li gundê Mikaîla yê girêdayî Polatliyê bi cîh bûn. Berên xwe jî ev in: Sîpkî, Kilirî, Biritî, Mankî û Muhailî ne. Navê xwe yê dawiyê Mikaîla ne. Yeşîlgoz jî dibêje Sîpkanli yan jî Memekanli li Melazgir û dora gola Wanê dijîn.(39) Vê hatinê nivîskarên din jî piştrast dikin: wek Alakom heman dîrokê didin.(126-70) Di sala 1850-56 an de rewşenbîrê Kurd Mela Mehmûdê Beyazîdî wiha dinivîsîne: "Ji hemûyan camêr û reşîd tayîfa Spîkan e û qedîmê axayê wan mala E'tl e û li axa Bazîdê dijîn; çend qebîlên wan hene:

| | |
|---|---|
| Sîpkî | 300 xane |
| Mankî | 200 xane |
| Kilêrî Êzîdî | 100 xane |
| **Mîxayilî** Êzîdî | 100 xane |
| Birinî | 70 xane.(177-1) |

Ji wan jêderan jî diyare, ku ew herî dawî li dora Bazîdê dijîn û ji wir jî belav bûne. Wekî tê gotin beşekî tere Rûsyayê, beşek tê Anadolê û mumkune beşek jî çûbe başûrê Kurdistanê. Lê bawer dikim ew beşa bi Cafan re çûn.


Mikaîliyên li Rûsya me li jor gotibûn, yên li Enqere-Polatliyê li şeş gundan belav bûne. Gundên Mikaîla: Mikaîla (Înler)-Mikaîlî-Milan, Ilce (Ilica) Mikaîlî-Tirk.(173-6) Mîkaîlî, li Enqere, Çanqiri, Adana, Ûzeyr û Qerehîsarî Şarkî, Haymana, Ergûvan (Sencexa Xarpûtê) dijîn û wek taîfa Yorukan hatiye nîşandan.(160-586) Gundên ji êla Rûta jî wekî Mikaîla dihesibîne lê divê ne wiha be, Rûta bi piranî di nava Şadiyan de xuya dikin. Gundên Rûta ev in: Rûta Newalê (Yenî Mehmetlî), Rûta Gazê, Koçika (Sapanca), Avda (Hecîmûsûl) ne.



**Gundê Rûta**

Ewên li Îran û Wanê (Hamûr, Taşliçay) kurmanc û şafiî ne.[180-62] Şêx Mewlana Xalidê Mikaîlî, li Silêmanî-Qeredaxê rûdiniştiye ku Neqşîbendîtî wî di nav Kurdan de belav kiriye.[181-38] Spîkan û Bazokaya (Melazgir, Tûtak, Dîlok, Xinis) jî 42-67 tîrên xwe hebûn. Pirtûkên dîrokê dibêjin ew herdu kom, rûmeta ola Îslamê nedizanîn. Spîkan dereng misilman bûn û ji Êzdatiyê derketin. Bazokiyan jî, ji Şîayên Batinî bûn. Şûn û warê Spîkan deşta Bazîdê Spî bû û navê xwe jî ji wir wergirtin.[32] Spîkên li Rûsya hîna jî Êzdî ne. Yên li Anatoliya Navîn jî sunnî ne.

Di alî kincan û kevneşopiyan de ti cûdabûna Mikaîliyan bi komên din ên herêmê re nîne û ji bo ku me berê qal kiribû hewcê nake ku em careke din dûbare bikin.



Gundiyekî Rûta

## SEWÊDÎ

Li ser navê vê êlê rîwayêtên cûda hene, yek ji wana min berê jî nivisî bû, ku xwarziyê Eba Muslîm, Babekê ji nesla Nebt/iye **Sevadan** kurê Abdullahê ji Medya ye. Diya xwe jî ji gundê Bilalabada (Kelanrûd) Mimeda li Ezerbeycanê dijî û jineka navê xwe Brûmid/Burûmend çaveke xwe kor bû ye. Navê bavê wî jî **Merdes** bû. Ne dûre ku navê êla Sewêda ji wî binemala Sevad hatibe; lewra em dizanin ku ew êl alîgirê Eba Muslîm bûn û ji bo tola wî hilnin, ji navenda

Xorasanê hatin dora Kerkûkê. Navê Merdes jî li ser êlekê ye û dibe ku herdû êl ji kokekî veqetîbin. Alternatîfa din a li ser koka wî navî jî, ji alî Şerefxan Bedlîsî ve hatiye nivîsîn.



**Ji Gundê Sewêdî Cîmanê Derbas**

Kok û serokaniya binemala Mîrên Sewêdî diçe digihîje **Bermekiyan**. Eslê êla wan digihîje yekî bi navê Eswed, ku di dema xwe de kolê eshabekî Pêxember e. Gor rîwayetekê jî: cihê êla Sewêdî yê eslî, li gundê **Suwêdeyê** du qonax ji Medînê dûr û ber bi aliyê Şamê ve ye. Lê neslê kurê Bermek diçe digihîje melîkên Farisan. Tê gotin ku berê li wilayeta Belhê jiyane û agirperest bûne.(157-276) Bi qasî em dizanin têkiliya Sewêda di dema Ebbasiyan de bi Ereban re hebûye. Berî wê ti agahiyên zêde nînin; lê piştî şerê bi Ebbasiyan re, ew berbi bakûrê Kurdistanê hatine û herçiqas îhtîmaleke kêm be jî, dibe ku navê Sîwêrekê ji wê êlê tê. Agahiya Şerefnamê ji bo gundê Suwêde jî dibe ku rast be. Hîna ku nehatine bakûr dibe ku li wir bicîh bûbin û ew nava jî ji kalên xwe wergirtibûn dane ser gund. Gor lêkolînên min kirî jî, ew Zerdeştî bûne, lê ti têkiliya wan bi Farisan re jî nine. M. E. Ewnî dibêje, rîwayeta nêzîkî rastiyê ev e: Ew êla ji Kela Sewêdî ya di navbera Amed û Rihayê ku niha jê re Sêwrek (Sîwerek) tê gotin hatine. Ev jî dema ku xaçperestan derûdora Şamê girtin û qismek Cezîrê îstîla kirin, Rûm û Ermeniyan wira kirin destên xwe, ew jî koç

kirin. Pêywendiya wan bi gundên nêzîkî Medînê re tune ye.(157-499) Ji bo ku ji navenda Xorasanê hatine, dibe ku Şerefxan li ser wî bingehî nivîsiye.

Navê din ê ku li wê êlê dikin jî: **"Qilorî"** ye. Ew nav ji dema Osmaniyan ve maye û îhtîmaleke ku bi vî awayî jî ketibe qeydên Osmaniyan. Heta roja îro ji alî gel ve û ji alî êlê ve jî carna bi kar tê ango gel jî wê yekê dizane. Li aliyê din navê Bermekî di nava gel de nayê nasîn. Gor rîwayetê, Osmaniyan bacê ji Sewêdiya xwestiye û ew jî fîlîkê bizinan dane û ji bo wê ji wan re bi tirkî gotina "Kil veren=fîlîk dan" û ew nav di pêvajoyê demê de wekî Qilorî tê guhartin. Lê navê herî rast Sewêdî ye.

Li ser dîroka Sewêdiya kevn agahiyên konkret nînin, tenê em dizanin ku ew jî ji navenda Xorasanê hatine. Li ser wê bingehê em texmîn dikin ku ew jî di bin sîwana Saka de bûn. Di dema Eba Muslîm de tê zanîn ku ew di nav tevgera wî de bûn. Şerefxan jî dipêjirine ku ew ji navenda Xorasanê hatine. Wê serdemê navenda Xorasan û Arran kêla berxwedana Kurdan bûne. Ş. Bedlîsî dibêje: Al-î Bermek ji Turkistanê bi leşkerên li dijî Emewiyan re hatin Îraqê û ji bo damezrandina Ebbasî gelek têkoşiyan. Çar kes ji wan bi nav û deng bûn:

**1. Xalîdê Cehfer:** Bi Ebu Muslîm re hat Îraqê û bû wezîrê Ebbasiyên Xwînrêj.

**2. Yehya kurê Xalid:** Ebû Cefherê Mensûr, Ezerbeycan da wî û Mehdî kir wezîr.

**3. Fedlê kurê Yehya:** Wezîrê Harûn Reşîd bû.

**4. Cehferê Kurê Yehya:** wezîrê Harûn Reşîd bû. Di dema Cehfer de fermana qirkirina Bermekiyan derket. -C. Rojbiyanî.(157-499)

E. Cemîl Paşa dibêje: Harûnê Reşîd, mêrê mezin Caferê Bermekî da kuştin; Bermekî ku hem gewremerd û hem hevalê wî bû û bi salan ji bo pêşveçûna Ebbasiyan kar kiribû. Ew ked û dilovaniya Bermekî ji bîr kir û serê wî hat firandin. Ji malbata wî jî pir bêgunehên din hatin kuştin.(9-195) Lê sedama wê kuştinê nanivîse. Şerefxan dibêje: Cehfer di dema Ebdulmelikê kurê Merwan an jî gor rîwayeteka din, di dema Silêmanê Ebdulmelik de, bi serwetek gelek mezin, bi xizmetkarên zêde koçê Şamê navenda fermanrewatiyê kir. Xelîfe ew bîhist û bangî wî kir ku were meclîsê. Serokê êlê Cehfer diçe dîwana xelîfe û li hundur xelîfe wî dide girtin. Ji bo ku di qaşa gustîrka wî de jehr hebûye, Xelîfe wî dide girtin. Cehfer jî wê yekê rast dike û dibêje: dema ez di tengasiyê de mam ezê qaşa gustîrkê bimijim û bimirim. Bi ser mêraniya wî ve xelîfe wî dike meclîsê û navê wan jî dibe Bermekî.(157-277) Wata wê çi ye? em îro nizanin, lê gereg wateka wê bi erebî hebe.

Li ser nakokiya Sewêdî û Ebbasiyan tê gotin; ku Harûn Reşîd bi gotina fesadan kir û Cehfer kuşt, Yehya û Fedlê jî avêtin zîndanê û dest danî ser mal û milkên wan. Mûsa jî îhtîmaleka mezine ku reviya çiyayên Kurdistanê û xwe weşart. Li ser wê rêvê gelek çirokên cûda tên qal kirin. Ji bo ku ew kesên ji êla Sewêdî di rêvebiriya Ebbasiyan de cîh girtine û meqamên girîng ketine destên wan û têkiliya wan û Ebbasiyan li destpêkê baş bûne, îro hinek Sewêdî (yên Anadolê) dibêjin eslê me Seyid e, yan jî digihîje Hz. Muhammed.



**Şahanê Mala Başê-B. Mezin**

Bingeha wan gotinana ew kes û têkilî ne. Yekê jî, di serdemekê de xwe nêzîkirina Ereban, misilmanan û Hz Muhammed jî kes yan jî kom dikirin xwedî îmtiyaz, yanê ji bo berjewendiya bi giştî bû. Di nava wê de bac nedayîn, heyî bi ser de dibarîn, li kîjan cîhî bixwazî bi cîh bûn, azadî, esker nedan û hwd. Lê ji alî biyolojîk û nijadî ve ti têkiliya Sewêda bi Ereb û Ebbasiyan re nîne. Ew di pêvajoya dîrokî de jî xuya ye: ku Ebbasiyan ji bo ku Emewiyan hilweşînin, ji Kurdan gelek îstîfade kirin, xwe nêzîkî wan kirin, meqam danê, lê piştî ku xwe rihet kirin û desthilatdariya xwe qewî kirin jî, wekî hêzên din vegerîn ser Kurdan, êrîş kirin, ew kuştin û hêza wan lewaz kirin.

Tê gotin ku bingeha vê ya dîrokî wiha bûye: Bi alîkariya Eba Muslîm û Kurdan desthilatdariya Emewî hilweşiya û Ebbasî bûn desthilatdar. Ebbasî, ji hêza Kurdan tirsiyan û di bin re destpêkirin ku wana ji holê rakin. Gelek serokên Sewêdiyan bi hencetan dan kuştin. Ew qesrên ku Sewêdiyan ji xwe re çêkiribûn Ebbasiyan qebûl nekirin û xwestin ku ew wana hilweşînin û ji bo Xelîfê çêbikin. Sewêdiyan va fikra qebûl nekirin. Ji ber vê Ebbasiyan fermana kuştina beg û serokên Sewêda (Bermekî-barmaki) dan. Di sala 790 an de kurê Xalîd Mûsa direve tê **çiyayên Gêncê**. Li wir Hemîdiyan û Şemsiyan jî ew pejirandine. Wî serokî cara yekem yekîtiya di nav Kurdên wan deran de pêk aniye. Di nav wan de Ermen û Gurcî jî hebûne. Di vir de mirov dikare texmîn bike, ku li dijî hovîtiya Xelîfe ya bi gelên ciran re hevgirtinek pêk anîbûn. Ji Hemîdiyan re Merwanî jî tê gotin ku piştre ew li Amedê bûbûn xwedî dewlet.

Wekî tê zanîn Hemîdî xalanê Xelîfê Emewî yê dawî Merwan in, Eba Muslim ew li Mûsilê têk bir (749) û ew reviya Filîstînê.[9-158] Kurê wî ji wir hatibû Amedê. Şemsî jî êla Kurdên Zerdeştî ne, ji bo bawerî bi agir û rojê dianîn, Ereban navê Şemsî lênabûn. Di vê gavê de Hemîdî û Şemsiyan li dijî Xaçperestan bi hevre îttîfaq dikirin. Piştî ceng û şerên giran, wan Kurdana li çiyayên Qerece û Xoxê, Heleb, Efrîn, Elezîz, Şemsat, Sîwerek, Xarpûtê bi cîh bûn. Şerefxan jî dibêje: Gor rîwayeta di nav gel de tê gotin: Di dema Ebbasiyan de, sê kurên (yek ji wana Mîr Şahab e) Al-î Bermek, Bexda terk kirine û ber bi Kurdistanê hatine. Li ciyekî navê wî **Hançûk** yê li Çiyayê Şeftalûyê girêdayî Gêncê bi cîh bûne. Piştî Şahab kurê wî Emîr Celal tê ser rêvebiriyê.[157-278]

Di sala 839 an de Xelîfe êrîşî Kurdên bi navê Hemîdiyan, Diyîloyan, Dihîvan, Lawatidyan, Karyan, **Barizan-Beranan-Mirdêsiyan, Siwêdiyan** kir. Vê hevgirtina Kurdan şer winda kir û leşkerên Xelîfe ji wan 500 hezar kuştin. Piştî ku xelîfe bi wê zilmê bihîstiye, serleşkerê xwe avêtiyê zîndanê. Lê vê polîtîkayê jî Kurd baş nasdikin ku berê di komkujî yê re derbas bike û piştre jî kesekî wek sûcdar bavêje zîndanê û destên xwe bi xwîna Kurdan bişo! Xala girîng ew e, ku li wê herêmê (Mûsil) Kurdên Sewêdî û Mirdêsî hebûne.



**Gundê Sewêda B. Mezin**

Di sala 852 an de **Mîrza Muhemmed** dibe serok, bi Kurdên Çemîşgezek ve hevgirtinek pêk tîne û êrîşî Ereban dike. Kurdên Çemîşgezek me di beşa Xorasanê de dabûn xuyakirin. Di sala 892 an de di şer de şehîd dikeve. Di şûna wî de **Emîr Mîrza Şah Fexreddîn** dibe serok û di serî de xelîfe û hemû cîran wî nasdikin. Li dijî Ermen û Gurcan jî şer kiriye û di dema wî de Xarpût, Xelat, Erciş ketiye destê wan û bi giştî 82 êlên Kurdan di bin destê wî de bûne. Di sala 927 an de **Mîr Muhemmed Berokî** bû serok û di dema wî de Sîwerek ji dest Hemdaniyan hat stendin. Dibe ku navê Barmekî ji navê wî mîrî jî tê.

Di sala **1045 an de Melîk Muhammed** dibe serok û ew bi Merwaniyan re hevgirtinek pêk tîne. Ji şerê Bîzansan bi şunde yekîtiya wan li Warê Berana (Mûş), Bedlîs û Xelatê jî pêk hatiye. Di sala 1054 an de Selçûqiyan êrîş anîn ser wan, lê Selçûqî ji ber wan heta çemê Çoruhê revîn. Di vî şerî de alikariya Mehmûdiyan û Merwaniyan hêja bû. Ev serok di şerê Melazgirtê yê di 1071 an de hate kuştin û di şûna wî de **Emîr Perwîz Muhemmed** dibe serok. Di derdora

salên 1152 an de **Emîr Celal** serok e û gelek şerên misilman û xaçperestan çêdibe û Kurdên wan deran jî beşdarî ew şerana dikin. Di derdora salên 1180-90 an de li gel Eyyûbiyan li hevkariyê digerin, lê Artûkî dibin asteng. Di sala 1200 an de bi Eyyûbiyên Meya Farqînê re yekîtî pêk anîn û şertên yekîtiyê wiha bûn:
**a-**Xutbe li ser navê Selheddîn bê xwendin.
**b-**Li ser peran navê Selheddîn were nivîsandin.
**c-**Herkes di bin ala xwe de here cengê.

Û ew peyman heta sala 1218 an dom kir.

Di sala 1272 an de **Emîr Hesen** dibe serok û welatê bav û kalên xwe hemû zept dike. Lê li vê demê Dulqadirî ji rojava êrîşê tînin ser wî û ew jî bi Çemîşgezekiyan re îttîfaqê datîne. Sedsal piştî wê demê, di 1386-1387 an de Tîmûr êrîşî ser Sipkan, Zêtikan, Sewêdiyan û Bazokayan kir û hemû ji ber revîn. Bi ser vê, ew bi Beraniyan ve çûn îttîfaqê.

Di sala 1409 an de koçerên bi navê Pezgewr ji aliye Ezerbeycanê êrîş tînin ser Emîr Fahreddîn, Şêx Hesenê Çemîşgezek, Mîr Omerê Kemah û êlên din, bi wan re aştî çêkirin. Di sala 1445 an de bavê Şah Îsmaîl, Şêx Cuneyt hate cem Hesenê Dirêj, serokê Sewêdiyan nêzîkatî nîşan dayê û têkilî pê re danî. Tewerê ji Şêx xwestibû ku Hesen dev ji welate dê û bavê wî berde. Hesenê Dirêj jî xuşka xwe dabû Şêx. Ev daxwaza wan Kurdana nayê qebûl kirin û bi ser vê de dev ji îttîfaqa Pezgewran berdidin. Kurdên bi navê Bazokyan êrîş tinîn ser wan; ev jî ji Çemişgezekiyan alîkariyê dixwazin. Di destpêkê de, ew Kurdana li gel Şah Îsmaîl cîh girtin û li bajarê Tebrîz mercên hevkariyê îmze kirine, lê paşê bi çewtî îttîfaqa wan belav bû.

**Emîr Celal kurê Emîr Şahab** dibe serokê Sewêdiyan. Pişt re, **Emîr Mihemmed, Emîr Fexreddîn; Emîr Hesen** tên. Mîr Mihemmed çû ba Hesenê Dirêj (1478 mir), wî jî Hançûk û Çepaqçûr da destê Mîr. Lê dema Mîr vegeriya di navbera wî û birayê wî Emîr Fexreddîn de şer derket û Mihemmed hate kuştin. Fexreddîn dema mir zarokên xwe biçûk bûn û lawê Mihemmed Ebdal Beg li cîhê wî rûnişt. Di wê demê de eskerên Qizilbaş êrîş anîn ser Xarçûkê û heft şev û heft rojan şer derket û Ebdal bi ser ket. Du kurên xwe bi navê Subhan û Siltan Ehmed Beg hebûn.[157-280]

Ji şerê Çaldiranê (1514) bi şûnde, ew herêma jî kete destê Osmaniyan. Di destpêka desthilatdariya Osmaniyan de, Mirnîşîn di navbera du kurên Ebdal de parve bû.[100-302] Wê demê ew mîrîtî wek **Suweydî** derbas dibû û girêdayî Amedê bû. Li ciyê Ebdal Beg lawê wî **Subhan Beg** rûnişt. Piştî mirina Xalîd Begê Pazûkî, Subhan Beg nehiya Kixê (Keyx) ji destê mirovên Xalid Beg girt. Piştî şerê Çaldiranê jî, nehiya Çepaqçûrê (Bîngol) ji destê Aykûtoxî-lî û Axçeqelê jî ji destê Mansûr Begê Pazûkî yê li ser navê Şah Îsmaîl birêve dibir, stend. Ji dervayê wan nehiyên Zak û Menş Kurd jî ji destê Qadîr Begê Qizilbaş stend.[157-281] Piraniya wan deveran li derûberên Amedê ne. Îro jî dema Sewêdî diaxifin mirov dizane ku devoka Amedê hîna jî taybetmendiya xwe wenda nekiriye û

hîna jî li Qulpê Sewêdî hene. Herdu birayan wîlayet di navbera xwe de parve kirin. Çepaqçûr û ciyên bi wê ve girêdayî para Subhan Beg û kelên wîlayetê yên din jî para Siltan Ehmet Beg re ket. Piştî çend salan, fîtne û fesadî kete navbera birayan, ji aliyê dîwana Siltan Silêman ve fermana kuştina Subhan Beg derket û ew kuştin. Kela Çepaqçûrê jî ji memûrekî Osmanî re hat dayîn. Subhan kurekî navê xwe Mexsûd li pey xwe hişt. Ehmet jî 50 salan fermanrewatiya xwe îdare kir û mir. Du kurên wî hebûn: Mûrad Beg û Mihemmed Beg.(157-282)/(100-302) **Di sala 1516 an de ew bi tevahî mîrîtiya xwe winda kirin û li cem pismamê xwe Kixî cîh girtin.**

Mexsûd Beg piştî kuştina bavê xwe ket maiyeta Siltan Silêman. Bi eskerên Osmaniyan ve li Arpeçaya girêdayî Nehçiwanê bi Qizilbaşan re kete şerekî giran. Di vî şerî de mêrxasiyeke mezin nîşan da û seva wê Siltan Çepakçur da wî. Lê mîrêmîranê Amedê Çerkez Îskender Paşa îdara Çepakçurê ji destê wî girt û da destê memûrekî Osmanî. Li ser zilim û neheqiya Îskender çû Stenbolê, lê heft salan nikarî xwe bigihîne Paşê û li Stenbolê mir. Piştî mirina wî Îskender wîleyeta wî di navbera kurên wî de parve kir. Nehiya Xançûk û Akçeqeleyê da Mihemmed Beg. Cihên din jî bi şerta bê şer û kuştina birayê xwe dan Mûrad Beg. Tenê Çepaqçûr di bin rêvebiriya memûrên Osmaniyan de ma. 16 salan bi wî awayî dom kir. Piştî wê Mûrad Beg bi riza xwe kar û bar da destê kurê xwe Silêman.(157-282)



**Gundê Sewêda Çîmana Biçûk**

Di dema Silêman de, Sewêdiyan gelek caran li hember Sefawiyan şer kirin û mêraniyên mezin nîşandan. Mirnîşîn bi navê Silêmaniyê hate xwendinê. Dibe ku du sedemên wê hebin: Yekemîn; heta sala 1005/1597 an(157-284) Silêman Beg serokê mîrekatiyê bû û dibe ku ji navê wî rêberê hêja girtibin. E. Xemgîn dibêje: Îskender Paşa beşa din ê mîrîtiya Sewêdî jî de bin destên Silêman; di dema wî de aramî û heyî hebû. Li deşta Menş Kurd amadekariya avakirina bajarekî mezin kirin. Dema bi Osmaniyan re diçû şer, herkes heyranê şer û mêraniya wî dima; bi taybetî jî li hember Sefawiyan serkeftinên mezin nîşan dabûn.(100-303) Rêberekî wiha dikare bi hêsanî navê xwe li ser êlê bihêle. Ya din jî; ji neslê Ker Merwanê bûyî Xelîfê Emewiyan (744-750) ê dawî tê. Piştî ew kuştin, kurên wî yek çû Hebeşîstanê yê din Ubeydûllah jî li Filîsîtîne dijî. Ew ji Filîstînê jî hatine Qulpê. Êlên li wê herême li dora wan gîhîştibûn hev, heşt

komên bingehîn in: Banûkî, Hewêdî, Dilxêran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zîkziyan û Berazan in. Hinek ji wan Êzidî bûn hinek jî misilman. Merwanî bi saya êlên Silêmanî hatin ba hev.(157-286) Wekî tê zanîn gelek nûser Sewêdiyan dikin nava Zîlan û wekî li jor jî xuyadike di nava wan de Zîlanî jî hene û Silêmanî di bingeh de wekî konfederasyon xuya dike. Silêmanê ku ew anîne cem hev û konfederasyon ava kiribû dikaribû navê xwe bide ser wê komê bi giştî jî. Îro Hewêdî, Boçî û Zîkziyan û hinek jî Beraz bi navê xwe yên qedîm li Xorasanê ne. Diyare ku yên din jî bela ne û hinek jê di bin navên din de dijîne.

Di dema lawê Silêmên Şah Weled Beg de, mîrîtiya Silêmanî kete bin desthilatdariya Osmaniyan. Komkujiyên ku paşayên Osmanî kiribûn avêtin ser Weled û fermana kuştina wî derxistin. Ew jî reviya Kela Qulpê û li wir mir. Kurê wî Elî 40 salan Qulp îdare kir. Herêmên din ên mîrîtiyê ketin bin destê Osmaniyan. Kurê wî Siltan Huseyn di sala 1573 an de bi pejirandina Siltan Selîmê II an bû xwediyê herêmê.(100-303) Li ser dîroka tê dayîn de, di navbera Şerefxan û Xemgîn de ferq heye. Şerefxan di sala 1597 an de dibêje hîna jî Silêmanî li ser rêvebiriyê ne…Di artêşa Muratê III an ku şandibû Ezerbeycanê de Siltan Huseyn jî hebû û hate kuştin. Di sala 1585 an de lawê xwe Zeynel derbasî cîhê wî bû. Piştre şerê nav birayan dîsa destpêkir û di dawiyê de Bege Beganê Amedê, Qulp û Batman di 1585 an de dane Zeynel. Piştre Seyid Ahmet hate rêvebiriyê; navbera wî begêbeganê Amedê xirav bû û bi ser wê de mîrîtî ji dest girtin û di sala 1595 an de dane birayê wî Zeynel.(100-303) Demeke bi fermana Osmaniyan baca êlên mîna Besyan, Bociyan û Zîlan jî berhev kirin. Di wê demê de di navbera Osmanî û Sefawiyan de hertim şer hebû. Herdû aliyan jî di firsendan de zilim jî li ser gelê Kurd dimeşandin. Ji ber wê gel ji alîkî diçû aliyê din. Baca Osmaniyan ya giran di dawiyê de bû sedama serhildanekê. Bi pêşengiya Şah Siwarê ji Besyan li hember Osmaniyan derketin. Di demeka kin de, bi alîkariya êlên derdorê hêzeka mezin derxistin holê û Osmanî têk birin. Li Bazîda girêdayî Erîvanê, Mîrnîşîna xwe ya serbixwe îlan kirin. Cara din jî Osmanî gerkirin, lê cara sêyemîn hêzeka mezin hat ser wan û Sewêdî belav bûn û komkujî pêkhat. Ji mirina Behlûl şûnde Emîr Xan Beg derbasî cîh bû. Wî jî tola bavê xwe jî êlên dorxwe heynan û gelek kes kuştin. Di dawiyê de jî li Amedê bi dar ve kirin. Omer hat şûna wî. Di wê demê de bac kom nekirin û dewletê mîrnîşîn ji holê rakir.(100-304)

Gor rîwayetan, serdarên Pazûkî ji êla Sewêdî ne, hinek rîwayetan jî ew wek Kurdên Îranê hesibandine. Kîjan rast dibe bila bibe, ew, di dema Tirkmen û Siltanên Qizilbaşan de di bin rêvebiriya hikumetên Kîxî, Ercîş, Adilcewaz, Eleşgirtê de bûne.(157-348) Li jor jî hate diyarkirin, ku Sewêda xaka Pazûkiyan ji dest girtine û tê wê watê ku serdarên Sewêdî koma Pazûkan birêve dibirine, tewerê nûser herdû koman wek hev dibînin bawerim ew divê ji wê bê û piştî demekê jî mumkune ew bûn yek. Dîtineka din jî Sewêdiyan di nava **Mamalûyan** de nîşan dide.

Orhonlû, Mamalûyan wek 16 êlan nîşan dide: Kafîr Kiran, Kizilli,

Sarilar, Qaracali, Alî Beylî, Kirik, Tûrgût, Elhac Alî, Selman Fakili, Nefeslî, Yaqûblû, Qaracali, Beçîlû, Arîfe Gazîlî, Keller.(90-85/86) Ewên girêdayî voyvoda Tokatê ji berê ve li sencaxa Bozok (Yozgat) koçber-nîştecîh bûn. Hinekan êdî cotkarî jî dikirin. Lê baca xwe nedidan. Êla **Şarikli** digotin em Seyidî ne; êlên Kirik û Kizil jî digotin em di nav eskeriyê de ne. Ji ber wê, di sala 1693 (li 1691 fikirî bûn) an de ew rakirin Rakka, keviya çemê Belîhê. Min li jor jî gotibû ku mezinên êla Sewêdî dibêjin em Seyidî ne; eger herdû jî heman êl be, wê demê Sewêdiyan navêkî xwe jî Şarikli derbas dibe. Ew navekî bi tirkî ye û xuyaye ku Osmaniyan lê danî ye û ji bo wê zêde wata xwe nîne. Birêz Hoko jî dibêje: Hinekên ji Suwediya ji Şêrvaniyan (522-704- Aras, Xezar, Mako) veqetîne.(32) Lê belê dîtina cîddî ya ku mirov li ser rawestî ew e; ku nîşandana Sewêdiyan ya di nava Zîlan de ne.

Dr. Fritz dibêje: Sewêdê ji eşîreta (divê federasyon/konfederasyon be) Zilan in û ew êla li sencaxa Bazîdê bicîh bûye û carna jî diçe Erîvanê. Milen wê: Zîlan, Ridkî, Dilçiri, Geltûrî, Berûkî, Sevîdî (100 kes), Dilkî, Pirhalî, Kurdikî, Cemaleddinî û Mamazeydî ne.(8) Seferoglû jî di bin sîwana Botan de nîşan dide û wiha berdewam dike: Yek ji milê kurmancên Dîcle ne. 300-350 sal in wek Bohtî "Zîlan" (deştî) tên binav kirin. Ew di Oxûznama Dede Korkut de ji **Oxûzên "Uç Oklar"** (Bayindir, Beçene, Çavûldûr, Çepnî, Salûr, Eymûr, Ala-Yûntli, Ûrexîr, Yixdir, Bûxdûz, Yîva û Kinik) tên nîşandan. Kurmancî deng dikin. Li Agirî, Bazîd û Eleşgirtê bi cîh bûne. 12 berên xwe hene: Zîlan, Birikî, Delikî, Pirekhalî, **Sevîdî**, Ritkî/Radikan, Geltûrî, Kurdîkî, Cemaldînî, Dilhirî/Dilikan, Mamzidî û Celalî ne. **Peçenek jî milê din ê kurmancên Diclê ne û bi zazakî deng dikin.**(91-63) Li Xorasanê herêmeka bi navê Radikan heye. Mela M. Bazîdî jî heman agahiyan dide.

Di salên 1850-56 an de rewşenbîrê Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: "Ew ji êşîreta Zîlan in, li ser axa Bazîdê dijîn û carna diçin Îran û Rewanê; çend qebîlên wan hene:

| | | |
|---|---|---|
| Zîlî | 300 xane | |
| Ridkî | 200 xane | |
| Kiltûrî | 100 xane | |
| Dilxêrî | 80 | " |
| Birokî | 400 | " |
| Cemaldînî | 300 | " |
| Siwêdî | 100 | " |
| Dilkî | 60 | " |
| Pîre Xalî | 100 | " |
| Mam Zêdî | 60 | " |
| Kurdkî | 150 | ".(177-1) |

Bi dîtina min ew 100 xane Sewêdî yên ku hatine Anatoliya Navîn in. Lewra, di wê serdemê de êla Sêvika ya girêdayî Reşiyan 180 xane û îro jî ew serhejmar û ferqa nabera herdû êlan xwe dipareze. Gor texmîna min Kurdîkî

yên derbas dibin jî Zazayên îro li Aksarayê ne.

Kocadax jî Kurdên li bakûrê Firatê dike du beş:

| Mil | Zil |
|---|---|
| Cibran | Heyderan |
| Hasenan | Ademan |
| Zirkan | Tokariyan |
| Milan | Zilan |
| Qerekeçilî | Celalî |
| Berezan | Sîpkan |
| ------- | BabaKurdî |

Ji bo Zilan jî, ji Şerefnamê vêya dewr dike: Li Bazîdê xuya dikin, lê yek caran jî derbasî Îran û Erîvanê dibin û girêdayî vê êlê: Ridikî, Dilkirî, Geltûrî, Berûkî, **Sevîdî**, Pire Xelîl, Kurdîkî, Cemaldînî, Dîlîkî, Misrikanî, Berhîkanî, Dîlîkanî, Alomehîlî, Hasohalekanî hene. Êlên serbixwe jî îşaret dike, ji wana Hertoşî yên li Haymana û gundên Cihanbeyliyê û navçê bixwe ne; Şêxbizinî jî li aliyê Agiriyê ne dibêje. Yekê jî di derbarê Beritan/Bertî de jî dibêje gorî gelê Bertî bi xwe qal dikin ku 500-600 salan berî vê, ew li Qonyayê bûne û ji ber şerê Qeremanî û Osmaniyan hatine aliyê Rihayê.[17] Êlên ku tene hejmartin hinek di nava Celaliyan de ne. Eger ew îddea rast be, wê demê divê Canbega navekî xwe jî Hertoşî be. Xala herî girîng a em fêr dibin jî ewe, ku zendên mîna Bertiyan di nava Qeremaniyan de bûne. Şiklê wan bi Qeremaniyên Xorasanê ve jî wek hev e.

Di deftera Tahrîr a Meletî ya ji sala 1560 an mayî de, cîhêkî bi navê **Sevîd** wiha derbas dibe: Girêdayê nehiya **Yaylû** Karye-î Sevîd, 25 nefer, 11 xane, 3 çîft, 8 benak, 14 mûcerrede hene.[97-312] Karye navê gunda ya kevn e. Dîsa mezraî Setgûr û Habadanê jî heye ku girêdayî wir xuya dike.[97-323] Ew nîşana Sewêdê ji warê bavê xwe veqetiyane dide, lewra ew ti caran li alî Meletî nehatine dîtin. Xuyaye li wir ew bi Reşiyan re li cem hev bûne; piştre mumkune berbi Bazîdê ve çûbin û ji wir jî hatibin Anadolê. Gor rapora dewlata Tirk a kûr, hatiye bi dest xistin de, beşek ji êla Suweydî û Sevkarî di bin sîwana Siyakaran de xuya dikin. Gor wê: Suweydî 400 kes in, zazakî dipeyivin û şafiî ne. Li Solhanê û çend gundên wê navçê dijîn.[108-79] Sêvkarî êlêka girêdayî Reşiyan e. Li Sewêdiyên kirmanckî axêf jî em rast nehatin.

Wekî di beşên derbasbûyî de jî min nivîsî, Osmaniyan ji bo cîhên vala û wêran şên bibin, êlên Kurd di bin kontrolê kin, bac û eskeran ji wan bigirin, êlên koçber bi cîh dikir. Ew êlên xwedî potansiyel ên mîna Tirkmenên Yenî-Îlê girêdayî Atîk Walîde Siltanê li Uskudarê (ji bo wê navê Tirkmenên Uskudar yan jî Uskudar Ewî li wan dikirin) li herêma Kangalê (Yellûce, Mancilik, Alacahan) dijîn. Di heman herême de, Tirkmenên Helebê (li Yenî îl bi navê Yaban –erî dihatin nasîn) û diçûn zozanên Sêwasê û bi Dulqadiriyan ve Yenî Îl pêk dianîn. Ew zivistanan jî diçûn Antaqya û Şamê.[156-25] Mezinên Sewêdî

dibêjin em girêdayî Walîdê Siltan in, li ser navê wê mizgeft avakirine û ji bo wê jî bacê nedidan û bi vî navî jî têne xwendin. Li dora Kilîsê jî êlên Îzzeddînlî dijîn ku ew jî girêdayî Walîde Siltan Hassiyan bûn. Dîsa Reşî jî li wir bûn ku li Meletî havîn derbas dikirin û zivistanan jî diçûn Sûriyê. Lekvanîk jî li Çorûmê bûn.(156-27) Îzzeddînî jî Oxçî ne.

C. Turkay dibêje: Suweydî Ekradi li Aksaray, Amed, Kilîs, Xinis, Qeyserî, Kîxiyê dijîn û ji taîfa Yorukani Ekrad in.(160-689) Ji bilî wan deran Sewêdî û Cemaldîne li dora bajarê Qulp, Riha, Xarpût, Mûş, Xelat, Erciş; hinek li dora Rewan-Erîwan, Kirgizîstan, Ozbekîstan, li rojavayê Kurdistan û Qonyayê dijîn.

Gundên Sewêdan îro li navenda Anadolê girêdayî navça Cîhanbegliyê ev in: Qendîl, Yayla Mewlîd, Bêşkavaka Mezin û Bêşkavaka Biçûk, Yayla Çolê, Çîman, Yayla Kîrligê-Eyşikê, Qonax in. Ji wan Qendîlê li destpêka koçê hatine bi cîh bûne; gundên din jî 180 sal berî niha ji Aksarayê hatine. Li Aksarayê jî çar gundên Sewêdî hene ku ew: Qullero (Gokkaya), Çawdarli, Seydo Jêr, Seydo Jor in. Ji B. Biçûk Seyidê Tefiqî Hecî Îbrem (63 salî) di sala 1997 de digot: Li Gundê Çawdarli li cem Qere Şamaz secera Sewêdan ji postê karxezalayê he-



**Kalên Sewêdî**

Di wir de dinivîse ku em ji Elî Pinara Amedê hatine Xarpûtê, ji wir jî hatine Sari Çîçek Yaylasiyê. Ji ber ku fîlîkê bizinan yê ji ber bacê dane dewletê ji wan re gotine "Qilveren-Qilorî". Cara siftê dema hatine navenda Anadolê jî li cîhê xwe niha bi cîh bûne, lê berî wan êlêka bi navî Mihînayê lê dijiye. Ew bi Osmaniyan gilî dikin û bertîlê didin fermandarê mufrizê û ew jî Mihînan ji wir radike.

Di Şerefnamê de ji bo ola Pazûkiyan tê gotin; ku prensîbên perwerdê

ku Pazûkî, Çemîşgezekî û Xinislû dimeşînin ne gor Îslamiyetê ye, bi misilman navkirina wan jî ne raste.(157-352) Eger mirov dîroka Sewêdiyan di ber çavan re derbas bike, tê dîtin ku ew Zerdeştî ne. Li Xorasanê misilmantî pejirandin û beşekî di dema Ebbasiyan de jî bi vî awî derbaskirin, lê ketina wan a nav Şemsiyan û Pazûkiyan divê ew vegerandibin ser ola wan ê kevn. Eger bi tevahî nehatibin jî, ez bawerim ew bi dizîka ola xwe ya kevn dişopandin. Di nav êlên li Anatoliya Navîn de, taybetmendiyeka Sewêda jî ji rengê sor hêzkirina wan a. Êlên der û dorê wê yekê didin ber pozî wan. Lê ew rengê sor jî îşareta wê yekê ku çawa ew ji Xorasanê hatine, piştî hezaran salan jî ew kevnoşopiya dom kiriye. Lewra hîna jî di rojên cejn û şahiyan de Xorasanî şalên sor li xwe dikin. Wekî din jî edetên li êlên din ên navenda Anadolê têne ditin, li cem Sewêdiyan



**Qendîl**

Di alî kincan de ti cûdahî di navbera Sewêdî û êlên din ên Anadolê de nîne. Lê ji alî devokê ve hinek cûdahî xuya dikin. Wek mînak:

| Sewêdî | Reşî | Kurdî |
|---|---|---|
| Çitorî? | Çirdikî? | Çewayî? |
| Aka | weng | wiha |
| Zari | kurik | zarok |
| Xûra | xera | xwe |

## AVŞAR
## (Qereman-Sine Milî-Terikî-Celikî )

Berê jî min anî ziman, ku Avşar konfederasyoneka Kurd e; lê dîroknûsên Tirk ew jî wek Tirk û hîmê Tirkan nîşan didin. Ew milekî ji Kurdên navend li Xorasanê yê girîng in. Bi hatina Tirkan ya berbi rojava û tevgera qewman re ew jî ji cîhê xwe veqetîn. Li Asya Navîn an jî li dora gola Aralê dijîn û wek Saka dihatin bi navkirin. Bi tevgera Tirkan re Kurdên li wê herêmê bûn du beş: Şaxek ji wan hate başûrê Kurdistanê ku di nava wan de Avşar hebûn. Yên din jî di bakûr û başûrê Derya Kesk re hatin Kurdistan û Anadolê. Seferoglû dibêje: Yek ji 24 zendên Oxûzan e. Ji sedsala XVI an vir ve hatine Anadolê. Heta sedsala XIX an koçer bûn; paşê li Pinarbaşi, Sariz û Tomarza

girê



**Li milê çepê - Mehmet Avşar ji Deşta Amîk**

Birêz M. Bayrak jî dibêje: Beşek ji Avşaran bi rêya Xorasan-Xuzîstanê hatin Anadolê…Avşar dibin du beş: yek, zendekî Oxûzan e û êlêka Tirkmenên ku di dema Selçûqiyan de hatine Anadolê û nîştecîh in. Yên din: Avşarên koçer in ku ji di dema 1865 an wir de bi tevgerên Derwêş û Ahmet Cevdet Paşa (Firka-î Islahiye) tên xwestin ku bi cîh bibin. Ji wan re Avşarên **Receplî** tê gotin. Îro ew li Qeyserî-Pinarbaşi, Sariz, Tomarza û li sê gundan bi cîh bûne. Berî nîştecîh bûnê (1865) ew di navbera Ûzûnyayla û Ava Sariz, Pinarbaşi û Zamantiyê de nêzîkî 300 salan koçer jiyane. Zivistanan jî diçûne Kozan-Mîsîsê.(175-47) F. Sumer jî di heman fikrê de ye: Avşarên li bakûrê Sûriyê ji alî sê malbatan ve dihatin birêvebirin: Kopek Oxûllari, Gunduz û Kut-Begî Oxûlari bûn.(131-275) Di sala 1580 an de serokên Avşaran Receb, Bahrî û K. Minnet hebûn; di sedsala XVII an de Avşar bi navê Recep Oxûllari jî dihatin nasîn.(131-282) Kutbegî bala me dikişîne, lewra li Anatoliya Navîn gundekî bi tenê bi navê Kutiga heye. Xelkê wî gundî, ji bilî malbatên piştre tevlî bûne, di esas de ji Avşaran in. F. Sumer wan di nava Milan de jî nîşan dide; lê îhtîmaleke pir mezine, ku Milan jî di nava zendên Avşar de ne.

Di nav koma Avşar de kîjan êl hene em baş nizanin, bi qasî em texmîn dikin; Celikî, Qereman, Milan û dibe ku Têrikî jî carna ketibin navê. Ji bo ku Avşaran di dîroka Sefawiyan de roleke girîng lîstinê û li her cihê Îranê

belav bûne, gelek êlên din jî di navê de hebin. Ew hewceyê lêkolînên zêde ye û ronîkirina vê yekê dikare gelek xalên din jî ronî bike. Wek mînak: Sumer dibêje: Avşarên Eberlû li Qazwînê dijîn, sala (1628) Şah Safî helkişt ser text û wê demê berpirsiyarê Abiverd Cemşîd Siltan ji Eberlûyan bû; hinek milên wan li Halhal û Tarûmê dijîn.(131-296) Ew êlên ku tên qal kirin min serlêda; dibêjin em Reşî ne, heta gundekî bi navê Reşî jî heye. Lê di nava axaftinên wan de derdiket holê, ku ew girêdayî konfederasyona Reşî û ji êla Emarlû ne. Yên li Xalxalê dijîn jî Celikî ne. Di beşa Xorasanê de min hinek qal kiribû. Ew êlêna ji binemalên Dulqadiriyan in, ku piştre çûne Îranê. Nadîr Şah ji Avşarê Kirklû ya ji Abiverdê bû; lê di sedsala XVI an de ew oba di nava Avşaran de nayê dîtin û li Bozokê tê dîtin.(131-298) Ew êlên ku ji Bozokê çûbûn bi tevahî Kurd in. Di dema Selçûqiyan de ew şaxa ji Xorasanê çûbûn dora Loristanê, ji wir hatin başûrê Anadolê mîrîtiya Dulqadir damezirandin û ji vir jî dîsa çûn dora Reşt-Gîlanê. Piştî gelek şer û nakokiyan, bi taybet jî êrîşên rêvebirên Safewî û nakokiyên di nava êlan de, xuyaye ewe vegeriyana Sêwasê. Ji vê jêderê û ji gelekên din jî tê fêhm kirin ku Nadîr Şah bi eslê xwe Kurd e.

Wekî hemû êl û zendên din ên hatine Kurdistan û Anadolê, Avşar jî gelek caran parçe bûne; sedema wê êrîş û komkujiyên Osmanî û Sefawiyan bûn. Hinek Avşar di nava Boz Ûlûsan de hatibûn Anadola Navîn û bi piranî li eyaleta Qeremanê war girtibûn. Di dawiya sedsala XVII an de ew bi zorê koçê Rakkayê kirin, xanewanên wan piştre yek bi yek hatin rojavayê Anadolê. Di sala 1716 an de li Balikesîr-Mihalîçê hatin dîtin.(131-284) Ewên ku tên qal kirin ji komên mîna Têrikî, Zerikî û Lekan yek e; lê em tam nikarin tespît bikin kîjan e. Beydilê girêdayî Îmanlû Avşari diçûn "beriyê", hinek diçûn Lazkiyê û hinek jî li alî Amedê bûn. Gelek jî jê çûn Îranê û gelek jî jê hatin Bala û Haymana-Sivrî Hisarê. Heta êrîşa Firkaî Islahiye êlêka pir xûrt û maxrûr bû. Piştî hatina wan a ji Rakkayê jî, ew dest bi talanê kirin û ji wê bo di sala 1742 an de biryar hat dayîn, ku pêşengên wan bên îdam kirin. Dadaloglûyê bi nav û deng ji wê êlê ye. Di sala 1865 an de ew li zozanên xwe hatin bicîh kirin.(131-284) Ew Îmanlû Avşari îhtîmelaka pir mezine ku Terikî ne.

Osmaniyan dema amadekariya perçiqandina êlên Avşar û Oxçû yên li Çiyayê Kurmenc (1865) kirin. Çûyîn û hatina êlan jî qedexe dikir; ji bo ku Avşar neçin cîhê zozanan, ji Kafqasya Çerkez anîn bi cîh kirin. Halaçoglû jî wê bûyerê dipejirîne: Îsal Firka-î Islahiye çûyîna zozanên Ûzûnyayla qedexê kir. Êla Avşar ji Çûkûrova diçû Ûzûnyayla yê. Lê ji ber ku Çerkez li cîhê zozanên wan hatibûn bi cîh kirin, ew jî nedikarîn herin. Ji ber wê yekê Hecî Beg, êla xwe li dora Sarizê xwest bi cîh bike.(83-147) Hîna jî ew Kurdana li Sarizê dijîn.

Êla herî bi xeter Afşar bûn. Di salên 1846 an de 1200 xane û nêzîkî 6 hezar serhejmara wan habû. 800-900 xane li Çûkûrova, 200-300 xane li Zamanti-Qeyseriyê diçûn germiyan. Ji bo zozanan jî diçûn Ûzûnyaylayê. Serokatiya beşekî Çerkez Beg, ya din Îsmaîl Beg, ya sêyemîn jî Qere Begê Topûz dikir. Di salên 1840 û 1850 an de ew di nava serhildanê de bûn. Osman Paşayê Mereşê

û meriyen wî yên ku ji bo bacê çûbûn ji alî Afşaran ve hatine kuştin.(171-235)

M. Bayrak dibêje: Bavê min gelek caran ji gerokên Almanî yên dihatin li herêma me digeriyan bi kêf qal dikir. Heyet, di destpêka sedsala XIX an de hatiye gundê cîranê me Kirkisrak û bi Momikê Kose re li ser Elewîtî û şirova wî yê nû axifî ne. Gor kesên di komê de: "Kurdên li wir dijîn ji alî jiyan, ji alî dîtina wan ê li ser mirovahiyê, ji Ewrûpiyan 100 caran pêşvetir in" gotibûn. Kesayetiya di nav vê komê de yek jî Hugo Grothe bû ku di sala 1906-07 an de "Gera Mina Asya Pêşîn" de nivîsî. Li hemû gundên ku Avşarên Qizilbaşên li çiyayên Torosan de bi Kurmancî tê dengkirin. Qizilbaş li Anadolê li gelek deveran belav bûne. Li herêma çiyayî ya Pontûs, Plato Ermenî, Dêrsîm, li çavkaniya Firat, Qizilirmak, Afyonqerehîsar-deşta Dolaçay, deşta Mereşê dijîn. Ew qizilbaş in, dema Dede tê gund cem çêdibin û di kesayetiya Elî de



**Cil û bergên Avşaran ên berê** (Birnebûn -II-rp 32)

Wekî birêz Bayrak jî dibêje, girêdana bi ola Kurdan ya kevn re di nava wan Kurdana de heta sedsala dawî jî bi hêz bû. Heta wan salan ew girêdayî Ocaxa Sersortiyê bûn û li hember rojê diayên xwe dikirin. Di roja îro de êdî ew Ocaxên pîroz nemane; di cîhê wan de Elewîtiya nêzîkî Sersoriyê hîna jî dom dike.

Ji alî hest, civakî, ziman, kevneşopî, olî û kincan de ti ferq di navbera

Avşaran, Reşî, Canbeg û Şêxbizinên navenda Anadolê de nîne.

## MIRDÊS-TÊRIKÎ

Mezinên Reşiyan ji bo wata "Mirdês" dibêjin: tê wata kesên serok-rêber, kevirên bîran, bedew û gerden bilind...Di nava van wateyan de jî bi taybetî ji bo ciwanî/fodiliyê bi kar tê. Ji bo ku xweşikbûn, fodilî û bedewiya yekê/î bidin xuya kirin, dibêjine: **"Pir Mirdêsî ye!"** yanê gelek ciwan e, wek xezalan e...Dîroknûsê Iranî Firdewsî jî dibêje: demeke camêrek hebû, him padîşah bû him jî xwedî rindi bû, di alî edalet û efûkirinê de dereca wî bilind bû ku navê xwe Merdes bû.(86-46) Eger mirov tenê li ser peyva Mirdês rawestê, Mir-mirin e, dê jî dayik e, sî jî sî ye; dibe ku bê wata kesên di siya diya xwe de mirî ye. Yan jî ji bo diya xwe mirî ye...Di dîroka wan de bi wê yekê re tekîldar bûyerek jî heye ku emê paşê qal bikin. Şerefname jî dibêje: Mirdêsî li keleha Egilê û bajêr rûdinên, ji ber ko navê serokê Benîkilaban (kurê Kilaban), Mirdas e, kurê Îdrîsê kurê Nusayre kurê Nasrê kurê Cemîl, "Mirdasî" hatiye gotin.(157-212) Ew jî îhtîmalel



**Mile Memedî Silêmen- Mirdêsî**

Li navenda Anadolê di demên berê de, navê Mirdês bi yê Têrikî ve di heman watê de bi kar dihat. Îro mumkune ku ew zedê nayê zanîn, lê wiha bû. Ew çawa pêk tê? Mirdês zend yan jî konfederasyon e, Têrik jî êlêka girêdayî wê yê? Yan jî du beşên zendekî ne? C. Turkay dibêje: Cemeeta Têrikan-Tilkan-

Tirekanli-Tinkanlû ji êla Mirdêsî ye.[(160-712)] Êlêka bi navê Tîtkanlû li Xorasanê jî heye û dibe ku beşekî Têrikan bin. Îddeayaka din ê ji bo navê Têrikî jî dibêjin: dema koçberiyê ew zarokên xwe ji ber baranê dikirine têran ji bo wê ew nava lê danîne.

Ji alî din ve, dibe ku têkiliya navê Badilî bi Mirdêsî û Têrikî re jî hebe; lewra gelek caran ew navana di heman watê de bikar tên û li kelêka hev tên dîtin. Ji bo ku navê êl û zendên Kurd gelek caran hatine guhartin, dibe ku ew jî yek ji wan be. Doç. Eroz dibêje: Têrikî girêdayî Bexdilî yên Oxûz in.[(99-38)] Bi dîtina min, Badilî navê bala-bilind e; yan jî mirov dikare wek konfederasyonekê jî bibîne. Yên din jî girêdayî vê rêxistinê ne.

Berê jî min nivisî bû, ku di dema Emewî û Ebbasiyan de, yek ji zendên Kurdên ku ji Mazenderan, Xorasan û Arranê anîbûn nava Anadolê bi cîh kiribûn Badilî bûn. Li ser vî navî em ti mîrîtiyan nabînin, lê li ser navê Mirdêsiyan di salên 750 an de li Egil, Palo û Çêrmûkê mîrîtî hene. Em dikarin bi rihêtî bibêjin ku navê yekemîn Badilî ye û piştre Mirdêsî tê, ji wî jî Têrikî veqetiye. Bê guman hin komên bi navê Badilî jî hene.

Di "Dîroka Amedê" de tê gotin; ku Mîrê Mirdêsiyan yê yekemîn, bi navê Pir Mansûr bîn Seyyîd Huseyn el-A'rac tê nasîn. Turba wî pênc km li rojhilatê Pîranê (Dîcle) li gundê Deran (Hocaalan) e. Li kîtaba li ser derî de: "Haza mescîd-î Mansûr bîn... 1611" dinivîse.[(138-659)] E. Xemgîn jî dibêje: Rîwayet dikin, ku ji koka apê Hz. Muhammed Ebbas tê ne. Begê yekemîn Seyid Huseyn El Arac e, ku berê li dora Çolamêrgê dijî; paşê hate dora Egilê û li gundê Pîranê bi cîh bû. Dergah ava kir û êla Mirdêsî û yên din li dora wî kom bûn.[(101-183)] Ti têkiliya Mirdêsiyan bi Ebbas re nîne.

Gelek dîrokzan dibêjin: Merdaiyan, dibe ku navê Mirdêsiyan ji wir derketiye, milekî jî Şemsiyan e ku cîhê wan ji Hema heya Şebîn Qerehîsarê dirêj dibe û bineciyên Meletî û Dêrsîmê yên kevn in. Heya dema Osmaniyan jî ew li dora Hema, Humus, Heleb, Ezaziye (Elezîz), Kilîs, Riha, Dîlok, Semsat, Meletî, Xarpût, Dêrsîm û dorên wan deran jiyane. **Germiyaniyên ku çûbûn Kutahya jî ji wan bûn**. Dîrokzanê Yûnanî Stepan Asolîk di sala 1021 an de dibêje: "Ji Dêrsîmê heya çiyayên Amanos hozên bi navê Şemsiyan dijîn û ew roj-perest bûn." Kurdên Êzdî ne. Hîn di dema Emewî û Ebbasiyan de li wir jiyane. Ji wan Kurdan tîren bi navê: **Mirdêsî**, Dasînî, Yesyaniye, Besnaniye, Mûsan, Şerqiyan, **Germiyan** û yên din hene. Ji bo Germiyanan gelek dîrokzan dibêjin ew Zerdeştî ne. Mîrîtiyên Elezîz û Kilîsê jî ji Kurdên Êzdî bûn û ji wan re Şemsî digotin. Di vir de pêwîste em binivîsînin ku hinekên bi navê Kuleybiyan ên ji Iraqê hatine, di nava Mirdêsiyan de bi cîh bûne û ji bo vê jî dîrokzanên Ereb ji bo hemûyan gotine ew Ereb in. Lê ew yeka ne raste. Di derdora sala 1011 an de Ereb hatine aliyê Helebê û bi serokê Mirdêsiyan kurê Mirdas Salih re hevkariyê kirine. Hebûna Mirdêsiyan ya li vê heremê gelek kevne. Di heman demê de tîreka Mirdêsiyan li Egil, Palû û Xarpûtê dijî.[(32)] Li ser parçebûna Mirdêsiyan Mînorskî dibêje: Îddea dikin ku di sala 1029 an de ji

Helebê hatine.[2-102] Wekî tê xuyakirin Heleb yek ji navenda Mirdêsiyan e.

Di beşa Beraniyan de jî min gotibû, Hoko li ser dîroka wan xaleka balkeş û hinek jî bi nakokî ragihandibû: Ev Kurdên bi navê Mirdêsî di serê sala 900 an de, gava êla mezin a bi navê Mehmûdî ji dora Mûsil û Şehrîzor hatine dûrxistin ew jî di nav de bûne.[32] Gelo ew hatin bakûrê Kurdistanê bi şûnde vegerîn, yan jî ji bo zivistanê diçûn Mûsilê? Ew dema hewceye ku were zelal kirin. Ji welat derketinê şunde, li pêş navê "Pîr" tên xwendin. Ew jî tê wê watê ku ew ola xwe vedişartine…Ji Hekkariyê dema hatine rojava, ji xwe re Pîran, Xarpût û zozanên wir kirin war. Ew êl û zendên hatibûn ev in: Aşmîşarat, **Bala Beranî**, Bergîlî, **Delîkan**, Babikî, Siwedanî, Birkanî, Mişkanî, **Şikakî**, **Reşwanî**, **Rêşwanî**, Lewabî, Keşahî, Lewanî, Cemanî, Mihrîkanîkî, Wexşanî, Pismanî, Pûnyanî, Cezîranî, Mîranî, Bikanî, Dodanî, Dumkanî, **Sêvkanî**, Yûsûfanî, Sadkanî, Mêrkanî.[32] Ez vê encamê jî derdixim ku wê demê ew êl û zend di bin sîwana Mehmûdiyan de kom bûne û ew serkeşiyê dikirine. Piraniya wan êlana piştre dê dewleta Şadî ava bikin û îro jî neviyên wan li navenda Anadolê ne.

Di wê demê de, yanî di salên 885-991 an de li Helebê hukumdariya Hamdan Oxûllari heye. Hukumdar jî Ebûl-Mealî Şerîf bû ku ji wî re Sa'dûddewle digotin. Ew li Musûl, Heleb û Amedê hukumdarî ajotin û Ereb in.[13-74] Di Erebbûyîna wan de gumanên min hene; lewra bûyereka balkêş ew îddeayên min piştrast dikin: Emîrê Merwaniyan Ebu Alî, qasidan dişîne Helebê û keça wî dixwaze. Dema bûk were di navbera bûkê û jinekê de diyalogeka balkêş derbas dibe, jinik ji bûkê re dibêje: " Behna xwe teng neke, tu dibî xwediya welatê bav û kalên xwe; tu dibî melîka Amedê, êdî girîngiyê mede tiştên din…[13-87] Li ser wî bingehî û îşaretên din ên zanyarî gihîştim vê baweriyê, ku Mirdêsî du şax in: Yek şaxê Amedê, yek jî yê Helebê. Wekî nivîskar jî radigihîne yên herdû cografya girtine jî divê kalên Mirdêsiyan bin. Berê, gelê Farqînê ava bîran vedixwar; Seyfûddewle cara yekemîn kanal çêkirin. Seyf, ji Hamdanan bû û serokê şaxê Helebê bû. Navê xwe yê eslî Elî ye û di sala 916 an de hatiye dinyayê. Di 935 an de dora Amedê heyna. Di sala 937 an de li nêzîkê Xarpûtê Bîzans têk birin. Piştî wê Heleb, Humus û Şam jî heyna. Di sala 967 an de li Helebê mir, lê laşê wî li Farqînê hate weşartin.[13-157] Bi dîtina min ew Mirdês in ku li jor jî Mînorskî digot ew ji Helebê hatine.

Şerefxan dibêje: Mirdêsî berê li dora Helebê, di bin desthilatdariya Îsmaîliyên Misrê de dijîn. Piştre di navbera wan û Misriyan de dubendî derket, ji ber wê hîmê dewleta wan hejiya, ketin rewşeka perîşan û belawela bûn. Piştre Salîhê kurê Mirdasê kurê Îdrîs, ji vê dubendiyê îstîfade kir, êrîş bir ser vê keleha han û xwest wê ji xwe re bike navend. Xelîfê Misrê esker şandin. Salîhê kurê Mirdas hate girtin û di sala 1029 an de ew bi kurê xwe ve hatin kuştin. Li ser vê, malbat û êlên wî, welatê xwe terk kirin û hatin aliyê Egilê bi cîh bûn.[157-212] Prof. Unal li ser mîritiya Mirdêsî ya li Helebê wiha radigihîne: Tekoşîna misilman û Bîzansan ji 200 salan zêdetir ajot. Lê destpêka sedsala X an Bîzansî ji parastinê derbasî êrîşê bûn. Bi ser wê de Anadol kete bin destê Bîzans. Bi wê

nema, dest bi dagirkirina Sûriyê jî kirin. Li rojhilatê başûrê Anadolê mîrîtiyên mîna Merwanî (Amed), **Mirdêsî (Heleb)** û Numayr Oxûllari (Harran) jî bac dane Bîzans û bi wî awî xwe dane jiyîn.(118-10) Avcioglû jî dibêje: Mirdasiyan di 1051 an de xugî didine Bîzansan; di sala 1056 an de xwe girêdayî Misrê dikin. Mirdêsiyên Helebê li dijî Bizans û Selçûqiyan jî şer dikin û di wî şerî de, ji der dorên xwe jî alikariyê distînin. Lê di sala 1070 an de neçar man ku xutba sunniyan bixwînin. Ji dîtinên Prof û yên Şerefxan jî diyare, ku Mirdêsî ji zû ve li Helebê ne. Îhtîmaleka pir mezine ku ew jî di nava Kurdên ji bo tola Eba Muslîm Xorasanî hatibûn de bûn. Piştî têkçûnê, ew belav bûn û Mirdêsiyan xwe li dora Helebê bi rêxistin kirin. Lewra berî dagirkirina Tirkan, ew li Helebê ne. Piştre ew ji vir diçin dora Amedê. Xala din a girîng jî îşareta ol guhartinê ye. Ew di sala 1070 an de xutba sunniyan xwendine, ku tê vê watê ew berî vê li ser ola xwe ya kevn bûne. Ew mantiqiye, lewra dema ji Xorasanê hatin hîna jî Sersor bûn, piştî mirina Eba M. Xorasanî jî divê demekê ew dom kiribin. Mateosê Riha dibêje ji sedsala IX an şunda, sunnîtî li herêmê bi pêş ket.

Di sala 1070 an de wezîrê Fatimiyan, Selçûqî teşwîk kirin ku Misrê heynin, bi ser vê Alparslan di riya Amedê re çû ser Sûriyê. Hukumdarê Helebê Mehmûdê kurê **Mirdas** Qadiyê Helebê şand ku bila pêşwaziya wî bike. Dema ji Firatê derbas bû, Erebên jîr ji Siltan re ew gotinana gotin: "Bi Xwedê şikir ke, cara yekemîne ku Hukumdarekî Tirk ji wî rûbarî derbas dike." **Mirdas kincên Oxûzan li xwe kirin** û hat cem Alparslan.(131-124) Wekî Sumer jî îşaret pê dike, ew hîn jî kincên Oxûzan-Kurdan li xwe dikirine. Ew jî îspateke din e, ku Kurdên îro li dervayê welat in ji alî dîroknûsên Tirk ve wek Oxûzan hatine binavkirin. Di **sala 1080** an de bi yarmetiya Melikşah, Muslîm dawî li deshiladariya Mirdasiyan anî. Di wan salan de li gorî Mateosê Riha yê, di "Namê Bûyeran" de nivîsandî, bi êrîşên Tirkmenan herêm di anarşiyê de ma ye û birçîbûnê destpêkiriye. Bi hezaran mirov ji wir reviyan…

Ji mirina Pîr Huseynê Mirdêsî şunde, şûna wî kurê xwe yê bi navê Pîr Mansûr rûdinê (950-1021). Ev serok di dema Merwaniyan de jiya û alikariya serok Bad ê ji Kurdên Hemîdiyê kir. Wek tê zanîn serok Bad bi destê Erebên bi navê Hemdaniyan ên bajarê Mûsilê hate kuştin. Paşê Kurdên Helebê dawî dan desthilatdariya Hemdaniyan. Di sala 1021 an de serok Pîr Mensûr mir; şûna vî kurê wî yê bi navê Pîr Mûsa bû serokê Palo, Çunguş, Çêrmûk, Osmaniye. Di dema Pîr Bedîr (1077) de Nisêbîn û Mêrdîn jî heynan. Di sala 1092 an de jî hemû Amîd, Farqîn, Heskîf, Xabûr kete dest. Paşê gelek êrîşên Selçûqiyan li ser welat çêdibin, Kurd aştiyê dixwazin, lê bi ser nakevin. Di dawiyê de birvar digrin ku mirina bi ser bilindî ji jiyana çav berjêrî baştire. Di **sala 1108** an de êrîşên Artûqiyan dawî li serokên Mirdasiyan tînin. Mirdas bûn sê beş: Egil, Palo û Çêrmûk.

**1. Egil-Bûldûkanî:** Pîr Mansûr berê li Çolemêrgê rûdinişt û paşê li Pîranê bi cîh bû. Şûna wî ji Pîr Mûsa rûnişt û di dema wî de Egil heynan. Şûna wî jî Pîr Bedîr hat. Piştre welatê wan dikeve bin destên Selçûqiyan û Pîr Bedir

direve cem Begê Meya Farqînê Emîr Husamettîn. Di êrîşa Alp Arslan de herdû jî şehîd ketin û tenê jina wî ya bi ducanan ma. Ji bo ku Selçûqî fêhm nekin, di nava hev de parolekê çêdikin, dema lawik tê jiyane bi tirkî dibêjin " Ewê ku em lê digerîn me dît-**Bûldûk!**" Bi ser wê de navê vê êlê wek Bûldûkanî jî derbas dibe. Dema Bûldûk mir bi dorê Emîr Îbrahîm û Muhammed derbasî cîhe wî bûn. Ji Muhammed: Emîr Îsa (Egil), Tîmûrtaş (Kela Baxin û Palo) û Huseyn (Kela Berdenc û Çêrmûk) bûn. Neviyê Îsa, Qasim Beg di dema Pezgewran de bû mamostê zarokên rêvebirên wan û ji bo wê ji re digotin "Lala Qasim". Şah Îsmaîl di sala 1507 an de Amed heyna, lê Lala stû jê re xwarnekir û xwe avêt paş Siltan Selîmê Osmanî. Piştî heft salan dîsa bû xwediyê welatê xwe.(138-486) Ji ber wê Şah, Xan M. Ûstaclû şand ser Egilê û ew der girt. Heft salan bi zilm ew birêve birin. Niha sala 1005 (-1587?) ê koçiyê, Cehfer Beg kar û barê Egilê dimeşîne.(157-217) Ango heta **sala 1587 an** ew mîrîtî dijî.

**2. Palo:** Eslê wan digihîje Emîr Teymûrtaş.

**3. Çêrmûk:** Emîr Muhammed, kela Baxinê da kurê xwe Emîr Teymûrtaş û kela Berdencê jî da Emîr Huseyn. Huseyn, ew kela parast. Cîhê wî Emîr Seyfeddîn hat, piştî sê nifşan jî Mihemmed beg hat ser text û Çêrmûk ji destê Qizilbaşan rizgar kir.(157-224)

Li jor jî hate nivîsîn ku têkiliya Pezgewran bi Mirdêsiyan re baş bûye; di bingeh de ew taktîka mîr, paşa û şahên dagirkeran e. Dema dewleta xwe lewaz û Kurd jî bi hêz dîtine ji wan keçik dikirîne û bi vê riyê ji Kurdan îstîfade dikirine. Piştre jî bîra Kurdan dikolane. Ew yeka ji alî John Woods ve jî hema hema tê gotin: Hesenê Direj, bi keça Bûldûkanî Dewletşah re di ber salên 1442 an de zewicî bû.(114-156) Ji wê jinikê lawikekî bi navê Ûxûrlû Muhammed bû.(114-160) Siyaseta Hesen li herêmên Kurdên li Armeniyê û Amedê; di 10 salên pêşiya desthilatdariya xwe de, ji dagirkirinê pirtir, lihevhatin bû. Bi mîrîtiyên Kurdên otonom re tim di têkiliyê de bû. Herî zedê jî bi Malkişan re. Lê dîsa jî zewaca bi Bûldûkanî û Zerikiyan re kirî jî, aştiyeka mayînde û îstîkrar nanî. Wek mînak lawê Dewletşah Îsa, peymana bavê xwe û Hesen bin pê kir û di sala 1457 an de tevlî reqîbê Hesen, Cîhangîr bû.(114-169) Di wan salan de xuya dike, ku Kurdên Mirdêsî bi Memlûkan ve di nava hevkariyê de ne. Lewra, di sala 1433 an de Baybarsê Memlûk çû ser Amedê, bi Qere Osman re ji gelek heftan bi şûnde peymanek çêkirin ku di wir de şert yek jî ew e: " Sozê dide ku careka din êrîşî ne xaka Memlûk, ne Heskîf û ne jî Begliga **Egil ê Kurd** neke.(114-94) Ew hevkarî li hember firehbûna Osmaniyan û Beraniyan e. Mirdêsî li destpêkê ne di nava Beraniyan de ne. Lê ji neçarî tevlî Pezgewran dibin.

Di sala 1459 an de Palû kete destê Pezgewran. Barbaro, di sala 1475 an de Palû ziyaret kir û dibêje: "Ji kelaye ka bilind û 300 malan pêk tê". Pezgewr hilweşiyan bi şûnde Palû kete destê Kurdên Bûldûkanî yên Egilê. Ew ji koçberên diçûn zozanên Ermenîstanê bertîl distendin.(114-106)

Berî şerê Çaldiranê (1514) Selîm, ji Îdrisê Bedlîsî re xeber şand ku ew amadekariyan bike û artêşê bigihîne hevdû. Îdrîs jî Mehmet Xanê ku li Amadê

rêvebiriya Sefawiyan dikir qewitand û li gelek cîhên din jî di şer de bi serket. Di vê navberê de ji êla Mirdêsî Cemşîd Beg, Palû ji destê waliyê Îran Bahdî Beydan girt. Bi vî awî begên Kurd waliyên Safewî avêtin û herêm bi piştgiriya Osmaniyan kirin bin destên xwe.(19-79) Ji wan bûyeran mirov vê encamê derdixe ku Mirdêsî wê demê misilman in û dest ji ola xwe ya kevn berdane.


Di şerê Osmanî û Sefawiyan de (1516) rêzên leşkerên Kurd gelek balkeş in: Di milê çepê yê artêşa Osmaniyan de, du komên Kurd hebûn: Emîrê Heskîfê Siltan Xelîl Eyyûbî, Sason-Mehmed Beg, **Egil-Qasim Beg**, Bekir Begê Bohtî, Mehmed Begê Zerikî, **Şah Elî Mirdêsî Beg**, Nasir Begê Silêmanî (Sewêdî), Bedlîs- Şeref Beg, Hîzan-Dawit Beg, Çemîşgezek-Emîr Pîr Huseyn Beg e. Di milê rastê yê Sefawiyan de jî: Riha-Dûrmûş Beg, Bîrecûk-Welî Xanê Pezgewr, Xarpût-Sarû Beg, Bexda-Kangiril Siltan û Hemedan-Çûka Siltan û Kelhûr-Yegan Beg bûn. Di wî şerî de Kurdan, bi taybet jî Melîk Xelîlê Eyyûbî û Mehmed Begê Zerikî û Begê Bohtî qehremaniyên mezin nîşan dan.(138-501) Berê jî me destnîşan kiribû, ku begên herdû aliyan jî Kurd in; ew li ser cûdabûna mezhebî û bi zextên dewleta Osmaniyan li hember hev derdiketine. Li aliyê Sefawiyan Kurdên Soran û Lek-Lor jî hene. Ji bo wê îspata herî baş fermana Osmaniyan ya di sala 1559 an de ye: **Ji begêbeganî Amedê re!** Zozanên Ûlûs ên qedîm Melezgir û herêmên mîna Kirk Ahûr, Kesûr, Zerdikan û Belîhan in. Ew 200 sal in ku terine wîlayeta Qizilbaşan, ji wan jî ti xêr nayê, heta ew bi xwe jî Qizilbaş in. Lê me mirad kiriye ku em wana vegerînin…sal 972-1559.(161-9) Ew jî nîşana wê ye, ku beg û mîrîtiyên Kurdan bi zor û zexta dewletan beşdarî wan şerana dibûne û herdû alî jî Sersor in!

Gor Deftera Tahrîra sala 1560 an de em Mirdêsiyan li dora Semsûrê dibînin. Îhtîmaleka mezinê ku ewên li wir xuya dikin piştre hatin Navenda Anadolê. Gor wê: li nehiya Mûşar (Sincik yan jî Yarpûzlû?) **mezraî Merdesî** heye.(97-105) Li nehiyeya Komrî jî Îzolî xuya dikin, ku 355 kes in û gelek gundên din ên girêdayî Komrî jî hene.(97-110) C. Turkay jî dide xuyakirin, ku Mirdêsî di dema koçberiyê de heta Erzirûmê diçûne; divê ew tevgera di dema wek Boz Ûlûs dihate binavkirin be: Mirdasî-Merdisî Ekradi zivistanan diçûn Rakka û havînan jî diçûn zozanên Erzirûmê, Gawirdaxi Behremêza li Erxanî Madenê ye. Ji êlên Mirdêsî: Kesên bi navê Terikanli, Osmanli û Abdûlhayyoglû bi êlên xwe ve ji berê ve diçûn Meşta ya li alî Amedê. Ji çend salan wir ve ew li Meletî, Besnî û Semsûrê digerin û gelê wir dikujine…(160-588) Boz Ûlûsê li Amêdê dijîn, ji ber sedema riyên dirêj û xerabe, di navbera zozan û zivistanê de, di sedsala XVII an de hatin Anadol û Qeremanê. Ji wir jî li Enqere, Aydin û Kutahyayê belav bûn. Ewên li Enqere, Keskîn ji xwe re war girtin.(156-26) Ji wir tê fêhm kirin, ku Mirdês-Têrik e, dema Boz Ûlûs (1602) hatiye rojava di nava wan de bûne. Heta mirov dikare ji wê agahiyê navê pêşiyên wan jî texmin bike ku tê gotin Têrikan, Osman û Abdûlhay in.

Wekî min di beşa berê de jî nivîsî, di dawiya sedsala XVII an de Osmaniyan gelek ferman derxistin ku Kurdên koçber bi cîh bikin; cîhê wan

jî çolên Sûriyê bûn. Yek ji wan jî bo Danişmendiyan derketiye. Gor lêkolîn û legerînên min kirî navê Danişmendî ji bo êla Têrikî-Mirdêsî bikar anîne. Li ser belavbûna êlê ev ferman hatiye dayîn: **Ji Waliyê Bexda Wezîr Ahmet Paşa re!** Tirkmenên Danişmendî yên ji berê ve li Heleb û Edenê dijiyan çend sal in bûne koçer. Hinek ji wan li Wêranşehr, hinek li Aydin-Torbali û hinek jî li Sû Sixirliya li sencexa Balikesîr û li gundê Omer, gundê Tîmûr Kapi û Vîranhanê dimînin; talanê dikin û gel dikujine. Berê, Begê Qereman û Anadolê hatibûn wazîfedar kirin. Eger ew êlên han hîna ku neçûnê cîhên xwe yên berê, ji bo ku li ser riya tene, jê re derfet meke û wana bibe ciyê wanî kevn, sal 1102-1689.(161-96) Mezinê wê êlê digotin: Piştî hatina ji Welat (Hama û Humus) çûbûn dora Torbali, Polathîsara girêdayê Sîvrîhîsarê; li wir jî ew tevlî serhildanekê dibin û beşekî jî tere Bala û yên din jî di sala 1859 an de li gundê Haymanê dimînin.

Ew êla hanê carna jî di bin navê Boz Ûlûs de kom dibe; ew kombûn nayê wê watê, ku ketine nav êl û zendekî din; Osmaniyan ew li gor cografyayê bi nav kirine, ne li gorî pêşiyên wan. Di defterên Osmaniyan de tê gotin: Hinek kesên ji civatên Şêx Ehmetlû û Huseyn Hecîlû yên girêdayî Boz Ûlûsê ku li Aydinê nîştecîh û girêdayî eyalata Qereman in, gelek kes li dora xwe komkiribûn û reviyabûn Toyaca Haymana yê. Li wir, ji wan bac hate xwestin, lê ew gotin ku me mizgeft û xan ava kirine û em bacê nadin. Di sala 1731 an de biryar hate wergirtin ku wan bişînin Qeremanê.(156-86) Di sala 1730 an de li herêma Toyca, ji bo ku derbend şên bibe ji êla Boz Ûlûs: Saki (Çanakli), Şêx Ahmedî, Huseyn Hecî yê girêdayî Oxûl Beylî û ji civata Kuşne li Qereman hinek nîştecîh kirin.(156-105) Toycaya ku navê xwe derbas dibe îro di nava cografya êla Têrikî de ye. Xelk Tirkmenên Çatak-li ne, berê li Însûyû ya nêzîkî Haymanayê dijiyan. Ji ber rêbirê Lewend û ji ber zilma yên kanûna datînin, nikarîn li wir bimînin û di rewşeka perîşan de ji sencaxa Kirşehîrê re hatin şandin. Li wir li navça Selmanlû Kebîr û li Yozgatê Selmanlû Saxirê cîhê ku 100 sal vir ve xirab bûne de hatin bi cîh kirin, sal 1741.(160-809) Îro jî gundekî bi navê Cataqî heye, gelê wir ji êla Têrika yê.



Gundiyekî ji Çatakê

Li ser wê êlê C. Orhonlû agahiyeka girîng dide: Êla Tabanli li Enqere, di sala 1842 an de wek 1230 xane li 30 gundan hate belavkirin û navçek jê hate meydanê.[90-113] Di vê demê de 1230 xane gelek e; lê dema mirov li gundên îro li navenda Anadolê baş lêkolîn dike; tê dîtin ku gelek malên Têrikî di nav gundên Reşî û yên din de hatine belav kirin. Hinek jê ji ber nexweşî û şêr, berbi bajarên rojhilatê navenda Anadolê û Kurdistanê çûne. Piraniya gundên Reşî û êlên din piştî salên 1840 an hatin bicîh kirin. Têrikan jî em dizanin ku piştî Reşiyan bi cîh bûn (1859). Lewra hinek gundên Têrikî (wek Xabûra û gundê Tirko) di cîhên gundên Reşiya yên kevn de nîştecîh bûn.

C. Turkay dibêje: êlên mîna Badilî û Modanli girêdayî Mirdêsiya ne.[160-219] Kurdên Badili yên li Riha, Rakka, Nîzîpê rûdiniştin; ji wir girêdayî Mirdêsiyan bûn û rakirin dora Enqere. Kargin/Karkinli, beşeka Mirdêsiyan in, li Edenê û Helebê koçber bûn li Çanqiri û Sêwasê bi cîh kirin.[39] Adaman ji êla Mirdêsî ne; ew li: Enqere, Rakka, Erzirûm, Amed, Qerehîsarî Şarkî, Qers, Çildir, Tûtak, Patnos, Kilîs, Mereş û Antebê dijîn.[160-21] Badilî, li: Îskîlîp-Çorûm, Edene, Çêrmûk, Amed, Sêwas, Mereş, Erxanî, Sarûhan, Çildir, Harran, Aydin, Qerehîsari Şarkî, Kutahya, Fîrecîk-Gelîbolû, Bûrsa, Enqere, Kocaelî, Rûmelî, Îbsala, Gûmûlcîne, Kemah, Pasîn, Riha, Trablûs Şam, Tîre-Îzmîr û hwd dijîn.[160-219] Di sedsala dawî de tablo bi wî rengî xuya bike jî, berî serdema Emewî û Ebbasiyan navê mezin, an jî rêxistina mezin Badilî ye. Êla cara yekemîn li navenda Anadolê bi cîh bûye tê gotin ku ew **Modanliya** ye. Modanli li Çatalca, Îbsala, Gûmûlcîne, Yenîce, Kocaelî, Bûrsa, Bîgayê dijîn.[160-590] Ji wê jî mirov dikare bibêje Modanli li navenda Anadolê bi cîh bûne; lewra hîn navê wan li ser gundan e; lê piştre ew çûne Marmara û Trakya ku ti agahiyên zêde li ser wan tunin. Cemeeta Bayindir jî girêdayî êla Bexdilî ye; ew li Sêwas, Kangal, Ûlaş û Delîklîtaşê nêzîkî Kangalê diman. Paşê ji bo ku li Rakkayê bi cîh bibin ferman hate  derxistin. Li: Kangal, Sêwas, Rakka, Kaş-Antalya, Ûlaş-Tarsûs, Heleb, Mereş, Meletî, Qereman, Çorûm, Hama, Aksaray, Hums, Aydin-Tire, Şam, Yabanabad-Enqere, Bexşehrî dijiyan.[160-230] **Cemeeta Têrikan-Tilkan-Tirekanli-Tinkanlû ji êla Mirdêsî** ye û li sencaxên Mereş û Meletiyê, Qeyserî, Enqere, Kirşehîr, Qonya, Kutahya, Mêrdîn, Erxanî, Çanqiri, Mûcûr, Hecîbektaş, Sêwas, Zîle, Erzirûm û Çildirê dijîn.[160-712/724] Ji berên Tabanlû, yan jî bi navê din êla Boz Ûlûs ên mîna Yûlar, Qereman, Îman, Îrazi Îman, Bayad û Şêxan li Haymanê gundê Çomak û herêma Kûrûçolê dihatin zozanan. Ew li Enqere, Qereman, Haymana, Çanqiri, Qers, Çildir, Amed, Rakka, Erzirûm, Bozok, Keşan, Malkara, Îbsala, Gelîbolûyê jî hebûn.[160-706] Wekî xuya dike li her cîhê Anadol û Kurdistanê Mirdês-Badili hene. Komekê weqas pir ku mirov nikare hejmara wan tam bibêje. Lê eger Kurd xwedî dewletek biyana, bajarê herî mezin ê ji wê êlê pêk bihata. Niebûhr dinivîse ku: Beydîlî li Riha nîştecîh e û 12 hezar konên xwe hene.[156-49] Lê ew tenê yên herêmekê ne.

Gor rapora dewleta Tirk a kûr, Mirdêsen li Kurdistanê: 15.762 kes in,

henefî ne û kurmancî diaxivin. Li Kolikê, li gundên girêdayî nehiya Narincê mîna: Ekîncî, Bozpinar, Akdoxan, Kavakli, Dûmlû, Alîdami, Gokçe, Baxbaşi, Eceler û Qeredûtê dijîn. Li nehiya Akincilara mezra Sûver a girêdayî gundê Tûxlû, mezra Cavgûr û Bodînê hene. Tevlî serhildanan nebûne û girêdayî welatê me ne.[108-23] Li Dîgorê gundê Kirdimi 1316 kesên Mirdêsî dijin ku henefî û kurmanc in.[108-193] Li Bozova, Hîlwan û gundên wan dijîn, 2365 kes in û ji



**Gundê Xebûra (Mirdêsî) - Haymana**

## MODANLI

Li jor di beşa Mirdêsiyan de jî min anî ziman, ku Modanli girêdayî vê zendê xuya dikin. Dr Fritz jî radigihîne ku ew êla li herêma Mezandiranê jî heye û êla li Îranê herî zêde entelektûel e.[8] M. Zekî jî êlêka bi navê Moliktan jî di nav Milan de û wek 500 mal nîşan dide.[19-181] Ewên li Mazenderanê balkêş in, hewceye ku mirov wan di cîh de bibîne. Şerefxan jî agahiyan li ser Modkiyan dide ku em nizanin hemû yek êlên an na?

Dema Kanûnî wîlayeta Bedlîsê girt û Şemseddîn Xanê serdarê wê ji wir derxist û ber bi welatê Ecem ve penaber bû; heta sê salan êlên Bayikî (Bayekî), Modkî, Zeydanî û Bilbasî neketin bin fermana wî û li hember dewleta Osmanî serî hildan. Paşê Siltan ferman da hemû mîrên Kurdan û li çiyayê Qaf dîsa êrîşî wan kirin, lê nikarîn bi darê zorê serî li wan bitewînin. Di dawiyê de ew bi pera û meqeman anîn rê.[157-378]

Êlêka bi navê Melûkan jî heye ku bi dîtina min ew Molikê girêdayî Reşiyan e û ti têkiliya wan bi Modanli ve nîne. Sakaoglû dibêje: Di sala 1784 an de ji paşayên herêmê re mektûp tên nivîsîn; ku ji êla Melûkan Mûsa Kethûda bi 700 malan ve neçûye zozanên xwe yên kevn û hatiye Kirşehîr-Sariçîçek Yayla yê. Tê xwestin ku wana belav bikin.[129-62]

Girêdayî Haymana gundên mîna Katranli-Modanli (Tirk), Saatlî-Modanli (Tirk), Toyçayiri-Modanli Têrikî hene; Depekoy jî wek Modanli tê xwendin ku ew jî Têrikî ne.

# BADILÎ-BEXDILÎ

Ew nava ji ku girtine nayê zanîn, lê gor texmîna min dibe ku ji begê bi navê Bad girtibin; yanê êla-Bad û ji bo ku nêzîkî vê peyvê Tirkan jî kiriye Begdilî. Di beşa Oxûzan de jî min anîbû ziman ku ew ji navenda Xorasanê hatin. Me gotibû Yaka li çiyayên Balhan dijîn êlên mîna Oklû, Goklû û Sûltanli jî girêdayî wan in. Lê ew nav bi tirkî hatine danîn, girînge ku mirov navê wan ên kurdî derxe holê. Ji wana Oklû di jêdêrên Safewiyan yên di sedsala XVI an de bi Eymûr, Salûr, Goklenan ve derbas dibin. Goklen li jora çemê Cûrcan rûdiniştin. Di wê komê de **Begdilî, Bayindir û Kayiyên bi kêm hejmar jî dihatin dîtin.**(131-163) Lê ew navê Kayî balkeş ê. Gor nûserên tirkan ew Osmanî damezirandibûn... Lê ew wêne jî îspateka din dide ku Kayî êlêka Kurd in... Herçiqas ewê ji koma mezin veqetiyayî xuya bikin jî, tespîta wan a li wê herême û dema kevn ji bo me pir hêja ye.

Di esas de dîroka wan bi ya Mirdês-Têrikan û Canbegan ve gelek ketiyê nav hev; ji bo ku gelek jêder liser wan bi taybet rawestiyane min ji hev cûda kir. N. Sakaoglû dibêje: Gor tê gotin Badilî yek ji 22 zendên Oxûzan e û ji 40 berî-êlan pêk tê.(129-54) Dema ji Xorasanê anîn, hejmara êlên wan hîn zêde bû. Yekemîn hatine Sûriyê û paşê heta Amedê belav bûne. Di nava êlên Yenî Îl û Tirkmenên Helebê de karibûne hebûna xwe berdewam bikin.(129-54) Pêwîste li vê Boz Ûlûs jî zêde bibe. Sakaoglû bi berdewamî dinivîse ku ew hertim esker dane Osmaniyan. Ji wana berên mîna Boz Koyûn û Qereşêx di sala 1690 an de Elbîstan dagirkirin û bûn pisgerêkeka mezin ya hundirê dewletê. Di sala 1692 an de xwestin bişînin Rakkayê, lê li dora ava Balîc war hate dayîn. Ew ti caran nexwestin bi cîh bibin û berbi Heleb, Dîlok, Hatay, Çûkûrova û Sêwasê belav bûn. Ji ber polîtîkayên şaş ew jî terorîze bûn. Di kilaman de tê gotin, ku ew 80 hezar mal bûne û Xanedana Kose Paşa jî ji wan e. Ji alî Riha-Firatê ji ber mesela keçekê bar kirine (1700) Divrîxiyê.(129-54)

Gorî Koçaş û Seferoglû radigihînin di dema Kanûnî de Beydilî ji 40 êlan pêk dihat, girêdayî Oxûzan bû û navê berekê jî **Kurd-ler** bû û hejmara wê 204 kes bûn.(49/91-27) Bexdilî, milê Tirkmenên li bakûrê Sûriyê yê Bozok bûn û tevlî avakirina dewleta Safewî jî bûn. Ji wan Sîncanan, Qere Şêxiyan û Çoplûyan talan dikirin. Di sala 1690-91 an de êlên Bexdîliyan hemûyan fermana ji Akçakalê heta Rakka û keviya Belîhê bicîh bibin derket.

**Helbestêk wiha dibêje:**

*Kurê Qadî, Yûsûf Paşa hat*
*Dinya derewnek, derdê min Bexdilî ye*
*Bi 80 hezar mal li Rakkayê nîştecîh bibe*
*Bexdilî şikand Tay û Muvalî (êlên Ereb in).*(131-305)

*Ji min re Hizna Xatûnê silav bikin*
*Ma kincên sor bêxê reş li xweke*
*Ma bi lawê xwe yê biçûk dilê xwe şa bike*
*Qulingno! Fîrûz Beg çû Ecem*

*Gaziyên ji çola Rakkayê hatin!*
*Gula Rakkayê jî çilmisî?*
*Ji wir min xebereka nû girt:*
*Dibêjin Cerîd Bekirî miriye, raste?*(131-307)

Ew kilama şînê ye, dîroka Badiliya ya sedsala dawî jî derdixe holê. Bi 80 hezar mal û bi darê zorê (Yûsûf Paşa) li Rakkayê bicîh kirin; şerê bi êlên Ereb re, Fîrûz Begê çûye Ecem û parçebûna zendê... Xeberên ji eniya şer hatine jî didin xuyakirin, ku serok Cerîd Bekir miriye. Di vir de xala herî girîng peyva Cerîd e; gelo navê zendê yê kevn Cerîd bû an ew nava ji alî Osmaniyan vê lê hatibû danîn? Tiştê em ji vê fêr dibin ewe, ku **Cerîd bi Badili ve û di cîhên din de Celikî** jî di heman watê de ne. Lewra gelek caran, di jêderên Osmaniyan de wek Cerîd derbas dibe. Dibe ku navê Celikî ji Cerîd Bekir hatibe. elên li Torosan dijîn dibêjin; em ji Anadolê şandin Colap (Rakka, Hama, Hums) û xortên me dîl girtin, keriyên pezên me zept kirin ku ma em bimînin. 84.000 mal bûn; 30.000 bi Fîrûz Beg re çûn Acem. Yen din dîsa vegeriyan Anadolê. Niha li Antakya û Torosan dijîn. Di wê koçberiyê de zirara mezin Beydîliyan kişand. Li ser wî stran gelek in. Beşê ku çûbûn Ecem jî, îro bi piranî li Xorasanê dora bajarê Bojnûrdê dijîn.

Dema êlên Kurd ji Rakkayê reviyan, Yûsûf Paşa ji bo ku ew dîsa bibe cîhên berê hate wezîfedar kirin. Ji Beydîliyan: 400 neferên Topal Ûşak û ji Barak, Bayindir, Mûsaca ve tevhev 3000 kes çemê Mûradê derbas kirin. Yûsûf Paşa çû ser wan û ew dawetî îskanê kirin. Kurdan guh nedanê û Osmaniyan êrîş kir û 600 neferên ji êlên Kurd kuştin. Yên man jî reviyan û xwe veşartin.(90-92) Heman bûyer ji bo Reşiyan jî tê gotin, ji bo ku Reşî jî di nava Badiliyan de xuya dikin; dibe ku wê demê tevhevbûn.

Kazim Yeşîlgoz(39)dibêje êlên girêdayî Badiliyan wiha ne:

| Nav | Cîhê berê lê dijiyan | Cîhê ku koçber bûne |
|---|---|---|
| Begler | ------------------- | Enqere, Qeyserî, Sêwas |
| Boz-Geyilî/Koyûn | Sûrûç, Nîzîp, Mêrdîn | Sêwas, Qeyserî |
| Bûldan | Mûsil | Qeyserî |
| Cece/Çeçe | Sûrûç, Nîzîp, Mêrdîn | Çanqiri, Sêwas, Nîxde |
| Çirik | ------------------- | Yozgat |

| | | |
|---|---|---|
| Dellûru/Demîrcî | Rakka, Riha, Amed | Sêwas, Çanqiri |
| Dimlekî | ------------------- | Yozgat, Qereman, Qonya |
| Erzînî | ------------------- | Sêwas |
| Qadirli | Hama, Humus, Nîzîp, Sûrûç, Mêrdîn | Sêwas |
| Qereşêxî | Amed, Heleb | Sêwas, Nîxde, Arapgir |
| Kartal/Kasan | ? | Develi,Enqere,Sêwas,Çanqiri |
| Kayas | ? | Nîxde, Aksary |
| Mîrzan | ? | Sêwas, Kangal |
| Pencî-Bar/Pencbar | Mêrdîn, Rakka, Riha | Sêwas, Qeyserî, Kirşehîr |
| Tecerlî | ? | Qereman, Sêwas, Kirşehîr |
| Ulamiş/Ûlaş | ? | Sêwas, Çorûm, Çanqiri |
| Rişvanlû, Rişvan | Halep, Entep, Besnî, Meletî, Sêwas | Qeyserî, Bozok, Sêwas Irişvanlû |

Di vir de pêwîste bê gotin ku yan nivîskar şaş nivîsiye, yan jî beşek ji Reşiyan ketiye bin sîwana Badiliyan. Gorî baweriya min, alternatîfa dawî raste; lewra gelek êl di dema şerê giran de mecbûr mane ku têkevin bin sîwana hevdû, yan jî îttîfaq kirine û di nav hev de mane.

Seferoglû jî dibêje: Tirkmen in û 12 berên xwe hene. Sunnî û Elewî ne. Girêdayî Reşiyan e û tê fehm kirin ku ew jî konfederasyon e. Bi Kurmancî dengdikin. 12 êlên Kurd ku navên tirkî li ser ev in: 1. Tilkî, 2. Kizirî, 3. Haydarî, 4. Ketiyan, 5. Sadakan, 6. Kizkapani, 7. Qerehesenî, 8. Qereî, 9. Axcaî, 10. Tûrûçî, 11. Kaba 12. Mahkanî.[91-60] Piraniya wan êlêna em girêdayî Atma, yan jî Sine Miliyan dizanin.

Ziya Gokalp jî ji bo Têrika dibêje, ji wan re "Bexdilî" digotin û li Carablûsê du êlên Tirkmenên bi navê Îlbexli û Bexdilî hebûn. Bexdilî ji alî Yozgatê hatine û surgunê Rakkayê bûne û 80.000 malbat bûne. Tekîliyên wan bi êlên Doxerli û Bexdilî yên li Rakka û Rihayê ve hebûne. Ew ji heman cedî ne. Têkiliyê wan bi Afşarên li Qonya û Edenê re jî hene.[22] Tespîta Gokalp bi min jî rast tê, têkiliyên wan bi Reşî, Celikî û Avşaran re jî rast in. Hinek nivîskar jî wiha tarîf dikin: Ev êla digihîje 650 malbatan, li bakûrê Amedê nîştecîh in, hinek Ermenî jî di nav de hene, rewşa wan baş e û şalên baş didirûn.[19-178] 650 malbat in di navbera Hanî û Firat de nîştecîh in. Bi cilên xwe yên rengîn tên nasîn. Pir jîr û destgirtî ne.[100-177] Di nava Milan de êla Têrikan 700 mal in û koçber in. Dîsa Nasiriyan jî 70 mal in û koçber in.[19-180] Di nava Milan de Mirdês jî hene ku hejmara wan 1000 mal in. Canbegan jî nîşan dide, lê hejmara wan-nanivîsîne.[19-181] Li 250 km rojavayê Enqerê rûdinên û 400 malbat in.[19-189] Wekî ew nûseran jî diyar dikin, gelek êl û zend tevlîhev bûne.

Rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" li ser bakûrê Kurdistanê agahiyên balkêş dide. Gor wê, li Gumuşhanê, navça Kelkît û gelek gundên wê ji êla Badilî 10.844 kes dijîn. Ew Kurmanc û şafiî ne.(108-149) Li Hîlwan û gundên wê 3227 kes xuya dikin û şafiî ne.(108-309)

Nêzîkî 20 hezar kesên Celalî ji ber Kûyû Murat Paşa reviyan çûn Îranê (1608), Şah ferman da ku 10 hezar ji wan li Biradost –Kela Dimdim- bên bi cîh kirin. Emîrxan jî ew pêşniyaza qebûl nekir û şerekî bi xwîn di navbera wan de qewîmî bû. Di dawî de Emîrxanê Çengzêrîn têk tere. Di nav fermandarê êrîşkaran de Muhemmed begê Begdilî jî heye ku piştre kela Dimdimê stend û meşandina kar û barên wê kir destê xwe.(157-513) Ew begê Badilî yê çûye Îranê, ku di kilama şînê de li jor tê qal kirine.

## CELIKAN
## (Avşar, Bayat, Cerîd, Reyhanli)

Li ser navê wê êlê jî ti agahiyên berbiçav nînin; heta çend sedsalên dawî jî ew nava li tu deveran min peyda nekir. Lê wekî bê texmîn kirin ew nava ji şexsekî tê, gor mezinên Celikî Miçê Rawê Mamî Tozê (1915) nav ji Cel tê; ne dûre ku ew Celal yan jî Cerîd be. Bi navê Celalî ve têkiliya xwe heye an na? Dîsa gor heman kesî ew Celalî ne, di nava êlên serhilderê Celalî de ti şik tune ku Celikî jî hene. Îhtîmala ji wir tê ya herî zêde ye. Navê Celika bi piranî, bi navê mîna Delika, Çelikan û Reyhanli ve tevhev derbas dibe ku hemû yek koke. Lê carna jî em şopa wan di nava zendên mezin de jî dibînin.

Ji wan zendana yek Avşar, yek jî Reşî ne. Li başûrê rojhilatê Bexdayê çemê Tîbê heye, nêzîkî kaniya wî, li Loristanê Kelaka bi navê Bayat heye. Qazwînî, di dawiya sedsala XII an de ji bo hinek bûyeran qala wê Kelê dikin. Wê demê em dizanin ku Xuzîstan di destê Avşarên ji Xorasanê hatî de bû. Bi vê re girêdayî di sedsala XIV an de li bakûrê Sûriyê sê zend dijîn: Bayat, Avşar û Bexdilî. Di sala 1399 an de gelek Bayat li Helebê dijîn. Şam Bayadi, piştî Tîmûr Tatar birin rojhilat, li Bozokê war girtin. Gelek ji Bayatan jî di avakirina dewleta Safewî de cîh girtin. Ji Bayatan Sevse-Sevindik Begî em nas dikin. Yek ji êlên Bayatan jî rêxistina **Reyhanli** bû. Di dema Kanûnî de ji 112 nifûsan bacê dida pêk dihat. Di heman demê de 90 malên xwe jî li Yenî Îlê bûn.(131-242) Bi dîtina min ew 90 mal, Celikiyên îro li navenda Anadolê dijîn in. Piştî salên 1516 an em wê êlê li Semsûr û navçê wê jî dibînin: Li Semsûrê navça Çelîkan heye ku navê xwe ji wê êlê nivîsiye, li Gergerê jî Reyhanli hene. Me berê jî gotibû ku ew di nava konfederasyona Reşiyan de jî xuya dikin. Ji bo ku ew êla heta sedsala dawî koçer û serhildêr bû, min xwest bi taybetî wê binivîsîm. Di sedsala XVIII an de Reyhanli li başûrê Sêwasê havîn, li Helebê jî zivistan derbas dikirin. Gerok Bürckhardt dibêjê ew 3000 kon in. Di nava sedsala XIX an de ew li deşta Amîkê bûn; di sala 1865 an de ew li Reyhanliyê bi cîh kirin.(131-242-47) Hevalê min

ên Avşar ji Amîkê hebûn, navbera wan û me de ti cûdahî tunebû. Ji alî fizîkî, ziman, ehlaq û rûhî de mîna Reşiyan in.

Dîrokzanê Kurd Şerefxan dibêje: Li Cezîrê 14 nehiye hebûn; yek ji wana nehiya Heytemê bû. Piraniya rûniştiyên wê Ermenî û xiristiyan in. Êla Cilekî (Cilkî) jî nîşteciyên wir in. Êlên din ên Boxtan jî ev in: Dinbilî, Nûkî, Mehmûdî, Reşikî, Şêxbizinî, Maskî û hwd. Ya rast ev e, ku êla Mehmûdî û Dinbilî ji gelek kevn ve ji Cizîrê derketine.(157-158) Li ser wê agahiya Şerefnamê mirov dikare bibêje, ku dema Avşar ji Loristanê derketin, herî kêm beşek ji wan hatin Cizîrê. Êl û zendên din ên li wir jî mirov mêzedike piraniya wan îro jî li dora Celikiyan in û li navenda Anadolê nîştecîh in. Ji wê herême jî divê çûbin dora Helebê. Li ser wê K. Yeşîlgoz dibêje: êla Delkan li Helebê dijî. Bera vê Celikan jî li Islahiye hate îskan kirin. Celika jî mezin bûn, bi xwe, li herêma îro bi navê Celikan bi cîh bûn.(39)

Celikî carna di nava Boz Ûlûs de jî tên nîşandan. Lê di sedsala XVI an de me gotibû, ku ji 15 êlên Reşiyan yek jî Celikî bûn. Di wan sedsalan de bûyerên hatine serê Reşiyan hatin serê Celikan û êlên din jî. Celikiyan jî ji ajotina Rakka para xwe girtin. C. Turkay dibêje: Êla Reyhanli berê her dem li Haremeynê dijîn, ji bo ku serhildan kirin, **ferman hate dayin, ku bên ajotinê Rakkayê**. Reyhanli, ji berê ve li herêma Helebê û li Xana Qeremûrtê zivistan derbas dikirin û ji bo zozanan jî diçûn çiyayên mîna Kargilik û Çobanoglû. Ji ber daxwaza wan bi xwe, ew li deşta Amîkê hatin bi cîh kirin. Berên wê êlê jî ev in: Sarica, Tokel, Kabakî, Tonî, Korû, Sala, Oxçû, Qereehmedî, Bahadirî. Ew li Kilîs, Rakka, Sêwas, Edene, Mereş, Heleb, Meletî, Elbîstan, Antakya, Qaza Kerker-Meletî dijîn.(160-140) Bi qasî ez dizanim ji wan beran Oxçû, ne êlêka Celîkiyan e. Dibe ku pismamê hevbin; ew êla di nava Celikan de xuyadike jî divê ji ber sedemekê ji Oxcûyan veqetiyabin. Berê jî min nivîsî bû, Osmaniyan ji bo ku êlên Kurd bi zorê bi cîh bikin, carna ji wan êlan serok an jî sewalên wan dîl digirtin. Ji bo wê êlê jî ew yeka pêk hatiye. Fermana bi vê yekê re tekildar wiha ye:

**Ji waliyê Rakkayê re!** Ji bo ku êl li Rakkayê bi cîh bibin û ewên li der doran perîşan bûne nîştecîh bibin, ji Çepnî du kes, ji Tacîrliyan (Oxçû-Dulqadir) du kes li Kela Amasya hatin dîl girtin. Ji Çepnî dîsa şeş kes li kela Çorûmê; dîsa ji Cerîd (Mirdês) du kes li Çanqiriyê, ji êla Koçekliyan sê kes li Kela Kalacik û dîsa ji Cerîd Welî Bolukbaşi li kela Qeyseriyê hatine girtin. Lê dîsa jî êl û qebîlên xwe neçûne îskanê. Di vê navberê de, êlên li Rakkayê nîştecîh en mîna Afşar, Kiliç bi Tirkmenên Dulqadirî ve li deşta Amîk, çiyayê Seyhûn û deşta Ûrûcê gihîştin hev. Ji bo ew jî herin cîhên xwe fermaneka tûj hatibû derxistin, sal 1118-1705.(161-135) Fermana wan piştî Reşiyan derketiye. Lê piştî vegera ji Sûriyê jî, wekî êlên din Celikî jî bi cîh nebûn û demeka dirêj wek nîvkoçer jiyan. Ew êla hanê di navbera Sêwas û Helebê de diçû û dihat.

Di derbarê vê çûyîna Reyhanliya yê Helebê de A. Refîk dibêje: **Ji waliyê Sêwasê Mehmet Paşa û yê Mereşê Mekkîzade Huseyn Paşa û ji Silêmanê**

**Reşî re emir!** Reyhaniyên ji Yenî Îl Tirkmenên Helebê, hersal bi mal û komên xwe ve ji alî Rûmê de dikevin tevgerê û ji bo zivistanê diçin Helebê û deşta Erîha. Reyhanî, ji eyaleta Sêwas û herêma Delîklî Taş diçin Helebê. Ji bo wê xelk tên kuştin, mal û milk talan dibin. Pêwîste rê li ber wan bê girtin...Çi pêwîst be bê kirin! sal: 1176-**1763**. Piştre, yanê du sal bi şûnde ji vê îskana Reyhanî dest hatiye berdan û li ciyê wan Êla Îlbexî li Delîklî Taş hatiye bi cîh kirin.(161-217) Lê piştî vê bicîh kirine, ji bi şer diçin ser Celikiyan û wana bi zorê didin sekinandin. Gor mezinên êla Celikî yên li navenda Anadolê, ew ji Mereşê-Dîlokê hatin Sêwasê û ji wir jî hatin Qonyayê.

Li başûrê Qerekutukê (bawerdikim li Osmaniyê) geliyek heye; di dema Koroglû de êla Reyhanli ya ji Hama dihatiye û dixwestiye herê çiyayên Bînboxa, şer destpêdike û Reyhanî belav dibin, dişkên û vedikişin. Careka din nikarîne herin zozanan; ji bo wê, ji vê geliye re gotine Hama. Di dema xwe de li Bînboxa zozanên herî dewlemend di destê Reyhanî de bûye.(107-375) Wek tê zanîn ji bo Reşiyan jî Reşî Gedixi, yanê gora Reşiyan jî heye. Êla Reyhanî ji 3000 konan pêk dihat (Nîebûhr di sala 1766 an de wek 2000 mal nîşan dide û dinivîse ku ew ji Helebê heta Sêwasê diçûn). Ew li deşta Amîk zivistan û li alî Kilîs û Azazê jî havîn derbas dikirin. Dema diçûn zozanan bi Begê Mereşê Îbrahîm re ketin şer û Îbrahîm têk birin. Ji bo wê dewletê dora wan girt û ew mecbûr kirin ku di sala 1780 an de li deşta Amîkê bi cîh bibin. Ewên ku dor girtibûn yek jî Omer Paşayê Reşî bû û Dulqadirên li Mereşê rûdinên jî pira Mereşê ya bi navê Ak Kopru girtibûn.(156-56) Di vegera Reşiyan de jî, Reşiyên niştecîh, bi êlên din ve li hember yên koçber bikar anîbûn... Ew Celikiyên ku li dora Helebê manî bûn. Beşêk ji wan jî li dora Sêwasê hebûn û bi Reşiyan re diketin tevgerê. Ewên li Sêwasê dê paşê bên Kûlûya Qonyayê.




**Ji gundê Celika Miçê Rawê û Absev**

Ji Reşiyan, berên mîna Barak, Qereşêxî û Bexdilî reviyan û tevlî êlên mîna Çelgan, Kiliç û Milan bûn û neçûn zozanên xwe û çûn dora Sêwasê û talan kirin. Êlên mîna Manda, Çelikan, Umranên li Alaca-xanê diçine zozanan. Wê yekê sîstema derbenda xirave kiriye; gelê derbendî barkiriye Yozgatê. Ji bo ewlekariya rêya Bexda, di sala 1781 an de ji waliyên Sêwas û Bexdayê re hatiye nivîsîn, ku ewlekariyê pêk bînin.(129-41) Gor gundiyên Celika (Atkafasi) gundê wan 113 sal in hatiye damezirandin. Berî wê demê jî ew saleke li Altinekin ( Zebil-Atkafasi)-Qonya mane, bi dûre tên cîhê Gundî Kosê ya îro (girêdayî Haymana yê) û di dawiyê de herdû gund cîhên xwe bi hev diguhêrin.

Di sala 1849 an de Celikan ji alî Gurunê diçûn zozanan,(171-250) ew dîtin îro ji alî mezinên Celikî ve jî tê pejirandin. Ji Celikayên biçûk Miçê Rawê Mamî Tozê digot: "Em diçûn Sêwasê".

Gelên nîştecîh Celikî gilî kirin, ew jî bi cîh kirin. Di sala 1850 an de bi giştî 6554 xane ji Reşî, Afşar û êlên din ên biçûk hatibûn bi cîhkirin.(171-250) Wê deme em dizanin ku Celikiyan nifûsa xwe bi giştî 100 xane bûye.(171-247) Celikiyên li Islahiyê îro li Nûrdaxi (Komurler), Turkoglû û Pazarcikê dijîn. Girêdayî wan navçana gundên mîna: Toplama, Mesthoyuk, Kiriçkal, Zencîrlî, Çamûrlû, Hîsar, Kulhaşkarahoyuk û yên din in ku bi giştî 13 gund in...Celikan li Islahiyê bi cîh bûn şûnde, dihatin zozanên li Gurun û Kangalê. Li gundên wan navçana xanî avakirin, lê îro hema hema hatine terk kirin. Li Gurunê gundên mîna Beştaşli û Kangal-Havûz û **Avşaroren** e. Îro Kurdên Celikî yên li Anadoliya Navîn ji Gurun û Kangalê re dibêjin yayle-zozan. Gundê Celikayan yê ku li Anadolê cara yekemîn hate avakirin Kirkpinare. Li vî gundî Celikiyê ji sala 1882 an ve êdî mayînde bûne.(174-27)



**Celika-Kirkpinar**


Kurdên koçer heta salên 1900 an jî desthilatdariya dewleta Osmaniyan qebûl nedikirin û li hember zexta seri hildidan û şer dikirin. Ji wan re mînaka herî baş Kurdên dora Çiyayê Kurmenc û Çiyayî Gawir û yên dora Hatayê ne.

Mirov dikare bibêje, ku Kurd, di esasê xwe de hezar sal in ku li hember Tirkan di nava têkoşînê de ne. Ew raperîn carna kûr, carna geş, carna fireh bûye, lê hîna jî berdewame...Dewleta Osmanî, Ji bo ku Kurd heta sedsala dawî jî sîstema wan qebûl nedikir bipelçiqîne, artêşeka taybeta bi navê **"Firka-î Islahiye"** ava kir û Derwêş Paşa jî anîn ser. Navê artêşê jî li ser e, ku tê wata terbiye kirin an jî perçiqandin. Armanca vê artêşê ji holê rakirina Ermenî û Kurdên li wê herêmê bû, ku guhdarî Osmaniyan nedikirin... C. Paşa (1822-1895) dinivîse ku: Derwêş Paşa, ji Zeybek û Arnavûtan heft tabûrên nizamî hilbijartin ku ew eskerên herî baş bûn. Hemûyan tifingên şeşane di dest de bûn. Ji Gîrîd, Heleb, Mereş û Edenê jî yek tabûr tevlî Firka-î Islahiye bûn. Yanî 11 tabûrên piyade û aleyek jî siwarî bûn. Lê Mîrlîva Paşa Îsmaîlê Kurd ji Sêwasê bi alayek siwarî û çar tabûrên piyadê hîn nehatibû. Ji begên Gurciyan Arslan Paşa bi 200 eskerên Gurcî û Çerkez; Mehmet Paşayê Eleşgirê yê Kurd jî bi 300 siwarî dihate Mereşê.[83] Di vê êrîşê de jî xuyadike, ku dewletê dîsa Kurdan li hember Kurdan dida qirkirin. Wekî di buyera Reşiyan de bûye, di şerê Celikan-dewletê de jî şaxê Celikayî wek Reyhanî tê binav kirin, ji Osmaniyan re rêbertiya neçîra birayên xwe dike. Paşayê Osmanî yên nijada xwe ji Balkanan wiha dinivîse:

Navê çiyayê Gawir re berê Cebel-î Bereket dihate gotin. Li rojhilatê wî jî çiyayê Kurmanc heye. Di newala navbera wan de xaka pir bi bereket hebû ku cîhê êlan bû. Ji êlan Tirkmen Reyhaniyê li deşta Amîkê bû. Delîkan û Çelîkanê Kurd jî li deşta Dumdumê zivistan derbas dikirin. Havînan her sê êl jî bi riya vê geliyê diçûn pişta Mereşê û ji wir jî diçûn Ûzûnyaylayê.[83-124]

Di sala 1281/1865 an de Firka-î Islahiye ji Edenê derbasî Îskenderûnê bû. Pêwîst bû ku me, heta Qeyserî, Elbîstan û Sêwasê îslah bikin. Me biryar da, ku di navbera çiyayê Gawir û Kurd kev in û tevgera leşkerî destpê bikin. Bi vî awayî me êl dikirin du beş. Lê pêdeviya me bi rêberan hebû ku me ji wan geliyan derbas bikin. Di vê navberê de mîremîrê êla Reyhanî Mûselzade Mistafa Beg hat û bi xwe re jî Paşo Begê nehiya Hecîler jî anî û kilîta çiyan da destê me...[83-132] Reyhanî êla herî mezin a li Çûkûrovayê koçber e. Rêberên wan gelek bi Firkaî Islahiye re alîkarî kirin.[83-133] Ji agahiyên fermandarên êrîşkaran jî xuya dike ku yekîtiya wan tune û îxaneta hundir jî bîrineka mezin e...

Komên mezinê mîna Avşar, Sarkinti û sê êlên Kurdên biçûk ên mîna: Kirinti, Lek û Heciyan bi zivistane dihatin Kozan-Edenê û havînan jî diçûn zozanên Anatoliya Navîn.[83] Hersê êlên dawî wek Şêxbizin tên nasîn û beşek ji wan li Sakarya bi cîh kirin. Li Sîs-Edenê jî Ermenî û misilman dijîn û zivistanan dihatin wir, havînan jî tevî yên din diçûn. Li bakûrê Mereşê di newalekê de bajarokê Zeytûn hebû, 1300 Ermenî lê dijîn.[83] Gerokê Swêdî yê bi navê Kûylenstîerna.[188] dema li wan deran digere dibîne ku ji navça Zeytûn dû hiltê û dengê şer tê. Di wê demê de, êla herî mezin a herêmê **Reyhaniyên** li deşta Amîkê bûn û ji berê ve girêdayî dewletê bûn. Reşî û Avşar gelek bûn, ji ber wê, ew belavkirî hatin bi cîh kirin û ji bo wê bi dîqet tevdigerin. Di cîhkirinê de carna jî rêyên êla yên zozan û zivistanan li ber çavan hate girtin. Wek mînak:




Nexşa Herekatî Islahiye

Reyhanî 2000 xane û 12 ber bûn ku li deşta Amîkê bi cîh bûn.[90-115] Êla Kurdên bi navê **Delîkanli û Çelîkanli** jî li navbera çiyayê Gawir û Kurd de li deşta Dumdumê bûn û havînan di ser Mereşê re diçûn Ûzûnyaylayê. Li navça Beylan a li deşta Amîkê êla **Qerefakili** hebû ku mîna Ûlaşliyan hov û şerkêş bûn. Koma Delikan li deşta Dumdum zivistan derbas dikir û li wir nîştecîh bû û ji 8 beran pêk dihat û mezin bû. Gundên li deşta Dumdum û nehiya Keferdiz ji Delikan û Çelîkan pêk dihatin. Van gundana me gîhandin hevdû û navça Islahiyê damezirand û çend axayên wan êlana li vir bi cîh kirin û wezîfe dane wan. Meclîsa me ava kir re, mîremiranê Delikan Huseyn Axa û ji yên din yek me kire nûnere meclîsê.[83-141]

Kesên xerîb (Ermenî) li nehiya Çerçîlê wekî daniyan belav bûn û serhildêr çûn çiyayên Ûlaşli. Divê di vê demê de be, li nava gundên Anatoliyê jî em gelek Ermeniyan dibînin. Xalê bavkî min H. Mamî Tozê digot 10-15 malên Ermeniyan di nava gundê me de hebûne. Piraniya wan ticaretê dikirine û hinekan jî hostetiya xanî çêkirine dikirine. Piştre hemû çûnê bajarên mîna Stenbol û Enqerê.

Gor rapora dewleta Tirk a kûr Celikiyên li Kurdistanê 6.000 kes in; Kurmanci axêf û henefî ne. Li gundên mîna Katranci, Încegedîk, Bayraktepe, Ortûlû, Toplamalar, Goluhoyuk, Zincîrlî, Komurler, Belpinar, Gedîklî, Kirişal, Emîrler û Mesthoyuk a girêdayî Islahiye dijîn. Raman: Ev koma, ji êlên mîna **Tepkan, Kamazan û Torûnan** pêk tê. Vê êlê, têkilî û xisimatiya xwe bi **Reşiyên ji milê Celalî yên ku li Haymana**, **Kûlû**, Besnî, Mereş, Meletî, Wan û Sûriyê ve heye. Di dema dawî de nîştecîh bûn.[108-142] Bi ser wê agahiyê ve, mirov dikare bêje, ku Topkanî yên li Xorasanê ji êla Celikan e. Yekê jî, dewleta kûr jî eşkere dike ku ew milê Celaliyan e û bi vî awayî dîtina min piştrast dike. Ji xanedana Kozanoglûyan ku leqaba xwe "Torûn" e, ji begê wan Huseyn axazade Mehmet Axa, Derwêş Axazade Ahmet Axa û kurên wî Hemze û Mistafa li Qeyseriyê bi cîh kirin û meaşê wan hatin girêdan.[83-164] Heta demên dereng, têkiliya Celikiyên li Anadolê bi birayên xwe yên li Islahiyê, Pazarcik, Belpinar, Zencîrlî û derdorên wir re jî hebûye. Gor mezinan, ji xismên wan ên li Kurdistanê re Qere Îbîş Oxûllari tê gotin.

Delikan jî 5500 kes in, li Islahiye, Kilîs û gundên wê rûdinên, Kurmanc û henefî ne. Delikan, êlên mîna: Melikan, **Belikan**, Heyderkan, Şerîkan, Mamatkan, Gulukan, Nûrikan digre nava xwe. Ew ji alî Derwêş Paşa ve li gundên cûda cûda hatin bi cîhkirin. Vê êlê xisimatî û têkiliya xwe bi êlên Qonya, Kirşehîr û Sûriyê vê heye.[108-143] Delikan: 300 malbat in û koçber in; li dora Mereşê zivistanan derbas dikin. Havînan jî terin Torosan. Belikan: Li dora Mereşê dijîn, 300 mal in û Kurmanc in.[19-187] Li Afşînê 2781 Celikî hene ku ew şafiî ne.[108-208] Beşek li Wanê, beşek li Ezingan, Erzirûm, Kilîs, Antakya, Meletî, Mereş û Dîlokê dijîn.[160-25] Celîkan li: Semsûr, Mereş, Bîrecîk, Islahiye, Rûmkal a-Rakka, Kilîs û Dîlokê dijîn.[160-271] Êlên mîna Nûdûr, Doxan, Gokrîşan û Cilikan li Mereşê rûdinên; **dizanin ku ew Tirkmen in lê bi kurmancî dengdikin**.

Delikan û Belikan jî hîn koçber in: Havînan li Torosan, zivistanan jî Delikan terin Kilîsê, Belikan jî terin geliyên Mereşê.[104-41]

Bayat ji Reyhaniyan zêdetir xwedî wan êla e: Kuzu Guden, Îl-Dîlek, Beçîlû, Yaban, Melek Hecî, Gozucek. Ji wana Kuzu Guden piştî talanên li Ak Kişla Qeyseriyê bi cîh bûn. Bayata, Pehlîvanli bi Reyhanliyan ve temsîl dikin. Boy Begê Pehlîvan li gundê Beg Obasi ya girêdayî Kirikala Enqerê dijî. Di sala 1707 an de mizgefta gund avakirine.[131-247]

Êlên Tirkmenên mîna Cerîd û Tecîrlî li Payasê/Îskenderûn zivistan derbas dikirin û havînan jî diçûn Ûzûnyaylayê. Bi çûyin û hatina van re gelek dizî û talan jî dibû û li Mereşê ew tişt dihatin firotin. Ji bo wê, esnafên Mereşê gelek kar dikirin. Di wê çûyin û hatinê de bi taybetî jî Çelîkan û Tecîrlî li wan deran belav dibûn û xelk dişêlandin û tiştên destên gel digirtin.[83-125] Mirov dikare li wir texmînek bike ku Tirkan **şûna Celikan, peyva Cerîd**, Reyhanli, Kabalar bi kar anîne.

Gor mezinên ji Meletî, îro li vî bajarî êlên girêdayî Reşiyan jî wiha tên rêzkirin: Atmiyan, Çeqêla, Xelka, Delika-Celika, Bîstika û Sêvikî. Dîrokzanê Kurd Îzady dibêje: Kurdên li Xalxal-Zencan jî: Delikan-Kurmanc û sunnî, Canpolat, Kilîsanî, Şatranî ne.[154-164] Min çend caran hewl da ku herim Xalxalê lê nebû, hêvîdarim hinekên din herin wir û li ser wan agahiyên zêde ragihînin. Celikiyên li navenda Anadolê li gundê Celika (Atkafasi), Kirkpinar û Hesarê belav dibin û hinek malbatên li Gundê Qutiga jî Celikî ne.



**Hesar**

Ji alî ziman, kinc, ol û civakî ve wekî Reşiyan e. Dema xwe tarîf dikin, pesnê xwe wiha didin: " Merin malên Molika, herin gorên Celika!" Lê her gund û êl bi awakî nêzîkî wê xwe mezin dikin...

## ÇEMÎŞGEZEK

Ji ber cografya xwe ya bilind Dêrsîm di her dema dîrokê de bûye sinca Kurdan. Bi taybetî jî Kurdên îro li dervayê welat dijîn bi piranî li wir kombûne yan jî ji wir belav bûne. Li Dêrsîmê navça Çemîşgezekê bi koma êlan yê bi vî navî jî navdare. Gelek êl û zendên Kurmanc, Kirmanc û Lekan li wir bihevre hevkariyê kirine û bihevre têkoşiyane. Îro li Xorasanê jî zendekî pir mezin ê bi navê Çemîşgezek-lû heye ku ji herêma Dêrsîmê çûne. Dîsa di alî olî de, êlên li vir yên herî dawî ji ola xwe yê kevn dev berdane. Di alî ziman û kincan de jî gelek wekhevî heye, ango bandorê lihev kirine.

Prof. M. Alî Unal dibêje: Herêma Çemîşgezek di serdema neolîtîk de jî cîhê xanî nûşînê bû. Di girê Pulurê de tebeqa dawî ji dema neolotîk ve maye. Tê texmînkirin ku di destpêka serdema Tûnc de, êlêka girêdayî federasyona êlan li wir jiyaye. Gel debara xwe bi cotkarî û ajalan xwedî kirinê derbas kiriye û neçîr karekî dûyemîn bû. Ewên li wir rûdiniştin sifir dihelandin û jê serê mertal û tevran çêdikirine.(118-7) Ti guman tune ku ew êlên Kurd bûn û heman nivîskar dibêje: Mûşkiyan jî li wir di sedsala IX an BÎ de di navbera Mûrat û Firat de dijîn.(118-8) Bi vî awayî erdnîgariya Dêrsîmê, ji Kurdên ji ber êrîşên Ereb, Asûr, Xelkên Deryayê reviyabûn re bûye war û ew yeka heta roja îro jî berdewame. Berî hertiştî êlên îro li vir dijîn bi yên di her demên berê ve hevdû digrin. Êlên îro li Xorasanê, navenda Anadolê, Lazqiyê û cîhên din dijîn hîna jî parçên xwe li Dêrsîmê hene. Ji van mirov dikare navê Reşiyan, Alan, Canbeg, Şêxbizin û gelekên din bijmêre. Ya di dîrokê de zêde şop hiştî û li vê herême jiyayî yek jî koma Mûşkî ye. Wekî di beşên derbasbûyî de jî min got, ew Kurd in, hîna jî êl û bajarên bi vî navî hene. Bi vî awayî Berî Mîladê ew herêm hertim di bin desthilatdariya Kurdan de bû. Di ber hatina Tirkan ya rojava jî ew herêm bû kela Kurdan û gelek êl û zendên ji navenda Xorsanê, Gîlan û Qefqasan hatibûn xwe avêtin çiyayên Dêrsîmê.

Bi taybet jî bi hilweşandina dewleta Şadî re zend û êlên ji wir belav bûbûn hatin Dêrsîmê. Berî vê jî êlên ji ber Tirkan reviyabûn hatin vê herêmê û gelek mîrîtiyên Kurd avakirin. Di serdema mîrîtiyên Kurdên li Anadolê û Kurdistanê hatibûn damezirandin de, li Dêrsîmê em êlên girêdayî Germiyanan dibînin. Dîsa federasyona Milan (îhtîmaleke mezine ku di nava Germiyanan de bû) û gelek êlên din jî ewder ji xwe re wek war girtibûn. Vê yekê nûserên Tirk wiha radigihînin: Desthiladariya Çûbûk Oxûllari li Çemîşgezek, Xarpût û dora wan deran heta sala 1113 an berdewam kir. Piştî Çûbûk, kurê wî Mehmed derbasî cîhê wî bû. Hinek jî dibêjin Çûbûk û Tirkmenên girêdayî wî Germiyanî demekê li Meletî ne.(118-11) Germiyanî wek tê zanîn Zerdeştî bûn û êlên heta roja îro li Dêrsîm û li dervayê Welat dijin jî, vê kevneşopiyê kêm zêde didomînin.

Wekî hate gotin Kurdên li vir, girseyekî ji Germiyanî û Şadiyan ve mabûn; ji bo vê jî gelek zend û konfederasyonên Kurdan di navê de hene. Ji ber

ku ew bi dehan salan şer kirine, di şeran de pijiyane, milekî pir şervan û stû nizm nedikiriye. Ji ber vê yekê heta dema Osmaniyan ew serbixwe jiyane. Bi dîtina min derba herî mezin şerê olan li wan xist. Lewra di serdema Sefawiyan de Şah pişta xwe de wan Kurdana; ew parçe kirin, li gelek beşên ji hev dûr bi cîh kirin (Loristan û Xorasan) ku pê welatê xwe biparêze. Di encama vê de ew hêza mezin bê taqet ma. Eger ew yeka pêk nehata, ew dikaribûn ji serxwebûna Kurdan re rebertî bikirana…

Prof. M. Alî Unal dibêje: Gor rîwayetên mezinan, di dema Alp Arslan de Çemîşgezekî di bin serokatiya Emîr Salik Alî bîn Qasim de li Erzenî-Rûm (Erzirûm) û wan deran dijîn. Bi Gurciyan re dijmin bûn. Di sala 1161 an de, di şerê bi Gurciyan re Emîr Saliq dîl ket.(118-34) Şerefxan jî li ser wê bûyerê wiha dinivîse: Emîr Salîqê kurê Eliyê kurê Qasim, ku ji şaxeke seltanata Selçûqiyan bûye, di dema Alp Arslan de, desthilata Erzen-î Rûm û derûberên wê di destê wî de bûn. Di navbera wî û Gurcîstanê de dijminatî hebû, koka wê kevn bû. Di dawiyê de di sala 1162 an de dîl kete destê Gurciyan. Lê ji bo ku xuşka wî jina Şah Ermen bû (fermanrewayê Tirkmenên Xelatê) û wî Şahî gelek diyarî ji Gurciyan re şandin û ew rizgar kir. Wek tê zanîn di wê serdemê de di navbera Şadî û Gurciyan de gelek şer hebûn.

Destpêka dîroka wan ê li Dêrsîmê Dr. Frîtz wiha radigihîne: Di dema serokê vê komê **Melîkşah Bin Muhammed de (1199)** li dijî Selçûqiyan raperîn kir û dîl kete destê Kiliç Arslan û hate kuştin.(8) Ji ber navê vî serokî ji van Kurdana re **"Melkîşî"** jî tê gotin. Li ser vê babetê Şerefxan dibêje: Di sala 1202 an de Erzirûm kete destê Selçûqiyên Rûmê.(157-200) Îhtîmaleke ku piştî vî şerî bi tevahî dev ji aliyê Ezerbeycanê berdan û li dora Çemîşgezekê bi cîh bûn.

**Van Kurdana berî Îslamê gelek caran bi Ermen û Gurcan re îttîfaq kiribûn, lê dema bi xwe li Arranê man jî bi sedsalan li hember wan şer kirin. Di salên 1202-1226 an de serokê Melkîşan keça xwe da Selçûqi**yên Qonyayê. Ew yeka di navbera êl û mîrîtiyên Kurdan de, baş nehate pêşwazî kirin. Bi çavekî xerab li vê bûyerê nihêrtin. Bêguman ew yeka bi xwe jî balkêşe; gelo çima keça xwe dabû? Ew ji têkiliyê wan û Tirkan ji şerê Aniyê dihat, an jî ew li ser hinek tiştan bi Tirkan re lihev kiribû? Bi dîtina min lihevhatinek xuyadike, Tirkan piştî vê hevkariyê berê xwe dan rojava. Dema bûk birin, di rê de Danişmendiyan bûk revandin û Selçûqiyan dawî dan mîrîtiya wan. **Lê Melkîş li dijî Selçûqiyan serî hilda, welatê xwe rizgar kir û komela xwe ya belav bûyî kom kir**. Yanê ji sînorên Şadiyan heta sînorên Danişmendiyan kete destê wan. Bi Eyyûbiyan re îttîfaq jî kirin, ku wê demê Eyyûbiyan ji Yemenê heta Tîflîsê kiribûn bin destên xwe. Li ser navê xwe û Eyyûbiyan xutbe xwendine û pere çap kirine. Di dema Melîk Mehmût Melkîşî de (1233) gelek êrîşên Ereb, Selçûqî, Menkûçî û Eretniyan pêk hatin. Lê di salên 1257 an de ew mir, kurê wî Melîk Hesen bû serok û di dema wî de gelek êlên din hatin nav wan. Piştî demekê aştiya nav gel xira bû, wî serokî ji êlên Şêrwan, Gîlan û Dînorê îttîfaq xwest.

Di sala 1438 an de Şêx Hesen dibe serokê mîrîtiyê û li dijî Pezgewran gelek tekoşîn dike. Pezgewr ji aliyê Ezerbeycanê hatin û li dora Sêwasê bi cîh bûn û êrîş tanîn ser Çemîşgezekiyan. J. Woods dibêje: Kurdên Çemîşgezekên Malkişî li ser dû şaxên Firat, Mûrat û Qeresû de herêmeka fireh îdare dikirin. Ji Ezinganê bigre heta Dîlokê riyên tîcarî kontrol dikirin. Serokê wan Sarû Şêx Hesen, di şerê navxweyî yê Pezgewran de li alî Hemze bû, lê di sala 1456 an de tevlî Hesenê Dirêj bû. Kurê Hesen Siltan Xelîl Suhrab bi keça Şêx Hesen re di sala 1459 de zewicî.(114-169) Şêx Cuneyt jî alikariya vê komela serok Suhrab kiriye. Gava Hesen va yeka dît, yanê îttîfaqa Kurdan dît, xuşka xwe da Cuneyt. Di vê demê de mirovên Şêx Cuneyt di navbera hikumeta Çemîşgezekê de pir bi rûmet bûn. Piraniya komelê mirîdên wî bûn. Ew jî sersortiya wan dide xuyakirin…Fatîh, Hesenê Dirêj têk bir şunde, xwest welatê Kurdên Çemîşgezek jî bigre, lê Kurdan bi mêranî welatê xwe parastin û Fatîh ji Kemahê derxistin. Ji ber vê sedemê neviyê Fatîh, Yawûz li Tebrîzê serê kurê serok û fermandarê wî jêdike. Di sala 1477 an de Ristem Paşa yê Melkîşî dibe serok û dema wî hemû bi şerê Osmaniyan ve derbas bû. Şerê wan bû şerê du ol û du mezheban. Di vê demê de ji Îranê jî gelek kes dihatin alîkariya Kurdan, lê Osmaniyan dubendî di navbera Kurdan de derdixistin û ew li dijî hev jî şer dikirin û îttîfaqa wan hildiweşiya. Di sala 1501 an de Şah Îsmaîl hat Baybûrtê; ji Hec Ristem Paşayê Melkîşî re got: **Tu vî welatî ji mirovê min Nûr Elî re berde ku em bikaribin bihev re dewleteka mezin ava bikin!**. Bi vê teklife re serok dev ji welatê xwe berdide, tere Tebrîzê û ji Îraq û Xorasanê re dibe rêvebir. Di sala 1514 an de ji alî Yawûz ve tê kuştin û dawî li hikumeta wan tê. Yawûz ji wê malbatê 40 rêvebir kuştin û paşê dewlet kete bin destê Osmaniyan.(101-185) Selîm li ser xaka Osmanî Kurdên Şîa, Şah jî Kurdên sunnî dikuştin. Ji şerê Çaldiranê bi şûnde, Hec Ristem Begê Çemîşgezekê (serokê Kurdên Xorasanê) û 40 kesên din ji serokên Kurd li Çaldiranê xwestibûn ku bi Siltan Selîm re aştiyê çêkin, lê wî bi nemerdî serê tevan birî. Kurdan mezheba Şîa/sersor ji xwe re pejirandin û bi tevahî hevkariya Sefawiyan dikirin.(145-10) Bi dîtina min, Kurdên dervayê welat ew mezheba ji xwe re nepejirandin; yên ku ew mezheba afirandin Kurd in. Di dema Yawûz de jî serokê xwe Hecî Ristem Beg bû, li gel Şah Îsmaîl li dijî Yawûz winda kir û hate daleqandin.(8)

Şerefxan dibêje ew ji sê şaxan pêk tên: nêzîkî 1000 mal ji wan di bin xizmeta Îranê de ne; grûbek din a ji wan jî ketin nav zabitên parêzgerî yên Şah. Qismek ji wan di eyaletan de bûn berpirsiyarên serbixwe. Welatê wan ji alî herkesî ve wek **Kurdistan** dihate nasîn. Ji vê mebest tenê wîlayeta Çemîşgezekê ye. 32 kele û 16 nehiye di sînoran de hebûn û di dema Cengîz Xan, Tîmûr, Şahrûx Mîrza û Qere Yusif de jî ew herêm serbixwe bû.(157-201) Tenê di dema Emîr Yalman de dewlet kete bin zilma Pezgewran, ji bo ku va koma girêdayî Beraniyan bû û ji bo ku bêhêz bîkin çi ji destê Hesenê Dirêj hat dikir.(2) Piştre Şêx Hesen xelk li dora xwe komkir û Pezgewr ji welatê xwe derxistin. Hesenê Dirêj pir hewl de ku fermanrewayên Kurd ji holê rake. Ji bo vê êla Xerbendelû yê şaxekî

Beraniyan bûn şand ser Çemîşgezek û wan ew cîha girtin.[157-202] Wekî em dizanin ew êl/koma jî Kurd in; bi vî awayî wî Kurd bi Kurdan didane kuştin. Eger destê Kurdan têde nebûya mumkun nedibû ku wî careka din herêm bigirta. Îro jî ew polîtîkaya ji alî her dagirkerên welatî me ve tê şopandin…Xaka Melkîşayê weqas fireh bû, ku Kurdistan bi Çemişgezekê ve dihatin heman watê.

Çemişgezekê di sala 1520 an de wek Hikumeteka girêdayî begê beganî Amedê derbas dibe.[39] Begên Çemîşgezek ji koka avakarê Mîrîtiya Pîr Huseyn Beg tên, Pîr, di sala 1515-1534 an de mir, 16 lawên wî hebûn û di nava wan de nakokî derket şûnde, ji Dulqadiran Elî Beg demeke kin derbasî cîhê wî bû. Lê koka wan ji Ebûl Qasim Saltûk II an ji sala 1072-1102 an de destpêdike.[118-37]

Li Dêrsîm û taybetî jî li Çemîzgezekê di defterên Tahrîr de hejmara nifûs heta sala 1541 an zêde dibe, lê piştî wan salan bi awakî dramatîk tê xwarê.[118-29] Ew hejmar kêmbûyîn bê guman bi êrîşên Osmaniyan re raste rast girêdayiye. Her ku êrîş zêde bûn gelê herême tevlî Sefawiyan bû û goçê Aran û Xorasanê kirin. Li ser serhejmarê Prof Unal wiha dinivîse: Li Çemîşgezek gundên girêdayî nehiya Belde, di sala 1541 an de 100 heb in; lê di sala 1566 an de ew yeka dibe 43 heb, sedema wê em qetî nizanin. Dîsa gundên girêdayî nehiya Gunduz di sala 1518 an de 24, di 1523 an de 25, di 1541 an de 27 û di sala 1566 an de 7 gund hene.[118-29] Beşêk ji zenda mezin e bi navê Çemîşgezekê îro li Xorasan e û guman nîne ku ew wê demê çûne. Gor defterên Tahrîr yên Osmaniyan li Çemîşgezekê di sala 1518 an de 6458, di sala 1523 an de 6695, di sala 1541 an de 10.645 û di sala 1566 an de jî 5241 xane şênî hene.[118-55] Ji wir jî eşkere diyar dibe ku nîvê niştecîhan ji welat derketiye. Tenê ji vê herêmê 5.404 xane koç kirine ku ew jî texmînî dike 30 hezar kes. Ewên derketibûn çûbûn Xorasanê, min di beşa Xorasan de jî qala zenda bi navê Çemîşgezek û êlên girêdayî wê kiribû. Di wir û di tabloyan wan de jî diyare ku ew ji gelek federasyon/ konfederasyonên cûda pêk hatine. Ew jî Şadî, Germiyanî, Qeremanî û zendên din in.

Pîr Huseyn Beg ji sencaxa Çemîşgezek 1.717.700 akçe pere digirtin ku gor wê deme gelek zêde bû. Sencexeka Osmanî ya klasîk tenê 400 akçe digirtin. Ew pere ku Pîr digirtin ji meaşê wezîr jî zêdetir bû.[118-142] Gor defterên Osmanî ya di sala 1527 an de; heft mîrên Kurd, wek begên Kurd û Kurdistanê têne qal kirin û dema xîtabê wan dibe: **"sîz"** tê gotin.[118-142] Yanî ji wan re rêz tê girtin û wek birêz/mr tê xîtab kirin. Bê guman ew jî ji hêza wan te.

Ew mîrîtiya di sala 1609 an de girêdayî begê beganî Amedê derbas dibe, lê heta sala 1653 an, tê xuyakirin ku hikumetên navendî li Kurdistanê hatine kêm kirin. Dema Çemîşgezekê di bin serokatiya Hecî Ristem begê Kurd de bû, Ristem ji alî Osmaniyan ve tê kuştin û mîrîtî derbasî Osmaniyan dibe. Yanî di vê sedsalê de mîrîtiyên Kurd hemû bi xwînê hatine hilweşandin û girêdayî Osmaniyan hatine kirin.[39]

## DESTHILATDARÊ KILÎSÊ
## (Mendola)

Pîrika min dema li yekî ji malê bi ya wê nedir, bi hêrs diket, ji wan re wiha digot: "Herê ma Mendola di diya ten..!" ew gotina pîrika min heta sedsala dawî jî bi xwe re anî. Îro em bingeha wê gotinê di mîrîtiya Kilîsê de dibînin.

Gor rîwayetên herî baş û rast, ew pismamên fermanrewayê Hekkarî û Amedê ne. Dibêjin ew sê bira bûne: **Şemseddîn, Bahaddîn û Menteşe**. Fermanrewayên Hekkarî ji binemala Şemseddîn in ku Şemo jî tê gotin. Ji fermanewayê **Amedê** yên ji nesla Bahaddîn-Behdîn dibêjin. **Ji Fermanrewayê Kilîsê yên ji nesla Menteşe ne jî re "Mend"** tê gotin. Mend eskeran kom dike û diçe dikevê bin xizmeta Eyyûbiyan; wan jî, nehiya Quseyre-Antakya danê. Kurdên alî Kilîs û Cum jî ketin bin parêzgeriya wî.(157-250) Bi dîtina min ew beşek yan jî bi temamî ji konfederasyona Milan bûn û bi piştgiriya Eyyûbiyan êlên dora Kilîsê kirin bin desthilatdariya xwe. Di dema neviyê Mend Qasim Beg de, Siltanên Çerkezan hikumeta Kurd dan destê Şêx Îzzeddîn ku Êzîdî bû.(157-250) **Neslê wî Îzzedîn ê piştre wek Oxçî bên xwendin**. Ji wir mirov dikare bibêje ku wê demê Reşî yan jî êlên din ên mina Oxçî, Celikî û yên din li wê herêmê û di bin desthilatdariya Mend de bûn. Ji gotina pîrika min jî diyare, ku ew mirovekî hişk û zilimkar bûye, ku gel ew gotina kevn li ser gotine.

Mend, Êzîdiyên li Quseyrê, Hama, Mereşê û bi Kurdên li Cun û Kilîsê ve dijiyan di bin fermandariya xwe de kom kirin. Di dema Memlûk û Selîmê I de, di navbera Şêx Îzzeddîn û malbata Mend de alozî derketin.(2-104) Mend, Kurdên Êzidî yên li Hama, Mereşê rabûn raperînê têk bir û bû desthilatdarê herêmê.(8) Li wir jî ew gotina pîrika min rast derdikeve; ne tenê ew, em fêr dibin ku Mend êla **Bênam** a girêdayî Reşiyan jî birêvedibiriye û îhtîmaleke mezine ku ew jî têk biribe. Koma Reşiyan, him ji alî nifûs him jî ji alî mîrîtiyên çekirî ve konfederasyoneka mezin bû. Walîtî û mîrîtiya Meletiyê di destê wan de bû. Milê Reşiyan yê bi navê Bênamî li Kilîse ji alî Canpolat Beg ve îdare dibû. Yanî kalên Welîd Canpolatê îro bi nav û deng jî girêdayî Reşiyan bûne.

Emîr Huseyn heta Rekkayê hukmê xwe derbas dibû û birayê xwe Emîr Elî Paşa jî emîrê Helebê bû. Dema şerê Çaldiranê Selîm ji wê malbatê re xeber şand ku ma alikariya leşkerî û xwarinê bidin Osmaniyan. Lê Emîr Huseyn ew bi bahanan derbas kir û qebûl nekir. Bi ser wê de sedrazamê Osmaniyan Sînan Paşa ji vegera Îranê di Kilîsê re derbas bû, birêvebirê Kilîsê Emir Huseyn kuşt. Canpolat Elî Paşa gelek bi wê yeke êşiya û li hember Osmaniyan serî hilda, li ser navê xwe pere çap kir û xutbe da xwendinê. Bi Îtalya re kete tekîliyê û serxwebûna xwe îlan kir. Sedrazamê dewletê Kûyûcû Murat Paşa bû. Bi Canpolat Elî re ketin şerekî dijwar, lê Elî fehm kir ku ewê têk here, xwe avête bextê Siltan Ahmetê I an û wî jî ew şand wîlayeta Temaşvar. Kûyû bi wê yekê gelek aciz bû û bi dizîka ew da kuştin (1607).

Gore salnama Osmaniyan a sala 1856 an, li wîlayeta Kilisê êla Oxçû Îzzeddinlû dijiya û ew eşîreta li Dêrsîm, Kerekoçan û Haymanê heye.

## ŞÊXAN

Li navenda Anadolê, girêdayî navça Polatliyê êlêka bi navê Şêxan e heye. Li gundên Kirşehîrê jî Şêxbilan hene, lê herdû ne yek êl e. Şêxbila girêdayî Reşiyan e; Şêxan serbixwe ne. Li çar gundan belav bûne. Li gelek cîhên din jî ji wê êlê kom hene.

Ew êla hanê di derdora salên 1780 an de ji gundê Ziyaretê yê girêdayî Sûrûçê hatiye û êlên girêdayî jî ev in: Serxaşlar, Seelîler, Kalikiler, Aciacilar, Kemalalar in. Wekî din li Sûriyê jî ew hene. Li Anadoliya Navîn jî li gundên bi navên Şêxa Jorîn (Emîrler Kesîkkavak), Şêxa Jêrîn (Emîrler Eskî Çaliş), Şêxkan (Buyuk Konakgormez) û Hespîra (K. Konakgormez), Polatli, Bala (gundê Sûguzel) û gundê Balçikhîsarê (Hecî Pir Oxûllari /Eyyûb Oxûllari) yê girêdayî navça Eskîşehîrê Mahmudiyê. Ji vê êlê kesên mîna Necmettîn Cevherî, H. Îbrahîm Uçak û Mûstafa Kiliç têne nasîn jî derketine.


**Şêxa Jorîn**

Rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" ji bo bakûrê Kurdistanê hatiye amadekirin de vê agahiyê dide: Şêxan li Hîlwan, Sûrûç, Sîwerek û gundên dorê 7529 kes in; Kurmanc û şafiî ne.(108-338)

Şêxane li çiyayê Kurmêncê ji Birecîkê hatine ku wana bi Amkan ve li rojavayê çiyê rûdinên.(132-16) Li Sûriyê erdê wan di navbera Biyan û Amkan de ye, ji bakûr ve jî Tirkiye heye. Derdora 12 hezar kes in û 75 gundên wan hene. Hinek ji wan gundana ev in: Etmana, Mamila, Qermitliq, Şêx Bela/Bilo, Be-

lelîko, Şengal...di sala 1852 an de bi Biyan re şer kirin û zora wan birin.[132-61]

Seferoglû dibêje: Şihan/Şêxan jî, yek ji çar milên Qerekeçîliyane, îro ketine nava Milan. Qebîlên Şêxikan ev in: Hacan, Mûsikan, Kubatan, Sihimam, Kotan, Davaran, Şixkan û Binkaşim in.[91-71] Ew jî îspateka ku Qerekeçî ne Tirk in û Kurdên xas in. Wekî êlên din ên Kurd, Şêxikan jî gelek belav bûne, beşek ji wan jî li Xorasan in. Beşek ji wan min ziyaret kirin, mirovên mêrxas, Kurdperwer û mêvan hêz in.

Şahvedîxanê Şêxkan, li herêma Çinaran û Radikan bigire heya Meşhedê di bin desthilatdariya wî de bûn. Nadîr Şah ku heman Nadir Quliye, bi xwe ji Kurdên Efşarên di herêma Dîzawend û aliyê Deregez û Qoçanê ye û diya wî ji Kurdên Baçiyan e. Şêxkan bi wî re alîkarî kirin û ew bilind kirin.[145-10] Di sala 2001 an de ez çûm Çinaranê û li wir bi şairê hêja Huseyn **Şêxikî** yê ji êla Şêxika ve me hevdû dît û hîna jî bi hêst û baweriya Kurd û Kurdistanê ne.

Îro di nava Beraziyan de êla Şêxan xuyadike û di nav Kurdên li Lazqiyê yên ku îro asîmîlê bûne de jî êlêka bi navê Şêxanî heye ku heman êl e. Mirov dikare bi rihetî bibêje ku ew êlêka girêdayî konfederasyona Berazî ye û Berazî jî bi Reşiyan ve pismamê hev in.

## OXÇÎ

Di jêderan (Osmanî) de navê vê êlê wek Okçî derbas dibe. Ok/Ox di zimanê tirkî de tê wata tîrê. Di demên berê de ji bo ku vê êlê ji artêşa dewleta Osmaniyan re tîr çêdikirine vê re gotine Okçî. Lê di bingeh de navê vê êlê ne ewe. Wekî heta vir jî me car caran îşaret pêkir ku vê komê bi zenda Reyhanli-Celikî ve têkilî û elaqa xwe heye. Em dibînin ew demeke wek Îzzedînlû, demeke wek Mendola û demeke jî wek Oxçî hatine binav kirin.

Ew koma han, di nava Beraziyan de jî xuya dike. Li Anadola Navîn jî ew di nava Reşiyan de xuya dikin. Gor agahiyên ji defterên tahrîr-nifûsê mane di sedsala XVI an de em Oxçiyan di nava Reşiyên li Kurdistanê de dibînin. Yanê, 500 salên dawî ew girêdayî Reşiyan e. Lê rastiyek heye ku komên bi navê Reşî, Berazî, Celikî-Reyhanli û Oxçî-Îzzeddînlî bi piranî di nav hev de bûne û hemû li kokekî digehêjin hevûdû. Eger mirov bibêje ew di bin sîwana Şadiyan de bûne di cîhê xwe de ye.

Di sala 287 an de li herêma Bedlîs û Mûşê rastî êrîşa birayên bi navê Mamik û Konak hatin. Di Oxûznama Dede Korkut de Slag=Oxçi girêdayî Îl-Begê xwe yê bi navê Oxçi Kozan bûn. Canê xwe bi hatina rojavayê Firat re rizgar kirin û ew ji Oxûzên di navbera Meletî û Helebê de dijîne. Ji 24 êlan pêk tên. Okçû-Îzzeddînlî li Kûrûdaxa li Helebê zivistanan derbas dikin. Di belgeyên Osmaniyan de wek "Konar-goçer Tirkman Taîfesî" derbas dibin û wek milekî Êla Reyhanli tê ziman.[91-69]

Di dema neviyê Mendê Kilîs, Qasim Beg de, Siltanên Çerkezan hikumeta Kurd dan destê Şêx Îzzeddîn ku Êzîdî bû. Dema Siltan Selîm, Qasim û kurê

wî yê 12 salî Canpolat hatin Stenbolê û fermana mîrîtiyê da Şêx Îzzeddîn.(157-252) Piştî mirina Şêxê kor-ocax (bê zarok), dewletê milkê wê mîrîtiyê li alî Antaqya xist ser milkê Siltaniyê (dewletê) û Hikumeta Kurdan ji Melîk Mihemmedê Begê ji binemala Mîrên Heskîfê re berdan.(157-252)

Di salên piştî 1700 an de, ji bo gelek êlên Kurd bicîh kirina li Sûriyê destpê kir, Oxçiyan jî ji wê yekê para xwe girtin û wekî Orhonlû jî dibêje: Gelek êl di sala 1711 an de li Hama û Humusê hatibûn bi cîh kirin. Lê ji ber êrîşên Ereban û şertên cografîk wan nikarîn li wir bijîn û reviyan Kurdistanê. Di sala 1720/1 an de ferman derket ku ew dîsa vegerin. Ew êlana wiha rêz dibûn: Harbende, Sîlsupur, Cerîd, Tacîr Koçeklîsî, Înal, Mûsaca, Oxçû Îzzeddîn û yên girêdayî wan Recep Avşari, Kiliçli Kurdu. Yên girêdayî Dulqadir, Avşar, Anterî, Omerî, Kizik, Yap-altûnê girêdayî Cerîd, Koyûnoglû û Canbegan bûn. Gor fermana di 1720 an de kesek nehate deşta Havran. Paşê gotin ma werin keviya çemê Belîhê. Di kontrola sala 1733 an de hate dîtin ku gelek ji wan li der doran belav bûne. Dîsa jî hewldan ku kom bikin.(90-96)

Oxçî Îzzeddiniyên ku li Çiyayê Kurmenc dijîn, paşê bi Kurdên Keferdûzê ve tevhev li Keferdûzê navçeka din çêkirin û nav danê Îzzeddin. Êlên girêdayî ev in:

| Nav | Cîhê berê lê dijîn | Cîhê ku koçber bûne |
|---|---|---|
| Kosebekiroglû | Kilîs, Dîlok, Heleb | Qeyserî |
| Mudulû | Mereş | Qeyserî, Kirşehîr, Nîxde |
| Serketan/Serikan | Heleb, Mereş | Sêwas, Semsûr.(39) |

C. Turkay jî dibêje êlên Oxçiyan ev in: Kel, Kosebekir, Şêx, Velîoglû, Disim, Mûsabex, Oksuz; civatên xwe jî ev in: Anit, Corikan (cerikan), Disim, Kosebekir.(160) Dîsa heman nivîskar ji bo Reyhanli jî van agahiyan dide: Êla Reyhanli ji van beran pêk tê: Saricaî, Qereahmetî, Tokali, Bahadirî, Kabaklarci, Tonî (Don'lû), Kuralî, Sala û **Okçû** ne. Ji wan Okçû ji Helebê bigre heta Sîs, Edene, Entep, Mereş, Bîga, Kîxî, Rakka, Bîrecîk, Ordû, Antakya, Aydin, Fîlîbe, Nîxdeyê belav dibin. Okçû Îzzeddînî ji êla Killi (divê Keller be) ne û di heman herêmên li jor rûdinên. Oxcûyan jî girêdayî Reşiyan in. Li Semsûr û Meletî dijîn.(160-611) Êla bi navê Orûçgazî Cerîdî girêdayî êla Killû ye û li Mereşê rûdinên.(160-615) Êla Killû hertim bi Cerîd, Reyhanli û Celîkiyan ve tevhev derbas dibe û tê heman watê. Gor rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk vê bi mora "pir pir dizî" hatî amedekirin de jî dibêje: Li Kîxiyê 1200 kesên ji Oxçiyan dijîn, henefî û kurmanc in. Piranî li Qereqoçanê-Depê rûdinên.(108-76) Li Navenda Anadolê û li navça Çîçekdaxi-Kirşehîrê gundên Oxçiyan ev in: Alan, Şorik, Bozlarevî, Golcuk, Konir, Avanoglû û Çokelîk.

M. E. Zekî jî wekî me got di nava Berazan de nîşan dide û dibêje: navê wan Berazî (Biraziye) ne, li aliyê Sûrûcê dijîn û 9000 hezar malbat in. Ji 11 qêbîlan pêk tên. Di nava wan de yek jî Oxçiyan e.(19)

# BERAZÎ

Li ser vê êl an jî zendê Şerefxan agahiyên giranbiha dide: Li saltanata Emewiyan, di destpêka sala 744 an de hevsarê rêvebiriyê kete destê Merwanê Kerr. Piştî pênc salan, Ebûl Ebbas El Seffah li dijî wî serî hilda û bi ser ket. Merwan berbi Misirê ve bazda lê ketin dû û di 750 an de ew kuştin. Merwanî ji ber zexta Ebbasiyan belav bûn, sê lawên Merwan û meriyên wî Filîstin terk kirin û hatin Qulpê û li nehiya Xezeliyê bi cîh bûn. Êla Banûkî jî li dora wan kom bû, ew xurttir bûn û heta Çemê Amedê kete destê wan. Ew xismên wan yên li Misir û Şamê jî hatin û di dawiyê de ev tayîfa han bûn heşt grûbên bingehîn: Banûkî, **Hewêdî**, Dilxêran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zikziyan û **Berazan**. Hinek ji wan şafiî ne, hinek jî Êzîdî ne. Nêzîkî 100 kom û şaxên ji wê zendê koçer in. Ji Merwan, Mîr Îzzeddîn û Mîr Celaleddîn ma.[157-286] Ew êlên Kurdên bi navê Misirî, Şamî gereg wê demê hatibin û ji wan êlên li jor yek e.



**Serokê Berazan-Şahîn**

Behlûl Begê neviyê Îzzeddîn ji dewleta Osmanî re pir xizmet kir, ji bo wê Meyafarqîn ji Qulpê veqetandin û dan destê Behlûl Beg. Baca êlên Besyan, Bociyan û Zîlan jî ji alî Behlûl ve tên berhevkirin. Di seferên Îranê de li gel gelek zilim hatin kirin û ji ber wê êla Silêmanî ji warê xwe barkirin û çûn cihê ji Qizilbaşan vala bû yî. Bi ser wê de xwestin, ku hevsarê êlan ji Behlûl bê stendin, lê êlan serî hildan û bac nedan. Bi ser vê de ji alî Mehmet Paşayê mîrêmîran ê Amedê ve fermana ji holê rakirina êlên Besyan û Bociyan hate dayîn.(157-292) Di beşa Sewêdiyan de jî me qal kir ku ew êla wek Silêmanî jî tê nasîn. Besyan û Boçiyan jî îro li Xorasanê dijîn.



**Emera**

Li ser beşekî Berazî em fermaneka balkêş dibînin: **Ji Qadiyê Riha û Rakkayê re!** Tu ku mîrêmîran î û ji min re name dişînî ku civatên Kor Xizir, Qere Yaxmûr,.....ji civata Berazî Silêman li Qerekeçiyan digihîjin hev, li gundê Hanifî û derbendê wir; eskerên ji wazîfê tên û diçin Rûm û Helebê dikujine û erzakan wan talan dikine...sala 1019-1606.(161-62) Ji wir em fêr dibin ku wê demê Berazî li dora Rihayê ne; ku li wir herêmeka bi vî navî jî heye. Dema kalê min digot em ji Berêz hatine, me nedizanî ku li dora Rihayê cîhekî bi vî navî heye. Ya din jî ew êrîşê gundên henefî dikirine ku tê wê watê ew yan Sersor yan jî Êzîdî bûne. Bi Qerekeçiyan ve jî têkiliya wan baş bûye.

M. E. Zekî diyar dike ku ew li dora Sûrûcê dijîn; 9.000 malbat in û beşek jê koçber in, di esas de ew milekî êla Berizanî ne; şaxên xwe ev in.(19-183)

| | | | |
|---|---|---|---|
| Didan | 300 mal | Kefikan | 700 mal |
| Şêxan | 600 mal | Okiyan (Oxcî) | 700 mal |
| Şeddada (Şadî) | 9.000 mal | Milidenbili | 300 mal |
| Maafan | 500 mal | Zervan | 600 mal |
| Pijan | 800 mal | Qeregeçiyan | 500 mal |
| Mir | 1100 mal | ------ | ---- |

Li Qereyazi-Erzirûm û Tûtak a Agiriyê 5500 Berazî hene ku ew şafiî û Kurmanc in.(108-121) Li bajarê Lazqiyê jî: Şêxan, Mûşan, Ûcan (Qoçan), Mamilî, Zirikan, Abdeliyê hene ku ew di salên 1620-1650 de çûne.

Gor Z. Gokalp Li Sûrûç, Mûsil û Kerkûkê dijin û şaxên xwe ev in.[104-27]

| | | | |
|---|---|---|---|
| Abîdîna | Keykanli (Kîkan) | Bicanli | Dinayî |
| Dîdanli | Şedadî | Sîncanli | ------ |

Li keviya Kizilirmak gundekî bi navê **Emera** heye rojavayê xwe Damlacike, başûrê xwe Şereflîkoçhîsare ku gundekî girêdayî Bala-Enqere ye. Gundên din ên Kurd jî Hirfanli, Kekîlîalo, Ekîzler (Gera) jî girêdayê Kamanê ne ku giştik ji êla Pisiyan in û hemû xismên hev in. Di nava Beraziyan de Pijan, Pican hene, bi dîtina min ew Pisiyan jî ji wan e.



**Serokên Kêtikan Besrawî**

Gor dîtina hinek nivîskarên din jî Berazî wiha belav dibin: Li Sûriyê 20 hezar xane Berazî hene. Berên xwe: Alaettîna, Pican, Dinan, Ketkan, Şeddad û Seyhanli ne.[108-367] Di qeydan de Gundê Beraz li di sala 1547 an de li Kolikê 7 xane û kesekî bê mal derbas dibe. Di sala 1560 an de ew bû 9/2.[109-61] Berazî-Burazî jî berê xwe ev in: Aladdin-Sarkinti, Beyhan, Asiyan, Doktîkan, Dida, Dodan, Ohyan, Ohyanûsiyan, Şêxan, Şeddad, Şeddadfer, Zarvar in.[160] Gor lêkolînên min kirî jî îro li Sûriyê ew êlên Berazî ye hene: Akûzan, Eledînan, Elîzeran, **Ebereşikan**, Meafan, Mîran, **Îstîkan**, Kêtikan (serokê xwe Besrawî ye û berên xwe ev in: Qerîşan, Pirçan, **Qeremdaliyan**, Tarpûşan, **Sîciklî**), **Oxan**, Pîjan, **Reşwan, Zirîkan, Şêxan, Şedadan, Mûsikan**, Zirvalan e.

Li bajarê Qobanê jî belavbûna wan wiha xuya dike: Berezan (serokê xwe Bozan Beg) Mîran, Meaf, Alêdînan, Zîrwar, Pîjan û Şêxan. Kêtikan jî wîha ne: Qerîş, Qeremdalî, Beşaltî ne. Ox û Şeddadan jî wiha ne: Ox, Şeddad, Asî,

Elîzer, Zoncikan ne. Wekî tê xuyakirin navên balkeş di navê de hene. Wekî Îstîkan, ku navê Îskîtan tîne bîra mirov û ne dûre ku ji wir jî tê... Dîsa Sicîklî, nêzî navê Sincika Xorasanê û îhtîmaleka nêzîke ku heman êl in. Reşî, Zerikan, Şêxan, Şadî û Mûsikan jî li Anatoliya Navîn û her cîhê din hene; ew jî dide xuyakirin ku ew êlêna çiqas nêzîk ketine nava hev…

## DIMILÎ/KE –KURDASÎ
## (Erkeciga-Hilkecik)

Li navenda Anadolê, bajarê Aksarayê Kurdên bi zaravê Kirmanckî diaxifin jî dijîn. Li vî bajarî ji bo Kirmanc-Dimilî-Zaza navên mîna Canî, ji zimanê xwe re jî dibêjin **Kurdasî û Dimilîke**; ji bo Kurmancên li wir jî navê Qilorî-Qilêrî bi kar tê. Qilêrî wekî berê jî min nivisî ew ji êla Sewêdî tê. Gor baweriya Sewêdiya ji ber bacê fîlîkên bizinan yê didane dewletê û wan jî di wata kesên fîlîk dide de bi tirkî **"Qil veren"** gotine û nivîsîne. Lê di bingeh de, ti êlên bi vî navî jî nînin. Nivîskar û lêkolînêrê herêmî bîrêz Memê Hilkecikî dibêje: Li Aksarayê navê Ekecik bi navê Kurd ve di heman watê de bi kar tê û nêzîkî 50 hezar Kurd li wir dijîn (Yavrûvatan Hilkecik Kürtlerînîn Serüvenî)."



**Gundê Kelebalta - Aksaray/** Foto: Omer Yuce

M. Hilkecikî: Ew Kurdana herî kêm 300 sal in hatine Aksarayê. Giştik dibêjin em ji Amedê hatine, lê **ewên nezan û bi piranî jî kal û pîrên xwendin û nivîsandina wan nîne dibêjin em ji "Asya Navîn" hatine**. Ew gotina nîşana propaganda nijadperestî ya di nav gel de cîh digre nîşan didin, dibêje. Lê heta vir min di gelek beşan de da xuyakirin ku Kurdên Kirmanckî axif jî ji navenda Xorasanê hatine. Ji bo wê gotina mezinên nêzan bi tevahî ne şaş e, berovajî wê raste; lewra ew ji kalên xwe bi zarkî/devkî fêrbûn ku ew ji Asya Navîn hatine û me heta vir hewl da ku wê îspat bikin. Dîtina din ê ji Amedê hatî jî raste; lewra ew êlêna ji Xorasanê hatin bakûrê Kurdistanê bi şûnde li Amedê bi cîh bûn û ji wir jî hatin şandinî Anadola Navîn.

Piştî hatina Tirkan ya berbi rojava û hilweşandina dewleta Şadî ya Kurd, em şopa Kurdên Kirmanckî axêf peyda nakin. Ew jî ji nav guhartina Osmaniyan tê; ji bo ku navê hemû êlên Kurdan guhartine, ji bo peydakirina wan gelek zahmetî derdikevin. Yek ji êlên herî zahmet ji bo derdikevin jî ew beşa Kurdan e. Lê piştî sedsala XV an êdî mirov dikare şopa wan bibîne. Wekî birêz Alakom dibêje:

Piştî zeptkirina Stenbolê, 1453, Kurd ji Aksarayê hatin ajotin wî bajarî û navça Aksaraya li Stenbolê damezirandin. Di wê demê de, di 1469 an de jî gundên Kurdan li Anadolê hebûn. Di dema Fatîh de jî gundekî bi navê Kurtler li Aksarayê hebûn. Dîsa di wê serdemê de navê mezreyeka bi navê Danişmendlû derbas dibe û ew gundê Kurtler jî di tapoya wî de ye.(126-38) Bi texmîna min ew êla han di jêderan de bi piranî wek "...**Kurd**..." hatiye bi nav kirin. Di nava êlên Tirkmenên Helebê û Boz Ûlûs de jî êlên bi vî navî hene. Birêz Hilkecikî dîroka êla xwe heta Qeremaniyan jî dibe. Texmîna min ew mumkune; lewra di nava Qeremaniyan de şopa wan tê texmîn kirin. Ew êlên wek Kurd tên xwendin jî bi piranî bi Qeremaniyan ve ne.




**Gundiya li Aksarayê-Tirşik** / Foto:Omer Yuce

Em dikarin dîroka Kurdên li wir heta Qeremaniyan bibin. Du delîlên wê hene: Yek, Şikarî yê dîroka Qereman Oxûllari nivîsî di rûpela 132 an de dibêje: Alaeddîn Begê Qereman ji Kurd, Tirkman, Moxol û Qeremanan 42 hezar esker kom kir û şand ser dizên li Kela Sivrîhîsarê. Ya din; Fatîh di sala 1469 an de Aksaray ji Qereman Oxûllari stend û tevlî Osmaniyan kir. Ji wan navên çend gundên Kurd jî derbas dibe, îro jî ew gundana hene û berê jî ew di destê Qeremaniyan de bûn. Di deftera "Deftera Fatîh" a ku di sala1476 an de hatiye

nivîsîn û niha li Enqerê ye de navê gundê Kurd Şêxan derbas dibe. Di destê Qere Şamazê ji gundê Çavdarli de berata (tapoya) ji Fatîh de mayî hebûye û di wê de bi cîh kirina Kurdan ya li Aksarayê dihatiye nivîsîn, lê sala 1970 ji Stenbolê du kes tên û wê dibin. Di dewra Beyazîtê II an de û di deftera 565 an qeydên qedîm de, weqfên di 1500/1 yên li Qereman û Qeyserî û Îçelê de gundên jor û gundê Borûcû jî derbas dibe. Di dema Yawûz de û di deftara hejmara 40 an de (Îstanbul-Başbakanlik Arşîvî) jî navê çar gundên din ên Kurdan derbas dibe. Vana: Gundê Kale, Alayî, Saxir Qaraca û Gelesûn in. Di dema Kanûnî de jî ew berdewam dike. Di dema Muratê III an de jî ew gund derbas dibin: Ekecîk, Agin, Çavdarli-Çavşîr, Tepesîdelîk, Saxir Qaraca, Qerekûyû, Gundê Mîr, Kurdler... (M. Hilkecikî).

Şemsettîn Samî di sala 1306 an hicrî de, di "Kamûs-ul Alam" de dibêje: Aksarayê heft bûcaxên xwe hene û ji wana **Kurd-lû û Ekecîk** jî dinivîse û dibêje hinek ji gelê wan bûcaxan Kurd in û ji êlan in.

Cemeeta Seyfler a li Aksarayê nîştecîh, di sala 1779 an de serî li dewletê da, ku bibin derbendvan û daxwaza wan hate qebûl kirin. Di sala 1796 an de ji êla Melîklî Bayadi jî hinek wek derbendvan hatin bicîh kirin.(156-100) Îhtîmaleke ku Seyfler Sewêdî bin.



**Du kal û pîrên ji Aksarayê** / Foto:Omer Yuce

Gorî salnama Osmaniyan di sala 1856 an de, li Liva-i Qonya êlên bi navê **Kureyş Divle û Kureyş Ozu** derbas dibin. Êla Kureso ya ku li Dêrsîmê

dijî, dibêjin em ji Qonyayê hatine. Ev êla jî bi êrîşên Tataran yên li hemberî Xorasanê, ji wir koç kirine û hatine Mêrdînê. Ji wir jî derbasî alî Qonyayê û ji wir jî derbasî Dêrsîmê bûn û beşek jî bi navê Xido Sur derbasî Semsûrê bûn.[39] Mumkune ku ew Dimiliyên li Aksarayê ji binemala Kureso bin. Lewra agahiyên birêz Kocadax dide jî wê bi hêztir dike. Kureyşan ji Xorasan hatine, li Dêrsîmê belav bûne. Ew ji êlekê zêdetir dergahek e û êlên din ji nava wan derketine û dedên xwe navdar in. Alî Kemalî wan wiha beş dike: Huseynan, Gulnan, Kalyan, Valyan, Aliyan, Heman, Silêmaniyan, Çitan, Gudan, Seykan, Gaziyan.[17-220] C. Turkay jî agahiyeka cûda dide: Saranli li Palû û Aksarayê dijîn û ew ji taîfe Ekrad in.[160-647] Ew jî Saranli nav dike û bi yên Palûyê ve girêdide. Li Palûyê jî piranî Dimilî dijîn lê çiqas têkiliya wan heye nayê zanîn. Sakaoglû jî dibêje ew li dora Sêwasê bûne. Derwêş Axa dibêje: "Êlên wek Canbeg, Kanli û Zaza 40-50 sal in li vir (eyelata Sêwasê) xwedî milk in û çavên wan ne li firarê ye; ez garantiya wê didim" dema dibêje sal dora 1848 in.[129-182] Yanê, 1800 an de ew êla Dimilî li Sêwasê bûye. Mumkune ku ew êla Kurmanckî axêf jî herdem li cîhêkî niştecîh nema. Ji ber êrişên cûrbecûr, ew jî cîh guhartin.

Gundên li Aksarayê yên Dimilîaxêf ev in: Alaxûn (Alayhan), Borûci, Porneka Mezin û ya Biçûk (Porink), Cûnqilî (Cangilli), Çalê Bekirî, Çekkûr (Çekîçler), Ekecîkgodeler, Kullan (Qereçayir), Ekecîkotû, Ekecîkyenikoy (Navê gundê yekemîn Melê Sûr e, paşê bûyê Yanko), Qereqû (Qerekûyû), Qoyax (Koyak), Canan (Salmanli)




**Salmanli** / Foto:Omer Yuce

Şêxler, Taptix, Kurdalî (Yanyûrt) in. Wekî xuya dike di nav gundên Dimilîaxêf de gundê bi navê Pornekê derbas dibe. Me li pêş dîtibû ku ew Pornek yek ji êlên Pezgewr avakirine ye. Ew xaleka gelek girînge û pêwîste hîn zêde bê lêkolîn kirin û bi zelalî derkeve holê. Di gelek jêderên Osmanî de jî

wek **Texteciyan** derbas dibin. Birêz Omer Yuce li ser gundên Erkeciga gelek lêkolîn kiriye û gor ew dinivîse, kesên ewan gundan piranî ji Amed, Dêrsîm û Çewlîkê hatine.

Ji bo dîroka gundê Alayhan Omer Yuce wiha radigihîne: Pîrên gundê me digotin kalê me ji Tetwanê hatine Amedê. Li wir, wê deme sûrên Amedê tamîr dibûne û ji wan jî baca şîr û hirî-fîlîkê xwestine ku baceka giran bûye. Ji ber wê bacê ew terin Rûmê. Li Aksarayê salekê dijîn lê ji ber vizikan tên herêma çiyayê Ekecîka Mezin û li dora gundên Çavdarlilar û Gokkaya bicîh dibin. Begên êlê li gundê Alayhanê bi cîh dibin. Ji kesên dihatine perê xanê distendine. Paşê ji rojhilat ve êla Qilvêren (-Sewêdî) tê û dibêjin ku ew gunda ji wan re hatiye dayin û di destê wan de belge-fermane heye. Lê ti caran ew nîşan nedane. Ew bi xwe begên xwe hildibijartine.. Çi demê hatine em nizanin. Îhtîmalek ku dema Fatîh Aksaray girt û gelê wir şande Stenbolê bi şûnde hatibin.



**Rafet** / Foto:Omer Yuce

Gundên li Aksarayê Kurmancî axêf jî ev in: Axîn, Alayî, Doqan, Bewek, Camî, Çiwderlî, Seyda Jêr, Duxûz, Sîdûn-Siwidûn, Qilorî, Qeremet, Qele-Qeleko, Xiyrat, Porneke Biçûk, Çavdirli ya Biçûk, Macirkoy, Macarli, Qişla Sor, Reşadiye, Cerran, Qullor-Saraxil, Sûsadî, Depesdelîk, Yalnicevîz in. Kurdên Zozanên Filikcî û Yalnizcevîzê îro heliyane û ciwanên wan kurdî nizanin.

## MÛSKAN

Li navenda Anadolê gundekî bi navê Mûsikan/Mûskan ê nêzîkî bajaroka Polatli û Haymanayê ye heye; gundî dibêjin em Mûsikî ne, lê li ser wê êlê yan jî navî tiştekî nizanin. Hinek ji gundiyan dibêjin em Canbegî, hinek jî dibêjin em Têrikî ne; di nava gundiyan de malbatên ji wan êl-koman hinek hene, lê Mûskan jî heye ku kes tiştekî li ser nizane. Gundî ji alî axaftinê ve nêzîkî Canbegan e, lê ji alî fizikî ve jî nêzîkî Mirdêsî û Sewêdan e.

Yeşîlgoz dibêje: Ji bo wan tê gotin ku ji Etî yan vir ve ew dijîne, ji hilweşandina Hîtîtan (BÎ-1200) wir ve begligên hatin damezirandin yek jî Mûskan e.[39] Eger ew îddea rast be, wê demê Mûskan binemalên Mûşka yên mora xwe li dîrokê xistin e. Me qala wan kiribû. Ji alî din ve di nava zenda Berazî de êlêka bi navê **Mûsikan** heye; îhtîmaleka pir mezine ku ew gunda ji alî kesên ji êla Berazî ve hatiye damezirandin. Malbatên din jî, dûre tevlî wan bûn. Cîh û pêvajoya zenda Berazî tê re derbasbûyî, ew êlên li Anadola Navîn jî derbas bûn û ji bo wê Berazîbûna wan ne tiştekî ecêb e. Bi vê re girêdayî dîtina birêz Yeşîlgoz jî di cîh de ye. Şopa zenda Berazî diçe dîrokeka gelek kevn. Bi vê rêyê mirov dikare îddea bike, ku Mûşkiyên bi nav û deng dibe ku kalên Berazî bin. Bê guman gereg hîn zêde bê lêkolîn kirin.

Gorî belgeyên Osmaniyan, cîhên Musîkan: Erxanî û Rakka ye û wek " Ekrad Taîfesî" tên nîşandan. Balekan û Amînane (Yekê jî Cereban e û yek jî ji Têrikan e ku paşê jê veqetiya) girêdayî Qerekeçîliyan jî qebîleka xwe bi navê Musîkan heye.[91-69] Îhtîmaleke ku Bilikên ku îro li Anadolê dijîn jî berekî ji Qerekeçîliyan bûn…

Di gelek jêderên kevn de ew êla hanê, girêdayî Zerikiyan jî xuya dike ku di beşa Zerikiyan de emê li ser rawestin.

## ZERIKÎ

Li ser navê vê komê gelek rîwayetên cûda hene; lê navekî kurdî ye û ji rengê zer derketiye. Zeri-kî, wekî kesê zer dikeve bîra mirov; îhtîmaleka mezine kesên ji vê êlê gelek kej in û ji bo wê jî bi wata kesên zer ew nava li ser maye. Lewra di nav vê êlê de kesên zer û çavşîn pir in û dema mirov wan bibîne nizane ku ew Kurd in. Bi taybet beşekî pir bejn dirêj, kej û çav şîn di navê de ne ku mirov matmayî dimîne... Seferoglû vê dîtinê tesdîq dike: Di deftera Osmaniyan a Tahrîr de wek "Konar-Goçer Ekrad Taîfesî" derbas dibe. Wata nav zerîne; ku di tirkiya kevn de "Sarig" derbas dibû.[91-72] Zeriya kurdî wergerandine tirkî û kirine sarig. Di nav jêderên Osmanî û tirkî de, navê vê êlê bi 24 awayên cûda hatiye nivîsîn. Wek mînak: Zeriqî, Zerikanlû, Zirokan, Zerniqî, Zerdiqan, Zediqî, Zorkan û hwd.[182-43] Gor vê yekê jî şansa wan heye ku orîjînala peyvê zêde nehatiye xirab kirin. Wekî din jî vê komê li cîhê mayî navê xwe hîştiye. Lêkolînerê ji heman komê Y. Zerikî dibêje: Li cîhê ku êla

me Zerikî nîştecîh bûye, dareka tûyan hebûye û vê re digotina "Tûya Zer" û ji bo wê ji wir re gotine Zerik. Li bakûrê Sûriyê cîhekî bi navê Zerqan heye, ji Dêrîka Mêrdînê re berê digotin Zerik, li Mêrdînê ava Zerqan û nehiya Zeriqan jî heye, berê girêdayî Amedê paşê jî girêdayî Wanê Liwayî Zerqî hebû, herêma di navbera Lîcê-Hezro-Hîzan-Mînar-Sêrt-Erûhê re wek Zeriqan derbas dibe. Dîsa gor xerîtên ji sala 1100 mane de, herêmeka firêh bi navê **Zraq** heye.(182-45)

Dîroknûsê Kurd Şerefxan li ser kok û navê Zerikiyan dibêje: neseba wan digihîjê Erebên Şamê û ji çar şaxan (Dêrzinî, Girdikan, Ataqê-Lîcê, Tercîl) pêk tên. Tê gotin; ku yekê navê wî Şêx Hesenê kurê Seyid Ebdurrehman şert û şirûtên zemanê ew mecbûr kirin ku welatê xwe yê xêr û bereket terk bike û bê welatê Mêrdînê. Şêx Hesen, li wir bicîh bû, dest bi îbadetê kir, ji bo ku her wextê kincên hêşin li xwe dikir, di nav gel de bi navê **"Şêxê Ezraqî"** hat naskirin. Belkî jî çavhêşîn bû û ji ber vê ew nav lê hatibû kirin. Şêx li Mêrdîn gelek kes li dora xwe komkir û Siltanê demê jê tirsî; lê paşê bi xwe jî bû mirîdê wî û keça xwe lê mehr kir.(157-265) Şerefxan jî şaşitiya nûserên din dike; îhtîmale ku ew di bandora yên din de jî maye, lê rastî ewe ku ti têkiliya Zerikiyan û Ereban ve nîne. Ew jî wek êlên din ên îro li dervayê welat ji navenda Xorasanê hatine. Pirsgirêk ewe ku em tam nikarin tespît bikin, ku dema cara yekemîn ew hatin li ku bi cîh bûne. Îhtîmaleka pir mezine ku ew li bakûrê Sûriyê yan jî li dora Şamê bi cîh bûn. Ya herî zêde nezikî rastiyê jî ewe; ku ew di navbera wan herêman de zivistan û havîn derbas dikirin. Ew şaxê vê koma li Lazqiyê jî divê binemala wan bin. Heta tê gotin ku malbata Hafiz-Beşar Esat a li serokatiya Sûriyê dike jî Kurd in û ne dûre ku Zerikî bin. Nivîskar Ebdul Ezîz Omer H. Mûsa radigihîne ku li çiyayê Elewiyan (Lazqiyê) êlên weke Abadli, Koçan, Zirikan (ew di dema Selheddîn de çûne-1320-1350), Şêxanî, Mamle, Mûşan. Ji bilî Zirikan, yên din di dema Selîmê I an de çûne.



**Fîrdewsa Mihê Ûsê-Zerikî**

Li ser dîroka Zerikiyan Hoko dibêje: Zerikî di dema kevn de li Mêrdîn, Mûsil û li Zaxrosan jiyane; dibe ku ew jî tevî koma ji Xorasan hatine başûrê Kurdistanê bûn. Gor gotina "Um el Iber", ew li Sîncar, Amed, Mêrdîn û Nisêbînê hikumet ava kirine. Êlên girêdayî vê komê jî wiha xuya dikirin: Aştiyan-Aşûtan, Mihraniyan, Bexosiyan, Beciniyan, Şeqakiyan-Şikakiyan, Estorkiyan, Gurdiliyan, Aşaniyan-Eyşaniyan, Kişkiyan, **Çêlkiyan**, Xende-qiyan-Xan Baqiyan, Suhaniyan, Mehmûdiyan, Keşaxiyan-Kaşaxiyan, **Mûsiyan**, Serbariyan-Sarbariyan in. Çêlkiyan bi Celikiyan ve têkiliya xwe heye yan na em nizanin; lê Mûsiyan di nava wê komê de jî xuya dikin. Ev êlêna di sala 900 an de di bin hikumeta xwe de dijîn. Mehmûdî di nava wan êlan de hevkariyê pêk tînin. Ji berê ve Mehmûdiyan bajarê Mûsil di destê xwe de digirtin. Ji tirsa hêza wan, xelîfê Ebbasiyan nikarîn tiştekî bikin û bi leşkerekî pir êrîşî wan kirin. Mehmûdî ji welat veqetîn çûn Wan, Erdîş, Warê Berana (Mûş, Xinis, Melazgir, Xelat, Motikan) hildane destên xwe. Serok Bad di sala 950 an de Erdîşê, di sala 984 an de jî Amîd-Amed, Mêrdîn û Farqînê dike din desthilatdariya xwe. Di sala 1282 an de serok Fîrozşahê Ziriqî giliyê hozên bi navê **Zaferanî** yê bi Eyyûbiyan kiriye; fermanrewanê Eyyûbiyan li Xerpûtê dijiyan. Ji vê jî xuya dike ku vê serdemê ew komana hîna tevhev nebûne; ewê piştre tevhev bibin û herin Xorasanê.

Nafî'î kurê Ezraqî henefî, ku **Ebû Raşîdiyan** jî jê re digotin, ji Xarîciyan bû û mezhebek nû danî. Di destpêkê de bawermendên wê mezhebê kêm bûn. Pişt re wisan lê hat, li Ehwaz û gelek cîhên Îranê piştgir jê re çêbûn. Li ser fermana Ebdullahê kurê Zubeyrê Gizîrê Besrayê, Ebdullahê kurê Hers Xuza'î li dijî wî rabû û li ber şikest; çend carên din hatin ser lê pê nikaribûn. Di dawiyê de Muhellebê kurê Ebû Sofre yê mîrê Xorasanê ew belav kirin. Nafî'î bi cinişînê wî ve kuştin û dest li ser wan ranekirin. Heta dema Ebdûlmelîkê kurê Merwan û Heccacê Gizîrê Îraqê jî her li dijî wan disekinin. Ezreqiyan Qeterê kurê Fucae kirin serokê xwe û piştre di nav wan de dubendî çêbû. Ebdurba Mezin, bi 7000 û Ebdurba Biçûk bi 4000 kesan cihê xwe terk kirin û berê xwe dan **Kirman û Qeterê** û di nav farisan de man û Muhalleb zora wî bir û ew jî ber bi Kirmanê ve çû. -C. Rojbiyanî.(157-498) Di wir de tiştê balkêş yek ewe; ku leqaba serokê Zerikiyan Raşîdiyan bûye ku nêzîkî Reşiya ye. Ya din tarîx nîne.


Farûk Sumer jî dibêje: Di sala 1185 an de gelek Tirkmen hatin rojhilat û başûrê rojhilatê Anadolê; ew li Riha, Mûsil û Rakkayê zivistan derbas dikirin. Ji nişkeva derketina wan nîşan dide ku ew ji Xorasanê hatine.(131-159) Lê heman nivîskar di rûpela 127 an de dibêje komek di sala 1048 an de hate Îraqê. Yanê hatina wan ne ji nişkava ye, bi hatina Tirkan re ew bûn du şax û yek ji wan hate başûrê Kurdistanê û ji wir jî hatin bakûre Sûriyê. Yên ku hatin dora Sûriyê, zivistanan jî diçûn dora Serhedê ku beşek ji wan Zerikî bûn. Sumer wiha berdewam dike: Ji Harîzmı Şahan Siltan Şah, Seraks a di dawî de di destê Oxûzan de mayî jî stendibû û Oxûz bela bûbûn. Li ser wan Ristem Beg hebû. Di navbera wan û Ekrad an de jî şer derket û Tirkmen bi serketin. Tirkmenên

Ristem dema diçûn zozanan êrîşî Gurciyan dikirin. Beşekî mezin ji wana ketin bin desthilatdariya lawê Kiliç Arslan, Kudbettîn Melîk-şah ku waliyê Sêwasê bû.[131-159] Ez bawernakim ku ew Zerikiyên îro li Sêwasê dijîn ji wê demê mabin; piştî vê bicîh bûnê jî gelek koçberî û hatin pêk hatin.

Zerikî, li destpêka dîroka Beraniyan yek ji zenda alîkariyê didaye wan bû; piştre Beranî lewaz bûn û Hesenê Dirêjê Pezgewran bi zewacê xwest Zerikiyan bikşîne aliyê xwe, lê dîsa jî bi serneket. Dema Huseyn Beg bû serokê Beraniyan, ji Mûşê (Zevzen) veqetî û çû Bişêriyê. Ji mîrên Kurd bi taybetî jî yê Heskîfê Melîk Adil û yên din bac, xelata mîrîtiyê xwest lê negirt û kesek nihat erda wî ku wî pîroz bike. Bi ser vê de Melîk Beg dizanî ku Huseyn beg ê tola vê heyne û dest bi amadekariyan kir. Ji Kurdan esker komkir. Di nava wan de desthilatdarê Bedlîsê Ziya ud-dîn, birayê wî û hakimê Mûşê Şemseddîn û **begê Farqînê Zirkî Şêx Îzzeddîn B. Şêx Zeydo** jî hebû. Di sala 1349 an de nêzîkî Batmanê şer derket û Melîk Adîl têk çû û dîl ket.[110-39] Di dema Beraniyan de tişte balkêş êlên îro li dervayê welat bi Beraniyan re dikevin tevgerê ye; bi taybetî yên hîna misilmantî qebûl nekiribûn. Bayram Xoce yê Beranî di sala 1371 an de Mûsil dorpêç kir; di wê hewldanê de eskerên Heskîfê jî hatibûn alikariyê. Ji Xoce bigre, hetanî dawiyê emîrên Heskîf, Cizîr, Bedlîs, Zirkî, Silêmanî û Kurdên din, bi Beraniyan re girêdayî man.[110-42] Qere Yûsûfê Beranî ji Sûriyê bi 1000 leşkerî vegerî Nisêbînê. Li wir rêvebirê Mêrdînê, hakimê Cizirê, êlên Silêmanî û Zirkî tevlî bûn şûnde, di navbera Mêrdîn û Heskîfê de li herêma Taki bi Pezgewran re, Qere Yûlûk Osman re şer kirin, lê ti encam jê derneket û aştî kirin.[110-68]

Wekî Yûsûf Zerikî jî radigihîne: Zerikî wek mîrîtiya serbixwe di sala 1100 de derket holê; heta salên 1520 an bi Pezgewran û Artûqiyan re şer kir û wê demê girêdayî eyeleta Wanê bû û serokê xwe Mehmet Beg bû.[182-46] E. Xemgîn dibêje: Şêx Hesen li dora Mêrdînê pesna ola xwe dida. Rêvebirê herêmî ew girt, gel jî nerazîbûna xwe nîşan da, ew azad bû. Di heman demê de rêvebir mir û gel jî ew wek serok hilbijart. Lawê xwe Habîl wek beg şande Derzînê. Law û keça Habîl ketin rewşeka xirav û kurê xwe şandin herêma Girdikan û begên Girdikan ji wê kokî ne. Begên Atakê (Lîcê) jî ji Zerikiyan in û begê xwe yê yekemîn Ahmed bege. Tercil (Hezro) jî gelê Zerikî ye. Hesenê Dirêj, Omerê Zerikî ji Bedlîsê re kire walî.[101-188] Hesenê Dirêj dixwest welatê xwe berbi rojhilat fireh bike û bi Beraniyan re cara dawî şerekî bike. Lê pêwîst bû, berê Kurdên di navbera wan de bike bin fermana xwe. Hakîmê Tercil û Atakê yê Kurd Omerê kurê Huseyn Beg pir girêdayî Hesen bû. Weqas ku erdê xwe û keça xwe da Hesen. Lawê Hesen ê yekemîn Zeynel ji wê jinikê bû.[138-419] Siyaseta Hesen li destpêkê, ji dagirkirinê pirtir lihevhatin bû. Paşê bi riya zewaca bi keçên Bûldûkanî (Têrikî/Mirdêsî) û Zerikiyan re xwest van bi xwe re girêbide, lê vê yekê aştiyeka mayînde û îstîkrar nanî. Wek Zarakî, di tekoşîna nav biran de, cend caran li hember Hesen derket lê di sala 1460 an de careka din sonda girêdana bi Hesen re da.[114-169] Cedê wan Elewî ne û di dema Artûk (1122) de

hatin Mêrdînê. Bi Artûkoglû û Pezgewran re xisimatî çêkirin. Çar şaxên wan hebûn.(142-29)




Di 1390 an de belavbûna Zerikiyan / Yûsûf Zerikî

Lê di dawiyê de Qere Osmanê Pezgewran, bi alîkariya Şahrûh artêşa Beranî belav kir bi şûnde, Çemîşgezek kire bin destên xwe û riyên Memlûk jî bi vî awayî kire bin kontrola xwe. Di sala 1424 an de Farqîn, Tercîl ji destê Kurdên Silêmanî û Zerikî hatin wergirtin.(114-91) Ew taqtîka Hesenê Dirêj û dewleta wî bû, ku bi riya zimanê xweş û zewacan mîrîtiyên Kurd girêdayî xwe dikir; dema bi hêz bû jî, hemû bi darê zorê kirin bin desthilatdariya xwe. Her çiqas erdê wan hatibe stendin jî, ew li welatê xwe man. Di dema Sefawiyan de jî ew li ser axa xwe ne.

Herêma Derziniya girêdayî Begê Zirkan, di dema Emîr Hemze de girêdayî Sefawiyan bû; di dema kurê wî Emîr Muhammed de bi Osmaniyan re hate girêdan. Lê di dema kurê wî Şah Kulî, di sala 1511 an de li hember Osmaniyan û polîtîka wan a li hember Kurdan serî hilda, lê têk çû û kurê wî Yakûb Beg hate cîhê wî. 25 salan desthilatdari kir, kurdî helbest nivîsîn û dîwana wî heye. Cîhê xwe da kurê xwe Nûman, lê di şerê Şîrvanê de Sefawiyan ew û gelek mîrên din ên Kurdan kuştin. Di sala 1579 an de Muhammed hate rêvebiriyê. Ji bo ku salê wî biçûk bûn, Girdikan êrîşî wan kir. Herêma Girdikan a Zirikî xwe bi Osmaniyan ve girê da. Zirkanê herêma Atakê di dema Emîr Ahmet Beg de bi Osmaniyan ve hate girêdan. Ahmet mir şûnde li ser mîrnîşînê sê kurên wî lihev nekirin û çûn Stenbolê. Osmaniyan welatê wan kirin sê beş. Paşê Atak raste rast bi Osmaniyan re hate girêdan.(100-300) Di nava gelek mîrîtiyên Kurd de mixabin ew ne lihevhatina birayan gelek caran tê dîtin. Di beşên berê de jî me diyar kiribû ku ew bû sedama gelek êş û windahî yên welatê Kurdan.

Piştî şerê Çaldiranê hêzên Safewî dîsa hatin Amedê û bajar salekê dorpêç kirin. Hêzên Kurd û Osmaniyan, ew piştî salekê ji wir avêtin. Safewî vekişiyan Mêrdînê. Li wir gelek li berxwedan. Di sala 1517 an de, Husrev Paşayê Osmanî bi Qerehanê Safewî ve li hember hevbûn. Şeş hezar eskerên Husrev Paşa li milê rastê bûn. Li milê çepê jî Îdrisê Bedlîsî, Emîr Xelîle Eyyûbî, lawê wî waliyê Sasonê Şeref, emîrê Egilê Qasim, waliyê Numeyranê Dawid, waliyê **Atakê Ahmet Zerkî bey**, serokê êla Şîrvan û Biyikli Hesen Paşa jî li navê bû. Sefawiyan şer wenda kirin. Bi vê re Erxanî, Sincar, Tilafar, Çêrmûk, Sîwerek, Bîrecîk kete destê Osmaniyan. Piştre careka din êrîşî Mêrdînê kirin û kirin bin destên xwe. Bi vê re kelehên mîna Riha, Heskîf û Rakka jî girtin.(19 82) Wê demê jî em dibînin ku Zerikî mîrîtiye û ew girêdayî Osmaniyan e.

Kanûnî ji sefera Bexda vegerî bi şûnde, êlên Kurdên ku ji ber zilma Yawûz çûbûn çiyayan re destûr derxist ku ew vegerin cîhên xwe. Gor wê **Koçgîrî çûn Zara-Sêwas ê**; Şahdelî çûn dora Palû û Kîxiyê; Îzol û Hiran çûn cîhê xwe yê berê Pertek ê; Balaban çûn herêma Balaban, Şahveliyan, Kimsoran, Hamoçîk jî çûn deşta Tercanê. Qebîla Sîsan a girêdayî **Çarikli** ya li çemê Kirdim çû dora Xinisê.(17-129) Îhtîmala yekemîn ewe, ku Zerikiyên li Qoçgîriyê ji vê demê mabin. Wekî mezinên Zerikiyên li Qoçgiriyê dijîn dibêjin: "Lawo lawo em taa ji welatê jorîn hatin, lê em kîngê hatine em nizanin."(182-45) Welatê jor Serhede yan Xorasane ew nizanin. Lê gor demê herdû jî rast in. Kanûnî cara

yekemîn di sala 1524 an de çû ser Tebrîzê, wê demê li Erzirûm, Wan û Mûşê kesek nemabû. Cara duyemîn, di sala 1539 an de çû û Dulqadir li Qers, Pasîn û Xarpûtê bicîh kirin. Êlên reviyabûn çiyan jî anîn û li Erzirûm, Kîxî û Xarpûtê bi cîh kirin. Koçgirî hatin Zara; Îzol û Hiran hatin Pertekê...(127-101) Mizgefta Amedê ya bi navê Ûlû Camî di dema Qanûnî de, beşa wê ya bi navê "Şaflîler" ji alî begê Atak Emîr Ahmed Zirkî ve hatiye çêkirin.(137-275) Li ser derî û paceyan kîtabeyeka ji sala 1528-29 an mayî heye ku wiha li ser tê nivîsîn: " ...efendiye kralên Ereb û Ecem, di dema lawê Siltan Beyazît, lawê Siltan Selîm û Siltan Silêman de, ji herêma Amedê û emîrê li Kela Atakê Huseyn Zirkî û kurê wî Emîr Muhammed Emîr Ahmed ev mizgefta nû kir.(137-286)

Di pirtûka bi navê "Kurd û Kurdistan" de tê îddea kirin; ku Zerikiyan, endamekî xwe yê Elewiyê Ereb ji Sûriyê di sala 1122 an de hate Mêrdînê.(2-104) Ew îddea li ser nezanînê û agahiyên şaş neqilkirine hatiye sazkirin. Lewra kesên ji başûr hatine hemû ne mecbûr in ku Ereb bin. Ew Kurd in û li destpêkê bi Artuqiyan paşê jî bi Pezgewran re bi zewacê têkilî sazkirin. Çar mil in: 1. Tercil (Hezro) û Atak (Lîcê) 2. Dêrzinî 3. Girdikan (Amed û MeyaFarqîn).(2-104)

**1-Mîrên Dêrziniyê:**

Emîr Hemze, demek direj li ser fermana Şah Îsmaîl kar û barên Dêrzînê dimeşand. Dema ew mir Mihemmed Begê kurê wî bi fermanrewayên Kurdistanê ve îtaeta xwe bi Siltan Selîm re pêşkêş kir. Piştî mirina Mihemmed kurê wî Elî Beg derbas bû. Di sala 1535 an de li ser fermana Siltan Silêman, Şah Qulî Begê kurê Mihemmed li ciyê birayê xwe rûnişt. Heşt salan serokatî kir, rojekê ji Stenbolê vedigerî, li bajarê Bolûyê rastî Basir Begê Zerikî yê Begê Girdikan hat û di şerê di navbera wan de mir. Piştî wî, birayê xwe Yakûb Beg bi fermana padîşah bû serokê hemû dîwana Zerikiyan. 25 salan serokatî kir bi şûnde kurê xwe Duman Beg da şûna xwe; piştî du salan di şerê Çildar de ji alî Sersoran ve hate kuştin û Mihemmed Beg derbasî şûna wî bû. Niha ku sala 1597 (1005) an e, bi serbixwe fermanrewatiya mîrektiyê dike.(157-267)

**2-Mîrên Girdikanê:**

Habîlê kurê Şêx Hesen Ezreqî, Dêrzîn fetîh kir. Qabîlê kurê Habîl bi keça Habîl re rabû û rûnişt û jê zarokek çêbû. Qabîl ji tirs û şerma bavê xwe re zarok şand Kela Girdikan. Mîrên Girdikan ji neslê wî zarokî ne. Li gor vê, ew kurmamên Mîrên Dêrzinî ne. Mîr Nasirê Girdikanî li ser gundê Minarê yê di navbera wilayeta Girdikan û Dêrzinî de, bi mîrê Dêrzinî re di nav şeran de bû. Di dawî de mîrê Şah Qulî Begê Dêrzinî çû cem Siltan Silêman û fermanek jê stend. Şah Qulî dema ew seh kir çû cem Siltan. Li Bolûyê rastî hev hatin û di şerê derketî de Şah Qulî hate kuştin. Xelkên mîrîtiyê li hember Nasir rabûn û bi 30 hevalên wî ve ew girtin. Ew jî hatin daliqandin. Mihemmed begê kurê Nasir hate ser mîrîtiyê. Nasir Begê Kurê Mihemmed jî hate ciyê bavê xwe. Fermanrewayê Hezzoyê û Zeynel Begê Şêrwî bûn sebeba aştiyê di navbera wan de

û biryar dan ku Mihemmed Begê Zirkî yê Kedxudayê Mihmmed Begê Dêrzinî û musebbîbê kuştina Mihemmed Begê Girdikanî, li Dêrzînê di bin xizmeta wî de nemîne. Mehmûd ji Dêrzinê derxist û çû Bedlîsê.(157-269)

**3- Mîrîtiya Atak-Lîcê:**

Dameziranerê xwe Ehmed Beg kurê Mîr Mehmûdê Zerikî ye; Ehmet Beg bi xwe jî hevçerxê Şah Îsmaîl Safewî bû. Dema Şah Îsmaîl dora Amedê heyna ji dest wî jî kela Atakê girtibû û teslîmî êla Qaçar kiribû. Zirkiyan ew deran terk kirin û çûn cîhen din. Piştî şerê Çaldiranê Zirkî jî vegeriyan û li dora herêma "Milh" ku nêzîkî Atakê bi cîh bûn. Serokê Qaçaran sedama wê pirsî, wan jî got: "Ji berê ve di navbera me û Mirdêsiyan de dijminatî heye, ne dûre ku ew êrîşî me bikin, ji ber wê heta roja hewa germ bû destûr bidin ku em di wê kela kevn de bimînin." Piştre me derence çêkirin û şevekê ketin hundirê kelê û hemû Sersor kuştin. Ehmet Beg jî, wek serok naskirin. Bi mirina Ehmet Beg re kurên wî (Şahîm, Yûsif û Mehmûd Beg) ji bo welat li hev nekirin û çûn deriyê Osmaniyan. Siltan Selîm jî di nava wan de parve kir û hinek jî kir bin milkê dewletê. Pişt re giştik kete ber destê Osmaniyan.(138-487/157-270) Ji Emîrê Heskîfê bigre heta ya Îmadiyê û Zirkî Ahmed, tevhev 25 begên Kurdistanê cîvîn û biryar wergirtin ku li dijî Sersoran di serokatiya Îdrisê Bedlîsî de şer bikin. Ahmedê Zirkî êrîşî kela MeyaFarqînê kir.(138-493) Ahmed Beg mirovêkî li dora Amedê bi seyidî û taybetmendiya xwe dihate nasîn.(138-494)

Emîrê Atak, Ahmed Beg, Ûlû Camiya Amedê ya hêla şafiyan jî beşek di sala 1528-9 an de tamîr kir. Li ser kîtabek hatiye nivîsîn ku di nava gel de ew wek "Şêx Hesen-i Ezrakî" tê nasîn.(138-611)

Rêvebirî û hatina Atakê, di nava sê birayan de parve dibû. Ji wan birayan Mehmûd mir bi şûnde, lawê xwe Kubat derbasî cîhê wî bû. Di dema begêbegan Ristem Paşa de (1540-43) Şahim Beg bi îxanetê hate tawanbar kirin û bi fermana Kanûnî ew hate lidarxistin. Piştî wê Atak ji destê begên Zirkî hate girtin. 20 salan bi şûnde Siltan Silêman, bi şerta hilweşandina kela Atakê rêvebirî da kurê Ahmed Yûsûf. Ew mîrîtî di dema Fatîh de di destê Welî Beg de bû û heta sala 1597 an dîroka wan tê zanîn, piştî wê dîrokê em tiştekî nizanin. Neviyên wan îro bi paşnavên "Işik, Alparslan û Atalay" derbas dibin.(138-610)

**4- Mirîtiya Tercilê:**

Di eslê xwe de ji koka Zirkiyan, Tercîl û Atak e. Tercîl du keleyên xwe hene: yek Tercîl e yek jî kela Dar'ayn-Dêr Zêr-Dêr Zin. Dêrzinî û Girdikan jî du şaxên Tercîl û Atak in. Dema Seyid Hesen ji Şamê hate Mêrdînê, li nehiya Ataqê bicî bû û dest bi îbadetê kir. Ew dem, Emîr Artûqê kurê Ekseb li ser navê Selçûqiyan rêvebiriya hikumeta Amed, Mêrdîn, Xarpût, Micengerd û Heskîfê dimeşand. Keça Ekseb nexweş ket, Şêx ew rind kir û paşê dan kurê Şêx Seyid Hesen. Ekseb, nehiya Tercîlê jî da Hesen. Paşê kurê wî Omer hate ser text. Omer, hevçerxê Hesenê Dirêj ê Bayindirî bû. Keça Omer dane Hesenê Dirêj. Di

sala 1508 an de Şah Îsmaîl Amed îstîla kir, li ser textê Tercîlê Ehmed Begê kurê Bûdakê Omer hebû ku ji alî Qizilbaşan ve hate kuştin. Heta serdema Muratê IV an ew der di destê Zerikiyan de bû.(157-274)

Dameziranerê xwe Seyyîd Huseynê kurê Şêx Hesenê Zirkî ye. Huseyn bi keça emîrê Artûkî re zewicî bû û Tercil ji wî re hatibû dayîn. Şûna wî jî Omer hate ser text û bi keça wî re jî Hesenê Dirêj zewicî bû.(138-488)

Tercil a Zerikan jî di dema Şemsî Beg de bi Osmaniyan re hate girêdan. Di dema kurê wî Heyder de, li Çildirê li hember Sefawiyan û li alî Osmaniyan şer kir û mir. Di dema Muratê IV an de, di birêvebiriyê de Omer Beg hebû û Begê Began yê Amedê ve têkiliya xwe baş bûn.(100-310)

**Mirîtiya Qulpê**:

Li vê mîrnîşînê êlên mîna: Silêmanî, Banûkî, Hewêdî, Dilhiran, Bociyan, Zîlan, Besyan; Zikziyan û Berazan dijîn. Di dema Sefawiyan de bi rêya dengdanê ew êlana ji alî Emîr Diyadîn ve dihatin birêvebirin. Diyadîn bi Ûstalcû Muhammed ve di nava danûstandinên baş de bû, ku keça xwe Bîkes Xanim dabû Diyadîn.(138-489) Ew êlên ku navê xwe derbas dibin hema hema bi tevahî li Xorasanê ne.

Di şerê dagirkerên Kurdistanê de pir mixabin ku êl û eskerên mîrîtiyên Kurd, di herdû aliyan de herdem li pêş bûn. A. Tanerî ji vê yekê wiha dinîvîsîne: Dema artêşa Osmaniyan diçû Ecem, artêşa Silêman Xan pêşengî dikir. Herî pêş Pînyanîş, piştî wan pêşêngen Mehmûdî (Wan) û piştî wan jî yên Hekkarî dihatin. Artêşa îslamê bi wî awayî kom dibû: Li milê rastê ji Kurdistan Îsbîrît, **Zerikî**, Karnî, Hîron, Karkar, Axakîs, Kesan, Mekes, Berdix, Ladik, Benîkutur, Ozecik, Çobanî û Dîegrar. Li milê çepê jî: Lamûs, Adîlcewaz, Erdîş, Bargirî, Bazîd, Akçakale, Çatak, Ekradmagû, Ziyaeddîn bûn.(89-126) Hema yek li aliyê Ecem ve jî wek wê bû û êlên Kurdên Sersor li pêş bûn û Kurdan hevûdu qir dikir.

Piştî gelek şerên bi Îranê re sîstema îdarî û ya mîrîtiya Kurd jî hate guhartin. Mîrîtiyên berê yên bi tevahî serbixwe bûn bi Osmaniyan re hatin guhartin; otonom bûn û destê Osmaniyan hîn zêde dirêj bû kete nava Kurdan. Pêşengê wê jî Îdrisê Bedlîsî bû ku Amed kire 19 sencaxan; ji wana 11 raste rast bi rêvebirên Osmanî re hate girêdan. Yên din jî di rêvebiriya begên Kurd de, girêdayî Osmaniyan û otonom bûn. Vana: Samxan, Qulp, Mîhraniye, Atak, Pertek, Çapakçûr û Çêrmûk bûn.(19-85) Wekî xuya dike, Ataka Zerikî otonome.

Piştî sedsala VXI an em Zerikiyan li dora Semsûrê girêdayî Reşiyan(160-787)dibînin. O. Lutfu Berkan jî Zerikiyan wek cemaat-i Kurdan nîşan dide.(182-47) Li aliyê din li ser girêdana Zerikiyan ya zendên din jî ramanên cûda hene. C. Orhonlû dinivîsîne, ku di salên 1716 an de li 26 gundên Gerger û Kahta Zurkanli yên girêdayî Reşiyan e bi cîh bûne. Ji bo ku ew Zerikî li gelê wir zilim kirine, ji waliyê Rakkayê re ferman hatiye şandin ku ew bên ajotinî Rakkayê.(183-50) Li wir tiştê derdikeve holê ewe, ku ew Zerikiyên hatinî şandinî Rakkayê,

piştre bi Kurdên din ên niha li hêrêmê dijîn ve hatine Anatoliya Navîn. Lê gor Cemal Şener ku wî ji deftera Cevdet Dahîliyê hejmar 5657 an girtî jî: Di sala 1780 an de, di dema Abdulhemîdê I an de, gelê nîştecîh ên li Gumuşhane, Kûrûçay, Kemah, Refahiye, Çemîşgezek, Kemaliye û Tercanê sê daxwaznamе didin padîşah ku êlên mîna Beyh Hesen, Dêrsîmî, Guvenî, Xiranî, Kawî, Zerikan, Gernî, Dûçekî, Qoçgirî, Şadî, Bazugî, Bektaşî, Benamî, Çakalî û Gureşî yên li çiyayên Kûrûçay, Kemah, Refahiyê, Bektaşli û Ozî (Kûrûçay) û yên li geliyê Kemah û Ezinganê û yên li Tercanê bên girtin û kom bi kom li cîhên din bêne nîştecîh kirin.(183-51) Di vê belgê de jî derdikeve holê, ku wê demê ew êl parçe bûye û hinek jê berbi bakûr û hinek jê berbi Anadola Navîn çûne. Ji gundiyên Zirqan (Eskî Karsak-Polatli) Fîrdewsa (1920) Mihê Ûsê û lawên wê, ew ji Erzirûm Qereyaziyê hatine. Berê ew çûne Înegola Bûrsayê, demeke dirêj li wir rûdinên. Piştre bi Tirkên wir ve nakokiyên wan çêdibin û tên Polatliyê. Gor hesabê me tev kirî, cîh bûna wan îro digihîje berî 200-260 salan.




**Zerikî (Eskî Karsak) - Polatli**

Di sala 1848 an de, êla Qoçgirî ya girêdayî sencaxa Dêrsîmê wek navçe hate qebûl kirin û dest bi sandina bacê kirin. Di sala 1849 an de serokê êlê Huseyn Beg bû.(116-36) Di sala 1856 an de wek **"Aşaîrî Zerikî"** li Tekman û Humusê navê xwe hatiye nivîsandin. Di sala 1856 an de wek lîva-sencaxa Zeriqî, ji rojavayê gola Wanê heta çemê Hîzan û heta Lîcê dirêj dibe. Ji başûrê rojhilatê Elezîzê heta rojhilatê Amedê û tevahî Mêrdînê jî dike nava xwe. Bi wê herêma fireh re Zeriqî tê gotin.(182-46)

Gor rapora dewleta Tirk a bi mora "pir pir dizî" Zirkan yan jî Zerkan 10.000 kes in; Kurmanc in û şafiî ne. Hinek li Qereyazi, Tekman û gundên wan in; hinek jî: Li Xinis û gundê wê ne.(108-137) Li Qoçgirî-Îmranliyê 4311 kes in, Elewî ne û Kurmancî diaxifin û tevlî serhildana Qoçgiriyê bûne.(108-281) Dîsa li Îmranliyê êla Qoçgirî heye ku hejmara xwe 12 716 ye; Elewî ne.(108-280) Li Îmranli-Sêwasê û gundên wir, 4311 kesên Zerikî hene, ew Kurmanc û elewî ne. Têkiliya wan bi êlên di navbera Sûşehrî-Sêwas û Refahiyê-Ezingan ve hene.(164-188)

Wekî her konı yan jî zendêka Kurd Zerikî jî ji gelek êlan pêk tên, li gelek cîhên cûda xuya dikin û gor nûseran jî ew tê guhartin. Gor Lynch, êlên li Erzirûmê ev in: Zirekî, Cibran, Zirkan, Zîlan, Hesenan, Heyderan, Adaman, Sîpkan, Mamakan in. Rûs Averîanov jî vana lê zêde dike: Cemaldinî, Celalî: (Kotan, Soran, Sagan, Keçanan, Dutkan, Kapdekan, Hesenan, Cînankan), Kaskan, Şadelî, Bedelî, Korûcan Kizilbaşlari (Çarik, Balaban, Bal-Ûşaxi, Keçilan û Lolan).[12-279] Li bakûrê Xinisê 7.000 malên Zerikî hene, bi êla Cebranli ve gelek nêzîkî hev in.[19-184] Zerikan-Zerikî li: Rakka, Semsûr, Aksaray, Amed, Erzirûm, Mêrdîn, Eyyûbelî-Aksaray, Sêwas, Kahta, Meletî, Mûş, Bedlîs, Erxaniyê dijîn.[160-168] Girêdayî Meletî, Kaza-î Kahta Mezraî Zirekanî heye.[97-361] Li Qoçgiriyê 15-17 gundên Zerkî hene. Dîsa li Qoçgiriyê êlên mîna: Atme, Ebbasan, Badilliyan, Pezgewran, Canbegan, Çareqî, Dimilî, Dirêjan, Gernî, Ginîan, Gondilan, Îzolan, Şadî, Resûlî, Rîciqî, Pezrewî, Parçiqî, Pîlweng, Qalxan, Qoçgirî ( Îbîkî, Îvîskî, Balo, Sariqî, Cefiqî, Sefiqî, Laçinî), Qurmeşa, Xormekî û Zerikî hene.[182-41]

Zirkiyên ji berê ve li Lice-Hezro û Haniyê nîştecîh bûn ji berê ve bi konfederasyona Milan re dijminatiya xwe hebû. Ji ber vê yekê, Azîz Sebrî Begê Zerikî (qaymeqamê Hulle ya kevne û ji Lîcê) jî ji êla xwe kesên ji dil komkirin û tevlî hêzên li hember Îbrahîm Paşayê Milan bû.[138-749]



**Zerikî Civata Saf girtî**

Li ser ola Zerikî ya kevn jî dîtinen balkêş hene, R. Blaga dibêje: Milekî Îsmaîliyê jî Zikrîtî ye. Kîtabeka wan a taybet heye; di nimêj û diayên xwe de

navê Hz. Muhammed avêtine û tenê Qiyama Mehdî (rapêrî Mehdî) tînin ziman.(95-58) Di destpêkê de jî me anî ziman, ku dema Şêxê wan ji Sûriyê hatiye, dest bi propaganda dinî kiriye; piranî êlên ji navenda Xorasanê hatibûn di wê rewşê de bûn. Hecî Bektaşî Welî, Mewlana û hwd hemû oldar in û piranî jî Îsmaîlî ne. Hîna jî Kurdên Xorasanê dibêjin em berê Îsmaîlî bûn. Mezinên Kurdên li navenda Anadolê jî berê digotin em Îsmaîlî bûn. Di rojên taybet de ayîna Zikrê dikirin. Belûcîstan-Torbete Kiç-Çiyayê Mûrat navenda wan e. **Li Belûcîstanê ji wan re Zirkî yan jî Daî tê gotin**. Beşek jî li Qereçiyê dijîn.(95-58) Gelek balkêş û ecêbe, ku dide xuyakirin ku Kurd çawa belav û asîmîle bûne. Zerikiyên îro li Sêwasê dijîn ecêbe ku hîna jî bi rojê bawer dikin û sibê zû li ber rojê ayîna xwe ya pîroz pêk tînin. Ew bi wêneyan jî me tespît kiriye. Xêr ji vana jî Kurdên li navenda Anadolê êdî vê ayînê bi kar naynin û berovajî vê xwe sunnî dizanin. Wek mînak parçeyên wan a li Polatli-Enqereyê ku li gundê Zirqan (Eskî Kasrak) dijîn ew ayîna olî terk kirine.

Bi dîtina min ew bi dor û ber re giredayî ye. Lewra Zerikiyên li Polatliyê dora xwe bi misilmanên henefî re dorpêç e; yên li Qoçgiriyê jî elewî ne. Sedema guhartinê ewe.

## MILAN

Li ser navê vê konfederasyonê ti agahî nînin; lê wekî bê texmîn kirin peyveka kurdî ye û jê ev wata derkeve: koma ji parçê mezin veqetiyayî, yan jî koma parçê mezin temam dike. Hinek dîtin hene û îddea dikin, ku beşek ji Kurdan (dibe ku ew Kurdên li dervayê welat bin) di dema kevn de bûne du beş, mîna Mil û Zil an jî Milan û Zîlan. Dibe ku Milan jî navê xwe ji vê veqetînê girtibin.

Di derbarê dîroka Milan ê kevn de agahiyên me têr bikin nînin; agahiyek ji alî Rişwanoglû ve tê dayîn. Gor wî di sala 991 ên hicrî de, ji sencexa Alaiye, Milan wek **"Taîfa Qere Yoruk"** dihate binavkirin.(128-96) Yanê wê demê ew li Antalya bûne. Gelo ew di dema Ebbasiyan de hatin, an berî hatina Tirkan? Îhtîmaleka mezine ku berî hatina Tirkan ew hatine rojavayê Anadolê. Dîsa jî ew zêde lêkolînê dixwaze. Navê QereYorukê lê hatî dayîn jî balkêşe; lewra di tirkî de kara tê wata reş; gelo ew bi Reşiyan ve yek kom bûn? Êlên di nav Milan de û têkiliyê dîrokî yê navbera herdû koman jî wê dîtinê bi hêztir dike. Li ser vê babete birêz Kocadax ji Dîroka Wanê niqteyeka balkêş radigihîne: " ...Êla Cibranli ya girêdayî Milan, di sedsala X an de li Teke (Antalya) rûdiniştin, ji wir hatin şandinî Rihayê, ji wir jî çûn Wêranşehrê. Piştî wê di pêşengiya axayê êlê Şehsûvar de çûn Varto, Bûlanik û Karliovayê.(17-193) Dîsa Qeregeçîliyên girêdayî Milan, di fermanên Osmanî yên di sala 975 ên hîcrî de wek "Teke Sencaxi Yorukleri" derbas dibe.(128-96) Di belgeyên Osmanî de Milan wek **"Goçer/Tirkmen Ekrad-Ûlûs Taîfesî"** derbas dibe.(91-62) Ji bo ku ew komên Kurd ji rojava çûne Kurdistanê, nûserên Tirk îddea dikin ku ew Tirk in. Lê ti seneta wan ê tapoya

li ser rojava tunebû ku ew êlên Kurd jî Tirk bin...

Di beşên derbasbûyî de jî min qala secera li gundê Şarikê kiribû, ew di sala **1186** an de hatibû nivîsîn ku 12 êl/kom ji Xorasanê hatibûn û di nava wan de Milan jî hebûn û li herêma Dêrsîmê bi cîh bûbûn. Vê yekê Dr Yilmazçelik jî dipejirîne: Piraniya êlên li Dêrsîmê di sala 1300 an de ji Xorasanê hatin, êlên sereke ku hatine ev in: Şêx Hesenan, Kureyşan, Hormek, Îzol, Şeydan, Karsan, Milan û Bamasûr.(116-18)

Li ser Milan dîtineka balkeş jî ji alî birêz E. Kiran ve tê kirin ku konfederasyona Milan di sedsala XVI an de hatiye damezirandin. Ew mumkune, lewra di vê sedsalê de êrîşên herî dijwar li dijî Kurdan pêk hatibûn ku wê yekê ew karê yekîtiyê hêsantir kir. Kiran dibêje: Konfederasyona Milan di 1500 an de hate damezirandin. Eger di orjînala Şerefnamê de tune xerê, Şerefxan wê çaxê êlên li bajaran e nivîsîne, lewra Milan gelê çiya ye. Hinek nivîskar dibêjin ku di dema Yawûz de, hinek êlên Milan li Anadoliya Navîn digeriyane. Orhonlû dibêje di sala 1707 an de Milan li Mêrdînê bi cîh kirin.(113-75) Li Anadolê bûyîna Milan ji sedî sed e, lê weqas qetî nizanin ku ew di nava kîjan mîrîtî yan jî komê de bûn. Ew dikare bibe Germiyan, Qeremanî û yên din...îddea Orhonlû jî raste, lewra wan salana dest bi cîh kirina êlan kiribûn. Wekî min gotibû Reşî di sala 1692 an de ajotibûn Rakkayê û ji wê demê bi şûnde êdî êl û komên din bi cîh kirin.

Di defterên Osmanî yên piştî sedsala XVI an de em êdî bi hêsanî şopa Milan dibînin. Di deftara Mufassala Osmanî ya, di sala 1518 an de, gelek gund bi ser nivîsa "Cemeetî Mîlîlî Bûzûrg" yan jî "Cemeetî Kohpînîklû" hatiye nivîsîn. Li başûrê Çemîşgezekê di defterên tahrîr de wek "Karyê-î kişlak-i **Ekradî Zahuranlû**" yan jî " Ekradi Kizil Maxaralû derbas dibe.(118-73) Ew jêdera ji bo me girînge; ji vê em fêr dibin ku Zaxûran-lû Milan in. Zaxûran li Xorasanê gelek in. Bi vî awayî girêdana wan hîn sexlem bû. Gundê Milan yê di sala 1518 an de li Çemîşgezek wek Millîlî Bûzûrg hatiye nivîsîn û ev in: Gundê Bîliç (27 xane), Cat Kurd,(17) **Germîkar,**(32) Hidirozu,(28) Komler, **Kurdan**,(35) Oxûz,(34) Tekûr(19) ê girêdayî nehiya Belde ne. Gundê Mîlîlî jî girêdayî nehiya Gunduze û 33 xane ne.(118-213) Navê gundên vê komê gelek balkêş in ku mirov nikare vê yekê ji dîroka wan qut bike. **Gundê bi navê Oxûz, Germîkar û Kurdan wekî dîroka wan Kurdana dide eşkere kirin**. Di gelek jêderan de navê êlêka Kurd her dem wek Kurdan derbas dibe. Dibe ku ew Ler yan jî Dimiliyên di bin sîwana Milan an jî navê demî Germiyan de bin. Heman nivîskar wiha berdewam dike: Di defterên Osmanî de, êla bi navê " Cemeeti Mîllîlî Bûzûrg" hatî nivîsîn êla herî zêde ye. Li gelek deran jî ew wek " Ekradi Millî" derbas dibe. Milan li heşt gundên Belda Çemîşgezekê dijîn. Di sala 1518 an de wek 225 xane 45 mucered (şexs), di 1523 an de 248 xane 27 mucered, di 1541 an de 313 xane 207 mucered derbas dibe.(118-77) Êlêka bi navê Mililî Kuçuk jî heye ku tê fêhm kirin ku şaxekî Milan e. Li gundên mîna Derderiç û Saxnaklû ya girêdayî Belde dijîn û di sala 1541 an 118 xane û 29 mucered bûn.(118-82)

Di qeydên Osmaniyan de mentalîta wan jî diyar dibe; vê dewletê ji sedsalan vir ve ye tim xwestiye ku Kurdan ji cîhên baş derxe û bajon cîhên bejî û zûva. Yanê, bi Kurdan welatekî nû servebigre û piştre jî ya wan bikujê yan jî bişine çiya…Ji bo vê Qeregeçî mînakeka başe: Êla bi navî Qeregeçîlî, ji 30 salan zedêtir e ku havînan jî zivistanan jî li sencaxa Teke (Antalya) cotkar in. Tu jî ji min **dixwazî ku ew li deftera sencaxa Tekê neyên qeyd kirin**. Eger ji 10 salan zêdetir li wan deran rûniştine, divê tu li defterekê qeyd bikî! Sala 975-**1562**.(161-11) Ji vê fermanê jî diyar dibe ku di wê demê de jî dubendî dikirine û dixwestine Kurdan ji cîhên baş derxînin. Kurdên ku ew welata rizgar kirine û xwîna xwe rijandine vê carê jî rastî nijatperestiya Tirkan dihatin. Doç. M. Eroz dibêje: Navê Qeregeçîlî şaxekî Qeregeçîlî yê Bûrsê ne. Bûne Kurd.(99-38) Di vir de xapandinek, dirûtiyek û bi dîrokê lîstin heye; ew ne Tirk in ku bûne Kurd! Ew Kurdên ji ber Tirkan hatine Anadolê û li rojava mîrîtî avakirine, piştre ji alî Osmaniyan ve dîsa hatine şandinî Kurdistanê. **Di nav gundên Qeregeçîlî de gundekî bi navê "Salûr" heye**. Wekî tê zanîn ew ji 24 êlên Oxûzan yek e. Turkan (Têrikî) berê cîranê Qeregeçîliyan bûn, girêdayî wan bûn, lê paşê bi zorê girêdayî Milan bûn.(99-38) Ji vê mirov dikare derxe, ku ji 24 êlên Oxûz Salgur kalên Qerekeçiyên Kurd in. Eger ew îddea rast be, wê demê Qerekeçî berê êlêka serbixwe bû û piştre bi Milan re hate girêdan.

Berovajî Orhonlû E. Xemgîn dibêje: Êla Milan li Mêrdînê dijî. Serokê êlê Gazî Beg çend caran êrîşî Salmas kir, bi ser wê de waliyê Tebrîzê Pîr Bûdak Xan çû ser Milan. Gazî Beg, ji Osmaniyan û Mehmûdiyên Wanê alîkarî xwest. Mehmûdiyan 10.000 leşker şandin û di sala 1616 an de şer derket û Pîr Bûdak têk çû. Di sala 1639 an de peymana Zaxo pêk hat û piştî wê êdî Osmaniyan xwestin mîrîtiyên di nava sînorên xwe de ji holê rakin. Ew plana hêdî hêdî pêk anîn. Ji bo ku Mêrdîn girêdayî Bexda bû, gelê herêmê jî bo giliyan Mêrdîn kiribûn navend û serokê Milan jî jê re çareserî didît. Ji bo vê, waliyên Heleb û Amedê jî jê ditirsiyan. Di sala 1790 an de Silêman Paşa hat Mûsilê û artêşeka ji 30.000 siwariyên Kurd pêk hatî tevlî xwe kir û waliyê Helebê Kosê Mistefa Paşa, waliyê **Rakka Ûzûn Îbrahîm Paşa û Mûtasarifê Meletî Rişvan Paşa jî bi hêza xwe tevlî Osmaniyan bûn. Tîmûr Paşayê Milan berbi Helebê vekişî. Paşê, di 1793 an de Tîmûr Paşa bû waliyê Rakkayê. Di 1839-1842 an şerê Osmaniyan-Misir de serokê Milan Tîmavî Beg bû** û alîgirê Misrê bû. Paşê bi dor Mehmût û Îbrahîm Paşa bûn serok. Di 1878 an de Osmaniyan esker şandin ser Îbrahîm Paşa û ew girtin û anîn Sêwasê.(100-359) Bi Tîmûr Paşayê Milan re girêdayî gelek kilam li Anatoliya Navîn di nav gel de tên gotin…**Milan** bi Îbrahîm Paşa ve gelek bi nav û deng û bi hêz bûn. Gelek der û doran tevgera wî xirav dikirin û navê wî wek eşqiya belav dikirin. Gerokê Swêdî wê demê wiha dinivîsîne:

Alexîs Kûyienstîerna, hîn neçûbû cem Îbrahîm Paşa, ji alî der doran ve hatibûn tirsandin û paşa li ber çavên wî hatibû reşkirin. Bi gîştî jî di pirtûka wî nivîsî de, hezkirina ji bo Kurdan kême, tewerê nefretekê mirov dixwîne, li

hember Tirkan û eskerên wan ji berovajî vê ye. Dema diçe Nisêbînê, walî jê re wiha dibêje: "Hewcê nake ku tu ji Îbrahîm bitirsî, berovajî tu dikarî mêvanperweriya wî bibînî. Îbrahîm Paşa ti caran rêwiyên serbixwe zirar nedayê û ew nekuştine."[188-282]



**Îbrahîm Paşa**

Celîl vê bûyerê wiha dinivîse: Osmaniyan ferman da waliyê Bexda ku Milan bi sînor bike, lewra dewlet aciz dibû ku Milan heta Heleb û Amedê bandora xwe belav dibû. Di sala 1791 an de seferek li hember Milan û serokê wan Temûr Paşa pêk hat. Ji Helebê walî Koca M. Paşa, ji Meletî walî Rişvanzadê Omer Paşa û yên din bi eskerên xwe ve êrîşî Milan kirin, Temûr rêviya Helebê.[113-145] Temûr serokê êla Milan bû, demeke li dora xwe hêzeke zêde civandiye, baca kom dikir ji nedida dewletê û zextê li der û doran dikir. Di sala 1204/1791 an de waliyê Bexdayê Silêman Paşa hêza xwe bi tevahî komkir û

çû ser. Di sala 1205 an de, Îbrahîm Ûzûn Paşayê li Rakka, waliyê Helebê Kose Mistefa Paşa û Mûtasarifê Meletî Omer Paşa yê Reşî yê li wê herême û şer baş dizanin jî dane bin fermana wî. Temûr zanî ku nikare li berxwe bide vekişî cîhê bi navê Bûk. Mal û milkê Milan ji alî eskerên Osmanî ve hate talan kirin. Piştre çûn ser Temûr Beg û ew bi 50 meriyên xwe ve reviya Helebê. Bira û dijminê xwe Îbrahîm Beg ji alî Silêman Paşa ve wek serokê Milan hate destnîşan kirin. Îbrahîm şandin şopa birayê wî. Di sala 1209 an de Temûr çû Bexda û xwe avêt bextê paşa.(163-1505) Ew nexweşiya Kurda ya wê demê ez bawêrim dawî lê hat û êdî ti serokên Kurd bi hêzên dagirkeran ve naçe ser birayê xwe. Bê guman vê belavbûnê zirareke mezin da Kurd û Milan; ew zenda wekî dewletekê xwe tevgerkirî û li ser axa gelek firêh dijî, belav bû. Piştî vê serhildanê êdî gelek ferman û bicîh kirinên bi zorê hene.

Di sala 1701 an de **ji waliyê Erzirûmê Nûman re ferman** tê şandin ku Milan bên cezakirin. Di sala 1707 an de li Mêrdîn û di sala 1711 an de li Rakkayê bi cîh kirin.(112-138) Di sala 1711 an de Milan li dora Amedê dijîn, ji bo ku der dorên xwe zirar didan ew hatin ajotinî Rakkayê. Bi wan re, êlên mîna Badilli, Zercî û yên bi wan re girêdayî yên mîna Şikakî, Beyzekî, Şerkiyan û Şerkiyên Beyzekî bi bahana zozanan çûn alî Xinis, Tekman, Pasîn, Kîxî û Tercanê. Di sala 1718 an de ji bo ku bi cîh bibin ji Amedê re hatin şandin.(156-136)



**Konaxa Îbrahîm Paşa / Serê Kaniyê**

Milan zendekî pir mezine, li her cîhê Kurd lê dijîn mumkune ku mirov êlên ji Milan bibîne. Yek ji wan parçana jî Anadola Navîn e. Carna gor herêman navên cûda jî li wê zendê têne kirin. Li Serhedê dibêjin: Milanê Gamirî, li Anatoliya Navîn jî dibêjin Milanê Gawestî.(113-73) **Kutukanli**-Kûlûkanli ji êla Milî Kebîr in û li Rakka, Erxanî, Dîlokê dijîn.(160-550) Kutun Ûşaxi-Kutuk Ûşaxi li Qonya û Bozokê dijîn.(160-568) Li Kaman û gundên girêdayî wir nêzîkî 10 gundên **Pisiyan** hene. Dîtin hene ku wana dikin nava Milan, lê di nava vê zendê de em ti êlên bi wî navî nabînin. Çawa berê jî min nivîsî gereg ew girêdayî Beraziyan bin. Gundên xwe ev in: Kotaz (Çadirlikormemed), Pisiyan ( Çadirlihaci Bay-

ram), Çadirli Haci Yûsûf, Axapinar, Kekîllîalî, Tatik, Melle Osmanlar, Îkîzler, Hîrfanli ne. Tê texmîn kirin ku ew di sala 1730 an de bi cîh bûn.

Êla Qeregeçiyan bi Milan re xuya dikî jî, li Eskîşehîr, Bîlecîk, Bûrsa, Balikesîr û Adapazariyê ne û nifûsa van zêde ye. **Tê gotin ku ew ji Kayiyan e**.(128-103) Di navbera salên 1864-1873 an de êlên bi cîh bûne, yan jî hewl didan ku bi cîh bibin li Balikesîr nêzîkî 40 gund bûn. Li herêma Karesiyê êlên pêş ev bûn: Akça Koyûnlû, Bûrhanli, Caferlî, Çepnî, Hardal, Qeregeçîlî, Kilaz, Kubaş, Soxutlu, Yayci û Bedîr bû. Ji wana Kubaş li 28 parçan, Qeregeçîlî jî 14 parçên belav bi cîh bûbû. Hinek ji Qeregeçîliyan li Sarûhan û Hudavendîgarê di sala 1843 an de belav hatibûn bi cîh kirin.(90-118)

Seferoglû dibêje:12 oymaxên Milan hene: Berazî/Barzikanî, Cibran, Qeregeçîlî, Hesenan, Zirkan, Sîpkan, Qerebaş, Şêxan/Şihan, Şidan/Seydan, Hûytû, Biritî, Şikak.(91-62) Berazî, Cibran, Zerikî, Sîpkan komên mezin in. Dibe dema nivîskar van digihîne hev ew wek konfederasyon bûn. Hemû ew êlên tên hejmartin gelek nezikî hev in û gelek tevlîhev bûne, lê mirov nikare hemûyan têxe bin sîwana Milan.

E. Kiran jî dibêje: Êlên cara yekemîn ku Konfederasyona Milan çêkirin ev in:

**1. Xidrekan:** Wêranşehr
**2. Torûnan:**
**3. Hecîkan:** Sîwerek
**4. Kuran:** Qerecdax û Wêranşehr
**5. Kumnexaşan**: Wêranşehr
**6. Sînkan**: Wêranşehr, Sîwerek.

Piştî wan jî van êlana ketin wê konfederasyonê: Badilan, **Tirkan**, Kejan, Îzol, Bergûhana, Meheliyan, Abiyan, Balekan, **Nasiran**, Şerqiyan (Êzdiyan), Dêwan, **Seyidan**, Çûvan, **Alreşan**, Şerabiyan, Dodikan, Bilkasman, Şekîran, **Şêxan**, Sermastan, Cemaldînan û Erebên Îbnî Xetîban, Advanan, Begaran, Hadîdiyan, Nihêmiyan û Birneşiyan. Tirkan û Kejan 300-500 sal berê ji Şengal bi zorê rabûne. **Canbeg û Badilî** jî carna xwe wek Milan nîşan didin.(113-81) Ew dîtin bi min rastir tê. Lewra, wekî bere jî min nivîsî, gelek ji wan êlên piştre tevlî bûn, ya ew serbixwe ne yan jî girêdayî zendên din in. Wek mînak: Nasiriyê girêdayî Reşiyan e.

**Li rojhilatê Kurdistanê êlên Milan ev in:**

| | |
|---|---|
| Koseyan | Memikî (Artêşa Sor-serê xwe sor girêdidin) |
| Baliyan | Seyidan |
| Dodikan | Şêxika |
| Omoya | Keçêliya |
| Qirdoya | Sarima |
| Delaya | ? |

M. E. Zekî jî wan êlêna wek Milan dinivîse.[19-180]:

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Vana | 250 | koçber | Seydan | 450 | Koçber |
| Keyran | 450 | " | Dudikan | ? | ? |
| Heycan | 700 | " | Keleş | ? | ? |
| Mendan | ? | ? | Gomariş | 350 | koçber |
| Şerqiyan | 80 | koçber | Alkevat | ? | ? |
| Daş | ? | ? | Kalendala | ? | ? |
| MeŞketlî | ? | ? | Hecîbayram | ? | ? |
| Hesenkan | 250 | koçber | Halacarî | 700 | koçber |
| Aliyan | ? | ? | Yedîsat | 80 | koçber |
| **Tirkan** | 700 | koçber | **Nasiriyan** | 70 | " |
| **Canbeg** | ? | nîştecîh | **Mirdêsî** | 1.000 | ? |
| Çuvan | 310 | koçber | Sartan | 80 | koçber |
| Asbahan | 70 | " | Matîmiye | 800 | " |
| Çemîşkan | 250 | " | Barkovan | 150 | " |
| Çayereş | ? | li Qerecdax | Zeberûfkan | ? | li Qerecdaxê |
| Taxbaşi | ? | Sîwerek | Bucak | ? | Zaza, Sîwerek |
| Hoşînan | ? | " | Beskî | 800 | --- |
| Cacîman | 500 | koçber | Kasiyanî | ? | koçber |
| Çekalî | 1000 | " | Atirkeşî | ? | ? |
| Bexliyan | 500 | nîştecîh | Derican | 800 | koçber |
| Kawî | 5.000 | nîvkoçer in | **Molikan** | 500 | ? |
| Qeregeçîlî | 170 | Sîwerek. | ----- | --- | --- |

Rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" Milan li Wan-Ozalpê wek 4000 kes nîşan dide û dibêje şafiî ne û nîv koçber in.[108-349]

Bi vî awî eşkere dibe ku ti zend, êl û komên Kurdan yên tevhev û parçê nebûne nîn in. Pêvajoya dîrokî jî wê yekê dipejirîne. Ew parçebûn û ketina nava hev di nava êlan de, di ziman, ol, kinc û çanda civakî de jî derdikeve pêşberî me û li benda lêkolînan e.

## JÊDER Û ÇAVKANÎ


1. Tarîh Îçînde Haymana-Halîl Îbrahîm Uçak-1986-Ankara-H. Yardimlaşma Dernegi no1.
2. Kürtler ve Kürdistan-V. Minorsky,Th. Bois,D.N.Mac Kenzie-Doz-96-Çev.Kamuran Firatli
3. VII-X yy. KÜRTLER-Arşak Poladyan-Oz-Ge-1991-Ankara-Çev.Mehmet Demîr
4. Îslamiyete Kadar-Kurdistan Tarîhî- Cilt 1 E. Xemgîn
5. Lêkolîn-6. Dr. Cemsit Bender-Înstîtuya Berlîn
6. Antîk çagda Kürt Tarîhî-Torî
7. Kürt Tarîhî ve Uygarligi-Dr. Cemşît Bender-Kaynak yayinlari-1991
8. Kürtlerin Tarîhi-Dr. Fritz-Çev. Sînan Şanlier-92-Îst.Hasat Yayinlari
9. Diroka Kurdistan bi kurtebirî-Ekrem Cemîl Paşa-În.K.Brukselê-1995
10. Tarîh ve Uygarlik-Anadolu,Kurdistan,Mezopotamya-Şerefxan Cizirî-Rewşen-1992
11. Kürt kokenî Buyuk Boylar-Welatê,Nêrgiza TORÎ-Koral-1991-Îstanbûl
12. Kürtler- Sosyolojik ve tarihi Inceleme-Bazîl Nikitin- Cilt-1-2 Deng-1994-Îstanbûl
13. Mervanî Kürtlerî Tarîhî-Ibn'ul- Ezrak-M.Emîn Bozarslan-Koral-1990-Îstanbûl
14. Geçmişten gunumuze-Kürtler ve Kurdistan-Cografya, tarîh, edebiyat- K. Burkay-Deng1992
15. Malatya Baliyan Aşîretî-Hasan Nedim Şahhuseyinoxlu-1991-Îstanbûl.
16. Çend Rûpel ji Dîroka Gelê Kurd-Dr.Mezher Ehmed-Elîşêr-Stockholm 1991-APEC
17. Doguda Aşîretler, Kürtler, Alevîler-Bûrhan Kocadax-ANT-1992-Îstanbûl
18. Anabasîs-Xenephon
19. Kurdistan Tarîhî-M. Emin Zeki-Beybûn-1992
20. Urfa Haçli Kontlugu Tarîhî (1098-1118)I. Cilt-Prof.Işin Demirkent-Turk Tarih kurumu Basimevi-1990-Türk Tarih Kurumu Yayinlari
21. Kürt Gerçegi-olaylar,Oyunlar,Çozûmler-Zekeriya Yildiz-Yeni Asya Yayinlari-1992
22. Kürt Aşiretleri Hakkinda Sosyolojik Tetkikler-Ziya Gokalp-Sosyal Yay.-Hazirlayan, Şevket Beysanoglu.
23. Türklerin Tarîhî-Dogan Avcioglu-IV.Kitap-Tekin Yayinlari-1984
24. Türklerin Tarîhî-Dogan Avcioglu-V. Kitap-Tekin Yayinlari-1984
25. Erzincan-Ali Kemali(eski vali)-Kaynak Yayinlari Îstanbûl -1992
26. XIX: YY: da Osmanli Imp. Kürtler-Dr.Celile Celil-Ozge Yayinlari-Anakara-1992
27. Tarih Içinde Anadolu Sakinleri ve Isyanlar-Ayaklanmalar-Abdulhadi Toplu-Ocak Y.Ankara-1996
28. Osmanli-Rus ve Iran Savaşlari'nda Kürtler 1801-1900-Avyarov-Osmanlicadan Muhammed (Hoko) Varli(Xanî)-Sîpan Yayinlari-Ankara -1996
29. Batili Seyahlarin Gozuyle Kürtler ve Kurdistan-I.Şerîf Vanly-Avesta-1997
30. Çagdaş Kurdistan Tarîhî-Lucian Rambout-Firat-Dicle Yayinlari-1992-Îstanbûl
31. Anadolu Beylikleri-Prof.Îsmaîl Hakki Uzunçarşili-TTKY-Ankara-1988
32. Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500 Cilt 1-Abdullah Memê Mehmed(Hoko)Xanî Varli-Sîpan-1997
33. Yezidilik ve Yezidilerin Kökeni-Erol Sever-Berfin-Îstanbûl-1993
34. Kurdên Haymana-Georges Perrot-Fawaz Husên-2000-apec
35. Anadolu Beylikleri Hakkinda Araştirmalar II. - Prof. Yaşar Yucel, Türk Tarih K.- 1991
36. Xorasan Kimin Yurdu? Faîk Bulut- Berfin-1998-Îstanbûl
37. Atalarin Karşilaşmasi-Derbend ve Şervan Ûlkesinde Kürtler ve Alanlar-Cemal Reşîd Ahmed-Avesta-werger ji Erebî Siraç Direk 1998, Îstanbûl.
38. Med Imparatorlugu Sonrasinda Kürtler- Tori-Aram yay. 1999- Îstanbûl
39. Kürtlerin Tarîhî ve Cografyasi Hakkinda bir Araştirma-Kazim Yeşîlgoz- 1996 Ankara
40. Ali'siz Alevilik-Islam'da Ozgurluk Arayisi-1,Faik BULUT-Berfin-Îstanbûl-1998
41. Babek- Said Nefisi- Berfin-1998-Îstabul

42. Kürt Kulturunun Kaynaklari ve Uygarliklar Beşigî Kurdistan- J. Kurdo- Ozge yayinlari-1993 Türkçesi:Huri Tuşik Ozkurt
43. Dogu Anadolu Turk Devletleri Tarîhî- Prof. Osman Turan-Bogaziçi Yayinlari-4. Baski
44. Genel Kurmay Belgelerinde Kürt Isyanlari 3- Kaynak Yayinlari- 1992
45. Hîwa- Nr 24 -Lêkolînek di rengên ola kurdî ya kevin de- Dilşa Yusif, O.Politika
46. Hurriyet-2. Şubat.2001-Cuma
47. Gurculer- David Marshall Lang- Ceylan- Nesenur Domanic-1997-İstanbûl
48. Abul-Farac Tarîhî-1-Gregory Abu'l-Farac-Ömer Riza Dogrul-1987-2.Baski-Türk Tarih
49. Kürtlerin Kökeni ve G. Anadolu Gercegi-M. Sadi Kocas-1990-Kastas yayinlari
50. Êzidiyatî-Ola Êzidîyan-Xidirê Silêman, Xelîlê Cindî-Avdar-1995
51. Kürtler-Minorsky-Koral yayinlari-İstanbûl, 1992
52. Aleviligin Kokenindeki Mazda Inanci ve Zerdûşt Ogretisi-E. Xemgin-Berfin-1995
53. Mazda Înancindan Alevilige .I. Etem Xemgin- Mezopotamya Yayinlari-2000
54. Eskiçagda Harran-Aynur Özfirat-Arkeoloji ve Sanat Yayinlari-1994
55. Urartu Kraligi Döneminde Elazig(Alzi)Kemalettin Köroglu-Arkoloji sanat Yay.-1996
56. Yzb. Frederick Burnaby-Kucuk Asya Seyahatnamesi,Anadoluda bir ingiliz Subayi 1876-Sabah Kitaplari 1998-Ceviren Meral Gaspirali
57. Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydinlar-Mehmet Kemal Işik(Torî)-Sorun yay.-2000
58. Tarihselden Guncele Kürt Gerçexi- Mehmet K.Işik( Torî)-Sorun yy.2000
59. Kürtler ve Kurdistan Tarîhî-I- Botan Amedi-Firat-Dicle yy. 1991-İstanbûl
60. Alevi Kürtler- Erdal Gezik- Kalan Yayinlari
61. Diyabakir- Dr. Ilhan Akbulut- Tukelmat AŞ. 1996-Izmir
62. Çerkes Tarîhî-Hayri Ersoy-Aysun Kamaci-Tumzamanlar Yayincilik-1994-İstanbûl
63. Kürtler-Kreyenbroek-Sperl-Cep-Belgesel-1994 İstanbûl
64. Suryanilerin Kokeni ve Türkiyeli Suryaniler-Yakup Bilge-1991- İstanbûl
65. Kürt Milliyetciliginin Tarîhî- Wadie Jwaideh-Iletişim Yayinlari-1999-İstanbûl
66. Atlas över mänsklighetens Historia-Bonniers
67. Historia med nya ögon-Anfang Förlag-1996- Stockholm
68. Ninova ve Kalintilari-Austen Henry Layard-Avesta,Çev. Zafer Afşar-2000
69. Bonniers Varldshistoria- I, II Flodrikena- Bonnier-1982
70. National Geographic- Nr; 4 Solens Faraoner -2001
71. Zerdûşt-Proto-Kürt bir peygamber-M. Siraç Bilgin, Rewsen-1997-Stockholm
72. Sumer Rahip Devletinden Halk Cumhuriyetine Dogru-Cilt I-Abdullah Ocalan Weşanên Serxwebûn 108- Ekim . 2001
73. Boken Om Vikingarna-Catharina Ingelman-Sundberg-Prisma- 1998-Stockholm
74. Svensk-Kurdiska Kontakter Under tusen or- Rohat Alakom-2000-Apec
75. Sumer Rahip Devletinden Demokratik Uygarliga- Cilt II- Abdullah Ocalan Mezopotamya Yayinlari 108- Ekim . 2001
76. Svarta Havet-Neal Ascherson-Ordfront-Veger: Lars G. Larsson-Stockholm 1999
77. Selahdînê Eyûbî-Cankurd-Helvest-Stockholm, 2000
78. Dogu Anadolu da Aşîret Duzenî-Ahmet Ozer-1990-Boyut
79. Sumerli Ludingirra-Muazzaz Îlmîye Çig, 3. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
80. Hititler ve Hattuşa-Muazzez Îlmîye Çig, 2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
81. Îbrahîm Peygamber-Muazzez Îlmîye Çig-2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000
82. Osmanli Devletî Tarîhî-I cîlt-Zaman Yayinlari
83. Ma'rûzat-Ahmed Cevdet Paşa-Dr. Yusuf Halaçoxlu-1980
84. Herodot Tarîhî-Herodotos, Remzi Kitabevi, 1991, M. Ökmen
85. Adiyaman-Însanligin Kultur Mirasi-Mehmet Akar-2000
86. Şahname-Firdevsî-Cîlt I, 1956-Îstanbûl
87. Arya Uygarliklarindan Kürtlere, Selahaddin Mihotuli, Koral-1992
88. Padîşah Analari-Alî Kemal Meram, 1997-Ankara

89. Türkistanli Bir Türk Boyu KÜRTLER, Aydin Tanerî, T.K.A.Ens.-1983-Ankara
90. Osmanli Împaratorlogunda Aşîretlerin Îskani, Cengîz Orhonlu,Eren Yay.
91. Anadolunun Îlk Sakînlerî KÜRTLER-Şukru Kaya Seferoglu-T.K.A.Ens. 1982 Ankara
92. Dûnden Bugûne Yenîce ve Şexbizinlar- E. Yurtdaş, H. Çeker, Faîk Coşkun-2003
93. Gecmîşten Gunûmûze Vîranşehîr-Hasan ÎDÎKÜRT-2000-Mersîn
94. Kürtlerîn Îlkçax Tarîhî-Torî, Berfîn yayinlari-2000
95. Handbook Of Iranian Peoples-Rafael Blaga-1997
96. Evliya Çelebî Seyahatnamesî 1-VI Cîld, 1944, Reşat E. Koçu-Türk T. Serîsî
97. Kanunî Devrî Malatya Tahrîr Defterî (1560)-Doç. R. Yinanç-Doç. M. Elîbuyuk/1983
98. Abbasîler Donemî-Prof.Îhsan S. Sirma-1993-Îstanbûl
99. Dogu Anadolu Hakkinda Sosya Kulturel bir Arastirma-Doç Mehmet Eroz-1972
100. Osmanli-Safevî Donemînde Kurdîstan Tarîhî-E. Xemgîn-Cîlt III-1991
101. Îslamîyetten Osmanlilara Kadar Kurdîstan Tarîhî-Cîlt II- E. Xemgîn,1989-Koln
102. Welatê Me- Faysal Daxli, Weşanên Mezopotamya
103. Türkîye dekî Tarîhsel Adlar- Bîlge Umar
104. Dogu Anadolu da Dil-Onomastik Îlîşkîlerî Uzerine bir deneme- Edip Yavuz-1983
105. Abbasîlere Yonelik Dinî ve Siyasî Îsyanlar-Cem Zorlu, Ankara Okulu, 2001
106. Cenupta Türkmen Oymaklari-I-Alî Riza Yalman, 1977- Ankara-Kûltûr Bakanligi
107. Cenupta Türkmen Oymaklari-II-Alî R. Yalman, 1993
108. Asîretler Raporu-Çok Gîzlî-Kaynak Yayinlari-1998
109. XVI yy da ADIYAMAN-Sosyal ve Îktisadî Tarîhî-Mehmet Taşdemîr-1999
110. Kara Koyunlular-I-Başlangiçtan Cîhan-Şah a kadar- Prof. Faruk Sumer-1992
111. 387 Nolu Muhasebeî Velayeti Karaman ve Rûm Defterî-I-(1530, Ankara 1996
112. Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelîşmesînde Anadolu Türklerînîn rolu.Prof- F. Sumer
113. Kürt Milan Aşîret Konfederasyonu-Eyup KIRAN-Elma, 2003
114. Akkoyunlular-Aşîret,Konfederasyon, Împ. John E. Woods, Mîllîyet-1993
115. Anadolu da Türkmen Aşiretleri-Bozulus-1540-1640-Dr Tufan Gundûz, 1997
116. XIX yy Îkicî Yarisinda Dersîm Sancaxi, Doç. Îrahîm Yilmazçelîk-1999 Elazix
117. 387 Nolu Muhasebeî Vîlayetî Karaman ve Rûm Defteri- II- (1530) , 1997 (Amasya, Çorum, Sivas-Tokat, Kara-hîsarî Şarkî, Canîk, Malatya, Gerger-Kahta…)
118. XVI yy da Çemîşgezek Sancaxi, Prof. M. Alî Ûnal, TTK-1999 – Ankara
119. Îşte Anadolu-Omer Tuncer, 1999 Îstanbûl
120. Adiyaman Îlî ve Îlçelerî, Mustafa Sucu , 1986- 2. Baski
121. SINCIK, Ekrem Îzî-Malatya 2000
122. Temel Ozellîklerîyle Kizilbaş Alavîlîk (Talîbîn El Kîtabi) Haşîm KUTLU
123. 12 Îmam ve Alevîlîk-Cemşîd Bender-Zulfîkar Yayinlari-5. Baski-1977
124. Alevîlîk Bîr Sir Dexildir-Ali Haydar Cîlasun-1995
125. Kizilbaşlixin Felsefi Dayanaklari-E. Erîp, S. Guven, A. Kilavuz, A. R. Bîlgîlî-Zulfîkar Yayinlari-1997 Koln.
126. Şarktan Her Zaman Guneş Dogmaz-Rohat Alakom-2003-Apec
127. Dogu Îllerî ve Varto Tarîhî-M. Şerîf Firat-T.K.A.Enst. 1983 Ankara
128. Dogu Aşîretlerî ve Emperyalizm- Dr. Mahmut Rişvanoxlu-T.K. Yayini-1978
129. Kose Paşa Hanedani-Necdet Sakaoxlu-Yurt Yayinlari-1984
130. Selçuklu Tarîhî (511/1118), Dr. Abdûlkerîm Ozaydin-T.T.K. Yayini-1990
131. Oxuzlar, Prof. Faruk Sumer, T. D. A. Vakfi-1999 , Stenbol
132. Çîyayê Kurmênc û Tevgera Murûdan- Roger Lescot- 1993 Swêd
133. Yalan Soyleyen Tarih Utansin-Mustafa Mûftûoglu, IV Cîlt- 1985
134. Dîvanû Lûgat-it-Turk Tercûmesî-Cîlt I-Besîm Atalay-1985- TDKY
135. Dîvanû Lûgat-it-Turk Tercûmesî-cilt III- B. Atalay
136. Tarîh-î Cevdet-Ahmet Cevdet Paşa-Cîlt I –Hîkmet Neşrîyat
137. Diyarbakir Tarîhî-Cild I- Şevket Beysanoglu-Ankara 1987

138. Diyarbakir Tarîhî-Cild II-Şevket Beysanoglu-Ankara 1987
139. Bîrnebûn-Hêjmar 26- Lêkolîn-Zorabê Bûdî Aloîan-2005
140. Rewanduz Kürtleri- Edmund R. Leach- Çev: S. Birwan, H. Ozsoy, Ruken Şengul-2001 Aram Yay.
141. Diyarbakir Evlerî-Orhan Cezmî Tuncer-D.B.B. Yay. 1999
142. Kürtler(İslam Ansîklopedîsî cîlt VI sf 1089-1114)-Belge 2, sayi 2-Komela Çanda Gelê Kurd li Stockholm-1982
143. Cîhanbeylî 1987-Alî Fuat Belgîn Endûstrî Meslek Lisesi
144. Bîrnebûn-18- Araştirma-2002
145. Hiwa-No 131-Heypeyvîn bi Kelîmullah Tewehûdî re-2005
146. Dulkadir Beyligi-Prof. Refet Yinanç, TTK 1989 Ankara
147. Osmanli Devletî-1600-1908, Sîna Aksîn, Metîn Kunt-Cem 1990
148. Lîse Tarîh 1-Kemal Kara-Onde-2002-03 MEBTTKB
149. Tarih Lise II-prof. K.Y. Kopraman-MEB-2002
150. Türk Beylîklerî-Osmanli Belgelerî île Kürt Türklerî Tarîhî, Nazmî Sevgen-1982
151. Belge ve Tutanaklariyla Dersim Direnişlerî-M. Kalman
152. Skytema-Herodots/ Suzanne Unge-1979
153. Guldet Fron Steppen-Aron Andersson, Ann Sandwall-Historiska Museum-1979
154. Kürtler-Mehrdad R. Izady-Doz
155. Osmanli Imp. Derbent Teşkîlati-Cengîz Orhonlu-Eren- 1990
156. XVIII yy Osmanli Imp. Îskan Sîyasetî ve Aşîretlerîn Yerleştîrîlmesî- Prof. Y. Halaçoglu-1991
157. Şerefname-Tarîxa Kurdîstanê ya kevn-Şerefxan Bedlisi-werger: Z. Avci, APEC
158. Bîr Kabile Aîlesînîn Tercûmeî Halî ve Necîp Şahîn in Hatirati
159. Meleklerîn Kûllerînden-Andrew Collîns-Avesta, çev: Zafer Avşar
160. Osm. Imp. Oymak,Aşîret ve Cemaatlar-Cevdet Turkay, Tercûman yy-1979
161. Anadolu'da Turk Aşîretlerî (966-1200), Ahmet Refik-1930 Îstanbûl
162. Osmanli Tarîhî-II-Ahmet Cevdet Paşa, Hîkmet
163. Osmanli Tarîhî-III- Ahmet Cevdet Paşa-Hîkmet yy
164. Koçgîrî Ulusal Kurtuluş Hareketî-Evîn Aydar Çîçek-1999-APEC
165. İç Anadolu Kürtlerî-Nuh Ateş, Komkar 1992
166. Moltke nîn Turkîyê Mektuplari-Feldmareşal Helmuth Von Moltke-Hayrullah Ors
167. Dogu Anadolu da Goçebe Kürt Aşîretî-İsmaîl Beşikçi-Yurt 1992
168. Tarîh Enstitûsû Dergîsî-13, Î. Şahîn, Osmanli Dev. Aşîretlerîn İsîm almalari –1987
169. Tarîh Dergîsî-33, 1638 Bagdat Seferînde Zahîre Nakline Memur Edîlen Yenî Îl ve Halep Türkmenlerî-Îlhan Şahîn 1982
170. Tarîh Enstitûsû Dergîsi-12, XVI Asirda Halep Turkmenlerî-Î. Şahîn 1982
171. Orta Anadolu dakî Aşîretlerîn İskani, Dr. Abdullah Saydam-1993 Samsun
172. Encyklopaedia Iranica-Ehsan Yarshater-II/5-New York
173. Bîrnebûn-I. Hugo Grothe nîn Seyahatnamesî, Mehmet Bayrak-1997
174. Bîrnebûn-III-Celikan Aşîretî-Muzaffer Ozgûr
175. Bîrnebûn-IV- Orta Anadolu Ax. Kürt Motiflerî-M. Bayrak-1998
176. Rişvan Aşîretînin Cemaat,Şahis ve Yer Adlari Üzerîne bîr degerlendîrme- Yrd. Doç. Faruk Soylemez-K.Maraş Sûtçû İmam Unîversîtesi
177. Camî'yê Rîsaliyan û h'ikayetan-Cankurd
178. Bîrnebûn-11-Yunak Kürtlerî-Kenan û Muzaffer
179. Bîrnebûn-19-Orta Anadolu da îlk Kürt Koyu-Rohat Alakom
180. Bîrnebûn-21-Aşîretler Raporu-Dr Mikaîlî
181. Bîrnebûn-23-Tarîxa eşîra Miakîliyan li Polatli ye-Dr. Mikaîlî
182. Veger-6-Qoçgirî Bolgesîndekî Zeriqîler-Yusuf Zerikî-2003
183. Veger-7- Qoçgirî Bolgesîndekî Zeriqî Aşîretînin Tarîhî ve Kokenî-2004

184. Det Dodsdomda Folkets Saga-M. Anholm-1906 Stockholm
185. M. Büyük Îskender-Milliyet-Çevîren: Încî Aslier
186. Ûlkede Gundem-2005.12.22 Prof. Baskin Oran île Roportaj-P. Selek
187. Şehname-Cîld II-Firdevsî-Verger Necatî Lugal-1992 Îstanbûl
188. Aventyr Bland Türkar och Araber- Alexis Kuylenstierna-1912 Stockholm
189. Ozgur Polîtika-5000 yillik şehîr bulundu-Tahsin Oruk-22.01.2005
190. Veger-V- Nivîskar: Abd Al Aziz Omer Hacî Mûsa-Verger: Dr. Xalid Hamza
191. Afyonkarahisar Yoresi Türkmen Mezar Taşlari-M. Seyirci, A. Topbaş
192. H. Tarîxê Kurden Xorasanê-Cild I , K. Tewahuddî-Meshed
193. H. T. Kurdên Xorasanê-Cîld II, K. Tewahodî-Meşhed
194. Ozgur Politika- Zeynep YUCE- 26. Temmuz. 2002
195. Êl û Koçerên Îranê, Îreç Efşar Sîstanî
196. Ship and Society- Gunilla Larsson-Uppsala Universitet -2007
197. Hereketa Tarîxî ya Kurd li Xorasan-Ûstad Rahnêma Dr. Behrewan.
198. Prisma Världshistoria-Joseph Reither
199. Bazil Nikitin- Kurtler



ISBN
91-976138-3-5
978-91-976138-3-5